



ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û EDEBIYATA KURDÎ
YEKEMÎN ÎNCÎLA KURDÎ BI ALFABEYA ERMENÎ
TRANSKRÎPSİYON Û LÊKOLÎN

Amadekar

İlyas SAYIM

TEZA DOKTORAYÊ

Şêwirmendê Tezê

Prof. Dr. Mehmet Zahir ERTEKÎN

Bîngol-2024

T.C. BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANA BİLİM DALI

ERMENİ ALFABESİYLE İLK KÜRTÇE İNCİL
TRANSKRİPSİYON VE İNCELEME

Hazırlayan
İlyas SAYIM

DOKTORA TEZİ

Tez Danışmanı
Prof. Dr. Mehmet Zahir ERTEKİN

Bingöl-2024

NAVEROK

NAVEROK	I
BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ.....	VI
TEZ ONAY SAYFASI	VII
KURTE	VIII
ÖZET.....	IX
ABSTRACT.....	X
PÊŞGOTIN	XI
KURTEPEYV	XII
DESTPÊK	1
BEŞA YEKEM	3
1. DANASÎNA BERHEMÊN BI TÎPÊN ERMENÎKÎ	3
1.1. Teorî û Rêbaza Xebatê	3
1.2. Tesbîtkirina Lîteratûrê/Çavkaniyên Nivîskî.....	4
1.2.1. Xebatên li ser Pirtûkên Kurdî yên bi Alfabeya Ermenîkî Hatine Nivîsîn ..	5
1.3. Miletê Ermenî û Zimanê Ermenîkî.....	7
1.4. Pirtûka Pîroz.....	9
1.4.1. Peymana Kevn.....	10
1.4.2. Beşên Peymana Kevn	10
1.4.2.1. Afirandin.....	12
1.4.2.2. Derketin	12
1.4.2.3. Lêwiyîyan	13
1.4.2.4. Hejmaran.....	13
1.4.2.5. Ji Nû Ve Lêkirin	13
1.4.2.6. Yêşû	14
1.4.2.7. Serweran	14
1.4.2.8. Rût.....	14
1.4.2.9. Samûyêl, Pirtûka Yekem	15
1.4.2.10. Samûyêl, Pirtûka Duyem	15
1.4.2.11. Qiralan, Pirtûka Yekem	15
1.4.2.12. Qiralan, Pirtûka Duyem	16
1.4.2.13. Dîrokan, Pirtûka Yekem	16

1.4.2.14. Dîrokan, Pirtûka Duyem	16
1.4.2.15. Esra	17
1.4.2.16. Nehemya	17
1.4.2.17. Ester	17
1.4.2.18. Eyûb	18
1.4.2.19. Zebûr (Mezmûran)	18
1.4.2.20. Methelokên Silêman	18
1.4.2.21. Waiz	18
1.4.2.22. Helbesta Helbestan	19
1.4.2.23. Îşaya	19
1.4.2.24. Yêremya	19
1.4.2.25. Lawijên Yêrtemya	19
1.4.2.26. Hêzekîl	20
1.4.2.27. Daniêl	20
1.4.2.28. Hoşeya	20
1.4.2.29. Yowêl	20
1.4.2.30. Amos	21
1.4.2.31. Obadya	21
1.4.2.32. Yûnis	21
1.4.2.33. Mîka	22
1.4.2.34. Nahûm	22
1.4.2.35. Habaqûq	22
1.4.2.36. Tsêfanya	22
1.4.2.37. Hagay	22
1.4.2.38. Zekerya	23
1.4.2.39. Maleyaxî	23
1.4.3. Peymana Nû	23
1.4.3.1. Mizgîniya Îsa Mesîh li gorî Metta	26
1.4.3.2. Mizgîniya Îsa Mesîh li gorî Marqos	26
1.4.3.3. Mizgîniya Îsa Mesîh li gorî Lûqa	27
1.4.3.4. Mizgîniya Îsa Mesîh li gorî Yûhenna	27
1.4.3.5. Karên Şandiyan	28
1.4.3.6. Nameya Pawlos a ji Romayîyan re	29

1.4.3.7. Nameya Pawlos a Pêşî ji Korîntiyan re	29
1.4.3.8. Nameya Pawlos a Duyem ji Korîntiyan re	30
1.4.3.9. Nameya Pawlos a ji Galatiyan re	30
1.4.3.10. Nameya Pawlos a ji Efesiyan re	31
1.4.3.11. Nameya Pawlos a ji Filîpiyan re	31
1.4.3.12. Nameya Pawlos a ji Kolosiyan re	31
1.4.3.13. Nameya Pawlos a Pêşî ji Selanîkiyan re	32
1.4.3.14. Nameya Pawlos a Duyem ji Selanîkiyan re	32
1.4.3.15. Nameya Pawlos a Pêşî ji Tîmotêyos re	32
1.4.3.16. Nameya Pawlos a Duyem ji Tîmotêyos re	33
1.4.3.17. Nameya Pawlos a ji Tîtos re	33
1.4.3.18. Nameya Pawlos a ji Filêmon re	33
1.4.3.19. Nameya ji Îbraniyan re	34
1.4.3.20. Nameya Aqûb	34
1.4.3.21. Nameya Petrûs a Pêşî	35
1.4.3.22. Nameya Petrûs a Duyem	35
1.4.3.23. Nameya Yûhenna ya Pêşî	36
1.4.3.24. Nameya Yûhenna ya Duyem	36
1.4.3.25. Nameya Yûhenna ya Sêyem	36
1.4.3.26. Nameya Cihûda	37
1.4.3.27. Peyxama Yûhenna	37
1.5. Tradîsyona Wergêriya Pirtûka Pîroz	38
1.6. Wergerên Încîlê yên bi Alfabeya Ermenîkî	39
1.6.1. Tercumeya Ewil an Încîla Madteosê	40
1.6.2. Tercumeya Çar Încîlên Kanonîk	41
1.6.3. Tercumeya Kamil Ya Peymana Nû	42
1.6.4. Tercumeya Încîla Madtêosê	44
1.6.5. Tercumeya Încîla Margosê	45
1.6.6. Tercumeya Încîla Xugasê	45
1.6.7. Tercumeya Încîla Hovhannêsê	46
1.6.8. Tercumeya Încîla ‘Emelê Resûla	47
1.7. Pirtûkên Din ên bi Tîpên Ermenîkî	48
1.7.1. Ayppenaran Kürderen Yev Hayeren Alîfbêcuz Kurmancî û Armenî	48

1.7.2. Tasakîrkê Kurmancî	50
1.7.3. Yerkaranê bi Kurmancî	51
1.7.4. Labder Lusadu	52
1.7.5. Yerk û Şaraganê bi Kurmancî	54
1.7.6. Yerkêd Rûhanî bi Zimanê Kurmancî A. Hador (Bergê Ewil).....	55
1.7.7. Şems	57
1.7.8. Tesbîhat	59
1.8. Taybetmendiyên Wergera Tam a Sala 1872yê	60
1.8.1. Taybetmendiyên Rastnivîsê yên vê Berhemê.....	60
1.8.2. Taybetmendiyên Sentaksê yên vê Berhemê	63
1.8.4. Taybetmendiyên Morfolojîk ên vê Berhemê.....	64
1.8.5. Taybetmendiyên Leksîkolojiyê yên vê Berhemê	65
1.9. Metneke Nimûneyî ji Wergera Tam a Încîlê.....	67
BEŞA DUYEM.....	69
2. METNA TRANKRÎPSÎYONÊ.....	69
ÎNCÎL BI QAWLA MADTEOS	72
ÎNCÎL BI QAWLA MARKOS	118
ÎNCÎL BI QAWLA LUĞAS	147
ÎNCÎL BI QAWLA HANNA	196
ŞIXULÊ RESÛLAN	233
MEKTÛBÊ RESÛLÊ BOĞOS JI ROMALÎAN RA.....	280
MEKTÛBÊ AWULÎN Ê RESÛLÊ BOĞOS JI GORNTOSLÎAN RA	299
MEKTÛBÊ ÎKÎNCÎ Ê RESÛLÊ BOĞOS JI GORNTOSLÎAN RA	318
MEKTÛBÊ Ê RESÛLÊ BOĞOS JI KAĞADALÎAN RA	332
MEKTÛBÊ Ê RESÛLÊ BOĞOS JI YEPESOSLÎAN RA	339
MEKTÛBÊ Ê RESÛLÊ BOĞOS JI FÎLÎBBELÎAN RA	346
MEKTÛBÊ Ê RESÛLÊ BOĞOS JI GOĞOSALÎAN RA.....	351
MEKTÛBÊ AWULÎN Ê RESÛLÊ BOĞOS JI TESAXONÎĞÎAN RA.....	356
MEKTÛBÊ ÎKÎNCÎ Ê RESÛLÊ BOĞOS JI TESAXONÎĞÎAN RA.....	360
MEKTÛBÊ AWULÎN Ê RESÛLÊ BOĞOS JI DÎMOTEOS RA	363
MEKTÛBÊ ÎKÎNCÎ Ê RESÛLÊ BOĞOS JI DÎMOTEOS RA.....	369
MEKTÛBÊ Ê RESÛLÊ BOĞOS JI DÎDOS RA.....	373
MEKTÛBÊ Ê RESÛLÊ BOĞOS JI PÎLÎMON RA	376

MEKTÛBÊ Ê RESÛLÊ BOËOS JI ÎBRANÎAN RA	377
MEKTÛBÊ GATOËÎGÊ Ê RESÛLÊ YAQÛB	392
MEKTÛBÊ GATOËÎGÊ AWULÎN Ê RESÛLÊ BEDROS	397
MEKTÛBÊ GATOËÎGÊ ÎKÎNCÎ Ê RESÛLÊ BEDROS	403
MEKTÛBÊ GATOËÎGÊ AWULÎN Ê RESÛLÊ HANNA.....	407
MEKTÛBÊ ÎKÎNCÎ Ê RESÛLÊ HANNA	413
MEKTÛBÊ ÜÇÜNCÎ Ê RESÛLÊ HANNA	414
MEKTÛBÊ GATOËÎGÊ Ê RESÛLÊ CÛDA	415
WAHÎ Ê RESÛLÊ HANNA Û ASDVADZAPAN ÎNCÎLÇÎÊ	417
XELADÎ.....	440
ENCAM	445
ÇAVKANÎ	447
PÊVEK.....	450
1. Ferhengok.....	450
2. Belge û Materyalên Vîzuel	455

BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ

Doktora tezi olarak hazırladığım “*Yekemîn Încîla Kurdî bi Alfabe ya Ermenî Transkrîpsiyon û Lêkolîn*” adlı çalışmanın öneri aşamasından sonuçlanmasına kadar geçen süreçte bilimsel etiğe ve akademik kurallara özenle uyduğumu, tez içindeki tüm bilgileri bilimsel ahlak ve gelenek çerçevesinde elde ettiğimi, tez yazım kurallarına uygun olarak hazırladığım bu çalışmamda doğrudan veya dolaylı olarak yaptığım her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve yararlandığım eserlerin kaynakçada gösterilenlerden oluştuğunu beyan ederim.

İlyas SAYIM

06/08/2024

TEZ ONAY SAYFASI

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜ'NE

İlyas SAYIM tarafından hazırlanan “*Yekemîn Încîla Kurdî bi Alfabe ya Ermenî Transkrîpsiyon û Lêkolîn*” başlıklı bu çalışma 06/08/2024 tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda [oybirliği ile] başarılı bulunarak jürimiz tarafından *Kürt Dili ve Edebiyatı Ana Bilim Dalı*'nda Doktora tezi olarak kabul edilmiştir.

TEZ JÜRİSİ ÜYELERİ (Unvanı, Adı ve Soyadı)

Başkan, Danışman: Prof. Dr. Mehmet Zahir ERTEKİN İmza:

Üye: Doç. Dr. Zafer AÇAR İmza:

Üye: Dr. Öğr. Üyesi İkrâm FİLİZ İmza:

Üye: Dr. Öğr. Üyesi Yaşar KAPLAN İmza:

Üye: Dr. Öğr. Üyesi Hemin Omar AHMAD İmza:

ONAY

Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun tarih ve sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul edilmiştir.

Dr. Öğr. Üyesi Abdullah BEDEVA

Enstitü Müdürü

KURTE

Încîl, ji aliyê bawermendên xwe ve wekî metneke pîroz tê qebûlkirin. Bi vê taybetiya xwe ve hertim bûye bingeha mîsyona teblîxê ya belavker û herwiha ji mêj ve li gelek zimanên cîhanê hatiye tercumekirin. Çend zimanên cihanê hene ku cara ewil bi wergera Încîlê bûne zimanekî nivîskî û di çend zimanan de herçiqas berê berhemên menzûm hebin jî pexşanên pêşîn bi saya wergera metnên pîroz peyda bûne.

Tradîsyon û pêvajoya pêşveçûnê ya wergerên Încîlê di her zimanekî de cuda ne û tevkarî, bandor, nîqaş û reaksiyonên cûrbicûr ên li hemberî wan, mijarên hêjayî lêkolînê ne. Xeyn ji vê perspektîfa dîrokî û teolojîk, tê dîtin ku ji ber ku Încîl metneke bihecm e, di nav xwe de gelek malzemeyên zimanî dihevine. Ev taybetî dikare ji bo lêkolînên zimannasiyê jî bibe bingeş. Lewra dengnasî, hevoksazî, watesazî, ferhengnasî, wergernasî û gelek qadên din ên lînguîstîkê dikarin li ser metna behskirî usûlên xwe yên taybet tetbîq bikin.

Ev xebat li ser wergera Încîlê ya ewil a bêkêmasî hatiye kirin û çend taybetmendiyên zimanî yên ku di nusxeya tam a sala 1872yê de tên dîtin hatine nirxandin. Taybetiyên vê berhemê bêtir ku li gorî pîvanên îroyîn ên rêzimana standard bîr nirxandin, li gorî dewr û konteksta wê ya xusûsî hatine pêşkêşkirin. Xeyn ji vê yekê, derbarê naveroka berhemên din ên ku bi herfên ermenîkî hatine nivîsandin û li ser mentîqa lîteratûra kurdî ya ku bi alfabeya ermenîkî hatiye sazî kirin û li ser sedema pêwîstiya metnên bi vî şiklî agahî hatiye dayîn û şirove hatiye kirin.

Peyvên Sereke: Încîl, Transkrîpsiyon, Kurmancî, Alfabeya Ermenî, Werger.

ÖZET

İncil, inananları tarafından mukaddes addedilen bir metin olması itibarıyla tarih boyunca yayılmacı tebliğ misyonunun temelini oluşturmuş ve birçok dile tercüme edilegelmiştir. Bazı diller ilk kez İncil vasıtasıyla yazılı dil hüviyeti kazanmış, başka bazı diller ise manzum eserlerin varlığına mukabil nesir sahasına yine onun tavassutuyla geçmiştir.

Her dilde ayrı bir seyri bulunan tercümelerin katkıları, tesirleri ve onlara dönük farklı türden reaksiyonlar incelemeye değer konular arasındadır. Bu tarihî ve teolojik perspektifin dışında İncil'in hacimli bir metin olması yönüyle de pek çok dil malzemesi barındırdığı ve dilbilimsel araştırmalara imkân sağladığı görülür; fonoloji, söz dizimi, semantik, leksikoloji, çeviribilim ve daha pek çok dilsel alan, kendi ilkeleri çerçevesinde ilgili metne dair farklı yaklaşımlar sunabilirler.

Bu çalışmada İncil'in Kurmancî'deki gelişimi incelenmiş ve 1872 yılına ait olan eksiksiz tercümede gözlemlenen bazı dil özellikleri günümüz standart gramer kaidelerine bağlı kalınmaksızın, kendi devre ve konteksti içerisinde ortaya konulmuştur. Bunun dışında Ermeni harfli diğer eserlerin muhtevasına dair tanıtıcı mahiyette bilgiler verilmiş ve Ermeni alfabesiyle oluşturulan Kürtçe literatürün mantığı ve bunun neden bir ihtiyaç olarak ortaya çıktığı izah edilmiştir.

Anahtar Kelimeler: İncil, Transkripsiyon, Kurmancî, Ermeni Alfabeti, Tercüme.

ABSTRACT

As a text accepted sacred by its believers, the New Testament has formed the basis of the missionary expansion throughout history and it has been translated into numerous languages. While some languages were first put into writing through Bible translations, some languages composed their first prose examples through these translations though they had already produced poetry.

The contributions and effects of translations, which have a different course in each language, and the different types of reactions to them are among the topics worth examining. Apart from this historical and theological perspective, it is observed that the Bible, being a voluminous text, contains many linguistic materials and enables linguistic research; phonology, syntax, semantics, lexicology, translation studies and many other linguistic fields offer various approaches to the mentioned text within the framework of their own principles.

In this study, the development of the Bible translations in Kurmanji was examined and some linguistic features observed in the complete translation of the New Testament (published in 1872) were revealed in its own period and context, without adhering to today's standard grammatical rules. Apart from this, introductory information is given about the contents of other works written in Armenian letters, and the background of Kurdish literature created with the Armenian alphabet and its emergence as a necessity have been explained.

Keywords: New Testament, Transcription, Kurmanji, Armenian Alphabet, Translation.

PÊŞGOTIN

Di dîroka nivîskî ya kurdiya kurmancî de rola metnên dinî yên mîsyoneran ku bi alfabeya ermenîkî hatine çapkirin giring e. Pexşana ewil a ku gihaştiye çapê Încîla Madteos e. Piştî beşa ewil beşên din ên Încîlê jî peyderpey çap dibin. Xeyn ji tercumeya *Peymana Nû* çend pirtûkên din jî hene ku dîsa bi alfabeya ermenîkî hatine çapkirin û ev pêvajoyê heta sala 1938ê dewam dike. Bi tevahî 13 pirtûkên çapkirî hene û yek destxet jî heye ku negihaştiye çapê.

Di vê çarçoveyê de ev xebat li ser wergera tam a Încîlê hatiye kirin. Herçend ji zimanekî din hatibe wergerkirin û di bin bandora zimanên wekî ermenîkî û osmanî bimîne jî ev metn di nav xwe de gelek materyalên zimanî yên dewlemend dihewîne. Ji ber ku alfabeya ermenîkî fonetîk e hemû vokalan jî nîşan dide bi saya vê xebatê jî bo famkirina teleffuza wê serdemê derfet çêdibe. Di metnê de xeyn ji peyvên olî ku bi termînolojiya xaçhebîniyê re têkildar in, ji qadên muxtelîf gelek peyvên curbicur jî hatine bikaranîn ku ev yek jî ji xebatên leksîkolojiyê û peyvsaziyê re derî vedike. Xulase, armanca vê xebatê ew e ku metneke dîrokî ya bi vî rengî ku heta îro zêde nehatiye nasîn bi wesîleya tîpguhêzî û analîzan dê were nasîn û ji bo vekolînên nû bibe têkariyeke biçûk.

Ev tez herçiqas xebateke şexsî be jî di amadekirina wê de ked û piştgiriya gelek kesan heye. Serê pêşî spasiya şewirmendê xwe birêz Prof. Dr. Mehmet Zahir ERTEKÎN dikim ku bi arîkariya wî ev tez nivîsî nema. Herwiha di nivîsîn û kemilîna xebatê de gelek feydeya endamên din ên lijneya tezê gihaşt min. Bi xêra rexne û pêşniyazên Doç. Dr. Zafer AÇAR, Doç. Dr. Yaşar KAPLAN, Dr. Hemin Omar AHMAD, Dr. İkrâm FİLİZ û Dr. Şeyhmus ORKÎN gelek kêmasiyên tezê hatin temamkirin. Ez spasiyên xwe pêşkêşî hemiyan dikim, mala wan ava be.

İlyas SAYIM

Mûş-2024

KURTEPEYV

? : etîmolojiya nediya

ara. : aramî

b.n. : berhema navborî

bnr. : binêrin

ere. : erebî

erm. : ermenîkî

far. : farsî

kur. : kurdî

osm. : osmanî

tir. : tirkî

yûn. : yûnanî

DESTPÊK

Miletê ermenî yek ji milletên rojhilata navîn e û zimanê wan zimanê ermenîkî ye. Zimanê ermenîkî di nav xwe dibe du şax: Ermenîkiya rojhilatê û ermenîkiya rojavayê. Piştî ku *Krapar*, zimanê klasîk ê ermenîkî ji holê radibe zimanê rojane dibe zimanê nivîsê û ji ber dûrahiya coxrafî û têkiliya zimanên cîran, du cureyên axaftin û nivîsînê dertên meydana. Di herdu zaravayan de jî heman alfabe tê emilandin, lê di xwendina wan de cudahiyeke mezin heye. Miletê ermenî xeyn ji zimanê xwe yê zikmakî zimanên din jî bi kar anîne û bi wan zimanan gelek berhem çêkirine ku tercumeyên Încîlê tenê qismek ji vê mîrata nivîskî ye.¹

Tekst û naveroka Încîlê ji bo fêrbûna jiyana Îsa Mesîh pir giring e û di nav xwe de xeyn ji agahiyên biyografîk gelek agahiyên olî û dîrokî jî dihewîne: Mûcizeyên Şandîyan ango Hewariyan (Arîkarên Îsa Mesîh), Nameyên Pavlus, Nameyên Giştî û xewna/pêşbîniya Yûhennayî beşên sereke yên Încîlê ne. Ji ber vê giringî û bingeînê ye ku hemû neteweyên xaçparêz xwestine Încîlê bi zimanê xwe yê dayîkê bixwînin û di vê rêyê de gelek westiyane. Dewlet û rêxistinên xaçparêz jî ev armanc ji xwe re kirine mîsyon û di daîreya mîsyoneriyê de xebatên sistematîk ên tercumeyê meşandine. Bi saya vê xebatkariyê ye ku îro herî kêr di hezar û pênc sed zimanan de² Încîl tê xwendin û gelek ziman bi wergera Încîlê bûne xwedî alfabe û nivîsê an jî ji nezmê derbasî pexşanê bûne. Di Încîlê de behsa giringiya belavkirina peyama îlahî wiha tê tarîfkirin: *Û wî (Îsa) ji wan re got: “Herin her çar aliyên dinyayê û Mizgîniyê li hemû afîrînê bidin bihîstin. Yê ku baweriyê bîne û bê imadkirin (waftîzkirin) wê xilas bibe, lê yê ku baweriyê neyne wê sûcdar bê derxistin. Û ev nîşanên ha wê bi yên ku baweriyê tînin re bin: Bi navê min wê cinan derxin, wê bi zimanên nû bipeyivin, wê maran bi destê xwe bigirin û eger ew tiştên bi jehr jî vexwin, qet ziyanê nabînin. Ewê destê xwe deynin ser nexweşan û nexweş wê qenc bibin.”*³

¹ A. S. Hasmik, *Ermeni Harfli Türkçe Kitaplar ve Süreli Yayınlar Bibliyografyası* (1727-1968), Turkuaz

Yayınları, 2005, r. 21–23.

² Ernst Wendland, Philip Noss, *Bible Translation*, Stellenbosch University, 2023, r. 5.

³ *Încîl Mizgînî*, Marqos 16: 15-18, Kitab-ı Mukaddes Şirketi, İstanbul, 2005, r. 109-110. (Peyvên ku di nav kevaneyan de hatine dayîn aîdî min in. Î. S.)

Di ayetên jorîn de amaje bi fêkirina Xebera Xweş ango Mizgîniyê û peyivîna zimanên nû hatiye kirin. Tevî ku di vê kontekstê de ev yek wek keramet an bûyereke derasayî hatibe îfadekirin jî şoperên xaçhebîniyê ji bo belavkirina peyama Încîlê dest bi xebatên wergerê kirine û xwestine ku pirtûka wan a pîroz bigihîje hemû welatên dinyayê. Ji destpêka avabûna dewletên xaçparêz heta roja me wergêriyê dewam kiriye, lê ev pîşe û mîsyon bi taybetî di sedsala 19em û sedsala 20em de bi pêş ve çûye. Zimanê kurdî jî ji tevgera giştî ya wergerê bêpar nemaye û metna Încîlê ji destpêka nîveka qirna 19em heta vê serdemê gelek caran hatiye tercumekirin.



BEŞA YEKEM

1. DANASÎNA BERHEMÊN BI TÎPÊN ERMENÎKÎ

1.1. Teorî û Rêbaza Xebatê

Ev xebat li ser tercumeya ewil a bêkêmasî hatiye kirin ku qonaxa sêyem a wergeran e ku pê helqeyên tercumeyê yên Peymana Nû temam dibin. Pêşî çavkaniyên çapkirî hatine peyda kirin û li gorî rêza dîrokê di derbarê naveroka wan de û heta ku derfet çêbûye li ser nivîskarên wan agahî hatiye dayîn. Ji pirtûkên din ên bi tîpên ermenîkî jî (wek pirtûka ewil ya zarokan û helbestên/îlahiyên olî) ku derveyî mijara nusxeyên Încîlê ne, bi kurtasî behs hatiye kirin.

Mebesta sereke ya vê xebatê ev e ku li ser naveroka nusxeya bêkêmasî ya Încîlê raweste ku di sala 1872yê de li Stembolê hatiye çapkirin û çend cihetên wê yên lînguîstîk analîz bike. Di vê çarçoveyê de ji bineşaxên zimannasiyê wek fonolojî, semantîk, sentaks û leksîkolojiyê sûd hatiye wergirtin û ji metna orîjînal îqtîbas hatine dayîn.

Di transkrîpsiyonê de metoda W. M. Thackston hatiye şopandin ku ji aliyê usûla fonetîkê ve xwedî sistemeke hevgirtî ye û dikare hemû dengên kurdiya kurmancî nîşan bide. Li pey tabloya alfabeya ermenîkî û muqabilên wê yên kurmancî çend tekstên nimûneyî ji Încîlê hatine parvekirin. Divê ku di pêvajoya tîpguhêziyê de adaptasyon, ango rastnivîseke modern neyê şopandin, lewre formên standardîzekirî nikarin bi teqezî nûneriya metnên dîrokî bikin ku bi alfabeyeke din hatine nivîsîn. Helbet rastnivîseke hevpar ku xwendina metnê hêsan dike tiştekî ne bêqîmet e lê ev yek ji bo xebatên zanistî zêde ne guncav e.

Du têgihên zimannasiyê hene ku di prosesa nirxandina taybetmendiyên metnekê an zimanekî de roleke giring dilîzin: (i) *rêzimana tewsiyekê* û (ii) *rêzimana sêwirkar*. Di ya yekem de rêzimana zimanekî diyarkirî bi hemû beş û binebeşên xwe ve li gorî rêzîknameyeke kifşkirî tê tarîfkirin, lê di ya duyem de zimannas an vekolîner daneyan kom dike, li taybetmendiyên berbiçav mêze dike û di tesbîtkirin û qeydkirina wan de krîtera wî ji teoriyê zêdetir pratîka ziman e.⁴

⁴ Eli Hinkel, *Descriptive versus Prescriptive Grammar*, TESOL Encyclopedia of English Language Teaching, Seattle Pacific University, r. 1.

Wekî ku Seyari û Aktaş jî di xebata xwe de îfade dikin “di xebatên ku bi rêbaza zimannasiya şayesî (*descriptive linguistic*) û teknîka zimannasiya kargîn (*functional linguistics*) tê kirin de guherînen ziman ên dîrokî bi nêrîneke dîyakronîk nayên analîzkirin û bi nêrîneke rêzikparêz (*prescriptive*) li ser rastbûn û şaşbûna taybetiyên zimên nirxandin nayên kirin.”⁵

Kurdiya sedsala 19em helbet ji kurdiya îro cudatir e û ji ber vê yekê di metna mijara lêkolînê de usûla gramera şayesî hatiye şopandin.

1.2. Tesbîtkirina Lîteratûrê/Çavkaniyên Nivîskî

Bingeha vê xebatê nusxeya tam a wergera Încîlê ye ku di sala 1872yê de çap bûye. Ev tercumeya bêkêmasî ku di nav xwe de hemû beşên Încîlê (bi tevahî 27 beş) dihewîne girêdayî metnên berî xwe ye. Ji ber vê yekê jî du çapên ewil ên berî wê jî bûne mijara vekolînê.

Di pêvajoya lêgerîna çavkaniyên nivîskî yên bi tîpên ermenîkî de, pênc pirtûkên cuda jî hatine tesbîtkirin ku her yek ji wan wek beşeke ji Încîlê hatine weşandin. Ev pirtûk piştî Încîla tam hatine weşandin û wergêrên wan ji hev cuda ne û bi vî awayî, ne berdewama wê ne. Ji ber ku her yek ji wan bi tena serê xwe dikarin bibin mijara xebateke berfireh û derveyî sînorên vê xebatê ne, di derbarê wan de agahiyên sînorkirî hatine dayîn.

Navên pirtûkên Încîlê yên çapkirî li gor rêzê wiha ne:

1. Încîlê Xodê Me Îsa El Mesîhê, Nivisandin Bi Destê Madteos
2. Încîl, Xodê Me Îsa El Mesîhê, Nivisandin Bi Destê Madteos, Markos, Lukas û Hanna
3. Peymanê No Ê Xoîyê Me Îsa El Mesîh
4. Încîla Rabbê Meî Hîsus Krîsdos Ko Madteos Nvîsî
5. Încîla Rabbê Meî Hîsus Krîsdos Ko Margos Nvîsî
6. Încîla Rabbê Meî Hîsus Krîsdos Ko Xûgas Nvîsî
7. Încîla Rabbê Meî Hîsus Krîsdos Ko Xûgas Nvîsî
8. ‘Emelê Resûla

⁵ Ahmet Seyari, Murat Aktaş, *Pêşgira Dariştinê ya ‘Ve-’ yê û Fonksiyonên Wê yên Morfosemantîk di Berhemên Klasîk ên Kurmancîya Jorîn da*, Kurdiya, Jimar: 9, Mijdar 2023, r. 1.

Xeyn ji van pirtûkan ku hemû wergerên Încîlê ne, pirtûkên din ên bi alfabeya ermenîkî jî hene. Ev cure berhem jî bi xêra naverokên xwe yên têr û tije dikarin bibin vekolînên serbixwe. Ji ber ku di pirtûkxaneyan de bi rehetî nedihatin peydakirin di nîrxandina van berhemên jorîn de ji kopiyên dijîtal sûd hatiye wergirtin. Ji aliyê rûpelan ve di van kopiyên elektronîk de kêmasî tune bû û hemû metn bi zelalî dihatin xwendin. Di encamê de kêmasiya nusxeyên çapbûyî nebû sedema nuqsaniyeke şênber.

1.2.1. Xebatên li ser Pirtûkên Kurdî yên bi Alfabeya Ermenîkî Hatine Nivîsîn

Pirtûkên kurdî yên bi alfabeya ermenîkî ji hêla dîroka nivîskî ve muhim in. Qasî ku hatiye tesbîtkirin 17 berhem hene ku yek ji wan destxet e (Tesbîhat), yek ji wan li Sovyetê û li gorî alfabeya ermenîkiya rojhilatê (Şems), yek ji wan li New Yorkê, yek ji wan li Xarpetê, didu ji wan li Helebê û yên mayîn li Stembolê hatine çapkirin.

Heta niha li ser van pirtûkan xebat hebin jî mixabin ne zêde ne. Mumkin e ku xebatên li ser vê mijarê hatine nivîsîn di nav çar beşan de bên nîrxandin: Pirtûk, beşa pirtûkan, meqale an nivîsên serbixwe û tez.

Pirtûka ewil ku li ser vê mijarê hatiye nivîsîn ji qelemê Dr. Ferhat Pîrbal derketiye û bi rastî jî berhemeke giring e: *Încîl le Mêjûy Edebiyata Kurdî da 1857-1957* (١٩٥٧-١٨٥٧ کوردیدا ئێمەییاتی کوردیدا). Nivîskar di berhema xwe de ku ji pêşgotin, şeş beşan, encam û çavkaniyê pêk tê, hewl dide ku bersiva van pirsên jêrîn bide û agahî li ser mijarên têkildar pêşkêş bike:

- Yên ku încîlan wergerî kurdî kirine kî ne?
- Încîl û dua û nimêjên mesîhiyan.
- Sedem û armanca tercimekirinê *Peymana Nû* bo kurdî.
- Ev încîl û kitêbên mesîhiyan di sedsala 19em de bi alfabeya ermenî hatine çapkirin.
- Çend tekstên zimanê kurdî bi alfabeya siryanî.

- Încîl û kitêbên mesîhiyan ku di navbera sala 1919 û 1957ê de bi alfabeya ‘erebî çap bûne.⁶

Çawa ku tê dîtin, ne tenê li ser berhemên bi alfabeya ermenîkî, lê bi alfabeyên din jî agahî hene û qîmeta wan a dîrokî jî hatiye nirxandin.

Nivîskarê din ku behsa vê mijarê dike Mehmet Bayrak e. Di xebata wî ya vekolîn û berhevkariyê ya bi navê “*Alevi-Bektaşî Edebiyatında Ermeni Âşıkları [Aşuğlar]*” de ji pirtûka “*Yerkaranê Bi Kurmancî*” transkrîpsiyona 36 îlahiyan heye.⁷ Wî bi xwe ew transkrîbe nekirine lê bi nivîskar Tosînê Reşîd -ji kurdên Qefqasyayê ye- dane tîpguhêzîkirin. Di veguhastina tîpan ji alfabeya ermenîkî bi alfabeya latînî de gelek xeletî hene. Tevî ku Tosînê Reşîd ji Ermenistanê ye û bi ermenîkî gelekî baş dizane, şaşiyên wî yên eşkere hene. Ev jî wisa xuya dike ku ji ber cudahiya du lehceyên ermenîkî pêk tê: Ermenîkiya rojhilatê û ermenîkiya rojavayê bi heman alfabeyê tên nivîsîn lê di xwendin û bilêvkirinê de ji hev gelekî dûr in. Tosînê Reşîd jî nekariye xwe ji xwendina rojhilatî dûr bixe û metneke ku li ser esasa ermenîkiya rojavayê hatiye nivîsîn li gorî vê yekê bixwîne û transkrîbe bike.

Pirtûka din ku tê de mijara berhemên kurdî bi tîpên ermenîkî derbas dibe dîsa aîdî Mehmet Bayrak e: Kürt Bâtınîliğinde Kutsal Metinler.⁸ Nivîskar di berhema xwe de transkrîpsiyona hemû îlahiyên pirtûka “*Yerkaranê Bi Kurmancî*” pêşkêşî xwendevanan dike lê derbarê tîpguhêr de agahî tune.⁹ Di xwendina metnê de dîsa gelek şaşî hene û diyar e ku ev yek ji ber cudahiya lehceyên ermenîkî pê nê hatine. Bi tevahî 105 îlahî hene û ji wan îlahiyan hejmara 12yê û ya 13yê kem in. (Di orîjînalê pirtûkê de 103 îlahî hene. Dibe ku ev du îlahîyên zêde hejmarên wenda bi xwe bin. Bi gotineke din di transkrîpsiyonê de di rêzêkirina îlahiyan de şaşîti çêbûye û hejmara 12yê û ya 13yê wekî 104 û 105 hatine nîşandan.)

Xebata din a ku vê mijarê elaqedar dike xebata doktorayê ya Marcin Rzepka ye ku paşê wekî pirtûkê jî hatiye weşandin.¹⁰ Ev xebat, bi navê xwe yê orîjînal

⁶ D. Ferhad Pîrbal, *Încîl (li ser berga navîn ‘Incîl’) le Mêjûy Edebiyata Kurdî da 1857-1957*, Kêtabxanê Kordşênasî Ehmêdê Şerîfî, Dihok, 1999.

⁷ Mehmet Bayrak, *Alevi-Bektaşî Edebiyatında Ermeni Âşıkları [Aşuğlar]*, Öz-Ge Yayınları, Ankara 2005, r. 702-705.

⁸ Mehmet Bayrak, *Kürt Bâtınîliğinde Kutsal Metinler*, Özge Yayınları, İstanbul, 2016, r. 725-759.

⁹ Nivîskar di e-maila ku ji min re şandiye de dibêje ku tîpguhêzî jî hêla nivîskarê kurd Eskerê Boyîk ve hatiye çêkirin.

¹⁰ Marcin Rzepka, *Konfesyjność Przekładu, Kulturowa Historia Kurdyjskich Tłumaczeń Biblii*, Uniwersytet Papieski Jana Pawła II w Krakowie Wydawnictwo Naukowe, Kraków 2013

“*Konfesyjność Przekładu, Kulturowa Historia Kurdyjskich Tłumaczeń Biblii*” bi zimanê lehî (polonyayî) ye û li ser xebatên wergerandina *Peymana Nû* bi zimanê kurdî û çalakîyên mîsyonerên li Kurdistanê radiweste. Nivîskar xeyn ji vê xebatê çend meqale û beşên pirtûkê jî nivîsîne ku bi dîroka tercumeyê ya kurdî û bi xebatên mîsyonaran re têkildar in.

Pirtûka din a ku divê behsa wê bê kirin aîdî lêkolîner Mesûd Serfiraz e: *Kurd, Kitêb, Çapxane, Weşangeriya Kitêbên Kurdî di Dewra Osmaniyan de (1844-1923)*. Nivîskar yek bi yek kunyeyên pirtûkên kurdî yên bi alfabeya ermenîkî dide û derbarê wan de bi kurtasî agahî parve dike.¹¹

1.3. Miletê Ermenî û Zimanê Ermenîkî

Miletê ermenî ku di zimanê ermenîkî de wekî “hay” tên zanîn, etnîsîteyek e di Rojhilata Navîn de. Li Komara Ermenistanê û li welatên cihê dijîn (dîasporaya ermenî). Miletê ermenî ji welatê xwe re “Hayastan” dibêjin. Zimanê wan jî ji zimanên cîran gelek cuda ye û di nav malbata Îndo-Ewropayê de şaxeke serbixwe ye û wek “ermenîkî” tê zanîn ku di zimanê ermeniyan de wekî “hayeren” derbas dibe. Gelek devok û du lehceyên sereke yên zimanê ermenîkî hene: Ermenîkiya Rojhilatê û Ermenîkiya Rojavayê.

Miletê ermenî xwedî alfabeyeke cuda ye. Li ser orjîna vê alfabeyê nîqaş heye lê diyar e ku bi saya vê alfabeyê neteweyek ji tunebûnê xelas bûye û bîra wan a dîrokî hatiye parastin. Herçend di dîroka milletê ermeniyan de têkîlî bi zimanên din xurt bibe jî û carna qismek ji xelqê zimanê xwe bi tevahî ji bîr bikin jî wekî yehûdîyan tu caran dev ji alfabeyê bernedane û bi xêra ziman û alfabeyê di nav milletên din de neheliyane.

Helbet ziman û alfabe ji baweriyê ne qetiyayî ye. Di nav milletê ermenî de musulmanî an ateîzm belav bibe jî bi giranî bi nasnameya xwe ya xirîstîyanî ve hatine nasîn. Di çarçoveya dîrokî de milletê ermenî ji destpêka sedsala 5em heta sedsala 20em xirîstîyan mane. Piştî tehcîrê di nav wan de Îslam jî belav bûye û ji ber modernîzmê ateîzm jî bandora xwe zêde kiriye, lê wek milletê suryanî, milletê ermenî

¹¹ Mesûd Serfiraz, *Kurd, Kitêb, Çapxane, Weşangeriya Kitêbên Kurdî di Dewra Osmaniyan de (1844-1923)*, Weşanên Peywend, Stenbol, 2015, r. 197-216.

jî bi tercîha xwe ya dînî hatiye nasîn û netewe û dîn di nav qalibekê de kelijîne. Ji ber vê yekê zimanê ermenî, alfabeya ermenî û xaçparêzî sê sitûnên neteweya ermenî ne.

Çawa ku li jorê hat gotin milletê ermenî di pêvajoya dîrokê de carna zimanê xwe yê dayikê ji bîr kirine an jî di bikaranîna wî de qels bûne. Helbet ev jibîrkirin an sistî bo tevan ne derbasdar bû lê qismek ji xelqê ji ber sedemên sosyolînguîstîk “zimanên din” axivîne û pê nivîsîne. Bi vî şiklê zimanên biyanî jî bûye perçeyek ji nasnameya ermenî. Di vê çarçoveyê de em dibînin ku ermeniyên Anatolê him zimanê tirkî û him jî zimanê kurdî bi kar anîne û tevî ku ev ziman ne zimanê wan ê eslî ye, ji ruh û hişmendiya neteweyî neqetiyane. Ev yek girêdayî bikaranîna alfabe û baweriya xirîstiyaniyê ye. Ermeniyên rojavayê Tirkiyeyê, bi taybet jî ermeniyên Îstambolê zimanê tirkî pejirandibûn. Milletê ermenî hertim bi perwerdeyî û nivîsê re elaqedar bûne û li vî bajarê metropol bê mekteb û nivîs nemane. Rewşenbîrên ermenî xeyn ji zimanê xwe yê dayikê an jî digel wî bi zimanê tirkî jî nivîsîne û gelek berhem afirandine. Îro di pirtûkxaneyên giştî û yên taybet de bi hezaran pirtûkên tirkî yên bi alfabeya ermenî hene û bêşik ev mîrata nivîskî, perçeyeke dewlemend û bêhempa ya mîrata zimanê tirkî ye. Mixabin îro ev qinaet (qebûlkirina metnên tirkî bi alfabeya ermenîkî) di xebatên tirkolojiyê de hêj ji belav nebûye û li hemberî van metnan pêşbiryareke xurt heye.

Herwiha ermeniyên rojhilatê ku li Anatolê dijîn, digel zimanê xwe zimanê kurdî jî bi kar dianîn û qismek ji xelqê zimanê xwe yê dayikê bi temamî ji bîr kiribûn. Wextê ku pêdivî bo nivîsê çêbû milletê ermenî, zimanê kurdî ku êdî bûbû perçeyek ji hebûna wan, bi alfabeya ermenî nivîsîn û bi vê alfabeyê pirtûk çap kirin. Di vê mînakê de jî tê dîtin ku alfabe ji bo parastina nasnameyê tiştêkî çarenîn û mecbûrî bû. Çawa ku metnên tirkî yên bi alfabeya ermenî ji hêla dîroka nivîskî ve pir muhîm in, wisa jî di dîroka nivîskî ya kurdî de jî cihekî pir biqîmet dadigirin. Bi xêra nivîsên ermeniyan zimanê kurdî jî ber bi dewlemendiyê ve çû û mînakên nivîskî yên bi vî zimanî bûne perçeyek ji dîroka zimên. Herçiqas ku di van mînakên pêşîn de ji hêla uslûb û vegotinê ve kêmasî hebin jî wek fotografên dewrê xwe derbarê ziman, civak û dîrokê de gelek agahî pêşkêş dikin.

1.4. Pirtûka Pîroz

“Pirtûka Pîroz” ji bo wê rêze-metn û nivîsên dînî re tê gotin ku ji aliyê bawermendên îsewitiyê ve îlahî û muqeddes tên pejirandin. Peyva “Bible”ê ku ji yewnaniya kevn/grekî ji peyva “τὰ βιβλία” (pirtûkan) derbasî zimanên ewropayî bûye, di zimanên Rojhilata Navîn de bi giştî wekî “Kitaba Muqeddes” hatiye zanîn. Ev koleksiyon an antolojiya risaleyan bi zimanên cuda wekî îbranî, aramî û grekiya koînî/helenîstîk û di dewrên muxtelîf de hatinê qeydkirin. Di nav van metnan de gelek materyalên dîrokî, civakî û edebî hene ku qismek jê wiha ne: Talîmat (rêzîkname), mesel (çîrokên alegorîk), qisseyên dîrokî, xeber ji pêşerojê, agahî derbarê kesayetên dînî û dîrokî de û hwd.. “Pirtûka Pîroz” herçend ji aliyê bawermendên xwe ve wek kanon (metneke sereke û xwedî otorîte) were qebûlkirin jî di şîrove û nirxandina wê de gelek cudahî hene ku di konteksta dîrokî de ev cure ferq û îxtîlaf bûne sedema îxtîlafê û di encamê de gelek mezheb derketine holê.

Metnên “Pirtûka Pîroz” ji beşên cuda pêk tên ku di dewrên cuda de hatine berhevkirin. Du pirtûkên sereke ku vê pirtûkê pêk tînin “Peymana Kevn” û “Peymana Nû” ne. Beşên herî kevn ên “Pirtûka Kevn” wekî “Pentateuch” tên zanîn ku bi wateya “Pênc Kitêb” an “Pênc Kitêbên Mûsa” ne. Beşa kevn a dîn “Nevîim” e ku tê de çîrok û kehanet hene. Koleksiyona sêyem pirtûka “Ketuvîm” e ku tê de Zebûr, Wecîze û çîrok hene. Ji bo van hemû beşan bi hev re “Pirtûka Cihûyan” an jî “Tanax” tê gotin. Di encamê de navên wan her sê beşên esasî digel maneyan wiha ne: Tewrat (te‘lîm), Nevîim (Peyxemberan), Ketuvîm (Nivîsan). Du nusxeyên dîrokî ku van beşên navborî dihewîne wiha ne: **1.** Metna Mazoretîk (bi zimanî îbranî û aramî ku ji hêla yehûdiyên rebbanî ve wekî metna desthilatdar tê qebûlkirin). **2.** Metna Septuagînt (bi zimanî grekiya qedîm e ku wekî metneke tercumekirî tê qebûlkirin; di gelek cihan de digel metna Mazoterîk mutabîq bibe jî cudahî û nakokiyên wan jî ne kêmtir in). Pirtûka duyem ji “Pirtûka Pîroz”, “Peymana Nû” ye. Di sedsala ewil ya xirîstiyaniyê de ew metnên ku derbarê jiyana Hz. Îsa de agahî didan û li ser meseleyên baweriyê bûn, hatin komkirin û paşê wekî “Peymana Nû” hatin binavkirin. Zimanê metnan grekiya koînî bû di wê serdemê de, ev ziman ji ber bandora Împaratoriya Romainê bûbû zimanê ragihandinê û wek zimanê lîngua franka (zimanê ku xelk bi saya wî danustandinê dikin) dihat bikaranîn. Çar beşên ewil ên “Peymana Nû” wekî Încîlên kanonîk (Încîlên fermiyetê) tên nasîn. Xeyn ji Încîlan di

vê pirtûkê de serboriyên hewariyan, “Nameyên Pawlos”, “Nameyên Giştî” û “Xewna Apokalîptîk” an bi navê xwe yê din “Weyh/Îlham” jî hene. Xirîstiyânên ewil hêj di sedsalên ewil ên mîladî de ev nivîs wergerandine zimanên siryanikiya kewn, qiptîkî, etîyopî (hebeşî) û latînî. Paşê ev kar û xebat (çalakiyên wergerandina metna “Pirtûka Pîroz” bi zimanên din) bû perçeyek ji mîsyoneriyê û hêj jî ev prose berdewam e. Îro li ser rûyê erdê pirtûka herî berbelav û bitîraj “Pirtûka Pîroz” e û pirtûka duyem a vê pirtûkê angû “Peymana Nû” ku di nav gel de wek “Încîl” tê zanîn, ew pirtûk e ku ji hemû pirtûkên din zêdetir hatiye tercumekirin, firotin û xwendin.

1.4.1. Peymana Kevn

Peymana Kevn, çawa ku berê jî hatibû gotin, cuz’a pêşîn a Pirtûka Pîroz e ku îro him jî bo cihûyan, him jî ji bo îsewîyan pirtûkeke qudsî ye. Ev pirtûk berî zayîna Îsa temam bûbû. Gelek kes wê wekî Pirtûka Cihûyan jî bi nav dikin.

Di tradîsyona xaçhebîniyê de mezhebên cuda çend beşên vê pirtûkê tevî metna baweriyê dikin an jî ji metna baweriyê derdixin. Bi qewleke din li ser hejmara pirtûkên ku Peymana Kevn pêk tînin lihevhatinek çênebûye û her mezhebê li gorî xwe metna ku jê bawer bikin an pê qayîl bibin diyar kirine. Kenîseya Katolîkan wê nusxeya Peymana Kevn bi kar tînin (dixwînin û pê ‘emel dikin) ku ji hêla Saint Jerome [Ezîz Cîrûm (342-420)] ve bi zimanê latînî hatiye wergerkirin. Ev nusxe wekî “Vulgata” (bi îngilizî ‘vulgate’) tê te‘rîfkirin. Xirîstiyânên Ortodoks tercumeyêke kevn a bi zimanê grekiya qedîm bi kar tînin ku wekî “Septuagînt” tê zanîn. Di vê nusxeya ortodoksan de li gorî nusxeya katolîkan çend pirtûk zêde ne. Mensûbên mezheba Protestaniyê zêdetir bi Tanaxê re mijûl in ku ji pirtûkên Tewrat (Pênc Kitêbên Mûsa), Nevîm û Ketuvîmê pêk tên û xeyn ji çend pasajan hema hema bi temamî bi zimanê ibrânî ye.

1.4.2. Beşên Peymana Kevn

Peymana Kevn ji 39 pirtûkan pêk tê û her pirtûk di nav xwe de ji beşan çêdibin (tenê pirtûka Obadya yek beş e). Pirtûkên Peymana Kevn û hejmara beşên wan bi rêzê wiha ne¹²:

01. Pirtûka Yekem ji Pênc Kitêbên Mûsa (Afîrandîn), 50 beş.

¹² Navên beşên Peymana Kevn ji vê tercumeya Kurdî hatine wergirtin: *Kitêba Pîroz*, Komela Hêvî û Jiyanê, Bielefeld, 2011.

02. Pirtûka Duyem ji Pênç Kitêbên Mûsa (Derketin), 40 beş.
03. Pirtûka Sêyem ji Pênç Kitêbên Mûsa (Lêwiyiyan), 27 beş.
04. Pirtûka Çarem ji Pênç Kitêbên Mûsa (Hejmaran), 36 beş.
05. Pirtûka Pêncem ji Pênç Kitêbên Mûsa (Ji Nû Ve Lêkirin), 34 beş.
06. Yêşû, 24 beş.
07. Serweran, 21 beş.
08. Rût, 4 beş.
09. Samûyêl, Pirtûka Yekem, 31 beş.
10. Samûyêl, Pirtûka Duyem, 24 beş.
11. Qiralan, Pirtûka Yekem, 22 beş.
12. Qiralan, Pirtûka Duyem, 25 beş.
13. Dîrokan, Pirtûka Yekem, 29 beş.
14. Dîrokan, Pirtûka Duyem, 36 beş.
15. Esra, 10 beş.
16. Nehemya, 13 beş.
17. Ester, 10 beş.
18. Eyûb, 42 beş.
19. Zebûr (Mezmûran), 150 beş.
20. Methelokên Silêman, 31 beş.
21. Waiz, 12 beş.
22. Helbesta Helbestan, 8 beş.
23. Îşaya, 66 beş.
24. Yêremya, 52 beş.
25. Lawijên Yêrtemya, 5 beş.
26. Hêzekîl, 48 beş.
27. Danîel, 12 beş.
28. Hoşeya, 14 beş.
29. Yowêl, 3 beş.
30. Amos, 9 beş.
31. Obadya, 1 beş.
32. Yûnis, 4 beş.
33. Mîka, 7 beş.
34. Nahûm, 3 beş.

35. Habaqûq, 3 beş.

36. Tsêfanya, 3 beş.

37. Hagay, 2 beş.

38. Zekerya, 14 beş.

39. Maleyaxî, 4 beş.

Naverokên Beşên Peymana Kevn

Ji ber ku Peymana Kevn perçeyek ji Pirtûka Pîroz a xêçebînan e û berî Peymana Nû hatiye berhevkirin û gelek meseleyên wê bi meseleyên Peymana Nû re têkildar in û têgihiştina wan rê vedike li ber fahmkirineke rastir a Încîl û nameyan, behsa naverokên pirtûkên Peymana Kevn bi kurtasî bibe jî tişteke ne bêfeyde ye. Kurteyên naverokên dîsa li gor rêzê wiha ne:

1.4.2.1. Afirandin

Pirtûka destpêkan e ku behsa çêbûna erd û ezmanan dike. Wextê ku însan bêmriyê Xwedê dîkin rêkûpêkiya dinyayê û yekgirtiya civakê xera dibe. Gelek netewe yan qewm dertên holê û gel dest bi axaftina bi zimanên cuda dike. Piştî gelek nîşan Xwedê bi zilamekî ku navê wî Îbrahîm e, qise dike û digel wî peymanekê datîne û dibêje ew ê ji zurriyetê wî miletekî mezin derîne û dê ji wan re axeke (wêlatekî) fireh bide. Îbrahîm ji Xwedayê xwe pir razî ye û baweriya wî bo vê sozê pir qewî ye. Jixwe, Xwedê jî bi îşaretan vê soza xwe piştrast dike. Ev têkîlî di navbera Xwedê û Îbrahîm de piştî wefata Îbrahîm digel kurê wî Îshaq û piştî wefata Îshaq digel kurê Îshaq Yaqûb dewam dike. Yaqûb û donzdeh kurên wî û temamê zaroyên Îsraîl (Yaqûb) piştî gelek bûyeran ku tefsîl hatine sêwirandin koçî Misrê dibin û bi arikariya Yûsuf ku li Misrê pozîsyeneke pir bilind wergirtibû li Misrê bicîh dibin û dijîn.¹³

1.4.2.2. Derketin

Di vê pirtûkê de tê dîtin ku zarokên Îsraîl (zurriyetê Îbrahîm bi silsileya Yaqûb) li Misrê gelek zêde bûne lê serokên Misrê ku wekî firewn tên binavkirin ji wan re zulm û te‘deyê dîkin û ew ji xwe re û ji miletê qibtî re kirine xulam û yêxsîr. Xwedê ji bo azadkirina wan zilamekî bi navê Mûsa hildibijêre û jê re bi gelek mûcizeyan piştgirî dide. Mûsa bi dizîka wan ji Misrê derdixe û tên qeraxa Behra Sor. Rê li ber

¹³ b.n., r. 19-102.

wan vedibe û derbasî aliyê din dibin lê Fir‘ewn û artêşa wî nikarin vê yekê bikin û bi temamî dixeniqin. Qewmê Benî Îsrâîl (zarokên Ye‘qûb) diçin nêzî Çiyayê Sinâyê û li wir bi cih dibin. Xwedê peyman xwe digel wan nû dike û ji wan re qanûnekê dişîne û dibêje ku divê xeyn ji Xwedê ji tu kesî re perestîş nekin û ji gotina wî derneyên.¹⁴

1.4.2.3. Lêwiyîyan

Ev pirtûk fermanên xwe dihevwîne ku ji Benî Îsrâîl dixwaze ku pêk bînin û bi saya vê yekê bibin milletê hîlbijartî yê Xwedê. Qismek ji fermanan derbarê qurbankirinê de ye ku çend cureyên şerjêkirina qurbanan bi tefsîlat hatine îzahkirin. Mebest ji qurbanan ew e ku benî Îsrâîl bi xwîn an xweliya heywanên şerjêkirî paqij bibin û têkiliyên wan digel Xwedê xurt bimîne. Bo van fermanên îlahî mebesteke din jî ew e ku ev milletê hîlbijartî xwe hazir bikin ji bo koça xwe ya pîroz ber bi welatê pîroz (erdê muqeddes) û berî vê yekê him ji aliyê bedenê ve him jî ji aliyê hişmendiyê ve amade, dilxwaz û çalak bibin.¹⁵

1.4.2.4. Hejmaran

Di vê pirtûkê de behsa bêmriya Benî Îsrâîl û sezaya giran ku ji wan re musteheq hatiye dîtin tê kirin. Zarûyên Ye‘qûb ku naxwazin herin herbê û li hemberî peyxemberê xwe dertên, nikarin ji çolê derkevin û ev serdem heta çil salan dewam dike. Navê “hejmaran” ji ber hejmartina zarûyên Îsrâîlê tê ku berî ku li hember dijminên xwe herb bikin zîlamên ji bîst salî mezintir hatibûn hejmartin. Mûsa û xelîfeyê wî Yûşa di dawiyê de xwe digihînin Moabê, sînorê erdê pîroz ku ji Yehûdiyan re hatiye we‘dkirin.¹⁶

1.4.2.5. Ji Nû Ve Lêkirin

Ev pirtûk axaftinên dawîn ên Mûsa dihevwîne ku Benî Îsrâîl wextê li van şîretan guhdarî dikin êdî gihaştine sînorê erdê pîroz, welatê Ken‘anê. Mûsa deng li wan dike û dibêje ku bila soza xwe digel Xwedê teze bikin, fermanên Xwedê bi cih bînin û xeber dide ku Xwedê herçend ku ew asî bibin jî li ser pişta wan e. Mûsa fermanên

¹⁴ b.n., r. 103-171.

¹⁵ b.n., r. 172-222.

¹⁶ b.n., r. 223-291.

Xwedê ji wan re ji nû ve vedibêje, ango tekrar dike. Peyameke eşkere ya vê pirtûkê ew e ku divê her kes ji dil û can xwe nezrî Xwedê bike û li ser rêya rast bimîne.¹⁷

1.4.2.6. Yêşû

Di vê pirtûkê de meseleyên piştî wefata Mûsa tên neqlkirin. Mûsa bi îzna Xwedê Yêşû/Yûşa wek xelîfeyê xwe û serokê Benî Îsraîlê wezîfedar dike. Armanca sereke ya vî zilamî ew e ku axa pîroz feth bike û digel qewmê xwe li wir bi cih bibin. Ew û eskerên xwe ewil bajarê Erîhayê fetih dikin û paşê çend bajarên din ên erdê pîroz. Yûşa heta kalbûn û wefata xwe ji bo qewmê xwe seroktiyê dike.¹⁸

1.4.2.7. Serweran

Di vê pirtûkê de behsa hakim an serweran tê kirin. Serwer bi xwe ne qiral in lê di herban de yan ji bo bêtifaqiyên sîvîl hukmên ‘adil didin û bo qewmê xwe rêberiyê dikin. Ji ber vê yekê ye ku navê wan “hakim/dadger” e. Yek ji wan hakimên Samson e ku ji aliyê qeweta bedenî ve ne merivekî ji rêzê ye. Li hemberî filistîniyan şer dike. Piştî ku hezkiriya wî Delîle wî dixapîne, dikeve destê dijminên xwe û dibe xulam. Berî ku bê îdamkirin avahiya ku tê de dimîne dipelişîne da ku qasî ji destê wî tê hejmareke mezin ji dijminên xwe bikuje. Gîdeon/Ced‘ewn jî yek ji wan hakimên e. Tenê bi 300 eskerên xwe arteşa medyenîyan têk dibe. Di nav wan hakimên de bi navê Debora jinek jî hebû ku seroka ‘eskerî, sîvîl û olî bû.

Di pirtûkê de hin bûyer dubarekirî ne: Xelk serî radikin Xwedê û gunekare dibin. Xwedê ceza dide wan û dijimên wan ji wan re misellet dibin. Piştî ku poşman dibin Xwedê ji wan re hakimekî dişîne û ji destê neyaran azad dibin. Lê rewş her tim wiha nadome û dîsa gunekar dibin û Xwedê belayeke din ji wan re dişîne. Dîsa poşman dibin û bi destê serwerekî rizgar dibin. Di pirtûkê de ev senaryo gelek caran ‘eynî bi vî şiklî diqewime.¹⁹

1.4.2.8. Rût

Di vê pirtûkê de behsa Rûtê tê kirin ku di serdema Serweran de jiyaye. Rût jineke jinebî ye û ne ji qewmê Benî Îsraîl e. Ji ber ku ev jin pir dilşewat, birehm û xwedî nezaket e bala Boaz dikşîne û Boaz wê mar dike. Rût bizarû dibe û jê re

¹⁷ b.n., r. 292-352.

¹⁸ b.n., 353-393.

¹⁹ b.n., 394-432.

kurekî tîne. Navê kurikî Obed e ku piştî mezin dibe jê re jî kurek çêdibe ku navê wî Yesse datînin. Yesse bavê Dawid e, ev jî nîşan dide ku Rût yek ji dapîrên Qiral Dawûd e (jina bavê kalikê wî Boaz e) û ev sîlsîle heta Îsa El-Mesîh dewam dike.²⁰

1.4.2.9. Samûyêl, Pirtûka Yekem

Di vê pirtûkê de bûyerên wê serdema întiqalê hatiye vegotin ku qewmê Îsraîl ji dewra hakimî derbasî hikûmeta qiralan dibin. Qiralê pêşîn ku hatiye birûnkirin (îşareta pîrozbûne û meqbûliyê) Talût e. Peyxember Samuel/Îşmoyîl ji qewmê xwe re îlan dike ku Saul/Talût ji wir şûnde reîsê wan e. Lê ji ber ku Talût di qiraltiya xwe de ji dirustiyê dûr dikeve û mexlûbî guneh û kibra xwe dibe Xwedê şexsiyetekî din ji bo textî hazir dike ku navê wî Dawûd e. Piştî wefata Talût dîsa heman peyxember Dawûd wekî qiral birûn dike. Mijareke giring a vê pirtûkê ew e ku Xwedê wek însanan li gorî xuyabûnê hukm nade û tam ber'eksiya vê yekê ji zahirê zêdetir li gorî qelbê wan însanan dadirizîne.²¹

1.4.2.10. Samûyêl, Pirtûka Duyem

Di vê pirtûkê de ku berdewama pirtûka berî xwe ye, ji serdema qiraltiya Dawûd tê behskirin. Ew, Qudsê -ku bi zimanê îbranî wekî Yerusâlim tê nasîn- wekî paytext radigihîne. Pêşî merivekî maqûl û dîlnizm e û ji dil û can ji Xwedayê xwe re dua dike (çawa ku di pirtûka Zebûrê de tê dîtin). Lê piştî demekê bilindahiya exlaqê wî xirab dibe û çav berdide jineke mêrkirî. Pê re şa dibe û ji vê minasebetê Silêman (paşê Silêmanê Qiral) çêdibe. Ji ber gunekariya wî zarûyên Dawûd rastî afat û belayan tên: Zarûyên wî dîn dibin, di nav wan de qetil çêdibe, û birakî namûsa xwişka xwe bînpê dike. Piştî van bûyeran qiraltiya Dawûd bi dawî dibe.²²

1.4.2.11. Qiralan, Pirtûka Yekem

Qismê pêşîn ê vê pirtûkê behsa qiraltiya Silêman kurê Dawûd dike ku digel qewmê xwe digije lûtkeya dewlemendî û refahê û li Qudsê Heykel/Perestgehê ava dike. Li dewleta Îsraîlê perwerdehî û hikmetê teşwîq dike. Lê piştî ku ew jî xeyn ji Xwedê xwedayên din nas û qebûl dike û ji wan re ibadet dike, Xwedê nivê hikûmdariya wî jê distîne û bi vî şiklî dewleta Îsraîlê dibe du perçe: Qiraltiya bakur,

²⁰ b.n., 433-439.

²¹ b.n., 440-490.

²² b.n., 491-533.

Îsraîl û Qiraltiya başûr, Yehûda. Qismê duyem ê vê pirtûkê behsa destpêka dîroka qiraltiyên perçebûyî dike û tê de behsa Îlyas Peyxember jî tê kirin ku qewmê xwe jî hebandina putan men' kiriye.²³

1.4.2.12. Qiralan, Pirtûka Duyem

Di vê pirtûkê de jî mijar dîroka herdu dewletên yehûdiyan e ku heta sirgûna mezin ya Babîlê dewam dike. Qiralên van dewletên dabeşbûyî li gor sozdariyên wan ji bona ehd û peymana Xwedê tîr xandin û tê dîtin ku gelek ji wan bêsoz û bêqerar in. Xwedê ji qewmê Benî Îsraîl û qiralan re gelek qasid dişîne û ew jî qewmê xwe û serokan hişyar dikin û wan ji puthebîniyê men' dikin, lê ev cehd û hewlên wan bêencam dimînin. Di netîceyê de Xwedê cezayeke giran dide wan: Babîlê tîr Qudsê, bajêr dager dikin û xelkê bi temamî sirgûn dikin.²⁴

1.4.2.13. Dîrokan, Pirtûka Yekem

Ev pirtûk bi şecerenameya Yehûdiyan dest pê dike ku neh beşên ewil bi vê mijarê re têkildar in. Dara malbatê ji Adem dest pê dike û heta yehûdiyên wê serdemê (serdema nivîsara vê pirtûkê ku êdî yehûdî ji sirgûnê veqetiyane) dewam dike. Paşê behsa mirina trajîk a Seûl (Talût) tê kirin ku yekemîn qiralê yehûdiyan bû. Piştî vê qisseyê bi dirêjahî behsa qiraltiya Dawûd tê kirin ku ber'eksiya beşên pêşîn li wir wek qiralekî îdeal tê teswîrkirin. Xwedê ew hîlbijartîye û je re xanedanek hetahetayê we'd kiriye û ew jî ji dil û can Tabûtê (emanetên berê ku ji Mûsa û Harûn mane) diparêze, Qudsa Şerîf di bin hukmê wî de bajareke ewle ye û ji bo avakirina Me'bedê zehf dixebite.²⁵

1.4.2.14. Dîrokan, Pirtûka Duyem

Di vê pirtûkê de behsa qiraltiya Silêman tê kirin ku bi çî awayî Me'bedê/Sînagoga Mezin daye avakirin. Di pêvajoya çêkirina Me'beda Xwedê û qesra Qiral Silêman de, Silêman ji qralê Sûrê (bajarekî li Lubnanê) Hîram re peyamekê dişîne da ku jê re bibe arîkar. Daxwaza Silêman ew e ku di miqabala

²³ b.n., 534-585.

²⁴ b.n., 586-633.

²⁵ b.n., 634-678.

kereste (darên avahiyan) û hosteyan de ji Hîram re ceh, şerab û rûn bişîne. Hîram vê pêşniyarê qebûl dike û Hûram-abî, hosteyekî zana ji bo vê projeyê dişîne.²⁶

1.4.2.15. Esra

Di vê pirtûkê de vegeerîna yehûdiyan ber bi memleketê wan î pîroz bi hûrgilî tê vegotin. Di vê serboriyê de ku ji Babîlê dertên û ber bi Ken'anê ve diçin Esrayê (wek 'Ezra' jî tê nivîsîn), katib (nivîskarê Tewratê) ji wan re rêberiyê dike. Ezra ji wan re dibêje ku divê peymana xwe digel Xwedê nû bikin û hertim guh bidin fermanên Wî. Dîsa li vir behsa jinûveçêkirina Me'bedê tê kirin ku di serdema dagira Babiliyan de bi temamî pelîşî bû. Bi vî şiklî Benî Îsraîl jî ber giringiya wê ya sembolîk vê perestgehê dubare ava dikin.²⁷

1.4.2.16. Nehemya

Di vê pirtûkê de behsa qehremantiya Nehemya tê kirin ku piştî vegeerîna ji sirgûniyê ji qewmê xwe re rêbertiyê dike da ku bajarê Qudsê ji nû ve ava bikin. Çawa ku bajar ji nû ve ava dibe Ezra û Nehemya seramonyekê pêk tînin da ku ew û qewmê xwe peymana Xwedê nû bikin.²⁸

1.4.2.17. Ester

Di vê pirtûkê de xelasbûna yehûdiyan ji komkujiyeke mezin tê neqlkirin ku bi destê jineke yehûdî ya bi navê Ester pêk tê. Dema ku Împaratoriya Persê gihaştibû hêza xwe ya herî mezin, qismek ji yehûdiyan di bin hukmê persan de dijiyan. Qiralê persan bedewiya Esterê di'ecibîne û pê re dizewice lê nizane ku jinik bi xwe yehûdî ye. Ji ber ku şahbanû ye, ji planên li dijî yehûdiyan xeberdar dibe û niyeta xerab a wezîrî ji padişah re vedibêje û bi saya hişyarî û wêrekiya wê miletê yehûdî wekî gelek carên berê ji tunebûnê xelas dibin. Herçend di pirtûkê de bi eşkeretî neyê gotin jî ev yek jî nîşan dide ku Xwedê bi peymana xwe re sozdar e û qewmê xwe ji helakbûnê diparêze.²⁹

²⁶ b.n., 679-734.

²⁷ b.n., 735-750.

²⁸ b.n., 751-773.

²⁹ b.n., 774-786.

1.4.2.18. Eyûb

Di vê pirtûkê de mijar merivekî sadiq û xwedî îman e ku navê wî Eyyûb/Eyûb e. Di qisseta wî de pirsar “Gelo Xwedê çima ji salihan re cewr û cefayê dide” tê bîra meriv. Eyûb vê pirsê di dilê xwe re derbas dike û bi dengî ji Xwedê û ji ‘edaleta Wî gazincan dike. Lê ji ber ku bisebr û sebat tevdigere û ji şubheyên xwe yên bêcih poşman dibe Xwedê mal û milkê wî û tenduristiya wî jê re paşde vedigerîne. Mirov têdigije ku însanên baş çiqas tûşî bela û ceribandînan derasayî werin jî Xwedê emeg û karên wan ên baş pûç dernaxe.³⁰

1.4.2.19. Zebûr (Mezmûran)

Ev pirtûk ji îlahî û duayan pêk tê ku piştî sirgûnê hatine berhevkirin. Bi saya vê pirtûkê Benî Îsrâîl hînî dua û lawijan dibin. Bi gelemperî ji aliyê temayê ve Zebûr di nav pênc kategoriyan de tê nirxandin: îlahî, lawijên civakî, lawijên qiralan, lawijên takekesî, şikirînên takekesî. Ji ber firehiya wê, Zebûr mezintirîn beşa Peymana Kevn e.³¹

1.4.2.20. Methelokên Silêman

Di vê pirtûkê de gelek we‘z û nesîhet û gotinên wecîz hene ku piraniya wan bi Qiral Silêman re tînin nisbetkirin. Ev metelok îzah dikin bê hikmeta Xwedê çi ye û çawa tê qezenckirin. Qewmê Xwedê tenê bi saya vê hikmetê dikarin geşdar bibin. Însan du qism in: Ên bîaqil ku guh didin hikmetê û bi saya wê tînin pîrozkirin; ên ehmeq ku jê mehrûm dimînin û di encamê de ji ber vê xeletiya mezin hertim di nav poşmanî û ‘ezabê de dimînin.³²

1.4.2.21. Waiz

Ev pirtûk nêrineke felsefî ya li ser jiyana Qiral Silêman e. Li ser vê dinyaya betal hûr dibe û hewl dide ku jê wateyekê derîne; di jiyana de çiqas tiştên absurd/dûrî aqil hebin jî divê di çarçoveya hikmetê de werin nirxandin. Di naverokê de herçiqas perspektîveke reşbîn hebe jî di encamê de bi bîranîneke hêvîdar bi dawî dibe: Eger mirov digel Xwedayê xwe têkiliyeke baş deyne jiyana watedar û biqîmet dibe.³³

³⁰ b.n., 787-834.

³¹ b.n., 835-952.

³² b.n., 953-993.

³³ b.n., 994-1006.

1.4.2.22. Helbesta Helbestan

Di vê pirtûkê de meseleyên zewac û hezkirinê bi stranan û bi uslûbeke bicoş tîr vegotin. Hêla wê ya cinsî bihêz e.³⁴

1.4.2.23. Îşaya

Di vê pirtûkê kehanetên Îşaya hene ku ji peyxemberên Benî Îsraîl e. Qewmê xwe hişyar dike û ji wan re dibêje ku hûn li ser soza xwe nasekinin, prensîbên Tewratê bînpê dîkin, ji putan re ‘evdîtiyê dîkin, ji feqîr û miskînan re bi xirabî mu‘amele dîkin. Ew, sirgûna mezin a Babîlonê ji pêş ve xeber dide û dîsa agahiyê dide wan û dibêje ku hûn ê ji sirgûnê vegerin û wekî derketina pêşîn ji Babîlê derkevin û werin Qudsê. Ne tenê van tiştên han, lê Xwedê bi destê warisê qiral Dawûd dê we serfiraz bike û ji Benî Îsraîl re lutf û ni‘metên xwe bişîne. Îşaya bi kehanetên xwe yên li ser zayîna Mesîh û mirina wî ya qurbanî navdar e.³⁵

1.4.2.24. Yêremya

Yêremya di qiraliyeta Yehûda de berî dagirkirina Babîliyan û di dema vê dagirkirinê de ji qewmê xwe re we‘z û şîretan dide. Di tradîsyonê de wek peyxemberê giryardar tê zanîn. Lê çiqas hewl bide jî xelk ji neshîten wî ‘acîz in û wî dixin girtîgehê. Ew çiqas rastî dijiwariyan were jî ji hişyariyan paşde namîne û bi eşkeretî serokên qewmê xwe rexne dike û ji wan re dibêje ku hûn Xwedê naynin bîra xwe û gotinên wî bi tişteki hesab nakin. Dîsa ji pêş ve xeber dide (kehanet dike) ku Xwedê dê rojekê digel qewmê xwe peymanî xwe nû bike û qanûnên xwe di qelbên wan de bi cih bike.³⁶

1.4.2.25. Lawijên Yêrtemya

Ev pirtûk ku helbesteke biçûk e, wekî zêmarekê ji bo ketina Qudsê û îşxala wê ya bi destê Babîliyan e. Ji ber gunekariya xwe poşman dibin, lê dîsa jî hêviya xwe ji Xwedê nabirin. Dizanin ku rehma Wî tu car bi dawî nabe û wekî tavê her sibeh nû dibe.³⁷

³⁴ b.n., 1007-1014.

³⁵ b.n., 1015-1096.

³⁶ b.n., 1097-1187.

³⁷ b.n., 1188-1196.

1.4.2.26. Hêzekîêl

Ev pirtûk kehanetên Hêzekîêl Peyxember û serboriya wî dihewîne. Li gorî van kehanetan, bajarê pîroz ê cihûyan Quds dê bipelişe. Ev dê bibe cezayek ji ber gunekariya vî qewmî. Derbarê qewmên din ên wekî ‘Emûniyan, Moaban, Edomiyan û Filistîniyan û li ser bajarên Sûr û Seyda jî kehanetine hene. Li gorî kehaneta dawîn, muhleta sirgûnê dê tamam bibe, bajarê Quds ji nû ve dê were avakirin, Heykel/Me‘beda mezin dê dîsa însa bibe û qewmên Îsraîl careke din dê kom bibin û bi destê Xwedê bîn pîrozkin.³⁸

1.4.2.27. Danîêl

Di vê pirtûkê de behsa Danîêl Peyxember tê kirin ku wekî kesayetekî bijarte piştî sirgûnê di qesra Nebûkadnezar de û ji bo çend hikûmdarên din ên piştî wî xizmet dike. Mijara sereke kehanetên wî, kerametên wî û kar û kiryarên wî ye. Peyama êşkere ya pirtûkê ew e ku Xwedê dê qewmê Îsraîl ji muşrikan (putperestên Babîlê) xelas bike çawa ku wî Danîêl Peyxember ji şerê wan kafîran xelas kiriye.³⁹

1.4.2.28. Hoşeya

Di vê pirtûkê de him li ser Yehûda û him jî li ser Samariya kehanet hene. Ev kehanet bi wesîleya Hoşeya pêk tên. Xeyn ji van kehanetan çîrokeke meşhûr jî heye ku wekî alegoriyeke têkiliya di navbera Xwedê û Benî Îsraîlê de nîşan dide: Xwedê ji Hoşeya re emir dike ku here ba jineke fahişe bizewice. Ew jî li gorî gotina Xwedê hereket dike. Li vir, jina qehb sembola qewmê Benî Îsraîl e ku her tim jê re serî radikin û li ser soza xwe nasekinin; Hoşeya jî di çarçoveya alegorîk de nûnerê Xwedê ye ku her çiqas jina wî bênamûs be jî dîsa jê hez dike û bê wê sebra wî nayê.⁴⁰

1.4.2.29. Yowêl

Ev pirtûk ji helbestên kurt ên kehanetan pêk tê ku ji devê Yowêl hatine neqilkirin. Yowêl behsa “Roja Xwedê” dike ku di wê rojê de dewletên xerab dê bipelişin û xelqê Xwedê (Benî Îsraîl) ji hikumdariya betal û fasid ên însanan dê xelas bibe. Kehaneteke din jî ew e ku Mesîhê qiral dê were û Ruhê Xwedê dê belav bibe.

³⁸ b.n., 1197-1279.

³⁹ b.n., 1280-1305.

⁴⁰ b.n., 1306-1319.

Bi saya vî Ruhê Pîroz xelqê Xwedê dê bi vîzyonan (keşf û kerametan) û xewnên xeybî tije bibin.⁴¹

1.4.2.30. Amos

Ev pirtûk di nav xwe de ji gelek kehanetan pêk tê ku vebêjê wan Amos e. Li gorî wan xeberên xeybî, Benî Îsrâîl ji ber gunekarî û bêemriya xwe dê werin sizakirin. Amos Peyxember gunekariya qewmê xwe li rûyê wan dixê û dibêje ku hûn ji feqîran re zulmê dikin û bê'edalet in. Xeyn ji wan gunehan qewmê wî meyl dikin ku ji xwe re putan bihebînin. Di encamê de kar û 'emelên wan ên xirab xezeba Xwedê gazî dike û ew ê wan dadgeh bike. Lê tê dîtîn ku ev xezeb û sezaya Xwedê ji ber hezkirina Wî pêk tên.⁴²

1.4.2.31. Obadya

Biçûktirîn pirtûka Peymana Kevn e ku tenê ji beşekê pêk tê. Di vê pirtûkê de Obadya Peyxember derbarê miletê Edom de kehanetekê bi lêv dike û dibêje ku Xwedê rojekê dê memleketê Yehûda te'mîr bike (ji nû ve ava bike) û kesên ku ji qelsiya qewmê Xwedê (miletê Elom) bi niyetê xirab îstîfade kirinê dê cezayê xwe bibînin. Ji vê kehanetê mirov têdigihiye ku lazim e em ji naçarî û ze'îfîya cînarên xwe sûd wernegirin.⁴³

1.4.2.32. Yûnis

Di vê pirtûkê de çîroka Yûnis tê vegotin ku ji Asûriyan re peyxembertiyê dike û hewl dide ku wan hîdayet bike. Lê piştî demekê ji wan 'aciz dibe û ji gazîkirina Xwedê direve (dev ji peyxembertiyê berdide). Di miqabila vê bêemriyê de ji keştiyê tê avêtin û masiyeke qerese wî dadiqurtîne. Ji ber ku poşman dibe û Xwedê wî 'efû dike masî wî hezm nake û diavêje qeraxekê. Yûnis vedigere qewmê xwe û vê carê qewmê wî guh didine gotinên wî. Ev yek jî nîşan dide ku carinan neyarên Benî Îsrâîl jî dikarin bibin ehlê îmanê û ji ber gunehên xwe poşman bibin; ev tişt e ku qewmê Xwedê gelek caran nekariye bi cih bîne.⁴⁴

⁴¹ b.n., 1320-1325.

⁴² b.n., 1326-1335.

⁴³ b.n., 1336-1337.

⁴⁴ b.n., 1338-1341.

1.4.2.33. Mîka

Di vê pirtûkê de we'z û nesîhetên Mîka hene ku ji qewmê xwe re dibêje ji ber gunehên xwe tewbe bikin. Rexne û hişyariyên wî yên giran hene li hemberî serok, seyda û peyxemberên derewîn. Ew ji her kesî re dibêje ku lazim e bidilnizmî digel Xwedê bimeşin, 'adilane hukm bidin û bi xweşî û nezaket tevbigerin. Herwiha, kehanetên vî peyxemberî jî hene û yek ji kehanetên wî ew e ku dibêje Mesîh dê li Betlehemê ji diya xwe bibe.⁴⁵

1.4.2.34. Nahûm

Divê pirtûkê de kehaneta Nahûm tê veguhastin. Li gor vê pêşbîniyê bajarê Nînova û miletê Asûrî dê tûşî xezeba Xwedê bibin û ji vir pê de hukm û nufûza wan dê çenebe. Ev jî nîşan dide ku duh jî, îro jî Xwedê neteweyên bê'edalet bêbersiv nehêle.⁴⁶

1.4.2.35. Habaqûq

Di vê pirtûkê de hevpeyvînek di navbera Habaqûq Peyxember û Xwedê de heye. Ev diyalog nêzî dagirkirina qiraliyeta Yehûda pêk tê. Nebî Habaqûq bi navê xelqê ji Xwedê pirsan dipirse û Xwedê jê re bersivan dide û jê re garantî dide û dibêje ku ez kengî bixwazim û bi çi awayî bixwazim, teqez ez ê însanên xirab mehkeme bikim. Herwiha, Xwedê bi bîra nebiyê xwe tîne û dibêje ku însanên qenc bi saya baweriyê dê her tim bijîn.⁴⁷

1.4.2.36. Tsêfanya

Di vê pirtûkê de behsa kehanetên Tsêfanya tê kirin ku yek ji neviyên Hêzekîel e. Ew pêşbînî dike û dibêje ku Roja Xwedê miheqqeq dê were û çi şexs, çi milet her kes dê hesabê xwe bide. Di wê rojê de xeyn ji qencan kes dê nemîne; agirê geş ê Xwedê dê dilxiraban bi temamî paqij bike.⁴⁸

1.4.2.37. Hagay

Di vê pirtûkê de pend û îxtarên Hagay hene. Piştî ku zarûyên Îsraîl ji sirgûnê vedigerin diviya ku Me'bed/Perestgeha ku di îşxalê de hatibû xerakirin ji nû ve ava

⁴⁵ b.n., 1342-1349.

⁴⁶ b.n., 1350-1353.

⁴⁷ b.n., 1354-1358.

⁴⁸ b.n., 1359-1363.

bikin. Lê Hagay dibîne ku xelq ji Me'bedê zêdetir qîmetê didin çêkirina xaniyên xwe. Lê paşê dest bi înşakirina wê dikan. Me'beda înşakirî wekî ya berê (dewra qiral Silêman) ne biheybet û hijmetkar e lê Xwedê dibêje ku ez ê xêr û bereketa xwe daynim ser wê. Ji peyamên Hagay mirov têdîgihîje ku ji bo bawermendan lazim e rehetiyên dinyayê wan meşxûl neke û divê pêşî manewiyatê tercîh bikin.⁴⁹

1.4.2.38. Zekerya

Di vê pirtûkê de jî we'zek bi devê Zekerya li ser restorasyona Me'bedê heye. Di peyama xwe de vedibêje ku Xwedê di pişt perdan de ji bo Benî Îsrâîl dixebite û lazim e ew jî jê re sozdar bin; Xwedê ji wan re dê Mesîh (xelaskarê mezin) bişîne, qewmê xwe îhya û piştrast bike û neyarên wan helak bike.⁵⁰

1.4.2.39. Maleyaxî

Di vê pirtûkê de ku pirtûka dawîn a Peymana Kevn e, şîret, we'z û kehanetên Maleyaxî tên neqilîkirin. Zarokên Ye'qûb ji hela me'newiyatê ve pir paşda çûne û ketine her cur xirabiyê: Seydayên wan qanûnan îhmal dikan; zîlam jîna xwe berdidin da ku bikaribin digel jinên pagan bizewicin û xelk bac û xeraca xwe (tesedduq û berpirsiyariya dînî) nadin. Xwedê bi peyxemberê xwe Maleyaxî ji wan re peyamê dişîne û dibêje ku hûn miletê min ê bijartî ne û vegerin bal min û Roja Xwedê (roja hisêb) bînin bîra xwe; ez soz didim ji we re ku ez ê nazil bim (werim) xwarê û ji we re serweriyê bikim bi wasiteya peyxemberê min Îlyas ku ji bo min dê amadehiyê bike û rê li ber min veke.⁵¹

1.4.3. Peymana Nû

Peymana Nû cuz'a duyem û dawî ya Pirtûka Pîroz e. Ji bo xaçhebînan pirtûkeke pîroz e lê cihû pîrozbûna wê qebûl nakin. Ev jî tê vê wateyê ku herçend Peymana Kevn ji bo îsewîyan muqeddes be jî yehûdî Peymana Nû qebûl nakin û bawerîya wan tenê bi Peymana Kevn re sînordar e. Ji ber vê yekê ji bo nirxandin û tehlîlîkirina dîroka Xirîstîyanîyê lazim e digel Peymana Nû, Peymana Kevn jî bê zanin. Jixwe gelek mijar, mesel, mesele, bûyer, kesayet bi Peymana Kevn re elaqedar in û carinan ayetên wê rasterast dikevin Peymana Nû jî.

⁴⁹ b.n., 1364-1366.

⁵⁰ b.n., 1367-1381.

⁵¹ b.n., 1382-1386.

Peymana Nû bi temamî bi zimanê grekî (yewnanî) ye lê di hin cihan de peyv, 'îbare an hevokên aramî û 'îbranî jî hene. Li ser hin peyvên jî ji aliyê etîmolojiyê ve nîqaş hene: gelo ew bi eslê xwe aramî ne yan 'îbranî ne hêj nehatiye zelalkirin. Jixwe di nav wan du zimanên semîtîk de nêzîkahiye berbiçav û hevpariyek mezin heye. Herdu jî girêdayî koma bakurê rojavayê ya zimanên semîtîk in ku wek zimanên Hamî-Samî jî tên zanîn.

Peymana Nû ji 27 pirtûkan pêk tê ku di zimanên cuda de û ji hêla nivîskarên cuda ve hatine nivîsîn. Ev 27 pirtûk di mezhebên cihê yê xirîstiyaniyê de bi fermî hatine qebûl û tesdîqkirin û wek Peymana Nû hatiye berhevkirin. Digel Peymana Kevn Peymana Nû jî pîroz û xwedayî ye û herdu bi hev re Kitêba Miqedes pêk tînin.

Dabeşkirina pirtûkên Peymana Nû li gorî cure û naverokê wiha ye:

- 4 pirtûkên kanonîk/çar încîl ku wek 4 pirtûkên evanjelîstan (mizgîner) jî tên zanîn.

- Kiryarên Şandiyan
- 13 nameyên Pawlûs
- Name ji 'îbraniyan re
- 7 nameyên giştî
- Pirtûka Wehyê

Çawa ku tê dîtin, 27 pirtûkên navborî eger werin kategorîzekirin dikevin 6 gruban. Navên van pirtûkan û hejmara beşên wan li gorî rêzê wiha ne⁵²:

- 01.** Încîl bi Qawla Madteos (28 Beş)
- 02.** Încîl bi Qawla Markos (16 Beş)
- 03.** Încîl bi Qawla Lukas (24)
- 04.** Încîl bi Qawla Hanna (21)
- 05.** Şîxulê Resûlan (28)
- 06.** Mektûbê Resûlê Boxos ji Romalîyan ra (16)
- 07.** Mektûbê Awulîn ê Resûlê Boxos ji Gorntoslîyan ra (16)
- 08.** Mektûbê Îkîncî ê Resûlê Boxos ji Gorntoslîyan ra (13 Beş)
- 09.** Mektûbê ê Resûlê Boxos ji Kaşadalîyan ra (6 Beş)
- 10.** Mektûbê ê Resûlê Boxos ji Yepesoslîyan ra (6 Beş)

⁵² Navên beşên Peymana Nû ji wergera ewil ya Peymana Nû ku mijara vê xebatê ye hatine wergirtin.

11. Mektûbê ê Resûlê Boxos ji Fîlîbbelîan ra (4 Beş)
12. Mektûbê ê Resûlê Boxos ji Goxosalîan ra (4 Beş)
13. Mektûbê Awulîn ê Resûlê Boxos ji Tesaxonîgîan ra (5 Beş)
14. Mektûbê Îkîncî ê Resûlê Boxos ji Tesaxonîgîan ra (3 Beş)
15. Mektûbê Awulîn ê Resûlê Boxos ji Dîmoteos ra (6 Beş)
16. Mektûbê Îkîncî ê Resûlê Boxos ji Dîmoteos ra (4 Beş)
17. Mektûbê ê Resûlê Boxos ji Dîdos ra (3 Beş)
18. Mektûbê ê Resûlê Boxos ji Pîlîmon ra (1 Beş)
19. Mektûbê ê Resûlê Boxos ji Îbranîan ra (13 Beş)
20. Mektûbê Gatoxîgê ê Resûlê Yaqûb (5 Beş)
21. Mektûbê Gatoxîgê Awulîn ê Resûlê Bedros (5 Beş)
22. Mektûbê Gatoxîgê Îkîncî ê Resûlê Bedros (3 Beş)
23. Mektûbê Gatoxîgê Awulîn ê Resûlê Hanna (5 Beş)
24. Mektûbê Îkîncî ê Resûlê Hanna (1 Beş)
25. Mektûbê Üçüncî ê Resûlê Hanna (1 Beş)
26. Mektûbê Gatoxîgê ê Resûlê Cûda (1 Beş)
27. Wahî ê Resûlê Hanna û Asdvadzapan Încîlçîê (22 Beş)

Peymana Nû bi grekî be jî bi gelek zimanên dinyayê hatiye tercumekirin. Tercumeyên ewil bi zimanên latînî, siryanîkî, kiptîkî (zimanê misrê yê berî ‘erebî), ermenîkî, gurgîkî, etîyopî ku wekî geez jî tê zanîn, soxdî û ‘erebî ne. Herku diçe hejmara van zimanên ku bi wan Peymana Nû tê xwendin zêde dibin. Îro hemû beşên Peymana Nû yan Çar beşên ewil ku wekî încîlên kanonîk jî tên nasîn an jî perçeyeke musteqil ji 27 pirtûkan bi hemû zimanên cihanê yên mezin û bi gelek zimanên kêmnas hatine wergerandin. Bi vî şiklî, Peymana Nû weke pirtûka herî zêde tercumekirî tê tarîfkirin.

Îro di nav kinîseyên xirîstîyanîyê de li ser hejmara beşan îxtîlaf tune be jî li ser rêza pirtûkên wan cîyawazî hene. Di Peymana Nû ya mijara vê tezê de ew rêz heman rêz e ku katolîk û protestanên ewanjelîst dişopînin. Di vê rêzandinê de Nameyên Pawlûs berî Nameyên Giştî ne, lê di ortodoksiya Slavan de berî Nameyên Pawlûs, Nameyên Giştî tên.

Li jêrê li ser naveroka hemû pirtûkên Peymana Nû bi xulase agahî hatine pêşkêşkirin. Di nav wan de pirtûka herî bi hecm Încîla Lûqayê ye û pirtûka herî kurt jî Nameya Yûhenna ya duyem e.

1.4.3.1. Mizgîniya Îsa Mesîh li gorî Metta

Di vê pirtûkê de agahî li ser şecerenameya Îsa tê pêşkêşkirin. Piştî jî behsa jidayîkbûna wî ya derasayî tê kirin. Paşê li ser van mijaran jî behs û vegotinên dîtin: Waftîza (tehfîl) Îsa El-Mesîh bi destê Yûhennayê ‘imadker (waftîzker); ceribandina Îsa ji hêla ceribandoxî (şeytan) ve; komkirina wî ya şandîyan (hewariyan); mûcizeyên wî; we‘z û nesîhetên wî li ser hikumraniya asmanî ku di beşên din ên Peymana Nû de wek hikumraniya Xwedê jî hatiye bilêvkirin; we‘za çiyayî; rexne li hemberî otoriteyên dînî (bitaybet jî seyda û serokên du ‘eşîrên navdar: Ferîsiyan û Sadûqiyan); encama xirab li axiretê ku li benda gunekaran e; pêdiviyên exlaqê baş; derdestkirina wî ji hêla hikûmeta romîyan; mehkema wî; dardekirin/xaçandina Îsa û piştî sê royan vejîna wî ji qebrê. Di dawiya vê pirtûkê de Îsa ji xwendevanên xwe re dibêje ku ez her daîm bi we re me, herin, hemû milletên rûyê qadê wek xwendevanên min perwerde bikin.

Tê têgihiştin ku mebesta nivîskar Mettayî îsbatkirina Mesîhbûna Îsa ye. Ji bo vê yekê jî ji Peymana Kevn ayetan wek delîl parve dike û dupar dike ku mesaja wî ne tenê bo miletekî ye, lê bo hemû xelqên cihanê re ye.⁵³

1.4.3.2. Mizgîniya Îsa Mesîh li gorî Marqos

Di vê pirtûkê de ku ji hersê încîlên mayîn kurtir e, nivîskar Marqos herî zêde li ser kiryar û mûcizeyên Îsa radiweste. Herçend jiyana Îsa wek încîlên din bi berfirehî nehatibe gotin jî li ser hin mijaran vegotineke bihûrgilî balê dikşîne.

Mijarên sereke ku di vê pirtûkê de behsa wan hatine vekirin ev in: Derketina (zuhûra) Îsa wekî xelaskarê qewmê xwe û wek Mesîh ku ji mêj ve Benî Îsraîl li benda hatina wî bûn; çalakiya Îsa (teblîx û fe‘aliyetên wî bo hîdayetkirina qewmê xwe) li Celîleyê û li derûdora Celîleyê; têkoşîna wî li hemberî mezinên qewmê wî, çi ruhanî û çi desthilatdar; perwerdekirina xwendevanên wî (bijartiyan); mizgîniya vejîna wî ku piştî mirina wî dê pek were; rojên dawîn ên Yerûşalîmê (Qudsa Şerîfê);

⁵³ Kutsal Kitap, Eski ve Yeni Antlaşma (Tevrat, Zebur, İncil); Kitabı Mukaddes Şirketi, İstanbul, 2003, r. 1189-1241.

mirina wî li ser darê xaçê (xaçandina wî li ser wî darî ku dişibe îşareta xaçê); veşartina wî bi destê şexsekî bi navê Yûsifê Aramatyayî; rabûna wî ji qebrê û xuyabûna wî li ber çavê bijartiyan.

Di beşa dawî ya vê pirtûkê de Îsa ji hewariyên xwe re emir dide û wiha dibêje: “Herin çar terefê dinyayê û Mizginiyê li her derê belav bikin; kesên ku îman tînin ew dê xelas bibin û kesên ku îman naynin ew dê werin dazandî. Kerametên ku ji bawermendan re bên dayîn ev in: Ew ê bi navê min cinan biqewirînin, *ew ê zimanên nû biaxivin*, ew ê maran bi destên xwe bigirin; jahrê jî vexwin ew ê zirarekê nebînin, ew ê destê xwe deynin ser nexweşan û nexweş dê sax bibin.”

Çawa ku dîtin yek ji kerametên xwendevanên Îsa ew e ku bi zimanên nû qise dikin. Li vir amaje bi giringiya zimanan hatiye kirin ku bê wan ne mumkin e teblîx (mîsyonerî) bi ser bikeve.⁵⁴

1.4.3.3. Mizgîniya Îsa Mesîh li gorî Lûqa

Di vê pirtûkê de ku mezintirîn beşa Peymana Nû ye, nivîskar dixwaze ji yana Îsa bi awayekî rasttir û berfirehtir vebêje. Wekî pirtûka Mettayê li vir jî behsa Yehyayê waftîzker tê kirin ku wezîfeya wî hazirkirina rêya Îsa ye. Yehya hêj di zikê diya xwe de bi sehkirina navê Îsa dikeve kelecane. Jidayikbûna Îsa, waftîzbûna wî, ceribandina wî ya giran û serkeftina wî, çalakiyên wî li Celîleyê û li derûdora Celîleyê, çûyîna wî ber bi bajarê Qudsê ve, rojên wî yên dawîn li Qudsê, binçavkirina wî ji ber tehrîka yehûdiyan û bi destê ‘eskerên Romayê ve, mehkema wî, mirina wî ya li ser xaçê, rabûna wî ji mirinê û bilindbûna wî mijarên din ên sereke yên vê pirtûkê ne. Ji ber ku du încîlên berê û încîla Lûqa ji aliyê naverok û kronolojiyê ve dişibin hev ji wan re încîlên sînoptîk (paralel) tê gotin.⁵⁵

1.4.3.4. Mizgîniya Îsa Mesîh li gorî Yûhenna

Di vê pirtûkê de usûleke cudatir hatiye şopandin ku ji încîlên sînoptîk ên berî xwe cihêwaz e. Di destpêkê de ne jidayikbûna Îsa lê xwedatiya wî tê vegotin ku wekî îzahên felsefî balê dikşînin. Armanca sereke ya pirtûkê danasîna Îsa ye ku bi gelek navan hatiye wesifandin. Qismek ji wan sifetan wiha ne: Peyv, Mesîh, Kurê Xwedê û Kurê Meriv. Dîsa di vê pirtûkê de Îsa gelek caran wekî “Bav” gazî Xwedê dike. Îsa ji

⁵⁴ b.n., r. 1242-1274.

⁵⁵ b.n., r. 1275-1329.

bawermendan re dibêje ku piştî wî dê yek were û wan tesellî bike. (Vê ayetê bala mufessirên Îslamê jî kişandiye ku ibareya “tesellîker”ê wekî peyxemberê axir zamanî Hz. Muhemmed kurê ‘Evdila şirove kirine.) Mijareke giring ku him li vir û him di beşên din de cih digire ew e ku redkirin û înkara serokên cihûyan e. Jixwe kesên ku mirina Îsa dixwastin û ji bo vê yekê cehd dikirin ew bi xwe bûn.

Xalên giring ên vê pirtûkê bi kurtasî wiha ne: Tebîata Îsa ya derasayî (peyvbûna wî ku peyv perçeyek ji Xwedê ye); Yûhennayê waftîzker û xwendevanên pêşîn ên Îsa; axaftinên (suhbet, we‘z û nesîhet, hişyarî, mizgînî, pêşbînî, û ên din) Îsa; mûcizeyên Îsa (av bi destê wî dibe ‘ereq; kurê esîlzadekî ku bi destê wî baş dibe; jî mêrekî re şifa dide; çavên korekî ronî dike; Lazarûsî vedijîne û ji qebrê radike û hwd.); hefteya dawî ya berî mirina wî li ser xaçê; rabûna wî ji qebrê; xuyabûna wî ji eshabê xwe re.⁵⁶

1.4.3.5. Karên Şandiyan

Di vê pirtûkê de mijar jiyana bawermendên piştî Îsa ye. Îsa ji hewariyên xwe re cara dawîn xuya dibe û carek din nayê dîtin. Îmandar bi Ruhê Pîroz tîrên pîrozkirin û dest bi belavkirina dînê mesîhîtiyê dikin. Ji vir şûn de peyamên Îsa ne tenê ji bona qewmê yehûdîyan, lê belê ji bo hemû neteweyên dinyayê ne. Kenîse (dêr, cime‘eta bawermendan) her ku diçe mezintir dibe lê dîsa wekî qonaxên berê, li hemberî vê mezinbûnê dijimên herî mezin serok, ‘alim û desthilatdarên yehûdîyan in. Pawlûs jî yek ji wan neyaran e lê bi kerameta (vîzyon) Îsa ku jê re weke ronahiyeke geş xuya dibe û çavên wî bi demkî kor dike, Pawlûs jî dikeve nav xelqeya bawermendan û dest bi seyahetên mîsyoneriyê dike. Bi vî awayî ev serborî dibe bingeş û hazirî ji bo nameyên Pawlûsî jî.

Xetên giştî yên vê pirtûkê wiha ne: Fermanên dawîn ên Îsa û hilkişîna wî ber bi asimanê ve; cime‘eta îmandaran ên Yerûşalemê; belavbûna peyva Xwedê li Yehûdiyeyê û Samiriyeyê; xelasiya Pawlûsî ji înkare; tevî zulm û zordariyê serkeftin; seyahatên dûr û dirêj ên Pawlûsî bi rola qasidê Îsa/Xwedê.⁵⁷

⁵⁶ b.n., r. 1330-1369.

⁵⁷ b.n., r. 1370-1421.

1.4.3.6. Nameya Pawlos a ji Romayîyan re

Li pey pirtûka “Karên Şandîyan” nameyên Pawlosî dest pê dîkin. Hejmara van nameyan 13 e lê qismek ji xaçparêzan “Nameya ji Îbraniyan re” jî tevî van nameyan dîkin û bi vî awayî hejmar dibe 14. Di van nameyan de ku bûne perçeyeke mezin û bîngêhîn a Peymana Nû, doktrîna Pawlûsî ku wekî mîmarê xirîstîyanîyê jî tê nasîn xuya dibe.

Di nameya ji romîyan re de gunehên însanan û çawaniya gunehan tê nîqaşkirin. Li gorî wî însan tenê bi saya îmana Mesîh dikare ji gunehan xelas bibe, ne bi şopandina Peymana Kevn. Ew dîsa dibêje ku şoperên Mesîh çawa ku ji gunehên xwe yên berê azad dibin, herwiha di pêşarojê de jî ji hukumdariya gunehan azad dibin, ji ber ku “guneh nikare li ser bawermendan hukm bike”. Pawlûs dixwest ku him qewmê wî û him jî mîletên din mîsyona wî qebûl bikin. Ji ber vê yekê li ser belavbûna baweriya bi Îsa di nav mîletên xeyn ji yehûdiyan de û helwesta pêdivî ya yehûdiyan li hemberî peyama Mesîh bi dirêjî hatiye nîqaşkirin. Babetên sereke yên vê pirtûkê wiha ne: Hisretkişandina Pawlûs ji bo rêwîtiyeke ber bi Romayê ve; meseleya gunehan û serîrêkirin li hemberî Xwedê çi ye?; Yehûdî û Zagona Pîroz (gelo hukmên Tewratê berdewam in an na?); Beraat (pakbûn) bi xêra îmanê; Îmana Îbrahîm; azadî ji zagonê; deyndariya însanan din ji bo yehûdiyan; xwestek û şîretên Pawlûsî ji bawermendan re.⁵⁸

1.4.3.7. Nameya Pawlos a Pêşî ji Korîntîyan re

Di vê nameyê de Pawlûs xitabî xelkê Korîntê dike ku bajarek li Yewnana Qedîm e. Pawlûs bersiva pirsên ku jê hatiye pirsîn dide û li ser meseleyên wekî ‘ezebbûn û zewac; goştê qurbanan ku ji bo putan hatine serjêkirin; diyariyên ruhî û fonksîyonên wan û civandina tesedduqan ku ji bo feqîrên Qudsê hatine bexişandin, nêrînen xwe parve dike. Mebesta sereke ya vê nameyê ew e ku girseyek ku hêj kamil nebûne were terbiyekirin. Di vê çarçoveyê de Pawlûs wan hişyar dike, carna bi zimanekî tûj wan rexne dike û wan de‘wet dike ji bo pakbûnê û wan teşwîq dike ku ji hev hez bikin.

Serenavên giştî ku naveroka vê pirtûkê pêk tînin ev in: Silav û spasiya Pawlûs; îxtîlaf û tevlihevî di nav dêra Korîntê de; jihevqetîn û perçebûna cima‘etê; helwesta

⁵⁸ b.n., r. 1422-1443.

civatê li hemberî zinakariyê; bersivên pirsên Korîntiyan; zewac; goştê heywanên ku ji putan re hatine qurbankirin; pergala civînan; diyariyên me'newî; vejîna Îsa (qiyam û rabûna wî); komkirina hîbeyan ji bo hejarên bajarê Qudsê.⁵⁹

1.4.3.8. Nameya Pawlos a Duyem ji Korîntiyan re

Di vê nameyê de Pawlûs bi dirêjî behsa xwe dike da ku ferq di navbera wî û qasidên saxtekar de zelal bibin. Ji Korîntiyan re armanca xwe û wezîfeya xwe îzah dike û berê ji wan re çawa mu'amele kiribû wê dibêje. Ji bo qasidên derewîn ku dixwazin xelkê Korîntê ji xwe re bikin kole hişyariyan dike û dibêje ku ew dixwazin "Mizgînî" yeke ji ya min cuda belav bikin. Ew li bendê dimîne û dixwaze ku korîntî wî û nivîsên wî ji dil û can qebûl bikin.

Çarçoveya giştî ya vê mektûbê wiha ye: Wezîfeya Pawlûsî; komkirina tesedduqan ji bo bawermendên Yehûdiyayê; Pawlûs û qasidên sexte (bewawridkirinek di nav wan her duyan de); hişyariyên dawîn.⁶⁰

1.4.3.9. Nameya Pawlos a ji Galatiyan re

Galatîa li Anatola navîn herêmeke dîrokî ye. Di vê nameyê de Pawlûs behsa giringiya îmanê dike û dibêje ku tenê bi navgîniya wê mirov dikare xwe bigihîne xelasiyê, ne bi baweriya Peymana Kevn. Ji ber ku baweriya bi Îsa her ku diçû firehtir dibû û wekî yehûdîyan, mîletên din jî pê bawer dibûn meseleya sunnetbûnê derketibû holê. Bawermendên mesîhî ku bi esle xwe yehûdî bûn, digotin ku bawermendên bi eslê xwe ne cihû ne lazim e wekî me sunnet bibin. Pawlûs di vê nameyê de vê meseleyê bi hasasî dinirxîne û li ser mijara "divê bawermend çawa li Peymana Kevn mêze bikin" disekine. Herwiha, Pawlûs îddia dike ku tenê mizgîniya wî rast e û divê ku kes jî încîlên din bawer nekin, çima ku Îsa ew hîlbijartîye û bi qasidiyê wezîfedar kiriye.

Naveroka nameyê bi xetên giştî wiha ye: Mizgîniya yekane ya ku aîdî Pawlûs e; Pawlûs qasidê Mesîh e; hewariyên din jî ew wek qasid qebûl dîkin; Peymana Kevn (Zagona pîroz) û meseleya baweriyê; şayîşên Pawlûs ji bona xelqê Galatiyayê; şîret û nesîhetên Pawlûs; hişyariyên dawîn û xatirxwestin.⁶¹

⁵⁹ b.n., r. 1444-1464.

⁶⁰ b.n., r. 1465-1478.

⁶¹ b.n., r. 1479-1486.

1.4.3.10. Nameya Pawlos a ji Efesiyan re

Efes bajarekî Anatolê ye. Ev name yek ji wan nameyan e ku Pawlûs di hebsê de nivîsiye û wezîfeya birêkirina wê dide Tîhîkos. Di naveroka wê de mijarên sereke wiha ne: Pawlûs silav û rêza xwe dişîne ji kenîseya (cime‘eta) efesiyan re; bereket û xêr ku bi saya îmanê pêk tên (îman bi încîla Pawlûsî); duayên Pawlûs ji bo bawermendan; guherînên mezin ku di milletên din (miletên ku ne yehûdî ne) de piştî baweriyê çêbûne; Pawlûs çawa hat hilbijartin û ji eqwam (qewmên xeyrî yehûdî) re bû qasid; yekbûn (wehdet); têkilî di nav ferdên civakê de (di navbera jin û mêr, endamên malbatê, kole û efendiyê wî de); silahên manewî ku Xwedê ji bawermendan re nesîb dike); silav û dua.⁶²

1.4.3.11. Nameya Pawlos a ji Filîpiyan re

Bajarê dîrokî yê Filîpî di sînoren Yewnanistana îroyîn de dimîne û nêzî bajarê Kavalayê ye. Di vê nameyê de Pawlûs diyar dike ku çiqas cewr û cefa bibîne jî ji belavbûna mizgîniyê pir şa û dilxweş dibe. Li gorî wî tu tişt wekî naskirina wî biqîmet nabe û ew ji bo ku bigêje armanca xwe dê bazdana xwe bidomîne.

Xetên giştî yên vê pirtûkê wiha ne: Silav; sipasî ji bo xelkê Filîpiyê ji ber ku beşdarî mizgîniyê bûne; dua ji bo zêdebûn û berdeewama bawerîya wan; hal û rewşa Pawlûs a guncav; mehkûmbûna wî; berteka birayan li hemberî girtina Pawlûs; helwesta Pawlûs di vê rewşê de; tewsiyeyên pratîk ji bo pîrozbûnê (tevgerîn bi cesaret, dîlnizmî, serîtewandin û ta‘et û hwd.); du mînakên giring di kesayetên Tîmoetos û Epafrodîtus de; nîqaşên doktrînel; divê armanc çi bin; şîretên dawîn û spasî ji bo tesedduqan.⁶³

1.4.3.12. Nameya Pawlos a ji Kolosiyan re

Kolose di nav sînoren Anatolê de bajarekî dîrokî ye. Di vê nameyê de Pawlûs ji ber bawerî û jidilbûna xelqê Koloseyê kêfxweşiya xwe bi lêv dike. Herwiha, ew ji ber baweriyên şaş û doktrînen tevlihev wan hişyar dike û dibêje ku xelasî tenê bi Mesîh çêdibe ku wekî “serê bedenê” ye. Hişyariyeke din jî wiha ye: “Çawa ku we Reb Mesîh ‘Îsa qebûl kiriye wisa jî di wî de bijîn.”

⁶² b.n., r. 1487-1494.

⁶³ b.n., r. 1495-1500.

Çarçoveya giştî ya vê pirtûkê ji van serenavan pêk tê: Silav û dua ji Kolosiyan re; serdestiya Mesîh; xizmeta Pawlûs bo pîrozan; jiyana di nav Mesîh de; hişyarî li dijî talîmên şaş; jiyana nû di Mesîh de; şîretên têvel û silavên dawîn.⁶⁴

1.4.3.13. Nameya Pawlos a Pêşî ji Selanîkiyan re

Selanîk bajarekî li Yewnanistana modern e ku di serdema Pawlûsî de paytexta eyaleta Makedonyayê bû ku ew jî girêdayî dewleta Romayê bû. Ev name wekî nameyên din bi silavê dest pê dike. Pawlûs hewl dide ku xelqê Selanîkê kêmasiyên xwe temam bikin, ji bêexlaqiyê dûr bimînin û di gelek mijaran de cesaretê dide wan.

Xetên giştî yên vê pirtûkê wiha ne: Spasî ji bo xelqê Selanîkê; çalakiyên Pawlûsî li Selanîkê; fikarên Pawlûs; xeberên xweş ku ji Selanîkê gihastin; rêya razîkirina Xwedê; hatina Mesîh a duyem (hatina wî ya dahatûyê); pendên dawîn.⁶⁵

1.4.3.14. Nameya Pawlos a Duyem ji Selanîkiyan re

Di vê nameyê de Pawlûs careke din xitabî xelqê Selanîkê dike. Ji Xwedê re spas dike ku xelq di rêya îmanê de pêşda diçin. Pawlûs hewl dide cesaretê bide wan da ku li hemberî zulm û te'dehyê ku dibînin bikarin tehemmul bikin. Du mesele hene ku xelq di wan de ketine şîkê: Pirsgrêka xebatê (bi karekî re mijûlbûn) û pirsgrêka hatina Mesîh a cara duyem. Pawlos bersiva wan pirsan dide û meseleyê ji bo xelqê Selanîkê zelal dike.

Babetên sereke yên vê nameyê wiha ne: Silav; qewlên teşwîqker li hemberî tengasiyan; roja ji nû ve hatina Îsa; sebr û tehemmul; xebat (Pawlûs xelqê teşwîq dike ji bo xebatê û dibêje ku ew bi xwe jî dema ku li Selanîkê maye vala nesekiniye û qasî ku jê hatiye ji bo rizqê xwe xebitiye); silav (berî bidawîanîna nameyê).⁶⁶

1.4.3.15. Nameya Pawlos a Pêşî ji Tîmotêyos re

Ev name û sêyên piştî vê ku Pawlûs ew nivîsîne ne ji xelqê bajarekî re ne, lê ji şexsan re ne (ji bo kesayetan hatine nivîsîn). Yek ji wan Tîmoteos e ku Pawlûs bona wî name nivîsiye. Pawlûs wî wek “kurê min ê helal di îmanê de” diwesifîne û wî wezîfedar dike da ku xelq meseleyên muhim bi wasîteya wî hîn bibin.

⁶⁴ b.n., r. 1501-1506.

⁶⁵ b.n., r. 1507-1511.

⁶⁶ b.n., r. 1512-1515.

Babetên sereke ku di vê nameyê de derbas dibin wiha ne: silav; hişyarî li hemberî peyxemberên sexte; te'mîrkirina dêrê (berhevkirina bawermendan û avakirina îmanê); usûla 'îbadetê ji bo camêr û canikan; heqê lîdertiye/serokatîye û rêveçûn di rêya Xwedê de.⁶⁷

1.4.3.16. Nameya Pawlos a Duyem ji Tîmotêyos re

Pawlûs di vê nameyê de dîsa xitabî şagirdê xwe Tîmoteos dike. Xwesteka wî jê ew e ku zû here cem wî û ji ber şahidî bo Îsa di dilê wî de tu tirs tune bin. Divê sebr bike û peyama Xwedê bi wêrekî belav bike. Di hawirdorekê de ku gelek peyamên nedirust tên belavkirin, divê girêdayî peyama rasteqîn be, çawa ku wî bi xwe ev yek bi jiyana xwe nîşan daye. Divê ji xwe re kesên ewle bibîne da ku bikaribe tiştên ku heta wê demê hîn bûne ji wan re emanet bike.

Çarçoveya giştî ya nameyê wiha ye: Şîret bo Tîmoteos: Li hemberî tengasiyan biqerar û saxlem be, ji niqaşên pûç û vala dûr bisekine û girêdayî wan prensîban be ku tu heta niha hîn bûyî; rojên dawî yên dinyayê; rewşa Pawlûs û encam.⁶⁸

1.4.3.17. Nameya Pawlos a ji Tîtos re

Di vê nameyê de Pawlûs xitabî Tîtûs dike ku arîkar û şopgerê wî ye. Di nameyê de behsa wesfên rêberekî dike ku bê wan ne mumkin e civakek were îdarekirin. Dîsa dikirpîne û dibêje ku pêdivî heye bo baweriyeke saxlem û tevgerên biîstîqrar. Xetên giştî yên vê nameyê bi kurtî wiha ne: Destpêk; divê ku îdare jî, doktrîn jî saxlem bin; tiştên ku lazim in bînin hînkirin; şîret û silav.⁶⁹

1.4.3.18. Nameya Pawlos a ji Filêmon re

Nameya dawîn ku Pawlûs ji şexsekî re nivîsiye ev e. Pawlûs wextê ku behsa Fîlîmon dike wî wekî "hevpişeyê me yê hezkirî" dipesînîne. Di nameya de behsa koleyê firarî yê Fîlîmon jî tê kirin ku navê wî Onîsîmos e; herçend firarî bibe jî li gorî Pawlûs, ew merivekî pêewle ye û li ber çavên wî 'ezîz e û ji Fîlîmon rica dike ku wî wekî birayekî hezkirî qebûl bike. Xetên giştî yên vê nameyê wiha ne: Silav; spasî û dua; hêvî û ricayên Pawlûs ji bo Onîsîmos; silavên dawîn.⁷⁰

⁶⁷ b.n., r. 1516-1521.

⁶⁸ b.n., r. 1522-1526.

⁶⁹ b.n., r. 1527-1530.

⁷⁰ b.n., r. 1531-1532.

1.4.3.19. Nameya ji Îbraniyan re

Ev pirtûk ji bo bawermendên yehûdî re hatiye nivîsîn. Nivîskar an muxateb ne diyar in. Ji naverokê tê têgihaştin ku nivîskar Peymana Kevn baş dizane û ji bo piştgirî yan îsbata nêrinên xwe gelek caran jê delîlan tîne. Îsa wek kurê Xwedê tê teqdîmkirin û ji ber nêzîkbûna wî ya bi Xwedê re ji melaîke û Hz. Mûsa bilindtir e. Wî canê xwe feda kiriye ku gunehan ji holê rake û ew kesên ku dikarin xwe nêzîkî Xwedê bikin, serokkahîn wan bi temamî xelas dike.

Di vê nameya dirêj de ji bo tehlukaya dûrketina ji Xwedê jî hin hişyarî hene. Di beşa 11em de hatiye gotin ku bê îman ne mumkin e Xwedê ji ‘evdê xwe razî be. Behsa mêr û jinên îdeal jî tê kirin ku ji bo şopandinê mînakên baş in. Ew şexsiyetên wisan in ku Xwedê şerm nake ku wekî Xwedayê wan were binavkirin. Di beşa dawî de jî nesîhet hene ku bi meseleyên pratîkê re (tetbîq û ‘emel) têkildar in.

Çarçoveya giştî ya vê pirtûkê wiha ye: Destpêk; bilindahiya Mesîh; serokkahîntiya Mesîh; peymaneke baştir ji Peymana Kevn; qurbanekî çêtir; biserketina îmanê; divê peyva xwedê neyê redkirin; şîretên dawîn.⁷¹

1.4.3.20. Nameya Aqûb

Ev name, nameya ewil a seriya (xeleka) nameyên giştî ye ku wekî nameya Ye‘qûb tê nasîn. Mebest ji giştî ew e ku uslûba nameyê ‘umûmî ye. Di destpêkê de gotinên teşwîqker hene: “Birayên min, ezmûnên ku hûn diceribînin wan bi kêfxweşî pêşwazî bikin.” Mirov nikare bê sebr û tehemmul bigêje kemalê. Herwiha, divê bawermend arîkariyê bikin ji bo jinebî û êtîman û bêleke bimînin da ku bigêjin pakiye. Îmaneke bê‘emel wek cesedekî bêruh e, ji ber vê yekê divê bawerî bi kiryanan were piştrastkirin. Ziman eger di cih de neyê bikaranîn dibe sedema cewr û cefayan. Zebtkirina wî ji zebtkirina heywanên hov diwartir e. Xwedê dilnizman bilind dike, bo vê yekê lazim e ku bawermend li hemberî birayên xwe dilnizm be. Dîsa ji bawermendan re hewce ye ku ji sondxwarinê xwe biparêzin.

Xetên giştî yên vê mektûbê wiha ne: Destpêk; tehemmul li hemberî îmtihanan; îmana ceribandî; dua bi îmanê; xwestekên xirab dibin sebaba gunehan û mirinê; hemû diyariyên baş ji jor ve tînin; guhdarîkirina peyvê û tetbîqkirina wê; însanê ku xwe li ser neynikê dibîne; ‘ibadeta pak û bêleke; ferq û mêlî (cihêkarî) di nav însanan

⁷¹ b.n., r. 1533-1549.

de ne cayîz e; evîn hesteke biesalet e; îmaneke ku tê de kar tune ye mirî ye; Îbrahîm xelîlê (dostê) Xwedê bû; zebtkirina zimên; ew hikmeta ku ji jor ve tê; dostnebûn digel dinyayê; dijberi li hemberî Îblîs; nêzîkahî ber bi Xwedê ve; xweparêzî ji pozbilindiyê; ji dewlemendan re hişyarî (şîret); kesên ku ji ber tengasiyan tehemmul dikin bextewar in; gotina we ya “erê” bila şûna sondxwarinê bigire; duaya biîman bibandor e; zivirandina gunehkaran ji rêya şaş.⁷²

1.4.3.21. Nameya Petrûs a Pêşî

Nameya duyem ji nameyên giştî, Nameya Petrûs/Petros a pêşî ye. Di nameyê de nivîskar pesnê qewîbûna baweriya Mesîhiyan dike ku tevî zulm û zordarî û ceribandînen giran dîsa jî şad û bextewar in. Bawermend bi xwîna pak û bêleke ya Mesîhî xelas bûne û divê hêviyên xwe hertim bidomînin. Dirustbûna bawermendan pir giring e, ji ber ku kesên bêbawerî dê li hereketan mêze bikin. Divê bawermed li hemberî xirabiyê ne bi xirabiyê, lê bi başî û xweşbîniyê tevbigerin. Divê ji gunehên curbicur ên dinyayê xwe biparêzin, ji hevdu hez bikin û mêvanhez bin, bila ji navê Mesîhîtiyê tu car şerm nekin û lazim e ku êxtiyarên cima‘etê jî zorbatîyê nekin û ji kerîya xwe re wek şivanên qenc mu‘amele bikin.

Xetên giştî yên vê nameyê wiha ne: Silav; spasi bo Xweda; kesayetên pîroz (merivên Xwedê); jiyan di sirgûniyê de; sebat di îmanê de; silavên dawîn.⁷³

1.4.3.22. Nameya Petrûs a Duyem

Nameya sêyem a ji nameyên giştî, Nameya Petrûs/Petros a duyem e. Di vê nameyê de nivîskar dibêje Xwedê her tişt daye me da ku em bikaribin di rêya Wî de bimeşin. Divê bawermend 7 xisletan pêş bixin: Fezîlet, agahî, xwekontrol (muraqebe), hêza tehemmulê (sebr), girêdayîbûn bi rêya Xwedê; hezkirina birayan û evîn. Herwiha, nivîskar dibêje tu caran xebereke bêbingeh parve nake û ew bi xwe digel Îsa hilkişiyaye çiyê û li wir bi çavên xwe şahîdî “transfîgurasyon”ê (guherîna Îsa ku tevî beden û cilên xwe bi temamî dibe nûr) bûye. Li gorî wî hukmên Nivîsên Pîroz misoger in; lazim e ku bawermend ji doktrînen batil xwe dûr bixin. Ji alîkî ve sedema derengmayîna vegerîna Îsa ya duyem îzah dike.

⁷² b.n., r. 1550-1555.

⁷³ b.n., r. 1556-1562.

Çarçoveya giştî ya vê mektûbe dikare wiha were xulasekirin: Cehd bikin (şîretên Petrûs bo bawermendan); armanca Petrûs û desthilatdariya wî; kesên ku talîm û peyamên çewt belav dikin; ji nû ve hatina Îsa.⁷⁴

1.4.3.23. Nameya Yûhenna ya Pêşî

Nameya çarem a ji nameyên giştî, nameya Yûhenna ya pêşî ye. Di vê nameyê de nivîskar ku wekî Yûhenna tê nasîn, ji muxatebên xwe re wekî “birayên min ên hezkirî”, “zarokên min” û “zarokno” bang dike. Çend meqsedên nameyê hene ku bi kurtasî wiha ne: Agahî di derheqê nasnameya Mesîhî de; meseleya gunehan ku divê bawermend him gunehkariya xwe îtiraf bikin û him jî xwe ji gunehan bi saya Mesîhî biparêzin; hêvî ji Mesîhî ku kurê Xwedê ye û kesên ku jê bawer dikin ew ê heta hetayê bijîn; hişyarî li hemberî kesên niyetxerab, ji ber ku înkâr dikin ku Mesîh piştî mirinê bi bedenê xwe dîsa hatiye dinyayê. Çarçoveya giştî ya vê nameyê wiha ye: Peyva Heyatê; ronahî û tarî; kesên ku doktrînen pûç belav dikin; guneh û evîn; ruhan biceribînin da ku neyên xapandin; Xwedê evîn e; bawerî û jiyan.⁷⁵

1.4.3.24. Nameya Yûhenna ya Duyem

Nameya pêncem a ji nameyên giştî, nameya Yûhenna ya duyem e. Ji beşekê pêk tê. Ev name hişyariyek e ji bo bawermendan ku di bin bandora wan kesên ku hatina Îsa înkâr dikin nemînin. Li gorî nivîskêr divê mizgînberên derewîn wek mêvan neyên qebûl kirin û bawermend ji wan re bi camêrî tevnegerin. Kesên ku bi bîrdoziya rast a Mesîh baweriya xwe bîne “Bav û Kur” dê bi wan re be. Çarçoveya giştî ya vê beşa biçûk wiha ye: Destpêk, de’wet bi evînê; hişyarî li hemberî doktrînen şaş; encam.⁷⁶

1.4.3.25. Nameya Yûhenna ya Sêyem

Nameya şeşem a ji nameyên giştî, nameya Yûhenna ya sêyem e. Ev jî wek nameya berî xwe tenê ji beşekê pêk tê. Di vê nameya kurt de muxateb şexsê bi navê Gayos e; nivîskar jê re dibêje “yek ji zarokên min” û wî dipesînê ji ber girêdayîbûna wî ya bi îmanê re. Navê din ê ku di nameyê de derbas dibe Dîotrefîs e ku mizgînberan qebûl nake û dixwaze cima’etê têxe bin bandora xwe. Ji ber vê yekê

⁷⁴ b.n., r. 1563-1567.

⁷⁵ b.n., r. 1568-1573.

⁷⁶ b.n., r. 1574-1575.

jî nivîskar wî dilomîne û şermazar dike. Navê dawîn ê ku behs bi wî hatiye kirin Dîmîtrîos e ku nivîskar wekî kesekî hêja behsa wî dike. Xetên giştî yên vê nameyê wiha ne: Destpêk, xizmet bo mizgînberên geştyar, Dîotrefîs û Dîmîtrîos, xatirxwestin û silav.⁷⁷

1.4.3.26. Nameya Cihûda

Nameya heftem û ya dawî ya ji nameyên giştî Nameya Cihûda ye ku ew ji wekî du nameyên berî xwe tenê ji beşekê pêk tê. Di vê nameya sade de bawermend tîen hişyarkirin da ku ji îmanê dûr nekevin, neşîbin kesên ku ketine gunehên înkare û hişyar bibin. Mumkin e di çarçoveyê giştî de mijarên sereke wiha bîen xulasekirin: Mamosteyên sextekar dê bîen mehkûmkirin; nîqaş di navbeyna Mîkaîl û Îblîsî de; peyxembertiya Hanokî; divê ji hezkirina Xwedê veneqetin; mezinahî tenê aidî Xwedê ye.⁷⁸

1.4.3.27. Peyxama Yûhenna

Pirtûka dawî ya Peymana Nû ye. Ev pirtûk wekî “Apokalîps” an “Pirtûka Qiyametê” jî tê zanîn. Di destpêkê de nivîskar behsa 7 cîmê‘atên Anatolê dike, xitabî wan dike û paşê kehanetên xwe derbarê qiyamet û axîretê de rêz dike. Bi uslûbeke alegorîk û remzî hatiye nivîsîn û ji ber vê yekê tefsîra wê gelekî bîezhmet e. Di nav van kehanetan de ku di zîmanên ewropayî de wek vîzyon (keşîf) tê navandin, behsa “ejderekî heft serî”, “mar” û “cinawîr” tê kirin ku tev berî zuhûra Îsa diqewîmin.

Naverok bi kurtasî wiha ye: Li gorî nivîskêr tiştên ku wî nivîsîne wehî ne ji Îsa Mesîh. Herwiha, di pêvajoya nivîsê de Ruhê Pîroz û melaîkê jê re arîkarî kirine. Armanca wî ew e ku bûyerên nêzîk ji xelqê re xeber bide. Derbarê heft civakên bawermend ên Anatolê de wehyên xusûsî jê re tîen ku ji hişyarî, pesinandin, fermanên cuda û sozan pêk tîen. Vîzyonên derbarê Îsa û mezinahiya Xwedê û perestîşa ezmanî de jî hene. Di nav van vîzyonan de unwan û pênasên cîhê yên Xwedê û Îsa tîen rêzîkirin. Paşê behs ji xezeba Xwedê vedibe. Tevî hêrsa Xwedê însan poşman nabin û tobe nakin. Heft mîhur vedibin, heft borezan tîen pîfîkirin û heft tas ji ezmanê tîen rêtin û bi vî awayî hukm (desthilatdarî) dibe ya Reb û ya Mesîh. Ziha ji ezmên tê avêtin xwarê û heta demekê ew û terefîdarên wî hêza xwe nîşan didin, lê paşê yek bi yek tîek

⁷⁷ b.n., r. 1576-1577.

⁷⁸ b.n., r. 1578-1580.

diçin; Babîl dipelişe, cinawir û peyxemberê derewîn û Şeytan tev tîn avêtin “gola êgir”.

Mirî li gorî gunehên xwe tîn darezandin. Kesên ku navên wan di pirtûka heyatê de ne, digihin jiyan û ezmaneke nû. Ji wir pê de Xwedê dê bi wan re bijî û ew dê bibin xelqê Xwedê û dê qet nemirin. Ji wan re ne xem heye û ne jî girîn. Kesên ku navên wan di pirtûka jiyanê de neyên dîtin ew dê bîn avêtin “gola êgir” ku ji bo wan mirina duyem ev e.

Xetên giştî yên vê pirtûkê ev in: Destpêk; name ji heft kenîseyan re; text, deste û berxik; heft muhr; heft borezan; vîzyon (keşf): jin û ziha, cinawir, mehsûla erdê; heft xemgînî; orispiya mezin Babîl hilweşiya; tîkçûna Şeytên; mirî tîn darezandin; ezmana nû, erdê nû û Yerusâlîma nû; encam.⁷⁹

1.5. Tradîsyona Wergêriya Pirtûka Pîroz

Încîl ji bo wê pirtûka pîroz tê gotin ku wek Peymana Nû tê zanîn. Di vê binavkirinê de telmîhek heye ji gotina Hz. Îsa re ku di *Şîva Dawîn* de ji Hewariyên xwe re gotiye: *Gava wan (Hz. Îsa û Hewariyên wî) xwarin dixwar, Îsa nan hilda, şikir kir, ew şikand, da şagirtan û got: “Bigirin û bixwin, ev bedena min e”. Piştî wî kasek hilda, şikir kir, da wan û got: “Hûn hemû ji vê vexwin. Çimkî ev xwîna min a Peymanê ye ku ji bo lêbihûrtina gunehan di ber gelekên de tê rijandin.”*⁸⁰

Peymana Kevn jî ew pirtûk e ku ji Tewratê dest pê dike û di nav xwe de wehyên din ên pêxemberên Benî Îsrâîl (Zarokên Hz. Ye‘qûb) dihewîne. Peyva peymanê di Tewratê de ji bo wê peymanê tê gotin ku di navbera Xwedê û Hz. Mûsa de hatiye danîn: *Û Mûsa derket hizûra Xwedê û Xudan (Rebb) ji çiya bangî wî kir û got: Tuyê ji mala Aqûp re wusa bibêje û tuyê ji lawên Îsrâêl re bigehîne. We dîtin ku min çî ji Misiriyan re kirin û we çawa di bazîkê qertel de bar kirin [kişandim û ji xwe re anîm]. Û niha, ger hûn, bi rastî jî gotina min guhdarî bikin û bi peymana min bigirin, hûn ê ji min re, ji hemû neteweyên zêdetir û xastir bibin netewe, ji ber ku hemû dinya ya min e û hûn ji min re bibin qiraletiya kahînan û gelê pîroz. Gotinên ku tuyê ji lawên Îsrâêl re bibêjî, ev in.*⁸¹

⁷⁹ b.n., r. 1581-1606.

⁸⁰ *Încîl Mizgînî*, Metta 26: 26-28, r. 62. (Peyvên ku di nav kevaneyan de hatine dayîn aîdî min. Î.S.)

⁸¹ *Kitêba Pîroz*, Derketin 19: 3-6, Wergêr: Said Alpaslan (Seîdê Dewrêş), Resul Yıldırım (Resûlê Qereqoçanî), Komela Hêvî û Jiyanê, Biefeld, Germany, 2011, r. 133. (Di jêgirtinê de peyva Xudan

Ev herdu peyman bi hev re *Pirtûka Pîroz an Kitêba Muqeddes* teşkîl dikin. Divê ku dîroka wergerê ya van herdu pirtûkan di her zimanekî de cuda were nirxandin. Lewra metna Peymana Nû bi gelek zimanan hatiye tercumekirin lê Peymana Kevn hêj di gelek zimanan de bi temamî nehatiye wergerandin.

Herdu beşên Pirtûka Pîroz jî li kurdiya kurmancî hatine wergerkirin. Destpêka wergeran, geşedanên wan û qonaxên wan ên dawîn mijarên giring in ku di her zimanekî de ev proses cihê ye. Bi gotineke din ji bo her zimanekî destpêk û berdewamiya wergeran çîrokeke cuda ye. Di zimanê kurdî de wergêriya Pirtûka Pîroz di sala 1856ê de bi Peymana Nû ango Încîlê û ji beşên Încîlê jî bi Beşa Madteosê dest pê kiriye. Temambûna wê rastî sala 1872yê dike. Peymana Kevn (Pênc Pirtûkên Hz. Mûsa, Pirtûkên Pêxemberan, Pirtûkên Dîrokî, Zebûra Hz. Dawûd û yên din; bi tevahî 39 beş) di sala 2004ê de hatiye temamkirin.

1.6. Wergerên Încîlê yên bi Alfabeya Ermenîkî

Di Încîlê de 27 heft beş hene. Di gelek zimanan de bi temamî û di gelek zimanan de tenê wergera qismekê hatiye kirin. Beşên Încîlê ku bi zaravayê kurmancî bi temamî hatine tercumekirin wiha ne:⁸²

- Mizgîniya Îsa Mesîh li gor Metta
- Mizgîniya Îsa Mesîh li gor Marqos
- Mizgîniya Îsa Mesîh li gor Lûqa
- Mizgîniya Îsa Mesîh li gor Yûhenna
- Karên Şandiyan
- Nameya Pawlos a ji Romayîyan re
- Nameya Pawlos a pêşî ji Korîntîyan re
- Nameya Pawlos a diduyan ji Korîntîyan re
- Nameya Pawlos a ji Galatîyan re
- Nameya Pawlos a ji Efesîyan re
- Nameya Pawlos a ji Filîpiyan re
- Nameya Pawlos a ji Kolosîyan re
- Nameya Pawlos a pêşî ji Selanîkiyan re

wek XUDAN hatiye nivîsîn. Î. S.)

⁸² Di rêzkirina beşan de di navbera mezhebên Ortodoks û Katolîkan de fêrê hene lê ji aliyê naveroka hejmara beşan ve cudahiyeke tune ye.

- Nameya Pawlos a diduyan ji Selanîkiyan re
- Nameya Pawlos a pêşî ji Tîmotêyos re
- Nameya Pawlos a diduyan ji Tîmotêyos re
- Nameya Pawlos a ji Tîtos re
- Nameya Pawlos a ji Filêmon re
- Nameya ji Îbraniyan re
- Nameya Aqûb
- Nameya Petrûs a pêşî
- Nameya Petrûs a diduyan
- Nameya Yûhenna ya pêşî
- Nameya Yûhenna ya diduyan
- Nameya Yûhenna ya sisiyan
- Nameya Cihûda
- Peyxama Yûhenna

1.6.1. Tercumeya Ewil an Încîla Madteosê

Di sala 1856ê de beşa yekem a Încîlê li Stembolê bi navê “Încîlê Xodê Me Îsa El Mesîhê, Nivisandin Bi Destê Madteos” tê weşandin. Ev berhem di dîroka çapemeniyê de yekem pirtûka kurmancî ye ku hatiye çapkirin.⁸³ Bi tevahî 112 rûpel e. Li ser berga pirtûkê yan jî di berga hundurîn de derbarê wergêrê wê de agahiyek tune ye. Agahiyên giring ên bi vî tarzî encax ji raporên mîsyoneran, ji kovarên rêxistinên mîsyoner an jî ji belgeyên wek name, meqbûz, mezbete, nîşeyên taybet û hwd. tên peydakirin.

Xweşbextane di çend çavkaniyan de navê wergêrê wê hatiye destnîşankirin. Li gorî van agahiyan navê mutercimê wê *Stepan* e û ermeniyekî ji Hênêya Amedê ye.⁸⁴ *Stepan* karê wergerê bi teşwîq û arîkariya mîsyonerên amerîkayî pêk tîne û piştî ku metna wergerê ji tesdîqa mîsyonerê navdar ê rêxistina ABCFMyê (*American Board*

⁸³ M. Rzepka, Translation, Power and Domination: The Postcolonial Explorations of the Bible in the Kurdish Context, Rediscovering Kurdistan's Cultures and Identities, editor: Joanna Bocheńska, 2017, Midyat, r. 202.

The Call of the Cricket

⁸⁴ M. Eric Nort, *The Book of a Thousand Tongues*, The American Bible Society New York, 1938, r. 200.

of Commissioners For Foreign Missions) William Goodell derbas dibe, li Stembolê di çapxaneyê A. P. Çirçîlê⁸⁵ de tê weşandin; hejmara kopiyan 3 hezar e.⁸⁶

Metneke nimûneyî ji vê wergerê wiha ye:

MADTEOS, SER 17

1 Û paşê şeş royan da Îsa bi xo ra girt Petros û Yaqûb û b[i]reyê wî Hanna; wan tenê bir li çîyekî bilind. 2 Û li ber wan da tebdîl bû û rûya wî dipêla weka ro û cilê wî sipî bûn weka tav. 3 Û waha Mûsa û Elîa xuyayî bûn ji wan ra û pê ra xeber didan. 4 Cewab da Petros û go ji Îsa ra: Ya Rebb, ji me re livir bûn qenc e, erki dixwazî sê holikan em çêkin, yek ji te ra, yek ji Mûsa ra û yek ji Elîa ra. 5 Û kînga ko wî xeber dida waha rohnî ewurkî wan sitir kir, ji ewrê denkkî hati û go: Ev e kurê min delalî ko jê hez dikim; ji wî ra godarî bikin. 6 Û şagirdan kînga ko bihîsdin li ser rûya xo ketin û pir tirsî[yan]. 7 Û Îsa nêzê wan bû, ket li wan û go: Rabin û metirsin. 8 Û wan wexta çehva xo vekirandinê ji Îsa pêtir keskî nedîn.

1.6.2. Tercumeya Çar Încîlên Kanonîk

Piştî salekê, di sala 1857ê de, dîsa bi destê rêxistina mîsyonparêz BFBS (*The British and Foreign Bible Society*) û bi xêra heman wergerê çar beşên Încîlê ku wek Încîlên kanonîk (ên fermî û yasayî) tên zanîn li payitexta Dewleta Osmaniyê tê çapkirin. Vê carê çapxane ne çapxaneyê berê ye; xwediyê vê çapa Încîlê Kayol e (bi navê xwe yê tam *Henri Caillol/Cayol* ê marsîlyayî ku digel eqrebeyê xwe *Jacques Caillol* li ser axa împaratoriye teknîka lîtoğrafyayê dane nasîn).⁸⁷ Pirtûk 398 rûpel e. Di vê çapa nû de şaşîtiyên çapa ewil hatine sererastkirin û li ser rastnivîsa hin peyvan jî guherîn çêbûye.

Tercumeya nimûneyî ji vê tercumeyê wiha ye:

⁸⁵ Navê çapxaneyan di heman demê de navên xwediyê çapxaneyan e jî. Wergêr Stepan navê çapxaneyê bi tîpên ermenîkî wek 'A. P. Çirçîl' nivîsiye, rastnivîsa wî yê bi tîpên Latînî 'A. B. Churchill' e. Navê wî yê tam Alfred Black Churchill (1825–1870) e û kurê çapxaneyê navdar William Nosworthy Churchill (1796–1846) e.

⁸⁶ Marcin Rzepka, *Konfesyjność przekładu Kulturowa historia kurdyjskich tłumaczeń Biblii*, Uniwersytet Papieski Jana Pawła II w Krakowie Wydawnictwo Naukowe, Kraków 2013, r. 146.

⁸⁷ Cebe Ayaydın, Özlem Günil, *19. Yüzyılda Osmanlı Toplumı Ve Basılı Türkçe Edebiyat: Etkileşimler, Değişimler, Çeşitlilik*, Doktora Tezi, Türk Edebiyatı Bölümü Bilkent Üniversitesi, Ankara, 2009, r. 148.

MADTEOS, SER 4

¹ *Wê çaxê Îsa ji Rûh el Qudsê hati birin li çolê ji boyê ceribandinê.* ² *Û çil ro, çil şev paşê rocî girtinê birçî bû.* ³ *Û ceribandox hat, go jê ra: Erki tu Kurê Xodê yî bibêji ki ev kev[i]ran nan bibin.* ⁴ *Ew cewab da û go: Nivisandî [y]e: Ne kî bi nan tenê meruv dijî, lê bi ew hemî xeberan ko ji devê Xodê dertê.* ⁵ *Wê çaxê Şeytan girt, bir wî li Bajêrê Ezîz û sekînandi wî li ser qubeyê Dacar û go: ⁶ Erki tu Kurê Xodê yî, tu xo ji vir bavêj li xwarîyê; çima ko nivisandî [y]e: Erki ji melekê xo ra emr kirîye ji boyê te û te li ser dest bigirin ki ji bin linga xo li kevir nexî.* ⁷ *Îsa dîsa go jê ra: Nivisandî [y]e: Erki Xodê û Ellahê xo neceribînî.* ⁸ *Şeytan dîsa girt wî û bir li çîyekî pir bilind û n[i]şan da jê ra hemî padîşahîtiyê dinê û îzzetê wan.* ⁹ *Û go jê ra: Evan hemî ji te ra didim, erki bikevî ji m[i] ra secde biki.* ¹⁰ *Wê çaxê Îsa go jê ra: Pey mi here ya Şeytan, çima ko nivisandî [y]e: Ji Xodê û Ellahê xo ra secde biki û tenê jê ra tapmîş bibî.* ¹¹ *Wê çaxê Şeytan berda wî û melekê Xodê hatin û jê ra xizmet dikirin.*

1.6.3. Tercumeya Kamil Ya Peymana Nû

Piştî 15 salan di sala 1872yê de Încîl bi tevahî tê çapkirin. Vê carê rêxistina sponsor ABS (*American Bible Society*) bû û xwediye metbeeyê jî A. H. Boyacıyan bû ku di heman demê de serokatiya civata ermeniyên Stembolê dikir.⁸⁸ Çapa ewil a sala 1857ê ku çar beşên Încîlê dihewand, dubare çap dibe û li serî jî 23 beşên mayîn tên zêdekirin. Ev, di dîroka kurdiya kurmancî de wergera ewil a temam e. Pirtûk ji 627 rûpelan pêk tê û mezinahiya wê 19.5 cm × 13 cm ye.

Di çavkaniyan de, derheqê wergêrê vê berhemê de ku 23 beşên mayî tercume kirine agahiyên gelekî kêr hene. Navê wî *Tamo ye (Tovmas)* û wezîfeya wî diyakozi ye (arîkariya keşişî).⁸⁹ Di prosesa wergerandinê de tefîş û edîtorî di destê mîsyonerê aktîf *Isaac Grout Blissê* (1822-1889) de ye. Bliss di nav 25 salan de ku li Dewleta Osmanî derbas kiribû karûbarên tercumeya Pirtûka Pîroz îdare dike û di vê muddetê de di 30 zimanan de salane 17000 heb kopîyên beşên Tewrat û Încîlê tên çapkirin û li çar aliyên împaratoriye tên belavkirin.⁹⁰

⁸⁸ Rzepka, b.n., r. 149.

⁸⁹ Kenneth J. Thomas, *BIBLE viii. Translations into other Modern Iranian Languages*, The Encyclopaedia Iranica.

⁹⁰ Rzepka, b.n., r. 149.

Bi van sê wergeran tercumeya Încîlê bi dawî dibe. Di Încîlê de carinan uslûbeke helbestane hebe jî bi pexşanê hatiye nivîsîn⁹¹ û bi temambûna wergera metna Peymana Nû nimûneyeke berfireh a pexşanê jî derketiye meydana û ev yek jî perspektîfa zimanê nivîskî û dîroka zimên jî pir giring e. Tercumeya duyem a bêkêmasî encax piştî 129 salan, di sala 1988ê de hatiye weşandin.⁹² Di vê navbera dûr û dirêj de helbet tercumegerî didome, lê tenê qismek jî Încîlê tê tercumekirin û çapkirin.

Metneke nimûneyî ji wergera kamil a pirtûka nû wiha ye:

ÎNCÎL BI QAWLA MADTEOS

SER 4

¹ Wê çaxê Îsa ji Rûh el qudsê hati birin li çolê ji boyê ceribandîne⁹³. ² Û çil ro û çil şev paşê rocî girtinê, birçî bû. ³ Û ceribandox hat go jê ra: Erki tu Kure Xodê yî bibêji ki av kevran nan bibin. ⁴ Aw cewab da û go: Nivisandî e, Na kî bi nan tenê meşuv bijî; lê bi aw hemî xaberan ko ji devê Xodê derî.

⁵ Wê çaxê Şeytan girt bir wî li bajêrê azîz, û sekînandi wî li ser qubeyê dacar, û go: ⁶ Erki tu Kure Xodê yî, tu xo ji vir bavêj li xwarîyê; çima ko nivisandî e, erki ji melekê xo ra emr kirîye ji boyê te, û te li ser dest bigirin; ki ji bin linga xo li kevîr nexî ⁷ Îsa dîsa go jê ra: Nivisandî e, erki xoyî û xodê xo naceribînî.

⁸ Şeytan dîsa girt wî û bir li çîyekî pîr bilind; û nişan da jê ra hemî padişahîtyê dinê û îzzetê wan; ⁹ Û go jê ra, Avan hemî ji ta ra didim, erki bikevî ji m ra secde bikî. ¹⁰ Wê çaxê Îsa go jê ra: Pey mi hâre yâ Şeytan, çima ko nivisandî e, Ji Xoyî û Xodê xo ra secde bikî, û tenê jê ra tapmiş bibî. ¹¹ Wê çaxê Şeytan berda wî, û melekê Xodê hatin û jê ra xizmet dikirin.

¹² Û kinga ko Îsa bihîst erki Hanna hati girtin, rabû çu Celîlê. ¹³ Û bi berdanê Nazaret, hati saknîbû li Gafarnayumê, li ba taniştê bahir, li nav sînorê Zapulon û Neftalîmê; ¹⁴ Ki tamam bibe bi destê Îşaya pey- [9] xember hati gotan aw xaber: ¹⁵ Welatê Zapulon û welatê Neftalîm, bi rêya bahr, li wî alîyê Hortan, Celîlê kefaran, ¹⁶ Li tarî da ronîşdox cemat mezin rohnî dî û rohnî da li ser wan, aw ko li welatê mirin,

⁹¹ Floyd V. Filson, *How Much of the New Testament Is Poetry?*, McCormick Theological Seminary, Journal of Biblical Literature, Vol. 67, No. 2, Jun., 1948, r. 125-126.

⁹² *Peymana Nû Mizginiya Îsa Mesih (Încil), Bî Kurdi (Devok A Kurmanci)*, Wer: Seidê Dewrêş, Resûlê Qereqoçani, Gute Botschaft Verlag, 1998, Dillenburg, Germany.

⁹³ Di metnê de *ceribaedîne* (nişeya wergêrê).

û li sî da dîronîşdîbûn. ¹⁷ Ji wê vi pê va Îsa dest kir vâz kirinê û gotinê, toba bikin; çima ko padîşahîtyê azümanan nêz e.

¹⁸ Kînga ko Îsa li ba bahrê Celîlian digerîa; dî herdu brêan, Şimhûn ki dihati gotan Petros, û brêyê wî Antrîas, li bahrê tor avêtin çima ko seydvane masî bûn. ¹⁹ Û go ji wan ra li pey mi werin, û ez wê seydvane merûvan bikim. ²⁰ Wan jî zû va alatê xo hiştin, û li pey wî çûn. ²¹ Û ji wê li pêş bi çûndinê, dî hênî du brêan Yaqûbê Zepetyan, brêy wî Hanna li nav gemî⁹⁴ bi Zepetos bavê xo ra; kînga torê xo pine di kirin, û gazî kir wan. ²² Û wan jî zû va gemî û bavê xo hiştin li pey wî da⁹⁵ çûn.

²³ Û Îsa hemî alîyê Celîlê digerîa, hîn dikir li derê wan da, û waz dikir Încîlê padîşahîtyê; li nav cematê her çeşît naxoşîtyan û her çeşît marazan sax dikir. ²⁴ Û navê wî çû li hemî welatê Yaqûbîyan, û anîn jê ra hemî naxoşan ki bi çeşît marazan û bi xazeban ezîyet dikişandin; û bi cinan û hîvketoxan û kötrüman, û sax kir wan; ²⁵ Û pîr cemat li pey wî diçûn ji Celîlê û ji Têgabolîsê, û ji Yerusâlîmê, û ji Yehûdîstanê, û ji wî alîyê Hortan, û sax kir wan.

1.6.4. Tercumeya Încîla Madtêosê

Yek ji wan tercumeyên parçeyî ku bi tîpên ermenîkî gihaştiye çapê, di sala 1891ê de tê weşandin. Ev, beşa yekem ya Încîlê ango Încîla Madtêosê, bi temamî wergereke nû ye, yanî ne berdewam an dubareya tercumeyên berî xwe ye. Bi sponsoriya ABSyê li Stembolê çap dibe; navê çapkerê wê A. H. Boyacıyan e û ji 148 rûpelan pêk tê. Li ser bergê navê wergêr tunebe jî tê zanîn ku sê wergêr hene û navên wan wiha ne: *Bedros Amîrxanyan*, *Ė. Der Ėazaryan* û *Kavîne Aflakadyan*. Ev her sê wergêr jî peywirdarên dêrê ne û tercumeya sparîşkirî di bin kontrola *James Barton*, sekreterê ABCFMyê kuta dibe.⁹⁶ Di rastnivîsa vê wergerê de û di yên din de ku li pey wê peyderpey hatine çapê, sistemeke kamiltir tê bikaranîn ku ji aliyê nûneriya dengên kurdî û çareserkirina aloziyên xwendinê ve serkeftîtir e.

Metna nimûneyî ji vê wergerê wiha ye:

⁹⁴ Di metnê de *gerî* (nîşeya wergêrê).

⁹⁵ Di metnê de *uxda* (nîşeya wergêrê).

⁹⁶ Rzepka, b.n., r. 153-154.

ÎNCÎLA MADTÊOS

SERÎ A

¹ Kîtab ê silsîla Hîsus Krîsdosê kurê Tavît, kurê Apraham.

² Ji Apraham re Îsahag bû; ji Îsahag re Hagop bû; ji Hagop re Huṭa û braêd wî bûn. ³ Ji Huṭa re Parês û Zara bûn ji Tamar; ji Parês re Yesron bû; ji Yesron re Aram bû. ⁴ Ji Aram re Amînatap bû; ji Amînatap re Naason bû; ji Naason re Salmon bû. ⁵ Ji Salmon re Poos bû ji Raxap; ji Poos re Vovpêt bû ji Hrut; ji Ovpêt re Hêssê bû. ⁶ Ji Hêssê re Tavît xundkar bû. Ji Tavît xundkar re Soxomos bû ji jî jina Urîa. ⁷ Ji Soxomos re Ropovam bû; ji Ropovam re Apîa bû; ji Apîa re Asa bû.

1.6.5. Tercumeya Încîla Margosê

Pirtûka duyem a vê silsileyê, Încîla Margosê, 20 sal paşê, di sala 1911ê de tê çapkirin. Pirtûk bi tevahî 87 rûpel e.

Metna nimûneyî ji vê berhemê wiha ye:

ÎNCÎLA MARGOS

SERÎ A

¹ Îbtîda ancîa Kuê Xodê Hîsus Krîsdos; ² Weka ko di nav peyxembera da hatîe nivîsandin. Eva az qasidê xo li pêşîa rûê te, dişaynim, ko wê rêa te di pêşîa te de hazir bîkê. ³ Dengê wî ko li nava berîê gazî dike, Rêa Rabb hazir bîkîn, şiverêkê wî rast bîkîn. ⁴ Hovhannês li nava berîê ‘imad di^{kir}, û ‘mada tobeê karo^z di^{kir}; ji bona ‘efûtîa gunaha. ⁵ Ê temamê welatê Cihûdîstanê û xelqê Yerûsaxê^{mê} di^{çû}ne balê û hemû ji wî ‘imad dibûn li nav çemê Hortananê, gunehê xo îqrar di^{kir}in. ⁶ Ê Hovhannês wergirtibû mûê deveê, û li pişta wî qayîş, û xwarina wî kulî û hinguvê çolê bû. ⁷ Ê karo^z di^{kir} û digot, ê ji min bi qwettir li pey min tê, ko ez ne layîq im bîkêvim û girêkê solê wî ve^{kim}. ⁸ Min we bi avê ‘imad kir; lakîn ew wê we bi Rûhê Paqij ‘mad bîkê.

1.6.6. Tercumeya Încîla Xugasê

Di heman salê de beşên din ên Încîlê tên çapkirin ku bi rêzê wiha ne: Încîla Xugasê (148 rûpel), Încîla Hovhannesê (109 rûpel), ‘Emelê Resûla (138 rûpel). Hemû pirtûkên vê silsileyê ku di sala 1891ê de bi beşa Madteosê dest pê dike û di sala 1911ê de bi ‘Emelê Resûla diqede û bi tevahî di nav xwe de 5 berg in, li

Stembolê hatine çapkirin û çapxaneya wan (li ser bergê *basmaxane* derbas dibe) aidî A. H. Boyacıyan (di îmlaya orijînal de *Boyacyan*) e. Wisa xuya dike ku rêxistina arîkar xwestiye ku temamê Peymana Nû bi destê van her sê wergêran bide temamkirin lê ev proje nîvco maye.

Wergereke nimûneyî ji Încîla Xugasê wiha ye:

ÎNCÎLA XUGAS

SERÎ A

¹ Ji bona ko geleke dest avêtne te'îlfa qiseta wan *tiştêd* li nav me bi sabîtî hatne nas *kirin*, ² Çawa ko ewanê ko ji 'ewilî ve biçav dîtibûn û ji xeberê *re* xizmet *kiribûn* ji me *re* teslîm *kir[i]n*, ³ Ez jî ko ji 'ewulî ve li ser wan hemû *tişt*a bi 'esehî bi 'îlam bûbûm, min minasib dît ko bi *rêz* ji *te re* binivîsim, ⁴ Yâ Teopîlosê Fadil, Ko heqîa *tiştêd* *tu hîn bûî fêhm bikî*.

1.6.7. Tercumeya Încîla Hovhannêsê

Pirtûka Hovhannêsê di silsileya wergerên nû de pirtûka çarem e. Tercumeyeke nimûneyî ji vê berhemê wiha ye:

ÎNCÎLA HOVHANNÊS

SERÎ A

¹ Ji ewilî de Kelam hebû, û Kelam li ba Xodê bû, û Kelam Xodê bû. ² Ew ji ewilî de li ba Xodê bû. ³ Her *tişt* bi wî çêbû, û bêy wî *tişte*k çênebû, çî ko çêbû. ⁴ Heyat di nav wî de bû, û heyat nûra însana bû. ⁵ Û nûr di nava terîê de *rohnî* dida, û *tariê* wî seh nekir.

⁶ Merivekî ji Xodê hatî şîandîn hebû, ko navê wî Hovhannês bû. ⁷ Evê ha ji boy şahdeyîê hat ko ji bona Nûrê şahdeyî bide, ko hemû bi destê wî îman bînin. ⁸ Ew ne ew nûr bû, lê ko ji bona Nûrê şahdeyî bide.

⁹ Nûra haq ew bû, ko hemû insanê hatî *dünyaê rohnî* bike. ¹⁰ Li nava *dünyaê* bû, û *dünya* bi wî çêbû, û *dünyaê* wî nas nekir. ¹¹ Ji êd *xo ra* hat, û êd wî wî qebûl nekirin. ¹² Lakîn ewê ko wî qebûl *kir[i]n*, ya 'nî ewê ko bi navê wî îman *tînin*, destûr da wan ko bibne Zarokêd Xodê. ¹³ Ko ew ne ji xûnê û ne ji vana cesed, û ne ji vana însan, lê ji Xodê welidîn. ¹⁴ Û Kelam bû cesed, bi kerem û bi haqîtî *tijî* di nava me de sekinî, û me 'îzzeta wî dît weke 'îzzeta *kurê* yekaneî ji Bav.

1.6.8. Tercumeya Încîla ‘Emelê Resûla

Pirtûka ‘Emelê Resûla di silsileya wergerên nû de pirtûka pêncem û ya dawî ye. Tercumeyeke nimûneyî ji vê berhemê wiha ye:

‘EMELÊ RESÛLA

SERÎ A

¹ Ya Teopîlos, qiseta ewilî min kir li ser hemû tiştê ko Hîsus dest pê kir îcra kir û hîn kir. ² Hetta wê roja ko li resûlêd xoî bijartî bi Rûhê Paqij tenbîh kir û bilind bû; ³ Ko xo jî piştî ezabkişandina xo bi gelek birhana sax ramî wan da di nav çil roja da li wan zahir dibû, û li ser xundkarîta Xodê xeber dida. ⁴ Û çaxê ko bi wan ra dicivîa li wan qewîtî di^{kir} ko ji Yerusaxêmê dûr nebin, lê çavne^{ria} wa’de Bav bi^{kin}, ko we ji min bihîst. ⁵ Çima ko bi rast Hovhannês bi avê ‘imad kir, lakîn ne gelek piştî wan roja hûnê bi Rûhê Paqij bêne ‘imad kirin. ⁶ Îdî we ko civîabûn, ji wî dipîrsîn û digotin, Ya Rabb, di vî weqtî da tuê xundkarîtê li Îsrayêl vege^{rinî}. ⁷ Û ji wan ra got, Ne li we ye ko hûn zanibin zeman û weqtê ko Bav xistîe bin hikmê xo; ⁸ Lakîn çaxê ko Rûhê Paqij bêe ser we, hûnê qwet bistînin, û bibne şahdeê min li nav Yerusaxêmê, û temamê Cihûdîstanê û Samariâe û hette bi terefê dinyayê. ⁹ Û ko nav got, gava ko wan dinhêrt, bilind bû, û ewrekî wî ji ber çavê wan hilanî. ¹⁰ Û hinga ko bi alê ezmana ve şaqis mabûn li şûna wî, eva du merivî kinc sipî li ba wan sekinîn, ¹¹ Û got[i]n, Gelî xelqê Kalîlîayî, çima? hûn sekinîne bi alê ezmana ve dinhêrin; ev Hîsusê ko ji ba we hilate ezmana, wiha wê bê, çawe ko we dît ew di^{çûe} ezmana. ¹² Hingê vege^{riane} Yerusaxêmê ji çîaê ko ê Zeytûna tîe gotin, ko bi qasî rêa roja sebtê nêzîkî Yerusaxêmê e. ¹³ Û çaxê ko ketnê, derketne koşkê, ko li wir disekinîn Bedros û Hagopos, Hovhannês û Antrêas, Pîlîbbos û Tovmas, Partuxîmêos û Madtêos, Hagoposê Alpêos û Sîmonê bi xayret û Hu^{ta}ê Hagop. ¹⁴ Ewêd ha hemû bi tevlî jina û Mariama dêa Hîsus û biraêd wî ve bi yek dilî di nimêjê de dom di^{kir}[i]n.

¹⁵ Û di nav roja de Bedros di nava bira de rabû, (ko ji ma re navê wan bi hev re qasê sed û bîst bû,) û got, ¹⁶ Gelî birá, lazim bû ko temam bibûa nivîsandina ko Rûhê Paqij ji berê ve bi devê Tavî^t got li derheqa Hu^{ta} ko bûe pêşîvanê wanê ko Hîsus girt[i]n. ¹⁷ Çima ko ew li nav me jimartî bû, û payê wî di vê xizmetê de hebû. ¹⁸ (Evî bi ucretê zilmê erdek kar kir, û serejêr ket di nivî de qelişî, û hemû hinavê wî rijîa. ¹⁹ Û ev tişt ji hemû sakînê Yerusaxêmê re eşkere bû û hette ko navê wî erdî bi

zimanê wan hate danîn Agex̄tama, ya'nî erdê xûnê.)²⁰ Çima ko di nav kîtabê Saxmos de hatî nivîsandin ko Meskenê wî xirabe dibe, û tinebe kesî *te* de bisekine, û wezîfa wî yekî din bistîne.²¹ Nexo lazim e ko ji van merivê ko bi me *re* bûn di wî hemû weqtî de, ko Rabb Hîsus dihat û diçû nav me, ji 'imadaHovhannês hette wê roja ko ji ba me bilind bû, yek ji van bi me *re* bibe şahdeê qîameta wî.²³ Û dido *rakir[i]n*, Hovsêpê ko *Parsapa* dihat gazî *kir[i]n*, ko Husdos hate bernav *kirin*, û Madatîa.²⁴ Û nimêj *kir[i]n* û *got[i]n*, *Tu*, ya Rabb, ko dilê hemûa zanî, ji van herdu a *ê* ko *te* wî bijart kufş bike,²⁵ Ko bistîne cîê vê wezîfa û rsûlîti ko Huṭa jê ket ji bona here cîê xo.²⁶ Û peşka wan avêt[i]n, û peşk ji Madatîa *re* ket, û bi her yazdeh resûla *re* hate hesab *kirin*.

1.7. Pirtûkên Din ên bi Tîpên Ermenîkî

Xeyn ji wan pirtûkên jorîn ku behsa wan hatiye kirin çend berhemên din jî hene ku bi alfabeya ermenîkî û bi zimanê kurdiya kurmancî hatine çapkirin. Ev cure berhem bi wesfên xwe yên pêşengî⁹⁷ û bi vekirina asoyên nû di dîroka nivîskî ya kurmancî de cihekî giring dadigirin.

1.7.1. Ayppenaran Kürderen Yev Hayeren Alîfbêcuz Kurmancî û Armenî

Pirtûka ewil ku ne wergera Încîlê ye “Alîfbecuz” e ku bi du zimanan, bi ermenîkî û kurdî û digel wêneyên balkêş ji bo fêrkirina alfabeyê, hejmaran, navên ajelan, duayên dînî, agahiyên dîrokî, neteweyî û hwd. hatiye hazirkirin. Navê wê yê tam wiha ye: “Ayppenaran Kürderen Yev Hayeren, Alîfbecuz Kurmancî û Armenî”. Nivîskarê wê *Migirdîç Dîkranyan* e ku li ser bergê wek rêberê rûhanî yê herêma Kurdistan û Paloyê tê danasîn. Di bin agahiyên kunyeyê de hevokeke bi ermenîkiya rojavayê jî hatiye nivîsîn: “*Mirov ji heywanan bi ilmê xwe û bi qabiliyeta xwe ya afirandinê tê cihêkirin.*” Pirtûk di sala 1860î de li Xalatîa, Gostantnubolîsê (Galata, Stembol), di çapxaneyê *H. Mühendîsyan* de hatiye çapkirin.⁹⁸ Heman pirtûk piştî salekê digihîje çapa duyem jî.⁹⁹

⁹⁷ Mesûd Serfiraz, *Kurd, Kitêb, Çapxane Weşangeriya Kitêbên Kurdî di Dewra Osmaniyan de (1844-1923)*, Peywend, Stenbol, 2015, r. 207.

⁹⁸ Migirdîç Dîkranyan, *Ayppenaran Kürderen Yev Hayeren Alîfbecuz Kurmancî û Armenî*, Gostantnubolîs, 1860, r. 1.

⁹⁹ Hasmik Stepanyan, *Hayeri Bîtîsum Yev Hayadarr Krderen Dzerragir u Dpagir Grakanutyuni, The Countries and Peoples of the Near And Middle East*, 2018, r. 237.

Di vê pirtûkê de tiştê enteresan ew e ku zimanê kurdî wek zimanekî navgînî hatiye bikaranîn da ku zarokên ermenî ku zimanê xwe yê neteweyî nizanin fêrî wî bibin. Ji ber vê çendê ye ku heman metn berê bi kurdî, piştî jî bi ermenîkî hatiye pêşkêşkirin. Di pêşgotinê de ku sernavê wê wek “Almat” (malat < millet) derbas dibe, mebestên pirtûke wiha hatine ravekirin: “**1.** *Vê elîfbacuz, hat çêkirin, bi rêyê kurt û kin ji boyê xelkê Kurdistanê qewmê ermenî.* **2.** *Loma pêş me danî bi rêz luxetan bi izmanê Kurmancî, û paşê li ber wan bi izmanê Ermenî, ku çaxê xwandinê zaroyan yek car izmanê ermenî jî hîn bibin.* **3.** *Û ji boyê dilê zaroyan şazkirinê her çî ku sûret bin destê me hazir hebû, her yekî cîyê xwe de me danî.* **4.** *Nîhayet her çî ku ji destê me dihat ji boyê zaro re îlmê xwandin şîrin xuyayîkirinê me kir.* **5.** *Û li pişt Elîfbe jî, ji hemî pêştir lazim bû neqlîyatek ji boyê hînbûna zaroyan me danî.* **6.** *Hîvîya me hene ku ji vê pê ve, herke xeyretek xuyayî bibe, ji wê gelek qencî re dest dibe bavêjim xuyayî kirinê.”*¹⁰⁰

Di vê pirtûkê de Duayê Rebê Me an bi navê xwe yê din Bavê Me yê Ezmanî jî hatiye tercumekirin ku ji tercimeyên ên Încîlê berê xwe cuda ye:

Diyayê Xodê Ra (Dua Ji Xodê Re)

Mibarek xodîyê ma Îsayel Mesîh; amîn; Bavê ma kî li azmannê da yî, paqîş bibî navê ta; bila bê padîşahîyê ta; bila bibî hamdê ta çawa li azmanê da û li ardê da. Nanê ma ha îmro jan bide îro ji ma ra. Û Barda ji ma ra deynê ma, çawa kî am bardidin dêndarê ma ra. Û maba i ma ciribandinê, îlla i ma xalas ke ji xarabîyê. Çima kî ê ta yepadîşahîî û quwwetîî û saltanatê abadî; amîn.

Ji heman pirtûke lîsteya kelîmeyan a duzimanî ku wek ferhengokekê bê binavkirin xelet nabe, wiha ye:

maymûn: gabîg

hirç: arç

kêrûş: nabasdag

pisîg: gadu

mişg: mug

kawuyk: axavnî

kaw: gakav

¹⁰⁰ Dîkranyan, b. n., r. 2. (Ji ber ku ev jêgirtî tenê ji bo danasînê ye di transkrîpsiyonê de bi mebesta hêsan kirina xwendinê rastnivîsa modern hatiye tercîhkirin. Î.S.)

sûsik: dadrag
bilbûl: soxag
çûçik: cincûg
ÿaz: sak (divê ku berê sak, paşê ÿaz bihata nivîsîn)
ördeg: pat
mirîşk: hav
dîk: akaÿaÿ
qijik: andzeÿ
hacac: dzîdzern
kurm: vort
kîsû: grîa
maq (baq?): kord
mêrû: mirçun
mar: otz
aqreb: garîc
mêş: canc
masî: tsug
îlangêc: xetskedîn
zilo: dzrug
sipî: voçîl
kêc: lu
bayqûş: pu
karmêş: işucanc

1.7.2. Tasakîrkê Kurmancî

Pirtûka din a bi tîpên ermenîkî “Tasakîrkê Kurmancî” ye. Peyva “tasakîrk”ê bi wateya kitêba dersê ye. Pirtûk di sala 1868ê de li Nor Yorkê (*New York*) di çapxaneyê “*Amerîgatsî Dedragî Ingerutyan*” de hatiye çapkirin.¹⁰¹ Derbarê nivîskarê/a wê de qeydek xuya nabe. Hejmara rûpelan 44 e. Naveroka wê pedagojîk e û bi danasîna tîp û peyvan fêrî xwendina zimanê kurmancî dike. Wek pirtûka Alîfbacuz wê jî çend peyvên kurdî digel muqabilên wan ên ermenîkî rêz kirine. Ji vir tê têgihîştin ku yek ji armancên pirtûkê ew e ku dixwaze bi wasîteya kurmancî fêrî

¹⁰¹ *Tasakîrkê Kurmancî*, Amerîgatsî Dedragî Ingerutyan, Nor York, 1868.

zimanê ermenîkî bike. Piştî egzersîzên herf û kêteyan metnên tîn. Di metnan de li gorî ola Xirîstîyanîyê şîret û pend tînin dîtin. Teksteke nimûneyî jî vê berhemê wiha ye: *“Hemû zarok gunehkar in; zehf gunehê te jî heye; wekî usa ye her êvar û her sibe dua bike, ko Hîsus gunehê te ef bike. Dilê te jî xirab e; dua bike ko Rûhê Paqij wî paqij bike û nû bike, ko gava ti bimirî herî ezman.”*¹⁰²

Her wiha jêgirtineke din wiha ye:

Ji xohê xo û biraê xo zehf hez bike û her gav qencî bike ji wan ra. Kî ko li nav tengayî dibînî arî wî bike. Dizî meke, çî ko ne ê te ye mestîne.

1.7.3. Yerkanê bi Kurmancî

Pirtûka din ku dê behsa wê were kirin “Yerkanê bi Kurmancî” ye ku di sala 1880yî de li Xarpêtê hatiye çapkirin.¹⁰³ “Yerkan” bi maneya “pirtûka îlahîyan” e. Di berhemê de xeyn jî pêşgotina bi sê zimanan (kurdî, ermenîkî û îngilîzî) 103 îlahî hene. Hejmara rûpelan digel rûpelên pêşgotinê û beşa dawîn ku sernavên îlahîyan dihewîne 115 ye. Navê çapxaneyê “Kollêc” e ku amaje bi koleja/mekteba dînî ya Xarpêtê dike. Xarpêt di nîveka sedsala 19em de dibe merkeza olî û ronakbîriyê bo ermenîyan, bi taybetî jî bo ermeniyên herêma Serhedê.¹⁰⁴

Straneke olî ya vê pirtûkê wiha ye:

“Were Şahê Bi Qewet

Were Şahê bi qewet,

Navê te î bi izet

Em hemd bidin;

Tu ku li her cî Reb î,

Dayîm ferehçî dibî,

*Em reca dîkin.”*¹⁰⁵

Îlahîyeke din wiha ye:

Şikrim ji Xodê re

Erd û ezman tev bi hev re

¹⁰² B. n., r. 25-26. (Di rastnivîsa latînî de çend guherînên biçûk hatine çêkirin. Î.S.)

¹⁰³ *Yerkanê Bi Kurmancî*, Çapxaneya Kollecê, Xarpêt, 1880.

¹⁰⁴ Martin Rzepka, *Translation, Power and Domination: The Postcolonial Explorations of the Bible in the Kurdish Context*, “Palgrave Studies in Cultural Heritage and Conflict, Rediscovering Kurdistan’s Cultures and Identities, The Call of the Cricket”, Gewerbestrasse, Switzerland, 2017, r. 203.

¹⁰⁵ *Yerkanê Bi Kurmancî*, r. 1-2. (Di rastnivîsa latînî de çend guherînên biçûk hatine çêkirin. Î.S.)

J' Bav û Kur û R[i]hê Paqij re

Hemd, izet û bereket

Bidin j' vêga heta ebed

Navê Rebê me bimbarek e

Ko sifra ezmanî vedike

Ya Rebî, rihê me pê bijîn

Em ji vir vala meçîn

Xeberê te l' me hiner bikin

Rihê hezinî zû şah bikin

Dilê kevirîn pê nerm bikin

Şinorhkê te b'bin.

1.7.4. Labder Lusadu

Pirtûka din ku bi alfabeya ermenîkî hatiye çapkirin “Labder Lusadu” ye. Ev serenavê ermenîkî tê wateya “Çirayê Ronayîker”. Li Stembolê di çapxaneya T. Dîvîcyan çap bûye; di sala 1868ê de hatiye çapkirin. Heta îro ev pirtûk veşartî maye û li tu cihan jî behsa wê nehatiye kirin. Wek pirtûka “Alîfbêcuz” bi du zimanan hatiye amadekirin. Di sitûna rastê de metna ermenîkî û di sitûna çepê de tercimeya wê ya bi kurdiya kurmancî heye.

Di vê pirtûkê de di pêşgotinê de bi zimanê ermenîkî li ser naverokê çend xal hatine rêzkirin ku wergera wê ya kurdî bi giştî wiha ye:

- Hikayeyên di derbarê afirandina dinyayê.
- Karên îlahî û bûyerên din ku ji Adem dest pê kirine û heta serdema kalê me yê Nûh dewam kirine.
- Karên îlahî û bûyerên din ku ji Tofanê dest pê dikin û heta serdema Aram, Hayg û qrala Asûriyan Nînosê dewam dikin.
- Serkeftinan û serfiraznebûnên ku ji qrala ermeniyên Haygî dest pê dikin û heta Abgarî dewam dikin.

- Hemû hikûmetên ku ji Aramî heta Mesîhî hatine dîtin û mîraca Mesîh.
 - Peyxemberên mubarek, hewariyên wan, navên hewariyan, wezîfeyên wan, mirin û şehadetên wan.
 - Kar û kîrînên qral Abgar.
 - Doktrînen xirîstiyaniyê, baweriyên wan ên pîroz, dua û we'z û nesîhetên wan.
- Metneke nimûneyî ji vê pirtûkê wiha ye:

KISAYÊ AWUL

Li Kürdistan sakîn in qowmê fillan, xundan û naxundan, bab û birêyê ma ra almat dibî, kî vê kîtêbê ma hat çêkirin nâ kî, îlîmdaran qowmê fillan û xundanan hîn bike, îmanê Krîsdos û naqlê qowmê.

Û nâhat çêkirinê ji boyê fayîdayê çêkroxê xo û îkramî ji navsê xo ra.

Îlla ji boyê xodê û fayde bûnê, nav dinêyê rojhilat, abir û wolatê Kürdsdanê mazin; kî tê da sakîn in bîst hazar malê fillan, bab û birêyê ma ra, kî min dastê xo lê da vê şîxulê piçûg.

Kî îji zû da barê hamî ilmîatê dûr katinê bi bab û bi bapîr, vê tarz mane; û gihişdine bilingazîtîyê pašîn û hesîrîtîyê bê tahmul, û kâtine nav nizanîtîyê.

Awul izmanê bab û bapîrê wa unda kîrine, bi izmanê kûrmancî qisay diqîn, û nimêj diqîn, muhtacê izmanê xarîban bûne.

Ji vê maztir bilingazî nabî ji qowmiki ra, kî izmanê babê xo îj bîr dike, û nizane.

Vê îjbîrîkirinê izmanê, bitanê qowmê ma ra nâqowmîye.

Îlla hamî har çî qowman kî kürdistanê sakîn in, hamî ra qowmîye.

Yaqûbî, Irûm, Katalîg, Nesdorî û Harçî kî sakîn in li wê wolatê.

Awan jî mînayê va izmanê babê wan unda kîrine, û bi izmanê kûrmancî xabar didin û dibêjin.

Bilingazîtîyê didu hamû wolatê Kürdsdan kaxiz nivisandox û hîsab krox bi nivîsî qas tune ne û nizanin nivisandin.

Kî îji vê pêş çiqas xasar û zîyan digihîne ji wo ra hûn mütala biqîn.

Bilingazîtîyê sisê va ye, kîn hûn qowmê Fillan e, û qowmê fillan kê? ye, iji ku darqatîye, nîzanin; hama kê kî fillayî zanî, dibije bi izmanê fillayî (yes hay em) û kurmancî zanox zî, dibije (az filla me, am filla ne); ji vê pê va tiştîk nîzanin.

Bilingazîtîyê çar vâ ye, kî îmanê va li sar Hîsûs Krîsdosê dibe bibî, û nîzanin, nâ kî hûn bitanê, li hamî qowman, kî dibên am krîsdonyanê, nîzanin.

Faraz kîtêbê dêrê ji boyê nimêjê dixuyin, lakîn çî fayde kî nîzanin çî? dibije.

Îsawî (krîsdonyay) bûnê va iji irojî girtinê va, û am fillan e gotinê va xuyayî dibî li bar kurmancan; lakîn li nav dêrê har çî havt şawrê paqîş dêrê tê kirîn, û diqadînin, yekî jî nîzanin, harkê şammas û keşşa; mahnayê wî çî? e nîzanin.

Îşde vê çar tarz iji bilingazîtîyê xalas iji bilingazîtîyê xalas kirinê iva (1844) tarîxê Krîsdos, az bixor hatim li nav Kürdistanê, şaş haft cî maqtab min vaqir badahwa bê para û bê pol.

Lakîm li bar çahvê wâ tiştîk bi âceb xuyayî bû; loma hat girtin û hamî xarc û masrafê ma tovş çû.

1.7.5. Yerk û Şaraganê bi Kurmancî

Ev jî pirtûka îlahîyan e. Li Sûriyeyê li bajarê Helebê di sala 1934ê de çap bûye. 24 rûpel e. Basmaxana Kolêcê ew çap kiriye. Li gor tespîtan ev yekemîn pirtûk e ku piştî damezirandina Komara Tirkîyeyê li derveyî Tirkîyeyê çap dibe. Metneke nimûneyî wiha ye:

YERK Ê ŞARAGANÊ BI KURMANCÎ

HEY HEWAR!

1. Ez d' gunahan de xerq bûme, hey hewar,

Xoyê günahê nû me, hey hewar,

Min înkâr kir Rabbê xo, hey hewar,

Min wî dûr kir j' qelê xo, hey hewar,

Mame heyîrî b' halê xo, hey hewar!

2. Çavê min tarî bûne, hey hewar,

Dilê min tijî xûn e, hey hewar,

Zîv û zêr min wînda kîr(i)n, hey hewar,

Wan min qet rîhat nekir(i)n, hey hewar,

Lê neyara l' min rakîr(i)n, hey hewar!

3. Recfa mirnê min h'lanî, hey hewar,

Mal û milkê min kanî? hey hewar,

Dinya min kul û kor kir, hey hewar,

Eşqa wî li min zor kir, hey hewar,

Min j' cinnetê mahrûm kir, hey hewar!

4. Ez poşman im, poşman im, hey hewar,

Bê mical im, bê mical im, hey hewar,

Ya Xilasekê xofran, hey hewar,

Ya Xaliqê erd ezman, hey hewar,

Eva Hatim bar giran, hey hewar!

5. Te gelekê rîhat kir, hey! şikir, hey hewar,

J' lewra min qezda te kir, hey hewar,

Ez zanim min der nakî, hey hewar,

Tu min bêhîvî nakî, hey hewar,

Min li ba xo qabûl d'kî, hey hewar!

1.7.6. Yerkêd Rûhanî bi Zimanê Kurmancî A. Hador (Bergê Ewil)

Ev jî pirtûka îlahiyan e û di nav pirtûkên bi alfabeya ermenîkî de ya dawîn e. Li Sûriyeyê li bajarê Helebê di sala 1938ê de çap bûye. Metneke nimûneyî wiha ye:

YERKÊD RÛHANÎ BI ZIMANÊ KURMANCÎ

2 WERE ŞAHÊ B' QWET

1. Were Şahê b' qwet,

L' navê tey bi îzzet

Em hemd bidin;

Tu ko l' her cî Rabb î,

Dayîm fetihçî d'bî,

L' ser me xoyî bibî,

Em reca d'kın.

2. Ya! Hîsus, zû were

Bibe xoyî j' me re,

Arî me b'ke;

Ewneçîtîa te

Em bîkın sûra xo,

Em xo dispêrne te,

Rabb kerem ke. (r. 6)

4. Gava dibhurin salan

Weke xewnê şevan,

Bimrim ez jî;

Hîsus, tu X'lase kî,

Tîrsê min fetih kî,

R'hê min b' jor ve rakî,

Ko l' wir bijî.

7. TERZÊ ÇÛNDINA BA KRÎSDOS

1. Çawa heme eva tême,

Ba xilasek bi ecel e,

Çûn te got, b' ser min de were,

Yá Berxê Xodêî ezîz.

2. Yá Rabb, b' qelbê min, tu zanî,

Wî biço ji her nuqsanî,

Her b' ser te de têm b' nefsanî,

1.7.7. Şems

Ev pirtûk ji naveroka xwe zêdetir bi rola xwe ya dîrokî giring e. Li Sovyetîstanê piştî ku ji bo kêmjimaran heqê perwerdehiyê hat dayîn, ji bo kurdên Kafkasyayê jî ev yek wek îhtiyaciyeke acil derket holê û ji bo çareserkirina vê problemê Lazo, bi navê xwe yê tam *Hakop Krîkorî Xazaryan* hat wezîfedarkirin. Wî jî li gorî alfabeya ermenîkî, lê ermenîkiya rojhilatê ku xwendina wê ji lehceya rojavayê gelek cuda ye, alfabeyek çêkir û pirtûka xwe ya bi navê “Şems”ê amade kir. Di vê pirtûkê de ewil digel heceyan û peyvên, tîp tîp nîşandayîn, paşî metnên kin an dirêj hatine rêzkirin.

Nivîskar di pêşgotina pirtûkê de ku bi zimanê ermenîkî hatiye nivîsîn wiha dibêje:

LI ŞÛNA PÊŞGOTINÊ

Pirsgirêka çêkirina pirtûka alfabeyê ji bo zimanê kurdî ku ji 1860an ber bi vir ve rojeva cîhana medenî mijûl dikir îro êdî bi saya hikûmeta Sovyetê ya Ermenistanê hatiye çareserkirin û berbiçav bûye. Di vî warî de Komara Sovyet a Sosyalîst a Ermenistanê ez peywirdar kirim û li hemberî tu astengekê hîç bêzar nebû; daxwaza wan tenê ew bû ku ev karê biserneketî ku bi dehan salan bûbû mijara nîqaşê û dawî lê nehatibû zûtirekê were pêkanîn.

Ev 20-30 sal in ku em li ser zimanê kurdî vekolînên dîrokî û etnografîk dimeşînin, lê dîsa jî li gor agahiyên nehêja ku me bi dest xistibûn haziriyeke zanistî û lînguîstîk ya hin kûrtir lazim bûbû, da ku di vê pêvajoya afirandina pirtûkeke ya dersan de em bikaribin wan diwariyên ku li hemberî me bûn hel bikin. Digel van qisûran evîna xebatê û keda bi dehan salan em mecbûrkirin ku gaveke wêrek biavêjin û em bi gotina “Tu bi lûfta xwe ji min ê aciz vê biçûkiyê qebûl bike û ji zatê xwe yê biqudretê vê mezinahiyê teqîr neke.” ketin rê. Bes ew meseleyên diwar ku derketibûn pêşberî me çî bûn?

1. Ya yekem meseleya zaravayê bû: Hemû lehceyên din ji xerabûna wê lehceyê pêk hatine ku wek kurmancî tê binavkirin. Me ev yek li ber çav girt û kurmancî hîlbijart.

2. *Ya duyem meseleya alfabeyê bû: Min dev ji wan herfan ku min bi xwe afirandibûn û dişîbiyan xetên Fenikeyê berda û ez hêdî hêdî li ser alfabeyên ‘ereb, latîn û ermenî rawestiyam. Karakterên ‘erebî ji bilî dijwarbûnê ji hêla doktrînên dînî ên êzdiyan ve jî guncav nebûn û diviya ku me ev yek paşçav nekira. Alfabeya latînî ku ji bo pejirandinê guncavtir dihat xuyanê di nav xwe de gelek kêmasî dihewand. Wek mînak, ji ber ku nûneriya dengên “x, o, y, k, t, c, ç, û, ş, i, q, j”yê tunebûn hewce bû me li ser herfên heyî nîşaneyên fonetîk danîya, lê belê hingê ev alfabeya nû tevlihev bûbûya û di hişên zarokan de şaşwazî û alozî bixuliqanda. Her wiha terkîbên herfan ên fonetîk ên sistema ewropî jî ji holê rabûna. Diyar e ku heta pergaleke navneteweyî û birêkûpêk a tîpguhêziyê çênebe, alfabeyeke adaptekirî ya kurdî ji bo tetbîqa fikra tîpguhêziyeke gelemperî dê nebe derfet û hêsanî. Ji ber van sedeman tenê bijardeya alfabeya ermenî dima. Di wê de me bizêdekirina du karakteran û jêkirina sê heb ji wan dikaribû fonetîka kurdî bi tevahî nîşan bida. Nexwe me wisa jî kir. Dengên “ă” (dz), “ô” (tz) û “g” (ts) ku di alfabeya ermenî ya nû de zêde bûn hatin deranîn; “l̄” wek berê notla “û”yê hat qebûlkirin; li şûna “t̄u”yê (ea) “ū” (e) û li şûna “n̄l̄”yê (“eu”ya fransîzî) “l̄” (u) hat bikaranîn. Heman tişt li ser dîftongan jî hat sepandin.*

Hemû hînker û helbestên pirtûka dersan ya “Şems”ê resen in.

NIVÎSKAR

Piştî pirtûka Şemsê tu pirtûkên din bi vê alfabeyê çap nebûne, an jî qet nebe heta niha nehatine peydakirin. Lazo di dawiya pirtûka xwe de mizgîniyê dide û dibêje ku çend pirtûken din jî hene ku di demeke nêzîk de dê werin çapkirin, lê mixabin li gorî texmîna me tenê wek reşenivîs mane û negihîştine çapê. Lazo di rûpela dawîn a Şemsê de wiha dibêje:

ZÛVA BASMA DIBA

LAZO

I

SOR ISTÊR

KÎTAB SABA MAZINAN

II

QAWLÊ ÊZDÎAN

(TAMAM)

III

XABARNAMÊ

JI KÛRMANCÎ BI ARMÊNÎ

Çawa ku tê dîtin behsa sê pirtûkan hatiye kirin lê ew bi xwe ne mewcûd in. Em hêvîdar in ku rojekê, wek miswede bin jî ew werin bidestxistin û werin weşandin.

Metneke nimûneyî ji pirtûka Şemsê wiha ye:

Deve polek

— Bavo, deve hatîe polek.

— Nekre, lao, zef giran e.

Salekî din kurik dîsa hat cem bav:

— Bavo, deve hatîe yêk kurur.

— Çî? erzane, here dû heb bikire.

— Rast dibêjî?, bavo;

— Lê!, çî? sekînî; zûva here.

— Bavo, Xudê mala te ava kye,
ew çax ko polekî bû, te got giran e,
niha...

— Lao, ew çax polekî min tûnne
bû, niha hezar kururê min heye.

MESELE

Zivir-zivir

Dîsa livir. (r. 37)

1.7.8. Tesbîhat

Ev berhem hêj negihaştiye çapê û wek destxet di pirtûkxaneyê dijîtal a “vhmml.org”ê û wek nusxe di pirtûkxaneyê “*Near East School of Theology*” ya Libnanê hatiye parastin. 505 rûpel e û bêdîrok e. Di agahiyên dijîtal de qeyda “sedsala 20em” dixuye. Navê wê bi xeletî wek *T’ēspimat*’ hatiye qeydkirin. Ji îlahiyan pêk tê. Metneke nimûneyî wiha ye:

TESBÎHAT

Rabb me bi silametî

Gihande roja lahdê,

Me b' hev re civand l' vî cî,

Ko şinorhk bixwazin jê;

Çi xoş a ev lahda ha,

Mîna ye ya azmana.

1.8. Taybetmendiyên Wergera Tam a Sala 1872yê

Çawa ku berê hatiye gotin di nav çapên wergerên Încîlê de wergera tam a sala 1872yê cihekî xusûsî digire. Ev xusûsiyet ji ber temambûna metna wergerê pêk tê ku di nav xwe de materyalên dewlemend ên zimanî dihevine. Ev materyal ji aliyekî ve bi qayîdeyên rêzimanê re, ji aliyekî ve jî bi binebeşên lînguîstîkê re girêdayî ne. Bi gotineke din metna wergerê ku hejmara ayetên wê nêzikî 8 hezarî ye, bi hemû hevok û peyvên xwe ve dikare bibe mijara vekolînê gramerê û li gor usûlên modern ên zimannasiyê were nirxandin.

Çend taybetiyên fîzîkî yên pirtûkê wiha ne: Metn bi tevahî 624 rûpel e û digel tabloya xeletî û rastiyan hejmara rûpelên wê dibe 627. Di pirtûkê serdema Osmanî de tabloya rastî û xeletiyên bi tirkî wek “hata-savâb cedveli” dihat binavkirin û di dawiya pirtûkê de mîna zeyl (pêvek) dihat weşandin. Di vê pirtûkê de jî bi sernavê “Xeladî”yê şaşîtiyên metnê û formên wan ên rast hatine nîşandan.

Di rûpelên metnê de zêde valahî nayê dîtin û li ser her rûpeleke tije herî zêde 33 riste hene. Mezinahiya wê 19.5 cm × 13 cm ye ku bi vê taybetmendiya xwe jî pirtûkê mezin tê hesibandin.

1.8.1. Taybetmendiyên Rastnivîsê yên vê Berhemê

Wergera tam a Peymana Nû bi alfabeya ermenîkî ya rojavayê hatiye çapkirin. Her çend alfabe aîdî zimanê ermenîkî be jî ziman kurdî ye. Ji ber hindê ji bo xwendina wê divê him alfabeya ermenîkî û him jî zimanê kurdî bê zanîn. Wek hemû alfabeyên adaptekirî alfabeya ermenîkî ya kurdî jî ji bo temsîliyeta denga hatiye nûjenkirin. Tîpên alfabeya ermenîkî ya kurdî bi rêzê wiha ne:

Transkrîpsiyon (Muqabîlên Herfên Ermenîkî bi Latînî)

Ermenîkî		Kurdî	
Majusku l	Mînuskul	Majuskul	Mînuskul
Ա	ա	A	a
Բ	բ	Բ	բ
Գ	գ	Է	է
Դ	դ	T	t
Ե	ե	YE/Y	ye/y
Զ	զ	Z	z
Է	է	E/Ê	e/ê
Ը	ը	I	i
Թ	թ	T	t
Ժ	ժ	J	j
Ի	ի	Î	î
Լ	լ	L	l
Խ	խ	X	x
Ծ	ծ	DZ	dz
Կ	կ	G	g
Հ	հ	Y	y
Ձ	ձ	TS	ts
Ղ	ղ	Ճ	ճ
Ճ	ճ	C	c
Ս	ս	M	m
Յ	յ	H/Y	h/y
Ն	ն	N	n
Շ	շ	Տ	ş
Ո	ո	VO/WE	vo/we
Չ	չ	Ç	ç
Պ	պ	B	b
Ջ	ջ	Ç	ç

Ռ	n	Ր	ṙ
Ս	u	Տ	s
Վ	վ	V/W	v/w
Տ	un	D	d
Ր	p	R	r
Ց	g	TS	ts
Ի	լ	V/W	v/w
Փ	փ	P	p
Ք	p	K	k
Օ	o	O	o
-	լ	-	yev
Ձ	զ	Q	q
Յ	յ	E	e
Էօ	եօ	Ö	ö
Ու	nլ	U/Û	u/û
Իլ	իլ	Ü	ü

Di alfabeya ermenîkî de 38 herf hene; xeyn ji wan herfan semboleke taybet heye ku tenê ji bo gihaneka “û”yê tê bikaranîn: “լ” (yev). Ev sembol di seranserê metnê de tenê yek car tê dîtin. Ji bo dengê “u”ya kin û dirêj du herf bi hev re tên nîşandayîn: “o” + “v”. Heman mentîqa rastnivîsê di zimanê yewnanî de jî tê dîtin ku ji bo “u”yê du tîp tên nivîsin. Ji ber ku yewnanî baş dizanibû, çêkerê alfabeya ermenî *Mesrob Maşdots* (361-440) bi ihtîmaleke mezin ev kombînasyon ji wî zimanî girtiye. Ji bo dengên “ö” û “ü”yê jî kombînasyon hene ku li gorî rêzê wiha ne: e+o=ö, i+u=ü. Ev herdu deng tenê ji bo rastnivîsa peyvên biyanî ku ji tirkî/osmanî hatine girtin tên bikaranîn. Du herfên zêde ku ji bo kurdî hatine çêkirin ev in: “e” û “q”.

Çawa ku alfabeya ermenîkî alfabeyeke serbixwe ye, wisa jî xalbendiyên ku di vî zimanî de tên şixulandin cuda ne.¹⁰⁶ Li jêrê xalbendiyên zimanê ermenîkî û wezîfeyên wan (ku di metna kurdî de jî bi heman şêweyê hatine bikaranîn) hatine şirovekirin:

¹⁰⁶ Dora Sakayan, *Western Armenian For the English-speaking World A Contrastive Approach*, Yerevan State University, 2021, r. 17.

: (xalecot): Ev sembol di dawiya hevokan de tê dîtin û şûna xalê digire.

. (xal): Ev sembol ji bo hevokên pêreyî, berî îzahatê yan jî axaftina kesekî/ê tê bikaranîn û şûna bêhnokê an xalebêhnokê digire.

ˆ (pirsnîşan): Ev sembol ji bo pirsîrînê tê bikaranîn. Teqez ne lazîm e ku li dawiyê bê danîtin; pirs li ser kîjan peyvê be li ser wê tê danîtin.

` (bêhnok): Ev sembol ji bo cudakirina hevokan an jî hevokên bê lêker tê bikaranîn. Şûna bêhnokê û xalebêhnokê digire.

, (bêhnok): Ev sembol ji bo cihêkirina peyvan an hevokan tê bikaranîn.

’ (dabir): Ev sembol di zimanê ermenîkî de ji bo dengên jêkirî tê bikaranîn, lê di metna kurdî de ji bo dengê ‘eynê (ع) hatiye xebitandin. Di dirêjahiya metnê de tenê çend caran tê dîtin.

’ (kirpandin): Ev sembol ji bo kirpandina peyv an dengdêrekê tê bikaranîn.

’ (baneşan): Ev sembol ji bo xitabkirinê tê bikaranîn.

1.8.2. Taybetmendiyên Sentaksê yê Berhemê

Sentaks an hevoksazî ew şûbeya zimannasiyê ye ku bi usûlên rêzandina hêmanên hevokê re elaqedar dibe. Di zimanekî mûeyyen de hevokek, tenê li gor rêzîkên diyarkirî tê sazîkirin û bêyî şopandina wan qaydeyan çarçoveyeke mentiqî pêk nayê. Helbet zimanê kurdî jî ne derveyî vê taybetmendiyê ye û nivîsa standart an axaftinê herêmî (devok) tev girêdayî sentaksê ne.

Gelek ziman di prosesa avakirina zimanê neteweyî de pêşî jî wergerê arîkarî dibînin¹⁰⁷ û di metnên wergerkirî de ji ber bandora zimanê jêderkî (*source language*) carna formên çewt, an çewt nebin jî seyr, tên dîtin. Di dîroka nivîskî ya kurdiya kurmancî de jî metnên destpêkî werger in û dema ku mirov li hevoksaziyê mêze dike bi hêsanî bandora zimanê tirkî/osmanî dibîne. Ev mesele jî aliyekî ve bi wergêriyê re têkildar e û ji terefê din bi têgiha “kontakta zimanan” re jî têkildar e. Zafer Açar vê fenomenê wiha tîne ziman: “*Îja, ji ber ku kontakta kurdî bi çend zimanan re ye, em guherîna di kurdî de eşkere dikarin bibînin. (...) Guherîn hem di deng û tîpên kurdî*

¹⁰⁷ Lirak Karjagdiu, Naser Mrasori, *The role of literary translation in the development and enrichment of national literature*, Journal of Language and Linguistic Studies, 17(4), 2332-2345, 2021, r. 2339-2340.

hem di peyv û ferhenga kurdî, hem di sazkirina hevokan hem jî di wateyê de pêk hatiye.”¹⁰⁸

Çend nimûneyên hevoksaziyê ji wergera tam a Încîlê û paralelbûna wê bi zimanê tirkî re wiha ne:

- “(...) *li Beytelehmê û dora wî da bûn hemî kurê piçûkan...*” (r. 6)¹⁰⁹

(Beytlehem’de ve çevresinde olan bütün küçük çocukları...)

- “*Û bi dîtinê aw cematên li çiyê rabû...*” (r. 10)

(Ve o cemaatleri görmekle dağa çıktı...)

- “*Îsa go jê ra, Erki dixwazî tekmîl bûn*” (...) (r.49)

(İsa ona dedi: Eğer kemale ermek istiyorsan...)

- “(...) *li ber Xodê mümkünê hemî tiştan heye.*” (s. 49)

(Tanrı’nın önünde her şeyin mümkünü vardır.)

Helbet pêkan e ku hevşibînên bi vî terzî muheqqeq bi bandora tirkî yan zimanekî din neyên îzahkirin. Dibe ku di wergerê de hostatiya wergêr kêmbê an jî ji ber kêmaniya mînakên nivîskî ên berî xwe nikaribe bi uslûbeke herikbar û rûniştî binivîse. Lê ne hewceyî gotinê ye ku zimanê fermî bivênevê tesîreke mezin îcra dike li ser zimanên neteweyên din û sentaks jî ne derveyî vê peywendiyê ye. Eger dereceya vê danûstandinê ji sînoreke maqûl derbas bibe, li wir dejenere û pûçbûn dest pê dike û xetereya wendabûna ziman dertê holê.¹¹⁰

1.8.4. Taybetmendiyên Morfolojîk ên vê Berhemê

Morfolojî bi metodên çekirina peyvan, wezîfeya qertafan, kesandina lêkeran û bi hemû cureyên formên zimên re elaqedar e; berê ev têgih tenê di zanista jîndarnasiyê de dihat bikaranîn lê îro wek têgiheke giring a lînguîstîkê jî tê bikaranîn ku şaxeke serbixwe ye û li ser morfên (guherînen) şiklî ên hêmanên zimanekî radiweste.¹¹¹

¹⁰⁸ Zafer Açar, *Sosyolînguîstîk Hin Têgehên Serekî û Sehayên Xebatê Yên Vê Zanistê*, “Rêzegotarên Zimannasiya Kurdî, Destpêk û Têgehên Sereke”, Peywend, Van, 2022, r. 158.

¹⁰⁹ Hejmarên rûpelan aîdî metna wergerê ya sala 1872yê ye.

¹¹⁰ İlyas Sayım, *Hasköy Kurmancî Ağzının Bir Kısım Özellikleri*, “Muş, Tarih, Toplum, Siyaset ve Hafıza”, Pınar Yayınları, İstanbul, 2020, r. 258-259.

¹¹¹ George Yule, *The Study of Language*, Cambridge University Press, Cambridge, 2001, r. 75.

Di metna wergera tam a Încîlê de gelek mînakên formsaziyê hene û gire (pêşgir û paşgir) qîsmeke muhim ên guherînen sûretan e. Li jêrê çend mînakên qertafan û fonksiyonên wan ên rêzimanê hatine nîşandan:

—ox: Gireya dariştinê ye, ji lêkeran kirde çêdike; li ser koka dema borî ya kesê sêyem tê îlawekirin. Mînak: Ceribandox (kesê/a ku diceribîne), gotox (kesê/a ku dibêje), nihêrox (kesê/a ku dinihêre), çûndox (kesê/a ku diçe).

—êt: Formeke veqetandekê ye ku ji bo pirjimariyê tê bikaranîn. Mînak: Xuşkê vîa, rûhê napakan, şagirdê wî.

—ê: Forma kurt ya veqetandeka ‘-êt’ê ye. Mînak: “Xodê dikari ji kavirê[t] han weledê[t] Îbrahîm derxîne.”

—tir: Gireya kêşanê ye, ji bo berawirdê tê bikaranîn, bi wateya zêdebûnê ye. Mînak: Pêtir, zêdetir.

—îtî/tî: Gireya dariştinê ye, ji navdêran navdêrên razber çêdike. Mînak: Qancîtî, mecbûrîtî, zarûtî, dirûtî (durûtî), padîşahîtî.

—cî: Gireya dariştinê ye, ji navdêran navdêr çêdike, amaje bi çêkerê dike. Ev qertaf bi eslê xwe ve tirkî ye: Mînak: Gümrügcî, xancî, şeraatcî.

1.8.5. Taybetmendiyên Leksîkolojiyê yên vê Berhemê

Leksîkoloji ew şaxa zimannasiyê ye ku li ser “leksîs”an ango peyvan dixebite û xweza, wate, dîrok û bikaranîna wan dinirxîne.¹¹² Di metna wergerê ya tam de vokabulereke dewlemend û rengîn heye ku dikare bibe babeta xebateke xusûsî. Ji ber ku werger aîdî metneke olî ye, tê de gelek leksîsên olî hene. Ji ber ku milletê kurd miletekî misilman e, pîrsa “termînolojiya dînî ya xaçebîniyê bi çi awayî hatiye îfadekirin” tê bîra meriv. Wergêrên Încîlê di vê meseleya biproblem de usûleke wiha şopandiye: Ji bo têgihan carna ji zimanê ermenîkî sûd hatiye wergirtin, qîsmek ji têgihan ji wergerên osmanî ku di nav xwe de gelek hêmanên erebî û farsî dihevine hatine girtin û qîsmek jî bi derfetên zimanê kurdî hatine avakirin. Ji ber vê yekê ye ku di etîmolojiya peyvan de çeşîtdarî balê dixşîne.¹¹³ Li jêrê çend peyvên nimûneyî û zimanên wan ên jêderkî hatine destnîşankirin:

¹¹² Jesús Martínez del Castillo, *Semantics and Lexicology*, Almería, 2013, r. 8.

¹¹³ Marcin Rzepka, *Protestants among Kurds and some problems of translations of the Bible into Kurdish in the 19th century*, Orentala Chrstana Cracovensa 1, 2009, r. 92.

Xodê (kurdî): Hêza mezin ê Teslîsê (sîstema îlahî ya Sê Xudayan ango Xwedayên Sisêyî). “*Zîra padîşahîtiê Xodê bi sözan nin e, lê bi quwwet e.*” (r. 398)

Rûhe’l-Quds (erebî): Hêza mezin ê din ji teslîsê. “*Az wê, tahfîl dikim bi av ji boyê toba; hama li pey mi hatox ji min taqatlî e, û ez sole wî garandinê nahêjim, awê wê dê tahfîl bike bi Rûh el quds û bi agir.*” (r. 7)

Îsa (erebî): Hêza mezin ê tir ji Teslîsê. Navkî taybet e ku di zimanê ermenîkî de wek ‘Hîsus’ tê bilêvkirin. “*Wê çaxê Îsa cematên berda, û li mal hat; şagirdê wî hatin li balê, û gon: Temsîlê zîwanê zevîan ji me ra bihakîne.*” (r. 34)

Kurê Meruv (kurdî): Leqeba Hz. Îsa ye ku bi wateya kurê însanê hatiye bikaranîn. Bi qewleke din Hz. Îsa di zikê diya xwe de çêbûye û loma wek “kurê meruv” tê binavkirin. “*Ji boy vî hûn jî hazir bibin, çima ko li wusan saatkî, ko hûn texmîn nakin Kurê meruv tê.*” (r. 64)

Dacar (ermenîkî): Perestîşgeh; Mabeda Hz. Suleyman, perestgeha mezin a cihûyan. “*Û çaxê ji qelebe ra go Îsa: Mi girtinê weka li ser diz hûn bi kêran û bi daran rabûn? Her ro li nav dacar da bi we ra dîronîşdibûm û talîm dikiribûm û hûn mi negirtin.*” (r. 72)

Tahfîl (erebî): Tehfîl, vaftîz, şûştina zarûyan ji wê gunehê ku ji Hz. Adem derbasî ziryetê wî bûye. “*Nua herin hemî mîlletan talîm bikin, û tahfîl bikin wan bi navê Bav û Kur û Rûh el quds; ...*” (r. 79)

Bayram (tirkî): Cejn; di dîroka cihûyan de roja xilasbûnê ji qralê Misirê. “*Û digotibûn, li vî bayram da nebe, ki li qawm da nebe ko welwelekî bibe.*” (r. 119)

Yerets (ermenîkî): Êxtiyar, rûsipî. “*Û bîst û çar yeretsan û çar haywanan ketin û secde kirin ji Xodê ra, ko li ser taxtê rodine, bi gotinê: Amîn, Alelûûa.*” (r. 617)

Xeyn ji van hêmanên dînî di peyvên din de jî çêşidiyeke mezin a etîmolojîk xuya dibe. Tê dîtin ku wergêrên Încîlê di bikaranîna peyvên biyanî de zêde dudilî nebûne û ew bi rehetî tevî metnê kirine. Dibe ku ev helwest karê tercumeyê ji wergêran re hêsantir kiribe, lê di xwendin û têgihiştina metnê de carinan dibe sedema alozî û serwextnebûnê. Çend unsûrên biyanî ku di metnê de derbas dibin wiha ne:

Başlamîş kirin (tirkî): Dest pê kirin. “*Û kînga ko aw çûn, Îsa başlamîş kir ji cevata ra gotinê ji boy Hanna.*” (r. 26)

Düşümîş bûn (tirkî): Fikirîn. “*Û düşümîş mebin hûn li nav xo da bêjinê, erki bavê me Îbrahîm heye, ji we ra dibêm, erki Xodê dikari ji kavirê han weledê Îbrahîm derxîne.*”

Kelb: (erebî): Kûçik. “*Û arzû fikir ko ji sufrayê aw zengînê hati ketin ji hûrikê nanan zikê xo tijî bike, û hem jî kelban dihatibûn û brînêt wî dalêstin.*” (r. 186).

Yemîş (tirkî): Mêwe. “*A nwa ji toba ra layiq yemîş bînin.*” (r. 8)

1.9. Metneke Nimûneyî ji Wergera Tam a Încîlê

Li jêrê metneke nimûneyî ji wergera tam a Încîlê heye. Berî transkrîpsiyonê sûreta orîjînal a vê metnê hatiye berpêşkirin.

Tîpguhêziya metnê li gor rêbaza W. M. Thackston hatiye kirin. Di vê rêbazê de ji bo dengdarên bêhilm, “r”ya qelew û ji bo dengên ku ji erebî derbasî kurdî bûne binxêz hatiye bikaranîn.¹¹⁴ Reqemên biçûk ên metnê hejmarên ayetan in.

Ev metn ji beşa şeşem ya Încîla Madteosê hatiye girtin¹¹⁵ û yek ji giringtirîn duayên xaçebîniyê ye ku wekî “Duayê Rebê” yan “Bavê Me” tê zanîn. Transkrîpsiyona wê bi alfabeya latîniya kurdî wiha ye:

“¹⁰ Yâ bavê me ko li azûmanday, navê *ta* azîz bibe; padîşahîtiyê *ta* bê; meramê *ta* bibe, çawan ko li azûmanda, wusan jî li ser ardê. ¹¹ Nanê me hemû royan îro me *ra* bide.

¹² Û deynê me ji mera baxş bike, çawan ko em jî baxş dikin ji deyndaranê xora. ¹³ Û me li tercubeyê mebe, lê ji şerê xalas bike, çima ko êtaye padîşahîti û quwwet û hamd ebedil ebed; amîn.”

Eger heman metn li gor rastnivîsa îro ji nû ve bê nivîsin dê wiha xuya bibe:

10 Ես' պարկէ մա՞ քօ լը աղիւմանտայ , նարկէ դա աղիղ
պըպա՞ . փատիշահիթիյէ դա պէ . մէրամէ դա պըպա՞ ,
չալան քօ լը աղիւմանտա՝ վոսան ժի լը սէր արտէ :
11 Նանէ մա՞ հէմու ուոյան իու մա՞ռա պըտա՞ :
12 Ու տէյնէ մա՞ ժը մա՞ռա պախշ պըքա՞ , չալան քօ ա՞մ
13 ժի պախշ տըքըն ժը տէյնտարանէ խոռա : Ու մա՞ լը
թէրծուպէյէ մա՞ պա՞ , լէ՛ ժը շա՞ռէ խալաս պըքա՞ , չըմա
քօ էդայա՞ փատիշահիթի ու գուլվէթ ու համո էպէտըլ
էպէտ . ամին :

¹¹⁴ W. M. Thackston, -Kurmanji Kurdish- A Reference Grammar with Selected Readings, r. 1-4.

¹¹⁵ Peymanê No, 1872. r. 14.

“¹⁰ Ya bavê me ku li azuman da y[e], navê te ezîz bibe; padişahîtiya te bê; merama te bibe, çawan ku li azuman de, wusan jî li ser erdê. ¹¹ Nanê me hemû royan îro ji me re bide.

¹² Û deynê me ji me re bexş bike, çawan ku em jî bexş dikin ji deyndarên xwe re. ¹³ Û me li tecrubeyê nebe, lê ji şerê xelas bike, çima ku ya te ye padişahîti û quwwet û hemd ebedu’l- ebed; amîn.”

Lêbelê li vir pirsgirêka mudaxeleyê dertê meydanê û reseniya metnê xerab dibe. Xeyn ji vê yekê gengaz e ku heman metn ji ber nêrînên cuda, bi şêwazên cihê were latînîzekirin. Ji hêla din ve, eger ev cure metn bi meqsedê pragmatîk an popûlîst werin standardîzekirin û ji daîreya teng a akademîyê derkevin, gelek kes dikarin ji wan xeberdar û sûdmend bibin. Bi gotîneke din herçend xebatên akademîk pabendî bi metna resen û tîpguhêziyeke hûr bixwaze jî ji bo gihîştina girseyên mezin standardîzekirin, zelalkirin, kurtasîkirin an usûlên bi vî rengî ji faydeyê ne dûr in.

BEŞA DUYEM

2. METNA TRANKRÎPSÎYONÊ



[1]
PEYMANÊ NO
Ê
XOÎYÊ ME ÎSA EL MESÎH



LI BASMAXANEÊ
A. H. BOYACYAN TAB BÛA

1872

LI ISDAMBOL DA

[2]



ÎNCÎL BI QAWLA MADTEOS

SER 1

¹ Kitêbê zayinê Îsa el Mesîhê e, kurê Îbrahîm kurê Dawûd. ² Îbrahîm za Îsahakê; Îsahak za Yaqûbê; Yaqûb za Cûdayê û brêyêt wî; ³ Cûda za Farîz û Zarax, ji Tamarê; Farîz za Azrûnê, Azrûn za Aramê; ⁴ Aram za Amînadabê; Amînadab za Nasrûnê; Nasrûn za Salmûnê; ⁵ Salmûn ji Raabê za Baazê; Baaz za Avbîtê ji Raûsê; Awbît za Yesseyê; ⁶ Yesse za Dawûd padişahê; Dawûd padişah za Süleymanê ji jina Ûriayê; ⁷ û Süleyman za Rahbaamê; Rahbaam za Abîayê; Abîa za Asayê; ⁸ Asa za Yûsafatê; Yûsafat za Yûramê; Yûram za Uzîayê; ⁹ Uzîa za Yûwasamê; Yûwasam za Axazê; Axaz za Hazkîayê; ¹⁰ Hazkîa za Manasayê, Manasa za Amonê; Amon za Yûsayê; ¹¹ Yûsa za Yûxaniayê û brêyêt wî li wexta yesîrîtîyê Babîlonê.

¹² Û li paşê yesîrîtîyê Babîlonê, Yûxanîa za Salsalîelê; Salsalîel za Zurababelê; ¹³ Zurababel za Abîûdê; Abîûd za Yeliakîmê; Yeliakîm za Azûrê; ¹⁴ Azûr za Sadukê; Saduk za Axînê; Axîn za Yeliûtê; ¹⁵ Yeliût za Yeliazarê; Yeliazar za Matanê; Matan za Yaqûbê; ¹⁶ Ya-[4] qûb za Yûsîf mêrê Meyremê; ko ji aw Meyremê Mesîh hati gotan Îsa za; ¹⁷ Nua hemî sîlsîleyan ji Îbrahîmê hata Dawûdê çardah sîlsîle; û ji Dawûdê hata yesîrîtîyê Babîlonê, çardah sîlsîle; û ji yesîrîtîyê Babîlonê hata li Mesîhê çardah sîlsîle e.

¹⁸ Û zayinê Îsa el Mesîh ahwa bû, diya wî Meyrem bi Yûsîf ra nşan bû; hêja li ba hevûdu nahat, ji Rûh el qudsê avis ma. ¹⁹ Û Yûsîf mêrê wî meruvkî sadiq bûnê, û nadixostibû ko aybê wî beyan bike, fikirî ko bê deng û dîn awî berde. ²⁰ Û kînga ko aw tiştê han difikiribû va ha melekê Xodê li xew da jê ra xuyayî bû, û go: Ey! Yûsîf kurê Dawûd, metirs ji xo ra girtinê jina xo Meyremê, çima ko li hindurê wî da hati za ji Rûh el qudsê e; ²¹ Û aw kur dê bizi, ko navê wî Îsa deynî; çima ko aw qawmê xo dê ji güneyê xo xelas bike.

²² Av hemî t[î]ştan bûn, ko tekmlîl bibe ji Rabb hati gotan, bi destê Îşaya peyemberê: ²³ Va ha qîz dê avis bibe û kur dê bize; û navê wî Amanuel dê deynin, ko tercûme dibe xodê bi me ra e gotinê.

24 Nua Yûsîf gava ko ji xewê rabû çawan ko melekê Xodê jê ra emr kiribû, kir; û jina xo girt; 25 hama awî nedizani bû hata ko kurê xo awulîn za, û navê wî Îsa danî.

SER 2

1 Û kînga Îsa za li welatê¹¹⁶ Yehûdîan li nava Beytlehem li roya Herodîs padîşahê, Va ha Alîman ji rohilatê hatin li Qutsuşerîfê; 2 û gon: Li kû? e aw, ko ji Yehûdîan ra padîşah [5] za; çima ko em istêrê wî li rohilatê dîn, û hatin jê ra secde bikin. 3 Û kînga Herodîs padîşah bihîsd haridî û hemî Qudsuşerîf pê ra.

4 Û bi civandinê hemî baş îmaman û xonidanê mîlletê pîrs kir ji wan, erki Mesîh li ko? awê dê bize. 5 Wan jî gon jê ra, Li nav Beytlehemê Yehûdîan; çima ko waha nivisandî ye bi destê peyember. 6 Û tu Beytlehem, li welatê Cûda; li nav rûsipîê Cûda qa piçûg nin î; ji ta ji mi ra rûsupîkî dê rabe ko ometê min Îsrayîl biçêrîne. 7 Wê çaxê Herodîs bi dizîka Alîman gazî kir, û qanc sahîtiyê kir ji wan wextê xuyayînê istêr. 8 Û wan li Beytlehemê bi şîyandinê go Harîrî sahîyê bizanin ji boyê wî kurîk; û kînga bibînin ji mi ra xaber bikin ko e jî bêm jê ra secde bikim. 9 Û kînga wan ji padîşahê aw tişt bihîstin, çûn, va ha aw istêr ko li rohilatê dîn li ber wan çû, hata ko hat sekinî li ser wî cîyê ko kurîk bû. 10 Kînga ko dîn istêr bi pîr mezin şaz bûnê şaz bûn. 11 Û kînga ko ketin li mal, dîn kurîk bi diyê xo Meyremê tev, û ketin secde kirin jê ra, û xazneyê xo bi vekirandinê baxşîşan dani jê ra; zêr, û künlig û mûr. 12 Û li xewê da bi îzn sendinê, ko carkî jî neçin li ba Herodîs, ji başqa rê ve çûn li welatê xo.

13 Kînga ko aw çûn ji wê, va ha li xewê da Melekê xodê xuya ji Yûsîf ra, û go: Rabe, bigir kurîk û diya wî, û birev li Misirê, û li wê bisekin hata ez ji ta ra bibejim; çima ko Herodîs wundakirin dixwazi kurîk. 14 Aw jî rabû girt kurîk û diyê wî li şevê da, û çû li Misirê 15 û hata ko Herodîs [6] mir li wê bû, Ko tamam bibe ji Xodê hati gotan bi destê peyember, ko dibêje, Ji Misirê ezê kurê xo gazî kim.

16 Wê çaxê kînga ko di Hîrodîs, ko hati xapandin ji Alîman, pîr sê hat; û şîyand qir kir li Beytelehmê û doza wî da bûn hemî kurê piçûkan ji du salan jêr, li gora wê çaxê ko ji Alîman fehm kir. 17 Wê çaxê tamam bû bi destê Îrîmîa

¹¹⁶ Di metnê de *ulatê* (nîşeya wergêrê).

peyemberê hati gotan, ko dêje: ¹⁸ Ji Rama sawndkî hata bihêsdin, şîn, grin û şînkî mezin, Rahel digirîa kûrê xo, û nedixost li dilê xo pîrs biki, çima ko tunna bûn.

¹⁹ Û kînga ko Herodîs mir, va ha melekê Xodê li xewê da li Misir xuya ji Yûsuf ra, û go, ²⁰ Rabe, bigir kûrik û dîyê wî, û hare li welatê Îsrayel, çima ko mirin, aw ko canê kûrik dixosdin. ²¹ Aw jî rabû kûruk û dîya wî girt, û hat li welatê Îsrayel. ²² Û kînga ko bihîsd Arkeşayos padîşahîyê kir li ser welatê Yehûdîan li cîyê bavê xo Herodîs, li wê çûnê tîrsîa, û li xewê da îzn bi sendine li aliyê Celîlê çû. ²³ Û hat li wî bajêrê sekinî ko Naserat tê gotan ko xaberê peyemberan tamam bibe jê ra Nasranî dê gazî bikin.

SER 3

¹ Aw royan Hannayê tahwîlî hat li nav çolê Yehûdîstan waz kirinê, û gotinê: ² toba bikin çima ko, padîşahîyê azûmanan nêzik e. ³ Çima ko vîa aw e, ko ji boyê wî bi destê Îşaya peyember hati gotin: Ko dibêje, dengik, ko li nav çolê gazî dika, rast bikin rêya Xodê, [7] û rast bikin ardê çûndinê wî. ⁴ Û cilê Hanna bû, mûyê deve, û nava wî da piştê qayîş, û taamê wî qumil hingifê çolê bû.

⁵ Wê çaxê Qutsuşerîf û gişk Yehûdîstan û hemî aliyê Hortan jê ra diçûbûn, ⁶ tahfil dibûn jê li nav çayê Hortan, û güneyê xo iqrar dikiribûn. ⁷ Û kinga ko dî Sadûqîyan û ji Farîsîan hat li tahfiliyê wî, go ji wan ra: Ey! ewledê gorimahran kî? ji we ra nişan da, aw xazeb ko dê bê, Jê birevin. ⁸ A nwa ji toba ra layiq yemîş bînin. ⁹ Û düşûmîş mebin hûn li nav xo da bêjinê, erki bavê me Îbrahîm heye, ji we ra dibêm, erki Xodê dikari ji kavirê han weledê Îbrahîm derxîne. ¹⁰ Hênî a nwa bivir li ba qurmê daran tê daînin; hemî dar ko yemîşê qenc nayni, tê birandin û tê avêtin li agir. ¹¹ Az wê, tahfil dikim bi av ji boyê toba; hama li pey mi hatox ji min taqatî e, û ez sole wî garandinê nahêjim, awê wê dê tahfil bike bi Rûh el quds û bi agir. ¹² Ki malebê wî li dest da ye, û bêderê xo awê dê paqij bike, û genim li ambarê xo dê bicivîne, û ka, bi bêbuhartin agirê dê bişawutîne.

¹³ Wê çaxê Îsa ji Celîlê hat li Hortanê ji Hanna ra; ko jê tahfil bibe. ¹⁴ Û Hanna berneda wî, û go, Ji mi ra lazim e ko ji ta tahfil bibim; û tu ji mi ra? tîy; ¹⁵ Îsa cewab da û go jê ra, Bêrde a nwa, çima ko ji me ra waha cayîz e, erki hemî sadaqatan tekîl bikin; û paşê berda awî. ¹⁶ Û kinga ko Îsa tahfil bû, zû va ji avê derhat, û va ha azûmanan jê ra vebûn, û dî Rûhê Xodê weka kevok dihati jêr û dihati li ser [8] wî. ¹⁷ Û va ha ji azûmanan dengî hat ko dîgo: Ev e Kûrê min dalalî ki jê has dikim.

SER 4

¹ Wê çaxê Îsa ji Rûh el qudsê hati birin li çolê ji boyê ceribandîne¹¹⁷. ² Û çil ro û çil şev paşê rocî girtinê, birçî bû. ³ Û ceribandox hat go jê ra: Erki tu Qurê Xodê yî bibêji ki av kevran nan bibin. ⁴ Aw cewab da û go: Nivisandî e, Na kî bi nan tenê meruv bijî; lê bi aw hemî xabêran ko ji devê Xodê derî.

⁵ Wê çaxê Şeytan girt bir wî li bajêrê azîz, û sekîrandi wî li ser qubeyê dacar, û go: ⁶ Erki tu Qurê Xodê yî, tu xo ji vir bavêj li xwarîyê; çima ko nivisandî e, erki ji melekê xo ra emr kirîye ji boyê te, û te li ser dest bigirin; ki ji bin linga xo li kevîr nexî ⁷ Îsa dîsa go jê ra: Nivisandî e, erki xoyî û xodê xo nacerîbînî.

⁸ Şeytan dîsa girt wî û bir li çîyekî pîr bilind; û nişan da jê ra hemî padîşahîtiyê dinê û îzzetê wan; ⁹ Û go jê ra, Avan hemî ji ta ra didim, erki bişevî ji m ra secde bikî. ¹⁰ Wê çaxê Îsa go jê ra: Pey mi hêre yâ Şeytan, çima ko nivisandî e, Ji Xoyî û Xodê xo ra secde bikî, û tenê jê ra tapmîş bibî. ¹¹ Wê çaxê Şeytan berda wî, û melekê Xodê hatin û jê ra xizmet dikirin.

¹² Û kinga ko Îsa bihîst erki Hanna hati girtin, rabû çu Celîlê. ¹³ Û bi berdanê Nazaret, hati saknîbû li Gafarnayumê, li ba taniştê bahir, li nav sînorê Zapulon û Neftalîmê; ¹⁴ Ki tamam bibe bi destê Îşaya pey- [9] xember hati gotan aw xabê: ¹⁵ Welatê Zapulon û welatê Neftalîm, bi rêya bahr, li wî alîyê Hortan, Celîlê kefaran, ¹⁶ Li tarî da ronîşdox cemat mezin rohnî dî û rohnî da li ser wan, aw ko li welatê mirin, û li sî da diroşîdîbûn. ¹⁷ Ji wê vi pê va Îsa dest kir vâz kirinê û gotinê, toba bikin; çima ko padîşahîtiyê azümanan nêz e.

¹⁸ Kinga ko Îsa li ba bahrê Celîlîan digêrî; dî herdu brêan, Şimhûn ki dihati gotan Petros, û brêyê wî Antrîas, li bahrê tor avêtin çima ko seydvanê masî bûn. ¹⁹ Û go ji wan ra li pey mi werin, û ez wê seydvanê merûvan bikim. ²⁰ Wan jî zû va alatê xo hiştin, û li pey wî çûn. ²¹ Û ji wê li pêş bi çûndinê, dî hênî du brêan Yaqûbê Zepetyan, brêy wî Hanna li nav gemî¹¹⁸ bi Zepetos bavê xo ra; kinga torê xo pîne di kirin, û gazî kir wan. ²² Û wan jî zû va gemî û bavê xo hiştin li pey wî da¹¹⁹ çûn.

²³ Û Îsa hemî alîyê Celîlê digêrî, hîn dikir li derê wan da, û waz dikir încîlê padîşahîtiyê; li nav cematê her çeşît naxoşîtyan û her çeşît marazan sax dikir. ²⁴ Û

¹¹⁷ Di metnê de *ceribaedînê* (nîşeya wergêrê).

¹¹⁸ Di metnê de *gerî* (nîşeya wergêrê).

¹¹⁹ Di metnê de *uxda* (nîşeya wergêrê).

navê wî çû li hemî welatê Yaqûbîyan, û anîn jê ra hemî naxoşan ki bi çêşt marazan û bi xazeban ezîyet dikişandin; û bi cinan û hîvketoxan û kötrüman, û sax kir wan; ²⁵ Û pîr cemat li pey wî diçûn ji Celîlê û ji Tegabolîsê, û ji Yerusâlîmê, û ji Yehûdîstanê, û ji wî alîyê Hortan, û sax kir wan.

[10] SER 5

¹ Û bi dîtîne aw cematî li çiyê rabû, û kînga ronişd li wê şagirdê wî çûn li balê. ² Û devê xo bi vakirandîne hîn dîkir wan ra û di go.

³ Xozî bi rûh faqîran¹²⁰ ra, çima ko padîşahîtiyê azümanan ji wan ra e. ⁴ Xozî ji wan ra ko bi şînin, çima ko aw dê bi dilê xo bîn pîrs¹²¹ bûn. ⁵ Xozî ji mahçûban ra çima ko awê mîras dê bigirin ardê. ⁶ Xozî ji wan ra ko birçî û tîn e ji sadaqat ra, çima ko wê dê tîr bin. ⁷ Xozî ji merhametlîyan, çima ko awê merhamet dê bibînin. ⁸ Xozî ji wan ra ko bidil paqij in, çima ko awê dê bibînin¹²² Xodê. ⁹ Xozî ji barûştî kroşan ra çima ko awê kure Xodê dê bîni gotan. ¹⁰ Xozî ji wan ra ko hatin qawirandin ji boy sadaqatê, çima ko padîşahîtiyê azümanan ji wan ra e. ¹¹ Xozî e ji wa ra kînga ko we serhevde dîkin wê diqewirînin û cîyê deraw her türî xaberê pîs dibên li ser we ji boyê min. ¹² Bikenin û şaz bin, çima ko ücretê wê li azümanan pîr e. Çima ko li av tarzê qewirandin ji wê awul bûn peyemberan.

¹³ Hûn in xoya ardê; lê erki xoy tahmê xo wunda bike, awê bi çi? xoy diba; ji vê pê va ji tiştî ra nayê, lê tenê derve avêtîne û bin lingê merûvan pêl kirîne. ¹⁴ Hûn in rohnîyê dinê; bajêrkî ko li ser çiyê sekinîne keşer bûn nayê. ¹⁵ Û çire vênaxin û danaynin li bin ölçegê, lê li ser şamdan û rohnî didi li hemîyan ki li mal da bûn. ¹⁶ Wusan bira rohnî bida rohnîyê wê li ber merûvan ko bibînin şixulê we qanc û şikir bikin ji Bavê wa ra ko li azümanda e.

[11] ¹⁷ Taxmîn mekin ki ez hatim qanûn û peyemberan xarab kirîne, nahatim xarab kirîne lê temam kirîne. ¹⁸ Bira dibêm ji wa ra hata kî azümanan û ard bibihurin, ji qanûnan û peyemberan yotakî ya noxtakî dê nebihori, hata hemî jî temam bibi. ¹⁹ Kî ko ji av piçûg tenbîhan yekê xarab diki û ji merûvan ra wusan hîn dike; awê piçûg dê bê gazî kirin li nav padîşahîtiyê azümanan. ²⁰ Ji wa ra dibêm erki sadaqatê wê ji sadaqatê xonidanan û farîsîan zêde nabi, dê nakevin li padîşahîtiyê azümanan.

¹²⁰ Di metnê de *fakîr*.

¹²¹ Di metnê de *pîrs*.

¹²² Di metnê de *ji bînin*.

21 Bihîstin ko ji awulan ra hati gotan: Qatl mekin, hama kî ko qatl dike ji şerat ra deyndar bibi. 22 Hama ez ji wa ra dibêm erki kî ko cîyê baçal ji brêyê xo ra diharidi, ji şerat ra deyndar dê bibe, û kî ko ji brêy xo ra ahmeq¹²³ dêje, ji civat ra deyndar dê bibe; û kî ko brêy xo ra aqilsiz dêje, ji agirê cehenem ra dê deyndar bibe. 23 Erki hedîyeyê xo tînî li ser mezbahê, û li wê bîra ta tê erki brêy ta haridîe li ser ta, 24 Ber[d]e hedîyeyê xo li ber mezbahê, hare awul bi brêy xo baruş bi, û paşê wêre ko hedîyeyê xo bidî. 25 Bi xismê xo ra zû va sulh be çiqas ki hûn li rê da ne nabiki¹²⁴, xismê ta, ta ji qadî ra teslîm bike, û qadî jî ji cellad ra li hapsê bêy ketin. 26 Bîra dibêm ji ta ra dê ranabî ji wê hata mangrê paşîn ada nakî.

27 Bihîstin ko hati gotan, zinê meke. 28 Hama ez ji wa ra dibêm erki kî ko ji jin ra nihêre bi dilê bijandinê, hênî aw li dilê xo da zinê kir bi wî ra.

29 Erki çahvê ta rast bi ta ra fitneyîti dida kirin awî biderxe ji xo û bavê ji xo; [12] çima ko qanc e ji ta ra ko ji azayan ta yek wunda bibi, û gövdeyê ta hemî naqave li cehenemê. 30 Erki destê ta rast ji ta ra fitneyîti dida kirin, awî bibir û bi xo bavêj, çima ko qanc e ji ta ra ko ji azayanê ta yek wunda¹²⁵ bibe, û gövdeyê ta hemî naqave li cehenemê. 31 Bîra hati gotan, Erki kî ko jina xo berdidi bira jê ra nivisê berdanê bide. 32 Hama ez dibêm ji wa ra, erki kî ko jina xo berdidi bê sebebê zîna, awê sebeb dibe ji zîna kirinê wî ra, û kî ko jinê berdan distîne zîna diki.

33 Dîsa hûn bihîsdin ko ji awulan ra hati gotan, Erki derew sond maxu, îlla sondê xo ada bike. 34 Hama ez ji wa ra dibêm qat sond mexun, na li ser azümanan ko kürseyê Xodê e. 35 Ê na li ser ard, ko cîyê danînê lingê wî e; û na li ser Qudsuşerîfê, ko bajêrê padîşahê mezin e. 36 Ê li ser serê xo sond mexu, çima ko niqarî mûkî spî bikî ya reş. 37 Ya xaberê wê bibi herê, herê, û na, na, û ji vî zêde ji yaramazê e.

38 Bihîstin ko hati gotan: Ji ber çahvan, çahv; û ji ber diranan, dran. 39 Hama ez dibêm ji we ra, ji yaramaz ra qarşî mesekinin; hama erki yekê dixa sîlekî li rûyê ta rast, vegeŕîne jê ra awê din jî. 40 Ê kî ko bi ta ra dawa diki û dixwazi bistîne kirasê ta, berde jê ra qaptanê xo jî. 41 Ê kî ko bi suxra ta mîlkî rê dibi, hara pê ra dido. 42 Ji ta xosdox ra bide, û rû mévegeŕîni ji wî ko dixwaze ji ta deyn bistîni.

¹²³ Di metnê de *ahmek*.

¹²⁴ Di metnê de ev peyv kêr in: *xismê ta, ta ji qadî ra teslîm bike*; (nîşeya wergêrê).

¹²⁵ Di metnê de *wuanda*.

43 Awa ko hûn behîsdin ko hati gotan, Havalê xo bihabîn, û ji dişminê xo îkrah bi ke. [13] 44 Hama ez ji wa ra¹²⁶ dibêm, bihubbin dişminê xo; ji we ra nifir krandoğan ra xêr dowa bikin û nimêc bikin li ser wan, ko ji we ra ezîyet dîkin û diqawirînin, 45 Hata ko bibin kuşê Bavê xo ko li azûmanda e, çima ko tavê xo didî erki li ser yaramazan û erki li ser qancan, û baran dişeyîni hem li ser haqan û hem li ser nehaqan. 46 Çima ko erki hûn wê habandoğan bihabînin, çi? ücretê wê heye, na kî gümrügcîan jî awî dîkin. 47 Nua hûn kâmil bibin, çawan ko Bavê wê ko li azûmanda e kâmil e.

SER 6

1 Saqin bibin ko tesaduqê xo li ber meşûvan nekin, ji boy ji wan ra nşan dayinê nabikî ücret negirin ji Bavê xo ko li azûmanda e. 2 A nwa kînga ko tesaduq didî li ber xo da zûna mede pîfîkin; çawan ko mûrayîyan dîkin li nav cematana û li kûçana da; ko ji meşûvan îkram bigirin. 3 Bira dibêm ji we ra, ücretê wan tenê aw e, hama tu kînga ko tesaduq dikî, destê ta çep bira nizana çi kirinê destê ta rast. 4 Ki tesaduqê ta dizîka bibe, û Bavê ta ko dizîka dibîna, awê ji ta ra bi aşîkar bedel dê bike.

5 Ê kînga ko nimêc dikî weka mûrayîyan nebî, ko dihubînin li nav cematana û li ser kûçana da nimêc kirin, ko ji meşûvan xuyayî bibin; bira dibêm¹²⁷ ji we ra, ücretê wan aw e. 6 Hama tu kînga ko nimêc dikî, bişev odayêt xo û deyin derîyêt xo, û nimê bike ji Bavê xo ra dizîka, û Bavê ta ko bi dizîka dibîne, awê ji ta ra bi aşîkar bedel dê bike. 7 Ê [14] kînga ko nimêc dîkin hûn, weka kifaran pîr xaberdan mebin, çima ko dibên qay ji boy pîr xaberdanê xo dê bîni bihîstin. 8 Nua hûn weka wan nebin, çima ko Bavê wê, ji we ra lazim bûn dizani, hûn hêja ji wî naxosdin. 9 A nwa hûn waha nimêc bikin.

10 Yâ bavê me ko li azûmanda y, navê ta azîz bibe; padîşahîtiye ta bê; meramê ta bibe, çawan ko li azûman da, wusan jî li ser ardê. 11 Nanê me hemû royan îro me ra bide.

12 Ê deynê me ji me ra baxş bike, çawan ko em jî baxş dîkin ji deyndaranê xo ra. 13 Ê me li tercubeyê mebe, lê ji şerê xalas bike, çima ko ê ta ye padîşahîti û quwwet û hamd ebedil ebed; amîn.

¹²⁶ Di metnê de *ua ra* (nîşeya wergêrê).

¹²⁷ Di metnê de *dibên*.

14 Çima ko erki hûn awf bikin qabahatê merûvan ji wan ra Bavê wê jî ko li azûmanda e ji we ra awf dê bike. 15 Lê erki hûn qabahatê merûvan afw nekin ji wan ra, Bavê wê jî ko li azûmanda e qabahatê we ji we ra afw nake.

16 Û kînga ko rocî digirin weka mûrayîyan melûl mebin, ki rûya xo xarab dîkin ko ji merûvan ra rocî girtoş xuyayî bibin, bîra dibêm ji we ra ücretê wan aw e. 17 Hama tu kînga ko rocî digrî, serê xo rûn bike, û rûyê xo bişû. 18 Ko ji merûvan ra rocî girtoş xuyayî nebî, lê ji Bavê xo ra dizîka, û Bavê ta ko dibîni dizîka, ji ta ra dê aşîkar bedel bike.

19 Li ser ardê ji xo ra xazna top mekin: li ko kî dîzan dikolînin û didîzin. 20 Lê li azûman da ji xo ra xazna top bikin; li ko kî ne gizûz û ne pas xarab dîkin, û ne dîzan dikolin û didîzin. 21 Çima ko xaznayêt we li ko kî e, dilê we jî dê li wê bibe.

[15] 22 Çireyê gövde çahv e erki çahvê te parlay e, gövdeyê te gişk rohnî dibe. 23 Hama erki çahvê te naqenc e; gövdeyê ta gişk tarî dibe; nua erki li ta da bûn rohnî tarî e, hênî aw tarî çîqas dê bibe.

24 Kesî nikare ji didu axaan ra xulamîtî bike; çima ko ya awê yekê dê nehubîne û awê din dê bihubîne, ya ji aw yekê ra îkram bike û ji yekê îkrah bike; nikarin ji Xodê ra û ji mamona ra xulamîtî bikin. 25 Ji boy vî dibêm ji we ra: ji boy nefse xo keder mexun erki hûnê çî dê bixun, ya çî dê vexun; ne jî ji boy bedenêt xo, erki çî dê wergirin; na? ki nefse ji taamê û gövde ji cil pêtir e? 26 Binêrin li tayrê azûmanan, ki ne dajon û ne diçînin, û ne li nav ambaran dicivînin, û Bavê we ko li azûman da ye taamê wan dide; na? ki hûn ji wan pêtir in? 27 A nwa, ji wê kî? dikare bi keder kşandinê xo li ser qametê xo halabîkî zêde bike? 28 Û ji boy wergirtin çima? keder dikişînin; binêrin li şûşana deştê, çawan mezin dibe, ne dişixule û ne dirêse. 29 Ji we ra dibêm, ko Süleyman jî li nav gişk îzzetê xo da weka ji wan yekî newergirt. 30 A nwa erki gişayê deşdê ko îro heye, û sibê awê bê avêtin li furûnê, Xodê wusan dide wergirtin, lê çîqas pêtir we, ey, îmanê hindik. 31 Ji vê pê va keder mexun bi gotinê, emê çî bixun ya vexun ya çî wergirin. 32 Çima ko hemî av tiştan kifaran dixwazin; zîra Bavê we ko li azûmanda ye dizane, ko av hemî tiştan ji we ra lazim in. 33 Awul padîşahîtiyê Xodê û sadaqatê wî bixwazin; û av hemî tiştan jî dê bê ji we ra dayin. 34 Ji vê pê va ji boy sibê xem mekişîn: çima **[16]** ko roya sibê ji boy xo awê xem bikîşîne; ji ro besê wî e derdê wî.

SER 7

¹ Hökm mekin, ko we ra hökm nabe. ² Çima ko, bi çi hökm bikin, bi wî dê bêni hökm kirin, û bi çi çap hûn çap bikin, bi wî dê bê ji we ra çapandin. ³ Çima? dinêrî qirşê nav çahvê brey xo, û li çahvê ta da kêranê nabînî? ⁴ Yaxod çawan dêjî ji brêy xo ra Berde qirşê ji çahvê ta derînim, û va ha li çahvê ta kêran heye. ⁵ Mûrayî, awul ji çahvê xo kêranê biderîne, û paşê tuyê binêrî ji çahvê brêy xo qirşê deranin.

⁶ Tiştê azîz ji san ra médin, û încuyê xo li ber xinzîran mávên, ko bin lingê xo pêl nekin wan û wegerin we biqatînin.

⁷ Bixwazin û ji we ra dê bê dayin, lê bigerin û dê bê bînin; derî lêxin û dê bê ji we ra vekirandin. ⁸ Çima ko her kî ko dixwazê, disdîni, û kî ko lê digere dibîni; û kî ko derî lêdixa, dê bê vekirandin jê ra. ⁹ Yaxod ji we kî meruv heye, ko ji wî kurê wî nan bixwaze, kevîr? dide jê ra. ¹⁰ Ê ya mahsî bixwaze, mahî dide jê ra. ¹¹ A nwa hûn ko yaramaz in, ji kurê xo ra baxşîşê qenc zanin dayin, çiqas pêtir Bavê wê ko li azûmanda ye, tiştê qenc dê bide ji wan ra ko jê dixwazin.

¹² Her çi ko dixwazin meruvan ji we ra bikin, hûn jî wusan bikin ji wan ra çima ko aw e nomos û peyemberan.

¹³ Ji deriyê teng herin hindur; çima ko fi- [17] ray aw derî, û mezin e aw rê, ko dibe hunda, û pîr in wan ko jê diçin. ¹⁴ Çima ko teng e aw derî, û teng e aw rê, ko dibe hayatê, û hindik in wan, ko dibînin wî.

¹⁵ Saqin bibin ji derew peyemberan, ko wan ji we ra tên bi cilê mîyan, hama ji hindûr va gurê har in. ¹⁶ Ji yemîşê wan hûnê nas bikin wan; meger ji îstirîan tîrî, ya ji îstirîyê mişkên hêjîl diçînin?. ¹⁷ Wusan jî hemî darê qanc yemîşê qanc dide, û darê çurug, kotî yemîş dide. ¹⁸ Darê qanc nikari kotî yemîş bide, û ne jî darê çurug yemîşê qanc. ¹⁹ Her dar ko yemîşê qanc nade tê birandin, û li nav agir tê avêtin. ²⁰ A nwa ji yemîşê wan hûnê dê nas bikin wan. ²¹ Her kî ko ji mi ra, Ya! Xoyî, ya Xoyî dêje, dê neçî padîşahîtiyê azûmanan; lê aw ko meramê Bavê min azûmanî tekmîl dike. ²² Wê royê pîr meruvan dê bêjin ji mi ra, Ya! Xoyî, ya! xoyî na ko bi navê ta, me peyemberîti kir, û bi navê te cinan me deranî; û bi navê ta pîr mucûzatan me kir. ²³ Ê wê çaxê dê bêjim ji wan ra, erki ez we, qa nas nedikiribûm, ji min dûr bin hûn hemîan jî ko yaramazîti dikirin.

²⁴ Kî ko aw xabêrê min dibihîse, û tekmîl dike wan, aw dimîna meruvkî aql, ko mala xo li ser zina çêkir. ²⁵ Baranan ketin, çeman rabûn, ban pif kirin û lêxistin li mal, û nehelweşîa; çima ko li ser zina qawî bûbû. ²⁶ Ê kî ko aw xabêrê min dibihîsi

û tekmîl neki wan, dimîna meruvkî aqlsîz, ko mala xo li ser qumê çekir. ²⁷ Baranan ketin, çeman rabûn, ban pîf kirin û xisdin li mal û helweşîa, û pîr mezin bû xara bûnê wî.

[18] ²⁸ Ê kînga ko Îsa temam kir av hemî xaberan, cematî mat dibûn li ser dersê wî. ²⁹ Çima ko, hokmet hîn dikir û na kî weka xonidanan.

SER 8

¹ Ê kînga ko aw ji çîyê hati xwarî pîr cemat çûn li pey wî. ² Ê va ha kotîkî hat, secde dikir ji wî ra û di go, Ya! Rabb, erki bixwazî, dikarî mi paqij kirin. ³ Îsa destê xo dirêj kir û xisd ji wî ra û go: Dixwazim, paqij bibe; û zû ve kotîyâtîyê wî paqij bû. ⁴ Ê Îsa go jê ra: Saqin bi ji kesê ra nebêjî; lê hêre, tu xo nişanê îmamê bide, û ji boy ji wan ra şehadetî bûnê hedîyê Mûsa bide.

⁵ Ê kînga ko ket li Gaparnayumê, yüzbaşîkî hat li ba lê, lava dikir jê ra, û digot: ⁶ Ya! Rabb, xulamê¹²⁸ min saqat li mal da vezelîae; pîr ezîyet dikîşîne. ⁷ Îsa cewab da jê ra: ez tîm û sax dikim wî. ⁸ Cewab da yüzbaşî û go, Ya! Rabb, ez layîq nin im ko tu li mala mi da bîkevî; lê tenê bi xaber bibêj, û dê sax bibe xulamê¹²⁹ min; ⁹ Çima ko e jî li bin emrê yek meruvkî im; û li bin emrê min asker heye, ji yekê ra dibêm, hêre, û diçê, û ji awê din ra wêre û tî; û ji xulamê xo ra, vîa bike, û dike. ¹⁰ Îsa kînga ko bihîst, taacib bû, û li pey wî çûndoxan ra go: Bîra dibêm ji we ra: li nav Îsrayel da wusan îman mi qat nedî. ¹¹ Ji we ra dibêm ko ji rohelatê û ji roavayê pîran dê bîn, li nav padîşahîyê azûmanan¹³⁰ dê ronin bi Îbrahîm, û Îsahak, û Yakob ra. ¹² Ê ewledê padîşahîyê awê dê rabin [19] tarîyê derve, li wê dê bibe girin û qirçînê dranan. ¹³ Ê Îsa ji yüzbaşî ra go: Hêre, û çawan ko ta îman anî, wusan bra bibe ji ta ra; û aw saatê rind bû xulamê wî.

¹⁴ Ê Îsa hat li mala Petros, dî ko xasûê wî ji tayê hati girtin vezelîabû. ¹⁵ Ji destê wî girt, û ta berda wî; li ser ling rabû, û xizmet dikir jê ra.

¹⁶ Kînga ko êvar bû, pîr bicinan anîn jê ra, û bi xaber deranî yaramaz¹³¹ rûhan û hemî naxoşan sax kir. ¹⁷ Ko temam bibe aw xaber, hati gotan bi destê Îşaya, peyember: Aw naxoşîyê me heland û hêşa me kişand.

¹²⁸ Di metnê de *xulûmê*.

¹²⁹ Di metnê de *xulemê*.

¹³⁰ Di metnê de *azûmandn*.

¹³¹ Di metnê de *yaramez*.

18 Îsa dor̄a xo pîr cemat bi dîtinê, emr kir ko wan alîyê din herin. 19 Û kâtîbkî hat û go jê ra: Ya! xoca, e jî li pey ta dê bêm; li ko ki herî! 20 Îsa go jê ra: Ji rûvîan ra lîs heye û ji tayrê azûman ra hêlîn heye; hama Qurê meruv ra cîkî tunne ko li wê serê xo deyne. 21 Û ji şagrdêt wî yek jî go jê ra: Ya! Rabb, ji mi ra îzn bide, ko herim awul bavê xo biveşêrim. 22 Îsa go jê ra, Wêre li pey min, û berde ji mirîan ra ko mrîyê xo biveşêrînin.

23 Û kînga ko ket li gemîyê, şagrdêt wî li pey wî çûn. 24 Û va ha li bahrê da mezin firtunakî bû, wusan ko gemî ji dalxa dihati veşêrandin, û aw radîza. 25 Û şagrdan çûn rakirin wî û gon: Ya! Rabb me xalas bike, çima ko va ha em wunda dibin! 26 Û ji wan ra go, Ey! hindik îmanan, çima? wusan tîrsok in wê çaxê rabû ji ba ra û bahir ra tazîl kir; û mezin rahatî bû. 27 Û meruvan taacib kirin, û digotin: Çawan? meruv e av, ko ban û bahr jê ra mûtêh dibin.

[20] 28 Û kînga ko li alîê din li welatê Kerkesyan bihurî; dido bicinan rastê wî hatin ji tirban rabûn, pîr her bûn, ko qa nadikaribû yekê ji wî rê da bibihure. 29 Û va ha gazî kirin û gon, Ya! Îsa Qurê Xodê, çi? şîxulê ta heye bi me ra; ji wextê ber¹³²? hatî me bixî li ezîyetê. 30 Û ji wan hinik dûr, garankî wehşan hebû, ko diçêrîan. 31 Û cinan lava dikirin jê ra û digotin, Erki me ji vir derdixî, emr bike ji me ra ko em herin li garanê wehşan. 32 Û go ji wan ra: Hêrin; û wan rabûn çûn li garanê wehşan, û garan gişk ji cîkî serdesd bazîan bahrê, û li nav avan mirin. 33 Û wehşan çêrandox jî revîan, û çûn li bajêr hemî jî hakandin, yanî aw şîxul ko bi cinan rast hat û va ha bajêr gîjk rabû li ber Îsa. 34 Kînga ko dîne wî lava kirin ko ji sînorê wan hare.

SER 9

1 Û ket li gemîyê, li alîyê din bihurî û hat bajêrê xo. 2 Û va ha kötrûmkî anîn jê ra, ki li nav cilê da vezeliabû; û Îsa îmanê wan bi dîtinê, ji kötrûm ra go, Güneyê ta ji ta ra awf bibin. 3 Û va ha hinik ji kâtîban li dilê xo da gon: Vîa dijmînan dike. 4 Îsa jî nîyetê wan bi zanîn go ji wan ra: Çima? li dilê xo da tiştê kotî difêkirînin. 5 Kîjan? rahat e, Güneyê ta ji ta ra awf bibin gotin?; ya, Rabe û biger gotin. 6 Hama wusan ko hûn bizanin; ko Qurê meruv hökmê wî heye li ser ardê ji güneyan awfîti dayin; (wê çaxê ji kötrûm ra go) Rabe, [21] bigir cilê xo û hare mala xo. 7 Û aw rabû çû mala xo.

¹³² Di metnê de der.

8 Cemat kînga ko dîn, taacib kirin; û hamd dikirin ji xodê ra: ko ji merûvan ra wusan hökmet dayîe.

9¹³³ Ê Îsa ji wê bi bihurtinê, merûvkî dî navê wî Madteos; ji boy gümrüg sendinê ronişdî bû; go jê ra: Li pey min were; û rabû li pey wî çû. 10 Ê bû kî li mal da li çaxê sufrê ronişdinê, va ha pîr gümrükcîan û günehkâran hat, û li sufrê da ronişdî bûn bi Îsa û şagrdê wî ra tev. 11 Ê farîsîan¹³⁴ kînga ko dîn, gon ji şagirdanê wî ra: Çima? xocayê we bi gümrügcîan û bi günehkâran dixo. 12 Hama Îsa kînga ko bihîst, go ji wan ra: Ji saxan ra hekîm ne lazim e, lê ji naxoşan ra. 13 Herin hîn bibin erki çî e aw xaber, tesaduq dixwazim, û ne qurban, çima ko ez nahatim¹³⁵ ewlîan gazî kirinê, lê günehkâran.

14 Wê çaxê şagirdê Hanna hatin¹³⁶ jê ra û gon: Çima? em û farîsîan pîr waqt rocî digirin û şagirdê ta nagirin. 15 Îsa go ji wan ra, Meger qabîl? e ko kûrê dawatan şîn bigirin, çiqas ko zava bi wan ra e; hama royan dê bîn, kînga ko zava ji wan bê girtin, û wê çaxê rocî dê bigirin. 16 Hem yekê falqayê cawê nû navêje li ser cilê kevî, çima ko aw, ko ji boy tîrîtyê hatiye datînin; digire ji cil, û qatandinê wî hênî pîr xarab dibe. 17 Na kî meyê nû li meşka kevînan da datînin; erki na meşkan diqatin¹³⁷, û mey dirîşe, û meşkan wunda dibin. 18 Lê meyê nû li meşkana nû da datînin û herdu jî tîn xodî kirin. 19 Kînga ko wî bi wan ra avî xaber dida, va ha yekê mezin hat, secde dikir jê ra û [22] digo, Nua qîzê min mir hama were destê xo li ser deyne, û awê bijî. 20 Rabû Îsa çû li pey wî bi şagrdê xo da tev.

21 Ê va ha dwanzdah salan xoyna wî çûndox jinkî hati ji pey va li pêşa wî ket. 22 Çima ko aw ji dilê xo da digo, tenê erki li cilê wî biqevim, sax dibim. 23 Hama Îsa, kînga ko li pey xo vegefa û wî dî, go: Metîrs, ya! qîz, îmanê ta ta sax kir; û jînik ji wî saatê sax bû.

24 Kînga ko Îsa hati li mala aw mezin, û dî zurnacîan û qalabalix ko şamata dikirin; go ji wan ra: Ji vê alî bin, çima ko qîz nemirîe, lê radize; û dikenîan li ser wî. 25 Ê kînga ko qalabalix derva bû; wî ket li hindur, girt ji destê wî; û qîz rabû. 26 Ê av xaber çû li hemî memleketê.

¹³³ Di metnê de „.

¹³⁴ Di metnê de *parîsîan*.

¹³⁵ Di metnê de *hetin*.

¹³⁶ Di metnê de *hetin*.

¹³⁷ Di metnê de *aiqatîn*.

27 Û kînga ko Îsa ji wê dibihurî, du kor ketin li pey wî lava dîkirin, û digon: Ey! kurê Dawûd, merahamet bike ji me ra. 28 Û kînga ko hati li mal, koran hatin jê ra; û Îsa go ji wan ra¹³⁸: Hûn înan dîkin? erki ez dikarim¹³⁹ av tiştê han ji wa ra kirinê. Gon jê ra Belê ya! Xoyî. 29 Wê çaxê ket li çahvê wan, û go: Weka îmanê¹⁴⁰ wê ji we ra bibe. 30 Û çahvê wan vebûn; û pîr tenbîh kir ji wan ra Îsa û go: Hêşar bin keskî nizanibe. 31 Hama wan rabûn li nav hemî aw memleketê xaberê wî dan.

32 Û kînga ko wan derve çûn, anîn jê ra lal bicin meruvkî. 33 Û kînga ko cin rabû lal xaber da; û civatan heyrî bûn, û gon, erki wusan tişt li nav Îsrayîl da qa nahati dîtin. 34 Hama farîsîan digotin, erki aw bi destê reysê cinan cinan derdixê.

[23] 35 Û Îsa digerrîa hemî bajarên û gundan, û li nav dêra wan hîn dîkir û waz dîkir mûjdeyê padîşahîtiyê, û sax dîkir hemî hîylan û naxoşîtiyê li nav cematên. 36 Û cematên bi dîtinê dilê wî şawutî li ser wan, çima ko raht û perîşan bûn weka bizinan ko şivanê wan tune. 37 Wê çaxê go ji şagirdê xo ra: Hasadan pîr in, hama palan hindik, a nua ji Xodîyê hasadan ra lava bikin, ko ji hasadê xo ra palayan biderxe.

SER 10

1 Û li ba xo bi gazî kirinê dwanzdah şagirdê xo, hokmat da ji wan ra li ser murdar cinan, wan derxistinê, û hemî hêşîtiyan û naxoşîtiyan sax kirinê. 2 Û navê dwanzdah resûlan¹⁴¹ av bûn: awulîn Şimhon ki hati gotan Pedros, û brêyê wî Andrîa, 3 Yaqûb kurê Zepetîa, û brêyê wî Hanna, Filîbbos, û Partulîmeos, Tovmas, û gümrügcî Madteos, Yaqûb Alfîan, û Xepeos, ki hati gotan Tateos. 4 Şimhon Kananî û Cûda Îsxarî, aw kî nebûyî¹⁴² lê kir. 5 Av dwanzdah Îsa şîhand, sipart ji wan ra, û go: Rêya kifaran meçin û bajarê Samariyan mekevin. 6 Hama bêtir¹⁴³ herin li bizinê wunda bûn mala Îsrayîl. 7 Û kînga ko diçin, waz bikin û bibêjin, erki padîşahîtiyê azümanan nêz e. 8 Naxoşan sax bikin uyuzan paqij bikin; cinan derxin; hûn belaş sendin, belaş bidin. 9 Li kemerê xo da ne zêr, ne zîv, ne baxir dameynin. 10 Ne ji boy rê tûr, û ne du cil; ne sol; ne çov; çima ko pala layîqê taamê xo e. 11 Kîjan bajêr ya gund¹⁴⁴ dike- [24] vin, pîrs bikin, erki kî e? layîq li nav wî da; û li wê bisekinin hata ko ji wê rabin.

¹³⁸ Di metnê de *ua ra* (nîşeya wergêrê).

¹³⁹ Di metnê de *dikdrim*.

¹⁴⁰ Di metnê de *îmane*.

¹⁴¹ Di metnê de *resûllan*.

¹⁴² Di metnê de *nebûjî*.

¹⁴³ Di metnê de *bêtir*.

¹⁴⁴ Di metnê de *gevnd* (nîşeya wergêrê).

12 Û kînga ko dikevin li mal silav bidin¹⁴⁵ jê ra. 13 Erki aw mal layîq e; silavê wê li ser wî bê, lê erki layîq nin i, silavê wê ji we ra vegere. 14 Û kî ko wê qabûl neke û xaberê wê godarî neke, kînga ko ji wî mal ya bajêr dertên, tozê lingê xo heldawêşînin. 15 Bîra dibêm¹⁴⁶ ji we ra, ji welatê Sotoman û Komoran roya qiyamê hênî rahat dê bibe, ji wî bajêrê.

16 Va ha ez wê dişeyînim weka mêyan li nav guran, nua weka mahran aql bibin û weka kavokan bêzarar bibin. 17 Hama ji meruvan saqinmiş bibin; çima ko dê wê ji civatan ra dê nebû bikin wan û nav dêrê wan dê wê bikutin. 18 Û li ber walîan û padîşahan dê bibin wê ji boy min, şahadetî kirinê ji wan ra û ji kifarên ra. 19 Hama kînga ko wê dest bidin, xem mexun, erki çawan ya çî dê xaber bidin, çima ko ji we ra dê bê dayin wî saatê, çî ko xaber bidin. 20 Çima ko, xaberdox hûn nin in, lê nav we da xaberdox Rûhê Bavê we e.

21 Nua brê, brê, û bav, kur ji mirin ra dê teslim bikin; û kurên li ser bavê xo dê rabin, û wan bikujin. 22 Ji hemîyan dê îkrah bibin ji boy navê min, hama aw, ko hata paşê sabr dike dê xalas bibe. 23 Û kînga ko wê li nav bajêrkî diqawirînin, li awê din birewin; û erki ji wê diqawirînin wê, bajêrê din birevin; bîra dibêm ji we ra bajêrê Îsrayîlîyan hûnê dê neqadînin, hata Kurê meruv bê.

24 Şagird ji xocayê xo û xazmetkâr ji axayê xo pêtir nin e. 25 Şagird ra weka xocayê xo û xaz- [25] metkâ ra weka axayê xo bibe bes e; erki ji xodîyê malê ra Beelzebûb gazî bikin, li ko? dimîne ji kufletê wî ra. 26 Nua ji wan metîrsin, çima ko tunna veşartin tiştîkî, ko awê aşîkâr nebe, û dizîka, ko dê neyê zanin. 27 Çi ko li tarî da ji we ra dibêm awî li rohnî da bibêjin; û çî ko li go da dibihîsdin, li ser xanîan waz bikin. 28 Metîrsin ji wan, ko leşê we diqujin, û kujtînê rûhan nikarin, lê hênî pîr ji wî bitîrsin hûn; ko dikare canê û leşê li nav cehenem da wunda kirin. 29 Du çûçîk yek pûlikkî nayê? frotan; hama wan yekê bê îznê Bavê wê li ardê naqeve. 30 Hama ê wê mûyê serê we jî gîjk hati jimartin. 31 Wusan e metîrsin; çima ko hûn ji pîr çûçîkan pêtir in. 32 Nua kî ko min li ber meruvan îqrar dike, e jî dê wî îqrar bikim li ber Bavê min ko li azûman da e. 33 Û min kî ko li ber meruvan înkâr dike, e jî wî dê înkâr bikim li ber Bavê min ko li azûmanda e.

34 Taxmîn mekin, ko ez hatim li ser ardê, selamet xistinê; selamet xistinê nehatim, lê şûr. 35 Çima ko meruv ji bav, û qîz ji dê, û bûk ji xesûê xo cîyê kirinê

¹⁴⁵ Di metnê de *bidrn*.

¹⁴⁶ Di metnê de *aibêm*.

hatim. ³⁶ Û dijaminê meruv kulfetê wî dê bibin. ³⁷ Aw ko bav, û dî ji min pêtir dihubîne, ji mi ra layîq nin e, û aw ko kur û qîzê xo ji min pêtir dihubîna ji mi ra layîq nîn e. ³⁸ Û aw ko xaçê xo nagire û li pey min nayê, ji mi ra layîq nîn e. ³⁹ Aw ko canê xo dibîne, dê wunda bike wî, û aw ko, canê xo wunda dike ji boy min, dê bibîne wî.

⁴⁰ Aw ko wê qabûl dike, min qabûl dike, û aw ko min qabûl dike, şîandoxê min qabûl dike. **[26]** ⁴¹ Aw ko peyemberkî bi navê peyember qabûl dike, ücretê peyember digire, û aw ko awlîaykî bi navê awlîay qabûl dike, ücretê awlîay distîna. ⁴² Û aw ko ji av piçûkan ra yekê tenê taskî ava sar bide vaxwarinê bi navê şagird bira dibêm ji we ra, ücretê wî wunda nake.

SER 11

¹ Û bû kî kînga Îsa tekmîl kir tenbihê dwanzdah şagirdê xo; çû ji wê li bajêrê wan waz kirinê û hîn kirinê. ² Û Hanna li hapsê da kînga ko amelê Mesîhê bihîsd bi destê şagirdê xo şîand, û go jê ra, ³ Tu î? aw, ko dê bihata, ya başqa yekê ra binêrin. ⁴ Cewab da Îsa û go ji wan ra: Herin û bihakînin ji Hanna ra, çî ko hûn dîn û bihîsdin. ⁵ Koran dibînin, û topalan digerin, uyuzan paqij dibin; û keran dibihîstin, û mirîan qiyam dikin; û ji faqîran ra încîl tê waz kirin. ⁶ Û xozîka li wî, ki li ser min xwar nabe.

⁷ Û kînga ko aw çûn, Îsa başlamîş kir ji cevabê ra gotinê ji boy Hanna. ⁸ Li çölê çî? tamaşa kirinê rabûn; ji bayê lerzan qamîşkî?; Hama çî? dîtinê hûn rabûn, bi nazîk cilan xamalandin meruvkî?; va ha nazîk cilan pêkiroşan li mala padîşahan da ne. ⁹ Lê çî? dîtinê hûn rabûn, peyemberkî, bira dibêm ji we ra, ji peyemberkî jî pêtir. ¹⁰ Çima ko vîa aw e ko ji boy wî hati nivîsandin: Va ha, ez elçiyê xo dê bişeyînim li ber rûyê ta, ki rêya ta hazir bike li pêşîa ta. ¹¹ Bira dibêm ji we ra, ji jinan zayoxan ji Tahwîlcî Hannayê mezin ranabûye, hama li nav padîşahîtiyê azümanan, **[27]** aw pîr piçûg, ji wê mezin e. ¹² Û ji gûna Tahwîlcî Hannayê hata nua padîşahîtiye azümanan bi zor di hate sendin û zorban zaft dikin wî. ¹³ Çima ko hemî qanûn û peyemberan hata Hanna peyemberîti kirin. ¹⁴ Erki dixwazin qabûl bikin, aw e Elîa, ko dê bihata. ¹⁵ Ji kê ra ko ji bihîstin ra go heye, bira godarî bike.

16 Ji kê ra? bişibînim qawmê han; dimîna zarûyan, ki li çarşîan¹⁴⁷ rodinin, havalê xo gazî dikan, û dibên: 17 Am zurna ji we ra pif kirin, û hûn neleyîzdin, û ji we ra me şîn kir, hûn negirîan. 18 Hanna hat ne dixwar û ne vedixwar, û dibên: Cin heye li nav wî. 19 Kurê meruv hat, dixo û vedixo, û dibên: Va ha pîr xwarox û serxoş meruvkî, dostê gümrükçyan û günehkâran; û îlm ji kurê xo tahqîq bû.

20 Wê çaxê başlamîş bû serhevde kirinê wan bajêran ko nav wan da pîr keremetê wî bûn; û toba nekirin. 21 Way? ji ta ra ey! Korazîn, way! ji ta ra, ey! Betsayîta; çima ko erki li nav Düros û Sîton bibana aw zor keremetan ki li nav we da bûn, ji zû va bi xarar û bi xolî dê toba bikirana. 22 Hama ji we ra dibêm, roya qiyametê ji Düros û Sîton ra ji we awê hênî rahat bibe. 23 Û tu ey! Kefernayum, ko hata li azümanan bilind bûy, hata cehenemê tuê bê xwarî; çima ko erki li nav Soţomê bibana aw zor keremetan, ki li nav ta da bûn, bîra ko hata av ro, dê bimîna. 24 Hama ji we ra dibêm, erki roya qiyamê ji welatê Soţomanan ji wê, awê hênî rahat bibe.

25 Li wî çaxê Îsa cewab da, û go, Şikir ji ta ey! Baba Xodî azümanan û ard; ki avî [28] ta veşart ji alîman û arîfan, û ji sabîan ra aşîkâr kir. 26 Belî, ya! Baba, çima ko li ber ta wusan qanc xuya. 27 Her tişt ji Bavê min ji mi ra teslîm bû; û yekê nas naki Kur, ji Baba zêdetir; û yekî nas naki Baba, ji¹⁴⁸ Kurê zêdetir; û aw ko Kur dixwaze jê ra aşîkâr kirinê.

28 Ey! hemî rahat bûn û bar bûn ji mi ra werin, ezê we rahat bikim. 29 Nîrê min li ser xo bigirin, û ji min hîn bibin ko ez mazlûm im û bi dil alçağ, û ji canê xo ra dê rahatî bibînin. 30 Çima ko nîrê min xoş e¹⁴⁹ û barê min sivik e.

SER 12

1 Wê çaxê da Îsa roya şemûyê ji nav zevîan dibihurîbû; û şagirdê wî birçî bûn, û dest kirin simbilê genimê qurufandinê û xwarinê. 2 Kînga ko farîsîan dîn gon jê ra, Va ha şagirdê te dikan çî ko li roya şemûyê cayîz nin e kirin. 3 Wî jî ji wan ra go, Hûn naxoyindine kirinê Dawûd; kînga ko birçî bû wî û aw ko pê ra bûn, 4 Çawan ket li mala¹⁵⁰ Xodê; û nanê huzûrê xwar; ko ne jê ra cayîz bû xwarinê û ne ji wan ra, ko pê ra bûn, lê tenê ji îmaman ra. 5 Yaxod li kanon da hûn naxoyindin?, ko îmaman roya şemûyê li nav dacar da şemûyê xarab dikan û bêsûc in. 6 Hama ji we ra dibêm li vir ji

¹⁴⁷ Di metnê de *çarşîdan*.

¹⁴⁸ Di metnê de *jî jî*.

¹⁴⁹ Di metnê de *xoşa*.

¹⁵⁰ Di metnê de *male*.

dacarê yekê mezin heye. ⁷ Erki hûn bizanibûna çi? gotin e: Tesaduq dixwazim û ne qurban, wê çaxê bêşûcan hûnê bisûc der dê naxisdana. ⁸ Çima ko Qurê meruv, xodîyê şemûê e. ⁹ Ê Îsa ji wê bi çûndinê, hati ket li dêra wan. ¹⁰ Ê li wê [29] destê wî hişk, yek meruvkî hebû; pîrs kirin ji wî û gon: li roya şemûyê sax kirin cayîz? e, ko jê gazinan bikin. ¹¹ Aw jî wi wan ra go: Ji we kî? meruv heye, ki bizinkî wî hebe, û aw li roya şemûyê li çalê bikeve, dê negire? û derxe wî. ¹² Nua çiqas! pêtr e meruv ji bizin; erki wusan e li roya şemû da qanc kirin lazim e. ¹³ Wê çaxê go ji wî meruv ra: destê xo dirêj bike; wî jî dirêj kir û rind bû weka din.

¹⁴ Hama farîsîan rabûn derve, li ser wî mişewre dikirin, erki çawan? wî wunda bikin. ¹⁵ Ê kînga ko Îsa zanî ji wê çû; û pîr cematan çûn li pey wî, û hemîan sax kir. ¹⁶ Ê tenbîh kir ji wan ra, ki ji keskî ra beyan nekin. ¹⁷ Erki bi destê Îşaya peyember hati gotan temam bibe, ¹⁸ Va ha xulamê min, ko mi bijart, û delalîyê min, ko canê min jê has kir; rûhê xo dê li ser wî deynim; û ji kifaşan ra şeraat dê xaber bide. ¹⁹ Ne dê nîza bike, û ne dê biqîre; û ne yekê dê bihîsi dengê wî li nav kûçan da. ²⁰ Qamîşê palixandî dê neşikîne, û bilbil fitilê dê natafine, hata ko şerîatê ji fath kirinê derxe; ²¹ û kifaşan ji navê wî ra dê umud bikin.

²² Wê çaxê kor û lal bicinkî anîn jê ra, û wî sax kir, wusan ko lal û kor xaber da û dî. ²³ Hemî cematan mat man, û digotin: Acab vîa e? Qurê Dawûd. ²⁴ Hama farîsîan kînga ko bihîsdin, gon: awî bi başqa tiştîkî dernaxe cinan, îlla bi reysê cinan bi Beelzepûl va. ²⁵ Kînga ko Îsa fikrê wan zanibû, go ji wan ra: Hemî padîşahîti li nav xo da hati cihê bûn, xarab dibe; û hemî bajêr ya mal li [30] nav xo da hati cihê bûn, namîna. ²⁶ Ê erki Şeytan, Şeytan derdixe; li nav xo da cihê bû; nua padîşahîtiyê wî çawan? dê bisekine. ²⁷ Ê erki ez cinan¹⁵¹ bi Beelzepûl derdixim, kurê wê bi çi? derdixin; ji boy wî, şeraatcîê we dê wan bibin. ²⁸ Hama erki ez bi Rûhê Xodê cinan derdixim; wusan e padîşahîtiyê Xodê li ser we gihîşdiye. ²⁹ Ya yekê çawa? dikare biqêvi li mala meruvkî mêr û malê wî bişêlîni, erki awul aw meruvê mêr girênedê, û wê çaxê¹⁵² mala wî yaxma bike. ³⁰ Aw ko bi mi ra nin e ziddê min e; û aw ko bi mi ra helneçîne, bela dike.

³¹ Ji boy vî ji we ra dibê: Hemî güneyan û kifran dê afw bibin ji meruvan ra; hama kifrê li ber Rûh el quds dê awf nebe ji meruvan ra. ³² Kî ko ji Qurê meruv ra

¹⁵¹ Di metnê de *ciman*.

¹⁵² Di metnê de *çaxê*.

tişt dibêja dê awf bibe pê ra¹⁵³, hama ji Rûh el qudus ra kî ko tişt dibêje¹⁵⁴, dê awf nebe jê ra; ne li vî dinê da, û ne li wê dinê da. ³³ Ya darê qanc bikin, û yemişê wî, qanc, ya darê çurug bikin û yemişê wî çurug; çima ko dar ji yemişê xo tê nas kirin. ³⁴ Ey! ewledê gorimahran çawan dikarin qanc xaberdan, hûn ko yaramaz in, çima ko ji zêdebûnê dilê xo dev xaber dide. ³⁵ Çima ko meruvê qanc; ji xazneyê dilê xo qanc, tiştê qanc derdixe, û meruvê yaramaz, ji xazneyê xo ji yaramaz, tiştê yaramaz derdixe. ³⁶ Hama ji we ra dibê, erki ji boy hemî xaberê nafîlan ko meruvan dîkin li roya qiyametê dê hasab bidin. ³⁷ Çima ko ji xaberê xo, tuyê dê sahîh bibî û ji xaberdana te dê li ser te hokm bibe.

³⁸ Wê çaxê hinik ji kâtîban û farîsîan cew- [31] ab dani jê ra, û gon: Ya! xoca, ji ta nşankî dixwazin bibînin. ³⁹ Wî cewab da û go ji wan ra: Yaramaz û zînakâr millet nşan dixwaze; û dê neyê ji wî ra dayin, ji nşanê Yûna peyxember pêtir. ⁴⁰ Çima ko, çawa Yûna sê ro û sê şav li zika mahsîyê ada da bû; wusan jî Qurê meruv dê bibe li nav zikê ardê sê ro û sê şavan. ⁴¹ Meruvê Nînûê li roya qiyamê li ber sîlsîleyê han dê rabin, û dê hokm bikin vîa; çima ko ji wazê Yûna, toba kirin; va ha livir ji Yûna yekê mezin heye. ⁴² Melîkê qublê roya qiyamê li ber vî sîlsîlê ra dê rabe, û wî dê hokm bike; çima ko aw ji perâ dinê hat, ki îlmê Süleyman bibihîsa; û va ha ji Süleyman mezin yekê heye livir. ⁴³ Ê kînga ko rûhê napak ji meruvkî tê der, cîyê bejîan da digere, rahatî dixwaze, û nabîne. ⁴⁴ Wê çaxê dibê, vegeşim dîsa li mala xo ji ko kî rabûm, û tê dibîni wî vala, paqij bûn û rast bûn. ⁴⁵ Wê çaxê diçû bi xo ra distîne haft hênî cinan ji wî pêtir yaramaz; û dikeve û li wê sakîn dibe; û sonê wî meruvê ji awulê wî xarab dibe; û wusan dê bibe av yaramaz sîlsîlê ra jî.

⁴⁶ Ê kînga ko aw bi cemat ra xaber dida, va ha dî û brêy wî li derva sekinîbûn, dixosdîn pê ra xaber dan. ⁴⁷ Ê yekê jê ra go: Va ha dî û brêy te derve sekinin û dixwazin bi ta ra xaber din. ⁴⁸ Wî jî ji wî ra gotox ra cewab da û go: Kî? e dîa min, yaxod kî? ne brêyê min. ⁴⁹ Ê destê xo alî şagirdê xo dirêj kir, û go: Va ha dîyê min û¹⁵⁵ brêyê min. ⁵⁰ Çima ko, kî ko meramê Bavê min azümanî dike, aw e brêy min û xuşka min û dîyê min.

¹⁵³ Di metnê de *bê ra*.

¹⁵⁴ Di metnê de *dibêja*.

¹⁵⁵ Di metnê de *sw*.

[32] SER 13

¹ Wê royê Îsa ji mal rabû û li kinarê bahrê da ronişd. ² Û pir li cemat li balê civandin; wusan ko wî ket li gemîyê û ronişd, û hemî cemat li kinarê bahrê da sekinin. ³ Û pir tiştan xaber dida ji wan ra bi temsîlan, û dîgo, ⁴ Va ha tovkiro x rabû, ko tov bike; û kîngî ko tov dikir, hinik li ser rê ketin û teyran hatin û xwarin wî. ⁵ Û hinik li cîyê qarac ketin, li ko kî pir harî tunna bû; ji kûrîtiyê harî tûnnabûnê, zû va şîn bû. ⁶ Kînga ko tav ket, germ bû, û ji qurm tûnnabûnê, hişk bû. ⁷ Û hinik ketin li navistirîan, û istirîan rabûn, û xaniqandin wî. ⁸ Û hinik li ardê rind ketin, û fêkî da, hinik sed û hinik şêst û hinik sî. ⁹ Ji kî ra ko ji bihîsdin ra go heye bira godarî bike.

¹⁰ Û şagirdê wî hatin, û gon jê ra: Çima bi temsîlan xaber didî bi wan ra. ¹¹ Wî jî cewab da, û go ji wan ra: Çima ko ji we ra hatiye dayin sirrê padîşahîtiyê azûmanan zanin, û ji wan ra nehatiya dayin. ¹² Çima ko ji kî ra, ko heye, ji wî ra dê bê dayin û dê zêde bibe; û ji kî ra ko tunna, aw ko heye jî dê bê sendin ji wî. ¹³ Ji boy vî bi wan ra bi temsîlan xaber didim; ko dibînin û nabînin, û dibihîsin û nabihîsin, û fehm nakin, ¹⁴ Û li ser wan tamam dibe peyemberîtiyê Îşaya, ko dibê: bi bihîsdinê dê bibihîsdin û ji bin dê fehm nekin; û bi dîtinê dê bibînin, û dê nebînin. ¹⁵ Çima ko, dilê qawmê han qalîn bû, û bi goyê xo giran bihîsdin, û çahvê xo girtin, ki ne bi ji bin bibînin, û bi go [33] bibihîsin, û bi dil fehm bikin; û vegeirin, û ez ji wan ra şîfa bidim. ¹⁶ Hama xozî e ji çahvê we ra, ki dibînin, û ji goyê we ra ki dibihên. ¹⁷ Bira dibê ji we ra ki pir peyemberan û sadiqan hasret kişandin dîtinê wê bibînin, û nedîn; û bihîsdinê wê bibihên û nebihîsdin. ¹⁸ Nua hûn temsîlê tov ajotox bibihîsin. ¹⁹ Ji ew hemîyan, ko xabê padîşahîtiyê dibihîse û fehm nake, yaramaz tê li nav dilê wî ajotan dişêlini, vî ew e ko li ser rê hati ajotan. ²⁰ Û li ser qaracê hati ajotan aw e ko kînga dibihîse xabê, zû va bi şazbûn qabûl dike wî. ²¹ Hama li xo da qurm tunne, hinik wax¹⁵⁶ diçû; û kînga ko ji boy wî xaber sixletkî ya qawirandinkî dibe zû va xwar dibe. ²² Û li navistirîan hati ajotan aw e ko kînga dibihîse xabê, ajxa vê dinê û xapxapokê zengînitîyê dixanîqîni xabê aw sözê û dibe bê yemiş. ²³ Û li nav ardê qanc hati ajotan aw e, ko kînga dibihîse xabê, fehm dike, û fêkî didi, hinik sed, hinik şêst, û hinik sî.

¹⁵⁶ Di metnê de *waxt*.

24 Ji wan ra hênî temsîlkî jî ber anî û go: padîşahîtiyê azümanan mîna bû ji meruvkî; ko li zevîyê¹⁵⁷ xo da tovê rind tov kir. 25 Û kînga ko merûvan xew da bûn, dişminê wî hat, û li nav genim da zîwan ajot, û çû. 26 Û kînga ko gîya şîn bû û meywe anî, wê çaxê zîwan jî xuyayî bû. 27 Xizmetkârê xodîyê malê hatin û jê ra gon: Ya! axa li zevîyê xo da tova rind ta neajot?; lê zîwan ji ko? bûn. 28 Û wî jî go ji wan ra: yek meruvkî dijmin kir wî; xizmetkâran jê ra gon, dixwazî ko em herin û aşêf bikin wî. 29 Û aw go ji wan ra: Na; [34] ki ne bi waxtê zîwan jêkirinê genim jî pê ra biçînin. 30 Berdin herdu jî ko li yek cî da mezin bibin hata waxta çîandinê, û wexta çîandinê dê bêjim ji çîndoxan ra: awul zîwanê biçînin, û wî patîl patîl girêdin ji şewutandin ra; û genim li ambara min bicivînin.

31 Hênî temsîlkî jî ber anî ji wan ra û go: Padîşahîtiyê azümanan mîna ye aw habê xardal ko meruvkî girt li zevîyê xo ajot. 32 Ko ji hemî tovan piçûk e, û kînga mezin dibe, ji hemî pencaran mezin e, û dar dibe wusan ko tayrê azümanan tînin, û li ser guliyê wî da datînin.

33 Başqa temsîlkî jî xaber da ji wan ra û go: Padîşahîtiyê azümanan mîna ye havîrê tîrşê ko jînkî girt li nav sê şînkî aran da veşart, hata ko hemî jî mîras bû.

34 Aw hemî bi temsîla xaber da Îsa bi cemat ra, û bê temsîl tiştî xaber nedida bi wan ra. 35 Ko ji peyemberê hati gotan temam bibe: bi temsîla ezê devê xo vekim ji temel¹⁵⁸ bûnê dinê aw tiştan ko hatin veşartin dê bêjim.

36 Wê çaxê Îsa cemat berda, û li mal hat; şagirdê wî hatin li balê, û gon: Temsîlê zîwanê zevîan ji me ra bihakîne. 37 Wî jî cewab da, û go ji wan ra, Tova qanc ajotox Kurê meruv e. 38 Û zevî dinê e; tova qanc wan in, ki Kurê padîşahîti ne; û zîwan kurê yaramaz in. 39 Û dijmin ko wî tov kir, Şeytan e; û bêder axirê dinê e; û çîndoxan melek in. 40 Û çawan ko zîwan tî civandin û li nava agir dişawutî axirê dinê jî wusan dê bibe. 41 Kurê meruv dê melekê xo bişeyini û dê bicivînin ji padîşahîtiyê wî hemî xwa- [35] rîtiyan û wan ko bînamûsîti dişixulin. 42 Û li nav külxanê agir dê bavêjin wan, li wê dê bibe girin û qirçiyê diranan. 43 Wê çaxê sadîqan weka ro dê tav bibin li nav padîşahîtiyê azümanan, ji kî ra ko ji godarin ra go heye bira godarî bike.

44 Dîsa padîşahîtiyê azümanan dimîna xaznakî ko li nav zevîkî hati veşartin; ko wî meruvkî bi dîtinê diveşêrine; û ji şazbûnê diço hemî tiştê xo difiroşe; û zevî dikire.

¹⁵⁷ Di metnê de *zeveyê*.

¹⁵⁸ Di metnê de *temîl*.

⁴⁵ Dîsa padişahîtiyê azümanan mîna yekî bezîrgan, ko li ser încuyê rîndan digere. ⁴⁶ Ê pîr bi qiymet încîkî bi dîtinê, çû hemî çî ko wî hebû fîrot û awî kirî.

⁴⁷ Dîsa, padişahîtiyê azümanan dimîna li bahrê hati avêtan torkî ko ji hemî cînsan dicivîne. ⁴⁸ Ko kînga ko tîja bû, deranîn li kenarê, û ronişdîn qancan li nav firaqan civandin, kötîyan li derve avêtin. ⁴⁹ Ahwa dê bibe li axirê dinê, melean dê rabin, û ji nava sadiqan yaramazan dê cîyê bikin. ⁵⁰ Ê dê bavêjin wan li külxanê agir, li wê dê bibe girin û qirçînê diranan.

⁵¹ Go ji wan ra Îsa: fehm kirin? av hemî tiştan; gon jê ra, Belî ya Xoyî. ⁵² Ê wî go ji wan ra: Ji boy vî, ji xusûsê padişahîtiyê azümanan her talîm bûn kâtîb ji xazney xo hem nû û hem kevin tiştan derxistox, ji yekî xodîyê malê mîna.

⁵³ Ê kînga ko Îsa temam kir va temsîla ji wê çû. ⁵⁴ Ê hat li welatê xo, hîn dikir ji wan ra, li nav cematê wan, wusan ko aw şaz dibûn û digotin: Av îlm û keremeta ji wî ra, [36] ji ko? bûn; ⁵⁵ Av kurê nacar nin? e, û dîyê vîa Meyrem nayê? gotan; û brêyê vîa, Yaqûb, û Hoses, û Şimhon, û Cûda. ⁵⁶ Ê xuşkê wî hemî li ba me nin? in?; nua ji vî ra av hemîyan ji ko? bûn. ⁵⁷ Ê xwar dibobûn li ser wî, û Îsa go ji wa ra, Peyxemberkî bê îtibar nin e, xayrî li nav welat û mala xo da. ⁵⁸ Ê li wê pîr keremetan nekir ji boy îmansizîê wan.

SER 14

¹ Wê çaxê Herodîsê rîb serwer navê Îsa bihîsd. ² Ji hizmetkârê xo ra go, Av tahfilçî Hanan e; û Ji mirîan qiyam kir; ji boy vî, bi wî kerematan dibin. ³ Çima ko, Herodîs ji boy Hîrodîa jinê brêyê wî Fîlîbos, girt Hannaê grêda wî û avêt li zindanê. ⁴ Çima ko Hanna digot, ji ta ra cayîz nin i wî bistînî. ⁵ Ê ji boy vî dixosd wî bîkujê, hama ji cematê ditirsîbû, çima ko weka peyember qabûl dikirin wî. ⁶ Kînga ko roya dawetê mewlûdê Herodîs bû, qîza Herodîs raqisand li ber dawatlîan; û¹⁵⁹ xoşa Herodîs hat, ⁷ Nua bi sond xwarinê söz da, erki bide jê ra çî ko xostinê bibe. ⁸ Ê awî ji awul ji dîyê xo nasîhat bûnê go: Bide ji mi ra livir serê Hannayê tafîlçî li ser sênîkî. ⁹ Ê padişah qasaawet kir; hama ji boy sondê û ji boy pê ra roniştoxan emr kir ko bidin jê ra. ¹⁰ Ê şîand li zindanê serê Hanna jê kir. ¹¹ Ê serê wî bi tevî sênî va hati anin û hati dayin ji qîzik ra, awî jî bir ji dîyê xo ra. ¹² Ê şagirdê wî çûn û leşê wî bi helandinê veşartin û hatin ji Îsa ra hakandin. [37] ¹³ Ê kînga ko Îsa bihîsd, ji wê bi

¹⁵⁹ Di metnê de sv.

gemîyê, çû li cîkî xalî; kînga ko xalq bihîsdin peya ji bajarê xo çûn li pey wî. ¹⁴ Û kînga Îsa rabû, pîr xalq dî, û rahm kir ji wan ra, û naxoşê wan sax kir. ¹⁵ Û li ber êvarê şagirdê wî hatin li balê, û gon: Livir cîkî çöyl e û waqt bihurî; xalqê berde; ko herin gûndan ji xo ra taam bikirin. ¹⁶ Îsa go, Lazîm nin e ji wan ra çûndin; hûn bidin ji wan ra xwarin. ¹⁷ Wan jî goni jê ra: Livir tiştî me tunne tenê pênc nan û du mahsî. ¹⁸ Û go ji wan ra, Bînin li vir. ¹⁹ Nua ji xalqê ra emr kir ko li ser gîyan bidin wan ronîşdandin, û pênc nanan û du mahsîyan girt û li azümanan nihêrt, û mübarek kir û şikênand û nanan da şagirdan û şagirdan ji xalqê ra.

²⁰ Hemî jî xwarin û têr bûn; dwanzdah sepet tîjî, ji zêdebûn parçan helanîn. ²¹ Û wan ko xwarin, ji jinan û zarûkan başqa, qasa pênc hazar mêr bûn.

²² Û şagirdan ra zor kir li gemîkî ketinê, li ber wî alîyê din biçun hata ko xalkê berde. ²³ Û kînga ko xalkê berda, wî tenê li çiyêkî rabû ji boy nimêc kirinê; û kînga êvar bû wî tenê li wê bû. ²⁴ Û gemî hama li orta bahrê li nava firtone bû; çima ko ba li qarşî bû. ²⁵ Û li şevê li nobetê çaran da, Îsa li ser bahrê bi çûndinê bi alî wan da hat. ²⁶ Û şagirdan kînga ko wî dîn ko li ser bahrê diçû bzdîan, û gon ko xeyal e, û ji tîrsan gazî kirin. ²⁷ Û zû va Îsa bi wan ra xaber da û go, Pêt bin, ez im; metîrsin. ²⁸ Petros cewab da jê ra û go: Ya! Xoyî erki tûy; emr bike ji mi ra li ser avê hanan ji ta ra bêm. ²⁹ Wî jî go, **[38]** Were, Petros jî, ji gemîyê hati xwarî, çû li ser avan û hati li ba Îsa. ³⁰ Û ba pîr zor bi dîtinê tîrsîa; û kînga ko batmîş dibobû gazî kir û go: Ya! Xoyî min xalas bike. ³¹ Û Îsa zû va destê xo dirêj kir; girt wî û go: Ey! hindik îman, çima? tu weswese bûy. ³² Û kînga ko rabûn li gemîyê, ba sakînî. ³³ Û aw ko gemî da bûn, hatin jê ra secde kirin û gon: bîra tu Xurê Xodê yî.

³⁴ Û bihurîn li alîyê din hatin li Kenesaretê. ³⁵ Û kînga ko meruvê li wê derê wî nas kirin, meruv şîandin li hemî sînoran; û nexoşan gîjk jê ra anîn. ³⁶ Û lava dikirin jê ra ko tenê li pêşa cilê wî bişevîn; û awan ko ketin hemî xalas bûn.

SER 15

¹ Wê çaxê Farîsîan û kâtîban ko ji Qudsuşerîfê bûn; hatin li ba Îsa û gon: ² Çima? şagirdê te siperê îxtîaran ra asî dibin; çima ko waqtê nan xwarinê destê xo naşûn. ³ Wî jî cewab da û go ji wan ra: Lê hûn? çima ji tenbîhê Xodê ra asî dibin bi semedê sipertinê we. ⁴ Çima ko Xodê bi tenbîh kirinê go, bav û diyê xo ra îkram bike, ⁵ Hem ji bavê ra ya ji diyê ra kî ko dijmîn bike; helbet awê dê bê kuştin. ⁶ Hama hûn dêjin: kî ko bav û diyê xo ra dêje, erki aw tişt ko dê ji min qazanc bikî; hedîye e,

ji vê pê va ji bav û dîyê xo ra îkram bira neke; ahwa ji semedê sip[ê]rtinê xo tenbîhê Xodê batâl dikin. 7 Ey! mürayîyan, qanc peyxemberîtî kir li ser wê Îşaya û go: 8 Av qawm bi lêvan ji mi ra îzzet dike, [39] hama dilê wan ji mi dûr in. 9 Nafîle ji mi ra îbadet dikin, ji merûvan tenbîh bûn talîman hîn dikin.

10 Ê cematî ji xo ra bi gazî kirinê go ji wan ra: 11 Godarî bikin û fehm bikin; aw ko li dev diçû merûv murdar nake; hama aw ko ji dev dertê; aw merûvan murdar dike. 12 Wê çaxê şagirdê wî hatin, û gon jê ra: Zanî? ko kînga ko farîsîan av xaberan bihîsdin xwar bûn. 13 Wî jî cewab da ji wan ra, û go: Aw hemî şax ko bavê min azûmanî da nanî de der bê. 14 Berdin wan; wan kor in ji koran ra qalawuz, kor kînga ko ji kor ra qalawuzîtî dike herdu jî li çalê dikevin. 15 Petros cewab da jê ra, û go: Av temsîla tarîf bike ji me ra. 16 Go Îsa: Hûn? jî hêja bê fehm in; 17 Ê fehm nakin?, erki hemî tişt ko li devê merûv diçû; diçû zikê wî; û tê der. 18 Hama ji dev hati der tiştan ji dil tîni der; wan merûvan murdar dikin. 19 Çima ko ji dil tîni der yaramaz fikran; qatlan, zînakârîtan, fahşîtan, dizîtan, deraw şahadatîtan, dijmînan. 20 Hemî van in ko merûvan murdar dikin; hama bi destê bê şûşdin nan xwarin, murdar nake merûv.

21 Ê ji wê rabû, li alîyê Dûrosê û Sîtonê çû. 22 Ê va ha ji wî sînoran Kananî jinkî rabû, gazî dikir û digot, Rahm bike ji mi ra ya! Rabb, Kure Dawûd; qîzikê min ji cinan pîr kûtî azab dikîne. 23 Hama wî cewab neda jê ra, û şagirdê wî hatin, û lava dikirin jê ra, û digotin: Berde vî çima ko li pey me diqîre. 24 Wî cewab da û go: ez ji başqa ra nehatim şîandin, îlla ji bizinê wun- [40] da ji mala Îsraîl. 25 Hama wî hat secde dikir jê ra û digot: Ya! Xoyî, ji mi ra îmdad bike. 26 Cewab da jê ra Îsa û go: tiştî qanc nin e nanê zarûkan girtin û ji san ra avêtin. 27 Ê awî go, Belî ya! Rabb; çima ko san jî ji sufreyê xodîy xo hati ketin ji hûrikê nan dixon. 28 Wê çaxê Îsa cewab da jê ra, û go: Ya! jin, îmanê ta mazin e; çawan ko dixwazî, wusan bira bibe ji ta ra, û ji wê saatê qîzê wî hati sax bûn.

29 Ê Îsa ji wê çû, hati li ba bahrê Celîlian û çîyêkî rabû, li wê ronîşd. 30 Ê pîr cematî hatin li balê; ko bi wan ra hebûn topalan, koran, lalan, saqatan, û başqa pîran; û avêtin wan li linga Îsayê û sax kir wan. 31 Wusak ko cematî tacib dikirin, ko didîtin ko, lalan xaber didan, topalan digerîan, saqatan dihatin sax bûn; koran didîtin, û ji Xodîyê Îsrayîl ra hamd dikirin.

32 Îsa şagirdê xo gazî kir ji xo ra û go Hayfa mi tê li ser vî xalqê; çima ko sê ro e ko li ba mi da ne, û tiştî wan tunna xwarinê, û wan birçî berdan naxwazim nebe ko rê da bixariqin. 33 Ê şagirdê wî jê ra gon: Li çolê da awqas xalqê têr kirinê, ji me

ra awqas nan ji? ko. ³⁴ Û Îsa ji wan ra¹⁶⁰ go: Çend? nanê wê heye; wan jî gon heft, û çend hab mahsî. ³⁵ Û emr kir ji xalqê ra ko li ser ardê ronin; [³⁶] û haft nanan û mahsîyan girt, şikir kir û şikênand; û da şagirdan; wan jî xalqê ra. ³⁷¹⁶¹ Xwarin hemîan û têr bûn; û haft zenbîl tîja ji zêdebûn parçan helanîn. ³⁸¹⁶² Û wan ko xwarin qasa çar hazar mêr bûn, ji jinan û **[41]** zarûkan başqa. ³⁹¹⁶³ Û kînga ko xalqê berda, li gemîyê suwar bû û hati li sînorê Maqtalî.

SER 16

¹ Û farîsîan û sadûqîan hatin li balê, bi carabandinê ji wî ji azûmanan nişankî dixostibûn ko nişan bide ji wan ra. ² Wî cewab da, û go ji wan ra, Kînga ko êvar dibe dibên, sayî dê bibe, çima ko azûman sor xuyaye.¹⁶⁴ ³ Û sibê îro hawa dê xarab bibe; çima ko azûman tarî sor e; nua rûya azûmanan dikarin tefûş kirinê; hama nişanê wê waqtê nakarin? bizanibinê. ⁴ Yaramaz û zînakâr sîlsîle nişan dixwaze; hama ji wî ra ji nişanê Yûna peyemberê pêtir nişan dê nayê dayin û berda wan û çû.

⁵ Şagirdan jî çûn li alîyê din, hama nan sendinê bîr kiribûn. ⁶ Go ji wan ra Îsa, Mêze kin û saqinin ji hevîrtirşê sadûqîan û farîsîan. ⁷ Wan jî li nav xo da dîşûmîş dibûn û digotin, Me nan neanî bi xo ra ji boy av e. ⁸ Hama Îsa dizanibû¹⁶⁵ û go, Li dilê xo da çima? dîşûmîş dibin, ey! hindik îmanan, erki nanê me tunne. ⁹ Hêja hûn fehm nakin? û bîra xo naynin pênc nanan, ji pênc ji pênc hazaran ra, û çend? sebet we helanî? ¹⁰ Û ne jî haft nanan, ji çar hazaran ra û çend? zenbîl wê helanî? ¹¹ Lê çima? hûn fehm nakin ko mi ji boy nan nego ji we ra ji hevîrtirşê sadûqîan û farîsîan saqinin. ¹² Wê çaxê fehm kirin ko ji boy hevîrtirşê nanê nego ji wan ra saqin bin, lê ji talîmê sadûqîan û farîsîan saqin bin.

¹³ Û Îsa hati li semtê Gesarîayê Fîlîbbosê; **[42]** ji şagirdan ra pîrs kir û digo, Ji boy min çi? dibên merûvan, erki kure merûv e. ¹⁴ Û wan jî gon: Hinikan dêjin, tahfilçî Hanna e; hinik, Elîa; hinikan jî Îrîmîa ya ji peyemberan yek e. ¹⁵ Go ji wan ra: hama hûn? ji boy min, kî im dibêjin. ¹⁶ Şimhon Petros cewab da û go: Tu yî Kure¹⁶⁶ sax Allah, aw Mesîh¹⁶⁷. ¹⁷ Îsa cewab û go jê ra: Xozî ji ta ra Şimhon kure

¹⁶⁰ Di metnê de *wan ja* (nişeya wergêrê).

¹⁶¹ Di metnê de ³⁶.

¹⁶² Di metnê de ³⁷.

¹⁶³ Di metnê de ³⁸ (nişeya wergêrê).

¹⁶⁴ Di metnê de *xuyeaye*.

¹⁶⁵ Di metnê de *bizanibû*.

¹⁶⁶ Di metnê de *Turê*.

Hovnan; çima ko ten û xoyn bi ƚa ƚa aşikâr nekir, lê Bavê min ko li azüman da ye. ¹⁸ Nua e jî ji ƚa ƚa dibê m ko ƚu Petros î û Kîlîsayê Xodê li ser vî zinarê dê çêkim û derîyêt cehenemê dê wî fath nekin. ¹⁹ Ê miftayêt derîyêt padîşahîtiyêt azümanan dê bidim ji ƚa ƚa, û çi ko li ser ardê girêdî, li nav azümanan dê bê girêdan; û çi ko li ser ardê vekî, li nav azümanan bê vekirin. ²⁰ Wê çaxê ji şagirdan ƚa pîr qawîti kir ko ji kesê ƚa nebêjin, ko wî Mesîh e.

²¹ Ji wê pê ve Îsa dest kir ji şagirdan ƚa nişan dayinê erki lazim e aw heƚa Qudsê û pîr ezîyetan bikşîne, ji baş îmaman û ji kâtîban û ji îxtîaran û bê kuşdin û roya sisêyan qiyam bigire. ²² Ê Petros wî li ba xo girt û dest kir pê ƚa bi zid çündinê û gotinê: Haşa ji ƚa ya! Xoyî av ƚişt bira ji ƚa ƚa nebe. ²³ Hama wî vegeŕîa Petros ƚa go: Li pey min heƚa ya! şeytan; ƚu ji mi ƚa xwarîti y çima ko ƚiştê însanan difikirî û ne ê Xodê.

²⁴ Wê çaxê Îsa ji şagirdê ƚa go: Erki yekî dixwaze li pey min bê, bira aw xo înkâr bike, û xaçê xo bistîne û li¹⁶⁷ pey min bê. ²⁵ Çima ko kî ko canê xo xalas kirin dixwaze dê wunda bike awî û kî ko ji boy min canê [43] xo wunda dike dê xalas bike wî. ²⁶ Nua çî fayde dike meruvkî, erki dinê hemî qazanc bike, hama canê xo wunda bike, yaxod bedelê canê xo dê çi? bide meruv. ²⁷ Çima ko Kûrê meruv bi îzzetê Bavê xo û bi melekêt xo dê bê; wê çaxê ji her kesê ƚa bi gora amelê xo dê ücret bibe. ²⁸ Bîra dibê m ji we ƚa: erki ji vir sekinandoşan hinikan hane, ko ƚahma mirinê dê nestînin, hata ko wan bibînin Kûrê meruv bi padîşahîtiyê xo hatin.

SER 17

¹ Ê paşê şeş royan da Îsa bi xo ƚa girt Petros; û Yaqûb û brêyêt wî Hanna; wan tenê bir li çîyekî bilind. ² Ê li ber wan da tebdîl bû; û rûya wî dipêla weka ro, û cilê wî sipî bûn weka ƚav. ³ Ê va ha Mûsa û Elîa xuyayî bûn ji wan ƚa; û pê ƚa xaber didan, ⁴ Cewab da Petros û go ji Îsa ƚa: Ya! Rabb, ji me ƚa livir bûn qanc e, erki dixwazî sê holikan em çêkin; yek ji ƚa ƚa, yek ji Mûsa ƚa û yek ji Elîa ƚa. ⁵ Ê kînga ko wî xaber dida, va ha rohnî awurkî wan sitir kir; ji awur dengkî hat, û go: Av e Kûrê min dalalî, ko jê haz dikim; ji wî ƚa godarî bikin. ⁶ Ê şagirdan kînga ko bihîsdin li ser rûya xo ketin, û pîr tîrsîan. ⁷ Ê Îsa nêzê wan bû, ket li wan û go: Rabin û metîrsin. ⁸ Ê wan wexta çahva xo vekirandinê ji Îsa pêtir keskî nedin.

¹⁶⁷ Di metnê de *Mesîa*.

¹⁶⁸ Di metnê de *lo* (nişeya wergêrê).

9 Û kînga ko ji çîyê dihatin xwarîyê, Îsa tenbîh kir ji wan ra û go: Av dîtin ji keskî ra mebêjin, hata Qurê meruv ji mirîan [44] qiyam bike. 10 Şagirdan jê ra pîrs kirin û gon: Çima? kâtiban dibên lazîm e ko awul Elîa bê. 11 Cewab da Îsa û go ji wan ra: Elîa dê bê, û hemî tiştan dê hazir bike. 12 Hama ji we ra dibêm ko Elîa ji zû va hatîye; û wî nas nekirin; lê çî ko xosdn jê ra kirin; wusan jî Qurê meruv dê ji wan ezîyet bikşîne. 13 Wê çaxê şagirdan fehm kirin ko ji boy tafîlçî Hanna go ji wan ra.

14 Û kînga ko li ba xalqê hati, meruvkî hat; û bi çok datîninê digot: Ya! Rabb, ji kurîkê mi ra rahm bike ko bi hîvê dikeve û kotî ezîyet dikşîne, pîr waqt li agir dikeve, û caran li nav avê. 15 Û awî min ji şagirdê ta ra anî, û nekaribûn sax bikin. 16 Û Îsa cewab da û go: Ey! îmansiz û ters sîlsîle, hata kînga ezê dê bi we ra bibim, hata kînga? dê ji we ra sabr bikim; ji mi ra bîne wî. 17 Û Îsa haridî li wî û cin ji wî rabû û ji wê saatê hati sax bûn kurîk. 18 Wê çaxê şagirdan tenê çûn li balê û gon ji Îsa ra: em çima? nekaribûn wî derxistin. 19 Û Îsa go ji wan ra, Ji boy îmansizîtiyê wê, nua erki weka habê xardel îmanê wê hebe, ji vî çîyê ra bibêjin, ji vir hare dê biço; û tiştê bê mûmkûn dê nebe bi we ra. 20 Hama av cîns bi hênî tiştê nayê der, îlla bi nimêc û rocî.

21 Û kînga wan li nav Celîlia digeriabûn; Îsa go ji wan ra: Qurê meruv destê meruvan dê teslîm bibe; 22 Û dê bikujin wî, û li sê royan da, qiyam dê bike; û pîr melûl bûn.

23 Û kînga ko wan li Kafarnayûmê hatin îkîlîk drem sandoşan hatin û ji Petros ra gon, Xocayê we îkîlîk drem nade?, û go wî: Belî [45] dide. 24 Û kînga ko ket li mal Îsa li şaqa wî hat, û go: Ya! Şîmhon, ji ta ra çawan? dixuya, padişahê dinê ji kî? distînin xarac û vergîyê; ji kurê? xo, ya xerîban. 25 Petros jê ra go, Ji xerîban; go jê ra Îsa, Erki wusan e kurîk azad in. 26 Hama ji wan ra ji boy xwar nedanîn; here li bahrê û çengel bavê û hamsîyê awul ko tê der bigir, û devê wî veke û dörtlükkî dê bibîn û awî bigir bide ji wan ra, ji ber min û ji ber ta.

SER 18

1 Ew royê şagirdan hatin li ba Îsa û gon, Acaba li padişahîtiyê azûman da kî mezin e? 2 Û Îsa zarûkkî xo ra gazî kir, wî li nav wan da sekînan, û go: 3 Bira dibêm ji we ra; erki hûn venegerin û weka zarûkan nebin, li padişahîtiyê azûmanan qa dê naqevin. 4 Nua kî ko xo weka zarûka han nizm dike aw e mezin li nav padişahîtiyê azûmanan. 5 Û kî ko zarûkkî ahwa bi navê min qebûl dike, aw min qebûl dike. 6 Û kî

ko xwar dike ji av piçûkan yekî, ko ji mi ra îman tîne, qanc e wî meruv ra, ko ji estoyê wî ra kevirkî aşê kerê bê aliqandin, û li bin bahrê da batmîş bibe.

7 Way! ji dinê ra ji sedemê xwarbûnê, zîra hatinê xwarbûnan lazim e ko bên, hama way! ji ew meruv ra ko bi destê ê kê xwarbûnan tîn! 8 Erki destê ta ya lingê ta ji ta ra fitneyîti dide kirin, bibir wî û ji xo bavêj; qanc e ji ta ra bi yek dest ya topal li hayatê ketin, na ko du dest û du ling hebûn, û li nav agirê ebedî ketin. 9 Hem [46] erki çahvê ta ji ta ra fitneyîti dide kirin, derxe wî û ji xo bavêj; qanc e ji ta ra bi yek çahv li hayatê ketin, na ko du çahv hebûn, û li agirê cehenemê ketin. 10 Saqinin ko ji av piçûkan yekê xarab mêze mekin; ji we ra dibêm ko li azûman da, melekê wan dayîm dibînin rûya Bavê min azûmanî. 11 Çima ko Qurê meruv hati wunda bûnan xelas kirinê. 12 Ji we ra çawan? xuyaye, erki ji yekê ra hebe sed bizin, û ji wan yek şaş bibe, not û neh bizinan li çîyan da bernade? û biça li dû wî şaş kirox? 13 Ê erki bibîni wî, bira dibêm ji we ra ko li ser wî hênî şaz dibe, na ko li ser aw not û nehan ko şaş nebûne. 14 Wusan jî bavê wê azûmanî, naxwazi ko ji av piçûkan yekê wunda bibe.

15 Ê erki brêyê ta ji ta ra günekî dike, heza tazîl bike wî, kînga ko tu û aw hûn tenê ne, erki ji ta ra godarî bike, ta brêy xo qazanc kir. 16 Lê erki ji ta ra godarî nake, bi xo ra yekê jî ya diduyan jî bistîn, çima ko ji devê du ya sê şahadan her söz isbat dibe. 17 Erki ji wan ra jî godarî nake? ji kîlise ra bibêj, Hama erki kîlise ra jî godarî nake; bra ji ta ra weka tayîfe û günekaran bibe. 18 Bira dibêm ji we ra: li ser ardê çi ko girêdin li azûman da dê bê girêdan; û li ser ardê çi ko vekin, li nav azûman da dê bê vekirin. 19 Dîsa dibêm ji we ra, erki ji wê du meruvan li ser ardê yek bibin ji boy hemî tiştan çi ko bixwazin dê bibe ji wan ra, ji Bavê min, ko li azûman da ye. 20 Çima ko, li ko kî du ya sê meruv hatin civandin bi navê min li wê mi ez li nav wan.

[47] 21 Wê çaxê Petros hat jê ra û go: Ya! Rabb, hata çend? caran erki ji mi ra güne bike brêy mi ji wî ra efw bikim; hata haft? caran. 22 Îsa go jê ra, Ji ta ra nabêjim erki hata haft caran, lê hata havtê caran haft.

23 Ji boy wî padîşahîtiyê azûmanan, dimîna padîşahkî, ko ji xizmetkaranê xo ra hasab sendinê xosd. 24 Ê kînga ko dest kir sendinê ji wî ra deh hezar talantan ra deyndarkî hate anîn. 25 Ê kînga ko qudrêtê wî tunnabû ada kirinê, axayê wî emr kir ko wî bifiroşin û jina wî kurêt wî û hemî tiştê wî û deynê wî ada bibe. 26 Ê xizmetkâr li ber wî bi ketinê, jê ra secde fikir û digot: Ya efendî, sabr bike ji mi ra û hemîan dê ada bikim; ji te ra. 27 Ê axayê wî ji xulamê xo ra bi rahm kirinê berda wî, û deynê wî

baxş kir jê ra. ²⁸ Hama aw xulam derket, ji haval xulamanê¹⁶⁹ xo yekê dî ko jê ra sed dînanan ra deyndar bû; girt wî dixaniqand û digot, Ada bike ji mi ra deynê xo. ²⁹ Nua quldaşê wî li linga wî ket, lava dikir û digot: Sabr bike ji mi ra, û hemî jî ji ta ra ada bikim. ³⁰ Hama wî nedixosd lê çû haps kir wî; hata ko deynê xo ada bike. ³¹ Kînga ko quldaşê wî dîn av tiştan, pîr melûl bûn, û çûn ji efendîyê xo ra hemî tiştê bûn beyan kirin. ³² Wê çaxê axayê wî gazî kir wî, û go: Ey! yaramaz qul ji mi ra ji boy lava kirinê ta, aw hemî deyn mi ji te ra baxş kir. ³³ Nua ji ta ra jî lazim nebû? ji quldaşê xo ra rahm kirin çawan ko mi ji ta ra rahm kir. ³⁴ Ê efendîyê wî li ser wî bi sê hatinê ji caladan ra wî teslîm kir, hata ko hemî deynê [48] xo ada bike. ³⁵ Wusan jî Bavê min azûmanî dê bike ji we ra erki ji dilê xo afw nekin her yek ji brêyet xo ra qabahetê wan.

SER 19

¹ Ê bû kî kînga Îsa ev xaberan temam kir, ji Celîlê rabû li alîyê Yehûdîstan li wî alîyê Hortanê hat. ² Ê li pey wî pîr xalq çûn, û li wê sax kir wan. ³ Ê farîsîan jê ra hatin wî diceribandin, û digotin, Cayîz? e ji yekê ra ji boy hemî sebebên jina xo berde. ⁴ Ê wî cewab da ji wan ra û go: Hûn naxondin ko aw ko ji awil xalq kir nêr û mê xalq kir wan, û go. ⁵ Ji boy vî merûv dê bav û diyê xo berde, û li pey jina xo hare, û herdu dê yek tên bibin. ⁶ Wusan e hênî dido nîn in, lê yek ten; nua cot kirinê Xodê hênî merûv bira cîyê neke. ⁷ Goni jê ra, Nua çima? Mûsa talaqname bi dayinê wî berdan tenbîh kir? ⁸ Go ji wan ra, Mûsa ji boy hişkîtiyê dilê we, ji we ra îzn da jinê xo berdanê, hama ji îbtîda¹⁷⁰ wusan nebû. ⁹ Hama ez ji we ra dibêm, kî ko ji sebebê faşîtiyê başqa, jina xo dixê û başqakî digire, zîna dike, û kî ko aw hati berdan digire, zîna dike. ¹⁰ Şagirdê wî goni jê ra, Erki li nav mêr û jin wusan qarar¹⁷¹ heye, nezewucin qanc e. ¹¹ Ê wî go ji wan ra, Qudretê hemîyan nabe ji av tişt ra, lê wan, ji kî ra ko hati dayin. ¹² Çima ko hane xadiman ko ji rahma diyê xo wusan zane; hane xadiman, ko ji merûvan xadim bûn, û hane xadiman ko ew xo xadim kirin, ji boy padîşahîtiyê azûmanan, qudretê kî ko dibe bira bibe.

[49] ¹³ Wê çaxê jê ra zarûkê piçûkan hati anîn, ko li ser wan dest deyne û duwa bike; û şagirdê wî tazîl dikir wan ra. ¹⁴ Îsa go: Berdin zarûkan û mealqînin wan

¹⁶⁹ Di metnê de *xulumanê*.

¹⁷⁰ Di metnê de *iftîda*.

¹⁷¹ Di metnê de *zarar*.

ji mi ra hatinê çima ko padîşahîtiyê azümanan weka wan ra e. ¹⁵ Û li ser wan paşê dest daftîninê, ji wê çû.

¹⁶ Û va ha yekê hati jê ra û go: Ya! xocayê qanc; çi? qancîti bikim ko ji ebedî hayat ra malik bibim? ¹⁷ Wî jî jê ra go: Ji mi ra çima? qanc dêjî; ji Xodê başqa keskê qanc tunne, hama erki li ebedî hayatê ketin dixwazî tenbîhan bigir: ¹⁸ Wî go jê ra: Kîjanan?; Îsa go jê ra, Vanan: Qatil meke, û zîna meke, û Dizî meke û Deraw şahadetî meke. ¹⁹ Û bav û diyê xo ra îkram bike; û Havalê xo weka nefse xo bihubîn. ²⁰ Aw xort go jê ra, Van hemîan ji piçûktîyê ber mi girtîa; nua hênî çi? kêmanîyê min heye. ²¹ Îsa go jê ra, Erki dixwazî tekmîl bûn, hare warîyetê xo bifroş û bide ji faqîran ra; û ji ta ra li azüman da xezne dê hebe, û were li pey min. ²² Nua wî xortê av xaberan ki bihîst melûl çû, çima ko pîr warîetê wî hebû.

²³ Û Îsa ji şagirdan ra go: Bîra dibêm ji we ra: erki merûvê zengîn bi pîr ezîyetan dê bikeve li padîşatîtiyê azümanan. ²⁴ Dîsa dibêm ji we ra, erki qolay e deve ji qula derzîyê biço, na kî zengîn bikevi li padîşahîtiyê azümanan. ²⁵ Û kînga şagirdê wî bihîsdin pîr acibandin û gon: Nua kî? dikare xalas bûn. ²⁶ Îsa nihêrt ji wan ra û go: Av ji alîyê merwan bê mûmkûn e, hama li ber Xodê mûmkûnê hemî tiştan heye. ²⁷ Wê çaxê Petros cewab da jê ra, [50] û go: Va ha em hemî tiştan berdan û li pey ta hatin; nua ji me ra dê çi bibe? ²⁸ Go ji wan ra Îsa: Bîra dibêm ji we ra erki hûn ko li pey mi hatin, kînga ko Kurê meruv dîsa bê li ser taxtê îzzetê xo ronî, hûn jî li ser dwanzdah taxtan dê ronin dwanzdah sîlsîleyê Îsrayîl hökm kirinê. ²⁹ Û kî ko berda mal, ya birê, ya xuşkan, ya bav, ya dê, ya jin, ya zarûkan, ji boy navê min, sad qatan dê bigire, û hem ebedî hayatê dê mîras bigire. ³⁰ Hama pîr awulan dê bibin paşin û paşinan awulîn.

SER 20

¹ Çima ko padîşahîtiyê azümanan ji yekê xodîyê malê mîna, ko sibê zû rabû ji rezê xo ra palayan girtinê. ² Û bi palayan ra royê dînarkî qawl kir; û wan şîand li rezê xo. ³ Û saat sisêan da nêz rabû, başqasîan dî, ko li nav çarşîan da baçal sekinîbûn, ⁴ Û go ji wan ra, Hûn jî herin li rezê min, û çi ko haq e ji we ra didim. ⁵ Wan jî çûn; dîsa saat waqta şeşan û nehan da rabû, wusan kir. ⁶ Û saat waqta yanizdan rabû, başqa baçal palayan dî, ko baçal sekinîbûn; go ji wan ra jî: Çima? ro hemî livir baçal sekinîn. ⁷ Goni jê ra, Ji boy wî ki me yekê bi ücret negirt; go ji wan ra: Herin hûn jî li rez, û çi ko haq e dê bistînin. ⁸ Û kînga ko êvar bû, xodîyê rez ji kedxüdayê xo ra go: Palayan

gazî ke û ücretê wan bide, ji paşînan dest bike hata awulîan. ⁹ Ê kînga ko hatin wan ko saat yanizda waqtan çûbûn, yek [51] yek dînar sendin. ¹⁰ Ê awulîan hatin taxmîn dikirin ko dê hênî zêde biştînin, hama wan jî yek yek dînar sendin. ¹¹ Ê kînga ko sendin ji xodîyê malê ra gazinan dikirin, û digotin, Erki av paşînan yek saat şixulin. ¹² Ê wan bi me ra ta barabar kir ki me giranîtiyê ro û germîtiyê wî kişand. ¹³ Ê wî cewab da ji wan yekê ra û go: Ya! dost, ez ji ta ra naheqî nakim; na? tu bi mi ra ji yek dînar ra qawl kir. ¹⁴ Bigir a xo hara, ez dixwazim ko av paşînan ra qasa ko mi da ji ta ra bidim wan. ¹⁵ Çima rusqatê min tunne? li ser malê min, çawan ko bixwazim kirinê; ya ji boy cömerd bûnê min çahvê ta yaramaz? e. ¹⁶ Ahwa paşînan dê awulîan bibin û awulîan paşînan; çima ko dawetlîan pîr in, hama bijartîan hindik.

¹⁷ Ê Îsa kînga ko li Qudsê diçû dwanzdah şagirdê xo bi xo ra girt tenê û li rê da go ji wan ra, ¹⁸ Va ha em Qudsê diçin, û Qurê meruv dê teslîm bibe ji baş xaxaman ra û ji kâtîban ra; û li ser wî mirin ra dê hökm bikin. ¹⁹ Ê ji kifaran ra dê wî teslîm bikin, ji boy mazqara kirinê û kutanê; û xaçê biderînin; û roya sisêan dê qiyam bigire.

²⁰ Ê wê çaxê di yê kurêt Zepetîa bi tevî kurêt xo hati jê ra, û secde dikir, û dîlekê dikir ji wî. ²¹ Wî jî go jê ra, Çi? dixwazî; Go jê ra, Bêje ki av herdu kurêt min li nav padîşahîtiyê ta da yekê li saxê ta û yekê jî li alîyê çapê te ronîn. ²² Ê Îsa cewab da, û go, Hûn nizanin çi dîlek dîkin; dikarin vexûn aw kâsik ko ezê dê vexûm, ya ji tahfilê tahfil bûn, ko ezê tahfil bibim; Goni jê ra, em dikarin. ²³ Ê wî go ji [52] wan ra, Kâsikê min hûnê vexûn, û bi aw tahfilê ko ezê dê bêm tahfil bûn hûnê dê tahfil bibin, hama li destê sax û çep ronîşdin, ê min nin i dayin, lê ji wan ra ko ji Bavê min hati hazir bûn. ²⁴ Ê kînga ko aw deh şagirdan bihîsdin sê hatin li ser wî du birêyan. ²⁵ Ê Îsa wan ji xo ra gazî kir û go: Hûn dizanin ko serdarê mîlletan hökmat dîkin li ser wan, û mezinê wan li ser wan zabîti dîkin. ²⁶ Hama li nav we da wusan, dê nebe, lê li we da kî ko mezin dixwaze bûn, bira xizmetkârê wê bibe. ²⁷ Ê li we da kî ko dixwaze pêşîn bûn, bira xizmetkârê wê bibe. ²⁸ Ê çawan ko Qurê meruv nehati ko jê ra xizmet bibe, lê xizmet bike, û canê xo ji boy pîran bedelê bide

²⁹ Ê kînga ko wan ji Erîkovê rabûn, pîr xalq li pey wî çûn. ³⁰ Ê va ha li ser rê du kor ronîşdî bûn; kînga ko bihîsdin Îsa dibihurî, qîrî[n] kirin, û gon, Rahm bike, ji me ra, ya! Qurê Dawûd. ³¹ Ê xalqê tazîl dikir ji wan ra, ko hûs bin, hama wan hênî pîr diqîrabûn û digotin: Ya! Rabb Qurê Dawûd rahm bike ji me ra. ³² Ê Îsa sekinî

gazî kir wan û go: Çi dixwazin ko ji we ra bikim. ³³ Goni jê ra, Ya Rabb, çahvê me vebin. ³⁴ Ê Îsa bi rahm kirinê ket li çahvê wan; û zû va dîn û li pey wî çûn.

SER 21

¹ Ê wan kînga ko nêzê Qudsuşerîfê bûn, û hatin Petpake nêza çîyayê Zeytûn, wê çaxê Îsa dido ji şagirdan şîand. ² Ê go ji wan ra, [53] Herin li ber we da aw qasaba; û zû va dê bibînin kerkî hati girêdan, û cahşkî pê ra; û wan vekin û bînin ji mi ra. ³ Ê erki yekê ji we ra tiştê dêje, bêjin, Van ji Rabb ra lazim in; û zû ve dê wan bişeyîne. ⁴ Hama av tiştan bû; ko sêze peyxemberê tamam bibe, ko dêje: ⁵ Ji qîzê Sîon ra bêjin, va ha padîşahê ta ji ta ra tê, halîm û li kerê hati swar bûn; û li ser cahşê kerê. ⁶ Ê şagirdan çûn û çawan ko Îsa ji wan ra emr kir, kirin; ⁷ Ê anîn kerê û cahşê kerê, û li ser wan cilê xo raxisdin û ronîşd li ser wan. ⁸ Ê pîran ji xalqê cilêt xo li ser rê raxisdin, û başqan ji daran gulîan dibîrandin û li ser rê radixisdin. ⁹ Ê qalabalix ko ji pêş û ji paş diçûbûn, diqîrabûn û digotin, Osanna Kurê Dawûd ra, mûbarek e aw ko bi navê Xodê tê; li pîr bilindan Osanna.

¹⁰ Ê kînga ko wî ket li Qudsê bajêr hemî lerzîan û digotin, Kî? e vîa. ¹¹ Ê xalqê gotin, Vîa Îsa peyxember e, Ji Nazaretê Celîlê.

¹² Ê Îsa ket li dacarê û derxîsd wan hemîan ko li nav dacar da difrotibûn û dikirîbûn; dezgehê sarrafan û kursîyêt kevok frotoxan quliband; ¹³ Ê go ji wan ra, hati nivîsandin, Mala min, mala nimêcê dê bê gotin, hama hûn mîxarayê dîzan kirin wî. ¹⁴ Ê li dacar da hemî koran û topalan jê ra hatin û sax kir wan. ¹⁵ Ê kînga ko baş xaxaman û kâtîban, hati kirin kerematan dîn, û zarûkê piçûkan ko li nav dacar da gazî dikirin û digotin: Osanna ji Kurê Dawûd ra sê hatin. ¹⁶ Ê goni jê ra: dibihîsî?, çî? dibêjin van?; go [54] ji wan ra Îsa, Belî; Qa? hûn naxoyndin, erki ji devê sabîyan û şîrxwaran ta medh îcad kir.

¹⁷ Ê wan berda ji bajêrê derva li Petanîyê rabû û şevê li wî sekinî. ¹⁸ Ê sibê da kînga ko dîsa vegerîa li bajêr, diçûbû. ¹⁹ Ê li ser rê darkî hêjîl dî çû li balê, û ji pelê başqa tiştê ne dî ser; û go, Ji vî pê va hênî ji ta yemiş nebe; û ji wî saatê darê hêjîl hijk bû. ²⁰ Ê kînga ko şagirdan dîn, mat man û gon, Erki darê hêjîl çawan! zû hişk bû. ²¹ Ê Îsa cewab da û go ji wan ra: Bîra dibêm ji we ra, erki îmanê wê bibe û şîfe nekin, na tenê madeyê av darê hêjîl dîkin, lê ji av çîyê ra jî bêjin rabe û li bahrê bîkev dê bibe. ²² Ê çî ko li nimêc da bi îman dîlek bikin dê bistînin. ²³ Ê gava ko hati li dacarê, baş xaxaman û mezinê civatan jê ra hatin kînga ko hîn dîkir, û go[n]: Tu bi

çi? hökmata av tiştan dikî; û kî? da ji ta ra av hökmata. ²⁴ Cewab da Îsa û go wan ra: A jî ji wê tiştî pîrs bikim, erki awê ji mi ra bêjin, e jî ji we ra dêjim bi çi hökmata av tiştan dikim: ²⁵ Tahfil kirinê Hanna ji ko? bû, ji azümanan? ya ji merûvan; û wan li nav xo da difikirîbûn û digotin: ²⁶ Erki bêjin ji azümanan, ji me ra dê beje Lê çima? îman nayînin; û erki bêjin ji merûvan, ji civat ditîrsin, çima ko hemî jî Hanna weka peyember qebûl dikin. ²⁷ Ê cewab dan ji Îsa ra û gon: Em nizanin; û wî jî ji wan ra go, A jî ji we ra nabêjim ko bi çi hökmata av tiştan dikim. ²⁸ Ê ji we ra çawan? dixuya; ji yekê ra du kur hebû, û çû ji awulîn ra go, Ya! **[55]** Kurê min, îro hare li rezê bişixul. ²⁹ Ê wî cewab da û go: Diçim ya efendî; û neçû. ³⁰ Ê ji awê din ra çû, û wusan go; awî cewab da û go: Naxwazim çûndin; Hama paşê poşman bû, û çû. ³¹ Nua ji av herdu kurê kîjan? meramê bavê xo îcra kir; goni: Aw paşînê; go ji wan ra Îsa: Bira dibêmin ji we ra; erki gümrügcîan û zînakâr jinan ji wê awul dê biçin li padîşahîtiyê azümanan. ³² Çima ko Hanna ji we ra bi rêya sadaqetê hat, û hûn jê ra îman neanîn; hama gümrügcîan û zînakâr jinan jê ra îman anîn, û hûn dîn û toba nekirin jê ra îman aninê.

³³ Ê başqa temsîlkî jî bibihên, yek xodîyê malê merûvkî hebû ko rezkî danî; û dorê wî perçîn kir, û li nava wî da mahserekî kola; û çardaxkî çêkir; û da destê palayan wî; û çû qurbetê. ³⁴ Ê kînga ko waxta yemîşê hat xizmetkârê xo şand ji başvanan ra ko yemîşê wî bistîne. ³⁵ Ê başvanan xizmetkârê wî girtin; yekî kutan, yekî kuştin, yekî kevîr kirin. ³⁶ Dîsa ji awul pîr xizmetkâran şand û ji wan ra jî wusan kirin. ³⁷ Ê paşê Kurê xo şand ji wan ra û go, Belkî dê şerm bikin ji kurê min. ³⁸ Hama başvanan kînga ko dîn kurê wî, li dilê xo da gon, Vîa e meresxor; werin vîa bişujin û mîrasê wî zabt bikin. ³⁹ Ê girtin wî ji rezê derva deranîn, û kuştin. ⁴⁰ Nua kînga ko xodîyê rezê bê, aw başvanan ra dê çi? bike. ⁴¹ Ê goni jê ra Aw kötîyan kötî dê helak bike, û rezê dê başqa başvancîan ra bide, ko li wextê da yemîşê wan bidin jê ra. ⁴² Go ji wan ra Îsa, Ka hûn naxoyndin li nav kitêb, Aw kevîr ko ji **[56]** yapîcîan redd bû; awî serîyê ruknê diwar bû; aw ji Xodê bû; û li ber çahvê me acêb e. ⁴³ Ji boy wî ji we ra dibêmin; ko padîşahîtiyê Xodê ji we dê bê sendin û ji mîletkî ra dê bê dayin, ko yemîşê wî bîne. ⁴⁴ Ê kî ko li ser wî Kevîrê bikeve dê bişikî û li ser kî ko bikeve dê xurdûxaş bike wî. ⁴⁵ Ê kînga ko baş xaxaman û kâtîban û farîsîan temsîlê

wî bihîsdin fehm kirin ko ji boy wan got. ⁴⁶ Û dixosdibûn wî girtênê¹⁷², hama ji xalqê tîrsîan, çima ko weka peyember qabûl dikirin wî.

SER 22

¹ Dîsa cewab da Îsa û bi temsîla go ji wan ra, ² Padîşahîtiyê azûmanan mîna yekê padîşah ko ji kure xo ra dawet kir. ³ Û xizmetkârê xo şîand ko dawetlîan li dawetê gazî kin; û wan hatin nexosdin. ⁴ Dîsa başqa xizmetkâran şîand û go: Bêjin ji dawetlîan ra: Va ha taştîyê xo mi hazir kir; mozîyê min û xort haywanê min hatin serjê kirin, û hemî tişt hazir in; werin dawetê min. ⁵ Û wan êhmalîti kirin; yekê çû zevîyê, yekê jî li alişverîşî xo. ⁶ Û başqasîan xizmetkârê wî girtin, dijmînan kirin û kuştin. ⁷ Û padîşah jî kînga ko bihîsd sê hat, û askerê xo şîand û aw kuştoşan helak kir, û bajêrê wan şewutant. ⁸ Wê çaxê ji xizmetkâranê xo ra go, Daweta min hazir e, û dawetlîan layîq nebûn. ⁹ Nua herin li rêya cadan; û kî ko bibînin gazî kin li daweta min. ¹⁰ Û xizmetkâran rabûn li ser rêyan, kî ko dîn erki yaramazan û erki qan- [57] can, hemîan jî civandin, û dawet bi dawetlîan hati tîja bûn. ¹¹ Û padîşah kînga ko ket li otaqê ji boy dawetlîan bibîne, dî li wê meşuvkî, erki cilê dawetê newergirtî bû. ¹² Û go jê ra: Ya! dost, erki cilê dawetê ta tunnabû, te çima? ketî livir; û awî lal bû. ¹³ Wê çaxê padîşah ji xizmetkâran ra go, Grêdin dest û lingê wî, û derxin wî li tarîyê derva, û li wê dê bibe girin û qirçîyê diranan. ¹⁴ Çima ko dawetlîan pîr in û bijartîyan hindik.

¹⁵ Wê çaxê farîsîan çûn, şewir kirin, erki çawan duzaşkî deynin jê ra, bi xaber. ¹⁶ Û şagirdê xo bi Herotîan ra tev şîand jê ra, û gon: Ya! xoca, em zanin ko tu doxîrî y û bi doxîrî rêya Xodê hîn dikî, û ji yekê fedî nakî, û ji yekê ra rûmet nakî. ¹⁷ Nua ji me ra bêje ji ta ra çawan dixuye, ji qayser ra xarac dayin, cayîz? e, ya na. ¹⁸ Û Îsa fendê wan dizanibû¹⁷³ û go: Çima? mi dicerîbînin éy mûrayîan? ¹⁹ Ji mi ra sîkeyê vergîyê nişan bidin, û wan jê ra dînarî anîn. ²⁰ Û go ji wan ra: Ê kî? e av sûret ya nivîs. ²¹ Jê ra gotin, Ê Qayser e; wê çaxê go ji wan ra, Herin, aw kî e Qayser e ji Qayser ra bidin û aw kî e Xodê e ji Xodê ra bidin. ²² Û kînga ko bihîsdin, mat man û berdan wî û çûn.

²³ Wê rojê Sadûqîan ko dêjin qiyam tunna hatin li balê; pîrs kirin jê û gotin: ²⁴ Ya! xoca, Mûsa go: Erki yekê bê weled bimre, brêy wî bra bistîne jina wî, ji brêy xo ra zurîyet biderxe. ²⁵ Nua li nav me da heft brê hebûn; awulîn jin send, û mir, zurîyet

¹⁷² Di metnê de *girtênê*.

¹⁷³ Di metnê de *bizanibû*.

tunnabû û jina xo hişt ji birey xo ra, wusan ji îkîncî û üçüncî ji hata haftan. ²⁶ Li paş [58] hemîan jin ji mir. ²⁷ Nua li qiyametê ji av haftan ji kî ra? dê jin bibe wî, ²⁸ Çima ko hemî ji jin sendin wî. ²⁹ Îsa cewab da ji wan ra, û go: Ey! şaşxunan, ne kitêb dizanin û ne quwwetê Xodê. ³⁰ Çima ko li qiyamet da ne jin distînin û ne mêr lê li azüman da weka melek in. ³¹ Hama ji boy qiyamê mirîan ji Xodê ji we ra hati gotan, hûn naxoyndin? ki gotîye, ³² Ez im Xodêyê Îbrahîm, Îsahak, û Yaqûb; û Xodê, Xodêyê mirîan nîn e, lê saxan. ³³ Ê kînga ko xalqê bihîsdin mat dibona li ser talîmê wî.

³⁴ Hama farîsîan kînga ko bihîsdin, erki sadûqîan lal kir, li yek cî hatin civandin. ³⁵ Ê ji wan yekî pîrs kir jê bi ceribandîne, û go, ³⁶ Ya! xoca li nomos da kîjan? tenbîh mezin e. ³⁷ Ê Îsa go jê ra: Xodê û Allahê xo tuyê bihebînî ji hemî dilê xo; û ji hemî canê xo, û ji hemî fikrê xo. ³⁸ Vîa e mezin û awulîn tenbîh. ³⁹ Ê îkîncî weka vîa, havalê xo weka canê xo dê bihebînî. ⁴⁰ Ji av herdu tenbîhan hatin alaqandin, hemî kanonan û peyxemberan. ⁴¹ Ê kînga ko farîsîan hatin civandin, Îsa pîrs kir ji wan, û go: ⁴² Ji boy Mesîhê ji we ra çawan? dixuya, aw kurê kî? e; goni jê ra, Kurê Dawûd. ⁴³ Ê go ji wan ra, Nua lê Dawûd bi rûhê çawan wî Rabb gazî dike, û dibê, Xodê ji Xodêy mi ra go, ⁴⁴ Li destê saxê min ronî hata ko ez dişminê te pêl kirinê lingê te bikim. ⁴⁵ Nua erki Dawûd wî Xodê gazî dike, çawan? kurê wî dibe. ⁴⁶ Ê kesî nedikaribû jê ra tiştî cewab dayin; û ji wê pê va hênî yekî cesaret nedikir jê tiştî pîrs kirinê.

[59] SER 23

¹ Wê çaxê Îsa hem xalqê ra û hem şagirdê xo ra xaber da, û go: ² Kâtîban û farîsîan li kürsîyê Mûsa ronişdin. ³ Nua çi ko ji we ra dibên, bikin û bigirin, hama weka amelê wan mekin, çima ko dêjin û nagirin. ⁴ Giran û ji birinê zorê baran girêdidin û datînin li piştê merûvan, hama wan bi pêçîan nadixwazin tev gerandin, ⁵ Ê hemî amelê xo ji boy nihêrtinê merûvan dikin, hamalîyêt xo bol dikin û pêşa cilêt xo dirêj dikin. ⁶ Li zîyafetan da, pêş ronişdandin dihubînin û li nav cemîatan da, kürsîyê serîn, û li çarşîan da silavan. ⁷ Ê ji merûvan rabbî, rabbî bêni gazî kirin. ⁸ Hama hûn rabbî meyin gazî kirin; çima ko xocayê wê yek Mesîh e û hûn hemîan brê ne. ⁹ Ê li ser ardê yekî ji xo ra baba gazî mekin, çima ko bavê wê yek e, ki li azüman da ye. ¹⁰ Ê hûn xoca meyin gazî kirin, çima ko xocayê wê yek Mesîh e. ¹¹ Ê mezinê

wé xizmetcîyê wê bibe. ¹² Û kî ko aw xo bilind dike dê alçağ bibe; û kî ko xo alçağ dike dê bilind bibe.

¹³ Hama way ji we ra ey! mürayî kâtîban û farîsîan, ko padîşahîyê azümanan li ber merûvan diqufilînin; hûn naçin jê, û wan ko dixwazin jê çûndinê hûn nahêlin. ¹⁴ Way! ji we ra ey! mürayî kâtîban û farîsîan, ko mala jinabîan dixûn, û ji boy¹⁷⁴ nihêrtinê nimêcê xo dirêj dikin, ji boy wî hênî pîr azaban dê bigirin. ¹⁵ Way! ji we ra ey! mürayî kâtîban û farîsîan, ko yekî ji boy dînê anîn ra bahrê û ardê digerin û kînga ko dibe, aw ji xo **[60]** du qat kûrê cehenemê dikin. ¹⁶ Way! ji we ra ey! kor qalawuzan, ko dêjin aw ko li ser dacarê sond dike, tiştîkî nîn e, hama aw ko li ser zêrê ko li nav dacar da e sond dike, awî deyndar e. ¹⁷ Ey! ahmaq¹⁷⁵ û koran, kîjan mezin e zêr? ya dacar ko zêrê qadas dike? ¹⁸ Hem dêjin kî ko li ser mezbahê sond dixo tiştîkî nîn e, hama kî ko li ser aw hedîye ko li ser mezbahê e sond dixo deyndar dibe. ¹⁹ Ey! dîwaneyan û koran, kîjan? mezin e, hedîye?, ya mezbah ko qadas dike hedîyeyê? ²⁰ Nua kî ko li ser mezbahê sond dixo, sond dixo li ser wî, û li ser wî da bûn hemî tiştan. ²¹ Û kî ko li ser dacarê sond dixo, sond dixo li ser wî û li nav wî da sakîn bûn ra. ²² Û kî ko li ser azümanan sond dixo sond dixo li ser kürsîyê Xodê, û li ser wî ronîşdox ra. ²³ Way! ji we ra ey! mürayî kâtîban û farîsîan ko üşrê nahnahê û anîsonê û çamanê didin, hama giran tiştê nomosê dihêlin, yanî şaraatê û îmanê; vanan lazîm e kirin, û awan terk nekirin. ²⁴ Ey kermêşan asirandox deveyan balia[n]dox kor qalawuzan! ²⁵ Way! ji we ra ey! mürayî kâtîban û farîsîan ko alîyê derê kâsikê û hem çanaqê paqij dikin, û li hundur va bi şêlandin û bi zulm tîja ne. ²⁶ Ey! kor farîsî, awul hindura kâsikê û çanaqê paqij bike¹⁷⁶, ki alîyê derva wan jî paqij bibe. ²⁷ Way! ji we ra ey mürayî kâtîban û farîsîan, ki dimînin tîrbê sipî bûn, ki ji alîyê derve rind dixuyan, hama ji alîyê hindur ve bi astîyê mirîan û bi hemî tarz murdarîtîan tîja ne. ²⁸ Hûn jî wusan ji alîyê derve ji merûvan ra sadiq dixuyan, û ji alîyê hindur ve bi mürayîti û **[61]** bi bênamûsîti tîja ne. ²⁹ Way! ji we ra ey! mürayî kâtîban û farîsîan ki tîrbê peyemberan çêdikin û tîrbê sadiqan dixamilînin. ³⁰ Û dêjin, erki gûna pîrbavanê xo em bibana, bi xoyna peyemberan em şerig dê nebana. ³¹ Nua hûn li ser xo şahadîti dikin erki kûrê wan in ki peyemberan diquştibûn. ³² Wusan e hûn jî

¹⁷⁴ Di metnê de *joy*.

¹⁷⁵ Di metnê de *ahmak*.

¹⁷⁶ Di metnê de *bibike*.

kêmanîyê çapê bavanê xo tîja bikin. ³³ Ey! mahran, ewladê gorimahran, çawan? dê bîrevîn ji hokmetê cehenemê.

³⁴ Ji boy vî va ha ez ji we ra peyemberan û alîman û kâtîban dişeyînim û ji wan dê bîkujîn, û xaçê dê bidêrînin, û ji wan li nav cemîatê xo dê bîkutin û ji bajêrê bajar dê biqawirînin. ³⁵ Hata ko li ardê hati rijandin hemî xoyna sadiq li ser wê bê ji xoyna sadiq Abelê hata xoyna Zaxarîa kura Parakîa, ki li nava dacar û mezbahê kuştin. ³⁶ Bîra dibêm ji we ra av hemîan dê bê li ser vî sîlsileyê.

³⁷ Ey! Yerusâlîm, Yerusâlîm, ki peyemberan di kuşdibûn, û ji ta ra hati şîandoşan kevîr dikiribûn; çend caran kurê ta min civandin xosd çawan ko mirîjk tûtîkê xo li bin perê xo dicivîne, û hûn nexosdin. ³⁸ Va ha mala wê ji we ra xarab dê bimîne. ³⁹ Hama ji we ra dibêm ki hênî ji vê pê va hûn dê nebînin min hata ko bêjin: Bi navê Xodê aw ki tê mûbarek bibe.

SER 24

¹ Ê Îsa ji dacarê bi rabûnê, diçobû; şagirdê wî cûn li balê ki yapuyê dacarê jê ra nişan bidin. ² Îsa go ji wan ra, dibînin? [62] av hemîan; bîra dibêm ji we ra dê nemîne livîr kevîr li ser kevîr ki neyê heloşandin.

³ Ê kînga ko li ser Çîyê Zeytûn da ronîşdîbû, şagirdan hatin jê ra tenê û gon, Bêje ji me ra, kînga? dê bibe av tişt, ya nişanê hatinê ta û axirê dinê çi? dê bibe. ⁴ Cewab da Îsa û go ji wan ra, Saqin bin, nebe ko yekî wê bixapîne; ⁵ Çima ko pîran bi navê min dê bên, û bêjin erki Ez im Mesîh, û pîran dê bixapînin. ⁶ Hem dê bibihîsin qawxan, û xabarê qawxan saqin bin ko şaş nebin, çima ko av hemî tiştan lazim e ko bibin, hama hêja axir nin e. ⁷ Çima ko mîllet li ser mîllet û padîşahîti li ser padîşahîti dê rabe; û cî cî xalayîyan û oletan û zelzeleyan dê bibin. ⁸ Hama av hemîan îbtîdayê hêşan in. ⁹ Wê çaxê wê dê sixlet ra teslîm bikin, û wê dê bîkujîn, û ji boy navê min ji hemî mîlletan dê îkrah bibin. ¹⁰ Hem wê çaxê pîran dê xwar bibin, û hevûdu dê teslîm bikin, û ji hevûdu dê îkrah bikin. ¹¹ Ê pîr deraw peyemberan dê rabin û pîran dê bixapînin. ¹² Ê ji boy pîr bûnê bênamûsîtiyê muhabetê pîran dê sar bibe. ¹³ Hama aw ko hata li axirê sabr bike, dê aw xalas bibe. ¹⁴ Ê av mûjdeyê padîşahîtiyê dê li nava hemî dinêyê waz bibe, ji boy şahadetîyê kifaran; û wê çaxê axir dê bê. ¹⁵ Nua kînga ko dibînin îkrahîtiyê xarab bûnê ki bi destê Danîel peyember hati gotan, ki li cîyê qadas dê bisekine (kî ko dixoyne bira fehm bike). ¹⁶ Wê çaxê kî ko li Yehûdîstan da ne, bira li çîyan bîrevîn. ¹⁷ Ê aw ko li ser xanî sekinîn, bira neyê xwarî ji mal tiştîkî

bistîne. ¹⁸ Û aw ko li nav zevî da e bira venegere ji boy cilê xo [63] sendin. ¹⁹ Hama way ji wan ra ko hamla û çiçik dayox in wê royan da. ²⁰ Û duwa bikin ko revînê wê li zivistan da nebe û ne jî li roya Şapatê. ²¹ Çima ko wê çaxê wusan mezin sixletkî dê bibe ko weka wî ji awulê dinê hata nua nebûe, û hênî dê nebe. ²² Û erki aw royan kin nebibana, qat yek ten nedikaribû xalas bûn; hama ji boy bijartîyan wê royan dê kin bibin. ²³ Wê çaxê erki yekî ji we ra bêje va ha livir e Mesîh ya li wê, bawur mekin. ²⁴ Çima ko deraw Mesîhan û peyemberan dê rabin û mezin alametên û keremetan dê bikin, wusan ko, erki qabîl bibana, bijartîyan jî dê bixapandibûn. ²⁵ Va ha ji we ra mi pêşîn gotîye. ²⁶ Nua erki bibêjin ji we ra, va ha li çolê da e, ramebin û va ha li nav odan da e, bawur mekin. ²⁷ Çima ko çawan ko birûsk ji rohelatê radiba û hata roavayê dixuye; wusan dê bibe hatinê Qurê meruv. ²⁸ Çima ko li ko kî leş heye qartalan li wê tên civandin.

²⁹ Û zû va li pey aw sixlet royan da ro dê bê girtin; û hîv dê tavê xo nede û ji azümanan istêran dê bikevin û quwetê azümanan dê tevgerin. ³⁰ Û paşê nişanê Qurê meruv dê xuyayi bibe li azüman da, û wê çaxê hemî milletê dinê dê qasawet bikin; û Qurê meruv dê bibînin li ser awrê azümanan hatin, bi quwwet û bi pîr saltanet. ³¹ Û melekê xo dê bişeyîne bi mezin deng zûrnayê, û dê bicivînin bijartîyê wî ji çar bayan, ji yek serê azümanan hata aw alîyê din.

³² Û av temsîla ha ji dara hêjîlê hîn bin, ki kînga gulîyê wî nerm dibe û pelê wî dixuya; dizanin ko havîn nêz e. ³³ Hûn jî kînga ko [64] av hemî tiştan dibînin, bizanin ko nêz e li ber derîan. ³⁴ Bîra dibêmin ji we ra; ko av sîlsîle dê nebihure, hata av hemî tiştan bibin. ³⁵ Azümanan û dinê dê bibihurin, hama xaberê min dê nebihirin. ³⁶ Hama ji boy wê royan keskî nizane, melekê azümanan bile nizanin, lê tenê Bav zane.

³⁷ Û çawan royê Nûh bû, hatinê Qurê meruv dê wusan bibe. ³⁸ Çima ko çawan bûn aw royan ji tûfanê awul, dixwaribûn, vedixobûn, jin digirtibûn û mêr digirtibûn; hata wê rojê ko Nûh ket gemîyê. ³⁹ Û wan nizanibûn, hata ko tûfan hat, û hemîyan helak kir; hatinê Qurê meruv jî wusan dê bibe. ⁴⁰ Wê çaxê erki du meruv li nav zevîkî bibin yekî dê bê girtin, û awê din dê bê berdan. ⁴¹ Û erki du jin li ser yek distar herandîne bibin, yekî dê bê girtin û awê din dê bê berdan. ⁴² Li xew mekevin, çima ko nizanin ko xodîyê wê li kîjan saatê tê.

⁴³ Hama avê bizanin, erki xodîyê malê bizanibû, erki kîjan saatê şevê diz tê, xewê nediçûbû; û bernedida ko malê wî qul bikin. ⁴⁴ Ji boy vî hûn jî hazir bibin, çima

ko li wusan saatkî, ko hûn texmîn nakin Qurê meruv tê. ⁴⁵ (Çima kî) acaba aw emîn û aqilli qul kî? e ko efendîyê wî awî li ser xalqê mala xo nasb kir, ko li wextê taamê wan bide. ⁴⁶ Xozî aw xizmetkâr ra ko, wexta hatinê axayê wî, awî wusan kirin dê bibîne. ⁴⁷ Bîra dibêjm ji we ra ko awî li ser hemî tiştê xo dê deyne. ⁴⁸ Lê, erki aw kotî qul li dilê xo da bêje: ⁴⁹ Hatinê axayê min dereng dikeve û dest bike quldaşê xo kutinê, û bi serxoşan ra xw- **[65]** arinê û vexwarinê. ⁵⁰ Axayê aw qulê li wusan rokî dê bê ko aw napê û li wusan saatkî, ko nizane. ⁵¹ Û awî li ortayê du cî dê bike, û paya wî bi mûrayîyan ra dê deyne; û li wê dê bibe girin û qirçînê diranan.

SER 25

¹ Wê çaxê padişahîtiyê azûmanan dê bimîne deh bîkr qîzan, ko fenerê xo girtin bi rabûnê çûn qarşiyê zava. ² Û ji wan pêncan bieqil bûn û pêncan ahmaq bûn. ³ Ahmaqan fenerê xo sendin û bi xo ra rûn nesendin. ⁴ Hema aqilîan bi fenerê xo bi firaqan rûn jî sendin. ⁵ Û bi dereng ketinê zeva¹⁷⁷, xewê hemîan jî hat û xew da çûn. ⁶ Û li nivê şevê da dengkî bû, Va ha zava tê, rabin li pêş wî. ⁷ Wê çaxê hemî bîkr qîzan rabûn û fenerê xo saz kirin. ⁸ Ahmaqan ji aqilîan ra gotin, Ji rûnê xo ji me ra bidin; çima ko fenerê me di tamirîn. ⁹ Cewab dan aqilîan, û gon: Nebe kî hem ji me ra û hem ji we ra qiyim neke; lê herin ji firotexan ra, û ji boy xo bikiirin. ¹⁰ Û kînga ko wan çûn ji boy kirandinê, zava hat û wan ko hazir bûn pê ra li dawate ketin û derî hati ketin. ¹¹ Û paşê aw bîkr qîzê din hatin, û gon: Ya! Rabb ya! Rabb, ji me ra veke. ¹² Û wî jî¹⁷⁸ cewab da û go: Bîra dibêjm ji we ra, erki ez we nas nakim. ¹³ Nua hûn li xewê meçun, çima ko ne royê dizanin û ne saatê.

¹⁴ Nua çawan ko li qurbetê çûndox meruvkî, xulamê xo gazî kir û warîyetê xo ji wan ra teslîm kir. ¹⁵ Û ji yekê ra pênc û ji yekê ra **[66]** dido, û ji yekê ra jî yek talant da; ji her yekê ra gora quwetê xo û zû ve çû li qurbetê. ¹⁶ Û aw pênc talantê sendox çû zû va şixuland wî, û hênî pênc talant jî qazanc kir. ¹⁷ Û ahwa aw didoyan sendox jî hênî didoyan jî qazanc kir. ¹⁸ Û aw ko yek se[n]d çû li bin ardê veşart axçeyê efendîyê xo. ¹⁹ Nua ji paşê pîr wextê efendîyê wê xulamên hat û ji wan hasab xos[d]. ²⁰ Û ew ko pênc talant send hat û pênc hênî talantan anî; û go: Ya! efendîyê min; ta ji mi ra pênc talantan teslîm nekir?, va ha li ser wan hênî pênc talantan mi qazanc kir. ²¹ Û efendîyê wî go jê ra, Aferîn, ey! qanc û emîn qul, tu kî li tiştê hindik

¹⁷⁷ Di metnê de zeva.

¹⁷⁸ Di metnê de ji.

da emîn bûy ezê ta li ser pir tiştan tayîn bikim, bîkev li şahmanlixê efendîyê xo. ²² Û du talant sendox jî hat û go: Ya! efendîyê min ta du¹⁷⁹ talant neda? ji mi ra; va ha li ser wan hênî dido talant jî mi qazanc kir. ²³ Û efendîyê wî go jê ra: Aferîn ey! qanc û emîn qul, tu kî li hindik tişt da emîn bûy, ezê ta li ser pir tiştan tayîn bikim, bîkev li şahmanlixê efendîyê xo. ²⁴ Û yek talant sendox jî hat û go, Ya! efendîyê min mi zanibû ko tu meruvkî dengser î; ji cîyê tov nekirinê diçînî, û ji cîyê neajoşînê berev dikî. ²⁵ Tîrsîyam, û çûm talantê ta li bin ardê mi veşart, û va ha malê ta ji ta ra. ²⁶ Û efendîyê wî cewab da jê ra û go: Ey qulê yaramaz û tenbel, ta zanibû ko ez ji cîyê tov nekirinê diçînim û ji cîyê neajoşînê berev dikim. ²⁷ Lazîm bû ji ta ra ko aşçeyê mi ta bidana ji sarrafan ra, û ezê bihatima bi feyde malê xo bisendima. ²⁸ Nua bigirin jê talantê, û bidine wî kî **[67]** deh talantê wî heye. ²⁹ Çima ko ji kê ra ko heye, jê ra dê bê dayin û zêde bibe; hama ê kî ko tunne bi wî ra bûn aw jî dê bê sendin jê. ³⁰ Û av qulê tenbel derxin li tarîyê derva; û li wê dê bibe girin û qirçînê diranan.

³¹ Û kînga ko Kurê meruv bi saltnetê xo bê û hemî melekê xo pê ra, û wê çaşê dê ronî li ser kürsüyê xo îzzetê. ³² Û hemî mîletan dê li ber wî bêni civandin û ji hevûdu dê cîyê bike; çawan ko şivan mîyan û bizinan ji hev cîyê dike. ³³ Û mîyan li alîyê rastê xo dê bisekinin û bizinan li alîyê çepê xo. ³⁴ Wê çaşê Padîşah li alîyê rast bûnoxan ra dê bêje, Ey mübarekê Bavê min, ji temel bûnê dînê awul ji boy wê hazir bûn padîşahîtyê mêras bigirin. ³⁵ Çima ko ez birçî bûm û wê ji mi ra xwarin dan, û ez tî bûm, û we av dan ji mi ra, qarîb bûm û hûn min qabûl kirin. ³⁶ Tazî bûm; û hûn mi dani wergirtin; naxoş bûm; û wê mi zîyaret kirin; li hapsê bûm û hûn hatin li ba min.

³⁷ Wê çaşê sadiqan dê cewab bidin û bên Ya! Rabb, kînga me ta birçî dî, û ta xodî kir, ya tî û me ta vexwart? ³⁸ Hem çi? çaş me ta qarîb dî, û me ta qabûl kir, ya tazî, û me ta da wergirtin? ³⁹ Kînga me ta naxoş û li hepsê da dî, û em hatin li ba ta.

⁴⁰ Û Padîşah dê cewab bide û bibêje ji wan ra: Bira dibêm ji we ra, her çiqas ki wê kir ji brêyê mi ra piçûkan ra wê ji mi ra kir.

⁴¹ Wê çaşê ji alîyê çep bûnoxan ra jî dê bêji, Ji min herin ey! melûnan li aw narê ebedî **[68]** ko hazir bûye ji şeytan ra û ji melekê wî ra; ⁴² Çima ko ez birçî bûm, û wê ji m ra xwarin neda; tî bûm û wê min neda vexwarin. ⁴³ Qarîb bûm wê min

¹⁷⁹ Di metnê de *tu*.

qabûl nekir; tazî bûm; û wê min neda wergirtin; naxoş û li hapsê da bûm û wê nehat li ba min.

44 Wê çaxê wan jî dê cewab bidin û bêjin: Ya Rabb, me kînga? ta birçî, ya tî, ya qarîb, ya tazî, ya naxoş, ya li hepsê da dî, û me ji ta ra îzzet nekir? 45 Wê çaxê dê cewab bide ji wan ra û bêje: 46 Bira dibêm ji we ra, hûn her ç[i]qas ko ji wan piçûkan yekê ra nekirin ji mi ra jî nekirin. 47 Ê wan dê heşin li azabê ebedî û sadîqan li hayatê ebedîyê.

SER 26

1 Ê kînga ko av hemî xaberan temam kir, go ji şagirdê xo ra: 2 Malûmê wê e, ko paşê du royan Paseh dê bibe û Qurê meruv awê bê teslîm bûn li xaxê rabûn ra.

3 Wê çaxê baş xaxaman û¹⁸⁰ kâtîban û îxtîarê civatan hatin civandin li hawşa baş xaxamê aw ko navê wî Gayîapa bû. 4 Ê şawrê kirin, ko bi fendkî Îsayê bigirin û bişujin. 5 Hama digotin, na li bayram da, ko nebe welwelkî bikeve li nav civatan. 6 Ê kînga ko Îsa hati li Petaniyê li mala Şimhûnê uyuz, 7 Jinkî hati li ba lê; ko şûşakî rûnê wî pîr buha hebû, û rijand li ser serê wî li ber wan ko li sufrê da ronîşdî bûn. 8 Ê şagirdan kînga ko dîn, xeyidîn, û gon: Çima? av rûn wunda bibe? 9 Çima ko qabîl bû ko aw rûn bi buha bihata firotan û ji [69] faqîran ra dayin. 10 Îsa fehm kir û go ji wan ra: Çima? rahatsîz dîkin jînekê; çima ko amelkî qanc şîxulî ji mi ra. 11 Faqîran her çax bi we ra dibin, hama ez dayîma bi we ra nabim. 12 Çima ko av jin, av rûn li ser bedenê min bi rijandinê, ji boy defîn kirinê min kir. 13 Hama bira dibêm ji we ra, li nava hemî dinê, li ko kî av mûjde tê waz kirin, kirinê wî jî dê bê gotin, ji boy zîkr kirinê wî.

14 Wê çaxê ji dwanzdan yekî, ko Îsxarî Yahûda dihati gotin, çû li baş xaxaman ra, û go, 15 Çi? dixwazin ji mi ra dayin, û ez wî ji we ra teslîm bikim, û wan sî parça zêv wad kirin jê ra. 16 Ê ji wê pê va fursentkî aramîş dîkir, ko wî bide destê wan.

17 Ê li roya awulê Fetîr bayraman; şagirdan hatin li ba Îsa û goni: Ji boy xwarinê Paseh li kê? derê dixwazî ko ji ta ra hazir bikin. 18 Ê wî go ji wan ra: Li bajêrê ji filan kesê ra heşin, û jê ra bêjin: Xoca dêje, Wextê min nêz e; pasehê ji

¹⁸⁰ Di metnê de sv.

şagirdê xo ra tev li cem ta dê bikim. ¹⁹ Ê şagirdan jî kirin çawan ko emr kir ji wan ra Îsa û hazir kirin pasehê.

²⁰ Ê kînga ko êvar bû, bi dwanzdah şagirdan ra sufrê da roniştî bû. ²¹ Ê kînga ko wan dixwaribûn, go, Bira dibêm ji we ra ko ji wê yekê dê mi bide dest. ²² Ê pîr qasawat kirin, û ji wan her yekê başlandin gotinê jê ra, Ya Rabb, saqin ez nevim?. ²³ Ê wî cewab da, û go: Aw ko destê xo bi mi ra li sahanê kir, awî dê min bide dest. ²⁴ Bira Kure meruv diçû çawan ko ji boy wî hati nivîsandin; hame way ji ew meruv ra, ko Kure me- **[70]** ruv bi destê wî dê bê teslîm bûn; aw meruv ji dîyê xo za nebana, jê ra hênî qanc bû. ²⁵ Cewab da Yehûda ki wî dê dest bidana, û go: Ya! xoca, saqin ez nevim; go jê ra: Ta go.

²⁶ Ê çiqas ko wan dixwaribûn, Îsa nanê send, mûbarek kir û şikênand, û da ji şagirdan ra, û go, Bigirin, bixun; av tenê min e. ²⁷ Ê kâsikê send şikir kir, da ji wan ra, û go: Hûn hemî jî vexûn jê; çima ko av e xuyna min, av ahda no ji boy pîran tê rijandin ji boy afwlixê güneyan. ²⁸ Hama ji we ra dibêm, ji vê pê ve hênî ji mahsûlê mêtew dê nevexum, hata wê royê, kînga ko bi we ra awî no vexum li nava padîşahîtiyê Bavê min. ²⁹ Ê paşê îlahîkî xoyndanê, rabûn li çiyê zeytûnê.

³⁰ Wê çaxê go Îsa, Hûn hemîyan vê şevê dê xwar bin ji min, çima ko hati nivîsandin ko, ³¹ Şivanê dê bixim û mîyê cöl dê bala bibin. ³² Hama paşê qiyam kirinê min, li ber wê ezê dê herim li Celîlê. ³³ Cewab da Petros û go: Erki hemî jî ji ta xwar bin, hama ez dê xwar nevim, ³⁴ Go jê ra Îsa, Bira dibêm ji ta ra: vê şevê li pêş bandanê dîkan sê caran tuyê mi înkâr dê bikî. ³⁵ Go jê ra Petros, Meger bi ta ra mirin jî lazîm be, ezê ta înkâr nekim; ahwa digotibûn şagirdan hemî jî.

³⁶ Wê çaxê Îsa bi wan ra Ketsemanî hati gotan cîkî hat, û go ji wan ra: Livir ronîn, hata ko ez herim li wê nimêc bikim. ³⁷ Ê bi sendinê Petrosê û herdu kure Zepetosê; başland qasawet kirinê û hacet kirinê. ³⁸ Wê çaxê go ji wan ra, Canê min qasa mirinê biqasawet e, livir bisekinin, û bi mi ra hêşar bi- **[71]** mînin. ³⁹ Ê hinikî li pêş çû, li ser rû ket, nimêc kir û go, Ya! Bavê min, erki mimkûn heye, bira av kâsikê ji min bibihure, hama ne xosdinê min îlla bi xosdinê ta bibe. ⁴⁰ Ê hati şagirdan ra; û wan li xewê da dî; û dêje ji Petros ra, Wusan saatkî? jî hûn nikaribûn bi mi ra hêşar bisekinin? ⁴¹ Hêşar bisekinin û nimêc bikin, ko li nav tercûbayê nekevin; bira rûh hazir e, hama ten zayîf e. ⁴² Dîsa îkîncî caran çû nimêc kir, û go: Ya! Bavê min, erki mimkûn nin e ko av kâsikê ji mi bibihure erki jê nevexum, bira meramê ta bibe. ⁴³ Ê dîsa hati wan li xewê da dî; çima ko çahvê wan giran bûbûn. ⁴⁴ Berda wan, û çû

üçüncü caran nimêc kir; û dîsa av xeber go. ⁴⁵ Wê çaxê hati şagirdan ra û go ji wan ra, Ji vê pê va xew da herin û rahat bibin; va ha saat gihîşt, û Qurê meruv li destê günekâran teslîm dibe. ⁴⁶ Rabin ji vir em herin, çima ko va ha gihîştî aw ko dê mi dest bide.

⁴⁷ Ê hêja wî av xaberan dida, va ha Yehûda ji dwanzdan yekî hat, û pê ra pîr qalabalix ji îxtîarê civatan û ji baş xaxaman bi kêran û bi daran. ⁴⁸ Ê wî dest dayox ji wan ra nişankî bi dayinê gotibû: Kî ko mi ramîsa aw e, awî bigirin. ⁴⁹ Ê zû ve li ba Îsa hat go: Selam ji ta ra ya! xoca, û awî ramîsa. ⁵⁰ Ê Îsa jê ra go, Ya dost! tu çima? hatî; wê çaxê hatin dest avêtin Îsayê û girtin wî. ⁵¹ Ê va ha awan ko bi Îsa ra bûn, yekî ji wan, destê xo avêt û kêra xo kşand li xizmetkârê baş xaxamê û goya wî cîyê kir. ⁵² Wê çaxê Îsa go jê ra, Kêra xo cîyê xo vegeşîne, çima ko hemî kêr kişandoşan bi kêrê dê [72] helak bin. ⁵³ Tu çi taxmîn dikî erki ez nikêrim? ji bavê xo ra lava kirinê û nua bigînî ji mi ra ji dwanzdah alayan zêde melean? ⁵⁴ Hama çawan dê temam bibin kitêban erki lazim e awha bûn[.]

⁵⁵ Ê çaxê ji qalaba ra go Îsa: Mi girtinê weka li ser diz? hûn bi kêran û bi daran rabûn; her ro li nav dacar da bi we ra dironîştibûm û talîm dikiribûm, û hûn mi negirtin. ⁵⁶ Ê av hemîan ji boy temam bûnê kitêbê peyxemberan bû; wê çaxê şagirdan gişk wî berdan û revîn.

⁵⁷ Ê wan girtin Îsayê birin ji Kayîapa xaxam başî ra, li ko kî kâtîban û îxtîaran hatibûn civandin. ⁵⁸ Ê Petros ji dûr ve li pey wî da çû, hata hawşa xaxam başîyê, û keti hindur bi xizmetkâran ra ronişt ko axirê bibîni. ⁵⁹ Ê baş xaxaman û şewîr gişk li ser Îsayê derew şahadetîkî aramîş dikiribûn; ko wî bîkujin. ⁶⁰ Hama nedîtin û pîr deraw şahadan hatin jî dîsa nedîtin; paşê hatin du deraw şahîdan, ⁶¹ Digotibûn, Erki vîa xaber dida: Ez dikarim dacarê Xodê helweşandinê û nava sê royan da çêkirin. ⁶² Ê xaxam başî bi rabûnê, jê ra go: Cewabkî nadî?; wanan li ser ta çi? şahadetî dikin; û Îsa hiskot bûbû. ⁶³ Cewab da xaxam başî, û go jê ra: Bi sax Allah ta sondê didim, erki ji mi ra bêjî, erki tu yî Mesîh Qurê Xodê. ⁶⁴ Go jê ra Îsa: Ta go, hama dêjim ji ta ra, ji vê pê ve dê bibînin Qurê meruv li alîyê saxê Qudretê hati ronişdin; û bi awrê azümanan hatin. ⁶⁵ Wê çaxê baş îmam cila xo qatand, û hênî şahadan ji me ra çi? lazim in. [73] Va ha hûn bihîsdin dijmîna wî. ⁶⁶ Ji we ra çawan dixuya; wan cewab dan û gon: Ji mirin ra mistaheq e. ⁶⁷ Wê çaxê tû kirin li rûya wî, bi pîr mista kutani wî; û hinikan jî sîle dixistibûn û digotibûn: ⁶⁸ Ji me ra peyxemberî bike ey! Mesîh; kî? e aw ko ji ta ra xist?

⁶⁹ Hama Petros derva li hewşê da rodinibû û hati qarwaşkî li balê û go: Tu jî bi Celîlî Îsa bûy. ⁷⁰ Ê wî li ber hemîyan înkâr kir û go, Erki ez nizamim tu çi dêjî. ⁷¹ Ê wî çiqas ko li derîyê hewşê dibihuribû, başqa qîzkî dî wî, û wan ko li wê bûn, go ji wan ra, Vîa jî bi Îsayê Nisranî ra bû. ⁷² Ê wî, Ew meruv nizamim, bi sondê înkâr kir. ⁷³ Ê paşê hinik jî wan ko li wê bûn hatin û goni ji Petros ra: Bîra tu jî ji wan î, çima ko xabera ta, belî dika ta. ⁷⁴ Wê çaxê başlandî lanet kirinê û sond xwarinê, Erki ez wî meruvê nizamim, û zû ve dîk ban da. ⁷⁵ Ê Petros xabera Îsayê bîra xo anî; erki li pêş bandanê dîk sê caran tuyê mi înkâr bikî, û derva rabû, pîr tahl girîa.

SER 27

¹ Ê kînga ko sibê bû, baş îmaman gişk û îxtîarê civatan şawr kirin ji boy Îsa erki wî bikujin. ² Ê awî bi girêdanê birin; û awî li destê Bondoslu Pîladosê dani. ³ Wê çaxê Yehûda ko awî dest da, bi dîtinê erki li ser wî hökm bû, puşman bû, sî parça zîv veğerand ji baş îmaman ra û îxtîaran ra go: ⁴ Ji boy dest dayinê min bêsuç xoyn, mi güne [74] kir, û wan goni, Ji me ra çi?; tu zanî. ⁵ Ê zîvê li nava dacarê avêt û çû, awî xo aliqand. ⁶ Ê baş xaxaman zîvê bi sendinê goni: Avî li xaznayê dacarê datînin cayîz nin e; çima ko av buhayê xoyn e. ⁷ Bi şawr kirinê, bi wî zevîyê pîrudê kirîn, ji boy mezelê qarîban ra. ⁸ Ji boy wî, hata vê rojê av zevî, zevîyê xuynê hati gazî kirin. ⁹ Wê çaxê tamam bû bi destê Îrîmîa peyşember hati gotan: Ê sendin aw sî parça zîvê buhayê hati fîrotan; ki hinikan ji kurê Îsrayîlê buha qatandin. ¹⁰ Ê dani awê ji zevîyê prud ra çawan ko Xodê ji mi ra emr kir. ¹¹ Ê Îsa li ber walîyê sekinand; walî pîrs kir jê û go: padîşahê Yehûdîan tu? î; û Îsa go jê ra: Tu dêjî. ¹² Wexta doz kirinê jê baş îmaman hem îxtîaran, qa cewab neda. ¹³ Wê çaxê Pîlados jê ra go: Li ser ta çiqas tiştan şahadetî dîkin, tu nabihîsî?. ¹⁴ Qat ji yek xaber ra bîle, jê ra cewab neda; wusan ko pîr tacub kir walî.

¹⁵ Hama adeta walî hebû, ko li her bayram da ji cemat ra grêdankî berde kî ko dixosdibûn. ¹⁶ Wê çaxê ji wan ra Parappe hati gotan meşhûr mahbûskî hebû. ¹⁷ Kînga ko hatin civandin; go ji wan ra Pîlados, Kîjan? dixwazin ko ji we ra berdim, Parappa? ya Îsa ko Mesîh tê gotan. ¹⁸ Çima ko dizanibû, ko awî ji boy hasûdîyê dest dabûn.

¹⁹ Ê kînga ko wî li kürsîyê şerîatê ronişdî bû, jina wî şîandi jê ra, û go, Şîxulê ta tunne bi aw sadîq kesê ra; çima ko îro li xewê da ji boy wî ez pîr kişandim. ²⁰ Hama baş îmaman û îxtîaran cematan qandurmîş kirin; ko Parappayê bixwazin û Îsa helak bikin.

[75] ²¹ Û walî ji wan ʔa cewab da, û go: Ji av herduyan kîjanê? dixwazin, ko ji we ʔa berdim; û wan gotin, ʔarappayê. ²² Pîlados go ji wan ʔa: Lê ʕi? bikim Îsayê ko Mesîh tê gotan. ²³ Hemî jî gotin: Bira bê xaç kirin; û go ji wan ʔa, ʕi? amelkî kôti şixulî; û wan hênî ʔir gazî dikirîbûn û digotibûn: Bira bê xaç kirin. ²⁴ Û Pîlados bi dîtîne ko faydakî nabe, lê hênî ʔir welwele dibe; avê send li ber civatan destê xo şûşt, û go: Ez ji av bêsuç xoynê pak im; hûn bizanin. ²⁵ Û hemî qawm cewab dan û gon: Xuyna awî li ser me û li ser ewladê me bibe.

²⁶ Wê ʕaxê ʔarappeyê berda ji wan ʔa, û Îsa bi kutanê destê wan da ko bê xaç kirin. ²⁷ Wê ʕaxê askerê walî li hindurê dîwanxanayê girtin Îsayê, û hemî bölügê li ser wî civandin. ²⁸ Tahzî kirin wî û jê ʔa xelatê sor ʔê kirin. ²⁹ Û ji istirîan tackî bi ʕêkirîne li serê wî danîn û qamîşkî li destê wî ʔast, û ber wî da li ser ʕökan bi hatîne mesqara dikirîbûn û digotibûn: Selam ji ʔa ʔa ya! Padîşahê Yehûdîan. ³⁰ Û li ser wî bi tû kirîne, qamîşe digirtibûn û serê wî dikutabûn. ³¹ Û awî ʔaşê mesqara kirîne xelatê jê şelandin; û cilê wî ʔê kirin jê ʔa, û birini wî li xaçê ʔabûn ʔa. ³² Û wan derva ʔabûnê navê wî Şimhûn yekî Gürenayi dîn, awî suxra girtin ko xaçê wî helgire. ³³ Û hatin aw ʕîyê ko ʔolgota tê gotan, yanî ʕîyê serî jê kirîne. ³⁴ Û jê ʔa bi öd tev bûn sîrka dani ko vexû, û kînga ko ʔamê wî send vexwarin nedixosdibû. ³⁵ Û awî li xaçê deranîn û cilê wî bi qurayê pay kirin, ko ji peyember hati gotan [76] xaber tamam bibe: Cilê min li nav xo da pay kirin, û li ser qaftanê min qura avêtin. ³⁶ Û roniştî bûn û awî dipêbûn. ³⁷ Û li ser serê wî cûrmê wî hati nivîsandin danîn; erki AV E ÎSA PADÎŞAHÊ YEHÛDÎAN.

³⁸ Wê ʕaxê ʔê ʔa du diz jî xaç kirin, yekî ji alîyê ʔast ʔa, û awê din ji alîyê ʕep ʔa. ³⁹ Û ji wê bihuroxan serê xo bi hêjandinê, jê ʔa küfr dikirîbûn, Û digotibûn, ⁴⁰ Ey! dacarê xarab kirox û nav sê ʔoyan da ʕêkiroş, tu xo xalas bike; erki tu ʔurê Xodê y, ji xaçê weri xwarî. ⁴¹ Hem wusan jî baş îmaman bi kâtîban û bi îxtîaran, mesqara dikirîbûn û digotibûn. ⁴² Başqayan xalas kir, aw xo nikari xalas kirîne; erki Padîşahê Îsrayîl e, nua bira ji xaçê bê xwar, û jê ʔa îman bînin. ⁴³ Erki ji Xodê ʔa umud kirîye, bira xalas bike wî; erki jê razî e; ʕima ko go, Ez ʔurê Xodê me. ⁴⁴ ʔê ʔa hati xaç bûn dizan jî wusan serhevde dikirîbûn jê ʔa.

⁴⁵ Û saat ji şeşan hata saat nehan li ser hemî dinê ʔarî bû. ⁴⁶ Û saat li wexta nehan Îsa bi dengkî bilind gazî kir û go, Elî, Elî, lama sabaktanî yanî, Ya! Allahê min, Allahê min, ʔa ʕima? mi terg kir? ⁴⁷ Ji wan hinikan, ko li wê sekinî bûn, kînga ko bihîsdin, digotibûn: Avî Îlîayê gazî dike. ⁴⁸ Û ji wan yekê bazda süngerî girt bi

sîrka tîja kir li ser qamîşkî pêça û da jê ra ko vexu. ⁴⁹ Ê awa dinan digotibûn, berde em mêze kin Îlîa tê wî xalas kirinê.

⁵⁰ Ê Îsa dîsa bi bilind sawndkî gazî kir û canê xo teslîm kir. ⁵¹ Ê va ha perdeyê dacarê ji jor da hata jêr diduyan qatya û [77] ard lerza û zinaran faqîtin; ⁵² Ê tirban hatin vebûn û tenê pîr azîzan ko xew da çûbûn qiyam kirin. ⁵³ Ê ji tirban rabûn paşê qiyam kirinê, û ketin li bajêrê muqadas, û ji pîran ra xuyayî bûn.

⁵⁴ Hama yûzbaşî û pê ra wan ko Îsayê dipê bûn, kînga ko dîn zelzeleyê û aw tîştan ko bûn, pîr tîrsîan, û gon: Bîra avî Qurê Xodê bû.

⁵⁵ Ê li wê, ji dûr ve nihêrtox pîr jinan hebûn; ko wan ji Celîlê li pey Îsa jê ra xizmet kirin ra hatibûn; ⁵⁶ Ko li nav wan da bû Meyrem Maqtalînî û Yakob hem dîyê Yosa Meyrem û dîyê kurê Zepetôsê.

⁵⁷ Ê kînga ko êvar bû ji Karîbramê meruvkî zengîn hat, ko navê wî Yusîf bû, ko wî jî şagirdê Îsa bû; ⁵⁸ Wîa li ba Pîladosê bi çûndinê tenê Îsa dîleg kir; wê çaxê Pîlados emr kir ko tenê bidin. ⁵⁹ Ê Yusîf tenê send bi pak çarşefan keten kir, ⁶⁰ Ê danî li tîrbkî no, ko ji kevîr kola bû, û kevîrkî mezin li derîyê tîrbê bi ger kirinê; û çû. ⁶¹ Ê li wê bû Meyrem Maqtalînî û Meyremê dîn, li ber tîrbê hati ronîşdin.

⁶² Ê aw roya dîn ko li paş inê bû; baş îmaman û farîsîan hatin civandin li ba Pîladosê, û gon, ⁶³ Ya! efendîyê me bîra me tê ko aw derawî li wexta sax bûnê xo digoti: Ko li paşê sê royan dê qiyam bikim. ⁶⁴ Nua emr bike ko hata sê ro tîrbê qanc bipên; nebe ko şagirdê wî bi şevê bîn, awî bidizin; û ji civat ra bêjin, erki ji mirîan rabû; û derawîyê paşîn ji awulîn kotî bibe. ⁶⁵ Pîlados ji wan ra go, Bekcîyê wê heye; herî çawan ko dîzanîn bi- [78] pên. ⁶⁶ Ê wan jî çûn qanc tîrbê xodî kirin, û möhr kirin kevîrê bi bekcîan.

SER 28

¹ Û êvarê şemûyê ko roya awulê haftê sibê dibe, hati Meyrem Maqtalînî û Meyremê din, ji boy nihêrtinê tirbê. ² Û va ha zelzelekî mezin bû; çima ko melekê Xodê ji azümanan hati xwarê, çû ji derîyê kevîr li alîkî ger kir û li ser wî ronîşd; ³ Û çahrayê wî weka brûsk bû, û cilê wî weka berf sipî bû. ⁴ Û ji tîrsa wî wan ko dipêbûn bizdîan, û weka mirî bûn. ⁵ Cewab da melek, û go ji jinan ra: hûn metîrsin, zanim ko hati xaç bûn Îsayê aramîş dîkin. ⁶ Aw livir nin e, çima ko qiyam kir, çawan ko go; ⁷ Werin mêze kin aw cî li ko kî raza bû; Û zû ve heşin ji şagirdê wî ra bêjin, erki qiyam girt, û va ha li ber wê li Celîlê diçû; li wê dê bibînin wî, va ha mi ji we ra xaber da. ⁸ Û zû ve ji tirbê rabûn bi tîrs û bi mezin şazbûnê; dibazîyabûn ji şagirdan ra xaber kirinê. ⁹ Û va ha Îsa laqa wan bû û go, Selam ji we ra. Û wan çûn lingê wî girtin û secde kirin jê ra. ¹⁰ Wê çaxê Îsa ji wan ra go: Metîrsin; heşin ji brêy mi ra bêjin: ko li Celîlê heşin, û li wê dê min bibînin.

¹¹ Û kînga ko wan çûn ji bekcîan hinik hatin li bajêr û ji baş îmaman ra hekandin hemî tiştan ko hati bûn. ¹² Û wan bi îxtîaran ra tev bi civandinê, şêwr kirin, pîr dirav dan ji askeran ra, û gon. ¹³ Bêjin erki şagirdê wî bi şevê hatin awî dizîn kînga ko em li [79] xew da bûn. ¹⁴ Erki aw tişt digê goya walîyê, em wî qandurmîş dîkin, û wê jî bêxem dîkin. ¹⁵ Û wan jî diravê sendin çawan ko hîn bûn wusan kirin; û aw xaber ji nava Yehûdîan rabû hata vê royê.

¹⁶ Hama yanzdah şagirdan çûn li Celîle aw çîyê, li ko kî Îsa ji wan ra tertîb kiribû. ¹⁷ Kînga ko wî dîn, secde kirin jê ra, û hinikan bi weswese bûn. ¹⁸ Û Îsa bi nêz bûnê, bi wan ra xaber da, û go: Li azümanan û li ardê hemî hokmatan ji mi ra hati dayin. ¹⁹ Nua heşin hemî mîlletan talîm bikin, û tahfîl bikin wan bi navê Bav û Kur û Rûh el quds; ²⁰ Hîn bikin ji wan ra ki aw hemî tiştan bipên, çî ko mi ji we ra tenbîh kir, û va ha hemî ro ez bi we ra me, hata axrê dinê.

ÎNCÎL BI QAWLA MARKOS

SER 1

¹ Awulê Încîlê kurê Xodê Îsa el Mesîh e. ² Çawan ko li nava peyemberan hati nivîsandin: va ha ez melekê xo dişeyînîm li pêş ta da, ki dê rêya ta li bar ta hazir bike. ³ Dengik ko li çölê da gazî dike, hazir bikin rêya Xodê û tarîqê wî rast bikin. ⁴ Yûhanna li çölê da tahfil dikir, û tahfil bûnê tobayê waz dikir, ji boy aflîxê gûneyan. ⁵ Ê hemî dîyarê Yehûdîstan û Qudsûşerîfîan hemî jê ra diçûbûn û tahfil dibobûn jê li nav çayê Yordan, bi îqrar kirinê gûnê xo. ⁶ Ê Yûhanna müya deve wergirtî bû, û piştî xo qayîş girêdabû, Ê taamê wî quml û hingifê yabanî bû.

⁷ Waz dikir û digot: Li pey mi ji min zaxm tê, ki ez layîq, nin im nizm bûn, ji boy vekirinê gira solê wî. ⁸ Mi wê bi av tahfil kir, hama aw bi Rûh el Quds dê tahfil bike.

⁹ Ê bû kî, wê royan Îsa ji Nazaretê Celîlîan hat, û tahfil bû ji Yûhanna li nav Yordan. ¹⁰ Ê zû ve ji avê der hatin va, vebûnê [81] azûmanan, û jêr hatinê Rûhê weka kevoq li ser wî, dî. ¹¹ Ê dengî hat ji azûmanan, ^{aw digot:} Tu yî Kurê min delalî ji ta razî bûm. ¹² Ê zû ve Rûh awî li çöle der anî. ¹³ Ê awî çil ro li wê bû. Ji Şeytan tercûba hati bûn; bi canavaran ra bû, û melekên jê ra xizmet dikiribûn. ¹⁴ Ê paşê teslim bûnê Yûhanna, Îsa hati li Celîlê, mûjdayê padîşahîtiyê Xodê waz dikir, û digot: ¹⁵ Erki wext tamam bûe, û padîşahîtiyê Xodê nêz bûe; toba bikin, û ji Încîl ra îman bikin.

¹⁶ Ê kînga ko ji kenarê bahrê Celîlîan dibihuribû, Şimhûn û brêy Şimhûn Andriâsê dî, ko li bahrê tor davêtibûn; çima ko mahsî girtoş bûn. ¹⁷ Ê Îsa go ji wan ra: Li pey min werin, ki ez wê seydvanê merûvan bikim. ¹⁸ Ê wan zû ve torê hiştin û li pey wî çûn. ¹⁹ Ê ji wê hinik li pêş bi çûndinê, kurê Zepetosê Yaqûbê, û brêy wî Yûhannayê dî; ki wan jî li nav gemiyê torêt xo meramet dikiribûn, û gazî kir wan. ²⁰ Ê zû ve bavêt xo Zepetosê li gemî da bi paleyan ra bi hiştinê li pey wî çûn.

²¹ Ê ketin li Kafarnayumê, û zû ve li roya şemûyê keti li cîyê civaţan, û hîn dikiribû wan. ²² Ê tacîb dikiribûn li ser talîmê wî, çima ko aw ji wan ra weka yekî xodiyê hûkmatê talîm dikiribû; û na weka kâtîban. ²³ Ê li cîyê civaţa wan meruvkî hebû, ki napak rûh li hindurê wî da hebû, ki qîrî kir, û go: ²⁴ Berde, li mabeynê me û ê ta çi? heye, ya! Îsayê Nasranî; ki hatî me helak kirinê, em zanin ta tu kî î: Azîzê

Xodê. ²⁵ Îsa tazîl kir wî û go: Lal be û ji wî rabe. ²⁶ Û Rûhe [82] napak awî hijikand û bi bilind sawndkî qîra, û jê der ket. ²⁷ Û hemîyan tacîb kirin, wusan ko ji hev û du pîrs dikiribûn û digotibûn, av çi? no talîmkî e, ko bi hûkmat emr dike li ser rûhê napakan jî, û jê ra mûtêh dibin. ²⁸ Û namê wî rabû li hemî alîyê Celîlîan.

²⁹ Û zû ve ji cîyê civaṭan rabû hati mala Şimhûn û Andrîasê; bi Yaqûb û bi Hanna ra. ³⁰ Û xasûyê Şimhûn bi ta razabû, û zû ve jê ra gotin ji boy wî. ³¹ Û nêz bû ji destê wî girt rakir wî, û ta berda wî, û ji wan ra xizmet dikir.

³² Û kînga ko êvar bû, wexta ro avayê, hemî wan ko li kötî hal da bûn, û bicinan jê ra dianîbûn. ³³ Û bajêr gişk li ber derîyê hatibûn civandin. ³⁴ Û pîr naxoşan ji çeşîd çeşîd naxoşîan sax kir, û pîr cinan deranî, û ji cinan ra xaberdan nedida, çima ko wan awî dizanibûn erki Mesîh e.

³⁵ Û serê sibê zû ve bi rabûnê, rabû û çû li cîkî berîyê û li wê nimêc dikir. ³⁶ Û Şimhûn û wan ko pê ra bûn ketin li dû wî. ³⁷ Û kînga ko dîn wî, goni jê ra, erki Hemîan li ta digerin. ³⁸ Û go ji wan ra: Werin em herin li nêz bûn qasaban, ki li wê jî waz dikim, çima ko¹⁸¹ ez ji boy av tişt hatim. ³⁹ Û li cîyê cîvata wan waz dikir li nava hemî Celîlîan, û cinan derdixist.

⁴⁰ Uyuzkî hati jê ra, lava dikir, çok dikir û digot: erki bixwazî, dikarî mi pak kirin. ⁴¹ Û Îsa bi merhamet kirinê, destê xo dirêj kir, ket jê ra, û go jê ra dixwazim pak be. ⁴² Û kînga ko aw go jê ra, zû ve uyu- [83] zîtî jê çû, û pak bû. ⁴³ Û jê ra bi qawî tenbîh kirinê zû ve awî der kir, û go: ⁴⁴ Saqin ji kesê ra tiştîkî nebêjî, lê heṛa xo nîşanê xaxamê bide; û bide hedîye paqij bûnê xo, ko Mûsa emr kir ji wan ra, ji boy îsbat bûnê. ⁴⁵ Û aw rabû dest kir waz kirinê û tiştê han xaber kirinê, wusan ko hênî¹⁸² aw nedikaribû aşîkâr li bajêrkî ketinê, lê derva li cîyê yaban da bû, û ji hemî alîyan jê ra dihatibûn.

SER 2

¹ Û paşê çend royan li Kafarnayumê ket. ² Û hati bihîsdin ko li mal da e, û zû ve pîran hatin civandin, wusan ko hênî li ber derîan jî cî nema, û wî kelimê Xodê ji wan ra digot. ³ Û dihatibûn jê ra, bi çar merûvan hati helanîn kötrûmkî dianî bûn. ⁴ Û kînga ko ji qalabalixê nedikaribûn nêzê wî hatinê, helweşandin xanîyê aw malê li ko kî Îsa bû, û bi qul kirinê, jêr kirin leh'êfê, li nava aw ko kötrûm radiza. ⁵ Û Îsa îmanê

¹⁸¹ Di metnê de *ke* (nîşeya wergêrê).

¹⁸² Di metnê de *hênê*.

wan bi dîtînê, go ji kötrüm ra: Ey! kûrik güneyê ta ji ta ra afw bû. 6 Û ji kâtîban hinikan li wê hebûn ronişdî; li dilê xo difikiribûn. 7 Çî e wîa ko ahwa dijmînan dêji; kî? dikari güneyan afw bikin; ji yek Xodê tenê. 8 Û Îsa fehm kir li rûhê xo da, ko wan ahwa düşümîş dibûn li dilê xo da, û go: Av çî e? li dilê xo da düşümîş dibin. 9 Kîjan? qolay e, ji kötrüm ra gotin güneyê ta ji ta ra afw bibin?; ya bigir lehêfê xo û biger gotin. 10 Hama ahwa ko bizanin, erki [84] hökmetê kûrê meşuv heya li ser ardê güneyan afw kirinê (ji kötrüm ra go). 11 Ji ta ra dibêm, rabe bigir lehêfê xo û here mala xo. 12 Û rabû zû ve lehêfê xo send li ber mîan li derva rabû, wusan ko hemîan taacüb kirin, û ji Xodê ra şikir kirin û gon: erki wusan tişt cara me qat nedî.

13 Û rabû¹⁸³ li kenarê bahrê, û civatan gişk jê ra hatin, û hîn dikir wan. 14 Û kînga ko dibihuribû, dî kûrê Alfeos Levîyê ko li gümrügxane da roniştî bû; û go jê ra, Wêre li pey min; wî jî rabû çû li pey wî. 15 Û bû kî kînga ko li mala wî li sufrê da roniştî bû, bi Îsa ra û hem bi şagirdê wî ra tev pîr gümrügcîan û günekâran jî li sufrê da roniştî bûn, çima ko pîran hebûn ko li pey wî diçobûn. 16 Hama kâtîban û farîsîan kînga ko dîn, erki bi gümrügcîan ra û bi günekâran ra dîxo, goni ji şagirdê wî ra, Çima? wusan bi gümrügcîan û bi günekâran dîxo û vedîxo. 17 Û kînga ko bihîst Îsa go ji wan ra, ji saxan ra hekîm na lazim e lê ji naxoşan ra; ez náhatim sadîqan gazî kirinê, lê günekâran.

18 Û şagirdê Hanna û hem farîsîan rocî digirtibûn hatin û jê¹⁸⁴ ra gotin: Çima? şagirdê ta rocî nagirin. 19 Û Îsa go ji wan ra: meger qabîl? kûrê dawatan, çiqas ko zava bi wan ra erocî bigirin. 20 Hama royan dê bèn ko zava ji wan dê bê sendin, û li wê zemanê, li wê royan da rocî dê bigirin. 21 Û keskî parçayê milê xo, li ser milê kevin pîna nâdirû, erki na, ji kevin distîni no; ki [85] terîtîyê wî bû, û qatandî hênî bêtir dibe. 22 Û ná jî yekî no da tîni li nava meşkê kevin, erki ná meyê no meşkan diqatîni; mey mey dirîji, û meşkan wunda dibin; lê meyê no li nava meşkê noyan tê datînin.

23 Û bû kî li roya şemûyê awî ji nav zevîan dibihurî bû, û şagirdan ko diçobûn, dest kirin serîyê genim qurfandinê, û xwarin. 24 Û farîsîan goni jê ra: Mêze ke çî dîkin li roya şemûyê, ki cayîz nin e. 25 Û Îsa go ji wan ra, Hûn qat naxwandin? kirinê Dawûd, kînga ko lazim bû; û brçî bû awî û awan ko pê ra bûn. 26 Çawan li güna Abîtar baş îmamê ket li mala Xodê, û nanê huzûrê xwar û da wan ra; wan ko

¹⁸³ Di metnê de *rebû* (nişeya wergêrê).

¹⁸⁴ Di metnê de *jî*.

pê ra bûn, ki ji îmanan ra başqa ji yekê ra cayîz nebû xwarinê. ²⁷ Û go ji wan ra, Şemû ji boy meruv bû, û na meruv ji boy şemûê. [²⁸]¹⁸⁵ Wusan ko, Kûrê meruv xodîyê şemû jî e.

SER 3

¹ Û dîsa ket li cîyê civatan; û li wê meruvkî hebû, ki destê wî hişk bûbû. ² Û lê mêze dikiribûn ko li roya şemûyê awî sax dike?; ko jê gazinan bikin. ³ Û wî go ji destê hişk bûn meruv ra: Rabe li *ortaya* bisekin. ⁴ Û go ji wan ra li roya Şemû da amelê qanc kirin cayîz? e, yá amelê kötî kirin, cankî? xalas kirin, yaxod wunda kirin; hama wan hiskot kirin. ⁵ Û Îsa li ser wan bi nihêrtinê, bi hêrs bû; ji boy kör kör bûnê dilê wan hati qasawet bûn, ji wî meruv ra go: Destê xo dirêj ke, û wî jî dirêj kir, û destê wî rind **[86]** bû. ⁶ Û farîsîan bi Herodîsîan ra tev zû va rabûn li derva, şawr dikiribûn ji boy wî erki çawan awî helak bikin.

⁷ Hama Îsa bi şagirdê xo ra li kenarê bahrê çû, û li pey wî ji Celîle û Yehûdîstanê. ⁸ Û ji Qudsê û ji Îdumê û ji alîyê dinê Hortanê, pîr civatan çûn, û wan ko ji Dûrosê û ji Sîtonê bûn, pîr civatan kînga ko dibihîsdibûn çiqas tişt dikir; dihatibûn jê ra. ⁹ Û go ji şagirdê xo ra; ji semedê xalqê, li ba wî qayixkî piçûk bipê; ko jê ra sixlet nekin. ¹⁰ Çima ko pîr meruvan sax kir, wusan ko, hamî marazlîan ji boy lê ketinê, li ser wî diketibûn. ¹¹ Û napak rûhan kînga ko wî didîtibûn, li ber wî diketibûn, diqîrabûn û gotibûn. ¹² Erki tu yî Kûrê Xodê; hama wî dixayîdibû ji wan ra ko awî aşîkar nekin.

¹³ Li cîyê radibe û ji xo ra gazî dike awan ko, awî xosd, û çûn li balê. ¹⁴ Û dwanzdah *tenan* tayîn kir, ki pê ra bibin, û ki wan bişeyîne waz kirinê. ¹⁵ Û ki hokmatê wan bibe naxoştîan sax kirin ra, û cinan der xisdin ra. ¹⁶ Û navê Şemhûnê Petros danî. ¹⁷ Û Kûrê Zebdî Yaqûb û brêy Yaqûb Hanna, navê wanan Boanerges, yanî Kûrê gürültîyê, danî. ¹⁸ Û Andriase, û Filîbosê, û Partulîmê û Medteyê û Tumayê û kûrê Halfa Yaqûbê û Tadayê û Şimhûnê Kananî. ¹⁹ Û Yehûdayê Îsxarî, awî ko wî dest da.

²⁰ Malkî hatin; û dîsa pîr xalq ciwandin wusan ko taam xwarin ra qadîr nebûn. ²¹ Û kînga ko qusûmê wî bihîsdin; rabûn ko awî bigirin, çima ko bêhiş bûye digotibûn. **[87]** ²² Û aw kâtîban ko ji Qudsê hatibûn digotibûn ko, Baalzebûlê wî

¹⁸⁵ Di metnê de hatiye jibîrkin (nişeya wergêrê).

heye, hem jî bi serwerê cinan, cinan der dixê. ²³ Ê wan li balê bi gazî kirinê, bi temsîlan xaber dida bi wan ra, Şeytan Şeytanê çawan? dikari der xisdin. ²⁴ Ê erki padîşahîtkî; li nav xo da tê cihê bûn, aw padîşahîtî, nikari bimîne. ²⁵ Ê erki nalkî li nav xo da tê cihê bûn, ew mal nikari bimîne. ²⁶ Ê erki Şeytan awî li ser xo rabûye û hati cihê bûn, awî nikari bimîne, lê paşê wî hatî. ²⁷ Ê qat yekê nikare li mala mêrkî bikeve û málê wî yaxma bike. ²⁸ Bîra dibê jî we ra, erki hemî günean dê bên afw bûn jî kure meruvan ra, û küfran, çiqas ko küfir dikan. ²⁹ Hama kî ko jî der haqê Rûh el Qudsê küfr dêje; jî wî ra qat li ebada afw dê tunne be; îlla jî ebedê hökmê ra deyndar dibe. ³⁰ Çima ko digotibûn, erki rûhê napak heye li hindurê¹⁸⁶ wî da.

³¹ Paşê dî û brêyet wî hatin, û li derve bi sekinandinê, şîandin û awî gazî dikiribûn. ³² Ê xalq li çar alîyê wî roniştî bûn; û kînga ko goni jê ra: Wahâ dî û brêyet ta li derve ta dixwazin. ³³ Cewab da jî wan ra û go, dî û brêyet min kî? ne; û nazar kir li ser wan ko li çar alîyê wî da roniştî bûn, û go: ³⁴ Va hâ dî û brêyet min. ³⁵ Çima ko kî ko meramê Xodê dike, awî e brê û xuşk û dîyê min.

SER 4

¹ Ê dîsa li ba bahrê da dest kir hîn kirinê, û li balê pîr xalq civandin, wusan ko [88] awî li gemî da ket û li ser bahrê ronişt; û xalq hemîan li ba bahrê li (zwayî da) bûn. ² Ê bi temsîlan pîr tiştan hîn dikir jî wan ra, û digot jî wan ra li talîmê xo da. ³ Bîbihîsin, va ha tovkiro x ji bot tov kirinê rabû. ⁴ Ê bû kî wexta tov kirinê hinikan li ser rê ketin, û tayran hatin û awî xwarin. ⁵ Ê başxasîan li cîyê qaraj ketin li ko kî pîr harî tunne bû, jî qurîtiyê harî tunne bûnê zû ve şîn bû. ⁶ Ê kînga k otav ket germ bû, û jî qurm tunne bûnê, hişk bû. ⁷ Ê hinikan ketin li nava istirîan, û istirîan rabûn û xeniqandin wî û fêkî neda. ⁸ Ê hinikan li ardê rind ketin, û rabû mezin bû fêkî dida; û dianibû li cîyê yekê sî, û yekê şêzt û yekê sed. ⁹ Ê jî wan ra digot, jî kê ra ko jî bihîsdin ra go heye bra godarî bike.

¹⁰ Ê kînga ko awî tenê ma, awan ko li ba wî da bûn bi dwanzdan ra tev, pîrs kirin jê aw temsîla. ¹¹ Ê jî wan ra go, jî we ra hatî dayin sîrê padîşahîtiyê Xodê zanin; û hama jî wan ra ko jî dervê nin, her tişt bi temsîla dibe. ¹² Kî bi dîtinê dê bibînin, û nebînin, û bi bihîsdinê dê bibihîsin, û dê fehm nekin, kî nebe vegezin, û güneyê wan afw bibe. ¹³ Ê go jî wan ra: Av temsîlê han nizanin?, erki wusan e hûn

¹⁸⁶ Di metnê de *hihdurê*.

çawan? hemî temsîlan dê bizanin. ¹⁴ Tov kirox sözê tov dike. ¹⁵ Ê li ser rê da bûn tovan awan in, li ko kî kelam tê ajotan, û kînga ko awî dibihîsin, Şeytan tê û li dilê wan da hati ajotin kelamê der dixe. ¹⁶ Ê li cîyê qarajan hati tov bûn wan in, ki kînga ko kelamê dibihîsin, **[89]** ¹⁷ Ê ji boy li nav xo da qurm tunne¹⁸⁷ bûnê tenê hinik zeman disekini, û paşê kînga ko bi samedê kelamê sixletkî ya qawerandinkî tê, zû va xwar dibin. ¹⁸ Ê li nav istirîan hati tov bûn wan in; ki kînga ko kelamê dibihîsin. ¹⁹ Hama aşxalê vê dinê û xapxapokê zengînîtiyê li nav dikevin û kelamê dixeniqînin, û bê meywe dibe. ²⁰ Ê li ardê rind hati axotan wan in, ki kelamê dibihîsin û qabûl dikin; û meywe didin ji yekê sî ji yekê şêzt ji yekê sed *qat*.

²¹ Hem ji wan ra go, meger çira li bin ölçegê ya li bin lihefê datînin ra tê?, na? ko ji boy li ser şamdandatinin ra tê, ²² Çima ko tunne veşartin tiştîkî ko dê aşîkâr nebe, û tiştîkî dizîka ko dê neyê meydanêç ²³ Ji kê ra ko ji bihîsdin ra go heye, bra godarî bike.

²⁴ Ê ji wan ra go: Mêze kin çî ko hûn dibihînin, bi çî ölçegê ko hûn dipêvin, bi wî ölçegê dê bê ji we ra pîvandin, û ji we ra ko godarî dikin dê zêda bibe. ²⁵ Ji kê ra ko heye ji wî ra dê bê dayin û ji wan ra ko tunne çî ko wî heye jî, dê bê sendin.

²⁶ Hem digot, padişahîtiyê Xodê ahwa e, çawan ko merûvkî li ardê tovê bixe. ²⁷ Ê li şev û li ro xew da diçû û radibe; û tov şîn dibe û mezin dibe; awî nizani erki çawan. ²⁸ Çima ko harî ji xo meywe dide, awul gîyayê, û paşê simbilê, û i wî pê va tija genim li nav simbil da. ²⁹ Hama kînga ko meywe dide zû ve dasê dişeyîne, çima ko wexta çînandin gîya ye.

³⁰ Ê digor: padişahîtiyê Xodê ji çî? ra bişîbînim, ya bi çî? temsîla nişan bidim. ³¹ Weka habê xardalê e; ki aw li ardê wexta ko tê **[90]** tov bûn, li nava ardê bûn ji hemî tovan piçûk e. ³² Hama kînga ko tê tov bûn şîn dibe, ji hemî pençaran jî mezin dibe; û gûlîyêt mezina tîne; wusan ko li bin sîyê wî da daninê teyrê asûman ra bes dibe.

³³ Ê nua bi temsîla xaber dida bi wan ra kelamê ki dikaribûn fehm kirinê. ³⁴ Ê bê temsîla bi wan ra tiştîkî xaber nedida, hama wexta xalî bûnê hemî jî beyan dikir ji şagirdê xo ra.

³⁵ Ê li wê ro da kînga ko êvar dibû, ji wan ra g1: li alîyê din em bibihurin. ³⁶ Ê xalq hiştin û awî çawan ko li gemî da bû, sendin; û pê ra başqa gemîyêt piçûkan jî

¹⁸⁷ Di metnê de *tunn ne*.

hebû. ³⁷ Û mezin firtunakî bayê bû, û dalxayan li gemîyê diketin, wusan ko hama tija dibûbû. ³⁸ Û aw li alîyê paşê gemîyê li ser balîvê xew da diçobû; awî ji xewê rakirin û jê ra gotin: ya! Xoca, va ha! em helak dibin hacetê ta nîne. ³⁹ Û heşar bû, xayidî li ser bayê, û ji bahrê ra go, hiş bi, lal be; û ba sekinî, û mezin xoşîtîkî bû. ⁴⁰ Û go ji wan ra: çima? hûn wusan tirsok in, çima? îmanê wê tunne, û pîr bizdîan û ji hevûdu ra digotibûn, acaba vîa kî? e ko hem ba û hem bahr jê ra mütah dibin.

SER 5

¹ Û hatin alîyê dinê bahrê li welatê Kadarîan. ² Û kînga ko awî ji gemîyê hati der, ji tirban merûvkî laqa wî hat, ki murdar cinê wî hebû. ³ Ki meskânê wî li tirban da bû; bi zencîran jî keskî nedikaribû [91] awî girê da. ⁴ Çima ko pîr caran awî hatibû girê dan bi qaydan û bi zencîran, zencîran diqurifandibû û qaydan dişikênandibû; û keskî nedikaribû awî zawf kirinê. ⁵ Çima ko li şevê û li rojê her wext li nav tirban û li çîyan da diqîrabû; û awî xo bi keviran dikuta. ⁶ Nua kînga ko ji dûr va Îsayê dî; bazîa û secde kir jê ra. ⁷ Bi bilind sawndkî qîra, û go: Çi? şixulê ta bi me ra heye ya! Îsa Kûrê Allah taalayê, ta bi navê Xodê sond kirinê didim mi li îskencîyê mexe. ⁸ (Çima ko awî jê ra digotibû: Ya! rûhê murdar ji merûvê were der). ⁹ Û jê pîrs kir erki navê ta çi e; û awî go: navê min lekeon, çima ko em pîr in. ¹⁰ Û pîr lava dikiribûn jê ra ko wan ji ew dîyarê der neşeyîne. ¹¹ Û li wê nêzê çîyê garankî mezin xinzîr hebû, ki diçêrîabûn. ¹² Û hemî cinan jê ra lava kirin û gon, me ji xinzîran ra bişeyîne, ki li wan em bikevin. ¹³ Û emr kir ji wan ra û kînga ko der ketin û garan ji bazdekê bazîan li bahrê, û li bahrê da xaniqîn; (qasa du hazaran hebûn). ¹⁴ Û gavanê xinzîran; revîan, li bajaran û li gûndan xaber kirin, û wan rabûn dîtîne, erki aw çi? tişt e ko bû. ¹⁵ Hatîn li ba Îsayê, û dîn aw bi cinnê li wî kî lekeon hebû, cilê xo wergirtin û aqilê wî li serî da ronîşdî bû; û bizdîan. ¹⁶ Û wan ko dîbûn ji wan ra naql kirin, erki çi hat li ser bi cinnê, û hawalê xinzîran. ¹⁷ Û jê ra lava kirinê başlamîş bûn; ki ji sînorê wan here. ¹⁸ Û kînga ko awî li gemîyê ket aw bi cinnî lava dikir jê ra, ko pê ra bibe. ¹⁹ Hama Îsa awî berneda; îlla jê ra go, here mala xo ji qisûmê xo ra, û naql bike [92] ji wan ra çi ko Xodê kir û merhamet kir ji ta ra. ²⁰ Û aw çû, û dest kir li welatê Tegapulîsê waz kirinê, çi ko Îsa jê ra kir, û hemîan jî tacûb dimabûn. ²¹ Û Îsa kînga ko dîsa li alîyê dinê bahrê bihurî, pîr xalq civandin li balê, û awî li kenarê bahrê da bû; ²² Û va ha

mezinê civatan¹⁸⁸ yekî navê wî Hayrus li ba wî hat; kînga ko awî dî, ket li linga wî. ²³ Û pîr lava dikir jê ra û digot, erki qîzikê min li son nefes da ye, wera destê xo li ser deyne, ki xalas bibe û bijî. ²⁴ Û çû pê ra, û pîr civatan li pey wî diçûbûn; û jê ra ezîyet didabûn.

²⁵ Û li dwanzah sal jê xuyn çûndox li îletkî bûn jinikkî. ²⁶ Ki li destê hekîman pîr kişandibû; û warîyetê xo hemî telef kiribû, û faydakî nedîbû, lê hênî beter bûbû. ²⁷ Kînga ko ji boy Îsayê bihîst li nava xalqê ji pêş ve hat, û li cilê wî ket. ²⁸ Çima ko li dilê xo da digot: erki tenê li cilê wî bikevim dê xalas bibim. ²⁹ Û zû va xuyn çûndinê wî brîa; û li gövda xo da hasîa, ki ji aw îletê şîfa dî. ³⁰ Û Îsa zû va hasîa li xo ki aw quwwet jê rabû, vegerîa li nav xalqê û go, kî? ket li cilê min. ³¹ Û şagirdan gon jê ra, dibînî ko xalqê ta diasirîne; û dêjî, erki kî ket li cilê min. ³² Û li çar alîyê xo mêze dikir ko bibîne erki kî? kir av tişt. ³³ Û jînik bizdîa û lerza, çima ko hasîa ko jê ra çî bû, û hat li ber wî ket û hemî *tiştan* rasdi rasd jê ra xaber da. ³⁴ Û Îsa jê ra go: Ya! qîz îmanê ta, ta xalas kir, hare bi selamet û ji derdê xo sax bibe.

³⁵ Û awî çiqas ko xaber dida hinikan ji alîyê [93] mezinê civatan hatin û gon: erki qîzê ta mir; hênî çima zahmet didî ji xoca ra. ³⁶ Hama Îsa kînga ko bihîst aw xabera ko hatin xaber dan, ji mezinê civatan ra go: metirs tu tenê îman bîne. ³⁷ Û yekî berneda pê ra çûndinê, tenê Petros û Yaqûb û brêy Yaqûbê Hanna. ³⁸ Û li mala mezinê hat, û dî şamatayê û hem awan ko digrîa bûn û ferîad dikiribûn. ³⁹ Û li hindur ket, û go ji wan ra: çimá hûn şamata dîkin û digirin, *kurik* nemirîe, lê xew da diçû. ⁴⁰ Û awî masqara dikiribûn, hama awî hemîan derve kir, û bi xo ra girt bav û dîyê *kurik* û wan ko pê ra bûn; û li li wê ket li ko kî *kurik* hatî bû datînin. ⁴¹ Û destê *kurikê* bigirtinê, go jê ra: Dalîta qûmî, ki tercûme dibe, Ya! qîz (ji ta ra dibêm) rabe. ⁴² Û zû va qîzik rabû û digerîa, çima ko qasa dwanzdah salan bû, û wan bi mat bûnê şaş bûn. ⁴³ Û ji wan ra qawî tenbîh kir ko vîa keskî nizane; û go ki jê ra taam bidin.

SER 6

¹ Û ji wê bi rabûnê hati li welatê xo, û şagirdê wî çûn li pey wî. ² Û bû kî li roya şemûê dest kir li nav cematê wan hîn kirinê û pîran kînga ko dibihîstibûn, acêb dimabûn li ser talîmê wî; û digotibûn ava *tiştan* ji wî ra ji ko?, û ji vîa ra hati dayin îlm çî? e, ki ahwa kerematan dibin bi destê vîa. ³ Vîa aw nacaş nin e? *kurê* Meyremê,

¹⁸⁸ Di metnê de *civatan*.

û brêy Yaqûb û Hoses û Yûda û Şimhûnê, û xuşkê vîa livir li ba me nin in? û li ser wî xwar bibûn. ⁴ Û go ji wan ra: pey- [94] xemberkî bêitibar nin e, li başqa derkî, lê tenê li welatê xo û li nav xisumê xo li mala xo da. ⁵ Û li wê qat nedikaribû kerematî jî bike, lê tenê li ser çend naxoşan destê xo bi datîninê sax kir wan. ⁶ Û ji boy îmansizîtiyê wan tacûb dikir, û digerîabû li dorê aw qasaban û hîn dikir.

⁷ Û dwanzdahan ji xo ra bi gazî kirinê û wan dido, dido ji şîandin ra başlamîş bû; û ji wan rali ser rûhêt napakan hokmat da. ⁸ Û tenbîh kir ji wan ra ko ji boy rê tîştî nestînin; lê tenê çovkî; na tûr, na nan; na dirav li kemerê xo da. ⁹ Lê çaroqan pêkin, û du xaftan wermegirin, go; ¹⁰ Û go ji wan ra, li mala kê ko hûn diçon li wê bisekinin, hata ko ji wê rabin. ¹¹ Û wan ko wê qabûl nakin û ji we ra godarî nakin, kînga ko ji wê radîbin, toza linga xo dawêşînin ji boy şahadetîyê wan.

¹² Û wan rabûn waz dikiribûn; ki *marûvan* toba bikin. ¹³ Û pîr cinan der dixistibûn, û pîr naxoşan bi rûn rûn dikirinbûn, û sax dikiribûn wan. ¹⁴ Û Herodîs padîşah bihîsd, (çima ko navê wî aşîkâr bû,) û digot erki Hannayê tahfilçî ji mirîan qiyam kirê; ji boy wî kerematan dibin bi destê wî. ¹⁵ Başxasîan digotibûn ko Îlîa e, û hinikan digotibûn ko peyxemberkî e, ya yekê weka peyxemberan e. ¹⁶ Hama kînga ko Herodîs bihîsd go, Vîa Hanna e serê awî ko mi jê kir; ji mirîan qiyam kirê.

¹⁷ Çima ko Herodîs awî şîand Hannayê girt û grê da awî û danî li hapsê, ji boy Herodîa jina brêy wî Filîbosê, çima ko awî ji xo ra jin [95] girt. ¹⁸ Çima ko Hanna ji Herodîs ra digot erki ji ta ra cayîz nin e jina brêy xo girtin. ¹⁹ Û xarazê Herodîa hebû pê ra û dixosdibû awî kuştin; û nedikaribû. ²⁰ Çima ko Herodîs ditîrsîa bû ji Hanna, bizanibû erki awî sadîq û muqddes merûvkî e; û devê wî mêze dikir, û jê ra bi godarî kirinê pîr tîştan dikir, û ji dil jê ra godarî dikir. ²¹ Û kînga ko mînasîb rokî bû, ki Herodîs li roya mewlûdê xo dawet dikir ji beyzadan ra û ji bînbasîan ra, û ji wucûhê Celîlîan ra. ²² Û kînga ko qîzê Herodîayê hat û reqîsî, Herodîs û wan ko li sufrê da ronişdibûn¹⁸⁹ pîr begenmîş bûn; û padîşah go ji qîzik ra: Bixwaz ji min, çî ko dixwazî dê bidim ji ta ra. ²³ Û jê ra sond xwar ko; Çî ko tu ji min bixwazî, dê bidim ji ta ra hata nivê padîşahîtiyê min. ²⁴ Aw jî rabû ji dîyê xo ra go: ez çî bixwazim; wî jî go, serê Hannayê tahfilçî. ²⁵ Û zû va qîzik bi ecele çû li ba padîşahê û go: dixwazim zû va li ser tepsîkî serê Hannaê tahfilçî ji mi ra bidî. ²⁶ Û padîşah pîr qasawet kir, hama ji boy sondan û ji boy awan ko li sufrê da ronişdî bûn nexosd ki ji xaberê xo vegeza. ²⁷

¹⁸⁹ Di metnê de *ronişdabûn*.

Û padîşah zû va cellad şîand û serê wî anin ɾa emr kir, awî jî hapsê da serê wî jê kir.
28 Û bi tepsîkî anî serê wî û da ji qîzik ɾa, û qîzik bir da ji dîyê xo ɾa. 29 Û kînga ko şagirdê wî bihîsdin, hatin leşê wî helanîn, û danîn li tîrbê.

30 Û resûlan¹⁹⁰ li ba Îsa hatin civandin; û tarîf kirin jê ɾa her çî ko kirin, û çî ko hîn kirin. 31 Û ji wan ra go, Werin hûn xo bi xo tenê li [96] cîkî yabanê, û hinik rahat bin, çîma ko hatox û çûndoxan pîr bûn; û xwarin ɾa bîle wextê wan tunne bû. 32 Û wan bi gemîyê, bi tenê cîkî yabanê çûn. 33 Û kînga wan diçûbûn xalqê wan dîn; û pîran awî nas kirin, û ji hemî bajaran peya li wê dibazîabûn, û li ber wan gîyan; û li ba wî civandin. 34 Û kînga ko Îsa ɾabû pîr xalq dî, û ji wan ɾa merhamet kir; çîma ko weka mîan bûn ko şivanê wan tunne; û dest kir ji wan ɾa pîr tîştan waz kirin.

35 Û kînga ko wext bihurî, şagirdê wî hatin li balê, gon erki av cî yaban e, û hênî wext bihurî e. 36 Awan berde ki heɾin çar alî qasaban û gûndan ji xo ɾa xwarin bikîrin; çîma ko livir tîştê wan ji xwarin ɾa tunne. 37 Û awî cewab da û ji wan ɾa go: hûn bidin ji wan ɾa ko bixun. 38 Gon jê ɾa, em biçun¹⁹¹ ji du sed dînara nan bikîrin?, û em bidin ji wan ɾa ko bixun. 39 Go ji wan ɾa, Çend nanê wê heye heɾin û mêze kin, kînga ko sahîti kirin gon jê ɾa, pênc nan û du mahsî. 40 Û emr kir ji wan ɾa ko li ser gîyayê şîn ronin bөлük bөлük, û sîra sîra ronişdin, sed sed û pêncî pêncî. 41 Û awî pênc nanan û du mahsîyan send rast li asûmanan nihêrî, û mübarek kir, şîkest nanan û du mahsî jî ji hemîan ɾa pay kir. 42 Xwarin û têr bûn. 43 Û dwazdah sepet parça, hem ji mahsîan helanî. 44 Û xwaroxan qasa pênc hazar meɾuv hebûn.

45 Û zû va ecele kir ji şagirdan ɾa ko li qayixê bikevin; li pêş wî aw alîyê din Petsayîtayê heɾin; hata ko awî xalqê berde. 46 Û ji [97] wan bi qatandinê ɾabû li çîyê nimê kirinê. 47 Û kînga ko êvar bû; û gemî li orta bahrê da bû û awî bi tenê li zwayî da bû. 48 Û awan dî ko ji ber kişandinê li ezîyetê da bûn çîma ko ba ji wan ɾa qarşî bû, û li wexta dördüncî nobetê şevê, li ser bahrê bi çûndinê ji wan ɾa hat; û dixosd wan bihurtin bîle. 49 Û wan kînga ko dîn ki li ser bahrê diçûbû, wan aciband ko xeyal e, û qîrî kirin. 50 Çîma ko hemî jî awî dîn, û bizdîan; û awî zû va xaber da bi wan ɾa, û go: mêr bîn ez im metîrsin. 51 Û ɾabû li gemî li ba wan, û ba sekinî; û hênî pîr met bûbûn li dilê xo da, û pîr tacüb mabûn. 52 Çîma ko ji xusûsê nanan fehîm nekirin; çîma ko dilê wan qalîn bûbû.

¹⁹⁰ Di metnê de *resûllan*.

¹⁹¹ Di metnê de *em bi biçun*.

⁵³ Û kînga ko aw alîyê din bihurin, hatin li dîyarê Kenesaretê. ⁵⁴ Û kînga ko ji gemîyê hatin der; *tavîlê* awî nas kirin. ⁵⁵ Û ji vir û ji wê bazîan li çar alî qasaban; dest kirin bi lihêfan naxoşan aninê; li ko kî didihîsdibûn erki aw li wê e. ⁵⁶ Û li ko kî awî diketibû; li gûndan, ya bajaran, ya li qasaban, naxoşan li meydan da dadinîbûn¹⁹² û lava dikiribûn jê ra; barê li pêşa cilê wî bikevin, û wan hemî ki diketibûn awî, xalas dibûbûn.

SER 7

¹ Û li balê hatin civandin farîsîan û ji kâtîban hinikan, ki ji Qudsê hatibûn. ² Û kînga ko dîn hinikan ji şagirdê wî ra napak, yanî bi destê neşûşdin nan dixwari- **[98]** bûn zem kirin. ³ Çima ko farîsîan û Yehûdîan gişk hat ko qanc destê xo neşon, nan naxun; çima ko tenbîhê îxtîaran digirin. ⁴ Û ji çarşîyê ko tên, awul hata neyêne şûşdin naxun; û başqa pîr tiştan heye ki qabûl dikin girtinê; yanî şûşdinê tasan û şerban û fîraqê xarinan û lihêfan. ⁵ Wê çaxê farîsîan û kâtîban pîrs kirin jê; erki çima? şagirdê ta weka tenbîhê îxtîaran naçûn, lê bi destê napak nan ixun. ⁶ Awî cewab da û go ji wan ra, qanc peyemberîti kir Îşaya ji boy wê mürayîyan, çawan ko go: av qawmê han bi lêvan ji mi ra îzzet dike, û dilê wan ji min dûr in. ⁷ Û li nafiye cî da ji mi ra îbadet dikin, û tenbîh û talîmê merûvan hîn dikin. ⁸ Tenbîhê Xodê wê berdane û tenbîhê merûvan digirin, şûşdinê şerban û tasan û weka wanan pîr tiştan dikin. ⁹ Û go ji wan ra, çi? qanc, ji boy tenbîhê xo girtinê, tenbîhê Xodê batal dikin. ¹⁰ Çima ko Mûsa dêje, ji bav û dîyê xo ra îkram bike, û kî ko ji bav û dîyê xo ra dijmînan dike awî elbete dê bê kuştin. ¹¹ Hama hûn dêjin, erki yekî ji bav ya ji dîyê xo ra bêje: aw tişt ko tu dê ji min fayde bikî, *aw ji Xodê ra dayin ra* qurban e, (Yanî hedîye e,) *aw xalas dibi.* ¹² Û hênî hûn bernadî jê ra tiştî kirinê bav ya ji dîyê xo ra. ¹³ Û bi tenbîhê wê ko hûn tenbîh dikin kalamê Xodê batal dikin, û hênî tiştan dikin ko weka vîa e. ¹⁴ Û xalqê hemîan li ba xo bi gazî kirinê, go ji wan ra: ji mi ra godarî bikin hûn hemîan û fehm bikin. ¹⁵ Ka tiştî tunne ko ji derve li hinurê merûv biço; û bikarî awî murdar kirinê, lê wan ko ji wê tîni **[99]** der, awî e ko merûv murdar bike. ¹⁶ Ji kê ra ko ji bihîsdin ra go heye bra godarî bike.

¹⁷ Û kînga ko ji xalqê, bi qatandinê keti li mal, şagirdan ji xusûsê temsîlê jê pîrs kirin ¹⁸ Û ji wan ra go, hûn? jî wusan bêfehm in, hûn fehm nakin? ko, her çi ko ji

¹⁹² Di metnê de *da diîninibûn*.

derve li hindurê meruv diço, nadikari awî murdar kirin. ¹⁹ Çima ko aw, li dilê wî nediço, lê zikê wî, û hemî taaman bi paqij kirinê li der tê. ²⁰ Ê digot her çi ko ji hindurê meruv tê der, awî meruv murdar dike. ²¹ Çima ko ji hindur ji dilê meruvan der tèn kötî fikran, zînan, fahşîtîan, dizîtîan. ²² Qatlan, tamakârîtîan, yaramazîtîan, hîle, edeb[sî]zîan, kem nazar, küfr, kîbîrîtî, arsızîtîan. ²³ Hemî av yaramaz tiştan ji hindur tèn der, û meruvan murdar dikan.

²⁴ Ê ji wê bi rabûnê, hat li sînorê Dürosê û Sîtonê û li malkî ket nedixostî bû ko yekê pê bihasa, qadîr nabû bê veşartin. ²⁵ Çima ko jinkî ko qîzikê wî ji napak rûhê ezîyet dikişandibû bihîst ji boy wî; hati li ber wî ket. ²⁶ Ê av jinik Yûnanî ji cinsa Sîrofinig bû, û lava dikir jê ra, ki cin ji qîzikê wî der xe. ²⁷ Îsa go jê ra: Berde bra awul zarûkan tîr bibin, çima ko nanê zarokan sendin, û ji wan ra avêtin qanc nin e. ²⁸ Ê awî cewab da û go, Be'lî ya! Rabb, san ji ji hûrikê sufrayê zarûkan dixun. ²⁹ Ê go jê ra: ji boy vî sözê hare ji qîzikê ta cin rabû. ³⁰ Ê gava jinik çû li mal, cinê hati der, û qîzikê li lihêf da dî.

³¹ Ê dîsa ji sînorê Dürosê û Sîtonê bi rabûnê, li orta sînorê Tîkabolîsê li ba bahrê [100] Celîlê hat. ³² Ê jê ra yek ker û peltek meruvkî anîn, û jê ra lava dikirin ko li ser wî destê xo deyne. ³³ Ê ji xalqê alîkî girt awî, û pêçiyê xo li goya awî kir, û li wê tû kir, û ji zimanê wî girt. ³⁴ Ê rast li asûmanan nihêrt, ax kişand, jê ra go: Effata, (yanî vebe). ³⁵ Ê zû va goyê wî vebû, û girê zimanê wî vebû, û rast xaber dida. ³⁶ Ê ji wan ra tenbîh kir ko ji kesê ra nebêjin, ham awî çiqas ko tenbîh dikir ji wan ra; wan hênî pîr waz dikiribûn. ³⁷ Ê pîr tacûb dikiribûn û digotibûn, her tişt awî qanc kir, ki ji keran ra bihîsdin dide, û ji lalan ra xaberdan.

SER 8

¹ Wê royan da dîsa pîr xalq hebû, û ji xwarin ra tiştê wan tunne bû, gazî kir şagirdê xo, go ji wan ra. ² Heyfa mi tê li ser wî xalê; çima ko nua sê ro e li ba min sekinîn; û tiştê wan tunne xwarin ra. ³ Ê erki wan birçî li mala xo bişeynîm, li rê da taqatê wan dê bibire; çima ko ji wan hinikan ji cîyê dûr hatine. ⁴ Cewab dan jê ra şagirdê wî, li wî çolê da ji? ko tu dikarî bi nan wanan tîr kirinê; ⁵ Ê pîrs kir ji wan, çend? nanê wê heye, û wan gon, haft. ⁶ Ê emr kir ji xalqê ra, ki li ser ardê ronîn, û haft nanan send, şikir kir şikênand û da ji şagirdan ra ko li ber xalqê deynin; û wan danîn li ber xalqê. ⁷ Ê hem çend mahsîyê wan hebû û şikir kir, û emr kir ki wan jî li ber wan deynin. ⁸ Xwarin û tîr bûn, û haft [101] zenbîl ji zêde bûn parçan helanîn. ⁹

Û xwaroxan qasa çar hazar bûn, û wan berda. ¹⁰ Û zû va li gemîyê bi ketinê bi şagirdê xo tev, hati sînoŕê Dilmanûtayê.

¹¹ Û farîsîan hatin û dest kirin pê ra doz kirinê, û awî bi carabandinê nişankî ji azümanan jê dixostibûn. ¹² Û aw li Rûhê xo da ax kişand, û go: Av sîlsîle çima nişan dixwaze, bîra dibêm ji we ra: vî sîlsîleyê han ra nişan dê neyê dayin. ¹³ Berda wan, dîsa ket li gemîyê, û çû li wî alîyê bahrê.

¹⁴ Û nan sendin bîr kirin, û li gemî da ji nankî pêtir tiştê wan tunne bû. ¹⁵ Û ji wan ra emr kir, û digot: Mêze kin, ji hevîrê tirşê farîsîan û Herodîan saqin bin. ¹⁶ Û li nav xo da wan fikir dikiribûn, û digotibûn, ji boy nan tunne bûnê me e. ¹⁷ Îsa zani û go ji wan ra: Çima? ji boy nan tunne bûnê xo fikir dikin; hêja hûn fehm nakin? û li bîra xo nayinin?, hêja dilê wê hijk in. ¹⁸ Çahvê wê heye û nabînin, goyê wê heye û nabihîsin, û bîra xo nayinin. ¹⁹ Kînga ko pênc nanan li nav pênc hazaran mi şikênand, çand? kufa tija parçan wê helanî; gon jê ra dwanzdah. ²⁰ Û kînga ko haft nanan li nav çar hazaran mi şikênand, çand? zenbîl tija parçan wê helanî; û wan gon, haft. ²¹ Û go ji wan ra: Lê çawan? hûn fehm nakin.

²² Û hati li Betsayîtayê û jê ra kôrkî anîn, û jê ra lava dikiribûn ko bikeve lê. ²³ Û ji destê kôr girt ji gund der xisd, tû kir li çahvê wî û destê xo li ser wî danî, û pîrs dikir jê, erki tiştê dibîne?. ²⁴ Mêze kir, û digot: Merûvan weka daran dibî- **[102]** nim, ki digerin. ²⁵ Dîsa destê xo li ser çahvê wî danî, û awî nihêrtin da, û awî sax bû, û her tişt aşîkâr didîbû. ²⁶ Awî li mala xo şîand û go: Li gund mekev û li gund kesê ra mebêj.

²⁷ Û Îsa bi şagirdê xo tev rabû li Filîbus hati gotan qazayê Qayserîyê, û li rê dapîrs dikir ji şagirdan ra, û digot: Merûvan ez kî? me dê jin. ²⁸ Û wan cewab dan û gon: Hannayê tahfilçî e dêjin, û hinikan Îlîa e başqasîan ji peyemberan yekê. ²⁹ Go ji wan ra hama hûn ez kî? me dêjin; cewab da Petros û go jê ra: Tu î Mesîh. ³⁰ Û ji wan ra qanc tenbîh kir ko ji boy wî ji kesê ra nebêjin.

³¹ Û dest kir ji wan ra hîn kirinê; erki lazim e ko Qurê meruv, pîr ezîyetan bikişîne, û ji îxtîaran û ji baş xaxaman û ji kâtîban, bê red bûn, û bê kujdin, û li roya sisê da qiyam bike. ³² Û av xaber aşîkâr digotibû, û Petros li ba xo send awî, dest kir jê ra qarşî gotinê; ³³ Û awî vegeŕa li şagirdan mêze kir; tazîl kir ji Petros ra û go, li pey min hare; Ya! Şeytan, çima ko tu tiştê Xodê düşümîş nakî¹⁹³, lê tiştê î[n]san.

¹⁹³ Di metnê de *nekî*.

³⁴ Û xalqê bi şagirdê xo tev gazî kir, go ji wan ra: erki yekî dixwaze li pey min hatin bira awî xo înkâr bike, û xaçê xo helîne û li pey min bê. ³⁵ Çima ko; kî ko dixwaze canê xo xalas kirin, awî dê wunda bike, û kî ko ji boy min û ji boy Încîl canê xo wunda dike, dê xalas bike awî. ³⁶ Çima ko çi? fayde dê bibe ji meruv ra erki hemî qazanc bike û canê xo wunda bike. ³⁷ Yaxod meruv bedela canê xo dê çi? bide. ³⁸ Çima ko kî ko li na- [103] va av zînakâr û günekâr sîlsîle da ji boy min û kelimê min şerm dike; Qurê meruv jî awî dê bi şerm bike, kînga ko bi saltanatê bavê xo û bi muqaddes melekan bê. ³⁹ Û go ji wan ra bira dibêm ji we ra ko ji vir sekinandoxan¹⁹⁴ hinikan hene ko tahma mirinê dê nestînin, hata ko bi bînin padîşahîtyê Xodê bi quwet hatin.

SER 9

¹ Û paşê şeş royan, Îsa Petros û Yaqûb û Hannayê send, û awanan bi tenê li ser çiyêkî bilind bir, û li ber wan tebdîl bû. ² Û cilê wî beriqî bûn pîr sipî wusan ko li ser ardê qasarcîan nikarin wusan sipî kirin. ³ Û Îlya bi Mûsa ra ji wan ra xuyayî bû, û bi Îsa ra xaber didabûn. ⁴ Û Petros cewab da û go ji Îsa ra: Ya! xoca' qanc e ji me ra ko em livir bibin, nua sê holikan em çêkin, yek ji ta ra, yek ji Mûsa ra, û yek ji Îlîa ra. ⁵ Çima ko aw nedizanibû çi bêje, çima ko pîr bizdîa bûn. ⁶ Û ji wan ra sî kirox awurkî bû, û ji awrê sawndkî bû û go: Awî e Qurê min delalî, jê ra godarî bikin. ⁷ Û qafil wan ko li dorê xo mêze bikin başqa yekê nedîn, lê tenê Îsa bi wan ra. ⁸ Û wan kînga ko ji çiyê dihatibûn xwari, tenbîh kir ji wan ra ko dîtinê xo ji kesê ra nebêjin, hata ko Qurê meruv ji mirîan qiyam bike. ⁹ Û wan av xaber li bira xo girtin, û li hev û du pîrs dikiribû[n], erki ji mirîan qiyam kirin çi? e. ¹⁰ Û pîrs kirin jê û gon: çima? kâtî[b]an dêjin erki lazim e awul Îlîa bê. ¹¹ Û awî [104] cewab da û go ji wan ra, bira Îlîa awul tê her tişt li cî da tîne, hama çawan hatî nivîsandin ji boy Qurê meruv, ki pîr tiştan dê bikşîne û tiştêkî dê hasab nebe. ¹² Hama ez ji we ra dêjim ko Îlîa hat, û çi ko xosdîn jê ra kirin, çawan hati nivîsandin ji boy wî.

¹³ Û hati li ba şagirdan dî, pîr xalq li ra wan û kâtîban ki doz dikiribûn bi wan ra. ¹⁴ Û zû va xalq hemîyan kînga ko awî dîn şaş bûn, û li pêş bi bazdanê silavan jê ra didabûn. ¹⁵ Û aw pîrs kir ji kâtîban, erki çi doz hûn dikiribûn bi wan ra. ¹⁶ Û ji xalqê yek cewab da û go: Ya! xoca mi Qurê xo ji ta ra anî ki lal rûhê wî heyê. ¹⁷ Û awî li ko

¹⁹⁴ Di metnê de *sekirandoxan*.

ki digire, li ardê dixe û kef dibe û didanê xo diqirçîne û hişk dibe, û mi ji şagirdê ta ra go kî der xin, û wan nikaribûn. ¹⁸ Cewab da ji wan ra û go: Ey! îmansiz sîlsîle, hata kînga dê ji we ra sabir bikim, hata? kînga dê bi we ra bibim, ji mi ra bînin awî. ¹⁹ Ê awî anîn jê ra, kînga ko rûh awî dî, zû va dawêşand wî, û li ardê ketibû digevizî û ji bavê wî pîrs kir, û go. ²⁰ Çiqas? wext e ko av tişt jê ra bû; û awî go, ji zarûtî; ²¹ Ê awî ji boy helak kirinê, pîr caran li agirê hem li avan avêt; nua erki dikari me ra yardum bike; Ya! Rabb li ser me bi merhamet kirinê. ²² Ê Îsa go jê ra, erki dikarî bawur kirinê, her tişt bimümkün e ji awî ra ki îman tîne. ²³ Ê bavê kûrik zû va qîra û go: Îman tînim ya! Rabb ji îmansuzîtîyê mi ra yardim bike. ²⁴ Ê Îsa kînga ko dî xalqê bi bazdanê dihatibûn civandin xayîdî ji napak rûh ra, û go: Ya! lal û ker **[105]** rûh ez ji ta ra emr dikim ji av meruvê der be', û hênî mekev li wî. ²⁵ Ê awî, qîra, û pîr ezîyet da jê ra, û jê der hat; û kûrik weka mirî bû, wusan ko pîran goni, erki mir. ²⁶ Ê Îsa ji destê wî girt û helanî awî, û aw sekinî. ²⁷ Ê wexta ko awî ket li mal şagirdan bi tenê jê pîrs kirin: lê çima? em nedikaribûn der xisdinê. ²⁸ Ê ji wan ra go: Av cînsê han mümkün nin e bi hênî tiştê der anîn, îlla bi rocî û bi nimêc. ²⁹ Ê rabûn ji wê, ji nav Celîle dibihuribûn; û nedixosd yekî pê bihese.

³⁰ Çima ko hîn dikir ji şagirdê xo ra, û digot ji wan ra: erki Kûrê meruv dê teslîm bibe li destê meruvan; û awî dê bikujin; kînga ko bê kujdin, li roya sisêan da dê qiyam bike. ³¹ Ê wan fehm nedikiribûn av xaberan; û ditirsîabûn jê pîrs kirinê.

³² Ê hat li Kafarnayumê; û kînga ko ket li mal, pîrs kir ji wan, erki li rê da çi xaber didabûn hûn bi hevûdu ra. ³³ Ê awan hiskot bûn; çima ko li rê da ji me kî? mezin e xaber didabûn. ³⁴ Ê gava ko ronîşd, gazî kir dwanzdan, û go ji wan ra: erki yekê dixwaze awulîn bûn, dê piçûkê hemîan bibe û xazmetkârê hemîan. ³⁵ Ê zarûkkî girt û sekinand li nav wan da, û awî li ber xo girt û go ji wan ra. ³⁶ Kî ko ahwa ji zarûkan yekê qabûl dike bi navê min, awî mi qabûl dike, û kî ko mi qabûl dike, mi qabûl nake lê mi şîandox *qabûl dike*. ³⁷ Cewab da jê ra Hanna û go: Ya! xoca me yekê dî, ki bi navê ta cinan der dixisd û li dû me nedihatibû û awî me nehişt, çima ko li dû me ne di- **[106]** hatibû. ³⁸ Ê awî go, jê bigerî, çima ko tunne yekê ko bi navê min kerametana bike; û zû va bikari ji mi ra kötî bêje. ³⁹ Çima ko aw ko zidê me nin e ji alîyê me da e. ⁴⁰ Ê kî ko ji we ra bi navê min erki hûn ê Mesîh in, taskî av dide vexwarin bîra dibêm ji we ra ücretê xo dê wunda neke. ⁴¹ Ê kî ko dide xwar kirin ji av piçûkan yekê ki ji mi ra îman tînin jê ra hênî qanc e, ko li astûyê wî ra kevirkî aşê bê aliqandin, û li bahrê bê avêtin. ⁴² Ê erki destê ta, ta xwar dike bibir û bavê ji xo,

çima ko ji ta ra qanc e çolaq li hayatê ketin; na ki du destê ta hebûn, û li cehenemê çûndin li nava agrê netafandin. ⁴³ Li ko kî kurmê wan namire û agirê wî nayê tafandin. ⁴⁴ Ê erki lingê ta ta xwar dike bibir awî qanc e ji ta ra topal li hayatê ketin, ná ki du linê ta hebûn' û li cehenemê tu bêy avêtin li nava agrê netafanadin. ⁴⁵ Li ko kî kurmê wan námie û agrê wî nayê tafandin. ⁴⁶ Ê erki çahvê ta ta xwar dike derxe awî, qanc e ji ta ra bi yek çahv li padîşahîtiyê Xodê ketin na' ki du çahvê ta hebe û li cehenemê ketin. ⁴⁷ Li ko kî kurmê wan nemire û agrê wî nayê tafandin. ⁴⁸ Çima ko her kes bi agir tê xoy kirin, û her qurban bi xoy dê bê xoy bûn. ⁴⁹ Xoy qanc e, hama erki bêtahm bibe bi çi? awî dê terbiye bibe, erki wusan e hûn li xo da xoyê bipên, û bi hevûdu ra selamet bikin.

SER 10

¹ Ê ji wê bi rabûnê li sînore Yehûdîan li aliyê dinê Yordanê hat, û dîsa xalq li balê [107] hatin civandin, û awî çawan ko adetê wî bû dîsa ji wan ra talîm didabû.

² Ê farîsîan bi caribandinê jê pîrs dikiribûn û digotibûn: erki cayîz e yekê, ko jina xo berde. ³ Awî cewab da ji wan ra' û go: Mûsa ji we ra çi? tenbîh kir. ⁴ Ê wan goni, Mûsa îzn da talaqname nivîsandinê, û berdanê. ⁵ Cewab da Îsa' û go ji wan ra: ji boy hişk bûnê dilê wê nivîsand ji we ra av tenbîhê. ⁶ Hama ji îbtîdayê xalq kirinê Xodê wan nêr û mê xalq kir, û go: ⁷ Ji boy wî meruv bav û diyê xo dê terg bike, û li pey jina xo here. ⁸ Ê herduyan yek gövde bibin; û ji wê pê va dido nin in' lê yek gövde. ⁹ Nua cot kirinê xodê Însan bira cîyê neke. ¹⁰ Ê li mal şagirdê wî dîsa hemen ji boy av tiştê jê pîrs kirin. ¹¹ Ê go ji wan ra, kî ko jina xo ber dide û hênî yekê distîne, zîna dike. ¹² Ê jin jî erki mêrê xo ber dide' û bi başqasîkî dizewuce zîna dike.

¹³ Ê jê ra zarûkan anîn ki dest deyne li ser wan, hama şagirdan dixayîdî bûn li ser anoxan. ¹⁴ Ê Îsa kînga ko dî, xayîdî û go ji wan ra, berdîn av zarûkan bira ji mi ra bên, ji wan bigerîn, çima ko padîşahîtiyê Xodê ji awê awha ra e. ¹⁵ Bira dibêmin ji we ra, padîşahîtiyê Xodê kî ko weka zarûk qabûl nake, awî dê ne'keve li wê. ¹⁶ Ê zarûkan helmêz kir û destê xo danî li ser wan, û mübarek kir wan.

¹⁷ Ê gava ko awî ji wê li rê rabû, va ha hampakî li pêş¹⁹⁵ bezîa bi çok¹⁹⁶ datîninê jê pîrs dikir, û digot, Ya! xocayê qanc ez çi? bikim ko ji ebedî hayat ra warîs bibim. ¹⁸ Ê Îsa jê [108] ra go, ji mi ra çima? qanc dêjî ji yek Xodê pêtir qanc tunne. ¹⁹

¹⁹⁵ Di metnê de *li tîş* (nişeya wergêrê).

¹⁹⁶ Di metnê de *çob* (nişeya wergêrê).

Tenbîhan dizanî, zîna meke, qatl meke, dizî meke, derew şahadetî meke, û bav û dîyê xo ra îkram bike. ²⁰ Ê awî cewab da û go jê ra: Ya xoca avanan hemîan ji zarûtîyê pê va mi kir, nua hênî çi? kêmanîyê min heye. ²¹ Ê Îsa li awî bi nihêrtinê, haband awî, û go jê ra, yek kêmanîyê ta heye: erki dixwazî tekmîl bûn, here her çîyê ta k heye bifiroş, û bide ji faqîran ra, û li azûman da xazneyê ta dê be; û bigir xaçê û weri li pey min. ²² Ê aw li ser vê sözê bi qasawet kirinê, melûl çû, çima ko pîr warîyetê wî hebû. ²³ Ê Îsa li dorê xo bi mêze kirinê, go ji şagirdan ra wan ko hampa ne çawan! zor e ji wan ra li padîşahîyê Xodê ketinê. ²⁴ Ê şagirdan li ser sözê wî dê acabandibûn; hama Îsa dîsa cewab da ji wan ra û go, Ya! ewladan, çiqas! zor e ji wan ra ko ser xortîyê xo umudê xo danîn, padîşahîyê Xodê ketin. ²⁵ Qolay e ko deve ji qulê derzîyê biço, na kî zengîn bikeve¹⁹⁷ li padîşahîyê Xodê. ²⁶ Ê wan hênî pîr diacibandibûn, û bi hev û du ra digotibûn, nua hênî kî dikare xalas bûn. ²⁷ Ê Îsa li wan bi nihêrtinê, go: Av ji alîyê merûvan bêmûmkûn e, hama li ber Xodê hemî tişt qolay e. ²⁸ Ê Petros jê ra gotinê dest kir: va ha me hemî tiştan berdan û li pey ta hatin. ²⁹ Îsa cewab da, û go: Bîra dibêmin ji we ra, qat yekê tunne ko ji boy min ya ji semedê Încîl mal, ya brêyan' ya xuşkan ya bav ya dî ya jin ya ewladan ya zevîan terk kir. ³⁰ Nua li asîrê han da sed qat malan û brêyan û xuşkan û dîyan û we- **[109]** ledan û zevîan, bi tevî qawarandinê; û asîrê min ko dê bê ebedî hayatê dê nestîne. ³¹ Çima ko pîr awulîn dê bibin paşîn, û paşinan, awulîn. ³² Ê wan li alîyê Qudsê radibûbûn û hêja li rê da bûn, û Îsa li ber wan diçûbû, û wan diacibandibûn hem ditirsîabûn; û dîsa dwanzdan li balê send, dest kir ji wan ra gotinê çi ko jê ra biqawmîa. ³³ Ê go: Va ha em li Qudsê ra dibin, û kurê merûv dê bê teslîm bûn ji baş îmaman û kâtîban ra, û awî dê ji mirin ra hokm bikin, û awî dê ji tayîfan ra teslîm bikin. ³⁴ Ê awî dê masqara bikin û bikutin awî; û tû bikin jê ra û bikujin, û li roya sisêan da dê qiyam bike. ³⁵¹⁹⁸ Ê li balê çûn kurê Zepetosê Yaqûb û Hanna, û goni jê ra: Ya! xoca em dixwazin, ko em çi ko ji ta bixwaz[i]n ji me ra bikî. ³⁶ Ê awî go, ji wan ra, çi? dixwazin ji minkî ji we ra bikim. ³⁷ Ê wan goni jê ra, kerem bike ji me ra ki ji me yekê li alîyê rastê ta û yekê li alîyê çepê ta ronîn li saltanatê ta da. ³⁸ Cewab da Îsa, û go ji wan ra, hûn nizanin çi dixwazin; dikarin? vexun aw tasê ko ezê dê vexum, ya bi aw tahfîl tahfîl bibin, ko ez dê tahfîl bibim û wan goni jê ra em dikarin; ³⁹ Ê Îsa go ji wan ra, aw tasê ko ez dê vexûm, hûn dê vexûn û bi aw tahfîlê ko ez pê tahfîl bûm, dê tahfîl bibin. ⁴⁰

¹⁹⁷ Di metnê de *bi qeve*.

¹⁹⁸ Di metnê de ³⁶ (nîşeya wergêrê).

Hama li rast û çepê mi da, ronişdin ê min nin i dayin; lê ji wan ra dê bê dayin, ji wan ra ko hatîe hazir bûn. ⁴¹ Û kînga ko aw deh şagirdê dinan bihîsdin, dest kirin xayîdandinê li ser Yaqûb û Hannayê. ⁴² Û Îsa li balê gazî kir wan, û go ji **[110]** wan ra, hûn dizanin ji tayfan ra hati gotan mezinan, li ser wan hökmat dajon, û hampayêt wan zabîdîtî dikin ji wan ra. ⁴³ Hama li nav we da wusan dê nebe, lê ji wê kî ko mezin bûn dixwaze, aw ji we ra xizmetkâr dê bibe. ⁴⁴ Û ji wê kî ko mezin bûn dixwaze qulê wê hemîan bira bibe. ⁴⁵ Çima ko kure meruv jî nehat ko jê ra xizmet bibe, lê hizmet bike, û canê xo dêla pîran telef bike. ⁴⁶ Û hatin li Îrîxayê, û aw, şagirdan hem bi pîr civatan kînga ko ji Îrîxayê radibûbûn, kure Dîma kör Bartîmawos li rê da bi ronişdinê bars dikiribû. ⁴⁷ Û kînga ko bihîsd ko Nasranî Îsa e, dest kir qîrinê, û gotinê, Ya! kure Dawûd Îsa ji mi ra merhamet bike. ⁴⁸ Û pîran jê ra dixayîdibûn, ko hiş be, Hama awî hênî pîr, ya! kure Dawûd ji mi ra merhamet bike diqîrabû. ⁴⁹ Û Îsa sekinî û emr kir ko awî gazî bikin, û bi gazî kirinê körê jê ra goni, pêt be û rabe, ta gazî dike. ⁵⁰ Û awî cilê xo avêt û bi rabûnê hati li ba Îsayê. ⁵¹ Cewab da jê ra Îsa, û go: Çi? dixwazî ko ji ta ra bikim, kör go jê ra, Ya! xoca çahvê min vebe. ⁵² Û Îsa go jê ra hare îmanê ta ta sax kir, û zû va hati vebûn, û li rê da li pey Îsa diçobû.

SER 11

¹ Û kînga ko nêzê Qudsê bûn, li Petpakeyê û Beydanîyê, li nêza çiyê Zeytûnê şagirdan didoyan şîand. ² Û go ji wan ra, herin li gündê hana ko li ber wê e; û gava ko li wê bikevin, dê cehşkî hati grê dan bibînin; ki li ser wî qat kesekî neronîşdîe; vekin awî û **[111]** ji mi ra bînin. ³ Û erki yekî bêje ji we ra çima? av tîşt¹⁹⁹ dikin, bêjin ko ji xodîyê wî ra lazim e; û zû va livir dê bişeyîne awî. ⁴ Û awan çûn cehşê li devê rê da li ber derîyê li derva, û vekirin awî. ⁵ Û li wê ji sekinadoxan hinikan gon ji wan ra: Çi? dikin, çima? vedikin cehşê. ⁶ Û wan çawan ko Îsa ji wan ra emr kir, ji wan ra gon, Û wan berdan. ⁷ Û cehşê anîn ji Îsa ra û li ser wî cilê xo danîn, û ronişd li ser wî. ⁸ Û pîran cilê xo li ser rê radixistibûn, û hinikan jî ji daran gülîan digirîbûn û li ser rê radixisdibûn. ⁹ Û ji pêş û ji paş çûndoxan diqîrabûn û digotibûn, Osanna; bi navê Xodê hatox mübarek bibe. ¹⁰ Bi navê Xodê hatox padişahîtiyê bavê me Dawûd mübarek bibe, li pîr bilinda Osanna.

¹⁹⁹ Di metnê de *bişî* (nişeya wergêrê).

11 Û Îsa li Qudsuşerîfê û li dacarê ket, û li çar alîyê li hemî tiştan hinêrt, û hênî bê wext bû, bi dwanzdahan li Beythanayê rabû.

12 Û roya dinê kînga ko ji Beythanayê radibobûn birçî bû. 13 Û ji dûr va bi pelçiman tijî darkî hejîlê dî; hati ko belkî li wê tiştî bibîne û kînga ko hati li ba wî ji pelçiman pêtir tiştî nedî, çima ko wexta hejîlan nebû. 14 Û Îsa cewab da û go jê ra: hênî ji ta ebeda yekê fêkî nexo, û şagirdê wî bihîsdin. 15 Û hatin li Qudsê; û Îsa li dacarê ket, û dest kir der xisdinê firotaxan û kiroxan ki li nav dacar da bûn; û dezgâhê sarrafan bela kir, û kürsîyê kevok firotaxan quluband. 16 Û bernedida ko yekê ji nav dacarê firaqî bibihurîne. 17 Û talîm dikir û digot ji wan ra: Hatîe [112] nivîsandin ko mala min mala îbadetê dê bê gotin ji hemî tayfan ra, hama hûn maxarayê dizin²⁰⁰ kirin wî. 18 Baş xaxaman û kâtîban bihîsdin, û awî helak kirin ra fursetkî aramîl dikiribûn; hama jê ditirîabûn; çima ko xalqê hemîan li ser talîmê wî acêb dimabûn. 19 Û kînga ko êvar bû, ji bajêr der ketin.

20 Û li sibê da kînga ko ji wê dibihuribûn, dîni darê hejîlê ko ji qurmê da hişk bûbû. 21 Û bîra Petros hat û go jê ra: Ya! xoca, va ha darê hejîlê ko ta lanet kir hişk bûe. 22 Cewab da Îsa, û go ji wan ra: Erki îmanê wê li ser Xodê bibe. 23 Nua bîra dibêm ji we ra: kî ko ji av çîyeyê han ra, bêji, rabe û li bahrê bikêv, û li dilê xo da şîfê neke, lê îman bîne çî ko bêje dibe, dê bibe jê ra, çî ko bêje. 24 Ji boy vî dêjim ji we ra, çî tişt ko bi nimêc dixwazim hûn û îman tînin erki dê bistînin, dê bibe ji we ra. 25 Û wexta ko nimêc dîkin erki li ber kesekî tiştî wê heye, afw bikin, wusan ko Bavê wê ko li asûmanday e afw bike ji we ra sûcê wê. 26 Hama erki hûn afw nekin, bavê wê ji ko li asûmanday sûcê wê ji we ra afw neke.

27 Ji wê dîsa li Qudsê hatin, û awî li dacar da kînga ko digerîabû, baş xaxaman û kâtîban û îxtîaran hatin li balê. 28 Û goni jê ra: Wanan bi çî hökmetê dikî, û kî? da ji ta ra av hökmetê av tiştan kirinê. 29 Cewab da Îsa, û go ji wan ra: E jî ji we ra tiştî pîrs dikim ji mi ra cewab bidin, û ez dibêjim ji we ra, bi çî hökmatê ez dikim av tiştê han. 30 Tahfilê Hanayê, ji asûman? bû, ya [113] ji merûvan, cewab bidin ji mi ra. 31 Û aw li nav xo da dîşûmîş dibûbûn û digotibûn, erki ji asûmanan em bêjin, dê bêje, Lê çima? hûn îman neanîn jê ra. 32 Hama erki em bêjin ji merûvan, ji xalqê em ditirsin, çima ko hemîan îman dianîbûn erki Hanna peyember e. 33 Cewab dan û gon ji Îsa

²⁰⁰ Di metnê de *dizan* (nîşeya wergêrê).

ra: Em nezanin; û Îsa cewab da ji wan ra û go: E jî nabêjim, bi çi hokmatê ez dikim av tiştan.

SER 12

1 Ê dest kir bi temsîlan bi wan ra xaber danê û gotinê, Yek meruvkî rez danî li dorê wî sinc kişand, û mahserê kola û qulle çekir, û awî da destê palayan û çû li qurbetê. 2 Ê li wextê da xizmetkarkî şand ji palayan ra ki ji palayan mahsulê rezê bistîne. 3 Hama wan awî girtin û kutan, û vala rê kirin. 4 Ê dîsa başqa xizmetkarkî ji şand, awî bi kewir kirinê birîndar kirin serê wî û bi rezîl kirinê berdan. 5 Ê dîsa başqakî şand, awî jî kuşdin; û hênî pîran, ko hinikan kutan, û hinikan kuşdin. 6 Ê paşê hemîan kurikkî wî delalî hebû, wî şand ji wan ra, go belkî ji kurê min şerm bikin. 7 Hama palayan kînga ko dîn awî ko dihatibû, gon ji hevûdu ra wîa e warîs, werin em bikujin wî, û mîras ji me ra bibe. 8 Ê girtin awî û kujdîn, û ji rezê der xisdin awî. 9 Nua xodîyê rezê dê çi? bike; dê bê, û palayan dê helak bike û rezê başqasîan ra dê bide. 10 Av nivîsê han hûn nexondin, erki aw kevir ko yapucîan li ber tiştîkî dananîn, serîyê ruknê bû. 11 Vîa ji [114] Xodê bû û li ber çahvê me acêb e. 12 Ê dixosdibûn awî girtinê, hama ji xalqê tîrsîan çima ko fehm kirin ko av temsîla ji boy wan go; û awî berdan û çûn.

13 Ê ji farîsîan û hîrodîsan hinikan jê ra şandin; ki bi xaber awî bigirin. 14 Ê wan hatin, bi fend pîrs dikiribûn jê û digotibûn: Ya! xoca, em dîzanin ko tu rasd î û ji boy kesê umûrê ta nin e, çima ko li xatirê kesê mêze nakî, îlla rêya Xodê bi rasd hîn dikî, ji hünkâr ra xarac dayin cayîz? eya na, em bidin?, ya nedin. 15 Ê awî dirûtîê bizanibûnê go ji wan ra, hûn çima? mi dicarabînin, ji mi ra dînakî bînin, ki bibînim. 16 Ê wan anîn, û go ji wan ra, av sûretê han ko li vîa ye ê kî? e ya nivîs, û wan goni jê ra, ê hünkâr. 17 Cewab da ji wan ra Îsa û go: Herî aw ko ê hünkârê e, ji hünkâr ra bidin, û aw ko ê Xodê e, ji Xodê ra bidin, û acibandin li ser vî.

18 Ê qiyam tunne gotox sadûqîan hatin li balê, û jê pîrs dikiribûn û digotibûn: 19 Ya xoca, Mûsa ji me ra nivîsand ko erki brêy yekî bimre û jinê bihêle, û zurîyet nehêle, brêy wî dê jina wî bistîne, û ji brêy xo ra zurîyet derxe. 20 Nua li ba me haft brê hebûn, awulîn send û mir, û zurîyet nehişt. 21 Ê îkîncî awî send û mir, û aw jî zurîyet nehişt, wusan üçüncî jî send awî. 22 Ê awî haft jî sendin û zurîyet nehiştin û ji

paşê hemîan jinik jî mir. ²³²⁰¹ Nua li wexta qiyametê, kînga ko qiyam bikin, ji wan ji kîjan? ra dê jin bibe awî; çima ko haftan jî jin kirin. ²⁴ Cewab da Îsa **[115]** û go ji wan ra, ji boy av nin e? ko hûn şaş bûne ki ne kîtêban dizanin û ne quwwetê Xodê. ²⁵ Çima ko kînga ko ji mirîan qiyam bikin, ne camêran jin distînin, ne jî jinan mêr distînin, lê weka melekê asûman in. ²⁶ Hama ji boy qiyamê mirîan, ko qiyam distînin, li kitêbê Mûsa da hûn naxondin? li ser dirî nerm çawan Xodê jê ra go, ez im, Xodêyê Îbrahîm, û Xodêyê Îsaq, û Xodêyê Yaqûb. ²⁷ Û awî xodêyê mirîan nin e lê saxan, Nua hûn pîr şaş in.

²⁸ Û ji kâtîban yekê hat, godarî fikir ji wan ra wexta ko wan doz dikiribûn, kînga ko dî erki qanc cewab da ji wan ra, pîrs kir jê û go, tenbîhê awulîn kîjan e. ²⁹ Û Îsa go jê ra ji hemîan awulîn vîa e: godarî bike, ya! Îsrayîl, Xodêyê û Allahê me yek Xodê e. ³⁰ Û dê bihubînî Xodê û Allahê xo ji hemî dilê xo, û ji hemî wucîdê xo; û ji hemî fikrê xo, û ji hemî quwetê xo; vîa e tenbîhê awulîn. ³¹ Û îkincî weka vîa, havalê xo weka xo dê bihubînî, ji wanan pêtir mezin tenbîh tunne. ³² Û kâtîb go jê ra, xoş, ya! xoca, ta rasd go, ko Xodê yek e, û ji wê pêtir başqasîkî tunne. ³³ Û awî ji bûtûn dilê, û bûtûn ji quwetê, û ji bûtûn fikrê hubandin, û haval weka xo hubandin, ji hemî voşçagezan û ji qirbanan pêtir e. ³⁴ Û Îsa kînga ko dî, bi aqil cewab da, go jê ra, ji padîşahîtiyê xodê dîr nîn î, û hênî başqasîkî curhat nedikir jê tiştî pîrs kirinê.

³⁵ Cewab da û go Îsa, va ha ko li dacar da hîn fikir; Kâtîban çawa²⁰²? dêjin ko Mesîh kurê Dawûd e. ³⁶ Û Dawûd bi xo bi Rûh el Quds dêje, Rabb ji Rabbê mi ra go: Li alîyê saxa **[116]** mi ronî, hata ko dijminêta ta pêl kirinê ta bikim. ³⁷²⁰³ Nua erki Dawûd bi xo awî Rabb dêje, çawan? kurê wî dibe, û ji xalqê pîran ji dilê xo jê ra godarî fikir.

³⁸²⁰⁴ Û digot bi hînkirinê li talîmê xo da: Saqinin ji kâtîban wan ko dihubînin di cilê qanc gerandin û li çarşîan da silavan. ³⁹²⁰⁵ Û li cemîat da kûrsîyê awulîn, û li dawetan da cîyê bilindan. ⁴⁰ Wan ko mala jinebîyan dixun, û ji boy xuyayî bûnê nimêcê xo dirêj dikin, wan hênî pîr dê hokm bibin.

⁴¹ Îsa li ber xaznayê sekinî, dinihêrt erki çawan xalqê li xaznayê manqirê baqir davêje, û pîr xortan pîr tiştî avêtin; ⁴² Û faqîr jinebîkî hat, û du pûlikan avêt, ki

²⁰¹ Di metnê de ²⁴ (nîşeya wergêrê).

²⁰² Di metnê de *cewa* (nîşeya wergêrê). Peyv di metnê de *wek cawa* derbas dibe.

²⁰³ Di metnê de ³² (nîşeya wergêrê).

²⁰⁴ Di metnê de ³⁹ (nîşeya wergêrê).

²⁰⁵ Di metnê de ³⁰ (nîşeya wergêrê).

manqirkî dike. ⁴³ Û şagirdan li balê gazî kir û go ji wan ra: Bira dibêm ji we ra, ki av faqîr jinebî li xazneyê avêtoxan ji hemîan pîr avêt. ⁴⁴ Çima ko hemîan ji zêde bûnê xo avêtin, hama jinikê han, ji faqîrîtiyê xo, her çi ko wî hebû, malê xo hemî avêt.

SER 13

¹ Û kînga ko ji dacarê der dihat, ji şagirdê wî yekê jê ra go: Ya! xoca binêr çawan kevir û çi türlü bîna nin. ² Cewab da ji wan ra Îsa, û go: dibînî? av kevirê mezinan, bira dibêm ji we ra, ko dê namîna kevir li ser kevir li wê, ko dê neyê heloşandin.

³ Û kînga awî li çiyê Zeytûnê li ber dacarê ronîşdî bû, pîrs kirin jê bi tenê Petros û Yaqûb û Hanna û Andrîa. ⁴ Bêje ji me ra, kînga? dê bibe avî, çi? nişan dê bibe, wexta tek- **[117]** bûnê av hemî tiştan. ⁵ Cewab da Îsa û go ji wan ra, Saqinin ko yekê wê nexapîne. ⁶ Çima ko pîran dê bîn bi navê min, û bêjin erki ez im Mesîh, û pîran jî dê şaş bikin. ⁷ Hama kînga ko bi bihîsdin qawxan û dengê qawxan bira xo megûhêz[i]n çima ko lazim e bûn; hama hêja axir nin e. ⁸ Çima ko mîllet dê li ser mîllet û padîşahîti li ser padîşahîti dê rabe, û cî cî zelzeleyan dê bibin, xalayîan û welweleyan, hama av hemîan îftîdayê hêşandin in. ⁹ Saqinin hûn li ser xo, çima ko wê ji civatan ra dê teslîm bikin û dê bêne kutan, û li ber walîyan û padîşahan dê bisekinin ji boy min, ji wan ra ji boy şahadetî kirinê. ¹⁰ Û ji hemî tayîfan ra lazim e ko awul Încîl bê waz bûn. ¹¹ Hama wexta ko wê teslîm bûn ra bibin, hûnê dê çi bibêjin ji awul da xam mexûn, û dîşûmîş mebin, lakîn ji we ra dê saatê çi ko tê dayin, awî bêjin; çima ko xaberdan hûn nin in, îlla Rûh el Quds e. ¹² Bire bireyê dê ji mirin ra teslîm bike, û bav kure, û awladan dê li ser bavan rabin, û dê bikujin wan. ¹³ Û ji boy navê min ji hemîan dê îkrah bibin; hama aw ko hata paşê sabir bike awî dê xalas bibe. ¹⁴ Û kînga ko dibînin îkrahîtiyê xarab bûnê, ki li cîyê cayîz nebûnê disekine (aw ko dixoyne bra fehî bike) wê çaxê wan ko li Yehûdîstan da ne bira li çîyan birevin. ¹⁵ Û aw ko li ser xanî e bira neyê xwarî li mal û nekevi li hindur ji mala xo tiştî helanin ra. ¹⁶ Û aw ko li zevî da e, bira venegere cilê xo sendin ra. ¹⁷ Hama way! ji wan rako hamla ne û çîçîk dayox in wê royan da. ¹⁸ Dua bikin ko li zivîsdan da nebe. ¹⁹ Wê royan da **[118]** wusan sixlet dê bibe ki ji awulê xalq kirinê maxlûqê Xodê hata nua wusan nebû, û ne jî dê bibe. ²⁰ Û erki Xodê kin nekiribû wê royan, qat cankî xalas dê bibe, hama ji boy bijartîyan, wan ko bijart, wê royan kin kir. ²¹ Û li wê çaxê erki yekê ji we ra bêje, erki va ha livir e Mesîh ya li wê, bawur mekin. ²² Çima

ko derew Mesîhan û derew peyxemberan dê rabin, û nşanan û alamatan dê bikin, ki erki mûmkûn e bijartîan jî şaş bikin. ²³ Hama hûn saqin bin, va ha ji awul mi ji we ra go hemîan.

²⁴ Hama wê royan da li paşa aw sixletan, ro dê tarî bibe, û hîv dê rohnî xo nede. ²⁵ Ê istêrê azümanan dê bibrijin, û li azüman da bûn quwwetan dê tev gerin. ²⁶ Ê wê çaxê hatinê Qurê meruv bi quwwet û bi pir îzzetê li awran da dê bibînin. ²⁷ Ê wê çaxê dê melekê xo bişeyîne û bijartîê xo ji çar bayan, ji perê dinê hata perê azümanan dê bicivîne. ²⁸ Nua hûn ji darê hejilê temsîlkî hîn bin, kînga ko hênî gülîê wî nerm in, û perçimê xo der dixê, dizanin ko havîn nêz e; ²⁹ Awha jî hûn, kînga ko dibînin av hemî tiştan bûn; bianin ko nêz e li ber derîan. ³⁰ Bira dibêm ji we ra, erki av, sîlsîleyê han dê nebihure, hata ko av hemî tiştan bibe. ³¹ Azümanan û ard dê bibihurin; û kelmê mindê nebihurin. ³² Hama ji boy wê royê û saatê yekê nizane, ne li azüman da bûn melean û ne Qur lê tenê Bav. ³³ Saqin bîn, heşar bîn û dua bikin, çima ko nizanin wext kînga e. ³⁴ Çawan ko li qurbetê çûndox meruvkî mala xo berde, û ji qulê xo ra hokmat bide, û ji her kesê [119] ra şixulê xo, û ji qapucî ra tenbîh bike ko heşar bibe. ³⁵ Nua heşar bin çima ko nizanin kînga tê xodîê malê, êvarê ya nivê şevê, ya dîk bandanê, ya sibê. ³⁶ Nebe ko xalf bê, wê li xewê da bibîne. ³⁷ Hama çi ko we ra dibêm, ji hemîan ra dibêm, heşar bin.

SER 14

¹ Ê paşê du royan pasîh û fetîr xwarin bû; baş îmaman û kâtîban aramîş dikiribûn, ko çawan, bi fendkî awî bigirin bikujin. ² Ê digotibûn, li vî bayram da nebe, ki li qawm da nebe ko welwelekî bibe. ³ Ê awî kînga ko li Petanîa da li mala Şimhûnê uyuz da li sufrê daşonîşdî bû, jinkî hat, şûşakî pir biqiymet û buha rûnê nartosê wî hebû; şikand aw şûşayê û li ser serê wî rêt. ⁴ Ê şagirdan xayidîn û digotibûn, çima? li nafîle cî da çû av rûn. ⁵ Ki ji sê sed dînanan pêtir dikaribû bihatana firotin û ji faqîran ra bihata dayin av rûn, û jê ra dixayibûn pir. ⁶ Ê Îsa go ji wan ra, berdin awî, çima? rahatsız dikin, çima? ko şixulkî qanc aw kir ji mi ra. ⁷ Faqîran her çax bi we ra ne û kînga ko bixwazin dikarin ji wan ra qancîti kirin, hama ez her çax bi we ra nin im. ⁸ Aw ji destê xo hatinê kir, ji awul gövday min ron kir ji boy nşanê kefen bûnê. ⁹ Bira diibêm ji we ra li hemî dinê da li ko kî Încîlê han bê waz bûn, kirinê av jinik jî ji boy zîkra wî dê bê gotin.

¹⁰ Û ji dwanzdan yekî Cûdayê Îsxarî, çû li ba baş îmaman ko awî ji wan ra teslîm bike. [120] ¹¹ Û wan kînga ko bihîsdin, şaz bûn û kjê ra drav dayinê wad kirin; û mêze dikiribû ko awî çawan bi fursendkî destê wan bide.

¹² Û roya awulê fetîr xwarinê, ko pasehê ser jê dikiribûn, şagirdan goni jê ra, li ko? dixwazî ko em herin ji ta ra pasehê hazir bikin ko bixuy. ¹³ Û awî ji şagirdan diduyan şîand û go ji wan ra: herin li bajêr, û kînga ko li bajêr dikevin merûvkî laqa wê dê bê ki li ser pişta wî da cerê avê dê bibe, li pey wî herin. ¹⁴ Û awî li mala kî ko bikeve bêjin ji xodîyê mal ra, xoca dêje, li ko? e misafîrxane, ki li wê bi tevî şagirdê xo ve pasehê bixum. ¹⁵ Aw jî ji we ra adilandin mezin odakî taqa jorîn dê nîşan bide., li wê hazir bikin ji me ra. ¹⁶ Û şagirdê wî çûn hazir kirinê, li bajêr hatin û çawan ko ji wan ra go, wusan dîn; û pasehê hazir kirin.

¹⁷ Û gava ko êvar bû bi dwanzdan hat. ¹⁸ Û kînga ko ronîşdin, û hêja dixwarin bûn, Îsa go: bîra dibêm ji we ra, ji wê yekî ki nua bi mi ra dixo, dê min dest bide. ¹⁹ Û dest kirin qasawet kirinê û yeka yek gitinê, saqin? ez nebim, û awê din saqin? ez nebim. ²⁰ Awî cewab da û go ji wan ra: ji dwanzdan yekê, dest xo bi mi ra li sahanê lê kiroxa. ²¹ Bîra Kûrê merûv diçû çawan ko ji boy wî hata nivîsandin, hama way! ji aw merûv ra ko bi destê wî Kûrê merûv dê bê teslîm bûn, ji aw merûv ra za nebana, jê ra hênî xêr bû.

²² Û gava ko wan dixwaribûn Îsa nan send, mûbarek kir û şikênand, da ji wan ra, û go: bistînin, av e tenê min. ²³ Û tasê send, şîkr kir û da ji wan ra; û hênî jî jê vexwarin; [121] ²⁴ Û go ji wan ra, vîa xuyna min e ahda noyê, ki ji boy pîran tê rijandin; ²⁵ Bîra dibêm ji we ra, hênî ji mahsûlê mêw qa dê venexûm, hata li wê royê, ko li padîşahîtiyê Xodê awî nû dê vexum.

²⁶ Û wan îlahîkî bi xondinê, li çiyê Zeytûnê rabûn. ²⁷ Û Îsa go ji wan ra, hûn hemîan jî îşev dê ji min xwar bibin, çima ko hati nuîsandin, şivanê dê bixim û mîan dê bela bibin. ²⁸ Hama paşê qiyam kirinê min ji wê pêş li Celîle dê herim. ²⁹ Cewab da Petros, û go jê ra: farazi hemî jî xwar bin, hama ez na. ³⁰ Û Îsa go jê ra, bîra dibêm ji ta ra erki tu jî li vê şevê li pêşê bandanê dîkan du caran, mi sê caran dê înkâr bikî. ³¹ Hama awî hênî pîr înad dikir û digot, erki bi ta ra mirin jî lazim bibe, ezê ta înkâr nekim, û hemîan jî waha digotibûn.

³² Û hatin wê gundê ko navê wî Ketseman bû, û go ji şagirdan ra, livir bisekinin hata ko ez nimêc bikim. ³³ Û send bi xo ra Petrosê û Yaqûbê û Hannayê, û dest kir qasawet kirinê û xem kişandinê. ³⁴ Wê çaxê go ji wan ra: Canê min qasa

mirinê bi qasawet e, livir bisekinin û heşar bin. ³⁵ Ê hinik li pêş çû, û li ser rûya xo li ardê ket, û duwa kir, erki qabîl e, av saat jê bibihure. ³⁶ Ê go, Ya! abba Baba li cem ta her tişt bimümkün e, av tasê han ji min bibihur, hama na ko çawan ko ez dixwazim, lê çawan ko tu dixwazî bira bibe. ³⁷ Ê hat wan li xewê da dî, û ji Petros ra go: Şimhûn xew da diçî, saatkî heşar sekinîn tu qadîr nebûy?. ³⁸ Heşar bin û duwa bîkin ki li tercübeyê neke- [122] vin, bîra rûh hazir e, hama ten zayîf e. ³⁹ Ê dîsa çû duwa kir, û haman av xaberan go. ⁴⁰ Ê vegeŕîa, û dîsa wan li xewê da dî; (çima ko çahvêt wan giran bûbûn), û nedizanibûn ko çi cewab bidin jê ra. ⁴¹ Ê cara sisêan hat, û go ji wan ra; ji vê pê ve xew da heŕin û rahat bin, çima ko axir gihîşt, hati saatê, û va ha Kûrê meŕuv li destê günekâran tê teslîm bûn. ⁴² Rabin em heŕin; va ha nêz bû; aw ko dê min dest bide.

⁴³ Ê zû ve hêja ko aw xaber dida, ji dwanzdan yekê ko navê wî Yehûda bû hat, û pê ra pîr qalabalix bi kêran û bi çovan ji baş îmaman û ji kâtîban û ji îxtîaran. ⁴⁴ Ê awî teslîm kirox ji wan ra nişankî dabû û gotibû kî ko ez ramîsim, aw e, awî bigrin û pê bibin. ⁴⁵ Ê zû ve bi nêz bûnê, go jê ra: Ya! xoca xoca, û awî ramîsa. ⁴⁶ Ê awan dest avêtin awî, û girtin awî. ⁴⁷ Ê li ba wî ji sekinandoxan yekê, kêrê xo kişand û xisd li xazmetkârê baş îmamê û goya awî jê kir. ⁴⁸ Ê Îsa cewab da, û go ji wan ra: saykî li ser dîzan? hûn rabûn bi kêran û bi çovan mi girtinê. ⁴⁹ Wê çaxê şagirdan gişk awî berdan û revîan. ⁵⁰ Her çax ez li ba wê mi negirtin, hama ji boy kitêbê peyemberan temam bûnê ahwa bû. ⁵¹ Ê xortkî li pey wî diçobû, li ser çiplax tenê xo çarşevkî lefand, xortan awî girtin. ⁵² Aw jî çarşefê berda, çiplax ji wan revî.

⁵³ Ê Îsa birin ji baş îmam ra, û hemî baş îmaman û kâtîban û îxtîaran li ba wî cem bûn. ⁵⁴ Ê Petros ji dûr ve, hata baş îmamê, li pey wî çû, û bi xazmetkâran ro- [123] nişd, li ba agirê germ dibobû. ⁵⁵ Ê baş îmaman hem jî civatan hemî li ber Îsa ji boy awî kuştinê li şahadat digeŕîabûn hama nedikaribûn dîtinê. ⁵⁶ Çima ko jê ra qarşî pîran hasadet kirin, hama şahadetîyê wan li hev nedihatibûn. ⁵⁷ Ê başqasîan rabûn li ser wî derew şahadetî dikiribûn, û digotibûn. ⁵⁸ Erki me bihîsd ji wê, ko digot, aw bi dest hati çêbûn dacarê dê heloşinim, û li sê royan da başqa, bê destan çêbûn dê çêkim²⁰⁶. ⁵⁹ Hama ahwa jî şahadetîyê wan li hev nedihatibûn. ⁶⁰ Ê paşê baş xaxam li ortaya rabû, ji Îsa pîrs fikir, û digot: Cewabkî nadî? wan çi şahadetî dîkin li ser ta; ⁶¹ Hama awî hûs bûbû, qa cewabkî nedidabû, dîsa baş xaxam jê pîrs kir, û jê ra go: Tu?

²⁰⁶ Di metnê de çêkir.

î Mesîh Kurê mûbarek Xodê. ⁶² Cewab²⁰⁷ da Îsa û go jê ra: Ta go ko ez im; û ronîşdinê Kurê meruv li aliyê saxê Qudretê û li awra asûmanan hatinê wî dê bibînin. ⁶³ Ê baş xaxam zû ve xaftanê xo qapand û go: Hênî çi? lazim e ji me ra şahadan. ⁶⁴ Va ha hûn hemîan jî ji devê wî küfrê bihîsdin, çawan? dixuya ji we ra; û awan hemîan li ser wî hökm kirin erki ji mirin ra mîstahaq e. ⁶⁵ Ê hinikan dest kirin tû kirinê li rûya wî, li ser serê wî kinc avêtinê, bi kulm kutanê û gotinê, peyemberîti bike ji me ra, ya Mesîh, kî? e awî ko ji ta ra lêxisd, û xazmetkâran sîle dixisdibûn jê ra.

⁶⁶ Ê Petros hêja li hawşê da bû, ji beslimayêt baş xaxaman yekî hat. ⁶⁷ Ê dî awî ko germ dibobû, nihêrd lê û go, tu jî bi Nasranî Îsa ra bûy. ⁶⁸ Awî înkâr kir û go: nizanim [124] tu çi dêjî, û fehm nakim, û kînga ko li derve li hawşê rabû, dîk jî ban da. ⁶⁹ Beslema dîsa awî dî, û dest kir li wê sekinandoxan ra gotinê, ki aîa jî ji wan e. ⁷⁰ Ê awî dîsa înkâr kir, û paşê gavkî jî, dîsa, li wê sekinandoxan gon Petros ra, bîra tu jî ji wan î?; çima ko tu ji Celîl î, û xaberdanê ta kî weka wan e. ⁷¹ Hama awî dest kir lanet kirinê, sond kirinê û gotinê; erki ez aw meruv nizanim, ji boy awî ko hûn dêjin. ⁷² Ê li wê saatê du caran dîk ban da, û Petros bîra xo anî aw xaber ko Îsa jê ra go, erki li pêş du caran dîk bandanê, tu sê caran dê mi înkâr bikî, û dest kir girînê.

SER 15

¹ Ê li sibê da zû ve baş îmaman bi tevî îxtîaran²⁰⁸ û kâtîban cemat jî hemîan şewîr kirin, Îsaê grê dan, û birin ji Pîlados ra teslîm kirin. ² Ê Pîlados jê pîrs kir û go: padîşahê Yehûdîan tu? î, awî cewab da jê ra û go, tu dêjî. ³ Ê baş xaxaman pîr îftîra dikiribûn li ser wî, hama aw cewabkî nedida. ⁴ Ê Pîlados dîsa jê pîrs kir, û go: tu qat cewabkî nadi?, mêze ke li ser ta çiqas? tiştan şahadetî dîkin. ⁵ Hama Îsa qat cewabkî neda, wusan ko Pîlados mat dima.

⁶ Hama li bayram da grêdankî ji wan ra ber dida bû, kî ko wan bixosdibûn. ⁷ Ê yekî habû ko navê²⁰⁹ wî Parappa bû, bi pev çûndoxan hati grêdan, ki wexta pev çûndinê wan meruvkî kuşdibû. ⁸ Ê xalqê bi qîranê, dest kirin dîlek kirinê ki bike ji wan ra ça- [125] wan ko her çax dikiribû. ⁹ Ê Pîlados cewab da ji wan ra, û go: dixwazin? ko padîşahê Yehûdîan ji we ra berdim. ¹⁰ Çima ko dizanibû ko baş

²⁰⁷ Di metnê de *mewab*.

²⁰⁸ Di metnê de *îxtîaren*.

²⁰⁹ Di metnê de *nevê*.

îmaman awî ji boy hasedê dest dan. ¹¹ Hama baş xaxaman xalqê begenmîş kirin ko Parappa, ji wan ra berde. ¹² Ê Pîlados ji wan ra cewab da, û go: lê ji padîşahê Yehûdîan ra çi? dixwazin ko bikim. ¹³ Ê wan dîsa diqîrabûn, xaçê biderîne awî. ¹⁴ Ê Pîlados ji wan ra go: Ya çi şîxulkî kôtî kirîne awî, û wan hênî pîr diqîra bûn û digotibûn, li xaçê biderîne awî. ¹⁵ Ê Pîlados kînga ko xosd, xalqê xoşnûd kirinê, Parappayê berda ji wan ra, û Îsa bi kutandinê dest da ko bê xaç bûn.

¹⁶ Ê askeran awî li hindurê hawşa mezin dîwanxaneyê birin; û bölûg hemîê gazî kirin. ¹⁷ Ê jê ra xelatê sor dani wergirtin, û ji istîrîan tackî bi çêkirinê li serê wî danîn. ¹⁸ Ê dest kirin jê ra silav dayinê û gotinê, sax be, padîşahê Yehûdîan. ¹⁹ Ê serê wî bi qamîş dikutabûn, li rûya wî tu dikiribûn, û li ser çokan hatinê, jê ra secde dikiribûn. ²⁰ Ê paşê awî mesqara kirinê xelatê jê şelandin, û cilê wî dan wergirtin jê ra, û der anîn, ko li xaçê derînin.

²¹ Ê ji wê bihurox bavê Eleksantrê û Rûpayê ji zevîyê hatox Şimhûnê kurênî, ji boy xaçê wî helandinê suxrayê girtin. ²² Ê awî Kolgata hati gotan cîkî birin, ko tê tercûme bûn, cîyê serî jê kirinê. ²³ Ê jê ra bi tal tevkirî mey dan, hama nesend, û li xaçê der anîn awî. ²⁴ Ê cilê wî pay kirin, û li ser bi qura avêtinê, erki kî dê çi bistîne. **[126]** ²⁵ Ê saat li sisêan da bû, û awî li xaçê der anîn. ²⁶ Ê yaftayê cûrmê wî hatibû nivîsandin erki padîşahê Yehûdîan e. ²⁷ Ê pê ra du dizan xaç kirin, yekê ji alîyê saxê wî û yekê jî ji alîyê çepê wî. ²⁸ Ê tamam bû aw nivîs, ko dêje, û bi bînamûsan hîsab bû. ²⁹ Ê ji wê bihuroxan, serê xo bi hejandinê, jê ra dijmîn fikir û digotibûn: Way! dacarê xarab kirox û li roya sisêan çêkirox. ³⁰ Tu xo xalas bike û ji av xaçê were xwarî. ³¹ Ê ahwa jî baş îmaman bi kâtîban ra tev li nav xo da bi mesqara kirinê digotibûn: Başqasîan xalas kir, û xo nikare xalas kirin. ³² Aw Mesîh Padîşahê Îsrayel, bra nua ji av xaçê bê xwarî, ko em bibînin û jê ra îman bînin, û pê ra li xaçê roboxan jê ra serhevde dikiribûn.

³³ Ê kînga ko saat şeş bû, li ser ardê tarî bû, hata saat nehan. ³⁴ Ê saat li nehan da Îsa bi bilind sawndkî gazî kir, û go: Êlî êlî lama sapaxtanî; ki tercûme tê bûn, Ya! Allahê min, Allahê min ta mi çima? terk kir, gotinê. ³⁵ Ê ji wan hinikan ko li ba wî sekinî bûn kînga ko bihîsdin, digotibûn erki Îlîayê gazî dike. ³⁶ Ê yekê bazda, süngerî bi sîrka tiji û li qamîşkî buhart jê ra dida ko vexu, û go, berdin em mêze kin, Îlîa tê? awî bîne xwarî. ³⁷ Ê Îsa dengkî mezin berda û rûhê xo teslîm kir. ³⁸ Ê perdeyê dacarê ji jor va hata li jêr du parça qatîa. ³⁹ Ê yüzbaşî ko li wê sekinî bû, kînga ko dî waha gazî kirinê wî û rûhê xo teslîm kirinê go, bîra av merûvê han Kûrê Xodê bû. ⁴⁰

Jinan jî hebûn ko ji dûr ve dinihîrtibûn ki li nav wan da bû Meyremê Magdalî, û Meyremê [127] dîya piçûg Yaqûbê û Osesê; û Solome jî bi wan ra bû. ⁴¹ Wan kînga ko Îsa li Celîlê de bû, wî ra, digerîabûn û jê ra xizmet dikiribûn; û pê ra li Qudsu şerîfê rabûn hênî pîr jinan jî hebûn.

⁴² Ê kînga ko êvar bû, ji boy îne bûnê, ki li şemûyê diketî bû. ⁴³ Ê Yûsîfê²¹⁰ Karîbramayê hampakî mûteber hat, ki wan jî ji boy padîşahîtiyê Xodê dipêbû; aw curhat kirinê li ba Pîladosê ket; û tenê Îsa dîleg kir. ⁴⁴ Ê Pîlados tacûb ma ko waha zû ve mir û yüzbaşîyê gazî kir, ji zû ve mir deyû jê pîrs kir. ⁴⁵ Ê ji yüzbaşîyê bi fehîm kirinê, tenê ji Yûsîf ra baxş kir. ⁴⁶ Ê awî caw kirî, û awî bi xwar send[i]nê, bi caw lefand, û danî awî li nav tîrbê ko ji kevir hatibû kola; û li derîyê tîrbê kevîrkî geş kir. ⁴⁷ Nua Meyremê Magdalî, û Meyremê dîya Yaqûb û Osesê dîn aw cî, li ko kî hati danîn.

SER 16

¹ Ê kînga ko şemûyê bihurî, Meyremê Magtalîni û Meyremê dîya Yaqûbê û Solomê çû bixûran hazîr kirin; ko bèn awî mesh bikin. ² Ê roya awulê haftê bi sibê zû ve gava ko tav diketibû, hatin li tîrbê. ³ Ê ji hevûdu ra digotibûn, av kevir ji derîyê tîrbê ji me ra dê kî? geş bike. ⁴ (Ê mêze kirin dîn ko kevir ji tîrbê geş bobû), çima ko pîr²¹¹ mezin bû. ⁵ Ê wan li tîrbê bi ketinê xortkî dîn ko li alîyê sax ronîşdî bû xaftanê sipî²¹² wergirtî, û bizdîan. ⁶ Ê awî ji wan ra go, metîrsin, Îsayê Nasranî aramîş di-[128] kin; ki li xaçê rabû, aw qiyam kir, livîr nîn e, va ha aw cî li ko kî awî danîn. ⁷ Hama herîn bêjin ji şagirdê wî ra û ji Petros ra, erki va ha ji wê awul li Celîlê diçû, li wê dê bibînin awî çawan ko ji we ra go. ⁸ Ê kînga ko bihîsdin rabûn û revîan ji tîrbê çima ko pîr bizdîabûn, û ji kesê ra tîştîkî negon, ji boy tîrsan. ⁹ Îsa li roya awulê haftê li serê sibê da va ha ko qiyam kir, awul ji Meyremê Magtalîni ra xuyayî bû ko ji wî heft cinan deranîbû. ¹⁰ Ê awî çû ji wan ra tarîf kir, wan ko awul pê ra bûn, va ha ko qasawet dikiribûn û digirîan. ¹¹ Wan gava ko bihîsdin erki sax e, û jê ra jî xuyayî bû, bawur nekirin.

¹² Ê paşê bi başqa kiswetkî ji wan diduyan ra xuyayî bû ki li zevîyê diçûbûn. ¹³ Ê wan çûn ji başqasîan ra tarîf kirin; û ji wan ra jî bawur nekirin.

²¹⁰ Di metnê de *Yûsûfê*.

²¹¹ Di metnê de *jîr*.

²¹² Di metnê de *srpî*.

¹⁴ Û paşê va ha yanzdan ronişdî bûn, ji wan ra xuyayî bû; li rûya wan xisd îmansizîtiyê wan û hişkîyê dilê wan, çima ko ji wan ra ko aw xuyayî bû li paşê qiyam kirinê, wan bawur nekirin.

¹⁵ Û ji wan ra go, herin li dinê hemî, û Încîlê ji hemî²¹³ alem ra waz bikin.¹⁶ Aw ko îman bîne û tahfil dibe dê xalas bibe; û aw ko îman neyne dê hokm bibe. ¹⁷ Û ji îman anoxan av nişan dê îcra bibin, bi navê min dê cinan derxin, bi zimanê nû dê xaber bidin. ¹⁸ Bi destan mahran dê bigirin, û erki mirin anox dermankî vexun, ji wan ra dê keder nebe, li ser naxoşan dê dest deynin, û sax bikin.

¹⁹ [129] Û paşê Îsa bi wan ra xaber danê li azümanan hat sendin, û li alîyê saxê Xodê ronişd, ²⁰ Û wan rabûn li hemî cî waz dikiribûn; û Rabb bi wan ra amel dikiribû, û bi îcra bûn nşanan kelamê îsbat dikiribûn.

²¹³ Di metnê de *hîmî*.

ÎNCÎL BI QAWLA LUĞAS

SER 1

¹ Çünkî pîran xosdin ji xusûsê av tiştan ko li nav me da qanc sahitî bû dîsa li sirayê deynin aw tarîfan; ² Çawan ko ji îbtîdayê bi çahwan dîtohan û xizmetcîyê kelimê mi me ra teslîm kirin. ³ Ez jî, ko ji îbtîdayê li pey aw hemî tiştan bi rasd çûbûm, mi xosd bi adata ji ta ra nivîsandin, ya! qudretlu Teofilos. ⁴ Ki sahitîyê aw hîn bûn sözan fehm bikî.

⁵ Li roya Hîrodîs padîşahê Yehûdîstanê, ji newbetê abîyayê bi Zaxarîa nav îmamkî hebû; û jina wî jî ji qîzê Harûn bû; û navê wî Elîsapet bû. ⁶ Ê herdu jî li ber Xodê sadiq bûn, û li hemî tenbîhê û şerîatê Xodê bêayb diçobûn. ⁷ Ê weledê wan tunne bû, çima ko Elîsapet istowir bû; û herduyan jî royê xo buhurtibûn.

⁸ Ê bû kî aw gava ko li sirayê newbetê xo li ber Xodê xizmetê îmamîti dîkir. ⁹ Li ser aadetê îmamîtiyê, jê ra ket ko li dacarê Xodê bikeve bixûr bişawitîne. ¹⁰ Ê cematê qawmê gişk li derve li wexta bixûrê li nimêcê sekinî [131] bûn. ¹¹ Nua melekê Xodê jê ra xuyayî bû, ki li aliyê saxê mezbahê bixûrê disekinî bû. ¹² Ê gava ko Zaxarîa dî bizdîa, û li ser wî tîrskî ket. ¹³ Ê melekê Xodê jê ra go: Métîrs ya!²¹⁴ Zaxarîa; çima ko nimêcê ta qabûl bû, û jina ta Elîsapet ji ta ra dê kûrkî bize û navê wî Hanna deynî. ¹⁴ Ê ji ta ra şazbûnê û şazîtî dê bibe, û pîran li ser mewlûdê wî dê şaz bin. ¹⁵ Çima ko li ber Xodê dê mezin bibe, û şerab û serxoş krox tişt qat dê venexû, û hêja ji rahma diyê xo da bi Rûh el Quds dê tije bibe. ¹⁶ Ê ji kûrê Îsrayîlê pîran li Xodê û Allahê wan dê vegeîrîne. ¹⁷ Ê awî dê li ber wî bê bi rûh û quwwetê Îliyayê, ki dilê bavan li ser kûran û bêitîatan li ilmê sadiqan dê vegeîrîne, ki ji Xodê ra hazir bûn qawmkî hazir bike. ¹⁸ Ê Zaxarîa go ji melek ra, Av tiştê han bi çi ez bizanim; çima ko ez îxtîar im û jina min wexta xo buhartîa. ¹⁹ Ê melek jê ra cewab da, û go: Ez li ber Xodê sekinandox Cebrayîl im, û ez hatim şîandin ji ta ra avanan gotinê û mûjde kirinê. ²⁰ Ê va ha tu dê lal bibî û dê nikarî xaberdan hata wê royê ki av tişt bibe; ji boy wî ko xabêrê mi ra bawur nekir ko wan li wexta xo dê tamam bibin. ²¹ Ê qawmê ji Zaxarîa ra dipêbûn, û qawm tacûb dîkiribûn li ser derengîyê wî li dacar da. ²² Ê gava ko li der hat nedikaribû, bi wan ra xaberdan; û fehm kirin ko li

²¹⁴ Di metnê de ya?.

dacar da jê ra dîtinkî xuyayî bû. ²³ Ê awî bi wan ra bi îşaret xaber didabû, û lal disekinî bû. ²⁴ Ê bû kî, gava ko royê xizmetê wî tamam bû li mala xo çû. ²⁵ Ê li payê wê royan jina wî Elîsabet [132] avis ma, û pênc mehan xo diveşart û digot: Av çawan tişt kir ji mi ra Xodê li vê royan da ki li ser min nihêrt û serhevdayê min ji meşûvan helanî.

²⁶ Ê li meha şeşan da, Cebrayîl ji alîyê Xodê hat şîandin li bajêrkî Celîlîan ko navê wî Nasaret bû. ²⁷ Ji bîkr qîzkî ra, ji yekê ra hatibû xosdin, ki navê wî Yûsîf bû, ji mala Dawûd, û navê bîkrê Meyrem bû. ²⁸ Ê gava ko melek hati li ba lê go: Selam ji ta ra, ya lutf dîtox qîz, Rabb bi ta ra e, tu li nav jinan mübarek î. ²⁹ Ê awî ji söza wî bzîa, û aw ji xo ra difikrîbû, erki çawan tişt dê bibe selamê han. ³⁰ Ê melek jê ra go, Ya! Meyrem metîrs; çima ko li ber Xodê ta lutf dî. ³¹ Ê va ha tu dê avis bimînî û weled dê bizî, û navê wî Îsa dê deynî. ³² Awî yekî azîm dê bibe û Qurê Taalayê dê bê gazî kirin, û Xodê û Rabb dê jê ra bide taxtê bavê wî Dawûdê. ³³ Ê li ser mala Yaqûb ebeden dê padîşahîti bike, û sonê padîşahîtiyê wî dê tunne be. ³⁴ Ê Meyrem go ji melek ra; Av tiştê han dê çawan? bibe ji mi ra; çima ko ez mêr nizanim. ³⁵ Ê melek cewab da, û go jê ra: Li ser ta Rûh el Qûds dê bê, û quwwetê Taalayê dê li ser ta sî bibe, ji boy vî aw ji ta hati za muqades jî, dê Qurê Allah bê gotin. ³⁶ Hem va ha xisimê ta Elîsabet, aw jî li wexta pîrîtiyê xo da avis e û av altincî mehê wî e ko istowr hatibû gotan. ³⁷ Çima ko li ber Xodê qat tiştîkî bêmümkün nin a. ³⁸ Ê Meyrem go: Va ha ez beslemeyê Xodê me, bi gotina ta bira bibe ji mi ra û melek ji b wî çû.

³⁹ Li wê royan da rabû Meyrem, û bi zû ve li [133] alîyê çiyê li bajêrkî Cûdayê çû. ⁴⁰ Ê ket li mala Zaxariyay û ji Elîsabet ra silavan da. ⁴¹ Ê bû kî, gava ko Elîsabet silavê Meyremê bihîsd; li rahm wî da sabî leyst, û Elîsabet bi rûh el Quds tija bûbû. ⁴² Ê bi bilind sawndkî gazî kir û go: Tu li nav jinan mübarek î, û meyweyê rahma ta mübarek e. ⁴³ Ê av ji mi ra jî? ko, ki dîya Xoyê min li ba min bê. ⁴⁴ Çima ko, va ha gava ko dengê silavê ta li goya mi hat, sabî li rahma mi daji şazbûnê leyst. ⁴⁵ Ê xozîka ji wî ra ko bawur dike erki dê tamam bibin aw hemî tiştan, ki ji Xodê jê ra hat gotin. ⁴⁶ Ê meyrem go: Canê min Xodê azîm dike. ⁴⁷ Ê rûhê min bi xalas Allahê mi ra şaz bû. ⁴⁸ Çima ko li mazlûmîtiyê carîye xo nazar kir; çima ko ji vê pê ve hemî sîlsîleyan dê ji mi ra xozî bikin. [49] Çima ko Qadîr, ji mi ra şixulê mezinan kir, û navê wî muqades e. ⁵⁰ Ê rahma wî li ser jê tîrsoxan e sîlsîle be sîlsîle. ⁵¹ Ê bi destê xo bi quwet şixul dî kübaran bi tevî efkârê xo bela kir. ⁵² Ê sultan ji taxtê xo heloşand; û alçağan bilind kir. ⁵³ Ê birçîan bi nîymetan tija kir, û xortan vala

şîand. ⁵⁴ Merhametê xo li bîr anînê ji qulê xo Îsrayîl ra îmdad kir. ⁵⁵ Çawan ki awî xaber da bi bavanê me ra ji Îbrajîm ra û ji zürriyetê wî ra ebada.

⁵⁶ Ê Meyrem li ba wî bi qasa sê mehan sekinî, û li mala xo vegeřîa.

⁵⁷ Ê wexta zayîê Elîsapet tija bû, û kurikkî za. ⁵⁸ Ê cîranan û xisimê wî bihîsdin ko Xodê jê ra mezin merhamet kir, û pê ra şaz dibobûn.

⁵⁹ Ê bû kî li roya haştan hatin kurikê sü- [134] net kirinê, û awî bi navê bavê xo Zaxarîa gazî dikiribûn. ⁶⁰ Ê diya wî cewab da û go: Na, îlla Hanna dê bê gotin. ⁶¹ Ê jê ra gon: Ki li nava xisimê ta da yekê tunne ko, navê wî Hanna bê gotin. ⁶² Ê ji bavê wî ra îşaret dikiribûn, ko jê ra çi? dixwaze gazî kirin. ⁶³ Ê aw jî taxtakî xosd, nivîsî û go, Hanna e navê wî, û tacûb man hemîan. ⁶⁴ Ê zû ve send wî û zimanê wî hati vebûn; û xaber dida û Xodê mübarek dikir. ⁶⁵ Ê pîrs ket li ser hemî cîranê wan; û hemî av tiştan li hemî daxîdanê Yehûdîan da dihatibû gotin. ⁶⁶ Ê aw hemîan ko dibihîsdibûn li dilê xo da danîn, û gon: Av kurikê han dê çi? bibe, û destê Xodê bi wî ra bû.

⁶⁷ Ê bavê wî Zaxarîa bi Rûh el Quds tija bû, û peyemberîti kir û go. ⁶⁸ Xoyî û Xodêyê Îsrayîl mübarek bibe, ki qawma xo qîyamet kir, û ji qawmê xo ra xalas kir. ⁶⁹ Ê ji me ra, ji mala qulê xo Dawûd qorçê xalasê deranî. ⁷⁰ Çawan ko bi devê muqadesê xo xaber da, wan ko ji îbtîdayê dinê peyemberê wî bûn. ⁷¹ Ji dijminê me û ji destê hemî îkrah kiroxê me xalas. ⁷² Ê ji bavanê me ra bi merhamet kirinê, û muqades wada xo bi bîr anînê. ⁷³ Aw sond ko bi bavê me Îbrahîm kir ji me ra dayînê. ⁷⁴ Ki em ji destê dijminê xo bi xalas bûnê, bêtîrs jê ra îbadet bikin. ⁷⁵ Li hemî royê omrê me da li ber wî bi pakî û bi sadaqat. ⁷⁶ Ê tu, ya! sebî, peyemberê Taalayê dê bêy gazî kirin; çima ko li ber rûyê Xodê dê biçî, ji boy rêyet wî hazir kirinê. ⁷⁷ Ji qawmê wî ra bi afwîtiyê güneyan; ji boy hîn kirinê xalasê wan. ⁷⁸ Ji boy merhametê Xodêyê me ko [135] bi destê wî ji jor ro ji me ra zîyaret kir. ⁷⁹ Ki li tarî da û li siyê mirin da ronîşdoxan ra tav bide ko linga me li rêya selametê da rasd bike.

⁸⁰ Ê sebî mezin dibobû û bi Rûh biquwet dibobû, û li ba wî da bû hata aw royê, ko awî ji Îsrayîl ra xuyayî bû.

SER 2

¹ Û bû kî li wê royan da ji Xistos Qayser ferman rabû, ko dinê hemî bê nivîsandin. ² Av tahrîrê awul, gava ko Kurenîos li Sûrîa da walî bû. ³ Û hemîan ji boy tahrîr bûnê, her kes li bajêrê xo diçobûn. ⁴ Nua Yûsîf jî ji Celîlê, ji bajêrê Nasaret rabû li alîyê Yehûdîstan li bajêrê Dawûd, ko Beytlaham tê gotin; ji boy av ko ji mala Dawûd û xisimê dawûd bû. ⁵ Ji boy tahrîr bûnê bi tevî Meyremê, ki aw xostîya wî bû; û avis bû. ⁶ Û bû kî gava ko wan li wê gîyan, roya mewlûdê wî tamam bû. ⁷ Û kûrê xo awulîn za, û awî danî li afîrê; çima ko li qonax da ji boy wan cî tunne bû.

⁸ Û li wê şivanan hebûn li berî da sekinandin, wan ko li ser naxirê xo li şevê da nobet dipêbûn. ⁹ Û melekê Xodê ji wan ra xuyayî bû, û li dorê wan celalê Xodê tav da, û wan pîr bizdîan. ¹⁰ Û Melek ji wan ra go: Metîrsin, çima ko va ha ez ji we ra mezin şazlixkî mûjde dikim, ko ji hemî qawm ra dê bibe. ¹¹ Çima ko ji we ra îro xalas kiroxkî za li nav bajêrê Dawûd. Ki aw Rabb el Mesîh e. ¹² Û ji we ra nişan eva bibe, qondaxbûn sebîkî dê bi- **[136]** bînin, û li afîr da danîn. ¹³ Û li wê saatê bi wî melek ra cûmhûrkî asakîrê azûmanan bû ko ji Xodê ra tesbît dikiribûn û digotibûn: ¹⁴ Li bilindîyê azûmanan ji Allah ra hamd, û li ser ardê selamet, li merûvan xoşnûdîtî bibe. ¹⁵ Û bû kî, gava ko melekên ji wan li azûmanan çûn, wê çaxê şivanan ji hevûdu ra gon: Werin hata li Beytlehemê em biçûn, û bibînin av çî tişt e, ko Xodê ji me ra nişan da. ¹⁶ Û bi taqaza kirinê hatin, û Meyrem û Yûsîf hem jî mahsûm li afîr da danîn dîn. ¹⁷ Û gava ko dîn, li xusûsê sebîyê han tiştê xaber kirin. ¹⁸ Û hemîan ko dibihîsdibûn tacûb dikiribûn li ser tiştê han, ko şivanan ji wan radigotibûn. ¹⁹ Û Meyrem hemî av xaberan li dilê xo bi danînê vedişart[i]bû. ²⁰ Û şivanan vegeŕian, û hamdsena dikiribûn ji Allah ra jî boy av hemî tiştan ko bihîsdinû dîn; çawan ko ji wan ra hatibû tarîf bûn.

²¹ Û sebîye ji sünnet kirin ra, gava ko heşt ro tekml bûn, aw, hêja li ber rahma dîya xo ketinê ji melekê hat gotan, navê wî Îsa hati danîn.

²² Û li ser qawla nomosê Mûsayê kînga ko royê paqijîtiyê wî, tamam bû, awî ji boy li ber Xodê deranînê, li Qudsê birin. ²³ Çawan ko li nomosê Xodê hatîe nivîsandin, erki hemî weledê nêr ko rahma dîyê xo vedike, ji Xodê ra mûqades dê bê gazî kirin. ²⁴ Û weka li nava nomosê Xodê hati gotan, cotkî fatimok ya du çêjikê kekovan. ²⁵ Û va ha li Qudsê²¹⁵ merûvkî hebû ko navê wî Şimhûn bû; û aw merûv

²¹⁵ Di metnê de *Qubsê*.

sadiq û bi îtîqat bû, û ji boy tesellîê Îs- [137] rayîlê dipêbû, û Rûh el Quds li ser wî bû. ²⁶ Ê ji Rûh el Qudsê jê ra emr bû ko mirin nebîne, hata ko Mesîhê Xodê bibîne. ²⁷ Ê aw bi Rûh li dacarê hat û gava dî û bavê wî mahsûm Îsayê anîn ki li ser adetê nomosê li ser wî bikin. ²⁸ Aw jî awî helmêz kir û mûbarek kir Xodê û go: ²⁹ Nua, ya! efendîyê min, bi göra kelimê xo bi selamet; qulê xo azad dikî. ³⁰ Çima ko çahvê min xelasê ta dîn. ³¹ Ki aw li ber hemî qawma xo ta hazir kir. ³² Ji boy rohnî bûnê tayîfan, nûr, û ji boy qawma ta Îsrayîlê îzzet. ³³ Yûsîf û dîya wî tacûb dikiribû[n] li ser av hemî tiştan ki li ser haqê wî dihatibûn gotan. ³⁴ Ê Şimhûn mûbarek kir wan, û ji dîyê wî ji Meyrem ra go, va ha vîa li nav Îsrayîl da ji boy ketin û rabûnê pîran, û ji boy nişanê dozê hati danîn. ³⁵ Hem ji dilê ta jî şûrkî dê bibihure, hata ko ji pîr dilan fikiran aşîkâr bibin.

³⁶ Ê li wê bû Hana peyember qîza Fanuelê ji asla Aşerê, wîa roya xo buhartibû; ji bekîrîtiyê, heft salan bi mêra xo bi sekinandinê. ³⁷ Ê jinebî bû qasa hajtê²¹⁶ û çar salan, ki ji dacarê nedîqatîyabû, lê bi rocî û bi nimêc li şev û ro ji Xodê ra îbadet dikir. ³⁸ Awîa jî wê saatê rabû ji Xodê rah hamd dikiribû, û li Qudsê şerîf da hemî ji wan ra ko ji xelas ra dipêbûn ji boy wî xaber didabû. ³⁹ Ê gava ko hemî tiştan li ser qanonê Xodê temam kirin, dîsa vegeŕian li Celîlê li Nasaret li bajêrê xo. ⁴⁰ Ê zarûk mezin dibobû, û bi quwwet dibobû bi îlîmê hati tîja bûn.

⁴¹ Ê li bayramê pasehê dî û bavê wî her sal [138] li Qudsê diçobûn. ⁴² Ê gava ko awî dwanzdeh salan bû, û li ser qanûnê bayramê gava ko wan li Qudsê rabûn. ⁴³ Ê gava ko aw royan temam kirinê, ji Qudsê vegeŕian û mahsûm Îsa li Qudsê ma²¹⁷, û Yûsîf û dîya wî nedizanibûn. ⁴⁴ Wan digotibûn qay bi rêwîan ra e, qasa rêya rokî hatin û awî li nav xisûman û nasan aramîş dikiribûn. ⁴⁵ Ê gava ko nedîn dîsa li Qudsê vegeŕian awî aramîş dikiribûn; ⁴⁶ Ê bû kî paşê sê royan awî li dacar da dîn, ko li nava xocan da rodinibû û ji wan ra godarî dikiribû û ji wan tişt pîrs dikiribû. ⁴⁷ Hemî wan ko jê ra godarî dikiribûn, tacûb dikiribûn li ser îlm û cewabê wî. ⁴⁸ Ê gava ko awî dîn tacûb kirin; û dîyê wî go jê ra: ya! oxul, ta çima? wusan kir ji me ra; va ha bavê ta, hem ez, bi pîr dil hêşandinê em ta aramîş dikiribûn. ⁴⁹ Ê aw ji wan ra go, wê çima? mi aramîş dikir²¹⁸, hûn nedizanibûn? ko ji mi ra lazim e ko li mala bavê xo da bibim. ⁵⁰ Ê wan fehm nekirin aw xaber ki ji wan ra go. ⁵¹ Ê ket bi wan ra û çû li

²¹⁶ Di metnê de *hajdeh* (nîşeya wergêrê).

²¹⁷ Di metnê de *me*.

²¹⁸ Di metnê de *mi çima? wê aramîş dikir*.

Nasaratê, û ji wan ra mûteh bû, hama dîya wî hemî tiştan li dilê xo da vedişart. ^{s2} Û Îsa li îlm da û li qamet da û li lutf da li ber²¹⁹ Xodê û meşruvan li pêş diçobû.

SER 3

¹ Û li on beşîncî salê padîşahîtiyê qayserê Dîperîusê, wexta Pîladosê Bondosê ko li ser Yehûdîstanê walî bû; û wexta Hîrodîsê ko rib reyîsê Celîlê bû; û wexta brêy wî Filîdosê ko rib reysê dîyarê Îdurya û Traxonîtîs [139] bû, û wexta Lusanîayê ko rib reyîsê Abelînê bû. ² Û roya îmamîtiyê Hanayê û Qayîafayê, li çölê da kelamê Xodê li ser Hanna kurê Zaxariyê bû. ³ Û hat li hemî aliyê Yordanê ji boy aflixê güneyan tahfilê toba waz dikiribû. ⁴ Çawan ko li nav kitêbê xabêrê Îşayîa hati nivîsandin, ko dêje, sawnda li çölê da gazî kiroxê, rêya Xodê hazir bikin, û rêçê lingê wî rast bikin. ⁵ Hemî newalan dê tija bibin û hemî çîyan û gazan dê nizm bin û dîjwaran dê qolay bibin. ⁶ Û her kes xelasê Xodê dê bibîne²²⁰.

⁷ Ji wî tahfil bûn ji xalqê ra, go: Ey! weledê goşimahrî kî? ji we ra nişan da ko bîrevî ji aw xazabê ko dê bê. ⁸ Nua ji töwbe ra layiq meywean hasil bikin, û hûn li xo da bavê me Îbrahîm heya gotinê başlamîş mebin; çima ko ez ji we ra bibêm, ko Xodê ji kevirê hanan jî qadîr e ji Îbrahîm ra zürîyet darxe. ⁹ Hem nua jî bivir li ba qurma daran disekine, nua aw hemî dar ko, qanc meywe nayîne, tê brandin û li agir avêtin. ¹⁰ Û xalqê jê pîrs dikir û digotibûn: Nua em çi? bikin, ¹¹ Û awî cewab da û go ji wan ra: Ji kê ra ko du xafdan heye bira yekê bide ji awî ra ko tunne, û ji kê ra ko taam heye bira ahwa bike. ¹² Û ji tahfil ra gümrügcîan jî hatin, û goni jê ra: Ya! xoca em çi? bikin? ¹³ Awî jî go ji wan ra, ji we ra çi ko emr bûye, ji wî zêde tiştî mekin. ¹⁴ Asker jî jê pîrs dikiribûn û digotibûn, Lê em jî çi? bikin; û ji wan ra go, Yekê talan mekin, û ji yekê ra îffîra mekin; û ji ülfayê xo ra qanaat bikin. [140] ¹⁵ Û gava ko xalqê umud dikiribûn, û hemîan li dilê xo da dîşûmîş dibobûn ji boy Hannayê, acaba vîa e Mesîh. ¹⁶ Hanna ji hemîan ra cewab da û go, Bîra ez wê bi avê tahfil dikim; hama ji min pêtir quwetlî tê, ki ez solê wî helain ra layiq nin im, awî dê wê tahfil bike bi Rûh el Quds û bi agir. ¹⁷ Ki milêbê wî li dest da e, û bêderê xo dê paqij bike, û genimê li ambarê xo de bicivîne, û kayê dê bi netafandin agrê bişewutîne. ¹⁸ Nua bi hênî pîr tiştan ji qawm ra nesîhat dikiribû û mûjde didabû.

²¹⁹ Di metnê de *bar*.

²²⁰ Di metnê de *bi bibîne*.

19 Hama Herodîs rib reys ji wî bi tazîl bûnê ji semedê jina brêy xo Hîrodîayê, û ji boyhemî yaramazîtîyê, ko Hîrodîs kir. 20 Li ser av hemîan vîa jî zêde kir, ki li zindanê danî Hannayê. 21 Û gava ko xalq hemîan tahfik bûn, û Îsa jî tahfil bû, û duwa fikir, azûman vebû; [22] Û rûh el Quds bi dîtîne gövde weka kevokê li ser wî hati xwar, û ji azûmanan sawndkî hat, ki digot, Tu î Qurê min delalî ji ta razî bûm.

23 Û Îsa awî qasa sî salan bûn; (ko çawan taxmîn dibobû) awî Qurê Yûsîf e, ki aw ê Halîne; ki aw ê Matadê. 24 Ki aw ê Lewîyê, ki aw ê Melkîyê, ki aw ê Yanaê, ki aw ê Yûsîfê. 25 Ki aw ê Madteê, ki aw ê Amowsê; ki aw ê Nahûmê, ki aw ê Haslîne, ki aw ê Nankeê. 26 Ki aw ê Maa'tê, ki aw ê Madatê, ki aw ê Şamhîê, ki aw ê Yûsîfê, ki aw ê Cûdayê. 27 Ki aw ê Yûhana, ki aw ê Saatîlê, ki aw ê Nerîyê. 28 Ki aw ê Melkîyê, ki aw ê Adeyê, ki aw ê Qûsamê, ki aw ê Elmatsanê, ki aw ê Arê. 29 Ki aw ê Yû- [141] sayê, ki aw ê Eliazarê, ki aw ê Yûramê, ki aw ê Matatê, ki aw ê Lewîyê. 30 Ki aw ê Şimhûnê, ki aw ê Yehûdayê, ki aw ê Yûsîfê, ki aw ê ki aw ê Yûnanê. 31 Ki aw ê Îlîaqîmê, ki aw ê Melîayê, ki aw ê Mînanê, ki aw ê Matataê. 32 Ki aw ê Matanê, ki aw ê Dawûdê, ki aw ê Yesîê, ki aw ê Yupetê, ki aw ê Baa'zê, ki aw ê Salmûnê, ki aw ê Nasunê,. 33 Ki aw ê Amînadapê, ki aw ê Aramê, ki aw ê Hasrûnê, ki aw ê Farîsê, ki aw ê Yehûdayê. 34 Ki aw ê Yaqûbê, ki aw ê Îshaqê, ki aw ê Îbrahîmê, ki aw ê Tarahê. 35 Ki aw ê Naxûrê, ki aw ê Sarûxê, ki aw ê Rahûê, ki aw ê Falîkê, ki aw ê Aberê, ki aw ê Salamê. 36 Ki aw ê Qaynanê, ki aw ê Arfaqsatê, ki aw ê Samê, ki aw ê Nûhê, ki aw ê Lamexê. 37 Ki aw ê Matasalîhê, ki aw ê Exnûxê, ki aw ê Yaretê. 38 Ki aw ê Mahlalaê, ki aw ê Qaynanê, ki aw ê Enûsê, ki aw ê Ademê, ki aw ê Xodê bû.

SER 4

1 Û Îsa bi Rûh el Quds tîja ji Yordanê vegeîra; û ji Rûhê li çölê hati birin. 2 Û ji Şetanê çil ro hati carabandina, û li wê royan da ne tiştîkî xwar û ne jî vexwar, û gava ko aw royan temam bûn, birçî bû. 3 Û Şeytan go jê ra: Erki tu Qurê Xodê yî bêje av kevirê han ra bira nan be. 4 Cewab da jê ra Îsa, û go: Hatîe nivîsandin, ko ne bi nan tenê meşuv dijî, lê bi her xaberê Xodê.

5 Û Şeytan awî li çîyêkî bilind deranî li yek daqîqa ki padîşahîtiyê hemî dinêyê jê ra nişan da. 6 Û Şeytan jê ra go: Hemî av hökmatan, û îzzetê ji ta ra didim; çima ko [142] av ji mi ra teslîm bûye, û kê ra ko bixwazim didim. 7 Nua erki tu li ber min bikevî û secde bikî, av hemî jî ji ta ra bibe. 8 Û Îsa cewab da jê ra û go: Hatîe nivîsandin: ji Xoyî û Xodê xo ra secde bikî û jê ra îbadet bikî.

9 Û awî li Qudsu şerîfê bir, û awî li ser qubayê dacarê sekinand, û jê ra go: Erki tu Kuxrê Xodê yî xo ji wê jêr bavêje. 10 Çima ko hatîe nivîsandin, erki melekê xo ra sipêrtîe ji boy ta, ki ta bipên. 11 Hem jî ta li ser destan dê helînin ki qat linga xo li kevir nexî. 12 Cewab da jê ra û go: Hatîe gotan, Xoyî û Xodêê xo neceŕbînî. 13 Û şeytan gava ko hemî tecrûbeyan temam kir, wextkî jê dûr ket.

14 Û Îsa bi quwetê Rûh li Celîlê vegeŕa; derhaqê wî aw hemî alîyan namê wî rabû. 15 Û awî li nav cemîyatê wan hîn dîkir û ji hemîan dihatibû îzzet bûn.

16 Û hati li Nasaretê, li ko ki awî mezin bûbû, û li ser adetê xo roya şemûyê ket li cîyê cemîyatê. 17 Û dani jê ra kitêba Îşaya peyxemberê; û gava ko kitêbê vekir, aw cî li ko ki nivîsandin bû. 18 Rûhê Xodê li ser min e, ji av sedemê mi mesh kir, mi ji faqîran ra mûjde kirin ra şîand û dilê şikestîan, şîfa kirinê. 19 Ji esîran ra xelas û ji koran ra dîtin, waz kirinê; wan ko li zulmê da ni azad berdanê, maqbûl salê Xodêyê waz kirinê mi şîand. 20 Û kitêbê qifiland, û da ji xizmetcî ra û ronîşt, û li cemîata bûn çahvê hemîan li ser wî dinihêrtibûn²²¹. 21 Û dest kir ji wan ra gotinê îro nivîsê han li goya wê ti- [143] ja bû. 22 Û hemîan li ser wî şahadet dîkir[i]bûn, û tacûb dîkiribûn li ser av latîf xaberan ko ji devê wî derdihat, û vîa kuxrê Yûsîf nin e? digotibûn. 23 Û go ji wan ra: Bîra hûnê dê ji mi ra bêjin av temsîlan han, ya! hekîm tu xo sax bike, çiqas ko me bihîst li Kafarnayûmê da ta kir, livir li welatê xo da jî bike. 24 Û go: Bîra dibêm ji we ra, qat peyxemberkî li welatê xo da maqbûl nin e. 25 Bîra dibêm ji we ra, li roya Îlîayê pîr jinebîan hebûn li nav Îsrayîlê gava ko sê sal û şeş mahan azûmanan hati qufîlandin, û mezin xalaî bû li hemî welatan. 26 Hama Îlîa ji wan ji yekê ra nehati şîandin, îlla tenê li nav bajêrê Sarfîa Sîtonê ji yek jinebî²²² jînik ra. 27 Û li gûna Îlîşahê pîr uyuzan hebûn li nav Îsrayîlê, hama ji wan yekê paqij nebû; îlla Sûryanî Naman. 28 Û gava ko wanan bihîsdin, wan hemîan ko li cîyê cemîatê da bû bi xazabê tîja bûn. 29 Û wan rabûn awî ji bajêr derxîsdin, û birin awî hata li firînekê çîye li ko ki bajêrê hatibû çêbûn, ki aw ji çîyê bilindê li xwarî bavêjin. 30 Hama aw ji nav wan bihurî çû.

31 Û çû li bajêrê Celîlê li Kafarnayûmê, û li royê şemûyê ji wan ra talîm didabû. 32 Û li ser talîmê wî mat dibûn; çima ko bi hokmat bû sözê wî. 33 Û li cîyê cemat da merûvkî hebû, ki nepak rûhê wî hebû; û aw bi bilind sawnd qîra bû û go: 34 Berde, bi me ra çi? îşê ta heye, ya! Nasranî Îsa, tu hatî me helak kirinê; em ta zanin

²²¹ Di metnê de *dinihêrtin bûn*.

²²² Di metnê de *jinabî*.

tu kî î, müqadesê Xodê. ³⁵ Ê İsa xayidî li ser awî û go, Lal be, û ji wî rabe, û cin awî li or- [144] tayê xisd, û jê rabû, û zararkî neda jê ra. ³⁶ Ê li ser hemîan tacûbkî hat, û xaber didabûn bi hevûdu û digotibûn: Av çi? xaver e, ko bi hokmat û bi quwet dixayidî li ser nepak rûhan, û dertên. ³⁷ Ê namê wî rabû li hemî derê aw memleketê.

³⁸ Ê ji cîyê cemîatê rabû û li mala Şimhûnê ket. ³⁹ Ê xasûê Şimhûnê takî xidar girtibû, û ji boy wî lava kirin jê ra. ⁴⁰ Ê awî sekinî li ba wî, li ser ta xayidî, û awî barda; û bi zû va rabû û ji wan ra xizmet dikir.

⁴¹ Ê gava ko ro ava dibobû, ji hemîan ra ko habû türli bi illetan naxoşan, dianibûn awan jê ra, aw jî li ser her yekê dest didanibû, û sax dikiribû wan. ⁴² Cinan jî ji pîran derdihatibûn, diqîrabûn, û digotibûn, ko tu Qurê Xodê î, û awî dixeyîde û bernedidabû ko xaber bidin.

⁴³ Ê gava ko roj bû, rabû çû li cîkî berîyê, û xalqê awî aramîş dikiribûn hatin hata li balê, û zor dikiribûn jê ra ko ji wan neçe. ⁴⁴ Awî jî go ji wan ra: Lazim e ko ji xayrî bajaran ra jî padîşahîtiyê Xodê mûjde bikîim; çima ko ji boy vî ez hatime şîandin. ⁴⁵ Ê li cemîatê Celîfîan waz dikiribû.

SER 5

¹ Ê bû kî gava ko xalq li dorê wî top bûbûn û kelmê Xodê godarî dikiribûn, awî jî li ba gölê Canaşarê disekinî bû. ² Ê dî ko du qayixan li ba gölê disekinî bûn, û seyadê mahsîan ji wan derhatibûn, torê [145] xo dişûşdibûn. ³ Ê awî li aw qayixan yekê da ket ko aw ê Şemhûn bû, jê ra lav kir ko hinik ji zwayîyê li nav bahrê bibe; û ronişd, û ji qayixê ji xalqê ra talîm didabû.

⁴ Ê gava ko ji xaberdanê sekinî, go ji Şimhûn ra: Li pêş li kûrê bibe qayixê, û torê xo bavêj mahsîan seyd kirinê. ⁵ Cewab da Şimhûn û go jê ra: Ya! xoca li şev gijik em şixulîn, hama qat tiştî me negirt, lakîn ji boy söza ta bavêjin torê. ⁶ Ê wan ko awî kirin pîr zahf pîr mahsîan civandin, wusan ko torê wan diqatîabûn. ⁷ Ê li aw qayixê din da bûn ji ortaxê xo ra îşaret dikiribûn, ko bên ji wan ra yardim bikin, û wan hatin, û herdu qayixan jî tija bûn wusan ko nêza xarî bûnê bûn. ⁸ Ê Şimhûn Petros gava ko dî, li ser çökê İsa ket û go: xo ji min alî de ya! Rabb çima ko ez yekê günekar im. ⁹ Çima ko bizdîa awî û wan hemî ko pê ra bûn; ji semedê seyde mahsîan. ¹⁰ Wusan jî kûrê Zebdîa Yaqûb û Hannayê wan ko ortaxê Şimhûn bûn, û İsa go ji Şimhûn ra, Metîrs ji wê pê va tu dê sayadê merûvan bibî ji boy hayatê. ¹¹ Ê qayixê xo kişandin li zwayîyê û her tiştê berdan, û li pey wî çûn.

12 Û bû kî gava ko awî gihîşt li bajêrkî, va ha merûvkî bi uyuzîtîyê tijî, gava ko dî Îsa, li ser rû ket, lava kir jê ra û go: Ya! Rabb erki dixwazî tu qadîr î mi paqij kirin. 13 Û awî destê xo dirêj kir, gîyand lê, û go: Dixwazim paqij be, û zû va illetê uyuzîtîyê jê çû. 14 Û awî tenbîh kir jê ra, ko ji yekê ra nebêje, lê go: Here tu xo ji îmam ra nişan bide, û ji boy paqijîtyet xo [146] hedîye bide çawan ko Mûsa emr kir, ji boy ji wan ra şahadetî bûne. 15 Û ji derhaqê wî, xaber hênî pîr radibobû; û pîr xalq dihatibûn civandin ji boy godarî kirinê, û ji naxoşîtyet xo sax bûnê. 16 Û awî li cîyê berîan diçobû, û duwa dikiribûn.

17 Û bû kî, kînga ko awî talîm didabû, û farîsîan û xocayê nomosîan ronişd[i]bûn; wan ko ji celîlê û ji Yehûdîstanê û ji Qudsê û ji hemî qasaban hatibûn civandin; û quwwetê Xodê belî dibobû wan sax kirinê. 18 Û va ha çend merûvan, yekî kötrûm li ser cilan dianîbûn, û dixosdibûn ko awî li hindurê bibin, û deynin li ber wî. 19 Û gava ko ji qalabalixê rê nedidîtibûn, ko ji wê li hindur bibin awî, li ser xanî rabûn, û ji qatîyê li jêr alaqandin awî, û bi cilan li ortayê li ber Îsayê anîn xwarîyê. 20 Û awî îmanê wan bi dîtinê, go jê ra: Ya! merûv güneyê ta ji ta ra afw bibin. 21 Û kâtîban û farîsîan dest kirin fikrandinê û gotinê: Vîa kî? e, ko wusan dijmînan xaber dide, kî? dikare güneyan afw bike ji yek Xodê başqa. 22 Û Îsa gava ko şawrê wan zanî, cewab da û go ji wan ra: Li dilê xo da çi? difikirin. 23 Kîjan? hênî rahat e, güneyê ta ji ta ra afw bibe gotin, ya rabe û biger gotin. 24 Hama wusan ko hûn bizanin hokmatê Qurê merûv, heye li ser ardê afw kirinê güneyan, go ji kötrûm ra; ji ta ra dêjim: rabe, bigir lihêfê xo û hare mala xo. 25 Wî jî li wê saatê li ber hemîan rabû, aw ki li ser wî radizabû helanî, û çû li mala xo, û ji Xodê ra şikir dikir. 26 Û hemîan mat man û [147] ji Xodê ra şikir dikiribûn, bi tîrsan tîja bûn, û gon: Erki îro em tiştê acayîb dîn.

27 Û ji wê pê ve ji wê rabû, û gömrügcîkî dî, ko navê wî Lewî bû, ki ji boy gömrüg sendin ra li wê ronişdî bû û go jê ra: li pey min were. 28 Wî jî her tiştê terk kir li pey wî çû. 29 Lewî jê ra dawatkî mezin kir li mala xo; û pîr qalabalixkî hebû ê gömrügcîan û başqasîan, ko bi wan ra li sofrê da ronişdî bûn. 30 Û kâtîban û hem farîsîan diŕdir dikiribûn û ji şagirdê wî ra digotibûn: Çima? bi gömrügcîan û bi günekâran hûn dixun û vedixun. 31 Cewab da ji wan ra Îsa, û go: Ji saxan ra hekîm lazîm nin e, lê ji naxoşan ra. 32 Ez nehatim sadiqan gazî kirinê, lê günekâran ji toba kirinê.

33 Wan jî goni jê ra: Çima şagirdê Hannayê pîr caran rocî digirin, û duwa dikan, wusan jî şagirdê farîsîan, û ê ta dixon û vedixon. 34 Awî jî go ji wan ra: hûn dikarin? ji zarûkê dawatlîan ra emr bikin ko rocî bipên, çiqas ko zava bi wan ra e. 35 Lakîn royan dê bên ko, zava ji wan dê bê sendin, û wê zemanê, li wê royan da dê rocî bigirin. 36 Masalkî jî go ji wan ra: Qat yekê pîneyê cilê nû ji cilê kavin ra daneyne; erki na aw nû jî diqatîne, hem jî ji kevin ra pîneyê nû yaqîşmîş nabe. 37 Ê yekî meyê nû li meşkê kevinan daneyîne, erki na meyê nû meşkê kevinan diqetîne, û awî dirije; hem jî meşkan wunda dibin. 38 Lê meyê nû li meşkê nû da datînin lazim e û herdu jî têni veşêrandin. 39 Ê yekê meyê kevin venaxu û paşê meyê nû bixwaze, çima ko dêje, erki kevin hênî xoş e.

[148] SER 6

1 Ê bû kî li îkîncî roya awulê şemû ê awî ji nava zevîan dibihuribû, û şagirdê wî bi destan sinbilê genim diqurufandibûn û bi ferikandinê dixwaribûn. 2 Ê ji farîsîan hinikan gon ji wan ra: Av çi? tişt e ko hûn dikan, kî li roya şemûyê da cayîz nin e. 3 Cewab da ji wan ra Îsa û go: Wê nexondin kirinê Dawûdê, gava ko birçî bû awî û wan ko pê ra bûn. 4 Çawan? awî ji mala Xodê ket, û nanê huzûrê xwar, û da ji wan ra jî ko pê ra bûn, kî awî xwarin ji yekê ra cayîz nebû, lê tenê ji îmaman ra. 5 Ê ji wan ra go: Qurê merûv xodîyê şemûê jî e.

6 Ê bû kî li başqa roya şemûêkî awî li cîyê civatan ket, û talîm dikir, û li wê merûvkî hebû, kî destê wî rasd hişk bûbû. 7 Ê kâtîban û farîsîan lê dipêbûn, kî li roya şemûê da awî sax kî ko bi aw semedê gilîkî li ser wî bibînin. 8 Ê awî dizanibû fikrê wan, go ji awî ra, ko destê wî hişk bûbû, rabe li ortayê bisek; awî jî²²³ rabû sekinî. 9 Îsa go ji wan ra: Ji wê tiştîkî pîrs kim, li roya şemûê da qancîtî? kirin, ya kötîti kirin cayîz e, cankî xalas? kirin ya helak. 10 Ê li çar alî li ser aw hemîan bi sê hatinê nihêrt, go ji aw merû[v] ra, Destê xo dirêj ke; aw jî dirêj kir, û destê sax weka awî din bû. 11 Wan jî har bûn, û li nava xo da ji Îsa ra çi bikin xaber didabûn.

12 Ê bû kî li wê royan da li cîyê rabû nimêc kirinê, û şevê gijik ji Allah ra bi duwa ki- [149] rinê buhart. 13 Ê gava ko sibê bû, gazî kir şagirdê xo, û ji wan dwanzdan bijart, kî wan ra resûlan jî nav danî. 14 Şimhûn ko jê ra Petros jî nav danî, û Fîlîbbûsê, û Partîlûmûsê, û Matdayê; 15 Ê Tûmayê, û kura A'lfî Yaqûbê Cûda, û

²²³ Di metnê de jî.

Lelotes hati gotan Şimhûnê. ¹⁶ Û brêyê Yaqûbê Cûda; û Îsxarî Cûda, ki dest dayox jî bû. ¹⁷ Û bi wan ra hati xwarî, û li cîkî deştê sekinî, û qalabalixê şagirdê wî, hem jî hemî Yehûdîstanê û jî Qudsê hem jî alîyê kenarê bahrê Dûrosê û Sîtonê pîr xalq hebû. ¹⁸ Ki jî wê hatin godarî kirinê, û jî boy jî naxoştîyê xo sax bûnê û hem jî napak rûhan ezîyet kşandoxan sax dibobûn. ¹⁹ Û xalq gişk dixosdibû jê ra nêz bûn; çima ko jê quwwet radibobû, û jî hemîan ra şîfa didabû.

²⁰ Û awî çahvê xo li şagirdê xo bi bilind kirinê go: Xozî ji we ra ya! faqîran, çima ko padîşahîyê Xodê ê wê e. ²¹ Xozî ji we ra ya! nua birçî bûyan; çima ko hûn dê têr bin; xozî ji we ra ko nua digirin, çima ko hûn dê şaz bin. ²² Xozî e ji we ra gava ko merûvan wê serhevde dîkin û gava ko wê jî hevalîtîyê xo alî din, û jî wê îkrah bikin, û navê wê xarab derînin jî semedê Kure merûv. ²³ Şaz bîn hûn li wê royê da, şaz bin, çima ko ücretê wê eli azûman da; çima ko bavê wan jî peyxemberan ra ahwa dikiribûn. ²⁴ Lakîn way! jî wê zengînan ra, çima ko teselîyê xo wê sendin. ²⁵ Way! jî we ra ko, nua hûn têr in, çima ko dê birçî bin; way! jî we ra ko nua dikenin, çima ko şîn dê bikin û dê bigirin. ²⁶ Way! jî we ra ko li ser wê qanc [150] dêjin hemî merûvan çima ko bavê wan ahwa dikiribûn jî deraw peyxemberan ra.

²⁷ Hama jî we ra godarî kiroxan ra dêjim, Dijminê xo bihebînin, jî wê îkrah kiroxan ra çêyî bikin. ²⁸ Ji we ra beddowa²²⁴ kiroxan ra, xayr dowa bikin, jî we ra ezîyet dayoxan ra duwa bikin.²⁹ Aw ko li çeney ta ra dixê, awê din jî jê ra nêz ke; û aw ko feraceyê ta derdixê, kirasê xo jî jê mevesêr. ³⁰ Û jî ta her xosdoxan ra bide, û jî malê ta sendoxan şûnda mestin. ³¹ Û çawan ko dixwazin merûvan jî we ra bikin, hûn jî wusan bikin jî wan ra. ³² Û erki hûn wê hebandoxan bihebînin çi? sewabê dibe, çima ko günekâran jî xo hebandoxan dihebînin. ³³ Û erki jî we ra qancîtî kiroxan ra qancî jî bikin, çi? sewabê bine, çima ko günekâran jî heman awî dîkin. ³⁴ Û erki wusan merûv ra deyn bidin ko umudê hebe sendinê, çi? sewabê wê heye, çima ko günekâran jî jî günekâran ra deyn didin, ki bedelê awî şûnda bistînin. ³⁵ Lê hûn bihebînin dijminê xo û jî wê îkrah kiroxan ra qancîtî bikin; û deyn bidin jî wî ra, jî ko kî sendinê umudê wê tunne; ki ücretê wê pîr bibe, û kure Taalayê bibin, çima ko awî jî namkôran ra û jî yaramazan ra qanc e. ³⁶ Nua bimerhamet bin çawan ko Bavê wê bi merhamet e. ³⁷ Û hökm û xazab mekin ko jî we ra jî hökm û xazab nebe, baxş bikin ko jî we ra jî baxş bibe. ³⁸ Bidin ko jî we ra jî bê dayin, bi rind ölçegê, abandin, hati

²²⁴ Di metnê de *berdowa*.

tevdayin, tija dê li paşilê wê bê dayin; bi wî çapê ko bi aw ko hûn dipîvin, ji we ra dê bê pîvandî. ³⁹ Têmsîl- [151] kî jî²²⁵ go ji wan ra, meger kor ji korê ra dikare qalawûzîtî bikin; na? kî herduyan jî li çalê dikevin. ⁴⁰ Şagird ji xocayê xo mezin nin e, û her tekmiîl bûn, weka xocayê xo dê bibe.⁴¹ Çima? li çahvê brêy xo qirşê dibînî, û kêran li çahvê xo da nabînî. ⁴² Yaxod çawan? dikârî gotin ji brêy xo ra: Ey! bira berde ko ji çahvê ta qirşê derînim; û li çahvê xo da kêranê nabînî; ey! mûrayî awul ji çahvê xo kêranê biderîn û paşê dê bibînî ji çahvê brêy xo qirşê deranîn. ⁴³ Çima ko darê qanc nikare meyweyê çurug bide, û darê çurug tunne ko bikare meyweyê qanc bide. ⁴⁴ Çima ko ji îsrîan hejîl naçînin, û ji dirê nermikê trî nacivînin. ⁴⁵ Meruvê qanc ji dilê xo ji xazneyê qanc, çê derîne²²⁶; û meruvê neqanc ji dilê xo neqanc tiştê kotî derîne çima ko devê wî ji zêde bûnê dil xaber dide.

⁴⁶ Çima? ji mi ra, ya! Rabb, ya! Rabb gazî dîkin, û gotinê min nakin. ⁴⁷ Her ji mi ra hatox û kelimê min godarî krox û awan krox, ji kê ra mîna, ji we ra nşan bidim. ⁴⁸ Aw mal çêkîrox meruv ra dimîne: ki kola û kûr kir, û hîmê wî li ser kevir danî, selê avan ko rabûn, çay xisd li aw mal, û qadîr nebû awî tev gerandin; çima ko hîmê wî li ser kevir qawî bûbû. ⁴⁹ Hama aw, ko kelimê min dibihîsd, û nake, dimîne ji aw meruv ra, ko li ser ardê bê hîm mal çêdike; ko lê çay xisd û zû va ket, û heloşandinê aw mal mezin bû.

SER 7

¹ Ê gava ko kelimê xo gişk tekmiîl kir li goya qawmê, ket li Kafarnayûmê. ² Ê qulê yûz [152] başîkî li giran naxoşîtî da nêza mirinê bû, ko jê ra delalî bû. ³ Gava ko li derhaqê Îsa bihîsd, ji Yehûdîan çend rûsipîan şîand, jê ra lava kirinê ko bê qulê wî xelas bike. ⁴ Ê wan jî hatin li ba Îsa pîr lava dikiribûn jê ra, û digotibûn: Erki aw layiq e ko jê ra av tişt bikî. ⁵ Çima ko mîlletê me dihebîne, û cîyê civatê awî çêkir ji me ra. ⁶ Ê Îsa bi wan ra çû, gava ko hênî ji mal dûr nebû, yûzbaşî jê ra çend dostan şîand, û go jê ra: Ya! Rabb li zahmetê mekev çima ko ez layiq nin im, ko li bin xanîyê min bikevî. ⁷ Ji boy vîa mi xo jî layiq nehasiband ji ta ra hatinê; lakîn xaberkî bibê, qulê min dê şîfa bibîne. ⁸ Çima ko e jî li bin hokmatê hati dayin meruvkî im, û li bin emrê min asker heye, û ji yekê ra here dibêm, diço, û ji awê din ra wêre, û tê; û ji xizmetkârê xo ra awî bike, û dike. ⁹ Ê gava ko Îsa vîa bihîsd, tacûb kir, û vegerîa li

²²⁵ Di metnê de jî.

²²⁶ Di metnê de ev peyv kêr in: *û meruvê neqanc ji dilê xo neqanc tiştê kotî derîne* (nîşeya wergêrê).

pey xo çûndox xalqê ra go: Bira dibêm ji we ra, ko li nava Îsrayîl da avqas îman mi nedî. ¹⁰ Ê hati şîandoxan li mal vegeŕian, û naxoş xizmekârê sax bûn dîn.

¹¹ Ê bû kî li roya dîn Nayîn hati gotan bajêrkî diçobû, pê ra diçobûn şagirdê wî jî, û piŕ xalq. ¹² Ê gava ko nêza drîyê bajêr bû, va ha mirîkî derdihatibû, ji dîyê xo ra yek hebik bû; û jin jinebî bû, û pê ra ji bajêr piŕ xalq hebû. ¹³ Ê Rabb gava ko awî dî, hayfa wî hat awî, û go: Megir. ¹⁴ Ê çû li nizangê nêz bû, û wan ko helanî dibiribûn sekinîn, û go: Ey! xorto ji ta ra dibêm rabe. ¹⁵ Ê mirî rabû û ronîşt, û dest **[153]** kir xaberdan, û da awî ji dîyê xo ra. ¹⁶ Ê nua hemîan jî tîrs girt, û ji Xodê ra şikir dikiribûn û digotibûn: Erki peyemberkî mezin li nav me rabûe, û erki Xodê qawmê xo qîyamet kir. ¹⁷ Ê av deng li derhaqê wî, li hemî Yehûdîstanê rabû, û li çar alîyê wê dinê.

¹⁸ Ê ji Hanna ra tarîf kirin şagirdê wî li ser aw hemî tiştan. ¹⁹ Hanna jî didoyan ji şagirdê xo gazî kir, li balê, şîandi wan li ba Îsa, û go: Aw ki dê bê tu? î, ya ji başqasîkî ra em mêze kin. ²⁰ Ê aw merûvan hatin li balê û gon, Hannayê tahfilçî me şîand ji ta ra, û dêje: Aw ko dê bê tu? î, ya ji başqasîkî ra em bipên. ²¹ Ê li wê saatê da piran ji naxoşîyê û ji derdan û ji yaramaz rûhan sax kir, û ji piŕ koran ra dîtin ra qudret da. ²² Cewab da ji wan ra Îsa, û go: Herin ji Hanna ra tarîf bikin çi ko wê dî û bihîs[d]in²²⁷, çawan kor dibîne, topal digere, üyuzan paqij dibin, keŕ di bihîse mirîan qiyam dikin, ji faqîran ra müjde dibe, ²³ û xozî ji awê ra ko; li ser min xwar nebe.

²⁴ Ê gava ko elçîyê Hannayê çûn, ji boy Hanna ji xalqê ra dest kir gotinê, li çölê çi? tamaşa kirinê wê rabûn, ji bayê lerzan qamîşkî?. ²⁵ Lê çi dîtinê wê rabûn, bi nazîk cilan xamalandin meruvkî?; va ha wan ko li cillê bi şöhretê û li zefqê da na li serayê padîşahan dibin. ²⁶ Lê çi? dîtinê wê rabûn, peyemberkî?, belî ji we ra dibêm ji peyemberkî hênî pêtir. ²⁷ Çima ko awî e; ji boyê kê ko hati nivîsandin, va ha erlçîyê xo ezê ber ta bişeyînim, ko rêya ta li ber ta da hazir ke. ²⁸ Bira dibêm ji we ra: ji jinan zan li nav wan da ji Hannayê me- **[154]** zin peyemberkî tunne; lakîn li padîşahîtiye Xodê aw piçûk ji wî mezin e.

²⁹ Ê xalqê gişk gava ko bihîsdin, û gümrügcîan jî, sadiq kirin Xodê ko bi tahfilê Hanna tahfil bûn. ³⁰ Lakîn farîsîan hem xocayê nomosê li derhaqê xo tedbîra Xodê batal kirin, ko jê tahfik nebûn.

²²⁷ Di metnê de ev peyv kêr in: *çawan kor dibîne, topal digere, üyuzan paqij dibin, keŕ dibihîse* (nişeya wergêrê).

³¹ Û Rabb go: Meṛuvê sîlsîleyê han ji kî re bişibînim, û ji kî ra dimînin. ³² Dimînin li aw zarûkan, ko li çarşî da ṛodin, li hevûdu gazî dîkin û dibên: ji we ra me dîdîk pîf kir, û wê neleysd; me şîn kir wê negrîan. ³³ Hannaê tahfilçî hat, ki nedixwar û nevedixwar, û wê digot cinê wî heye. ³⁴ Kûrê meṛuv hat, ki dîxo û vedîxo, û dêjin, va ha xwarox û bekrî meṛuvkî, dostê gümrügcîan û günekâr. ³⁵ Hama îlm ji hemî ewledê xo sadîq bû. ³⁶ Û ji farîsîan yekê jê ra lava dîkir ko pê ra nan bîxo, wî jî li mala farîsîyê ket, û li sofrê da ṛonişt. ³⁷ Û li wê bajêr da günekâr jînkî hebû; gava ko zanî, erki li mala farîsî da li sofrê da ṛonişdîe, şûşakî bi xoş bîn ṛûn anî. ³⁸ Û li pey ve li ber linga wî sekinî û digîrabû, û bi hêstran dest kir linga wî şîl kirin, û bi pora serê xo paqij dîkir, û linga wî ṛadimîsabû, û bi ṛûn dîkir. ³⁹ Û gava ko awî dawat kîrox farîsîyê dî, li dilê xo digot: Erki awî peyṁemberkî bibana, jê ra nêz bûn jin kî? e, û çî tarz e dê bizanibû, çima ko aw yekê günekâr e. ⁴⁰ Cewab da Îsa û go jê ra: Ya! Şîmhûn ji ta ra tiştê min heye gotinê, wî jî go: Ya! xoca bêje. ⁴¹ Ji yekê deyn dayoxan ra du deyndarê wî hebû, ji yekê ra pênc sed û ji [155] aw ê din ra pêncî dînar deynê wan hebû. ⁴² Û gava ko tiştê wan tunne bû dêl ve dayinê, ji herduyan ra baxş kir; nua bêje, awî kîjanê? dê pîr bihebîne. ⁴³ Û Şîmhûn cewab da û go: Ji mi ra xuya: Erki ji kê ra ko pîr baxş kir, wî jî go jê ra, Ta ṛasd şerh kir. ⁴⁴ Û vegeṛîa li alîyê jinikê û ji Şemhûn ra go: Jinikê hana dibînî?, hama wîa bi hêstrê xo linga mi şûşd, û bi pora serê xo paqij kir. ⁴⁵ Ta ji mi ra ṛamîsakî neda, va ha wîa gava ko livir ketime ji ṛamîsayê linga min faraxet nekîr. ⁴⁶ Tu serê min bi ṛûn ṛûn nekîr, wîa linga min bi xoş bîn ṛûn kir. ⁴⁷ Ji boy avî dibêm ji ta ra, afw bibe ji wan ra pîr güneyê wî, çima ko pîr heband; çima ko ji kê ra ko hindîk afw dibe hindîk dihubîne. ⁴⁸ Û go jê ra: Güneyê ta ji ta ra afw bibin. ⁴⁹ Û tev li sofrê da ṛonişdoxan li xo da dest kirin gotinê, vîa kî? e ko afîtlîyê güneyan dide. ⁵⁰ Û awî go ji jinik ra: Ta îmanê ta xalas kir, here bi selametê.

SER 8

¹ Û bû kî ji wê pê ve, wî jî bajêr be bajêr û qasaba digêṛabû, waz dîkir û padîşahîtiyê Xodê mûjde dîkir; û dwanzdan jî pê ra. ² Hem jî çend jinan ko ji yaramaz rûhan û ji naxoşîtîan sax kiribû, yanî Meyremê ko Magdalînî dihati gotan ko ji wî heft cinan deranî bû. ³ Û Yohanna jina xuzayê ketxüdayê Hîrodesê, û Susanê, û hênî pîran, wan ko bi malê xo jê ra xîzmet di- [156] kiribûn. ⁴ Û pîr qalabalix bi hev hatinê, û ji her bajêr xalq ko jê ra hatin, bi temsîlkî go ji wan ra. ⁵ Tov kîroxxî ṛabû

tova xo tov kirinê, û wexta tov kirinê, hinikan li ser rê ketin; û li bin lingan hati pêl bûn û tayrê azümanan awî xwarin. 6 Ê başqasî li cîyê qarajê ket, hama bi hêşîl bûnê hişk bû, ji namîtî tunne bûnê ardê. 7 Ê başqasî li navistirîan ket, û istirîan pê ra bi şîn bûnê, awî xaniqandin. 8 Ê başqasî li ser ardê rind ket, û gava ko hasil bû, ji dêla yekê sed qat da, û kînga go awî xaber da go: Ji kê ra ko ji bihîsdin ra go heye, bira bibihîse.

9 Ê şagirdê wî jê bi pîrs kirinê digotibûn acaba temsîlê han çi? e. 10 Ê wî jî go: Sira padişahîtyê Xodê ji we ra hatî dayin zaninê; hama ji başqasîan ra bi temsîla tê gotin, ko dê bibînîn, û nebînîn, û dê bibihîsin, û fehîm nekin. 11 Hama aw temsîl vîa e tov kelimê Xodê e. 12 Ê li ser rê wan in, ko dibihîsin, û paşê Şeytan tê, ji dilê wan aw kelimê dertîne, ko nebe ko îman bînîn û xelas bin. 13 Ê li cîyê qarajê wan in, wexta ko dibihîsin, bi şazîtyê qabûl dîkin; hama ji qurm tunne bûnê wan, wextkî îman tînin, û wexta tercûbeyê bi şûnda disekinîn. 14 Ê li navistirîan ketoxan jî wan in: ko gava ko aw kelimê dibihîsin, bi xemê vîe dîne û bi zengînîtyê û bi dil bijandinê bi mejxûl bûnê, tîni xeniqandin; û bêmeywe dibin. 15 Ê li ser ardê rind bûn wan in, ko qanc û bi xoş dil aw kelimê dibihîsin û qabûl dîkin, û bi sabr mahsûl didin.

[157] 16 Ê tunne yekê ko çireye vexe, û li bin firaqkî, ya li bin lihêfê deyne, lê ser şemdanê datîne, ko li hindur hatoxan ronîtyê bibînîn. 17 Çima ko veşardî tîştîkî tunne ko aşîkâr nebe, û ne jî dizîka tîştîkî ko neyê zanin, û li meydanê neyê. 18 Nua mêze kin erki çawan dibihîsin; çima ko ji kê ra ko heye, ji wî ra dê bê dayin, û ji kê ra ko tunne, çi ko wî jî ko aw taxmîn dike heye, wî jî dê jê bê sendin.

19 Ê dê û brêyê wî jê ra hatin, û ji qalabayê nedikarîbûn lê bibihên. 20 Ê jê ra xaber kirin û gon: Dê û brêyê ta li derva sekinîn, û dixwazin ta bibînîn. Ê awî cewab da û go ji wan ra: Dê û brêyê min awan in ko kelimê Xodê dibihîsin û tekmîl dîkin.

22 Ê bû kî li rokî awî li gemîtyê ket û şagirdê wî jî, û go ji wan ra: Wêrin em li aw alîtyê din bibihurin, û çûn. 23 Ê gava ko bi gemîtyê diçobûn, awî xew da çû, û boblîskî bayê li ser gölê hati xwarî û diwerimîbû, û wan li nav zararê da bûn. 24 Ê li balê çûn û awî ji xew kirin, û gon: Ya! xoca, ya! xoca, em helak dibin; û wî jî rabû û sê hat li ser bayê, û ser dalxayê avan, û rahat bûn û selamet bû. 25 Ê awî go ji wan ra: li ko? e îmanê wê, û wan li nav tîrsê ketin, mat man, û ji hevûdu ra digotibûn: Acaba vîa kî? dê bibe, ko li ser bayan û avan emr dike, mütî dibin jê ra.

26 Û wan bi qayixê, çûn li welatê Kerkesîan, ki aw li qarşîyê Celîlê e. 27 Û awî gava ko bajêr derket, ji wî bajêrê yekî li ber wî [158] rabû ko li hindurê wî cinan hebûn, û piş zeman cil wernadigirtibû, û li mal nedisekinîbû, lê li nav mezelan. 28 Û gava ko Îsa dî, bi qîrandinê, li ber wî ket, û bi bilind sawndkî go: Çi? şixulê ta bi mi ra heye; ya! Qurê Allah Taalalyê Îsa, lava dikim ji ta mi li îskence mexe. 29 Çima ko emr fikir ji aw napak rûh ra, ko ji aw meruvê der be, çima ko ji piş zemanê awî zabt kiribû, û zîncîran dihati grêdan, û bi qeydan dihatibû veşardin û aw qeydan dişikênadibû, û ji cinê, li çölê dihatibû qawirandin. 30 Pîrs kir jê Îsa û go: Navê ta çi? e wî jî go: Lakyon, çima ko li awî piş cinan ketibûn. 31 Û lava dikiribûn jê ra ko li bin ardê reş çûndinê ji wan ra emr neke. 32 Û li wê garankî piş xinzîr hebû, ko li çiyê da diçêrabûn, û jê ra lava dikir[i]bûn, ko ji wan ra îzn bide, li wan ketinê, û îzn da ji wan ra. 33 Û cinan ji aw meruvê derhatin, ketin li xinzîran, û garan ji aw cîyê bazdekê li bahrê bazîa, û xaniqî. 34 Û çêrandoxê xinzîran, gava ko aw tiştan dîn' revîn, û tarîf kirin li bajêr û li gundan. 35 Û gava ko meruvan av tiştan dîtinê rabûn, û hatin li ba Îsa; û dîn aw meruv ji ê kê ko aw cinan derhatibûn; li linga Îsa ronişdî, hati wergirtin û aqîl li serî da, hênî bizdîan. 36 Dîtoxan tarîf kirin ji wan ra erki çawa bicin xelas bû. 37 Û xalqê çar aliyê Kerkesîan jê ra lava dikiribûn, ko ji sînorê wan here; çima ko li nav mezin tîrskî ketibûbûn, wî jî li gemîyê ket, û vegeîa. 38 Û aw meruv ji ê kê ko cinan hatibûn der, lava dikir jê ra, ko pê ra [159] bigere, hama Îsa şîand awî, û go: 39 Veger li mala xo, û Xodê çi ko ji ta ra kir xaber bide, û aw çû li hemî bajêr da çi ko Îsa jê ra kir naqil kir.

40 Û gava ko Îsa vegeîa, xalqê awî qabûl kirin, çima ko hemîan lê dipêbûn. 41 Û va ha bi Yayîros nav öeruvkî hat, û awî serwerê cemîatê bû; ket li linga Îsa lava dikir jê ra, ki li mala wî keve. 42 Çima ko yek hebik qîzika wî hebû; qasa dwanzdah salan ki nêza mirinê bû; nua wexta jê ra çûndinê xalqê jê ra ezîyet didabûn. 43 Û jinkî hebû, ko dwanzdah sal li nav îlletê xuyn çûndinê da bû, ko hemî warîyetê xo ji hekîman ra telef kir[i]bû ko jê ra ji yekê sax bûnê çarekî nebûbû. 44 Ji aliyê pê ve bi nêz bûnê ket li pêşa cilê wî, û li wê saatê, bazdanê xuyna wî birya. 45 Û Îsa go: Kî? bû aw ki li mi ket; gava ko hemîan înkâr dikiribûn, go Petros û wan ko pê ra bûn: Ya! xoca ta tahir didin û ta diasirînin. 46 Û Îsa go: Yekê li min ket, çima ko ez li xo hasiami ko ji min quwetkî rabû. 47 Û gava ko dî jînik erki jê nehati veşerandin; bi lîrzandinê hati, û ket li ber wî, û li ber hemî qawmê, naqil kir, erki ji semedê çi? lê

ketibû, û bû, û erki çawan awî zû va sax bûbû. ⁴⁸ Wî jî²²⁸ go: Metîrs ey! qîz îmanê ta ta xalas kir, heç bi selametê.

⁴⁹ Ê gava ko awî xaber didabû, ji alîyê serwerê yekê hat û go jê ra: Qîza ta mir, ji xocayê ra zahmet meke. ⁵⁰ Ê gava ko Îsa bihîsd cewab da jê ra û go: Metîrs lê tenê îman bîne, û dê xelas bibe. ⁵¹ Ê gava ko li mal **[160]** ket, başqa yekê nehişt ko li hindur bikevi, ji xayrê Petrosê û Yaqûbê, û Hannayê, û bav û dîyê qîzikê. ⁵² Ê hemîan jî ji boy qîzikê digirîbûn û li ser wî şîn dikir[i]bûn û awî go: Megirin, çima ko mirî nin e lê xew da diçû. ⁵³ Ê wan awî meqare dikiribûn, çima ko dizanibûn, erki mir. ⁵⁴ Ê awî hemîan jê li derxîsd; ji destê wî girt, gazî kir û go: Ya! qîz rabe. ⁵⁵ Ê rûhê wî li şûnda vegeŕîa, û zû ve rabû; û emr kir ko kê ra taam bidin. ⁵⁶ Ê bav û dîyê wî şaş bûn û ji wan ra tenbîh kir, çî ko bû ji yekê ra nebêjin.

SER 9

¹ Ê awî dwanzdah şagirdan gazî kir, ji wan ra quwet û hökmat li ser napak rûhan da, û naxoştîan sax kirinê. ² Ê wan padîşahîtiyê Xodê waz kirinê, û naxoşan sax kirinê şîand. ³ Ê ji wan ra go: Ji boy rê tîştîkî mestînin, ne çov, û ne tûr, ne nan, û ne dirav, û ne jî du xaftanê wê hebe. ⁴ Ê her kîjan mal dikevin li wê bisekinin, û ji wê herin. ⁵ Ê wan ko wê qabûl nakin, gava ko ji wî bajêrê hûn dertên, toza linga xo dawêşînin ji boy wan ra şahadetîyê. ⁶ Ê wan rabûn li bajaran û li gundan digerîabûn, Încîlê waz dikiribûn û li her cîyan naxoşan sax dikiribûn.

⁷ Rîb serwerê Hîrodîs, hemî amelê wî bihîst, tacûb dikir, çima ko hinikan gotibûn. ⁸ Erki Hanna e ji mirîan qiyam kir, û hinikan, erki Îlîa aşîkâr bû, û başqasîan jî erki ji peyemberê awulan yekê qiyam kir. ⁹ Hîrodîs go: **[161]** Serê Hanna mi jê kir, lê vîa dê kî? bibe, ji boy ê kê ko ahwa tîştan dibihîsim, û dixwazibû ko awî bibîne.

¹⁰ Ê resûlan vegeŕîan, û naql kirin jê ra her çî ko kirin, û wan send bi tenê xo bi xo li cîkî çölê kîşîa li ba bajêrkî, ki navê ê kê Beytsayîda bû. ¹¹ Gava ko xalq bihîsd li pey wî çûn, û wan bi qabûl kirinê, bi wan ra ji derhaqê padîşahîtiyê Xodê xaber didabû, û wan ko ji sax bûn ra muhtac bûn, sax dikir. ¹² Gava ko ro nêza avayê dibobû; dwanzdahan hatin û gon jê ra, xalqê berde ko li av çar alî qasaban û gundan herin vêsa bin, û hem xwarin bibînin; çima ko livir li cîkî çöl da ne em. ¹³ Ê go ji

²²⁸ Di metnê de jî.

wan  ra, h n bidin ji wan  ra xwarin, wan j  gon: Ji p nc nanan   du mahs an p tir t      me tunne, erki em ne in besa av xalq  taam nekirin. ¹⁴  ima ko qasa p nc hazaran me uv heb ; go ji  agirdan  ra, Wan b l k b l k bi p ncan p ncan  oni din bidin. ¹⁵ Wan wusan kirin,   hem an j  dan  oni din. ¹⁶   p nc nanan hem du mahs an send    rast li az manan hin rt, wan m barek kir,    ikand,   didab  ji  agirdan  ra, ko li ber xalq  deynin. ¹⁷ Xwarin   t r b n hem an j    z de b n  par an dwanzdah zemb l helan n.

¹⁸   b  k  gava ko aw  bi ten  duwa dikir  agird t w  j  p   ra b n p rs kir ji wan   go: Xalq  ji boy min ez k ? im d jin. ¹⁹   wan cewab dan   gon: Hannay  tahfil ; ba qas an j   l a;   hinikan j  ji pey ember t awul an yek  qiyam kir  d jin. ²⁰ Aw  go ji wan  ra: L  h n ez k ? me d jin:   Petros cewab da   go: Mes h  Xod   . **[162]** ²¹ Aw  ji wan  ra p r qaw t  kir ko ji kes   ra neb jin t     han. ²²   go: Erki lazim e ko  ur  me uv p r ez yet bik  ne,   ji ba   maman   ji  xt aran   ji k t ban redd bibe,   b  ku tin   li  roya sis yan da qiyam kirin. ²³   ji hem an  ra digot, yek  erki dixwaze li pey min b , aw xo bra  nk r ke   her  o xa   xo bra hel ne,   li pey min b . ²⁴  ima ko k  ko can  xo xalas kirin dixwaze, aw  d  wunda bike;   k  ko ji boy min can  xo wunda dike, d  aw  xalas bike. ²⁵  ima ko  i? Fayde e ji me uv k   ra; erki din  hem  qazanc ke,   can  xo helak ya wunda bike. ²⁶  ima ko k  ko mi   kelam  min ayb dihasib ne,  ur  me uv j  aw  d  bi ayb ke, gava ko b , bi saltanat  xo   Bav   m qades melean. ²⁷ Hama b ra dib m ji we  ra, ji livir sekinandoxan hinikan hene ko hata ko pad  ah t  Xod  bib nin, qat tama mirin  d  nest nin.

²⁸   b  k  pa   av kelaman qasa he t  royan, Petros   Ya  b    Hannay  send,  rab  li   y  nim c kirin . ²⁹   gava ko aw  nim c dikir       w  xay r  t rl k  b ,   cil  w  sip  ber q  b . ³⁰   va ha du me uvan p   ra xaber didab n; ko wan M sa    l a b n. ³¹ Ki wan bi  zzet  xuyay  b n,   ko li ser axir   mr  w  xaber didab n, ki li quds  d  tekm l bana. ³² Hama Petros hem wan ko p   ra b n ji xew   rab n d n  zzet  w ,   aw herdu me uvan ko li bal  sekin  b n. ³³   b  k  gava ko wan j  veqat an, Petros go ji  sa  ra: Ya! xoca ji me  ra livir b n qanc e,   s  holikan em   kin: yek ji ta  ra,   yek  ji **[163]** M sa  ra,   yek  j  ji  l a  ra,  ima ko gotin  xo nedizanib . ³⁴   k nga ko aw  go: awirk  hat   li ser wan s  b ,   gava ko li bin awr  ketin bixd an. ³⁵ Sawndk  b  ji awr ,   go: Av e  ur  mi delal  j   ra godar  bikin.³⁶   gava ko deng b ,  sa ten  ma;   wan hi  b n, ji aw t  tan ko d n li w  Royan da ji kes   ra t     negotin.

³⁷ Û bû kî li roya din gava ko wan ji çîyê dihatibûn xwarî xalq pîr rabûn li qarşî wî. ³⁸ Û va ha ji xalqê yekê qîra û go: Ya! xoca ji ta dîleg dikim li ser kûrê min nazar bike; çima ko yek weledê min e. ³⁹ Û va ha awî cin digire, û awî xafil diqîre, û awî li ardê dixê, û digevizîne, û dida kef kirin û ancax jê vediqate, awî bi xurdûxaş kirinê. ⁴⁰ Û mi ji şagirdê ta ra lava kir ko awî derxin, hama qadîr nebûn. ⁴¹ Û Îsa cewab da û go: Ey! îmansiz û ters sîlsîle, hata kînga? ez dê bi we ra bim, û ji we ra sabr kim; kûrê livir bîne. ⁴² Û gava ko awî nêz dibobû cin awî li ardê xist; û dawêşand. ⁴³ Û Îsa sê hat li ser napak rûhê; û sax kir kûrik û da ji bavê xo ra. ⁴⁴ Û hemîan li ser azametê Xodê şaş dibobûn; û va ha ko hemîan şaş dibobûn li ser kirinê Îsa, go ji şagirdê xo ra: Hûn av xabêran li goya xo deynin, ki Kurê merûv li destê merûvan dê teslîm bibe. ⁴⁵ Hama wan av sözê han nedizanibûn, û ji wan veşartî bû, ko fehm nekin; û ditîrsîabûn ji semedê av xebêrê jê pîrs kirinê.

⁴⁶ Û li nav wan şawrî ket, erki wan da mezin dê kî? b,be. ⁴⁷ Û gava ko Îsa fehm kir şawrê dilê wan zarûkî send awî li ba xo se- [164] kinand. ⁴⁸ Û go ji wan ra: Kî ko zarûkê han bi navê min qabûl dike, mi şîandoxê qabûl dike; çima ko li nav we da ji hemîan piçûk, aw dê bibe mezin.

⁴⁹ Cewab da Hanna û go: Ya xoca yekê me dî ko bi navê ta cinan derdixist, me nehişt awî, çima ko bi me ra nedigerîabû. ⁵⁰ Îsa go ji wan ra: Jê biger[i]n çima ko aw ko ji me ra zid nin e, ji alîyê me da e.

⁵¹ Û bû kî gava ko royê ji dinê hati helaninê wî tekmîl dibobû, berê xo li qudsê çûndinê rast kir. ⁵² Û elçîan li pêş xo şîand, û wan çûn li qasabakî Samarîan ketin; ko ji boy wî tedarik bikin. ⁵³ Û awî qabûl nekirin, çima ko aw rûya xo li alîyê Qudsê rast kiribû. ⁵⁴ Û gava ko Yaqûb û Hanna şagirdan dîn, gon: Ya! Rabb dixwazî? ko çawan ko Îlîa kir, em bêjin ko ji azûmanan agir bê xwarî, û wan helak bike. ⁵⁵ Vegeŕîa tazîl kir ji wan ra, û go: Hûn nizanin erki xodîyê çî rûh in. ⁵⁶ Çima ko Kûrê merûv canê merûvan helak kirinê nehat, îlla xalas kirinê û başqa qasabakî çûn.

⁵⁷ Û gava ko wa rê diçûbûn, yekê go jê ra: E jî li pey ta bêm, li ko kî tu here. ⁵⁸ Îsa go jê ra: vorça rûvîan heye û hêlinê tayrê azûmanan; hama ji Kûrê merûv ra cîkî tunne ko serê xo deyne.

⁵⁹ Û ji yek başqasîkî ra go: Were li pey min; wî jî go: Ya! Rabb ji mi ra îzn bide ko awul harîm bavê xo bitamarînim. ⁶⁰ Îsa go jê ra, Berde ko mirîan, mirîyê xo

bitamarînin²²⁹, û tu here padişahîtiyê Xodê waz bike. 61 Başqa ye- [165] kê go: Ya! Rabb li pey ta bêm, lakîn îzn bide ji mi ra, ko awul halalîti ji kûfletê mala xo bixwazim. 62 Îsa go: Tunne yekê ko destê xo li ser şûrikê deyne û li şûnda mêze bike, mînasîbê padişahîtiyê Xodê dê be.

SER 10

1 Û ji wê pê va heftê²³⁰ jî xuyayî kir, û wan li ber xo dido dido şîand li hemî bajaran û cîyan, li ko kî awî dê biçûbû. 2 Û go ji wan ra, bira hasadan pir in; hama paleyan hinik, nau ji xodîyê hasadan ra lava kin ko paleyan derxe ji hasadê xo ra. 3 Herin va ha ez wê dişeyînim weka berxan, li nava guran. 4 Bi xo ra kîs, ya tûr, ya sol mestinin, û li rê da ji kesê ra silavan medin. 5 Û li kîjan mal dikevin, awul bêjin, silavan ji mala han ra. 6 Erki li wê ji silavan ra layîq yekê heye, silava wê dê li ser awî deyne, lê erki na, silavê wê dê ji we ra vegere. 7 Û li aw mal da bisekinin, ji wan bixun, û vexun, çima ko pale ji ücrete xo ra layîq e, hûn ji malan mal meyin gohrandin. 8 Û li her kîjan bajêrê hûn dikevin, û wê qabûl dikan, çî ko li ber wê da tînin bixun. 9 Û li wî da naxoş bûn sax kin û bêjin ji wan ra, li ser wê padişahîtiyê Xodê nêz bûe. 10 Hama li kîjan bajêr ko hûn dikevin û wan wê qabûl nakin, gava ko ji kuçeyê wî dertênî, bêjin. 11 Ji bajêrê wê aw toz ko li linga me zaliqîne ji we ra em dadoşînin, hama vîa hûn zanibin ko padişahîtiyê Xodê li ser wê nêz bûe. 12 Û ji we ra dibêm, ko li wê royê şerîatê Sadûmîan, ji aw bajêrê hênî qo- [166] lay dê bibe. 13 Way! ji ta ra Kûrazîn; way ji ta ra Beytsayda, çima ko erki li Düros û Sîdan da bibana aw quwwetlî amelên ko li nav we da bûn; ji zû va bi xarar û li nav xolîyê hatibûn ronişdin û toba kiribûn. 14 Hama li roya qiyametê, ji Düros û Saydan ra ji wê hênî qola dê bibe. 15 Û tu ya! Kafarnaûm ko li hata azümanan bilind bû; hata li cehenemê tuyê dê bêy xwarî. 16 Aw ko ji we ra godarî dike, ji mi ra godarî dike, û aw ko wê nahasibîne mi nahasibîne, û aw ko mi nahasibîne mi şîandoxê nahasibîne.

17 Nua heftê²³¹ bi şazîtiyê vegerîan û gon: Ya! Rabb bi navê ta cinan jî ji me ra mütêh dibin. 18 Û ji wan ra go: Mi dî Şeytan weka birûsk ji azümanan biketibû. 19 Va ha ji we ra mi hökmat da li ser mahran û dupişkan û li ser hemî quwwetê dijminê

²²⁹ Di metnê de *bi tamarînim* (nişeya wergêrê).

²³⁰ Di metnê de *heftê û didoyan* (nişeya wergêrê).

²³¹ Di metnê de *heftê û didoyan* (nişeya wergêrê).

pêl kirinê û ji we ra qat dê tiştê zarar nedin. ²⁰ Hama hûn li ser vîa şaz mebin ko rûhan ji we ra mûtêh dibin, lê şaz bin ko navê wê li azûman da hatîe nivîsandin.

²¹ Ê li wê saatê Îsa bi Rûh el Quds şaz bû û go: Ya! Baba xodîyê azûmanan û ardê ji ta ra şikir dikim ko, wanan ji alîman û ji arîfan ta veşart, û awan ji mahsûman ra ta beyan kir, belî ya! Baba, çima ko li ber ta ahwa xoş bûya. Ji Bavê min her tişt ji mi ra teslîm bû û yekê nizane kî e Kur, îlla Bav, û kî e Bav, lê tenê Kur, û ji kê ra ko Kur bixwaze aşîkâr kirin. ²³ Ê vegeŕîa xo bi xo li şagirdan, û go: Xozîka ji çahvê we ra, ko dîtinê xo dibînin. ²⁴ Ji we ra dibêm ko pîr peyemberan û padîşahan xosdin dîtinê wê bi- **[167]** bînin, û nedîn; û bihîsdinê wê bibihîsin, hama nebihîsdin.

²⁵ Ê va ha yekê nomosê rabû, dicarabandibû awî, û got: Ya! xoca ez çi? bikim ko ebedî hayatê mîras bigirim. ²⁶ Wî jî go jê ra: Li nomos da çi? hatîe nivîsandin; çawan? dixoyî. ²⁷ Cewab da awî, û go: Xoyî û Xodê xo ji hemî dilêt xo; û ji hemî canê xo, û ji hemî quwwetê xo, û ji hemî fikrê xo, û hevalê xo jî weka nefsê xo bihabîn. ²⁸ Ê awî go jê ra cewabê xo ta rast da, awî bike tuyê dê xalas bibî. ²⁹ Hama awî xo ji boy sadiq deranînê, go ji Îsa ra: Lê hevalê mi kî? e. ³⁰ Cewab da Îsa û go: Meruvkî ji Qudsu şerîfê li Erîxayê dihatibû xwarî; û ket li destê dizan ko wan awî tazî kirin, û bi brîndar kirinê nîv mirin hiştin û çûn. ³¹ Nua rast hat ko ji wî rê da îmamkî bê xwarî û gava ko awî dî li alîyê din bihurî. ³² Kezalîk yekî Lewî li aw cîyê bi hatinê, dî, û li alîyê din bihurî. ³³ Lakîn yekê Samarî ko rêwîti dikir, li rê hati li ba wî, û gava ko awî dî, hayfa wî hat. ³⁴ Ê nêz bû û brîne wî pêça, li ser rûna zeytûnê û şerab bi rijandinê û awî li ser haywanê xo suar kir û awî xankî bir, û jê ra muqayet kir. ³⁵ Ê li roya dinê gava ko ji wê radibobû, du dînar deranî û ji xancî ra da, û go: Muqayet bibe ji wî ra, û çi ko li ser wî zêde xarc bikî, gava ko ez dîsa bêm, ezê ji ta ra eda bikim. ³⁶ Nua ji av sisêyan kîjan? ji ta ra dixuya hevalê aw li destê dizan ketox bû. ³⁷ Awî go: Jê ra merhamet krox.

³⁸ Îsa go jê ra: Here tu jî ahwa bike. **[168]** ³⁹ Ê bû kî gava ko wan çûn, awî li qasabakî ket; û jînkî navê wî Marta awî mala xo qabûl kir, û jê ra xuşkkî hebû ko nava ê kê Meyrem bû; ko hat li ber linga Îsa ronişd û kelamê wî godarî dikir. ⁴⁰ Hama Marta li nav pîr tedarîk dîtinê mejxûl bobû; hati sekinî li balê û go: ya! Rabb hacetê ta nin e; ko xuşka min, mi tenê hişt li nav xizmetê, nua jê ra bêje ko ji mi ra yardum bike. ⁴¹ Cewab da Îsa, û go: Ya! Marta tu xem dixuyî û bi pîr tiştan meşxûl bûy. ⁴² Lakîn lazim bûn tişt yek e Meyrem aw hîsseyê qanc helanî, ko jê dê neyê sendin.

SER 11

¹ Û bû kî gava ko aw li cîkî da îbadet dikir, wexta tebitandinê, ji şagirdan yekê go jê ra: Ya! xoca ji me ra nimêc kirin hîn ke, çawan ko Hanna ji şagirdê xo ra hîn kir. ² Go ji wan ra: Wexta ko hûn nimêc dîkin bêjin: Ya! Bavê me, navê ta muqades bibe; padîşahîtiyê ta be; ³ Nanê me yê hemî rojan, ro be ro ji me ra bide. ⁴ Û güneyê me ji me ra afw bike; çima ko em jî ji hemî deyndarê xo ra afw dîkin, û me li tecrûbeyê mebe.

⁵ Û go ji wan ra, ji wê kî? e aw, ko dostkî wî hebe, û li nivê şevê biço jê ra, û bêje jê ra: Ya! dost ji mi ra sê nanan deyn bide. ⁶ Çima ko dostkî min ji rê ji mi ra hat, û tiştîkî mi tunne ko li ber wî deynim. ⁷ Û awî jî ji hindur cewab bide û bêje, ji mi ra zahmet mede, hênî derîyan hatine girtin; û sebîyê min bi mi ra li lihêf da ne, nikarim **[169]** rabim û ji ta ra nan bidim. ⁸ Ji we ra dibê, erki ji boy dostiyê wî neçabe jê ra nede; lakîn ji boy arsiyê wî dê rabe û qasa lazim bûnê wî dê bide jê ra. ⁹ E jî ji we ra dibê, dîleg bikin û ji we ra dê bê dayin, aramîş bikin û dê hûn bibînin; li derî xî, û ji we ra dê bê vebûn. ¹⁰ Çima ko her dîlegçî distîne, û aramîş krox, dibîne; û kî ko li derî dixê dê jê ra bê vebûn. ¹¹ Ji wê kî e? aw bav, ko erki kure wî jê mahsî bixwaze, meger dêlê mahsîyê mahr? dide²³² jê ra. ¹² Yaxod hêk bixwaze, meger dûpişk? dide jê ra? ¹³ Nua erki hûn ko yaramaz in dizanin baxşîşê qanc bidin ji weledê xo ra, çiqas hênî pîr bavê wê ji azûmanan Rûh el Quds dide ji wan ra ko jê dîleg dîkin.

¹⁴ Û lal cinkî derdixîsd, û bû kî gava ko cin rabû, û lal xaber da, û xalqê hemî tacûb man. ¹⁵ Û ji wan hinikan gon: Awî cinan bi destê; Baalzebûl reyseê cinan derdixê. ¹⁶ Û başqasîan jî awî bi dicarabandibûn, û ji azûmanan jê nişankî dîleg kiribûn. ¹⁷ Hama awî fikrê wan bi zanibûnê, go ji wan ra: hemî padîşahîtiyê li nav xo da hati cîhê bûn, xarab dibe, û malkî li nav xo da hati cîhê bûn dikeve. ¹⁸ Û erki Şeytan jî li xo da cîhê bûe; padîşahîtiyê wî çawan? dê bisekine; çima ko hûn dêjin erki ez cina bi Baalzebûl va derdixim. ¹⁹ Û erki ez bi Baalzebûl va cina derdixim, kure wê bi çi? derdixin, ji boy awî wan dê şeraatçiyê wê bibin. ²⁰ Lê erki bi pêçiyê Xodê ez cinan der dixim; erki wusan e padîşahîtiyê Xodê li ser wê gîhîşdî. ²¹ Kînga ko meruvkî bi quwet ko **[170]** sîlahê xo girêdan mala xo dipê, malê wî li selamet da e. ²² Hama erki jê yekê bi zor li ser wî bê awî fath bike, sîlahê wî jê distîné li ser awî

²³² Di metnê de *didide*.

ko aw umudê xo danî bû; û aw ko ji wî sendîe pay dike. ²³ Aw ko bi mi ra nin e ji mi ra zidd e û aw ko bi mi ra nacivîné bela dike.

²⁴ Gava ko napak rûh ji merûvkî tê der li cîyê bejî digêrâ wesayîti aramîş dike, û kînga ko nabîné dêje vegeîm dîsa li mala xo ji ko kî ez rabûm. ²⁵ Ê gava ko tê awî paqij û sax kirin dibîne. ²⁶ Ê wê çaxê diçû ji pêtir başqa heft rûh distîne bi xo ra; û dikeve li wê sakîn dibe, û axirê wê merûv jî awulê wî beter dibe.

²⁷ Ê bû kî gava ko awî wan ra xaber dida jinkî ji qalabayê sawnda xo helanî û go, xozî ji aw rahm ra ko ta xoyî kir û ji aw çîçik ra ko ji ta ra şîr dan. ²⁸ Ê awî go: Îllâ xozî ji wan ra ko kelamê Xodê dibihîsin û dipên.

²⁹ Ê gava ko xalq li ser wî dihatibûn civandin, dest kir gotinê, sîlsîleyê han yaramaz e, nşan dixwaze, hama ji wî ra ji nşanê Yûna peyxember pêtir, nşan dê neyê dayin. ³⁰ Çima ko çawan ko Yûna Nînweyîyan nşan bû, wusan jî Kûrê merûv dê ji sîlsîleyê han ra bibe. ³¹ Melîkê qibleyê roya qiyamê dê bi merûvê sîlsîleyê han rabe şeraatê û li ser wan dê hokm bike, çima ko aw ji ara dinê hat ji boy bihîsdnê îlmê Süleymanê; û va ha livir ji Süleyman pêtir yekê heye. ³² Merûvê Nînweyîyan li roya qiyamê dê bi sîlsîleyê han [171] rabin, û dê hokm bikin wan; çima ko bi waza Yûnayê kirin; û va ha ji Yûna pêtir yekê livir heye.

³³ Ê qat yekê çirê venaxe û li cî ko dizîka deyne, ne jî li bin kêlê, lê li ser şamdanê, ko li hindûr hatoxan tavê bibînin. ³⁴ Çireyê gövde çahv e ko gava çahv zalal e; gövde hemî bi rohnî dibe, hama wexta ko çahv yaramaz e gövde jî tarî dibe. ³⁵ Nua mêze ke ko li ta da bûn rohnî tarî nebe. ³⁶ Erki hemî gövdeê ta bi rohnî e, û tarî parçakî tunne hemî jî bi rohnî bibe, çawan ko çirekî bi rohnîyê xo ta rohnî bike.

³⁷ Ê gava ko tiştê han xaber dida bû; farîsikî jê ra lava dikir ko taştê bixon; wî jî çû li sufrayê ronit. ³⁸ Gava ko farîsî dî, mat ma, ko ji taştê kirinê awul nahati şûşdin. ³⁹ Ê Rabb jê ra go: Nua hûn farîsîan, li alîyê derve tasê û çanaqê paqij dikan; û li alîyê hindûr bi kşandin û bi yaramazîti tija e. ⁴⁰ Ey! aqilsizan, aw ko alîyê derve çêkir, alîyê hindûr jî aw çênêkir?. ⁴¹ Lakîn ji warîyetê xo tasadiq bidin, û va ha her tişt ji we ra paqij dibe. ⁴² Way! ji wê, farîsîan ra, ko uşrê naneyê û pekenayê û ji hemî û ji hemî pencar mencaran didin û goh nadin ji şerîatê û muhabetê Xodê, avanan kirinê û awa dinan jî gerek e li paş goh navêtin. ⁴³ Way! ji wê farîsîan ra; ko li nav dêran li cîyê bilindan ronîşdin dihubînin û li çarşîan silavan. ⁴⁴ Way! ji we ra ko, hûn weka beylisiz tirban in, ko merûvan li ser diçûn û nizanin.

45 Û ji nomosîan yekê cewab da û go: Ya! xoca av xaberan bi gotinê me ji serhevde dikî. [172] 46 Wî jî go: Ji we ra nomosîan ra jî way!; çima ko ji merûvan ra bi zor²³³ hati birin baran bar dikan; û hûn bi pêçîyê xo ji aw baran ra nêz nabin. 47 Way! ji we ra, ko tirbêt peyemberan çêdikan, û bavêt wê kuşdin wan. 48 Bû kî, ji kirinê bavanê xo bi şahadet kirinê qayîl dibin, çima ko wan awan kuştin, û hûn tirbêt wan çêdikan. 49 Ji boy wî îlmê Xodê jî go: dê ji wan ra peyemberan û resûlan bişeyînim, û ji wan dê kujin û bikavirînin. 50 Hata ko ji îbtîdayê dinê hati rijandin xuyna hemî peyemberan, ji sîlsîleyê han dê bê xosdin. 51 Ji xuyna Abelê hata xuyna Zaxarîyayê, ko li orta mezbahê û dacarê hati kujtin; bira dibêm ji we ra, ji sîlsîleyê han dê bê xosdin. 52 Way! ji wê nomosîan ra, ko miftêyê îlmê hûn veşartin, hûn neçûnî ê kê, û wan ko dixwazin çûndin, nahêlin.

53 Û gava ko aw xaberan ji wan ra go, kâtiban û farîsîan dest kirin sû hatinê, û ji semedê hênî pîr tiştan pê ra zidd çûndinê. 54 Û dipêbûn ko ji devê wî tiştî seydbikin; ko jê gilî bikin.

SER 12

1 Bi awan gava ko bi hazaran qalaba li ser wî hatin civandin, wusan ko hev û du pêl dikiribûn, dest kir ji şagirdê xo ra gotinê; ji hemîyan pêştr ji hevîrtişê farîsîan saqin bin, ko an mûrayîti e. 2 Çima ko veşartî tiştî tunne ko beyan nebe, û dizîka ko neyê zanin. 3 Ji boy wî her çi ko li tarî da hûn dêjin, aw li rohnî da dê bê bihîsdin, û aw ko li [173] odayan û li goh da wê go, li ser xanîyan dê bê waz kirin. 4 Hama ji wê dostê xo ra dêjim, metirsin ji wan ko gövde dikujin, û ji wê pê va hênî tiştî kirinê tunne. 5 Lê ji we ra nşan bidim erki ji kî bitirsin, ji wî bitirsin, ko ji paşê kujdinê hokmatê wî heye li cehenemê avêtinê. 6 Pênc çûçikan ji dido pûlik ra nayê? fırotan, ji wan yekê bile li ber Xodê nayê bîr bûn. 7 Lakîn mûyê serê wê hemî jî hatîe jimartin, erki wusan e metirsin, çima ko hûn ji pîr çûçikan pêtir in. 8 Û ji we ra dêjim, her kî ko mi li ber merûvan îqrar dike, Qurê merûv jî awî dê li ber melekê Xodê îqrar bike. 9 Hama aw ko mi li ber merûvan înkâr bike, li ber melekê Xodê dê bê înkâr bûn. 10 Û her kî ko li qarşîyê Qurê merûv tiştê dêje, jê ra dê bê afw bûn hama ji Rûh el Quds ra küfür kroxan dê afw nebin. 11 Û gava ko wê dibin li cemîatan, û li ber zabîtan û

²³³ Di metnê de *zor*.

hökimdaran xam mekişînin, erki çi cewab dê bidin, ya çi dê bêjin. ¹² Çima ko Rûh el Quds li wê saatê ji gotin ra ji we ra lazim bûn dê hîn bike.

¹³ Û ji qalabayê yekê jê ra go: Ya! xoca ji brêyê mi ra bêje ko bi mi ra mîrasê pay bike. ¹⁴ Û awî jê ra go: Ya! meruv mi li ser wê qadî ya ay kirox kî? danî. ¹⁵ Û go ji wan ra: mêze kin û saqinin ji tamakârîtiyê, çima ko ömrê yekê ji zêde bûnê warîyetê wî nin e. ¹⁶ Ji wan ra temsîlkî go: Ji cotê meruvkî xort pîr mahsûl hat. ¹⁷ Û awî li dilê xo da fikir dikiribû û digot: Çi? bikim cî tunne ko li wê mahsûlê xo tê kim. ¹⁸ Û go: Ez zanim dê çi bikim, ambarê xo heloşînim û hênî mezin çekim; û **[174]** li wê bicivînim mahsûlê xo û hemî nîmetê xo. ¹⁹ Û ji nefse xo ra dê bêjim: Ya! nefsi ji boy pîr salan pîr nîymetê ta heye rahat be, bixor, vexor, û şaz be. ²⁰ Lakîn Xodê jê ra go: Ey! aqilsiz îşev canê ta dê ji ta talab bikin, nua awan ko ta hazir kir dê ji kê? ra bibin. ²¹ Weka vîa e aw jî ko ji boy nefse xo xazne top dike, û bi Xodê zengîn nabe.

²² Go ji şagirdê xo ra, Ji boy avî ji we ra dêjim ji boy nefse xo zem mekişînin erki em dê çî bixun, û ne jî boy gövdeyê xo, erki em dê çî bixun, û ne jî boy gövdeyê xo, erki em dê çî wergirin. ²³ Çima ko ömr ji taamê pêtir e, û gövde ji cil. ²⁴ Li qijikan mêze kin ko na tov dîkin û na diçînin, ko kîler û ambarê wan tune; û Xodê wan xodî dike, lê çî qas zêde wê ko ji tayran pêtir in. ²⁵ Û ji wê kî? bi xem kişandinê xo dikare li ser qamê xo halabîkî zêde kirinê. ²⁶ Nua erki li ser tiştê piçûk qudretê wê nagê, ji boy başqa tiştan çima? zem dixun. ²⁷ Mêze kin li ser şûşanê çawan mezin dibe, zahmet naxo û nadişêse, hama ji we ra dêjim, Süleyman bîle bi hemî saltanatê xo weka wanan yekê nedihati wergirtin. ²⁸ Nua îro li yabanê sekinî, û sibê dê li agir bê avêtin gîyayê, Xodê wusan dide²³⁴ wergirtin, hemî çî? qas zêde wê ey! hindik îmaman. ²⁹ Hênî hûn aramîş mekin dê çî bixun û dê çî vexun, û li weswesê da mekevin. ³⁰ Çima ko awan hemîyan tayîfeyê dinê aramîş dîkin, hama Bavê wê dizane ko av hemîyan ji we ra lazim in. ³¹ Lakîn hûn padîşahîtiyê Xodê dîleg bikin, û av hemî tiştan dê ji we ra zêde bin. ³² Metirs ey! garanê piçûk; çima ko Bavê wê razî bû ko ji we ra padîşahîtiyê bide. ³³ Warîyetê **[175]** xo bifiroşin û sadaqa bidin, û ji xo ra ne hati kevin bûn keseyan çekin û li azûman da ji xo ra ne hati qadandin xazne bikin, li ko kî ne diz didize û ne²³⁵ gizûx xarab dike. ³⁴ Çima ko xazneyê wê li ko kî bibe, dilê wê jî dê li wê bide. ³⁵ Piştê wê grêdan bibe, û çireyê wê hati vexisdin. ³⁶ Û hûn jî weka aw meruvan ko ji efendiyê xo ra dipên, erki çî? çaxê dê vegere ji dawetê, ko

²³⁴ Di metnê de *dida*.

²³⁵ Di metnê de *na*.

kînga bê û li derî xe, zû ve jê ra vekir. ³⁷ Xozî ji aw xizmetkâran ra, ko gava ko efendî bê, û wan heşar dibîne; bîra dibêm ji we ra, ko aw dê piştê xo girê de, û wan li sufrê da dê bide ronişdin û bibihure ji wan ra dê xizmet bike. ³⁸ Erki li îkîncî ya üçüncî nobetê şevê bê û wusan bibîne, xozî ji aw xizmetkâran ra. ³⁹ Hama awî bizanin ko xodîyê malê bizanibû li kîjan saatê da diz tê, hêşar disekinî bû, û bernedida ko diz malaw wî qul bike. ⁴⁰ Hûn ji hazir bin, çima ko li wexta ko hûn taxmîn nakin *Qurê* meşuv tê.

⁴¹ Ê Petros jê ra go: Ya! Rabb av temsîlê ha ji me? ra ta go; ya ji hemîan ra jî. ⁴² Ê Rabb go: Acaba aw emîn û bi aqil wekîlxarc kî? e ko efendîyê wî awî li ser xizmetkâranê xo tayîn kir; ko li wextê da tayînê wan bide. ⁴³ Xozî ji aw qul ra ko wexta hatinê efendîyê wî awî dê wusan kirox bibîne. ⁴⁴ Bîra dibêm ji we ra, ko awî dê li ser hemî warîyetê xo tayîn dike. ⁴⁵ Hama erki aw qul li dilê xo da dêje efendîyê min dereng dikevi hatinê, û xizmetkâran hem beslemeyan kutinê, û serxoş bûnê başlamîş dibe. ⁴⁶ Efendîyê aw qul dê bê, li wusan rokî ko napê û li wusan saatkî ko [176] aw nizane; û awî dê dû cî bike û hîseê wî dê bi îmansizan ra deyne. ⁴⁷ Ê aw qul ko xosdinê efendîyê xo zane û bi xosdinê wî hazir nake, pîr dê bê kutan. ⁴⁸ Hama aw ko nizane û ji kutin ra layiq tiştê dike, hindik tê kutan; û ji kê ra ku pîr hati dayîn, ji wî dê pîr taleb bibe û ji kê ra ko pîr hati tenbîh kirin, ji wî dê hênî zêde taleb bibe. ⁴⁹ Ez agir xistinê hatim li dinê: çima ko dixwazim ji nua da alaf veketî bûya. ⁵⁰ Hama tahfîlkî min heye ji tahfîl bûn ra û çawan taqaza dikim hata ko tekîl bibe. ⁵¹ Hûn taxmîn dîkin ez hatim li ser ardê selamet xisdinê, ji we ra dibêm, na, cîhê bûn. ⁵² Çima ko ji vê pê va li yek mal da, pêncan ji hevûdu dê bîn cîhê bûn, sisê didoyan, û dido ji sêan. ⁵³ Bav dê cîhê bibe ji weladê, û welad ji bavê, dê ji qîz, û qîz ji dê, û xesû ji bûk, û bûk ji xesû.

⁵⁴ Ê go xalqê ra: çawa ko ji alîyê roavayê agurkî hati rabûn dibînin zû va dêjin erki baran dê bê, û usan dibe. ⁵⁵ Ê gava ko bayê qublê, pîf dike, dêjin dê germ bibe û wusan dine. ⁵⁶ Ya! mûraîan rûya azûmanan û ardê dizanin teftîş kirinê lê wexta han çawan hûn teftîş nakin. ⁵⁷ Ê hûn ji xo çima? farq nakin haqê. ⁵⁸ Çima ko gava ko bi xasmê xo ra li zabîte diçî; li rê da jê xalas bûn ra bixabte²³⁶ nebe ko ta li

²³⁶ Di metnê de *bixabet*.

ba qazî bikşîne, û qazî ta ji celda ra teslîm bike, û celad jî li zindanê da tîne. ⁵⁹ Ji ta ra dêjim, ji wê dera nebî, hata ko pûlikê pašînê²³⁷ eda nekî.

[177] SER 13

¹ Û li rê zemanê hinikan hatin û ji boy Celîlîan jê ra tarîf kirin, ko xuynê wan Pîlados bi qurbanê wan tev kir. ² Cewab da Îsa û go ji wan ra: Hûn taxmîn dikin ku av Celîlîan ji hemî Celîlîan pêtir günekar? bûn, ko wusan tiştan kişandin. ³ Ji we ra dêjim na, lê erki hûn toba nekin hemîan jî dê wusan helak bin. ⁴ Yaxod heşdahan, ko li ser wan quleyê Sîluhanê ket û wan kuşt, hûn taxmîn dikin ko awan li Qudsê sakîn bûn ji hemî merûvan pêtir? bi qabahat bûn. ⁵ Ji we ra dêjim na, hama erki hûn toba nekin, hûn hemîan helak bin.

⁶ Temsîl han jî go: Yekê li nav rezê xo da darkî hejîl danî bû; û hati jê meywe xosdinê û nedî. ⁷ Go ji baxwan ra va ha sê sal e ko ez tîm ji av darê hejîlê meywe aramîş kirinê û nabînim, nua bibîr awî, çima? ardê jî baçal dike. ⁸ Awî cewab da û go: Ya! efendîyê min awî îsal jî berde, hata ko li dorê wî bikolim û sergîn daynim. ⁹ Û erki meywe da, xoş, erki na awî bibîr û bavêje.

¹⁰ Û Îsa li derkî li roya şemuê hîn dikir. ¹¹ Û va ha jinikkî hebû ko awê rûhê naxoştîyê grtibû ji hajdah salan pê va, û civîa glock bobû û qa nedikaribû li jor nihêrtinê. ¹² Û Îsa awî ko dî ji xo ra gazî kir, û go jê ra: Ya! hurme ji naxoştîyê xo tu xalas bûy. ¹³ Û destê xo li ser wî danî, û zû va rast bû, û ji Xodê ra şikir dikir. ¹⁴ Û mezinê civatê bi sê hatinê cewab da, ji boy Îsa li roya şemuê sax kirinê, û go ji xalkê ra, [178] Şeş ro heye ko li wê çaxê cayîz e şîxul kirinê wê royan da werin sax bin, û na li roya şemuê da. ¹⁵ Nua Rabb jê ra cewab da û go: Ya! mürayî, ji wê her yekê li roya şemu da gayê xo ya ker ji afir venake²³⁸? ko bibe av de. ¹⁶ Lê vîa ko qîza Îbrahîm bû ko va ha hejdah sal e ko Şeytan awî girê da, li roya şemu da ji av girêdanê vekirin cayîz nebû?. ¹⁷ Û tiştê han ki go, li qarşî wî sekinandox hemîan jî rezîl dibobûn, û xalqê hemî sax dibobûn li ser aw hemî qanc amelan ko îcra dibobûn.

¹⁸ Û go padişahîyê Xodê minayê çî, û çî? ra bişibînim. ¹⁹ Dimîne habê xardalê ko me meruvkî send, û li baxçeyê xo avêt, mezin bû û dar bû; û tayrê azümanan li ser gulîêt wî sakîn bûn.

²³⁷ Di metnê de *raşînê*.

²³⁸ Di metnê de *veneke*.

20 Û dîsa go, padîşahîtîyê Xodê ji çi tişt ra dişibînim: 21 Dimîne hevîr tîrşê, ko awî jînik send û li nav sê şînik aran veşart, hata ko hemî jî hevîr bû.

22 Û li bajêran û li qasaban bi gerandinê hîn fikir, û gava ko li alîyê Qudsê rêwîti fikir. 23 Yekê go jê ra, Ya! Rabb acaba hindik in wan ko dê xalas bin. 24 Wî jî go ji wan ra xayret bikin ko ji derîyê teng bibihurin, ji we ra dibêm, pîran lê cûndinê dê bixwazin hama qadîr dê nebin. 25 Ji vê pê va ko xodîyê radîbe; derî diqufilîne, û hûn li derve bi sekinandinê; dê dest kin li derî xisdinê û gotinê: Ya! Rabb, ya! Rabb ji me ra veke, wî jî cewab dayinê dê bêje ji we ra: ez wê nas nakim hûn ji ko ne. 26 Wê çaxê dê dest kin gotinê em li ber ta xwarin û vexwarin, û ta li kûçeyê me hîn kir. 27 Û [179] awî dê bêje, ji we ra dêjim, ez wê nas nakim hûn ji ko ne, ji mi dûr bin, ya! hemî nahaqîti kiroxan. 28 Li rê dê bibe girin û qirçînê didanan, û gava ko bibînin Îbrahîmê û Îshaqê û Yaqûbê û hemî peyxemberan li nav padîşahîtîyê Xodê û wê li derve kirinê. 29 Û ji rohelatê û roavayê û poryasê û ji qublê dê bîn û dê ronin li padîşahîtîyê Xodê. 30 Û va ha hene awulan ko dê paşînan bibin û paşînan ko dê awulîn bibin.

31 Û li wî royê da çend farîsîan hatin û gon jê ra: rabe û ji vir here, çima ko Hîrodîs te kuşdin dixwaze. 32 Û awî go ji wan ra, herin ji aw rûvî ra bêjin: va ha ez cinan derdixim, û şîfayîtîan temam dikim îro û sibê, û li roya sisêan da dê tekmîl bibim. 33 Lakîn ji mi ra lazim e ko ihtîmal nin e ko peyxember ji Qudsuşerîfê derva helak bibe. 34 Ya! Yerusâlîm, peyxemberan kuştî û ji ta ra hati şîandoxan kevîr krox Yerusâlîm, çend caran mi xosd weledê te nivandin, çawan ko mirîşk cûçikê xo li bin perê xo dicivîne, û hûn nexosdin. 35 Va ha mala wê ji we ra xarab dimîne, hama ji we ra dibêm hênî mi hûn dê nebînin, hata ko bêjin, bi navê Xodê hatîx mübarek bibe.

SER 14

1 Û bû kî, gava ko awî li rokî şemû da, ket li mala farîsîkî nan xwarinê, û awan awî dipêbûn. 2 Û va ha yekê sisqa li ber wî da hebû. 3 Û Îsa cewab da, û go ji nomosîan ra, erki cayîz? e li roya şe- [180] mû da sax kirin. 4 Û wan hiskot bobûn, û awî girt û awî sax kir wî û şîand û go ji wan ra: 5 Ji wê ker ya gayê kî? li roya şemû da li bîrê bîkeve, awî zû va derneyne! 6 Û jê ra ji boy tiştê han qadîr nebûn cewab dayinê.

7 Û ji dawetlîan ra temsîlkî go: Gava ko di erki çawan cîyê awulîn dibijartin; go ji wan ra: 8 Gava ko yekê ta gazî dike li dawetê li ser dîşegê jorîn rûmene, nebe

ko ji wî ji ta yekê müteber bê gazî bûn. 9 Û aw ko ta û awî gazî kir, bê ji ta ra bêje, ji vî ra cî bide; û ji pê va başlamîş bî bi şerm li ceyê paşîn girtinê. 10 Lê gava ko dawet dibî, here li cîyê paşîn ronî, ki wexta ta dawet kroş bê, ji ta ra bêje: Ya! dostê min hênî jor rabe, li wê çaxê bi ta ra li sofrê da ronîşdoşan, li ber wan ji ta ra dê îzzet bibe. 11 Çima ko her kî ko aw xo bilind dike, dê alçaş bibe; û xo alçaş kroş dê bilind bibe.

12 Hem ji xo dawet kroş ra go: Gava ko taştê yâ şîvê dikî, dostê xo ya brêyê xo yaxod xisimê xo ya cîranê zengînan dawet meke, nabe ko wan jî ta dawet bikin, û ji ta ra bedel bibe. 13 Lê gava ko zîyafet dikî, faqîran, saqatan topalan, koşan dawet bike. 14 Û xozî ji ta ra ko, bedelê wan tunne ko ji ta ra bikin, û aw bedelê dê li qiyamê sadiqan ji ta ra bê dayîn.

15 Ji aw sufrê da ronîşdoşan yekê gava ko xaberê han bihîsd go jê ra: Xozî ji awî ra ko nan dîxo li padîşahîtiyê Xodê da. 16 Û awî jê ra go: Merûvkî şîvkî mezin kir û pîr merûvan dawet kir. 17 Û wexta şîvê xizmet- **[181]** kârê xo şîand, ko aw dawetlîan gazî ke, bi gotinê erki, her tiştê hazir e: 18 Û hemîan jî başlamîş bûn mihane dîtînê, awulîn go: Mi zevî kirî, divabû ko herim awî bibînim. Ez ji te reca dikim ko mi mazûl hasab ke. 19 Û aw ê din go: Pênc cotî ga mi kirî, û diçim ko wan bicerbînim, ji ta reca dikim ko mi mazûl hasab ke. 20 Û başqasî go: Mi ji xo ra jin anî, ji boy awî ez nikarim bêm. 21 Û xizmetkâr hat û ji efendiyê xo ra awan xaber kir, wê çaxê aw xodiyê malê sû hat, û go ji xizmetkârê xo ra, zû va rabe li meydanan û kuçeyê bajêrê, û faqîran û saqatan û topalan û koşan livir bîne. 22 Qul jî go: Ya! Rabb çawan ko ta amr kirbû, û hêja jî heye. 23 Û efendî ji qul ra go: 23 Rabe li nav rêyan û naqaban, û kî ko dibînî, bînî livir, hata²³⁹ ko mala min tiye dibe²⁴⁰. 24 Çima ko ji we ra dêjim ko ji aw dawetlîan, yekê jî dê tama şîvê min nestîne.

25 Û pê ra pîr xalq çûn, vegeŕîa û go ji wan ra: 26 Aw ko li pey mi tê, ji bav û ji dî, ji jin, û ji ewladan, û ji brêyan, û ji xuşkan, û ji nefsê xo jî îkrah neke, nikare şagirdê mi bibe. 27 Û kî ko xaçê xo helneyne, û pey min neye, nikare şagirdê mi bibe. 28 Çima ko ji wê kî? qullekî çêkirin bixwaze, awul roneyne? û xarcê wî hîsab neke, erki awî tamam kirinê qudretê wî heye? 29 Erki nebi ko gava hemî deyne, û nikari tamam bike, hemî dîtoşan dest bikin awî meqara kirinê. 30 Û gotinê, erki merûvê han dest kir çêkirinê, û qadîr nebû tamam kirinê. 31 Yaxod kîjan? xondkâr diçû, pev

²³⁹ Di metnê de *hat* (nişeya wergêrê).

²⁴⁰ Di metnê de *tiye*.

diço bi hênî xondkârkî, [182] û awul roneyne û ji xo ra şêwir bike, erki bi dah hazaran dikare? li ber awî bisekine ko bi bîst hazaran tê li ser awî. ³² Erki na, çi qas ko aw²⁴¹ dût e, elçî dişeyne, û baruştî dixwaze. ³³ Nua ji we jî, ahwa her kî ko hemî warîyetê xo terg neke, nikari şagirdê mi bibe. ³⁴ Xoy qenc e, hama xoy erki bê tahlm bibe, bi çi? dê terbîye bibe. ³⁵ Aw ne ji harî ra na jî ji sergîn ra lazim dibe, lê awî li der dawêjin, ji kê ra ko ji bihîsdin ra go heye bra godarî bike.

SER 15

¹ Û awî godarî kirinê hemî gümrükçîa û günekâran jê ra nêz dibobûn. ² Û farîsîan û kâtîban gazinan dikirbûn û digotibûn: çima? awî günekâran qabûl dike, û bi wan ra dixo.

³ Temsîl han go ji wan ra: ⁴ Ji wê jî kê ra? sed bizinê wî hebe, û ji wan erki yekê wunda bike, not û nehan nehêlê? li çölê, û li pey aw wunda bûn biço, û hata ko awî bibîne. ⁵ Û gava ko dibîne, bi şazîtî li ser piştê xo datîne awî. ⁶ Û li mal diço gazî dike dost û cîranê xo, û ji wan ra dibê: Şaz bin bi mi ra; çima ko mi wunda kir bizinê xo dî. ⁷ Ji we ra bêm ko ahwa şazîtî dê bibe li azüman da ji boy günekârkî ko toba dike, na kî ji boy not û neh sadîqan, ko ji wan ra toba lazim nîne. ⁸ Yaxod, kîjan? jin e ko deh dremê wî hebe, û erki dremkî wunda bike; çira wê naxe? û li nav malê sivnik xi, û qanc lê bigere, hata ko awî bi- [183] bîne. ⁹ Û gava ko dibîne, gazî dike dost û cîranan û dêje, bi mi ra şaz bin, çima ko mi wunda kir dremê xo dî. ¹⁰ Ji we ra dibêm, wusan jî şazîtî dibe li ber melekê Xodê, ji boy günekârkî ko toba dike.

¹¹ Û go: Ji yekê ra du kûrê wî hebû; Ji wan piçûg ji bavê xo ra go: ¹² Ya! baba ji warîyetê xo çi ko ji mi ra dikeve hîsseyê min bide; wî²⁴² jî, malê xo ji wan ra pay kir. ¹³ Û pîr nema kûrê piçûk hemî tiştê xo civand û li welatkî dût çû; û li wê malê xo hemî telef kir, çima ko bi xowardeyîtî ra dibobû û rodinişdbû. ¹⁴ Û gava ko hemî qadand, li wê memleketî da xalayîkî mezin bû, awî başlamîş bû faqîrîtî kşandinê. ¹⁵ Û çû ket li ba yekê aw memleketlîyê, wî jî awî şîand li deşdê xinzîran çêrandinê. ¹⁶ Û arzû dikir ji xarnûbê ji xwarinê xinzîran zikê xo tîja kirinê û yekê nedida jê ra: ¹⁷ Û awî li ser xo hat, û go: Çênd palyan hene li mala bavê min bi nan têr bûn, û ez li vir ji nazan dimirim. ¹⁸ Rabim herîm ji bavê xo ra, û bêjim jê ra: Ya! baba mi güne kir li ber azümanan û li ber ta; [19] Û hênî layîq nin im ez kûrê ta bêm gotinê, mi weka

²⁴¹ Di metnê de *û*.

²⁴² Di metnê de *wî*?

paleyanêṭ xo yekê bike. ²⁰ Û rabû ji bavê xo ra²⁴³ hat, û awî gava ko hêj dûr bû bavê wî dî, û hayfa wî hat, rabû bazda û li astûyê wî ket û ramîsa awî. ²¹ Û kur jî jê ra go: Ya! baba, mi güne kir li ber azümanan û li ber ta, û hênî layîq nin im ez kurê te bêm gotin. ²² Û baba ji xizmetkâran ra go: Bîderînin cilê awulîn û jê ra bidin wergrîtin, û gûstîr deynin li pêçîyê wî û sol li linga wî. ²³ Û conigayê [184] qalaw bînin û serjê kin, em bixun û şaz bin. ²⁴ Çima ko kurê mi han, mirî bobû sax bû, û wunda bobû hati dîtin; û dest kirin şaz bûnê. ²⁵ Û kurê wî mezin li zevî da bû; û gava ko dihatibû, û nêzê mal bû û denga istran û raqsan bihîsd. ²⁶ Û ji xizmetkâran yekê xo ra gazî kir û pîrs dikir, erki av çi ne. ²⁷ Wî jî go jê ra: erki brêy ta hat û bavê ta conigayê qalaw serjê kir, ji wî sedemê ko awî sax selîm dest anî. ²⁸ Nua awî sê hat; û nadixosdibû li hindur ketinê, hama bavê wî li der ket û jê ra lava dikir. ²⁹ Cewab da û go ji bavê xo ra: av çend sal e ko ji ta ra xizmet dikim, û qat ji xabarê ta ez derneketim, û qat carkî ji mi ra ta qarikkî neda, ko bi dostêṭ xo ra mi şazîṭî bikira. ³⁰ Hama gava ko hat kurê ta av ko malê ta bi fahşan xwar, jê ra ta serjê kir conigayê qalaw. ³¹ Û awî go jê ra: Ey! ewlad tu her çax bi mi ra î, û hemî warîyetê min ê ta e. ³² Hama lazim bû ko, şaz û mesrûr bûn; çima ko brêy ta hana mirî bobû û sax bû, û wunda bobû; û hati dîtin.

SER 16

¹ Û go ji şagirdan ra: Yekê zengîn hebû, ko ketxüdakî wî hebû, û li ser wî gilî bûbû, erki warîyetê wî telef dike. ² Û awî gazî kir û go: Av çi? e ko ji boy ta dibihîsim, hîsabê ketxüdayîṭîyê xo bide, çima ko hênî ketxüdayîṭî dê nekî. ³ Ketxüda li dilê xo da go: Ez çi? bikim; çima ko efendîyê min ketxüdayîṭî ji min distîne, şîxul kirin nika- [185] rim, dîlançîṭî şerm dikim. ⁴ Ez zanim dê çi bikim, wusan gava ko ketxüdayîṭîyê xo mazûl bibim, mi li mala xo qabûl bikin. ⁵ Deyndarê efendîyê xo ji xo ra gazî kir, ji awulîn ra go: çi? qas deynê ta heye ji efendîyê mi ra. ⁶ Wî jî go: Sad çap rûnê zeytûn; go jê ra: bistîn temesîkê xo, û ronî zû va pêncî binivîs. ⁷ Paşê duê din ra go: Tu çi? qas deyndar î; wî jî go: Sad kêl genim, û go jê ra: Temesîkê xo bistîn, û ronî haştê binivîs. ⁸ Û efendî ketxüdayê nahaq medh kir, ji boy bi aqil tevgerandinê; çima ko weledê dinêyê han li cînsa xo da, ji kurêṭ rohnîyê hênî bi aqil in. ⁹ Û ez jî ji we ra dibêṃ: Hûn ji xo ra ji malê nahaqîṭîyê dostan peyda bikin, gava ko hûn muhtac dimînin, we li çadirêṭ ebedî da qabûl bikin. ¹⁰ Li tiştê hindik da emîn

²⁴³ Di metnê de xoda (nişeya wergêrê).

bûn, li pîr da jî emîn e; û li hindik da nahaq bûn, li pîr da jî nahaq e. ¹¹ Nua erki hûn li nahaq mal da emîn nebûn; hak mal kî? dê ji we ra bawur bike. ¹² Ê erki li tiştê başqasîan hûn emîn nebûn; ê we kî? dê ji we ra bide? ¹³ Qat yek qulkî ji du axan ra xizmet nikari bike; çima ko ya ji yekê îkrah dê bike, û awê din bihubîne, ya ji yekê ra dê tabî bibe, û li awê din xarab mêze ke; hûn qadîr nin in ji Xodê ra û mamona ra xizmet kirin.

¹⁴ Ê avanan hemîan tamakâr farîsîan dibihîstibûn, û awî mesqara dikiribûn, ¹⁵ Ê go ji wan ra: Hûn in ko li ber meşûvan xo sadîq nşan didin, hama Xodê dilê wê dizane, çima ko li ber meşûvan bilind bûn, li ber Xodê mekrûh e. ¹⁶ Nomos û peyşemberîtî hata **[186]** Hanna bûn; û ji wê pê va padîşahîtiyê Xodê mûjde dibe, û her kes awî bi zor dest dixê.

¹⁷ Ê azûman û ard bi buhartinê, ji nomosê noqtakî ketinê qolay e. ¹⁸ Her kî ko jina xo berdide û başqasîkî distîne, zîna dike; û kî ko aw hati berdanê distîne, zîna dike.

¹⁹ Ê yek meşûvkî zengîn hebû, ko pehez û nazîk dülband werdigirtbû, û her ro sefa dikir. ²⁰ Ê yek Lazaros bi nav faqîrkî hebû, ko aw hati brîndar bû, li ber derîê wî hatibû avêtin. ²¹ Ê arzû dikir ko ji sufrayê aw zengînê hati ketin ji hûrikê nanan zikê xo tîjî bike, û hem jî kelban dihatibûn û brînet wî dalêstin. ²² Ê bû kî ko aw faqîr mir; û melekê Xodê awî birin li helmezê Îbrahîmê²⁴⁴; zengîn jî mir û hati tamirandin. ²³ Ê li cehenemê da gava ko li îskence da bû, çahvê xo helanî û ji dûr va Îbrahîmê û Lazarosê li helmeza wî dî. ²⁴ Ê awî qîra û go: Ya! baba Îbrahîm ji mi ra merhamet bike, û bişeyîne Lazarosê ko serê pêçiyê xo li avê xe, û zimanê min honik bike, çima ko li alavê han da azab dikşînim. ²⁵ Ê Îbrahîm jî go jê ra: Ya! ewlad bîra xo bîne ko tu li wê dinê da nîymetê xo send, wusan jî Lazaros ezîyetê; a nwa ew li vir tesellî dibe û tu azab dikşînî. ²⁶ Hem li ser av hemî tiştan mada li mabeyna me da xendeqkî qayîm bûe; hata ko ji vir ji we ra buhartox xosdîn qadîr nebin, hem wan ko li wê ne ji me ra qadîr nebin buhartinê. ²⁷ Wî jî go: Nua ji ta dîleg dikim ya! baba ko awî li mala bavê min bişeyînî. ²⁸ Li wê pênc brêy min hene ko here²⁴⁵ ji wan ra şehadetî bike, ko nebe ko wan jî li av cîyê azabê bên. ²⁹ Ê Îb- **[187]** rahîm jê ra go: Mûsa û peyşemberan li ba wê nin; ji wan ra bra godarî bikin. ³⁰ Aw jî go: Ná ya! baba

²⁴⁴ Di metnê de *Îbrahîmê*.

²⁴⁵ Di metnê de *hare*.

Îbrahîm, lakîn erki ji mirîan yekê herê ji wan ra toba dîkin. ³¹ Û awî go jê ra: erki ji Mûsa ra û peyemberan ra godarî nekin; ji mirîan jî yekê rabe dê bawur nekin.

SER 17

¹ Û ji şagirdê xo ra go: bêmümkün in ko xwar bûn neyin, hama way ji awê ra ko, bi destê ê kê tê. ² Ji wî ra hênî qanc bû, ko ji astuyê wî ra kevirkî aşê bihati alaqandin û li bahrê bihat avêtin, na kî ji av yekê piçûkan xwar ke.

³ Hûn ji xo ra sqin bin; Erki brêy ta ji ta ra qabahat dike, jê ra tazîr bike, û erki toba dike jê ra afw bike. ⁴ Û li royê da haft caran ji ta ra qabahat bike û haft caran vegere û bêje, toba dikim, jê ra afw bike. ⁵ Û resûlan gon ji Rabb ra: Îmanê me zêde bike. ⁶ Û Rabb go: Erki qasa habê xardalê îmanê wê bibe, û ji darê tûyê han ra bêjin: Ji cîyê xo bifilit û li bahrê bê dayin, aw jî ji we ra dê îtaat bike.

⁷ Hama ji wê kî? e aw ko cotkâr ya şivan qulkî wî hebe, ko gava ko aw ji zevêyê li mal bê, zû va bêje jê ra erki were li vir ronî li sufrê da. ⁸ Lê nebêje jê ra, erki şîvê min hazir bike, piştî xo girê de ji mi ra xizmet bike hata ko ez bixum û vexum, û paşê tu jî xo û vexo. ⁹ Meger razî dibe²⁴⁶ ji aw qulê ji boy jê ra emr bûn tiştan îcra kirinê. ¹⁰ Wusan jî hûn gava ko ji we ra hati emr bûn hemî [188] tiştan dîkin, bêjin erki em faydesîz qul in, çima ko aw ko em deyndar bûn kirinê me kir.

¹¹ Û bû kî gava awî li Qudsê diçobû, ji orta Samarîayê û Celîlê dibihurî bû. ¹² Û gava ko awî li qasabakî diketibû; deh²⁴⁷ uyuz merûvan laqa wî bûn; ko wan ji dûr va sekinîn. ¹³ Dengê xo helanîn û gon: Ya! xoca Îsa ji me ra merhamet bike. ¹⁴ Û gava ko wan gî, go ji wan ra: Herin hûn xo nşanê îmaman bidin, û bû kî gava ko çûn, zû va paqij bûn. ¹⁵ Ji wan yekê gava ko dî erki şîfa send, vegeŕîa bi bilind avazkî ji Xodê ra şikir dida. ¹⁶ Li linga wî ket li ser rû, û jê razî diboybû û awî ji Samarî bû. ¹⁷ Cewab da Îsa û go: Deh merûvan paqij ne?bûn, nua nahan li ko? ne. ¹⁸ Ko li vir nayên xuyayî, vegeŕandinê û ji Xodê ra şikir kirinê; lê tenê yabancîyê han. ¹⁹ Û go jê ra: Rabe herê²⁴⁸ çima ko îmanê ta ta sax kir.

²⁰ Farîsîan gava ko pîrs kirin, erki padîşahîtiyê Xodê kînga? dê bê; cewab da ji wan ra û go: Padîşahîtiyê Xodê bi der va hati xuyayi tiştan nayê. ²¹ Hem va ha livir e ya va ha wê e dê nebêjin; çima ko padîşahîtiyê Xodê li hindura wê da e. ²² Û ji

²⁴⁶ Di metnê de *diba*.

²⁴⁷ Di metne de *dah*.

²⁴⁸ Di metnê de *hare*.

şagirdan ɾa go: ɾoyan dê bēn ko hūn ɾoya Ƙurê meruv dîtinê dê arzû bikin, û hama dê nebînin. ²³ Ê erki ji we ɾa bêjin: va ha livir e ya li wê li dû wan meçin. ²⁴ Çima ko çawan ko birûsk ji bin azûmanan bi baraqandinê, hata li alîyê dinê azûmanan şawq dide, Ƙurê meruv jî li ɾoya xo dê ahwa bibe. ²⁵ Hama jê ɾa awul pîr ezîyetan kşandin lazim e, û ji sîlsîleyê han redd bûn. ²⁶ Ê çawan ko ɾoya Nûh bû, ɾoya meruv jî **[189]** dê wusan bibe. ²⁷ Dixwaribûn û vedixwaribûn, dizewucîbûn û dizewucandibûn, hata li wê ɾoyê, ko Nûh li gemîyê ket, û tofan hat û hemîan helak kir. ²⁸ Wusan jî çawan ko li eyamê Lût bû, dixwaribûn û vedixwaribûn, dikişibûn, difirotibûn, didanîbûn çêdikiribûn. ²⁹ Ham ɾoya ser hatinê Lût ji Sudumê, ji azûmanan agir û kîbrîti hati rijandin, û hemîan jî helak kir. ³⁰ Li ɾoya aşîkâr bûnê Ƙurê meruv jî, weka wanan dê bibe. ³¹ Li wê ɾo da aw ko li ser xanî da e û fîraqa wî li mal da, bira ji boy wan sendinê neyê xwarî, û aw ko li zevî da e, bira venegere. ³² Li bîra xo bînin jina Lûtê. ³³ Aw kî ko canê xo xelas kirinê dixwaze, awî dê wunda bike, û awî kî ko wunda bike, dê xelas bike. ³⁴ Ji we ɾa dibem, erki du meruv li wê şevê da li yek lihêf da bibin, yekê dê bê sendin û awê din dê bê hişdin. ³⁵ Ê erki du jin li yek cîda ji hêrandin ɾa bibin, yekê dê bê sendin û yekê dê bê hişdin, û erki du meruv li zevî da bibin, yekê dê bê sendin û yekê dê bê hişdin. ^[36]²⁴⁹ Cewab dan û gon jê ɾa: Ya! Rabb li ko? dê bibin tiştê han. ³⁷ Wî jî go ji wan ɾa: li ko kî leş heye, qartalan li wê dê bēn civandin.

SER 18

¹ Ji wan ɾa temsîlkî jî go ji boy awî ko: erki ji wan ɾa dayîma îbadet kirin lazim e, û acîz nebûn. ² Go: Li bajêrkî qadîkî hebû, ji Xodê neditîrsabû; û ji meruvan şerm nedikiribû. ³ Ê jinebîkî hebû li aw **[190]** bajêr da; dihatibû jê ɾa û digot: haqê min ji xismê mi ɾa bistîn. ⁴ Ê li pîr zeman aw nedixosdibû, hama ji wê pê va li dilê xoda go: Faraza ez ji Xodê natîrsim û ji meruvan şerm nakim. ⁵ Barê ji boy ji mi ɾa zahmet kirinê jinebîyê han haqê wî haq bikim, ko neyê her wext ji mi ɾa acîzîti bide. ⁶ Ê go Rabb: Bibihîsin kirinê nahaq qadîyê. ⁷ Nua Xodê, li ɾo û şevê jê ɾa ferîad kroş haqê bijartîyê xo dê haq ne?ke, erki ji wan ɾa sabr jî bike. ⁸ Bîra dibem ji we ɾa, erki

²⁴⁹ Di metnê de hejmar tune ye (nişeya wergêrê).

zû va, haqê wan dê haq bike; lakîn gava ko Qurê meruv bê; acaba li ser ardê²⁵⁰ îman dê bibîne.

9 Û ji çend meruvan ra, ko ji xo ra güvemîş bobûn, û pîran serhevde dikiribûn temsîlê han go: 10 Du maruv ji boy îbadet kirinê li dacarê rabûn yekê farîsî û aw ê din gümrügcî. 11 Û farîsî sekinî, duwayê han dikiir: Ya! Allah ji ta ra şikir dikim ko, ez weka başqa meruvan nin im, kşandox, nahaq, zînakâr, yaxod weka gümrügcîyê han jî nin im. 12 Lê li haftê da du caran ronci digirim; û uşrê hemî malê xo didim. 13 Û gümrügcî ji dûr va sekinî, çahvê xo jî rasd li azümanê bilind kirinê nedixosdibû; îlla li singê xo dixisd û digot: Ya! Allah ji mi günekar ra afw bike. 14 Ji we ra dibêm, vîa ji awê din pêtir sadiq çû li mala xo; çima ko her kî ko aw xo bilind dike, dê alçağ bibe, û kî ko aw xo alçağ bike, dê bilind bibe.

15 Hem jê ra masûman anîn, ko li wan biqevi, gava ko şagirdan dîn, ji wan ra tazîl dikiribûn. 16 Hama Îsa wan ji xo ra bi gazî kirinê [191] go: Berdin aw masûman ko ji mi ra bîn, û ji wan bigerîn; çima ko padîşahîtyê Xodê weka wanan ra e. 17 Bîra dibêm ji we ra, kî ko padîşahîtyê Xodê weka zarokkî qabûl neke, dê li wê neqeve. 18 Û serwerkî jê pîrs kir û go: Ya! xocayê qanc, çi amel bikim ko ji ebedî ömrê ra warîs bibim. [19]²⁵¹ Îsa go jê ra: Ji mi ra çima? qanc dêjî ji Xodê madê qat yekê qanc tunne. 20²⁵² Tenbîhan dizanî?: zîna meke, qatil meke, dizî meke, derew şahadetî meke, ji bav û diyê xo ra îkram bike. 21 Wî jî go: Avanan hemîan ji piçûkîtyê xo mi girtîa. 22 Gava ko Îsa bihîsd go jê ra: yek kêmânîkî ta heye, hemî warîyetê xo bifiroş û ji faqîran ra bide, û li azüman da xazneyê ta dê bibe; û were li pey min. 23 Awî gava ko ava bihîsd bi qasawet bû; çima ko pîr zengîn bû. 24 Û Îsa gaa ko dî awî bi qasawet, go: wan ko malê wan heye, çawan! bi çetin dê ikevin li padîşahîtyê Xodê. 25 Çima ko deve ji qula derzîyê bi bihurinê, ji meruvê zengîn li padîşahîtyê Xodê ketinê pêtir e. 26 Û wan ko bihîsdin, digotibûn: Hênî kî? dikari xelas bûn. 27 Û awî go: Aw tişt ko ji meruvan bêmümkün in, li ber Xodê bi mümkün in. 28 Û Petros go: Va ha me hemî tiştê xo berdan û li pey ta hatin. 29 Û awî go ji wan ra: bîra dibêm ji we ra: qat yekê tunne ko ji boy padîşahîtyê Xodê, hişt, mal, ya bav û dê ya brêyan, ya jin ya ewlêdan. 30 Ki aw li asirê han da pîr qatan û li aw dinêyê dinê da ebedî ömrê nestîne.

²⁵⁰ Di metnê de *drdê*.

²⁵¹ Di metnê de hejmar tune ye (nişeya wergerê).

²⁵² Di metnê de *25* (nişeya wergerê).

³¹ Û dwanzdahan li balê send ji wan ra go: Va ha em li Qudsê radibin; bi destê pey- [192] xemberan ji derhaqê Qurê meruv, hemî hati nivîsan dê tamam bibin. ³² Çima ko ji tayîfan ra dê teslim bibe. ³³ Û dê bikutin û dê bikujin awî, û li roya sisêyan da dê qiyam bike.

³⁴ Û wan ji wanan qat yekê fehm nekirin, û sözê han ji wan hatibû veşartin; û hati gotan tiştan nedizanibûn.

³⁵ Û bû kî gava ko aw nêzê Îrîxayê dibobû, li ser rê da yek kor meruvkî ronişdî bû ji boy dîlencîtyê. ³⁶ Gava ko bihîsd buhartinê galabayê, pîrs kir, erki çî? e av. ³⁷ Û jê ra goni erki Îsayê Nasranî dibihurî. ³⁸ Û awî gazî kir û go: Ya! Îsa Qurê Dawûd ji mi ra merhamet bike. ³⁹ Û wan ko li pêş diçobûn, tazîr dikiribûn jê ra ko dengê xo bibre, û awî hênî pîr ya! Qurê Dawûd ji mi ra merhamet bike, diqîrabû. ⁴⁰ Nua Îsa sekinî û emr kir ko awê jê ra bînin, û gava ko nêza wî bû, pîrs kir jê û go: Çî? dixwazî tu ko ji ta ra bikim. ⁴¹ Wî jî go: Ya! Rabb dixwazim ko bibînim. ⁴² Û Îsa jî jê ra go: Bira vebin îmanê ta ta xelas kir. ⁴³ Û aw zû va dî, û li pey wî diçobû, û ji Xodê ra şikir kir, û gava ko xalq hemîan dîn; ji Xodê ra hamd dikiribûn.

SER 19²⁵³

¹ Û ket ji Îrîxayê dibihurî bû. ² Û va ha meruvkî hebû, navê wî Zaka, ko başê gümrügcîan bû, û yekê zengîn bû. ³ Û dixosdibû dîtinê, erki kî? e Îsa, hama ji qalabayê qadîr nedibobû, çima ko qamê wî kin bû. ⁴ Û bazîa li pêş da ser dara hê- [193] jîlê ko awî bibîne, çima ko ji wê dê bibihurî bû. ⁵ Gava ko li wê hat, Îsa li jor nihîst û go jê ra: Ya! Zaka, zû ke ji wê were xwarî, çima ko ji mi ra gerek e ko îro li mala ta da bibim. ⁶ Û awî zû va hati xwarî, û bi şaz bûnê awî qabûl kir. ⁷ Û gava ko hemîan dîn, gazinan dikiribûn û digotibûn: li ba günekar meruvê qonax sendinê çû. ⁸ Û Zaka hati sekinî û ji Rabb ra go: îşte nîvê warîyetê xo ji faqîran ra didim ya! Rabb; û ji kê ra ko mi xadr kir çar qatê ödemîş dikim. ⁹ Îsa go jê ra: îro li mala han da xelas îcra bû, çûnkî vî jî Qurê Îbrahîm bû. ¹⁰ Çima ko Qurê meruv hat ko wunda bûn aramîş bike û xelas bike.

¹¹ Û gava ko wan av tiştan dibihîsdibûn, temsîlkî jî go li ser nêz bûnê wî li Qudsê; ji boy wan ko wusan taxmîn dikiribûn, erki padîşahîtyê Xodê zû va dê beyan be. ¹² Go, yek asilzada meruvkî çû li welatkî dûr ji xo ra padîşahîti sendinê û

²⁵³ Di metnê de 18.

vegerandinê. ¹³ Û qulê xo gazî kir, deh mina da; û go ji wan ra: ava bişixulîn hata ko ez bêm. ¹⁴ Hama bajarîyê wî jê îkrah dikiribûn, û li pey wî da elçî şîandin û gon: Em naxwazin ko av li ser me da padîşahîti bike. ¹⁵ Û bû kî gava ko awî padîşahîti send, vegeŕîa, gazî kir aw qulan ko ji wan ra axçe dabû, ko bizane kî? çi kâr kirî. ¹⁶ Aw awlîn hati û go: Ya! efendîyê min, nimayê ta deh nimayê din qazanc kir. ¹⁷ Û go jê ra: Aferîn ya! qulê qanc, çûn li hindik da tu emîn bûy, li ser deh bajêran hokmat bike. ¹⁸ Û îkîncî hat û go: Ya! efendî nimayê ta pênc nimayê [194] din qazanc kir. ¹⁹ Û ji wî ra jî go: Tu jî li ser pênc bajêran bibe. ²⁰ Û hati başqasîkî û go: Ya! efendîyê min, va ha nimayê ta ko awî mi li dismalkî lefandibû; çima ko ez ji ta ditirsiabûm; ²¹ çima ko tu merûvkî sert î, ta nedarînê xo dihelînî; û tov nekirinê xo diçînî. ²² Û awî jê ra go: Ez ê ta ji devê ta dê hokm bikim ey! qulê yaramaz, ta dizanibû erki ez merûvkî sert im; ez dihelînim ji cîyê nedarînê xo, û ji cîyê tov nekirinê xo diçînim. ²³ Nua ta çima? axçeyê min ji sarraf ra neda, ko ez bihatima, û awî mi bi fayîzê jê tahsîl bikirana. ²⁴ Û ji xizmetkâran ra go: Bistînin jê nimayê, û awî bidin ji awî ra ko deh nimayê wî heye. ²⁵ (Û goni jê ra: Ya! efendîm deh nimayê wî heye). ²⁶ Ji we ra dibêm, ji kê ra ko heye dê jê ra bê dayin, û ji kê ra ko tunne, aw ko pê ra e jî dê bê jê sendin. ²⁷ Hama aw dijminê min, wan ko ne dixosdibûn ko ez li ser wan padîşahîti bikim li vir li ber min binin û biqujin. ²⁸ Û gava ko vanan go, li pêş çû li Qudsê rabûnê.

²⁹ Û bû kî gava ko nêza Beytfaqê û Beytannîayê, nêza aw cîyê ko, çeyeyê Zeytûnan tê gotin bû, dido ji şagirdê xo şîand û go: ³⁰ Hûn herin li ber me da bûn gund, li awî da gava ko bikevin dê bibînin cahşkî hati girêdan, ko li ser êkê qay yekê swar nebûye, vekin û binin. ³¹ Û erki hûn çima vedikin, ahwa bêjin jê ra, erki ji Rabb ra lazim e. ³² Û gava ko çûn awan ko hatin şîandin, dîn çawan ko ji wan ra, xaber da. ³³ Û gava ko cahşê vedikiribûn xo- [195] dîyê wî ji wan ra gon: Çima? vedikin cahşê han. ³⁴ Wan jî gon: Aw ji Rabb ra lazim e. ³⁵ Û awî jî Îsa ra anîn, û cilê xo avêtin li ser cahşê, û Îsayê swar kirin. ³⁶ Û gava ko awê diçobû wan cilê xo li ser radixisibûn. ³⁷ Û gava ko awî nêza berjêrê çîyeyê zeytûnê bû, cûmhûrê şagirdan hemî dest kirin bi şaz bûnê ji Xodê ra tesbîh kirinê bi bilind awazkî, ji boy aw hemû kerematan ko dîtibûn. ³⁸ Û digot[i]bûn bi navê Xodê hatox padîşah mübarek bibe, li azûmanan selamet û li pîr bilindan îzzet bibe. ³⁹ Û ji nav aw qalabayê çend farîsîan gon jê ra: Ya! xoca ji şagirdê xo ra tazîl bike. ⁴⁰ Cewab da û go: Ji we ra dibêm, erki wanan heş bibin; kevîran dê biqîrin.

41 Û gava ko nêz bû, bajêr, dî û girîa li ser wî û go: 42 Barê li av royan da ta bizanibû selametê xo, hama nua hati veşardin ji ber çahvê ta. 43 Çima ko li ser ta royan dê bên, ko dijminê ta li dorê ta dê meterîs bikşînin û ta dê hasar bikin, û ji hemî alîyê dê ta li ezîyetê bixin. 44 Û ta hemî ewledê ta ko li nav ta da ne li ardê xin, û kevîr li ser kevîr dê nehêlin li ta da; çima ko ta roya zîyaretê xo nizanibû.

47 Û ket li dacarê, dest kir deranînê jê firotoşan û kroxan. 48 Û go ji wan ra, Hatî nivîsandin, mala min mala îbadetê e, û hûn awî meşarayê dizan kirin.

47 Û her gav li nav dacar da ji wan ra hîn fikir hama baş îmaman û kâtîban û mezinê qawmê, awî helak kirinê aramîş dikiribûn. [196] 48 Û tîştî nedikaribûn dîtînê, ko çi bikin, çima ko xalq gişk lê hatibûn grêdan, ji godarî kirin ra.

SER 20

1 Û bû kî li wê royan yekê da, gava ko li dacar da qawmê hîn fikir û Încîlê waz fikir, baş îmaman û kâtîban bi tevî îxtîaran li ser gîyan. 2 Û gon jê ra, Ji me ra bêje avanan bi çi? hokmetê dikî, yaxod hokmetê han kî? ji ta ra da. 3 Cewab da û go ji wan ra: E jî ji wê tîştî pîrs dikim, û ji mi ra bêjin. 4 Tahfîlê Hanna ji azûmanan? bû, ya ji merûvan. 5 Wan jî li dilê xo da dîşûmûş dibobûn, û digotin. 6 Erki em bêjin ji azûmanan dê bêje, Lê çima we? jê ra îman neanîn, û erki em bêjin ji merûvan xalq gijê dê me kevîr bikin, çima ko li dilê xo asah danî bûn ji Hannayê, erki erki peyember e. 7 Û ceab dan, erki em nizanin ji ko e. 8 Û Îsa goji wan ra, Erki e jî vanan bi çi hokmetê dikim nabêjim.

9 Û dest kir temsîl ha ji xalqê ra gotinê: Merûvkî rezkî danî, û awî da ji baxçîan ra, û awî pîr salan li qurbetê çû. 10 Û li wextê da ji aw baxçîan ra xizmetkarkî şîand; ko ji mahsûlê rezê bidin; hama baxçîan awî bi kutandinê vala şîandin. 11 Û dîsa başqa xizmetkarkî jî şîand, wan awî jî kutan, rezîl kirin û vala şîandin. 12 Û dîsa üçüncükî şîand; wan wî jî bi brîndar kirinê li der xisdin. 13 Xodîyê rez go: Ez çi? bikim, kurê xo delalîyê bişeyînim, belkî jê şerm bikin. 14 Hama gava ko baxçîan awî dîn, li [197] nav xo da gon, Warîs vîa e, werin em wî bikujin ko mîras ji me ra bibe. 15 Û awî ji rez der xisdin û kuşdin, nua xodîyê rez ji wan ra dê çi? bike. 16 Na? kî dê bê û av baxçîan helak ke, û rez dê ji başqasîan ra bide, û gava ko awî bihîsdin gon: Hêşa. 17 Û awî li wan bi nihêrtinê go: nua av hati nivîsandinçi? e; Erki aw kevîr ko ji yapucîan redd bû, aw serê rîknê bû. 18 Her kî ko li ser aw kevîr dikeve, dê bê şikandin û li ser kî ko bikeve, dê xurd û xaş bike awî. 19 Û kâtîban û baş îmaman li wê saatê da

dixosdibûn lê dest avêtinê, hama ji xalqê tirsîan, çima ko temsîl ji derhaqê wan gotinê fehm kirin.

20 Û paşê lê pê kirinê, çend meruvêt derawîn şîandin, wan ko bi mûraîtîyê aw xo sadîq didabûn bûyayî, ko awî bi xaberkî bigirin, ji zabît û hokmatê walîyê awî teslîm bikin. 21 Pîrs kirin jê û gon: Ya! xoca em zanin ko rîasd xaber didî û hîn dikî, xatir nakî, lê li ser haqîyê rêya Xodê talîm dikî. 22 Ji me ra cayîz? e ji qayser ra xarac dayin, ya nâ. 23 Û hîlekarîyê wan bi fehm kirinê go ji wan ra. 24 Çima mi dicerebînin; Ji mi ra dînarkî nşan din, wan jî nşan dan, û go ji wan ra: Sûretê han û harf ê kî? e, cewab dan û gon: Ê qayser e. 25 Awî go ji wan ra, nua herin ê qayser ji qayse[r] ra û ê Xodê ji Xodê ra bidin. 26 Û wan awî li ber xalqê bi xaberkî girtinê qadîr nebûn, û bi tacûb manê li ser cewabê wî, heş bûn.

27 Ji sadûqîan hinikan hatin, wan ko zid disekinîbûn erki qiyamet tunne, pîrs kirin jê û gon: Ya! xoca, Mûsa ji me ra nivîsandi- [198²⁵⁴] bû, erki birey yekê, jina wî hebe, û bê weled bimire, brêy ewî bra bistîne jina wî û ji brêy xo ra zûrîyet derxe. 29 Nua haft brêyan hebûn, û yekê bi zewicandinê bê weled mir. 30 Û îkîncî jî awî send, û awî jî bê weled mir. 31 Ûçûncû jî awî send, hem kezalîk heftan jî, ewledan bi nehişdinê mirin. 32 Û paşê hemîan jinik jî mir. 33 Nua li roya qiyamet da ji wan ji kê ra dê jin bibe, çima ko haftan jî awî jin sendin. 34 Îsa cewab da ji wan ra û go: Meruvê dinêyê han dicewucin û dizewucînin. 35 Hama wan ko layîq dê bibin li aw dinêyê din ra gihîşdinê û ji mirîan qiyam sendinê; ne dizewucin û ne dizewucînin. 36 Çima ko hênî nikarin bimirin, çima ko kureî qiyametê nin. 37 Hama li naqlîyetê qiyamê mirîan Mûsa jî xaber da li tarîfê direyê nerm da gava ko dêji ji boy Rabb, Xodêyê Îbrahîmê, û Xodêyê Îshaqê, û Xodêyê Yaqûbê. 38 Û Xodê Xodêyê mirîan nin e, lê ê saxan; çima ko hemîan jî bi wî sax in. 39 Ji kâtîban hinikan cewab dan û gon: Ya! xoca ta qanc go. 40 Û hênî yekê cesaret nekiribû jê tîştî pîrs kirinê.

41 Û go ji wan ra, Mesîh çima? kure Dawûd e dêjin. 42 Û Dawûd aw bi xo dêje li nav kitêbê zabûr, Rabb ji Rabbê mi ra go: Li alîyê rîasdê mi da ronî, hata ko ez dijminê ta cîyê datîninê linga ta bikim. 44 Nua erki Dawûd awî Rabb gazî dike, Aw çawan? kure wî dibe. 45 Û li ber hemî xalqê go ji şagirdê xo ra: Saqinin ji aw kâtîban ko dixwazin bi cilê bol gerandin, û li çarşî da silavan dihubînin û li dêran da kürsiyê

²⁵⁴ Di metnê de 98.

awulîn; û li zîyafe- **[199]** tê da cîyê bilindan. ⁴⁷ Wan mala jinebîan dixun û ji boy xuyayî bûnê nimêcê dirêjan dikan wan hemî pîr dê azab bikşînin.

SER 21

¹ Ê çahv avêt li xazneyê hedîye avêtox zengîna dî. ² Ê yek faqîr jinebîkî dî ko li wê du pûl avêt. ³ Ê go: Bîra dibêm ji we ra; ko av faqîr jinebî ji hemîan pîr avêt. ⁴ Çima ko van hemîan ji wan zêde bûnan avêtin li hedîyê Xodêê, hama vîa ji neçarîtiyê xo hemî abûrê xo avêt.

⁵ Ê gava ko hinikan ji derheqê dacarê digotibûn, erki çawan kevêrê qanc û bi hedîyan hatîe xamalandin, awî go: ⁶ Av hemîan ko dibînin royan dê bîn, ko li wê çaxê kevîr dê li ser kevîr nemîne li wê ko neyê heloşandin. ⁷ Nua jê pîrs kirin û gon: Ya! xoca kînga dê bibe av, û çi? e nşan, gava ko avî dê bibe. ⁸ Wî jî go: Saqinin ko neyin xapandin, çima ko pîran dê bîn bi navê min, û bêjin, erki ez im Mesîh, û waqt nêz bû; li pey wan hûn neçin. ⁹ Hama gava ko hûn bibihên cengan û fitnetîyan, metîrsin, çima ko avanan lazim e ko awul bibin, hama xir zû va nabe. ¹⁰ Wê çaxê ji wan ra go: Mîllet li mîllet û padîşahîti li ser padîşahîti dê rabin. ¹¹ Hem dê li cî ciyan mezin zelzeleyan xalayîyan û oletan bibin; Hem tiştê bi hîybetan û ji azûmanan dê mezin nşanan bibin. ¹² Hama ji av hemî tiştan pêş destê xo dê li wê bavêjin û²⁵⁵ biqawarînin; ji civatan ra û hapsan ra dê wê teslîm bikin, û li ber walîyan û padî- **[200]** şahan dê wê bibin ji boy navê min. ¹³ Ê wîa ji we ra dê boy şahadetîyê bibe. ¹⁴ Nua li dilê xo deynin ko, ji awulê ji boy cewab dayinê talîm nebin. ¹⁵ Çima ko e ji we ra dev û îlm bidim ko jê ra qarşî dê nikarin sekinin, yaxod cewabkî bidin hemî xismê wê. ¹⁶ Dê teslîm bibin ji bav û diyê û ji brêyan, û ji xisiman û ji dostan, û ji we dê biqujin. ¹⁷ Ê ji hemîan dê îkrah bibin ji semedê navê min. ¹⁸ Hama mûkî ji ji serê we dê wunda nebe. ¹⁹ Ê canê xo we dê bi sabrê xo qazanc bikin.

²⁰ Ê kînga ko dibînin Qudsuşerîfê²⁵⁶ ji çar aliyê bi askeran hati lefandin wê çaxê bizanin ko xarabetê wî nêz bû. ²¹ Wê çaxê wan ko li Yehûdistan in, bra li ciyan birevin; û wan ko li nav wî da ni[n] bira li derve bikevin, û wan ko li dorê wî da ne, bira nekevin li hindurê²⁵⁷ wî. ²² Çima ko vê royan roya întîqamê nin, ko hemî hati nivîsandinan tekîl bibin. ²³ Ê way! li wê royan da ji avisan ra û ji çiçik dayoxan ra,

²⁵⁵ Di metnê de *û û*.

²⁵⁶ Di metnê de *Qudouşerîfê*.

²⁵⁷ Di metnê de *hinrûra* (nişeya wergêrê).

çima ko mezin sixlet dê bê ser ardê û xazab dê bê li ser av qawmê. ²⁴ Ê bi devê şûrê dê biqevîn, û ji hemî tayîfan ra dê yêşîr bibin, û Qudsuşerîf ji tayfan pêl kirin dê bibe, hata ko waqta tayfan tekmîl bibe. ²⁵ Ê li ser ro û hîv û îstêran nşanan dê bibin, û li ser ardê bi şaş bûnê tayfan dê sixlet bibin, û bahr û dalxayan dê deng bidin. ²⁶ Ji tîrsê aw belayan ko li ser dinê dê bîn û ji pê kirinê aw tiştan dilê merûvan dê bibihurin, çima ko quwwetê azûmanan dê bilerzin. ²⁷ Wê çaxê dê bibînin Kûrê merûv li ser awran, bi quwwet û bi mezin îzzet hati. ²⁸ Ê gava ko av tiş- [201] tan başlemîş dibin, li jor meze kin û serê xo bilind kin; çima ko xelasê wê nêz e.

²⁹ Ê ji wan ra temsîlkî go: Li darê hêjîlê û li hemî daran meze kin; ³⁰ Gava ko meyweyê xo nşan didin, dibînin, û ji wan nas dîkin erki havîn nêz e. ³¹ Wusan jî hûn gava ko dibînin av hemî tiştan bûn, bizanin ko padîşahîtiyê Xodê nêz e. ³² Bîra dibêmin ji we ra, erki av sîlsîleyê han dê nebihure hata ko av hemîan temam bibin. ³³ Azûman û ardê bibihure, hama kelmî mi qat dê nebihure. ³⁴ Ê hûn ji xo ra saqinin ko nebe dilê wê bi xwarin û vexwarin û²⁵⁸ bi serxoşîti û bi xemê dinê gran bibin, û xafil roya han li ser wê bigê. ³⁵ Çima ko aw li ser rûya ardê li ser hemî ronîşdoxan weka faq dê bê. ³⁶ Nua hûn hênî heşar bisekinin, her waqt duwa bikin, ko hûn layiq bibin xelas bûnê ji av hemî tiştan ko dê bibin; û li ber kûrê merûvê sekinandinê.

³⁷ Ê awî li ro li dacar da talîm dikirbû, û li şevan radibobû li çiyê zeytûn hati gotan disekinê bû. ³⁸ Ê qam gijk li sibê zû va jê ra diçobûn li dacarê ji boy xaberê wî godarî kirinê.

SER 22

¹ Ê fetîr bayramê nêz bû, ko paseh dihati gotan. ² Ê baş îmaman û kâtîban, awî çawan bikujin rêkî aramîş dikiribûn, çima ko ji qawmê ditîrsibûn. ³ Ê paşê Şeytan li nav Îsxarîhati gotan Cûdayê ket, ki aw ji hasabê dwanzdan bû. ⁴ Çû ji baş îmaman ra serdaran ra xaber kir, ko awî li destê wan [202] teslîm bike. ⁵ Wan jî şaz bûn, û jê ra axçe dayin ra söz dan. ⁶ Ê awî li ser xo send, û fursentkî aramîş dikir awî ji qawmê cîkî xalî li destê wan teslîm bike.

⁷ Ê roya fetîran hat, ko li wê royê adet hebû pasehê ser jê kirin. ⁸ Ê şîand Petrosê û Hannayê, û go: Heşin ji me ra pasehê haz[i]r bikin, ko em bixun. ⁹ Wan jî gon: Li ko? dixwazî ko em hazir bikin. ¹⁰ Ê go ji wan ra: Va ha gava ko hûn li bajêr

²⁵⁸ Di metnê de ov.

dişevin, ji we ra çarê avê helandoş meruvkî dê rast bê, li pey wî herin li aw mal li ko kî awê dê bikeve. ¹¹ Ê ji xodiyê aw malê ra bêjin, xoca dêje, otaqa mi li ko? e, ko li wê bi tevî şagirdê xo pasehê bixum. ¹² Aw jî ji we ra hati xamalandin taqkî jorinê nşan bide, û li wê hazir bikin. ¹³ Ê wan çûn çawan ko ji wan ra go din û pasehê hazir kirin.

¹⁴ Ê gava ko wext hat, li sufrê da ronîşd, û dwanzdah resûlan pê ra: ¹⁵ Ê go ji wan ra: Mi pîr hasret kşand ko pasehê hanbi we ra bixum ji ezîyet kşandinê min awul. ¹⁶ Çima ko ji we ra dibêm, ko hênî ji vî dê nexum hata ko li nava padîşahîtiyê Xodê tekml bibe. ¹⁷ Ê kâsikê send, şikir kir û go: Vîa bistînin, û li nav xo pay bikin. ¹⁸ Çima ko ji we ra dibêm, ko ji vî pê va ji mahsûlê mêwe dê nevexum, hata ko padîşahîtiyê Xodê bê. ¹⁹ Ê nan send şikir kir, şikenand û da ji wan ra, û go: Vî e tenê min ko ji boy wê hatîe dayin; vîa bikin ji boy mi zîkr kirinê. ²⁰ Wusan jî paşê şîvê kâsik jî send, û go: Av kâsikê han bi xuyna min ahda no e, ki ji boy wê tî rijandin.

²¹ Lakîn va ha destê mi teslîm kiroş bi mi ra li [203] ser sufrey han da e. ²² Bîra Kurê meruv diço, çawan ko müqader bû e; hama way! ji aw meruv ra ko bi destê wî dê bê teslîm bûn. ²³ Ê wan acaba ji van tiştê han kiroş dê kî? bibe li nav xo ra pîrs kirinê dest kirin.

²⁴ Hem dozki jî li nav wan rabû, erki ji wan kî? dê mezin hîsab bibe. ²⁵ Ê wî jî go ji wan ra: padîşahê tayîfayan wan zabtî dikan, û ji wan ra hokmat ajotoşan, qancîti kiroş tîni gotan. ²⁶ Hama hûn dê wusan nebin, lê aw ko li nav we da mezin e, birá weka piçûg bibe, û aw awulîn bûn brá weka xizmet kiroş bibe. ²⁷ Çima ko mezin kî? e, li sufrê da ronîşdoş?, yaxod xizmet kiroş; li sufrê da ronîştoş nin e?, hama ez li nav we da weka xizmet kiroşkî im. ²⁸ Ê hûn wan in ko dayîm bi mi ra li tercubeyê min disekinîbûn. ²⁹ E jî ji we ra padîşahîtkî wad dikim çawan ko bavê mi jî ji mi ra padîşahîtkî wad kir. ³⁰ Hata ko li nav padîşahîtiyê min, ji sufreyê min bixun û vexun, û li ser taxtan ronin û şeratê dwanzdah²⁵⁹ sîlsileyê Îsrayîlê bibînin. ³¹ Ê Rabb go: Ya! Şmhûn Şmhûn, va ha şeytan xosd ko wê weka genim bêjing bike. ³² Hama mi ji boy ta duwa kir, ko îmanê ta kême nebe; û tu wexta ko vegeirî brêyet xo qayîm bike. ³³ Wî jî go jê ra: Ya! Rabb ez bi ta ra, hem li hapsê û hem ji mirin ra çûndinê hazir im. ³⁴ Wî jî go jê ra: Ya Petros ji ta ra dibêm ko îro ji pêş dik ban danê sê caran tu yê dê mi înkâr bikî, erki mi nas nakî bi gotinê.

²⁵⁹ Di metnê de dsvanzdah.

35 Û go ji wan   : Gava ko mi w    and b  k s   b  t r   b  sol, qat we temani   t     k  and?;   wan gon, qat ji t        j . [204] 36 Nua j  wan    go: Lak n nua ji k     ko k s heye br  bi xo    bist ne, wusan j  t r;   ji k     ko   r tunne bra cil  xo bif   ,   ji xo         bik re. 37 Hama ji we    dib m, ko av t     han ko hati niv sandin gerek li ser min tek    bibe: erki bi b nam san h    b ;   ma ko son  av t    n ko ji derha   min b n hat. 38 Wan j  gon: Ya! Rabb va ha li vir du   r hene, w  j  go ji wan   , Bas in.

39 Û      li ser adet  xo li      zeyt nan   ,     girdan j  li d    n. 40 Û gava ko li w  gih  d, go ji wan   : duwa bikin ko li tercubey  ne evin. 41 Û aw qasa   vir av tink  ji wan qat a,   li ser   kan hat   nim c dikir,   digot: 42 Ya! Bav erki dixwaz  k     han ji min bibihur, lak n  radet   a bra bibe. 43 Û ji az manan j     melekk  hati   andin   p t dikir aw ;   li nav pir sixlet  ketin , h n  pir bi dil nim c dikir. 44 Û xoydan  w  li ser ard  hati xwar  we a mezin dilop  xuyn  b . 45 Û ji nim c       li ba   girdan hat, Û wan ji qasawet  xew da   n d . 46 Û ji wan    go:   ma? xew da di  n,   bin nim c bikin ko li tercubey  ne evin.

47 Û gava h  a ko aw xaber dida, v  a qalabak    aw C da hati gotan j  bi wan    dihatib n,   n  a   a b  ko aw      se. 48 Û   a go j    : Ya! C da K    mer v bi     say ? dest did . 49 Û wan ko li dor  w  da b n gava ko t     b n d n, gon j    : Ya Rabb bi   r em l   n? wan. 50 Û ji wan yek  li xizmetk    ba    mam  xisd,   av - [205] te xwar    goya w      . 51 Û   a cewab da   go: Hata livir berdin,   ket li goya w    sax  kir aw . 52 Û   a go ji wan    ko li ser w  hati b n ji ba    maman      serdaran      ji     aran   : Hasak  li ser diz? w      n bi   van   bi k ran. 53 Her    bi we    li nav dacar da b m, w  li ser min dest neav  n, hama saat  w  h  mat        v a e.

54 Û aw  girtin birin,   aw  an n li nav mala ba    mam ,   Petros j  d r va li pey w  di  b . 55 Û gava ko agir vexisdin li haw   da   li dor  w        n, Petros j  li nav²⁶⁰ wan da      . 56 Qarwa    d  aw  li ba agir        ; l  m  e kir   go: V a j  ji wan e; ko p     b n. 57 Hama Petros       kir   go: Ya! jin ez w  nas nakim. 58 Û pa   gav  j  ba  ak  j  aw  d ,   go: T  j  ji wan  , hama Petros go: Ya! mer v ez ji wan nin im. 59 Û qasa saat  bihur  ba  ak  ling dixisd   digot, asah v a j  p     b ,   ma ko w  j  Cel    e. 60 Go Petros: Ya! mer v ez nizamim t   i d   ,   li w  saat 

²⁶⁰ Di metn  de ndv.

hêja ko av xaber li dev da bû, dîk ban da. ⁶¹ Û Rabb vegeŕîa û li Petros nihêrt, û Petros xaberê Rabb li bîra xo anî, ko jê ra gotibû: Erki li ber ban danê dîkan, sê caran tu yê înkâr²⁶¹ bikî. ⁶² Û Petros ket li derva û pîr bi tahl grîa.

⁶³ Û aw merûvan ko Îsa girtibûn awî bi masqara kirinê di kutabûn. ⁶⁴ Û dinixaftin rûyê wî û li rûya wî dixisdibû[n], û jê pîrs dikirbûn û digotibûn: Peyxemberîti bîke li ta xisdox kî? e. ⁶⁵ Û hênî tiştan digotibûn jê ra bi dijmînan.

[206] ⁶⁶ Û gava ko sibê bû, îxtîarê qawmê, hem baş îmaman û kâtîban hatin civandin, û awî li cemaatê xo birin, û gone, erki Mesîh tu î ji me ra bêje. ⁶⁷ Go ji wan ra, erki ji we ra bêjim jî dê bawur nekin. ⁶⁸ Û erki ji we tiştê pîrs kim, hûn dê ji mi ra cewab nedin. ⁶⁹ Lê ji vê pê va Qurê merûv ji aliyê rasdê quwetê Xodê dê ronî. ⁷⁰ Û hemîan gon: Nua tu Qurê Xodê? î, û aw ji wan ra: Erki hûn dêjin ez im. ⁷¹ Û wan gon: Hênî çi? lazim e ji me ra, em bi xo ji devê wî bihîsdin.

SER 23

¹ Û hemî cemaatê wan rabûn; awî ji Pîlados ra birin. ² Û jê gilî kirinê başlamîş bûn û gon: Vîa me dî ko mîlletê azdirmîş dikir, û ji qayser ra xarac dayin nedihîşt, û ji boy xo digot, ez Mesîh û padîşah im. ³ Nua Pîlados pîrs kir jê, û go: Padîşahê Yehûdîan tu î?, wî jî cewab da jê ra û go: Ta go. ⁴ Û Pîlados ji baş îmaman ra û xalqê ra go: Ez li ser merûvê han qabahatkî nabînim. ⁵ Hama wan zor dikir û digot, erki ji Celîlê dest kirî hata li vir û li nava hemî Yehûdîstanê hîn dike û xalqê li welweleyê dixa. ⁶ Û Pîladós gava ko Celîlê bihîsd pîrs kir erki av merûv ji Celîlê? e. ⁷ Û gava ko zanî, erki ji hokmatê Hîrodîsê e, awî ji Hîrodîs ra şîand, çima ko aw jî li wê royan da li Qudsê bû.

⁸ Û Hîrodîs gava ko Îsa dî pîr şaz bû; çima ko awî ji zû va hasret dikşandibû ko awî bibîne, çima ko pîr caran ji derhaqê wî [207] pîr tiştan dibihîsdibû, û umîş dikir jê nşankî bibîne. ⁹ Û bi pîr xaberan jê pîrs dikir; hama awî qat cewabkî jê ra neda. ¹⁰ Û baş îmaman û kâtîban jî sekinîbûn, û qawî gilî dikiribûn li ser awî. ¹¹ Û Hîrodîs bi askerê xo awî bi xarab meze kirinê û bi masqara kirinê cilê beriqî jê ra da wergirtin û dîsa ji Pîlados ra şîand. ¹² Û ji aw royê Pîlados û²⁶² Hîrodîs dostê hevûdu bûn; çima ko awul dijmînê hevûdu bûn.

²⁶¹ Di metnê de *îekâr*.

²⁶² Di metnê de *wes*.

13 Nua Pîlados û serweran qawmê gazî kir û go ji wan ra. 14 Meruvê han yanî qawmê azdirmîş dike wê ji mi ra anî; û mi li ber wê teftîş kir, û ji gilî kir tiştê wê mi qabahatkî nedî li ser wî. 15 Ê ne jî Hîrodîs; çima ko awî mi jê ra şîand, nua awî ji miran ra layiq tiştê nekirîye. 16 Nua tedîb bikim awî û berdim. 17 Çima ko aw li her bayram da diwê bû ji wan ra grêdan berde. 18 Ê qalaba gişk qîran û gon: Vîa helîne û ji me ra Barabayê berde. 19 Ki aw li bajêr da bûn ji boy fitnetîyê û qawlê li hapsê danîbûn. 20 Nua Pîlados dîsa dest kir gotinê, çima ko awî dixosd ko Îsayê berde. 21 Hama wan bi qîranê digotibûn: Li xaçê biderîne awî. 22 Ê ewî üçüncü caran go ji wan ra: Lê vîa çi? kötî şîxulkî kir; ji mirinê mustahaq mi qat sûckî nedî li ser wî; nua awî tedîb bikim û berdim. 23 Hama wan bi bilind²⁶³ awazkî zor dikiribûn û dixosdibûn awî li xaçê deranînê; û wan û dengê baş îmaman pîr zor bûn. 24 Ê Pîlados razî bû ko dîlegê wan bike. 25 Nua Barabayê berda ji wan ra, aw kî ji boy fitnetîyê û qatlê li hapsê hatibû danîn; ki awî di- **[208]** xosdibûn; Ê Îsa ji xosdinê wan ra teslîm kir.

26 Ê gava ko wan diçobûnî, ji zevîyê hatoş bi nav Şimhûn yekê Kurenî girtin, û xaçê li ser wî danîn, ko li pey Îsa bîne. 27 Ê li pey wî diçobûn pîr xalq, û jinan jî, wan ko şîn fikir û digîrabûn li ser wî. 28 Îsa vegeîa û go ji wan ra: Ya! qîzê Qudsuşerîfê li ser mi megirin, lê hûn li ser xo û li ser kureî xo bigirin. 29 Va ha royan tîen ki li wa[n] royan da dê bêjin: Xozî istowan ra ji naza rahman ra û ji aw çiçikan ra ko şîr nedan. 30 Li wê çaxê dê başlamîş bibin ji çîyan ra gotinê, erki li ser me bikevin, û ji gazan ra erki me binixefin. 31 Çima ko erki ji êzingê tîrin ra ahwa dikin lê ji hişk ra dê çî bibe.

32 Başqa du xarabkâr jî pê ra anîn ji kujtin ra. 33 Va ha ko hatin li aw cîyê ko Qaf dihati gotin, li wê awî li xaçê deranîn û aw xarabkâran jî yekê li alîyê rastê wî da û yekê ji çepê wî da xaç kirin. 34 Ê Îsa go: Ya! Bav! afw bike ji vîan ra çima ko çi kirinê xo nizanin. 35 Ê wexta cilê wî pay kirinê qura avêtin; Ê xalqê sekinî tamaşa dikir, û bi wan ra baş îmaman jî masqara dikiribûn awî û digotin: Başqasîa xelas kir bira aw xo jî xelas ke, erki bijartîyê Xodê Mesîh aw e. 36 Ê askeran jî awî masqara dikiribûn li ber dihatibûn û sîrke jê ra didabûn. 37 Ê digotibûn, erki padîşahê Yehûdîan tu î xo xelas bike. 38 Ê li ser wî da “PADÎŞAHÊ YEYHÛDÎAN VÎA YE” bi Yûnanî û bi Rumanî û bi Îbranî hati nivîsandin yaftakî hebû.

²⁶³ Di metnê de *bilina*.

³⁹ Hama ji aw hati alaquadin xarabkâran [209] yekê jê ra dijmînan dikir û digot: Erki Mesîh tu î hem xo hem jî me xelas bike. ⁴⁰ Hama cewab da hevalê wî, û go: Tu ji Xodê natirsî?, çima ko tu heman li nava azab da î. ⁴¹ Û em li ser haqîyê dikşînin; çima ko em mustahaq bedelê kirinê xo distînin; hama vîa kötî tîştî nekir. ⁴² Û ji Îsa ra go: Ya! Rabb²⁶⁴ gava ko li padîşahîtiyê xo bêy mi bîra xo bîne. ⁴³ Îsa jî go jê ra: Bîra dibêm ji ta ra îro bi mi ra li cenet da dê bibî.

⁴⁴ Û wexta saat li şeşan da bû, û li ser hemî ardê tarî bû hata li saat nehan. ⁴⁵ Û ro tarî bû; û perdeyê dacarê ji ortayê qatîa. ⁴⁶ Û Îsa bi bilind sawndkî gazî kir û go: Ya! Bav ez rûhê xo li destê ta teslîm dikim; û gava ko vanan go rûhê xo teslîm kir.

⁴⁷ Û [y]üzbaşî av tîştan bi dîtîne ji Xodê ra şikir da û go: Bîra merûvê han sadiq bû. ⁴⁸ Û xalq gîjk ko hatibûn av tamaşayê dîtîne û av tîştan ko bobûn li singê xo dixisdibûn û vedigerîabûn. ⁴⁹ Û hemî nasê wî ji dûr va sekinîbûn; û aw jinan ko li pey wî hatibûn ji Celîlê, didîbûn av tîştê hanan.

⁵⁰ Û va ha yekê ko navê wî Yûsîf bû, awî müşîr bû, qanc û sadiq merûvkî. ⁵¹ Ki wî ji mîşewir û amelê wan ra reza nedabû, ji Arîmeta ji bajêrê Yehûdîan bû, ki aw jî ji padîşahîtiyê Xodê dipêbû. ⁵² Wîa li ba Pîladosê hat û gövdeyê Îsa xosd. ⁵³ Û awî ji xaçê anî xwarî û çarşefkî pêça û awî ji zinarkî hati kolan tirkî danî, ko li wê qat tu caran yekê nehatibû danîn. ⁵⁴ Ro jî îne bû, û şemûê nêz dibobû.

⁵⁵ Û li pey wî diçobûn aw jinan ko ji Celîlê [210] pê ra hatibûn, tirkê û gövdeyê wî dîn erki çawan li wê hati danîn. ⁵⁶ Û vegeŕîan û hazir kirin; bixuran û bi bîna xoş rûnan; û li roya şemû göra tenbîhê rahat bûn.

SER 24

¹ Hama li roya yek şemû li sibê da zû va hatin li tirkê, anîn aw bixuran ko hazir kirin, û başqa jinan jî bi wan ra. ² Û kevîr ji tirkê alîkî geŕ bûn dîn. ³ Û li hindur ketin, hama meyiê Îsa li wê nebû. ⁴ Û bû kî gava ko wan ji boy awî tacûb dikiribûn, va ha du merûvan bi cilê beriqî li ba wan sekinîn. ⁵ Û aw jinan bi tîrs tija bûnê, gava ko rûya xo li ardê nizm kirin; wan ji wan ra gon: Çima? saxê li nav mirîan wê aramîş dikin. ⁶ Li vir nin e aw, lê qiyam send; li bîra xo bînin çawan ko ji we ra xaber da, gava ko li Celîl da bû.

²⁶⁴ Di metnê de *Weabb*.

7 Ki digot erki *Qurê* meruv *ra* lazim e ko li destê meruvê *günekâran* bi teslîm bûn, û li *xaçê rabe*; û li *roya sisêyan* da *qiyam bistîne*. 8 *Û* li *bîra* xo *anîn xaberê wî*; 9 *Û* *vegerîan* av *hemî tiştan tarîf kirin* ji aw *yanzdahan ra* û ji *başqa hemîan ra* jî. 10 *Û* *wanan bûn* ko av *tiştan resûlan ra tarîf kirin*: *Meyremê Maqtalînî*, *Yûnanê û Meyremê dîyê Yaqûbê*. 11 *Û* *xaberê wan* li *ber wan weka boş söz xuyayî bû*, û ji *wan ra* *bawur nedikiribûn*. 12 *Hama Petros rabû* li *tirbê bazîa*; û *nizm bûnê dî* ko *çawan tenê disekinibûn*, û aw li *dilê xo* da bi *tacûb kirinê* li *ser aw bûnê çû*.

13 *Û* *va ha* ji *wan didoyan* li *rê royê* li *gund- [211]* *kî diçobûn*, ko ji *Qudsê şêst*²⁶⁵ *asbarêz dûr bû*; û *navê wî Emawus bû*. 14 *Û* *wan* li *nav* xo da li *ser* av *hemî hati qawmî tiştan xaber didabûn*. 15 *Û* *bû* *kî gava* ko *wan xaber dida* û *doz dikiribûn*; *Îsa* bi *xo jî nêz bû* û bi *wan ra diçûbû*. 16 *Û* *awî* ji *nas kirinê çahvêt wan hati bû girtin*. 17 *Û* *go* ji *wan ra, çi?* e av *xaberê wê* ji *boy awî* ko *hûn* bi *hav û* *du doz dikin gava* ko *diçun*, û *hûn melûl in jî*. 18 *Cewab* da ji *wan yekê*, ko *nava ê kê Klaotas bû*, û *go jê ra: tu tenê?* li *Qudsê mîsafîr î*, ko *nizani çi bû* li *wê* li *vî royan* da. 19 *Û* *awî* *go* ji *wan ra, Çi?*; *wan jî gon*: *Ji derhaqê Îsayê Nasranî* aw *tiştan* ko *bûn*, *ki* aw *meruvkî peyember bû*, *bi amel û* *bi xaber* bi *quwet* li *ber Xodê û qawmê*. 20 *Û* *çawan baş îmamê* me *û serwerê* me *ji mirin hokm ra teslîm kirin*, û li *xaçê deranîn*. 21 *Me umîş* *dikir* ko *aw e* ko *Îsrayîlê dê* *xelas bike*; *lakîn* li *ser* av *hemîan* av *roya sisêyan e*, ko *av tişt bûn*. 22 *Û* *hem* ji *me şend jinan jî* me *tacûb kirin*, *wan* ko *sibê* da²⁶⁶ *zû* li *tirbê çûn*. 23 *Û* *meyîtê wî nedîn*, *wan* ko *gotibûn* ji *boy wî*, *erki sax e*. 24 *Û* *ji* me *hinikan jî* li *trbê çûn*, û *wusan dîn*, *çawan* ko *aw jinan gon*, *hama gövdeyê awî nedîn*. 25 *Wî jî* *go* ji *wan ra*: *Ey!* *aqilsizan û* *bi dil granan gawur kirinê* ji *aw hemî tiştan ra* ko *peyemberan xaber dan*. 26 *Ji Mesîh ra* *wanan kşandinê* û li *saltanatê* *xo ketinê gerek nebû?*. 27 *Û* *dest kir* ji *Mûsayê* û *ji hemî peyemberan*, *tarîf dikir*, *çi* ko *ji derhaqê wî* li *kitêban* da *hatibû nivîsandin*. 28 *Û* *gava* ko *nêza* aw *qasabayê bûn*, li ko **[212]** *kî diçûbûn*, *wî jî* *wusan didabû* *xuyayî erki wî* li *hênî dûr derkê dê diçû*. 29 *Hama lê zor kirin û gon*: *Li* *ba* me *bisekine*, *çima* ko *êvar e*, *û wext dereng e*, *û* li *wê ket* li *ba* *wan sekinandi[n] ra*. 30 *Û* *bû* *kî gava* ko *awî* bi *wan ra* li *sufre da ronîşd*, *nan send mübarek kir*, *şikênand û* *da* *ji* *wan ra*. 31 *Û* *çahvêt wan hati vebûn* û *awî* *nas kirin*; *û* *awî* *ji* *wan nexuyayî bû*. 32 *Û* *ji hevûdu ra digotibûn*: *Na?* *kî dilê* me *jî* *nav* me *dişawutîbûn gava* ko li *rê* da bi *me ra* *xaber didabû*, *û* *kitêban* bi *tarîf kirinê* *ji* *me ra*.

²⁶⁵ Di metnê de *sedû şêst* (nîşeya wergêrê).

²⁶⁶ Di metnê de *srbê da*.

33 Û rabûn li wê saatê li Qudsê vegeŕian û yanzdahan û bi wan ra bûn li yek cî da hati civandin dîn. 34 Û gon: Bîra Rabb qiyam send, û ji Şimhûn ra xuyayî bû. 35 Û wan tarîf kirin çi ko li rê da bû, û erki çawan awî xo da nas kirin, li wexta nan şikênandinê.

36 Û gava ko wan xaber didabûn Îsa awî bi xo sekinand li nav wan û go ji wan ra: selam ji we ra, 37 hama wan bi bizdîan tîrsîan û taxmîn dikiribûn erki rûhkî dibînin. 38 Û go ji wan ra: çima? hûn li hav ketin û çima li dilê we da fikran tîen. 39 Mêze kin dest û linga min, erki ez aw im, bisahînin min û binêrin; çima ko gövda astîyê rûhê tunne, çima ko dibînin a min heye. 40 Û ahwa bi gotinê dest û lingê xo nşan da wan ra: 41 Û wan ji şazîtîyê bawur nedikirbûn, û li tacûb da bûn; go ji wan ra: Xwarinkê wê heye? li vir. 42 Wan jî jê ra parçakî mahsîyê qalandî û nanê hingif dan. 43 Û send û xwar li ber wan. 44 Û go ji wan ra: vanan in aw xaberan gava ko bi we ra bûm mi ji we ra go; erki lazim e ko tekml bi- [213] bibn av hemîan, ko li Tewratê Mûsa da û li nav peyşembaran û nav Zebûran ji boy mi hatin nivîsandin. 45 Wê çaxê mejîyê wan vekir ko kitêban fehmin. 46 Û go ji wan ra, Erki ahwa hatî nivîsandin û ahwa lazim e ji Mesîh ra kişandin, û li roya sisêyan da qiyam kirin. 47 Û bi navê wî toban û ji güneyan ra afitî bê waz bûn li nav hemî tayfan, ji Qudsê bi başlamîş²⁶⁷ bûnê. 48 Û hûn in şahîdê av tîştan. 49 Û va ha ez ji we ra wadê bavê xo dişeyînim, hama hûn li bajêrê Qudsê ronin hata ko ji jor quwet bistînin li ser xo. 50 Û wan hata li Beytanîayê deranî, û destê xo li jor helanî, û wan mübarek kir.

51 Û bû kî gava ko wan mübarek dikir ji wan veqatîa, û jor li azümanan radîbobû. 52 Û wan jê ra bi secde kirinê, bi mezin şazîtîyê vegeŕian li Qudsuşerîfê. 53 Û her gav li dacar da bûn, ji Xodê ra şikir didabûn û mübarek dikiribûn.

²⁶⁷ Di metnê de *başlamêş* (nîşeya wergervanê).

ÎNCÎL BI QAWLA HANNA

SER 1

¹ Ji îbtîdayê kelam hebû; û kelam li ba Xodê bû, û aw kelam Xodê bû. ² Aw ji îbtîdayê li ba Xodê bû, ³ Her tişt bi awî bû, û bê wî tiştî nebû, her çi ko bû. ⁴ Ömr bi wî bû, û ömr ronîyê meşuvan bû. ⁵ Ê rohnî li nav aw tarîyê rohnî didabû, û tarî awî fehîm nekir. ⁶ Ji Xodê meşuvî hati şîandin, ko navê e kî Hanna bû. ⁷ Wîa hat şehadet kirinê, ko ji boy aw rohnîyê şehadet bike, ko bi wî bawur bikin. ⁸ Rohnî aw nebû, lê hat ko ji boy rohnîyê şehadet bike.

⁹ Doxî rohnî aw bû ko, li dinê hatox hemî meşuvan rohnî dîkin. ¹⁰ Awî li nav dinê bû, û dinê bi wî bû, û dinê awî nas nekir. ¹¹ Ji a xoyîyan ra hat a xoyîyan awî qabûl nekirin. ¹² Hama wan ko awî qabûl kirin, ji wan ra ji navê wî ra bawur kiroşan ra, hokmet da ko kureş Xodê bibin. ¹³ Ko wan ne ji îradetê gowde û ne jî ji îradetê meşuv, îlla ji Xodê zan. ¹⁴ Ê kelam ten bû, û bi lutf û hem bi doxîrîyê tîjî, li nav me da sakîn bû, û îzzetê wî ji Bav weşî îzzetê yekikê me dî. [215]

¹⁵ Hanna şehadet kir ji boy wî, qîra û go: Vîa e ji boy e kê ko mi digot: Aw ko dê li pey min bê, ji min aw awul bobû, çima ko ji min awul bû. ¹⁶ Ê ji tîjîyê wî ji dêla lutfê me hemî jî lutf send. ¹⁷ Çima ko nomos bi destê²⁶⁸ Mûsa hati dayin, hama lutf û doxîrî bi destê Îsa el Mesîh bû. ¹⁸ Xodê qat yekê nedîtî, hama yekza Kur ko li helmêza Bav e, aw tarîf kir.

¹⁹ Ê Şehadetîyê Hanna vîa e, gava ko Yehûdîan ji Qudsê îmaman û Lewîan jê ra şîandin, ko jê pîrs kin, erki tu kî? î. ²⁰ Ê îqrar kir û înkâr nekir; îqrar kir, erki ez Mesîh nin im. ²¹ Ê jê pîrs kirin lê tu kî? î; Îlîa? î; û go, nin im; lê tu aw peyşember? î; jewab da erki nin im. ²² Nua ji me ra bêje, tu kî? î, ko em cewab bibin ji wan ra ko me şîandin, tu çi? dêjê ji boy xo. ²³ Go: Ez sawndkî me ki li çölê da Gazî dike tarîqê Xodê rast kin, çawan ko Îşaya peyşember go. ²⁴ Ê aw hati şîandin farîsîan bûn. ²⁵ Pîrs kirin jê û gon: Lê çima? tahfil dikî erki tu Mesîh nin î, û na Îlîa, û na jî aw peyşember. ²⁶ Hanna ji wan ra cewab da û go: Ez bi av we tahfil dikim hama li nav wê yekê heye, ko hûn nas nakin; ²⁷ ko aw li pey min dê bê, ko ez layiq nin im

²⁶⁸ Di metnê de *aestê*.

grêdanê solê wî vekirinê. ²⁸ Av tiştê han li Beythabrayê da bû aw alîyê dinê Cordanê; li ko kî Hanna disakinî bû û tahfîl dikir. dikir[i]bû

²⁹ Aw roya dinê Hanna dî ko Îsa jê ra tê û go: Va ha Bexê Xodê, ko güneyê dinê dihelîne. ³⁰ Vîa e ko ji boy ê kê mi digot, li pey min meruvkî tê, ko aw ji min awul bobû, çima ko ji min awul bû. ³¹ Ê mi awî nas nedikir, hama [216] ji aw sedemê ez hatim bi av tahfîl bikim, ko aw ji Îsrâîl ra aşîkâr bibe. ³² Hanna şehadet kir û go: Rûh weka kevokê mi dî, ko ji azümanan dihati xwarî. ³³ Ê mi awî nedizanibûm, hama aw aw ko mi şîand bi avê tahfîl kirinê awî go ji mi ra: li ser kî ko dibînî ko Rûh tê²⁶⁹ xwarî, û li ser wî datîni, bi Rûh el Quds tahfîl kirox aw e. ³⁴ Mi jî dî û şehadet kir erki av e Qurê Xodê.

³⁵ Li aw roya dinê dîsa Hanna sekinîbû û ji şagirdê wî diduyan. ³⁶ Ê bi mêze kirinê li ser Îsa, ko digerîa, go: Va ha Mesîh Bexê Xodê. ³⁷ Bihîsdin jê herdu şagirdan, ko xaber dida û li pey Îsa çûn. ³⁸ Gava ko Îsa vegeîa û dî wan ko li pey wî diçobûn, go ji wan ra: Çi? dixwazin; wan gon jê ra: Rabbî (ko bi tercüme bûnê xoca gotin e) li ko? dimînî.

³⁹ Ji wan ra go: Werin û bibînin; hatin û dîn li aw der ki aw disekinî bû; û li aw royan da li ba wî sekinîn, û li wexta deh saatan bû. ⁴⁰ Ji aw herduyan yekê Petros hati gotan brêy Şimhûn Andarîa bû, ko ji Hanna bihîsdin û li pey wî çûn. ⁴¹ Îsa awul brêy xo Şimhûnê dî, û jê ra go: Mesîhê (ko bi tercüme bûnê Xrîsdos tê gotan) me dî. ⁴² Wîa awî bir ba Îsa²⁷⁰, Îsa lê bi nihêrtinê, go: Qurê Yûnanê Şimhûn tu? dê Kefas bêy gotin, ko Petros tercüme dibe. ⁴³ Li aw roya dinê Îsa li Celîlê rabûnê xosd; û Fîlîbosê dî, û jê ra go: Li pey min were. ⁴⁴ Ê Fîlîbos ji nav Betsayîtayê bû ji bajêrê²⁷¹ Andîrayê û Petrosê. ⁴⁵ Fîlîbos Natanayelê dibîne û jê ra dibê, aw ji boy ê kê ko Mûsa li nav tawratê nivîsand û peyemberan jî, awî me dî; yanî Nasranî [217] Îsa, Qurê Yûsîf. ⁴⁶ Natanayel go jê ra: Ji Nasratê²⁷² tiştê qanc qabîl? e ko be, go jê ra Fîlîbos, Wêre û bibîne. ⁴⁷ Îsa gava ko dî Natanayel li alîyê wî dihat, go ji boy wî; Va ha doxîrî Îsrayîlkî ko li nav wî hille tunne. ⁴⁸ Natanyel go jê ra: tu mi ji? ko nas dikî, cewab da Îsa, û go jê ra: Fîlîbos hêja ta gazî nekir gava ko tu li bin dara hêjîl da bûy, mi ta dî. ⁴⁹ Cewab da jê ra Natanayal û go: Ya xoca tu î Qurê Xodê; tu î padîşahê Îsrayîlê. ⁵⁰ Îsa cewab da jê ra û go: Çünkî mi ta ra go, erki mi ta li bin darê hêjîlê dî; bawur dikî; ji

²⁶⁹ Di metnê de *kê*.

²⁷⁰ Di metnê de *Îsk*.

²⁷¹ Di metnê de *bdjêrê*.

²⁷² Di metnê de *Nasratê* (nişeya wergêrê).

vîa hênî pîr mezin tîştan dê bibînî. ⁵¹ Û go jê ra: Bîra bîra dibê m ji we ra, ji vê pê va dê bibînin azûmanan hati vebûn û melekê Xodê ko radîbin û tîni xwar li ser Kûrê Meruv.

SER 2

¹ Û paşê sê royan dawetkî hebû li Kana li bajêrkî Celîlê da, û dîya Îsa jî li wê bû. ² Nua hem Îsa hem jî şagirdê wî jî hatin gazî kirin li dawetê. ³ Û gava ko mey kêm bû, dîyê Îsayê hjê ra go: meyê wan tunne. ⁴ Îsa go jê ra: Ya!²⁷³ jin çi? îşê ta bi mi ra heye; wexta min hêja negihîşdî. ⁵ Dîya wî ji xizmetcîan ra go: Ji we ra her çi ko dêje bikin. ⁶ Li wê haft denê kevîrin²⁷⁴ hebûn li göre adetê paqij bûnê Yehûdîan; ko her yekê wan dido ya sisê mar tîşt disend. ⁷ Îsa go ji wan ra: Tîji bikin denê hana bi av û wan tîji bikin hata devê wan. ⁸ Û go ji wan ra, nua bistînin û ji qadehkâr başî ra bibin, wan jî anîn. **[218]** ⁹ Û qadehkâr başî gava ko tamê mey bûn avê send û nedizanîbû ji ko bûnê wî (hama xizmetcîan dizanibûn ko avê tîji kirin) qadehkâr başî zavayê gazî kir. ¹⁰ Û go: Her kes meyê qanc awul li ortayê tîne, û kînga ko bi mey dibin, wê çaxê kotîyêl ta meyê qanc hata nua veşart. ¹¹ Îsa li bajêrê Celîlê Gana da îbtîdayê mucûzatan vîa kir, û îzzetê xo beyan kir, û şagirdê wî jê ra îman anîn.

¹² Û ji vê pê va Îsa çû li Kafarnayûmê; awî û dîyê wî, û brêyê wî, û şagirdê wî, û li wê çend royan sekinin. ¹³ Û Pasehê Yehûdîan²⁷⁵ nêz bû; û Îsa Qudsê rabû. ¹⁴ Û dî ko li pey dacar noginan û bizinan û kevokan difrotibûn, û sarrafan jî ko ronîşdîbûn. ¹⁵ Û ji benê qamîşkî çêkir û hemîan ji dacarê der xisd, bizinan û noginan; û axçayê sarrafan bela kir; û dezgâhan quluband. ¹⁶ Û wan ko kevokan difrotibûn, go ji wan ra: Ji vê helînin vanan; û mala bavê min mala alîşverîşê mekin. ¹⁷ Paşê şagirdê wî bîra xo anîn, ko hatî nivîsandî, xayretê mala ta mi xwar. ¹⁸ Cewab dan Yehûdîan û gon jê ra: Ji boy vanan kirinê ji me ra çi? nşan didî. ¹⁹ Cewab da Îsa û go ji wan ra: Heloşînin dacarê han li sê royan da ez ê çêkim awî. ²⁰ Yehûdîan jê ra gon: dacarê han li çil û şeş salan hati çêbûn; û tu li sê? royan da dê çêkî awî. ²¹ Hama aw ji boy dacarê gowday xo digot. ²² Nua gava ko ji mirîan rabû, şagirdê wî bîra xo anîn, erki vîa bûe ko awî go, û îman anîn ji kitêb ra û ji kelamê Îsa ra.

²⁷³ Di metnê de *Ya?*.

²⁷⁴ Di metnê de *qevirin*.

²⁷⁵ Di metnê de *Yehûdîsan*.

23 Û li paseh da, li bayram da, gava ko awî li Qudsê bû; pîran îman anîn ji navê wî ra, [219] çima ko aw mucûzat ko aw fikir, wan didîtibûn. 24 Hama Îsa aw xo ji wan ra bawur nedikir, çima ko aw dizanîbû her kes. 25 Û lazim nebû, erki ji boy meruv şehadet bike, çima ko aw dizanî erki çi heye li hindurê meruv.

SER 3

1 Û li nav farîsîan meruvkî hebû ko navê e kê Nîkotîmos bû, ko reysê Yehûdîan bû. 2 Vîa li şev da li ba wî hat, û go jê ra: Ya! xoca em dizanin ko tu ji Xodê hatî; çima ko yekê nedikârî bike aw keremetan ko tu dikî, erki Xodê pê ra nebe. 3 Cewab da Îsa, û go jê ra: Bîra bîra dibêm ji ta ra: erki yekê ji jor da neze, nikare padîşahîtiyê²⁷⁶ Xodê dîtînê. 4 Nîkotîmos go jê ra: Çawan dikârî meruvkî bize, aw ko pîr e, qabîl e? ko carkî jî dîsa li rahma dîya xo bikeve, û bize. 5 Cewab da Îsa û go: Bîra bîra dibêm ji ta ra, erki yekê ji av û ji Rûh neze, nikârî li padîşahîtiyê Xodê ketînê. 6 Çima ko ji ten hati za ten e û ji Rûh hati za rûh e. 7 Tu tacûb meke ko mi ji ta ra go lazim e ko ji we ra dîsa ji jor zayin. 8 Çima ko ba li ko kî bixwaze pif dike, û dengê wî dibihîsî, hama nizanî ji ko tê û li ko diçû; ahwa nin [e] aw hemîan ko ji Rûh dizin. 9 Cewab da Nîkotîmos û go jê ra: Av çawan? dikârî bize. 10 Cewab da Îsa û go jê ra: Tu xocayê Îsrayîl î, tiştê hanan nizanî?. 11 Bîra dibêm ji we ra, erki çi ko em dizanin xaber didin, û çi ko me dî em şehadet dîkin, û şehade- [220] tiyê me hûn qabûl nekin. 12 Nua erki ji we ra dünyawî tiştan xaber da, hûn bawur nakin, lê çawan? dê bawur bikin, erki ko azmanî tiştan bêjim. 13 Û li azümanê qat yekê ranebûe, îlla ji azümanê hati xwar ko aw li azüman da e. 14 Û çawan ko Mûsa li çölê da mahrê bilind kir, wusan jî lazim²⁷⁷ e ko Qurê meruv bilind bibe. 15 Ki her kî ko jê ra îman bîni, wunda nebe, îlla ji ebedî ömr ra malîk bibe. 16 Çima ko Xodê wusan huband dinê, hata ko yekza Qurê xo da, Ki her kî ko jê ra îman bîne wunda nebe, lê ji ebedî hayat ra malîk bibe. 17 Çima ko Xodê Qurê xo neşîand li dinê ko dinê hökm bike, lê, ko dinê bi wî xelas bibe. 18 Aw ko jê ra îman tene, hökm nebe, û aw ko îman neyne jê ra, aw ji a nwa da hökm bûe; çima ko ji nava yekza Qurê Xodê ra îman neanî. 19 Û hökm vîa e, ko rohnî hat li dinê; û meruvan tarî ji rohnî pêtir hebandin; çima ko amelê wan yaramaz bûn. 20 Çima ko her kî ko kötî amel dişixule aw ji rohnî îkrah dike; û li ba

²⁷⁶ Di metnê de *pddîşahîtiyê*.

²⁷⁷ Di metnê de *ldzim*.

rohnîyê nayê ko amelê wî zemm nebin. ²¹ Hama aw ko haqî dişixule, li ba rohnî tê hata ko amelê wî aşîkâr bibin ko bi Xodê hati şixulandin.

²² Ji van pê va, Îsa bi tevlî şagirdê xo hati li dîarê Yehûdîstanê û li wê digerrîa bi wan ra, û tahfil dikir. ²³ Hanna jî li nav Aynonê li nêza Salîmê tahfil dikir, çima ko li wê pîr av hebû û dihatibûn û tahfil dibobû. ²⁴ Çima ko Hanna hêja li zindanê nehatibû danîn. ²⁵ Nua bi şagirdê Hanna li nav Yehûdîan ji xusûsê paqij bûnê dozki bû. ²⁶ Hatin ji Hanna ra û gon jê ra: Ya xoca! [221] aw ko bi ta ra li aw alîyê dinê Hortanê bû, ji boy ê kê ko ta şehadet kir; va ha awî tahfil dike, û hemîan jê ra diçun. ²⁷ Cewab da Hanna û go: Meruv ji xo tiştê nikari kirinê, erki ji jor ji azümanan ji wî ra neyê dayin. ²⁸ Hûn bi xo ji boy min şehadet dikin, ko mi ji we ra go: Erki Mesîh ez nin im, îlla ko li ber wî hatim şîandin. ²⁹ Ji kê ra ko bûk heye, zava ew e; hama dostê zava, ko disekine û awî godarî dike, bi şazîtiyê şaz dibe ji boy dengê zava; nua şazîtiyê min tîja bûe. ³⁰ Hênî lazim e ko aw mezin bibe, û ez piçûk bibim. ³¹ Aw ko ji jor tê, ji hemîan jor e, û aw ko ji aw dinê e, dünyawî e, û ji dinê xaber dide. ³² Aw ko ji azümanan tê çî ko dî, û çî ko bihîsd, şehadet dike, û şehadetiyê wî yekê qabûl neke. ³³ Aw ko şehadetiyê wî qabûl kir; hökm kir ko Xodê doxrî e. ³⁴ Çima ko aw ko Xodê şîand, xaberê Xodê xaber dide; çima ko Xodê jê ra bi ölçiyê Rûhê nade. ³⁵ Bav Qurê dihebîne, û her tişt da li destê wî. ³⁶ Aw ko ji Qurê ra îman tîne, ebedî hayatê qabûl dike, û aw ko ji Qurê ra îtaat nake, awî hayat nabîne, lê xazabê Xodê li ser wî disekine.

SER 4

¹ Gava ko Îsa fehm kir ko farîsîan²⁷⁸ bihîsdin, erki Îsa ji Hannayê pêtir şagirdan peyda dike û tahfil dike. ² (Faraza Îsa aw bi xo tahfil nedikir lê şagirdê wî.) ³ Yehûdîstanê hişt dîsa li Celîlê hat. ⁴ Ê awî ji Samarîayê dê bibihurîa. ⁵ Hat li bajêrkî Sama- [222] rîyê, ko navê ê kê Sûkar bû, nêza av gundê, aw ko Yaqûb ji Qurê xo ji Yûsîf ra dabû. ⁶ Ê li wê ji Yaqûb ra bîr hebû Îsa jî bi rê va bi rahat bûnê li ser aw bîrê ronişt, saat jî wexta şeşan bû. ⁷ Ji Samarîayê jinikkî hat av kişandin ra, Îsa go jê ra: ⁸ Ji mi ra av bide vexwarin ra, çima ko şagirdê wî li bajêr çobûn ko taam bikin. ⁹ Jinikê Samarîyê go jê ra: Tu kî Yehûdî î, çawan? ji min vexwarin dixwazî ji jinkî Samarîyê; çima ko Yehûdîan qat bi Samîrîan ra tev nabin. ¹⁰ Îsa cewab da jê ra û go:

²⁷⁸ Di metnê de *fdrîsîan*.

Erki tu bexşîşê Xodê û aw kî e ko ji ta av vexwarinê dixwaze bizanibana, tu ji wî dê dîleg bikirana, û aw ji ta ra dê abuhayat bidana. ¹¹ Jinik go jê ra: Ya! Rabb, av kşandin ra firaqê ta jî tunne, û bîrê han kûr e, nua ji ko dê bibe abuhayatê ta. ¹² Meger tu ji bavê me Yaqûb? yekê mezin î, ko bîrê han ji me ra da, û awî ji vir vexwar û weledê wî û haywanê wî jî. ¹³ Cewab da jê ra Îsa û go: Her kî ko ji av avê vexo, dîsa tî dibe, hama kî ko vexo ji aw avê ko, ez didim jê ra, Ebedî tî nabe. ¹⁴ Lê awavê, ko ezê dê bidim jê ra, dê bibe jê ra kanîkî avê, ko li nav ebedî hayat da davêje. ¹⁵ Jinik go jê ra: Ya! Rabb bide ji mîra ji av avê, ko tî nebim û livir neyê av kşandinê, ¹⁶ Îsa go jê ra: Hare mîrê xo gazî ke û livir wêre. ¹⁷ Jinik cewab da jê ra û go: Mîrê mi tunne, Îsa go jê ra: Ta qanc go, erki mîrê mi tunne. ¹⁸ Çima ko ta pênc mîran gohrandî, aw ko a nua ji ta ra heye mîrê ta nin e; avî ta rasd go: ¹⁹ Go jê ra jinik: Ya! Rabb ji mi ra xuyaye ko [223] tu peyember î. ²⁰ Ejdadê me me li çîyayê han da secde kirin hûn dêjin, erki tenê Qudsuşerîf e aw cî, ko li wê lazim e secde kirin. ²¹ Îsa go jê ra: Ya jin ji mi ra îman bîne, ko zeman dê bê, ji Bav ra ne, li çîyê han da û ne jî li Qudsuşerîf da dê secde bikin. ²² Hûn secde dikin ji yekê ra ko nas nakin, em ji awî ra secde dikin, ko awî em nas dikin; çima ko xelas ji Yehûdîan e. ²³ Lakîn zeman dê bê, û hala nua jî e, ko ji Bav ra doxrî secde kroşan bi rûh û bi haqîyê dê secde bikin, çima ko Bav jî ahwa secde kroşan dixwaze. ²⁴ Xodê rûh e, û jê ra secde kroşan ra jî lazim e ko bi rûh û bi haqîyê secde bikin. ²⁵ Jinik go jê ra: Zanim ko Xrîstos hati gotan Mesîh dê bê, gava ko bê, awî dê bêje ji me ra hemî tiştan. ²⁶ Îsa go jê ra: Ez aw im, ko bi ta ra xaber didim. ²⁷ Ê li ser vî sözê şagirdê wî hatin, û mat man ko bi aw jinik ra xaber didabû; hama ji wan yekê jî nego, erki çi? dixwaze yaxod çi xaber didî pê ra. ²⁸ Jinik hişt cerê, û çû li bajêr, û go ji meruvan ra. ²⁹ Wêrin bibînin meruvkî, ko go ji mi ra, her çi ko mi şîxulê; acaba vî e Mesîh. ³⁰ Ji bajêr rabûn jê ra dihatibûn.

³¹ Ê hêja wan nehat, şagirdan jê ra lava dikiribûn û digotibûn: Ya! xoca bixo. ³² Awî go ji wan ra: Taamê min ê xwarinê heye ko hûn nizanin. ³³ Şagirdan ji hev û du ra digotibûn acaba yekê jê ra tiştê xwarinê anî?. ³⁴ Îsa go ji wan ra: Taamê min aw e ko îradetê mi şîandoxê bikim. ³⁵ Ê şîxulê wî tamam bikim; Na? ko hûn dêjin, hêja çar meh heye ko hasadê bê; va ha ez ji we ra [224] dibêm: Çahvê xo helînin li zevîan binihêrin, ko sipî bûne, û ji çîrandin ra gîyane. ³⁶ Ê çîrandox ücret distîne, û ji ebedî hayata mahsûl dicivîne; ko tov kroş û çîrandox şaz bin. ³⁷ Çima ko doxrî söz li vî da e tov kiroş başqa; û çîrandox başqa e. ³⁸ Mi wê şîand çîrandinê aw ko wê emeg nekişand, başqasîan çalişmîş bûn û hûn li emegê wan ketin.

³⁹ Nua ji aw bajêrê Samarîan pîran jê ra îman anîn, ji boy söza aw jinikê ko şehadet kir, erki mi çi ko kiribû hemî jî ji mi ra go. ⁴⁰ Gava ko Samarîan jê ra hatin, lava dikiribûn jê ra ko li ba wan bimîne; du ro li wê sekinî. ⁴¹ Ê hênî pîran jê ra îman anîn, ji boy söza wî. ⁴² Ê digotibûn ji jinik ra, Ji vê pê va na ji boy söza ta em îman tînin; çima ko em bi xo bihîsdin û dizanin, ko asah xelas kiroxê dinê Mesîh vîa e.

⁴³ Ê paşê du royan ji wê rabû çu li Celîlê. ⁴⁴ Çima ko Îsa bi xo şehadet kir, erki ji ê peyğember kî ra li nav welatê xo da îtîbar heye. ⁴⁵ Hama gava ko awî li Celîlê hat, celîlian awî qabûl kirin, çima ko dîtibûn aw hemî keremetan, ki awî kir li Qudsê li wexta bayramê; çima ko wan jî hatibûn li aw bayramê.

⁴⁶ Dîsa hat li bajêrê Celîlê li Ganayê, li ko kî av mey kiribû, û li wê ji aslê padîşahê yekê hebû ko kure wî li nav Kafarnayûm da naxoş bû. ⁴⁷ Gava ko awê bihîsd Îsa erki ji Yehûdîstan li Celîlê hatî, hati jê ra û lava fikir, ko bê û kure wî sax ke, çima ko li nêza mirinê bû. ⁴⁸ Îsa go jê ra: Erki hûn keremetan û mûcûzatan nabînin îman naynin. [225] ⁴⁹ Ji aslê padîşahê meşuv go jê ra: Ya! Rabb wêre çi qas ko kure min nemirî. ⁵⁰ Îsa go jê ra: Hare kure ta sax e, meşuv jî bawur kir ji aw xaber ra ko Îsa go jê ra, û çû. ⁵¹ Ê gava ko diçobû li pêş wî rabûn xizmetkârê wî, mûjde dan û gon, erki kure wî sax e. ⁵² Nua ji wan wexta sax²⁷⁹ bûnê pîrs kir, û jê ra gon: Ta awî do saat li haftan berda. ⁵³ Zanî bavê wî erki aw saat bû, ko Îsa jê ra go: ⁵⁴ Erki kure ta sax e, û îman anî awî û mala wî jî gişk; Îsa Yehûdîstanê gava ko hat li Celîlê, dîsa vîa îkîncî keremet kir.

SER 5

¹ Ji vê pê va, aydê Yehûdîan bû Îsa li Qudsê rabû. ² Ê li Qudsê, li deriyê bizinan da bi Îbranîyê Bethest hati gotan hawuzkî hebû; ki pênc hayatê wî hebû. ³ Ko li wan da pîr naxoşan dihatibûn vezelandin; koran; topalan, hişk bûyan, ko ji tev bûnê avê dipêbûn, ⁴ Çima ko gava²⁸⁰ melekê Xodê dihatibû xwarî û avê tev didabû; nua paşê tev bûnê avê, kî ko awul li avê diketibû her çi naxoşî bibana, sax dibobû. ⁵ Ê li wê meşuvkî hebû ko ji sî û haşt salan pêş naxoş bû. ⁶ Îsa gava ko di awî, ko ketî; hatibû danî, û zanî ko ji pîr zeman e; go jê ra: Dixwazî? sax bûn. ⁷ Naxoş cewab da jê ra: Ya Rabb²⁸¹ xodîyê min tunne ko wexta tev bûnê avê, mi li hawuzê bavêje, lê

²⁷⁹ Di metnê de *weax*.

²⁸⁰ Di metnê de *gava gava*.

²⁸¹ Di metnê de *Weabb* (nîşeya wergêrê).

wexta ko ez giran tevdigerim, ji min pêş başqasîkî dikeve. ⁸ Îsa go jê ra: Rabe lihêfa [226] xo helîne û hêre. ⁹ Ê zû va sax bû aw meruv; û lihêfa xo helanî, û gerîa, û aw ro şemû bû. ¹⁰ Nua Yehûdîan ji aw sax bûn meruv ra gon, roya şemû e ji ta ra cayîz nin e ko lihêfa xo helînî. ¹¹ Cewab da ji wan ra û go: Aw ko mi sax kir ji mi ra go: Lihêfa xo helîne û hêre. ¹² Nua jê pîrs kirin, aw kî e ko ji ta ra go, lihêfa xo helîne û hêre. ¹³ Lakîn aw şîfa sendox meruv, nedizanibû erki aw kî e, çima ko Îsa ji aw cîyê xo dabû alî ji boy qalabayê. ¹⁴ Ji vê pê va Îsa awî li nav dacar da dibîne û jê ra dêje: Va ha tu sax bûy hênî güne meke; ko hênî beter tiştî ra oxramîş nebî. ¹⁵ Ê meruv û ji Yehûdîan ra go: Erki aw Îsa bû, ko mi sax kir. ¹⁶ Ê ji boy vîa Yehûdîan Îsa bi diqawurandibûn; ko aw tişt awî li roya şemûê dîkir. ¹⁷ Hama Îsa cewab da ji wan ra û go: Bavê min hata a nwa dişixule, e jî dişixulim. ¹⁸ Ji boy vîa hênî pîr Yehûdîan awî kuşdinê aramîş dîkiribûn, çima ko na kî tenê roya şemûyan nedipêbû, lê Xodê jî bavê min e digotibû, wusan ko, awî xo beraberê Allah dîkir[i]bû. ¹⁹ Nua Îsa cewab da ji wan ra û go: Bîra bîra dibêm ji we ra, Qur aw ji xo tiştî jî nedikaribû kirinê, lê tenê çî ko dibîne, ko Bav dike, çima ko çî ko awî diki, hama aw tişt, Qur jî dike weka wî. ²⁰ Çima ko Bav Qurê dihabîne û her tişt nşan dide jê ra, çî ko awî diki; û ji van hênî pîr mezin şixulan dê nşanê wî bide, ko li wî hûn acêb bimînin. ²¹ Çima ko çawan ko Bav mirîan radixe, û sax dike wusan jî [227] Qur, kîjan ko dixwaze sax dike. ²² Çima ko Bav qat keskî hökm neke, îlla hemî hökm ji Qur ra dayê. ²³ Ko hemîan îzzet bikin ji Qur ra,²⁸² çawan ko ji Bav ra dîkin; aw ko ji Qur ra îzzet neke, ji awê şîandox Bav ra neke. ²⁴ Bîra bîra dibêm ji we ra, erki aw ko kelamê min godarî dike, û îman tîne ji mi şîandox ra, ebedî hayatê qabûl dike, û li bin hökmê naqeve, lê ji mirinê li ömrê bihurîe. ²⁵ Bîra bîra dibêm ji we ra, zeman dê bê, û nua jî e, ko wê çaxê mirîan dê dengê Qurê Xodê bibihîsin; û wan ko dibihîsin, dê bijîn. ²⁶ Çima ko çawan ko ji Bav ra li xo da ömrê wî heye, wusan jî da ji Qurê ra ko li xo da ömrê wî bibe. ²⁷ Ê²⁸³ jê ra hökmat da ko şerîat bike; çûnkî aw Qurê meruv e. ²⁸ Li ser vîa acêb mebin, çima ko wext dê bê ko aw²⁸⁴ hemîan ko li tîrbê da ne dê dengê wî bibihîsin. ²⁹ Ê li der dê bîn, wan ko xayr amel kirine li qiyametê hayatê, û wan ko kötî amel kirin li qiyametê azabê dê hevin. ³⁰ Ez ji xo tiştî nikarim kirinê, lê çawan ko dibihîsim, wusan hökm dîkim, û şeratê min doxî e, çima ko ez îradetê xo aramîş nakim, lê mi şîandox

²⁸² Di metnê de *kurra* (nişeya wergêrê).

²⁸³ Di metnê de *We* (nişeya wergêrê).

²⁸⁴ Di metnê de *dw*.

îradetê Bav. ³¹ Erki ez ji boy xo şehadetî bikim, şehadetîyê²⁸⁵ min doxrî nin e. ³² Başqasî e ko ji boy min şehadet dike, û ez zanim ko aw şehadetî kî ji der haqê mi kir doxrî e. ³³ Wê ji Hanna ra şîand û ji haqî ra şehadet kir. ³⁴ Hama ez na kî ji merûvan şehadet distînim, lê vîa dibêm ko hûn xelas bibin. ³⁵ Awî çirakî bû ko dişawutîbû û rohnî didabû û hûn xosdin wextkî bi rohnîyê wî şaz bûn. ³⁶ Hama a min ji şehadetîyê Hanna hênî mezin şe- [228] hadetî heye, aw şixulan ko Bav ji mi ra da ko wan tekmlî bikim; aw amelên ko dişixulim, wan ji boy min şehadet dikan erki Bav mi şîand. ³⁷ Û Bav ko mi şîand, awî ji boy min şehadet kir, hûn qa tu car dengê wî bihisdin, û şeklê wî we na dîtin. ³⁸ Na jî kalamê wî li nav we da sakîn bûye; çima ko hûn îman neyinin ji awî ra ko aw şîand. ³⁹ Kitêban tefîş bikin, çima ko hûn bi wan hîsab dikan ebedî ömrê we hebûn; û asil wan in ko ji boy min şehadetê dikan. ⁴⁰ Û hûn naxwazin ji mîra hatin, ki ebedî hayatê we bibe. ⁴¹ Az ji merûvan izzet nasdînim. ⁴² Hama ez we dizanim ko muhabetê Xodê li nav we da tunne. ⁴³ Ez bi navê bavê xo hatim, û hûn mi qabûl nakin, erki başqa yekê bi navê xo bê, awî qabûl dikan. ⁴⁴ Hûn çawan dikarin îman bînin, ko ji hev û du îzzet distînin û aw îzzet ko ji yek Xodê e, aramîş nakin. ⁴⁵ Taxmîn makin ko ji Bav ra ez ji we ra gilî dikim, heye yekê ko li ser we gilî bike, Mûsa, li awî ko we umud kirî. ⁴⁶ Çima ko erki hûn ji Mûsa ra îman bianîyana, ji mi ra jî dê îman bianîyabûn, çima ko aw ji boy min nivîsand. ⁴⁷ Çûnkî erki ji hati nivîsandinê wî ra hûn îman naynin, ji kalamê mi ra çawan? dê îman bînin.

SER 6

¹ Ji van pê va Îsa li aw alîyê dinê bahrê Dîberîayê Celîlê çû. ² Û li pey wî pîr xalq diçobûn; çima ko didîtibûn aw keremetan ko li ser naxoşan dikan. ³ Îsa li çîyêkî rabû, û li rê ronişd bi tevî şagirdê xo; ⁴ Û paseh [229] bayramê Yehûdîan nêz bû. ⁵ Û Îsa gava ko çahvê xo helanî, û dî ko pîr xalq jê ra dihatibûn, go ji Fîlîbbos ra: Ji? ko em nan bikişin ko avanan bixun. ⁶ Wîa digoti ji boy awî çarabandinê; hama awî dizanibû çî dê bike. ⁷ Fîlîbbos cewab da jê ra, du sed dînar nan ji wan ra bes nin e; erki ji wan her yekê hinikî jî bistîne. ⁸ Ji şagirdê wî yekê Andriâs brêy Şimhûn Petrosê, go jê ra: ⁹ Li vir zarûkkî piçûk heye ko pênc nanê cehê wî û du mahsîyê wî heye, lakîn av ji av qas merûvan ra dê çî? bibe. ¹⁰ Îsa go, bidin ronişdin av merûvan; û li wê pîr gîya hebû; û merûvan ronişdin bi hîsab qasa pênc hazaran. ¹¹ Û Îsa nan

²⁸⁵ Di metnê de *şehdetîyê*.

send û şikir û ji aw ronişdoxan ra pay kir, wusan jî ji mahsîan çi qas xosdin. ¹² Û gava ko têr bûn go ji şagirdan ra: Zêde bûn kerîan bicivînin; hata ko tiştê wunda nebe. ¹³ Civandin, ji xwaroxan zêde bûnê, ji kerîyê pênc nanê cehan, dwanzdah qufan tîja kirin. ¹⁴ Nua av merûvan gava ko av alametani dîn, digotibûn, erki asah aw peyember ko dê li dinê bê vîa e. ¹⁵ Nua gava ko Îsa fehmi kir ko dê bên awî bibikşînin bikin, ko awî padîşah bikin; dîsa aw tenê çû li çiyê. ¹⁶ Û gava ko êvar bû, şagirdê wî çûnî²⁸⁶ xwarî li kenarê bahrê. ¹⁷ Û wan li gemîyê bi ketinê li alîyê dinê bahrê li Kafarnayûm diçobûn; û hênî tarîbû, û Îsa hêja ji wan ra nehatibû. ¹⁸ Bahr jî ji pîr pîf kirinê bayê diwerimîbû. ¹⁹ Nua wan bîst û pênc yaxod qasî sî asbarêzan ko li pêş çûn; dîn ko Îsa li ser bahrê dihatibû nêza gemîyê bobû, pîr bizdian. ²⁰ Hama awî [230] go ji wan ra: Ez im, nêtirsin. ²¹ Nua xosdin ko awî li gemîyê bistînin, û zû va gemî gîya li aw welatê li ko kî wan dê biçuanan.

²² Aw roya dinê, ko xalq li alîyê dinê bahrê bûn dîn ko ji aw yekê pêtir gemî li wê tunne bû, li awê ko şagirdê Îsa ketin, û ko Îsa bi şagirdan li gemîyê neketibû, lê tenê şagirdê wî çû. ²³ Hama ji Vîberîayê başqa gemîan hatin nêza aw ciyê, li ko kî nan xwarin. ²⁴ Nua gava ko xalqê dîn ne Îsa hem ne şagirdê wî li wê ne, wan jî ketin li gemîyê, Îsayê bi aramîş kirinê, hatin li Kafarnayûmê. ²⁵ Û gava ko awî li alîyê dinê bahrê dîn, gon jê ra: Ya! xoca li vir tu çi? çax hatîy. ²⁶ Îsa ji wan ra cewab da û go: Bîra bîra dibêm ji we ra hûn mi aramîş dîkin, na ko ji boy aw keremetan ko hûn dîn, lê ji boy awî ko hûn ji nanê xwarin û û têr bûn. ²⁷ Ji boy aw helak bûn taamê na, îlla ji boy li ebedî hayat da mayox taamê bişixulin; awî ko ji we ra dê Kûrê meruv dide, çima ko Allah Bav awî hokm kir. ²⁸ Nua jê ra gon: Em çi? bikin, ko amelê Xodê bişixulin. ²⁹ Cewab da Îsa û go ji wan ra: Vîa e şixulê Xodê ko ji şîandoxê wî ra îman bînin. ³⁰ Gon jê ra: Çi? nşan dikî, ko em bibînin û îman bînin; çi? dişixulî. ³¹ Ejdadê me li çolê da mananayê xwarin çawan ko hatî nivîsandin, ji azümanan nan da ji wan ra ko bixun. ³² Îsa go ji wan ra: Bîra bîra dibêm ji we ra: Erki Mûsa ne da ji we ra nanê azümanî, lakîn bavê min dide ji we ra aw asah nanê azümanî. ³³ Çima ko ji Xodê hati dayin nan aw e ko ji azümanê tê xwarî, û ömr dide ji dinê ra. ³⁴ Ya! Rabb her çax av nan bide ji [231] me ra. ³⁵ Îsa go ji wan ra, ez im nanê hayatê, aw ko ji mi ra tê birçî nabe, û aw ko ji mi ra îma tîne, qat tî nabe. ³⁶ Hama mi ji we ra go, ki hûn ez dîne û îman naynin. ³⁷ Aw hemîan ko Bav ji mi ra dide, ji mi ra dê bê, û aw ko ji

²⁸⁶ Di metnê de çûî ûnî.

mi ra tê awî dernaxim. ³⁸ Çima ko ez ji azümanê hatim xwarî, na ko meramê xo bikim, lê meramê awî ko mi şîand. ³⁹ Vîa e meramê Bavê min ko mi şîand, ko aw hemîan ko Bav ji mi ra da jê wunda nekim, îlla awî li roya paşîyê raxim. ⁴⁰ Û meramê Bavê min vîa e, ko her kî ko Qurê dibîne û jê ra îman tîne ebedî ömrê wî bibe, û awî li roya paşînê raxim.

⁴¹ Nua Yehûdîan ji boy wî gazinan dikiribûn; çima ko go: Erki ez im ji azümanan hati xwarî nan. ⁴² Û digotibûn, vîa Qurê Yûsîf Îsa nin? e, ko bav û dîyê ê kê nas dîkin, nua çawan? dêje ko ez ji azümanan hatim xwarî. ⁴³ Cewab da Îsa, û go ji wan ra: Bi hev û du diçûn mekin. ⁴⁴ Yekê qat ji mi ra nikare bê, erki mi şîandox Bav awî nekşîne, û ez awî raxim li roya paşînê²⁸⁷. ⁴⁵ Li nav peyemberan hatî nivîsandin: û hemîan jî ji Xodê bêne hîn bûn; aw hemîan ko ji Bav dibihîse û hîn dibe, ji mi ra tê. ⁴⁶ Na kî keskî Bav dîtî, ji aw kesê made, aw ko ji Xodê e; Bav aw dîtî. ⁴⁷ Bîra bîra dibêm ji we ra, ji mi ra bawur krox ra ebedî ömrê wî heye. ⁴⁸ Ez im nanê hayat. ⁴⁹ Ejdadê we li çölê da mananayê xwarin û mirin. ⁵⁰ Vîa e aw nan, ko ji azümanan hatî xwarî, ko erki yekê jê bixor dê nemire. ⁵¹ Ez ji azümanan hatim xwarî nanê ömrê me. ⁵² Erki yekê ji nanê hana di- [232] xo; ebeden dê bijî; hem aw nan ko ez ê bidim, tenê min e, ko awî dê ji boy ömrê dinê bidim.

⁵³ Nua Yehûdîan bi hev û du pev diçûbûn û digotibûn, vîa çawan dikare tenê xo me rva ji xwarin ra bide. ⁵⁴ Îsa go ji wan ra: Bîra bîra dibêm ji we ra, erki tenê Qurê merûv hûn nexon û xuyna wî venexun, li Xodê ömrê wê nebe. ⁵⁵ Aw ko tenê mi dixo û xuyna mi vedixo ebedî ömrê wî heye û ez ê wî dê raxim li roya paşîyê. ⁵⁶ Çima ko tenê min asah taam e û xuyna min asah vexwarin e. ⁵⁷ Her kî ko tenê min dixo û xuyna min vedixo, aw li mi da sakîn dibe û ez li wî. ⁵⁸ Çawan ko sax Bav mi şîand û ez sax im bi destê Bavê xo, wusan jî aw ko mi dixo, aw jî bi destê min sax dimîne. ⁵⁹ Ji azümanan hati xwar nan vîa e, na ko çawan ko ejdadê wê namanayê xwarin û mirin; aw ko nanê han dixo, li ebedî dê bijî.

⁶⁰ Tîştê hanan xaber da li nav dêrê gava ko li Kafarnayûm da hîn dîkir. ⁶¹ Nua ji şagirdan pîran gava ko bihîsidin gon: Çetin in xaberên han, kî? dikari jê ra godarî kirin. ⁶² Îsa gava ko fehm kir aw ji xo ra, ko şagirdê wî ji boy av tîşt gazinan dikiribûn, go ji wan ra: Av we xwar dike?. ⁶³ Lê çî? hûn dê taxmîn bikin erki bibînin Qurê merûv ko rabe li ko kîawul bû. ⁶⁴ Ömr dayox rûh e, ten, qat faydakî nake, aw

²⁸⁷ Di metnê de *palînê*.

kelamên ko mi ji we ra xaber da rûh û hayat e. ⁶⁵ Lakîn ji wê hinikan hene ko îman naynin; çima ko Îsa ji îbtîda dizanibû erki kî? ne wan ko îman naynin, û aw kî e ko awî dê teslîm bika. [233] ⁶⁶ Û digot, ji boy vîa mi go ji we ra, ko keskî nikari ji mi ra bê, erki ji bavê min jê ra neyê dayin.

⁶⁷ Ji vî sedemê ji şagirdê wî pîran şûnda cûn, û hênî pê ra nedigerîabûn. ⁶⁸ Îsa ji dwanzdah şagirdan ra go: Hûn jî dixwazin? cûndin. ⁶⁹ Şimhûn Petros cewab da jê ra: Ya! Rabb em ê ji kê? ra herin, ji ta ra kelamê ebedî ömrê heye. ⁷⁰ Û em îman anîn û nas kirin erki tu î Mesîh²⁸⁸ kurê sax Xodê. ⁷¹ Îsa cewab da ji wan ra, mi we dwanzdah nebijard?, hama ji we yekê şeytan e. ⁷² Û ji kurê Şimhûn ji boy Cûdayê Îsxaî digot, çima ko aw bû ko awî dê teslîm bikira, û ji dwanzdahan yekê bû.

SER 7

¹ Û ji paşê tiştê hanan Îsa li nav Celîlê digerîabû çima ko nedixosdibû li nav Yehûdîstanê gerandin; çima ko Yehûdîan dixosdibûn wî kuşdin.

² Û çadir bayramê Yehûdîan nêz bû. ³ Nua brêyê wî gon jê ra: Rabe ji vir û li Yehûdîstanê hare, hata şagirdê ta jî bibînin amelê ta ko dikî. ⁴ Çima ko tunne yekê ko dizîka tiştê bike, û awî bixwazi aşîkâr bûn; erki tu av tiştan dikî, tu xo dinê ra aşîkâr bike. ⁵ Çima ko brêyê wî bile jê ra îman nedianîbûn. ⁶ Nua Îsa ji wan ra go: Hêja wextê min negîyaye, lakîn wextê wê dayîm hazir e. ⁷ Dinê ji we îkrah nikare bike hama ji min îkrah dike, çima ko ez li ser wî şhadet dikim ko amelê wî yara- [234] maz in. ⁸ Li bayramê han hûn herin, ez hêja li bayramê han naçim, çima ko wextê min hêja tekmîl nebû. ⁹ Vanan ko go, aw li wê li Celîlê ma. ¹⁰ Gava ko brêyê wî rabûn, paşê aw jî rabû li bayramê, lakîn na aşîkâr, lê bi dizîka tarzê.

¹¹ Nua Yehûdîan, li ayd da awî aramîş dikir û digotibûn: Aw li ko? e. ¹² Ji boy wî li nav xalqê pîr dirdir hebû; hinikan, qanc e digotibûn, hinikan jî digotibûn: Ná, xalqê şaş dike. ¹³ Hama qat yekê ji boy wî aşîkâr xaber nedidabû, ji tirsê Yehûdîan.

¹⁴ Gava ko ayd nîv bû, Îsa li dacarê rabû, û hîn dikir. ¹⁵ Yehûdîan mat diman û digotibûn: Vîa çawan? kitêban dizane, ko qat hîn nebûn. ¹⁶ Îsa cewab da ji wan ra û go: Dersê min a min nin e, lê ê mi şîandoxê e. ¹⁷ Erki yekê dixwaze îradetê wî kirin, dê bizane ji boy dersê han, erki acaba ji Xodê e?, ya erki ez ji xo dibêm. ¹⁸ Aw ko ji xo dibêje, îzzetê xo aramîş dike; hama aw ko îzzetê xo şîandox aramîş dike, aw rasd

²⁸⁸ Di metnê de *Mesîh*.

e; û li wî da nahaqîtî tunne. ¹⁹ Mûsa ji we ra neda? nomosê, û ji wê qat yekê nomosê îcra nake. ²⁰ Çima hûn ez kuşdinê aramîş dîkin; xalqê cewab dan û gotin: cinê ta heye, kî? aramîş dike ta kuşdinê. ²¹ Cewab da Îsa û go ji wan ra: Mi şîxulkî şîxulî û hûn hemîan jî mat mane. ²² Nua Mûsa ji we ra sûnetê da, na kî aw ji Mûsa e, lê ji ejdadan e; û li roya şemûyê merûv sûnet dîkin; ²³ Nua erki li roya şemûê merûv sûnet distîne, ko nomosê Mûsa xarab nebe, hûn ji mi ra xeyîdîne ko ez li roya şemûê tamam merûvkî sax kirim. ²⁴ Weka xuyayî ye şeraat me- **[235]** kin; lê rasd şeraat bikin. ²⁵ Nua ji Qudsîan hinikan digotibûn: Vîa aw nîn e? ko awî, aramîş dikiribûn kuşdinê. ²⁶ Ê va ha awî aşîkâr xaber dide û jê ra tîştîkî nakin; acaba serweran jî Mesîh bûnê wî fehm kirin. ²⁷ Lakîn em av ji ko e zanin, hama Mesîh gava ko bê, yekê nizane aw ji ko e. ²⁸ Nua Îsa li dacar da hîn dîkir, û digot: Mi jî hûn dizanin û ez ji ko me dizanin, û ez ji xo nehatim, lê aw ko mi şîand rasd e; ko awî hûn nizanin. ²⁹ Ez dizanim awî, çima ko ez ji wî me, û awî mi şîand. ³⁰ Nua dixosdibûn awî girtinê hama keskî lê dest navêt; çima ko hêja wextê wî nehatibû. ³¹ Ê ji xalqê pîran jê ra îman anîn, û digotibûn, gava ko Mesîh bê, hênî? pîr kerematan dê bike, çi qas ko vîa dike.

³² Nua farîsîan jî bihîsdin dirîrê xalqê ser wî; û baş îmaman û farîsîan xizmetcîan şîandin, ko awî bigirin. ³³ Nua Îsa go: Hinikkî wext jî ez bi we ra me; û diçûm ji awî ra ko mi şîand. ³⁴ Hûn mi dê aramîş bikin û dê nebînin; û li ko kî ez diçûm hûn nikârin bîn. ³⁵ Yehûdîan gon ji hev û du ra; Vîa²⁸⁹ li ko? dê hejî ko em awî dê nizanibin, acaba li Yûnanîyan ji belabûnan ra dê hejî û ji Yûnanîyan ra jî dê talîm bide. ³⁶ Çi? e av xaber, ko xaber da: Hûn mi dê aramîş bikin, hama dê nebînin, û li ko kê ez diçûm, hûn nikârin bîn.

³⁷ Ê li axirê bayramê; li roya azîmê, Îsa sekinî, û bi gazî kirinê go: Erki yekê tî bûe; bra ji mir ra bê, û vexo. ³⁸ Aw ko ji mi ra îman tîne, çawan ko kitêban dêjin, ji zikê wî dê çemê abuhayat bikşe. ³⁹ Vîa di got ji boy **[236]** Rûhê ko jê ra îman anoxan dê bisendena çima ko hêja Rûh nehatibû dayîn; çima ko hêja Îsa bi îzzet nebobû. ⁴⁰ Ji xalqê hinikan ko sözê han bihîsdin, digotin; Vîa e aw peyemberê rasd. ⁴¹ Başqasîan digotibûn: Vîa e Mesîh; hama nivîan digotibûn Mesîh Celîlê? dê bê. ⁴² Na ko kitêban dêjin: Erki ji zürîyetê Dawûd, ji qasabayê Beytlehemê li ko kî Dawûd bû; ji wê dê bê

²⁸⁹ Di metnê de *Weûa* (nîşeya wergêrê).

Mesîh. ⁴³ Û li nav xalqê firqakî bû ji boy aw. ⁴⁴ Û ji wan hinikan xosdîn awî girtinê, hama yekê dest lê nexisd.

⁴⁵ Nua îzzetkâran hati ji baş îmaman ra û farîsîan ra, wan ji wan ra gon: awî hûn çima? neanîn li vir. ⁴⁶ Cewab dan xizmetkâran û gon: Qat yekê wusan xaber nedayê çawan ko av meruv. ⁴⁷ Farîsîan cewab dan û gon: Hûn? jî şaş bûn. ⁴⁸ Ji hampan yaxod ji farîsîan yekê jê ra îman anî? ⁴⁹ Lê tenê av nas an ko nomosê nizanin û bi bedua nin. ⁵⁰ Nîtotîmos go ji wan ra; ko ji berê li şevê jê ra hatibû, û ji wan yekê bû. ⁵¹ Şerîatê me yekê hökm dike?; erki awul jê tiştîkî nebihîsd; yaxod nizane çi kirî. ⁵² Cewab dan jê ra û gon: Acaba tu jî ji Celîl î, teftîş bike û mêze ke; ki ji Celîlê peyember dernayê. ⁵³ Û her yek li cîyê xo çûn.

SER 8

¹ Û Îsa li cîyê zeytûnê çû. ² Û li sbê da zû va dîsa hat dacarê, û xalq gijik jê ra dihat, û awî bi ronişdinê ji wan ra talîm dida. ³ Nua kâtîban û farîsîan li zîna da [237] hati girtin jinkî anîn jê ra, û awî li ortayê bi sekinandinê, gon jê ra. ⁴ Ya! xoca jinê han gava zîna diikir li ser av amelê hati girtin. ⁵ Û li nav tevatê da Mûsa ji me ra tenbîh kir, ahwanan kevîr kirinê; nua tu çi? dêjî ji boy awî. ⁶ Û Îsa, bi cerîbanê digotibûn; hata ko li ser wî gilîkî bibe; hama Îsa li xwarî bi nihêrtinê, bi pêçîyan li ser ard dinivîsand. ⁷ Hama gava ko li ser ketin bi pîrs kirinê jê li jor bi nihêrtinê go ji wan ra: Ji wê kî ko bêgûne e, bra awî awul kevîr li ser awî bavêje. ⁸ Û dîsa li xwarî bi binêrtinê, li ser ardê dinivîsand. ⁹ Û gava ko vîa bihîsdin yeka yek li der diketibûn; ji awulîan bi dest kirinê hata paşînan; û Îsa tenê ma, û jinik jî li ber sekinîbû. ¹⁰ Cewab da Îsa û go jê ra: Ya jinê li ko? ne; yekê li ser ta hökm nekir?. ¹¹ Û awî go: Na ya! Rabb, û go Îsa: E jî ta hökm nakim, hare ji vê pê va güne neke.

¹² Îsa cewab da ji wan ra dîsa û go: Ez rohnîyê dinê me; aw ko li pey min tê, li nav zulmê nagere; lê rohnîyê hayatê distîne. ¹³ Farîsîan gon jê ra: Tu ji boy xo şehadetî dikî, şehadetîyê ta rasd nin e. ¹⁴ Cewab da Îsa û go ji wan ra: Erki ez ji boy xo şehadet bikim jî, şehadetîyê min rasd e; çima ko dizanim ji ko hatim, û li ko diçim, hama hûn nizanin, ji ko tîm yaxod li ko diçim. ¹⁵ Hûn li tenê bi nihêrtinê hökm dikin; ez qat yekê hökm nakim. ¹⁶ Faraza erki yekê hökm jî bikim şerîatê min rasd e çima ko ez tenê nîn im, lê ez û Bav, ko mi şîand. ¹⁷ Û li nav tewratê we nivîsandî, erki şehadetîyê du meruvan rasd [238] e. ¹⁸ Ez im ko ji boy xo şehadet dikim, û şehadet dike ji boy min Bav, ko mi şîand. ¹⁹ Nua jê ra gon bavê ta li ko? e;

Îsa ceab da û go ji wan ra: Ne hûn mi dizanin û ne Bavê min; erki hûn mi bizanibana, Bavê mi jî dê bizanibûn.

20 Söze han Îsa xaber da li xazne odasîyê gava ko li dacar da talîm didabû, û yekê awî negirt; çima ko hêja wextê wî negîya bû.

21 Îsa dîsa go ji wan ra, Ez diçim û hûn dê mi aramîş bikin, û li nav güneyêt xo dê bimrin; çima ko li ko kî ez diçim hûn nikârin bên. 22 Yehûdîan digotibûn, saqin aw xo nekuje?, ko dêje: Erki li ko kî ez diçim; hûn nikârin bên û go ji wan ra. 23 Hûn ji vir ji jêr da ne û ez ji vê ji jor da me; hûn ji av dinê nin, ez ji av dinê nin im. 24 Nua mi ji we ra go: Erki li nav güneyêt bimrin, çima ko erki hûn îman neyînin erki ez im; li nav güneyêt xo dê bimrin. 25 Goni jê ra: Tu kî? î; go ji wan ra Îsa, heman ji îbtîdayê çî ko bi we ra xaber didim. 26 Pîr tiştê mi heye ji derhaqê we gotinê û hökm kirinê, lakîn aw ko mi şîand rasd e; e jî aw tişt ko jê bihîsdim, awî xaber didim li dinêyê han. 27 Ê wan fehîm nekirin ko ji boy Bav xaber didabû bi wan ra.

28 Nua Îsa go ji wan ra: kînga ko Qurê meruv bilind bikin dê bizanin wê çaxê ko ez im, û mi ji xo tiştê nekirê; lê Bavê min çawan ko mi hîn kir wusan xaber didim. 29 Ê aw ko mi şîand bi mi ra e, ez tenê nehişt, çima ko ez muqum xosdinê wî dikim.

30 Gava ko vîa xaber da pîran jê ra îman [239] anîn. 31 Nua Îsa jê ra îman anox ji Yedûîan ra digot: Erki hûn li nav kalamê bisekinin, rasd şagirdê mi nin. 32 Ê doxrîtiyê dê bizanin û aw doxrîtî dê we xelas bike. 33 Cewab dani jê ra û gon: Em zürîyetê Îbrahîm in, û qat me ji yekê ra qullux nekrê tu çawan? dêjî dê hûn azad bibin. 34 Îsa²⁹⁰ cewab da ji wan ra û go, Bîra bîra dibêm ji we ra, erki her kî ko güne dişixulî aw qulê güne e. 35 Ê qul ebedî li mal da namîne, hama kur ebeda dimîne. 36 Nua erki Kur wê azad bike, hûn bi rasdî azad dibin. 37 Hûn zürîyetê Îbrahîm in dizanim, hama ez kuşdinê aramîş dikin; çima ko kalamê min li we da cî nagire. 38 Ez çî ko dîme li cem Bavê xo awî xaber didim, û hûn ji bavê çî ko bihîsdin, awî dikin. 39 Cewab dan jê ra û gon: Bavê me Îbrahîm e; go ji wan ra Îsa: Erki hûn zürîyetê Îbrahîmê bibana, amelê Îbrahîm dê şixulîabûn. 40 Hama hûn dixwazin ko mi bikujin, wusankî ko mi ji we ra doxrîtî xaber da, aw ko ez ji bavê xo bihîsdim; Îbrahîm tiştê han nekir. 41 Hûn amelê bavê xo dişixulin, gon jê ra: Em ewledê zîna nin in, yek bavê me heye, Xodê. 42 Nua Îsa ji wan ra go: Erki Xodê bavê wê bibana, hûn dê min

²⁹⁰ Di metnê de Îse.

bihubandina; çima ko ez ji Xodê rabûm, û hatim, û ez ji xo nehatim, lê awî şîand. ⁴³ Çima? hûn kelimê min fehîm nakin; ji boy awî ko hûn nikarin gotinê min godarî kirinê. ⁴⁴ Hûn ji bavê xo Şeytan in, û dixwazin arzûyê bavê xo kirinê; çima ko aw ji îbtîdayê qatîl bû; û li nav doxrîtîyê nesekinand; çima ko li hindurê wî da rasdî tunne, [240] gava ko awî derewkî dêje, asil ji a xoyan dêje; semed av e ko aw derew e û bavê wî. ⁴⁵ Hama ez ko haqîyê xaber didim, ji mi ra îman naynin. ⁴⁶ Ji wê kî? dikarî mi tazîl bike ji boy güneyê, erki haqîyê xaber didim; çima? ji mi ra îman naynin. ⁴⁷ Aw ko ji Xodê e; kelimê min godarî dike, û hûn ji boy aw godarî nakin, çûnkî ji Xodê nin in. ⁴⁸ Cewab dan Yehûdîan, û gon jê ra: Em qanc nebêjin?, erki tu ji Samarî î û cinê ta heye. ⁴⁹ Îsa cewab da û go: Cinê min tunne, lê ez ji Bavê xo ra îzzet dikim, û hûn mi serhevde dikin. ⁵⁰ Ez îzzetê xo aramîş nakim; awî²⁹¹ aramîş kroş û şeraat dîtoş heye. ⁵¹ Bîra bîra dibêm ji we ra: Erki kî ko kelimê mi dipê, ebada qat dê mirin nebîne. ⁵² Yehûdîan gon jê ra: Nua em zanin ko cinê ta heye Îbrahîm mir û hem peyemberan, û tu dêjî erki yekê kelimê mi dipê, ebada qat dê tahma mirinê nastîne. ⁵³ Tu ji bavê me Îbrahîmê mezin? î, kî aw mir û peyemberan daxî mirin; tu xo kî? dikî. ⁵⁴ Îsa cewab da, erki ez ji xo ra îzzet bikim; îzzetê min tiştîkî nin e; Bavê min e ko ji mi ra îkram dike, ji boy ê kê ko hûn dêjin Xodê me e. ⁵⁵ Ê awî hûn nas nakin hama ez awî zanim; û²⁹² erki bêjim, erki awî nizamim, weka we derew dibêm; lakîn awî dizanim, û kelimê wî dipêm. ⁵⁶ Bavê we Îbrahîm arzû kir rûvoya min dîtinê; dî û şaz bû. ⁵⁷ Yehûdîan gon jê ra: Tu hêja pêncê salî nin î, Îbrahîm? jî ta dî. ⁵⁸ Îsa go ji wan ra: Bîra bîra dibêm ji we ra, hêja ji awul nebûnê Îbrahîm ez heyim. ⁵⁹ Keviran helanîn ko li ser wî bavêjin, hama Îsa xo kşand alîkî, û rabû çû ji dacarê.

[241] SER 9

¹ Ê gava ko dibihurîbû, û ji dê za merûvkî korî dî. ² Ê şagirdê wî jê pîrs kirin û gon: Ya! xoca kî? güne kir vîa?, yaxod bav û dîyê wî, ko av korî za? ³ Cewab da Îsa: Ne a vî e güne ne jî e bav û dê; lakîn ko amelê Xodê li ser wî aşîkâr bibe. ⁴ Ê ji mi ra lazim e ko şîxulê mi şîandoşê bişîxulim, çî qas ko ro e, çevê tê, ko li wê çaxê keskî nikarî bişîxule. ⁵ Çî qas ko li nav dinê me rohnîyê dinê me. ⁶ Gava ko vîa go, tû kir li ardê, û bi tû herî çêkir, û av herî li ser çahvê kur taynand û go jê ra: ⁷ Hare li hawuzê Sîloamê bişo (ko tercûme dibe hati şîandoş tê gotan,) çû şuşd, û hat û didîbû.

²⁹¹ Di metnê de *dwî*.

²⁹² Di metnê de *û û*.

8 Nua cîranan û wan ko awul kor bûnê wî dibûn digotibûn; vîa aw nîn e? ko dironişd û pars dîkir. 9 Nîvîan digotin aw e, û başqasîan na, lê weka wî yek e, û awî digot erki ez im. 10 Goni jê ra, lê çawan çahvêt ta hati vebûn. 11 Awî cewab da, meruvkî ko jê ra Îsa dêjin herî çêkir û çahvêt min taynand; û go ji mi ra: Here li hawuza Sîloamê û bişo, û gava ko ez çûm hatim şuşdin, ez dibînim. 12 Goni jê ra aw li ko? e, go ji wan ra: Nizanim. 13 Ji farîsîan ra birin awî, ko bi zemana kor bobû. 14 Ê şemûê bû awdibînî; ro, gava ko Îsa herî çêkir, û çahvê korê vekir. 15 Dîsa farîsîan jî jê pîrs dikiribûn, erki çawan? dibînî; vîa jî go ji wan ra: Herî danî li ser çahvê min, û hatim şuşdin û dibînim. 16 Nua ji farîsîan hinikan digotibûn: Meru- [242] vê han ji Xodê nin e, çima ko royê şemûan napê; nîvîan digotibûn: Lê meruvê günekar çawan? dikare kerematê ahwa kirinê, û li nav wan fîraqî bû. 17 Dîsa ji kor ra gon: Tu çi? dêjî ji boy aw meruv ko çahvê ta vekir; wî jî go, peyemberkî e. 18 Nua Yehûdîan bawur nedikiribûn ji boy awî, erki kor bû, û hati vebûn hata bav û diyê ê kê gazî kirin ko çahvê wî hatibû vebûn. 19 Ê ji wan pîrs kirin û gon, vîa e? kurê we, ko ji boy ê kê we digotin erki kor za, lê a nua çawan? dibîne. 20 Cewab dan bav û diê wî û gon, Em dizanin vîa e kurê me, û ko awî kor za. 21 Hama nua çawan? dibîne em nizanin; Yaxod kî? çahvê wî vekir em nizanin; jê pîrs kin, tamam e; bra awî ji boy xo xaber bide. 22 Ahwa gotin bav û diyê wî, çûnkî ji Yehûdîan ditîrsîabûn; çima ko Yehûdîan wad kiribûn erki yekê awî Mesîh îqrar bike ji dêrê der bimîne. 23 Ji boy vîa bav û diyê wî gon, Aw tamam e jê pîrs kin. 24 Paşê dîsa gazî kirin aw meruvê kor, û gon jê ra: Şikir ke ji Xodê ra em zanin ko meruvê günekar e. 25 Wî jî go: Aw erki günekar e ez nizanim, tenê vîa zanim ez kor bûm û a nwa dibînim. 26 Dîsa gon jê ra: Çi? kir ji ta ra, Çahvêt ta çawan vekir. 27 Cewab da ji wan ra: Mi nua go ji we ra û hûn nabihîsdin; çima? dîsa bihîsdinê dixwazin, saqin hûn? jî dixwazin şagird bin jê ra. 28 Wan dijmîn didabûn jê ra, û digotibûn, tu bibe jê ra şagird; em şagirdê Mûsa ne. 29 Em zanin ko Xodê bi Mûsa ra xaber da, hama vî em nizanin ji kî e. 30 Cewab da meruv û go ji wan ra: Tîştê bi [243] acêb aw e ko, hûn nizanin ji ku e, û awî çahvê mi vekir. 31 Em zanin ko Xodê ji günekar ra godarî nake, îlla erki yekê ji Xodê ra îtîqat bike û meramê wî îcra bike, jê ra godarî bike. 32 Ji îbtîdayê dinê pê va yekê nebihîsdî; erki meruvkî çahvê ji dê za korê vekir. 33 Erki ji Xodê nebana av meruv tîştê nedîkaribû kirinê. 34 Cewab dan jê ra û gon: Tu yek car li güne da zay, û tu? ji me ra talîm didî, û awî li der kirin.

³⁵ Îsa bihîsd ko awî der kirin, va ha ko dî awî, go jê ra: Tu îman tînî? ji Qurê Xodê ra. ³⁶ Awî cewab da û go: Ya! Rabb kî? e aw ko jê ra îman bînim. ³⁷ Îsa go jê ra: Ta dî jî awî, û bi ta ra xaber dayox aw e. ³⁸ Wî jî go: Îman tînim ya! Rabb, û jê ra secde kir. ³⁹ Ê go Îsa: Ez şerîat kirinê hatim dinêy han, ko wan ko nabînin, bibînin, û wan ko dibînin kor bin.

⁴⁰ Avan pê ra bûn farîsîan bihîsdin hinikan, û gon: Meger em jî? kor in? ⁴¹ Îsa go ji wan ra: Erki wê kor bibana güneyê we tunne bû, hama nua dêjin erki em dibînin; ji boy avî güneyê wê li ser we dimîne.

SER 10

¹ Bîra bîra dibêm ji we ra: aw ko ji derî naqeve li gomê mîyan, lê ji başqa derkî radibe, awî diz û haramî e. ² Hama aw ko ji derî diqeve aw şivanê mîyan e. ³ Qapucî jê ra vedike, û mîyan dengê wî dibihîsin û mîyê xo, bi nav gazî dike û derdixe wan. ⁴ Ê gava ko mîyê xo derdixe; li ber wan diço, û mîyan li dû wî diçin çima ko dengê wî nas di- [244] kin. ⁵ Li pey xarîban qat neçin, îlla jê direvin; çima ko dengê xarîban nas nakin.

⁶ Îsa temsîlê han ji wan ra go; hama wan fehî nedikir[i]bûn, erki çi? bû ko bi wan ra xaber didabû. ⁷ Dîsa Îsa go ji wan ra: Bîra bîra dibêm ji we ra: ko deriyê mîyan ez im. ⁸ Aw hemîan ko ji mi awul hatin diz û haramî bobûn hama mîyan ji wan ra godarî nekirin. ⁹ Ez im derî, erki yekê ji min li hindur bikeve, xelas dibe, diqeve û li der tê û çerandin dibîne. ¹⁰ Diz nayê, îlla kî bidize û serjê ke û helak bike; ez hatim ko ömrê wan hebe, û hênî zêde bibe ji wan ra. ¹¹ Ez im şivanê qanc şivanê qanc canê xo li uxurê mîyan datîne. ¹² Hama şivanê bi ücret, ko dibîne ko gur tê; bizinan berdide û direve, hur jî wan qapmîş dike û bela dike. ¹³ Çima ko aw bi ücretê hacet wî nin e ji boy mîyan. ¹⁴ Şivanê qanc ez im, û a xoyîyan nas dikim û ji a xoyîyan nas dibim. ¹⁵ Çawan ko Bav mi nas dike, wusan jî ez Bav nas dikim, û canê xo li uxurê mîyan datînim. ¹⁶ Başqa mîya mi jî hene ko ji av gomê nin in, wan jî li vir²⁹³ aninê ji mi ra lazim e; û dengê mi dê bibihên û dê bibin yek cöl û yek şivan. ¹⁷ Bav mi ji boy vîa dihubîne ko canê xo datînim û dîsa awî bistînim. ¹⁸ Awî yekê ji min dernaxe, lê ez datînim awî ji xo, hökmatê mi heye awî datîninê û hökmatê min heye dîsa awî sendinê; tenbîhê han mi ji Bavê xo sendîe.

²⁹³ Di metnê de *li vip*.

19 Nua ji semedê sözê hanan li nav Yehûdîan dîsa firqa bû. 20 Nua ji wan pîran digotibûn, cinê wî heye, û dîn bûe, hênî çima? jê ra godarî bikin. 21 Başqasîan digotibûn, [245] xaberê ahwa xaberê bicanan nin in; cin dikare çahvê koran veke.

22 Wê çaxê li Qudsê ayda teberûk bû, û zivistan bû. 23 Ê Îsa li dacar da li hayatê Süleymanê digerîabû. 24 Yehûdîan çar alîyê wî girtin û gotin, hata kînga tu yê canê me dê biderxî, erki Mesîh tu î ji me ra aşîkâr bêje. 25 Îsa cewab da ji wan ra û go, Mi ji we ra go û hûn ji mi ra îman naynin, aw amelên ko ez bi navê Bavê xo dikim, wan ji boy min şhadet dîkin. 26 Hama hûn îman naynin; çima ko hûn ji av bizinê min nin in. 27 Bizinê mi dengê mi dibihên, e jî wan nas dikim. 28 Ê li dû mi tîn û e jî ji wan ra ebedî hayatê didim, ko ebedî qat dê wanda nebin û yekê wan dê ji destê mi nederîne. 29 Bavê min ko wan ji mi ra da ji hemîan mezin e, û yekê nikare ji destê Bavê min biderîne. 30 Ê ez û Bavê xo em yek in. 31 Yehûdîan kevîr helanîn ko awî kevîr kin. 32 Îsa cewab da wan ra, Mi ji Bavê xo pîr şîxulê qanc ji we ra nişan da; ji wan ji boy kîja? amelê hûn ez kevîr dîkin, Yehûdîan cewab dan jê ra: 33 Ji boy şîxulê qanc em ta kevîr nakin, lê ji boy kifrê, û çima ko tu meşuv î û tu xo Xodê dikî. 34 Îsa cewab da ji wan ra: Na? kî li nav tewratê we hatî nivîsandin, erki mi go qay hûn Xodê ne. 35 Hama erki ji wan ra Xodêan dêje, ji wan ra ko xaberê Xodê bû, û qabîl nin e ko aw hati nivîsandin bê xarab bûn. 36 Lê aw ko Bav muqades kir û li dinê şîand; hûn jê ra dêjin erki kifîr dikî, ji boy Qurê Xodê me gotinê min. 37 Erki şîxulê Bavê xo nakim ji mi ra bawur mekin. 38 Lê erki dişîxulim, faraz ji mi ra bawur nakin, [246] barê ji şîxulan ra îman bînin, ko bizanin û nas bikin erki Bav li mi da e û ez li Bav da me.

39 Dîsa dixosdibûn awî girtinê hama ji destê wan filitî. 40 Ê dîsa çu li aw alîyê dinê Hordanê, li aw cî, li ko kî Hanna li awulê disekinî û tahfîl dikir. 41 Ê pîran hatin jê ra û gon: Erki Hanna keremetkî nekir. 42 Hama çî ko Hanna go ji boy wî aw hemî jî rasd bû û pîran li wê jê ra îman anîn.

SER 11

¹ Û bi Lazar nav naxoşkî hebû li nav Beytanîayê, ji gundê Meyremê û xuşka wî Martayê. ² Vîa aw Meyrem bû, ko Rabbîê bibîna xoş rûnê rûn kir, û linga wî bi pora xo paqij kir, ko brêy ê kê Lazar naxoş bû. ³ Xuşkat wî meşuv şîandin jê ra û gon: Ya! Rabb, va ha awî ko ta pîr diheband, naxoş e. ⁴ Gava ko Îsa bihîsd go: Av naxoştîyê mirinê nin e, lê ji boy îzzetê Xodê e, ko Qurê Xodê bi awî îzzet bibe. ⁵ Û Îsa dihuband Martayê û xuşka wî Meyremê, û Lazarê. ⁶ Gava ko bihîsd erki naxoş e, du ro jî sekinî heman li aw derê li ko kî disekinîbû. ⁷ Û ji wê pê va go ji şagirdan ra: Wêrin dîsa em li Yehûdîstanê herin. ⁸ Şagirdan jê ra gon: Ya! Xoca, yehûdîan nua ta aramîş dikiribûn kevîr kirinê, û dîsa li wê? em herin. ⁹ Cewab da Îsa, dwanzdah saatê royê tunne?, erki yekê li ro digere şaş nabe, çima ko rohnîê vê dinê dibîne. ¹⁰ Hama erki yekê li şevê bigere şaş dibe, çima ko bi wî ra rohnî tunne. ¹¹ Vîa ko go, ji wê pê va go ji wan ra: Dostê me Lazar li xwe çû, hama diçim ko awî ji xewê rakim. ¹² Şagirdan gon jê ra: **[247]** Ya! xoca erki li xew çûe aw dê xelas bibîne. ¹³ Hama Îsa ji boy mirinê wî digot, ji wan ra wusan dixuyabû, ko ji boy xew çûndinê digot. ¹⁴ Wê çaxê Îsa aşîkâr go ji wan ra: Lazar mir. ¹⁵ Û ez şaz im ji boy wê ko ez li wê nebûm ko hûn ji mi ra îman bînin; hama nua wêrin em jê ra herin. ¹⁶ Tûma, ko Lewî dihatibû gotan, go ji hevaldaş şagirdanê xor ra: Wêrin em jî herin ko pê ra bimrin.

¹⁷ Nua Îsa hat, awî ji çar royan li tîrbê hati danî dî. ¹⁸ Û Beytanîa ji Qudsê ra qasa panzdeh mîl nêz bû. ¹⁹ Û ji Yehûdîan pîran hatibûn ji Marta ra û ji Meyrem ra, ko ji wan ra ji boy brêy wan li dilê wan pîrs kin. ²⁰ Gava ko Marta bihîsd Îsa tê, çû li qarşîya wî; hama Meyrem li mal rodinibû. ²¹ Marta go ji Îsa ra: Ya! Rabb erki tu li vir bibana, brêy mi nedimîrbû. ²² Hama nua jî ez zanim, çi ko tu ji Xodê dîleg bikî, Xodê dide ji ta ra. ²³ Îsa go jê ra: Brêy ta dê qiyam bistîne. ²⁴ Marta go jê ra: Ez zanim ko li roya paşînê li qiyamet da dê rabe. ²⁵ Îsa go jê ra: qiyamet û hayat ez im, aw ko mi ra îman tîne, erki bimra jî, dê bije. ²⁶ Aw hemîan ko sax in û ji mi ra îman tînin, ebedî dê nemirin tu ji avîa ra baur dikî?. ²⁷ Go jê ra: Bêlî Ya! Rabb, mi îman anî, ko tu î Mesîh Qurê Xodê, ko li dinê dê bihatibûy. ²⁸ Û gava ko vîa go, çû bi dizîka xuşka xo Meyremê gazî kir û go: Xoca hatîe û ta gazî dike. ²⁹ Gava ko avî bihîsd zû va rabû, û hati li balê. ³⁰ Îsa hêja li gund nehatibû, lê li derê han bû, li ko kî Marta qarşîyê wî çû. ³¹ Hama Yehûdîan ko pê ra li mal da bûn û li dilê wî di- **[248]** pîrsîbûn; gava ko dîn Marta zû va rabû çû, wan jî li pey wî çûn, taxmîn dikiribûn ko li tîrbê diçû ko li wê bigire. ³² Nua Meyrem gava ko hat li aw cîyê ko Îsa bû, û awî dî,

li linga wî ket û go: Ya! Rabb erki tu li vir bibana, brêy min dê nemirana. ³³ Îsa gava ko dî awî ko digrîa, û pê ra bûn Yehûdîan ko digrîaûn, Îsa weka derdlîkî li dilê xo da ser û binî bû, û go: ³⁴ Li ko? we danî wî; gon jê ra: Ya! Rabb were û bibîne. ³⁵ Û Îsa grîa. ³⁶ Yehûdîan digotibûn, mêze kin çî qas dihubandi awî. ³⁷ Ji wan hinikan digotibûn, vîa ko çahvê koran vekir, nedikâribû ko vîa jî nemire. ³⁸ Îsa dîsa li dilê xo da bi derdlî li tîrbê tê; û li wê mizarakî hebû, û li ser wî kevîrkî hatibû datînin. ³⁹ Û Îsa go: Kevîrê han helînin, û xuşka mirîyê Meyrem go jê ra: Ya! Rabb nua bîno bûe, çima ko ji çar royan e. ⁴⁰ Go jê ra Îsa: Mi ji ta ra nego erki bawur bikî, îzzetê Xodê dê bibînî. ⁴¹ Û gava ko kevîr helanîn, Îsa çahvê xo, li jor helanî û go: Şikir ji ta ra ya! Bav, ko ta mi godarî kir. ⁴² Û ez dizanim ko tu dayîma ji mi ra godarî dikî, lakîn li vir sekinadox ji boy xalqê dêjim, ko bawur bikin ko ta ez şîand. ⁴³ Gava ko vîa go, bi bilind awazkî gazî kir û go: Ya! Lazar li der we re. ⁴⁴ Meyîd jî rabû ling hai girêdan, û dest bi lefandinê; û rûya wî bi dismal hati leandin, û Îsa go ji wan ra: Vekin awî û berdîn bra hare.

⁴⁵ Ji Yehûdîan pîran ko ji Meyrem ra hatibûn, gava ko kirinê Îsa dîn, jê ra îman anîn. ⁴⁶ Û ji wan hinikan jî çûn ji farîsîan ra û kirinê Îsa ji wan ra tarîf kirin. **[249]**

⁴⁷ Baş îmanan û farîsîan li yek cî hatin civandinê û gon: Em çî? bikin çima ko merûvê han pîr keremetan dike. ⁴⁸ Erki em awî wusan berdîn, hemî jî dê jê ra îman bînin, û roman dê bîn û hem cîyê me û hem qawmê me dê helînin. ⁴⁹ Ji wan yekê bi Kayeafa nav, ko baş îmamê wê salê bû, go ji wan ra, hûn qat tiştîkî nizanin. ⁵⁰ Û qat jî dîşûmîş nabin, erki ji mer ra qanc e ko merûvkî dêla qawmê bimre, û qawm gişk helak nebe. ⁵¹ Û tiştê han aw ji xo nego, lê baş îmamê wê salê bûyinê, peyemberîti kir, erki Îsa ji boy mîlletê dê bimrana. ⁵² Û tenê ji boy aw mîlletê na, lakîn ko hati bela bûn ewladê Xodê li yek cî bicivîne.

⁵³ Hênî ji wê royê pê va şawr kirin ko awî bikujin. ⁵⁴ Nua Îsa li nav Yehûdîan hênî aşîkâr nedigerîabû, lakîn ji wê li li nêza çölê welatkî çû, li bajêrkî ko nava ê kê Efrayîm bû.

⁵⁵ Û pasehê Yehûdîan nêz bû, û pîran ji wê semtê li pêş li Qudsê rabûn; ko aw xo paqij kin. ⁵⁶ Nua Îsayê aramîş dikiribûn, û ji hevûdu ra digotibûn gava ko li dacar da bûn, ji we ra çawan? dixuya acaba li bayram da li vir dê bê?; baş îmaman û farîsîan tenbîh kiribûn ko erki yekê bizane li kîjan der bûnê wî, xaber bike ji boy wî ko awî bigirin.

SER 12

¹ Nua Îsa şeş ro li pey bayramê li Beytanîayê hat, li ko kî Lazarosê mirî bû, ko Îsa awî ji mirîan rakir. ² Û li wê jê ra zîyafetkî [250] kirin, û Marta xizmet dikir, û Lazar pê ra li sufrê da ji ronişdoxan yekê bû. ³ Nua Meyrem liîrkî bi pîr buha xalîs rûna; nardanê send, lingê Îsa rûn kir, û bi pora xo lingê wî paqij dikir, û mal bi bîna rûnê tîja bû. ⁴ Ji şagirdan yekê Cûdayê Îsxarî, ko awî dê dest bidana, go: ⁵ Çima? rûnê han bi sê sed dînarê nehati firotan ko ji faqîran ra di hate dayin. ⁶ Vîa go, na ko ji boy faqîran hacetê wî bû, lê ko diz bû, û sindoq awî dipêbû, û çi ko dihatibû avêtin lê awî dikişandibû. ⁷ Îsa go: Berde awî, aw ji boy roya tamirandinê min veşart. ⁸ Çima ko faqîran her çax bi we ra dibin, hama ez dayîma bi we ra nabim.

⁹ Gava ko ji Yehûdîan pîran hasîan ko aw li wê e, hatin, na tenê ji boy Îsa, lê ko Lazarê jî bibînin, awî ko ji mirîan rakir. ¹⁰ Baş îmaman şawr kirin ko Lazar jî bişujin. ¹¹ Çima ko ji Yehûdîan pîran ji ji boy awî diçobûn û ji Îsa ra îman dianîbûn.

¹² Li aw roya dinê, pîr xalq ko li bayramê hatibûn, gava ko bihîsdin erki Îsa li Qudsê tê. ¹³ Guliyê dara xurmê sendin, û çûn li qarşiyê wî, diqîrabûn û digotibûn, Osanna, bi navê Xodê hatox, padîşahê Îsrayîlê mübarek bibe. ¹⁴ Û Îsa kerki dî û li wî ronişd, çawan ko hatîe nivîsandin. ¹⁵ Metirs, ey! qîzê Sahrûnê va ha padîşahê ta li ser cahşê kerê swar bûn tê. ¹⁶ Û şagirdê wî awul vîa fehîm nekirin; hama gava ko Îsa bi îzzet bû, wê çaxê bîra xo anîn; erki av bû, ko hatibû nivîsandin ji boy wî; û van tiştê hanan kirin jê ra. ¹⁷ Nua pê ra bûn xalq şehadet dikiri- [251] bûn ko Lazarê tenê ji tîrbê gazî kir, û ji mirîan rakir awî. ¹⁸ Û ji boy avî xalq awî qarşîlemîş kir; çima ko bihîsdibûn erki av keremetê han kiribû. ¹⁹ Nua farîsîan ji hev û du ra digotibûn, mêze dikin? ko nikarin faydekî kirinê, va ha dinê gişk li pey wî çûn.

²⁰ Û li wê çend Yehûdîan jî hebûn, bi wan ra ko li bayram da ji secde kirin ra rabobûn. ²¹ Wanan hatin ji Fîlîbbos ra, ko awî ji Beytsayîdê Celîlê bû, lava dikiribûn jê ra û digotibûn: Ya! efendî, Îsa em dixwazin dîtinê. ²² Fîlîbbos jî hat ji Andrîa ra go: Andrîa û Fîlîbbos tev ji Îsa ra gon: ²³ Îsa jî cewab da ji wan ra û go: Hat saatê ko Kûrê meruv bi îzzet bibe. ²⁴ Bîra bîra dibêm ji we ra: erki habê genimê li nav xolîyê neya avêtan namiri; hama erki bimire, pîr meywe tîne. ²⁵ Aw ko canê xo dihubîne, awî dê wunda bike; û aw ko canê xo îkrah dike li nav dinêyê han, ji boy ebedî hayatê diveşêrîne awî. ²⁶ Erki yekê ji mi ra xizmet dike bra li pey mi bê; û ez li ko me xizmetkârê mi jî dê li wê bibe; erki yekê ji mi ra xizmet dike, Bav awî dê bi îzzet

bike. ²⁷ Hama nua canê min ser hev ra qalibîye û çi? bêjim, erki ya! Bav mi xelas bike ji saatê han; hama ez ji boy vîa hatim ji saatê han ra. ²⁸ Ya! Bav navê xo bi îzzet bike, nua ji azümanan dengkî hat, mi bi îzzet kir jî û dîsa dê bi îzzet bikim. ²⁹ Ê xalqê ko sekinîbûn û dibihîsdibûn, digotibûn, gürültî dibe; û hinikan jî digotibûn erki melayîk pê ra xaber da. ³⁰ Îsa cewab da û go: Dengê han ji boy mi néhat, lê ji boy we. ³¹ Nua hökmê dinêyê han dibe; nua reysê di- [252] nêyê han dê bê derve avêtin. ³² E jî gava ko ji ardê bilind bibim, hemîan jî ji xo ra bikşînim. ³³ Ê vîa bi çi mirinê dê bimre bi beyan kirinê go: ³⁴ Xalq jê ra cewab da: Em ji Tewratê bihîsdin ko Mesîh ji ebedan dê bimîne, û tu çawan? dêjî ko, ji Qurê meruv ra bilind bûn lazim e; kî? e aw Qurê meruv. ³⁵ Îsa go ji wan ra: hêja hinik wext rohnî bi we ra e; herin hûn çi qas ko rohnî bi we ra e; çima ko li tarî da çûndox nizane li ko diçû. ³⁶ Çi qas ko rohnî bi we ra e îman bînin ji aw rohnî ra, ko Qurê rohnî bibin, û Îsa tiştê hanan xaber da, û çû xo veşart ji wan. ³⁷ Ê faraza av qasa keremetan kiribû li ber wan; hama wan îman nedianîbûn jê ra. ³⁸ Ko kelimê Îşaya peyemberê tamam bibe; ko go: Ya! Rabb ji xaberê me ra kî? bawur kir, û bîlegê Xodê ji kê ra aşîkâr bû. ³⁹ Ji boy vîa nedikaribûn îman aninê, çûn dîsa Îşaya go: ⁴⁰ Çahvê wan kor kir û qalbê wan qalin kir ko bi çahvan nebînin û bi qalbê fehm nekin, û vegeşin, û ez ji wan ra şîfa bidim. ⁴¹ Xaberê han go Îşaya, gava ko îzzetê wî dî, û xaber da li ser wî. ⁴² Lakîn bi ahwa bûnê, ji hampayan dîsa pîran jê ra îman anîn; hama ji boy farîsîan beyan nedikirin ko ji dêrê der neyin. ⁴³ Çima ko îzzetê meruvan ji îzzetê Xodê pêtir hebandin.

⁴⁴ Hama Îsa diqîra û digot: Aw ko ji mi ra îman tîne, ji mi ra îman nayne, lê ji awî ra k mi şîand. ⁴⁵ Ê aw ko mi dibîne; dibîne awî ko mi şîand. ⁴⁶ Ez ji dinê ra rohnî hatim, ko her kî ko ji mi ra îman bîne, li nav tarî da namîne. ⁴⁷ Ê erki yekê xaberê mi dibihê û napê²⁹⁴, ez awî hökm nakim; çima ko ez ne hatim [253] ko dinê hökm bikim, lê ko dinê xelas bikim. ⁴⁸ Aw ko mi hasab nake û kelimê min qabûl nake, heye yekê ko awî hökm dike, aw xaber ko mi xaber da; aw xaber li roya axirê awî hökm bike. ⁴⁹ Çima ko mi ji xo xaber²⁹⁵ neda, lê Bav ko mi şîand, aw ji mi ra tenbîh kir çi ko dê bêjim û çi ko xaber bidim. ⁵⁰ Ê dizanim ko tenbîhê wî ebedî hayat e, nua çi ko ez xaber bidim, çawan ko Bav ji mi ra go, wusan xaber didim.

²⁹⁴ Di metnê de *dipê* (nîşeya wergêrê).

²⁹⁵ Di metnê de *xaber* (nîşeya wergêrê).

SER 13

¹ Û ji aydê pasehê awul, Îsa zanî ko saatê wî heye, ko ji dinê han rabe li ba Bav; a xoyîan ko li nav dinê da bûn, heband, hata paşê jî hebandi wan.

² Û gava ko şîv dibana, Şeytan jî li dilê Cûdayê Şimhûnê Îsxarî danîbû; ko awî teslîm bike. ³ Îsa fehm kir ko Bav her tişt li destê wî da, û ko ji Xodê rabû û li ba Xodê diço. ⁴ Ji şîvê rabû, û cilê xo deranî, û pêştimalê girt hati lefandin. ⁵ Û paşê av send li leganê, û²⁹⁶ bi aw hati lefandin pêştimalê xo paqij dikir. ⁶ Nua Şimhûn Petros ra hat; wî jî go jê ra: Ya! Rabb tu? dê linga mi bişuy. ⁷ Îsa cewab da jê ra û go: Ez çi ko dikim tu nua nizanî, lê paşê dê fehm bikî. ⁸ Petros go jê ra: Linga mi qat tu dê neşuy, Îsa cewab da jê ra: Erki ez ta neşum, hîssê ta bi mi ra tunne. ⁹ Şimhûn Petros jê ra go: Ya! Rabb na tenê linga min, lê dest û serê mi jî. ¹⁰ Îsa go jê ra: Ji yekê hati şuşdin ra ji linga başqa ji şuşdin ra muhtac nin e, îlla yek car pak e, [254] hûn jî pak in, lakîn hûn hemîan na. ¹¹ Çima ko dizanibû awî, ko dê awî dest bidana, ji av semedê go; erki na hûn hemî paqij in. ¹² Û gava ko lingê wan şuşd, cilê xo girt û li sufrê ronîşd, û²⁹⁷ go ji wan ra, Hûn dizanin? mi çi kir ji we ra. ¹³ Hûn ez xoca û Rabb gazî dikin û qanc dikin, çima ko ez wusan im. ¹⁴ Lê erki ez xoca û Rabb mi linga we şuşd; lazim e ko hûn jî linga hevûdu bişûn. ¹⁵ Çima ko mi ji we ra örneşkî da; çawan ko mi ji we ra kir hûn jî weka kirinê mi bikin. ¹⁶ Bîra bîra dibêm ji we ra: qul ji axayê xo mezin nin e, ne jî hati şîandox ji xo şîandox mezin e. ¹⁷ Çünkî vanan hûn zanin, xozî ji we ra, erki wanan bikin. ¹⁸ Ji we ji hemîan ra nabêm; çima ko ez nas dikim wan ko mi bijart, lakîn hata ko nivîs tekmîl bibe, aw ko bi mi ra nan dixwaribû, ji mi ra hîlle kir. ¹⁹ Ji nua ji we ra dibêm çi qas ko nebûe, ko kînga ko bibe, Îman bînin ko ez aw im. ²⁰ Bîra bîra dibêm ji we ra: Kî ko qabûl dike awî ko ez dişeyînim mi qabûl dike, û kî ko mi qabûl dike, mi şîandoxê qabûl dike.

²¹ Îsa gava ko vîa go, li Rûhê xo da hari dî şehadet kir û go: Bîra bîra dibem ji we ra, ji we yekê dê mi dest bide. ²² Nua şagirdan ji boy kî dêje acab bi tacûb kirinê li hev û du meze dikir[i]bûn. ²³ Û ji şagirdan yekê hebû ko li ba Îsa ronîşdî, awî ko Îsa dihebandi yekê. ²⁴ Nua Şimhûn Petros jê ra îşaret dikir ji boy pîrs kirinê erki kî dê bibe aw, ji boy ê kê ko xaber dide. ²⁵ Wî jî li ser sengê Îsayê ket, û go jê ra: Ya! Rabb kî? e aw. ²⁶ Îsa cewab da û go, Aw e ji kê ra ko, ez ê nan şil [255] dikim û didim; û şil kir nan da ji Îsxarî Cûda ra. ²⁷ Û ji paşê nanê Şeytan li hindura wî ket; û Îsa go jê

²⁹⁶ Di metnê de so.

²⁹⁷ Di metnê de ov.

ra: Nua çi ko dê bikî zû va bike. ²⁸ Lakîn tiştê han ji sufrê da ronişdoxan yekê fehm nekir, erki ji boy çi? go jê ra. ²⁹ Çima ko hinikan taxmîn kirin ko, Cûda ji boy kesedar bûnê, Îsa jê ra go: li bayram da çi ko ji mer ra lazim e bikî, yaxod ji faqîran ra tiştê bide. ³⁰ Awî jî hama ko nanê send, zû va li der rabû û şev bû.

³¹ Û gava ko rabû li der, Îsa go: Nua Qurê meruv bi îzzet bû, û Xodê jî bi awî bi îzzet bû. ³² Erki Xodê bi awî bi îzzet bû Xodê jî li xo da awî dê bi îzzet bike û zû va dê bi îzzet bike awî. ³³ Ey! zarûkan, hinik wext jî ez bi we ra me, hûn mi dê aramîş bikin, û çawan ko mi ji Yehûdîan ra go, erki li ko kî ez diçûm hûn nikarin bên, nua jî we ra dibem. ³⁴ Ji we ra tenbîhekî no didim, ko hev û du bihebînin, çawan ko mi wê huband, hata ko hûn jî hevûdu bihebînin. ³⁵ Bi awî hemîan dê bizanin, erki hûn şagirda min in, erki hev û du bihebînin. ³⁶ Şimhûn Petro go jê ra: Ya! Rabb li ko? diçî; Îsa cewab da, li ko kî ez diçûm, tu nua nikarî bêy hama paşê dê bêy li pey mi. ³⁷ Petros go jê ra: Ya! Rabb çima? dê nikarim nua li pey ta bêm; ez ji a nua da canê xo jî li uxura ta datînim. ³⁸ Cewab da Îsa: Canê xo li uxura mi dê deynî, bîra bîra dibêm ji ta ra li ber dîk ban danê, sê caran tu yê dê mi înkâr bikî.

[256] SER 14

¹ Dilê wê bra ser û bin nebe ji Xodê ra îman bînin, û ji mi ra îman bînin. ² Li mala Bavê min pîr qonaxan hen in, erki na mi ji we ra digot, erki diçûm û ji we ra cî hazir dikim. ³ Û erki biçûm û ji we ra cî hazir bikim, dîsa tîm û wê li ba xo distînim, ko ez li ko mi, hûn jî li wê bibin. ⁴ Û li ko kî diçûm, hûn zanin, û re jî zanin.

⁵ Tûma jê ra go: Ya! Rabb em nizanin li ko diçî; û çawan? dikarin rê bizanin. ⁶ Îsa go jê ra: Ez im rê û rasdî û hayat, ji Bav ra kesî nikarî bê; îlla bi destê min. ⁷ Erki hûn mi bizanibana, bavê mi jî dizanibana, ji vî pê va awî zanin û we awî dîn.

⁸ Fîlîbos go jê ra: Ya! Rabb Bav ji me ra nişan bide, û bes e ji me ra. ⁹ Go jê ra Îsa: Av qas wext bi we ra mi, û ta ez nas nekir, ya! Fîlîbos, aw ko ez dî, Bav jî dîe, û tu çawan dêjî erki Bav ji mi ra nîşan bide. ¹⁰ Tu bawur nakî?, erki ez li Bav da me û Bav li mi da e, av xaber ko ez ji we ra xaber didim, ez ji xo nabêjim, îlla Bav ko li mi da sakîn bûe, awî dişixule av şixulan. ¹¹ Ji mi ra îman tînin?, erki ez li Bav da me û Bav li mi da e. ¹² Erki na ji boy av amelan ji mi ra îman bînin; bîra bîra dibêm ji we ra, erki aw ko ji mi ra îman tîne, aw amelan ko ez dişixulim, wî jî dê bişixule, û ji wan hênî zêde dê bike, çima ko ez ji Bav ra diçûm. ¹³ Û bi navê min çi ko dîleg bikin; dê bikim awî, ko Bav bi Qur bi îzzet bibe. ¹⁴ Çi ko bi navê min dîleg bikin,

[257] awî dê bikim. ¹⁵ Erki hûn mi dihebînin tembîhê mi bipên. ¹⁶ Û e jî ji Bav ra dê lava bikim, û başqa teselî dayoxkî dê bide ji we ra ko ebedan aw bi we ra bimîne. ¹⁷ Rûhê rasdîyê, ko dinêy han nikâre aw qabûl kirin; çima ko nabîne awî, û nas nake awî; lakîn hûn nas dîkin awî, çima ko bi we ra dimîne, û bi we ra dê bibe. ¹⁸ We sêvî nahêlim, tîm ji we ra. ¹⁹ Ji paşê hinikî zeman, hênî dinê mi nabîne; hama hûn dê bibînin mi; çima ko ez sax im, û hûn dê sax bibin. ²⁰ Û wê royê hûn dê bizanin, ko ez li Bav da me, û hûn li mi da, û ez li we da. ²¹ Tenbîhê mi girtoş û pê kiroş, aw e ez hebandox, û aw ko ez dihebîni, ji Bavê min dê bê hebandin, û ezê dê wî bihebînim, û ez xo jê ra dê beyan bikim.

²² Cûda (na Îsxarî) go jê ra: Ya! Rabb, çawan bû kî tu xo dê ji me ra beyan bikî û na ji dinê ra. ²³ Îsa cewab da û go jê ra: erki yekê mi dihebîni; kelimê min dipê û Bavê min awî dihebîne û em jê ra tîm, û li ba wî qonax dîkin. ²⁴ Û aw ko mi nahebîne, kelimê min napê, û kelimê min ko dibihên, a min nin i, lê ê Bav ko ez şîand. ²⁵ Tîştê hanan me ji we ra, xaber da, çi qas ko ez li ba we da me. ²⁶ Lakîn tesellî dayox Rûh el Quds, ko Bav bi navê min dê bişeyne, hemîyan aw dê ji we ra hîn dike, û mi çi ko ji we ra go dê bîra we bîne. ²⁷ Ji we ra selamet dihêlim, selametê xo didim ji we ra; ez weka dayînê dinê ji we ra nadim; dilê we bra ser û bin nebe û metîrsin. ²⁸ Hûn bihîsdin ko mi ji we ra go: Diçûm û ji we ra tîm; erki hûn ez bihubîrandana, wusani dê şaz bibana, erki ez ji Bavê xo ra diçûm; çima ko [258] Bavê min ji min mezin e. ²⁹ Û ji nua da hêja nebûe mi ji we ra go, gava ko bibe, bawur bikin. ³⁰ Hênî bi we ra dê pîr xaber nedim; çima ko mezinê dinêy han tî, hama li ba min tîştê wî tunne. ³¹ Lakîn dinê bizani ko ez Bav dihebînim, û çawan ko Bav ji mi ra tenbîh kir, wusan dikim, hênî rabin ji vir em herin.

SER 15

¹ Mêwê rasd ez im, û bavê min baxwen e. ² Her gulî ko li ser min e û yêmîş nayne; dibîre awî, û aw hemî ko yêmîş tîne paqij dike awî, ko hênî pîr meywedardibe. ³ Hûn ji a nuda da paqij in bi aw kelimê ko mi ji we ra xaber da. ⁴ Li nav mi da sekinin, û ez li nav we da; çawan ko gulî aw ji xo nikâre meywe bîne; erki li ser mêw hati adilandin nebe, wusan jî hûn; erki li ser mi hati adilandin nebin.

⁵ Ez mêw im û hûn gulî; aw ko li ser mi hatîe adiland û ez li ser wî, awî pîr meywe tîne, çima ko bê min hûn nikarin tîştê kirinê. ⁶ Erki yekê li ser mi nehatîe adilandin, awî weka gulî li der ket û hişk bû û dicivînin awî, û li agirê davêjin, û

dişawûte. ⁷ Û erki hûn li nav mi bimînin û kelmê mi jî li nav we da bimînin, çi ko dixwazin dîleg bikin, û dê bibe ji we ra. ⁸ Bi awî da Bavê min bi îzzet bû, ko hûn pîr meywe bînin, û şagirdê mi bibin.

⁹ Çawan ko Bav mi heband, mi jî wê heband, li muhabetê mi da adilandî bisekinin. ¹⁰ Erki tenbîhê mi hûn bipên, li nav muhabetê mi dê bisekinin, çawan ko mi tenbîhê Bav girt, û li nav muhabetê wî sekinîm. ¹¹ Tîştê hanan mi bi [259] we ra xaber da; ko şazlîxê mi li nav we bimîne, û şazlîxê we tekmîl bibe. ¹² Tenbîhê mi vîa e ko hev û du bihebînin, çawan ko mi we heband. ¹³ Ji vîa pêtir muhabetê yekê tunne; ko canê xo li uxurê dostê xo deyne. ¹⁴ Hûn dosta min in, erki bikin çi ko ez ji we ra tenbîh dikim. ¹⁵ Hênî ji we ra qul nabêm, çima ko qul nizane çi kirinê axay xo; hama mi ji we ra dost go, çima ko ji Bav çi tîşt ko mi bihîsd, mi ji we ra xaber da. ¹⁶ Hûn ez nabijartin, lê mi we bijart, û mi we tayîn kir, ko hûn herin û meywe bînin, û meyweyê we bimîne, û bi navê min çi ko ji Bavê min bixwazin, ji we ra bide. ¹⁷ Vîa tenbîh dikim ko hev û du bi hebînin.

¹⁸ Erki dinê ji wê îkrah dike; bizanin ko awul ji mi îkrah kir. ¹⁹ Erki hûn ji dinê han bibane, dinê a xoyîyan dihebîne, lakîn hûn ji dinê nin in, lê mi wê ji dinê bijart; ji boy av dinê ji wê îkrah dike. ²⁰ Bîra xo bînin xaberê han ko mi ji we ra go, Erki qul ji axay xo mezin nin e, erki ez qawarandin, we jî dê qawarînin, erki xaberê mi girtin e we jî dê bigirin. ²¹ Lakîn av hemî tîştan dê ji we ra bikin ji boy navê min, çima ko nas nekirin awî ko mi şîand. ²² Erki ez nehatibama û ji wan ra negotibama, güneyê wan dê nebana, lakîn hênî nua ji boy güneyê wan mihanakî wan tunne. ²³ Aw ko ji min îkrah dike, ji Bavê mi jî îkrah dike. ²⁴ Erki aw şîxulan mi nav wan da nekirana, awan ko xayrî yekê nakirê, güney wan dê tunne bana, hama nua hem dîn, û îkrah kirin gerek ji min, gerek ji Bavê min. ²⁵ Lakîn vîa bû kî tamam bibe aw kelm ko li nav Tewratê wan hatî nivîsandin, erki bîla sebeb ji min [260] îkrah kirin²⁹⁸. ²⁶ Lakîn gava ko tesellî dayox bê ko ez ji Bavê ji we ra bişeynim aw Rûhê rasdîyê, ko ji Bav xurûc dike, aw ko dê ji boy mi şehadet bike. ²⁷ Û hûn jî şehadet dîkin, çima ko ji îbtîdayê hûn bi mi ra ne.

²⁹⁸ Di metnê de *kiran*.

SER 16

¹ Tîştê hanan mi ji we ra go, ki xwar nebin. ² Ji dêra xo we dê li der xim, lakîn wext dê bê, ko her kî ko we bişuje, wusan dê hasab bike ko ji Xodê ra xizmet dike. ³ Û tîştê han dê ji we ra bikin; ji boy aw ko ne av nas kirin û ne jî mi. ⁴ Lakîn tîştê han mi ji wan ra go, ko va ha saat bê, hûn bîra xo bînin erki mi ji we ra go, sözê han awul mi we ra nego, çima ko ez bi we ra bûm.

⁵ Lakîn nua ez diçum li ba mi şîandox, û ji wê yekê jî pîrs nake erki li ko diçî. ⁶ Lakîn ji boy av tîştan ko mi ji we ra go, dilê we bi qasawetê tîja bû. ⁷ Hama ez bîra dibêm ji we ra, ji we ra qanc e ko ez herim, çima ko erki ez neçim, tesellî dayox ji we ra nayê; hama erki biçum, awî ji we ra dişeyînim. ⁸ Û awî gava ko bê, dinê dê tazîl bike ji boy güneyan, û sadaqatê û şerîatê. ⁹ Ji boy güneyan, çünkî ji mi ra îman naynin. ¹⁰ Ji boy sadaqatê, çünkî ez ji Bav ra diçum, û hênî mi nabînin. ¹¹ Ji boy şerîatê çünkî mezinê vê dinêyê hatîe brandin. ¹² Hêja ji we ra pîr tîştê min heye gotin ra, lakîn a nua hûn nikarin tahmul kirinê. ¹³ Hama gava ko Rûhê rasdîyê bê ji we ra li hemî rasdîyê qalawuzîti dike, çima ko aw ji xo tîştê dê xaber nede, lê çî ko bibihî-[261] se, awî dê xaber de, û ji we ra aw tîştê ko dê bibin dê tarîf bike. ¹⁴ Awî ez dê bi îzzet bike, çima ko ji a minan dê bistîne, û ji we ra tarîf bike. ¹⁵ Ji Bav ra her çî ko heye, ê min e; ji boy aw ji mi ra go, erki ji a minan dê bistîne, û ji we ra tarîf bike. ¹⁶ Hinikî wext hênî dê mi nebînin, û dîsa hinikî wext dê mi bibînin; çima ko ez ji Bav ra diçum.

¹⁷ Nua ji şagirdan hinikan ji hev û du ra digotibûn: çî? e vîa ko ji me ra dêje, erki hinikî, hênî mi dê nebînin, û dîsa hinikî, dê mi bibînin, û erki ez ji Bav ra diçim. ¹⁸ Û digotibûn: çî? dê bibe av hinik jî em nizanin çî? dêje. ¹⁹ Îsa fehm kir ko dixwazin jê pîrs kirinê; û go ji wan ra, ji boy awî li nav xo pîrs dîkin, ko mi go gavkî jî hênî dê mi nebînin, û dîsa gavkî jî dê mi bibînin. ²⁰ Bîra bîra dibêm ji we ra, ko hûn dê bigrin, û şîn bikin, hama dinê dê şaz be, hûn dê qasawet bikin; lakîn qasawetê wê dê li şazîtiyê bê gohrandin. ²¹ Jinkî gava ko dize, qasawet dikşîne çima ko saatê wî gîyae lakîn gava ko ewled bize, ji şazîtiyê hênî sixletê xo bîra xo nayne, ko li dinê da meruvkî za. ²² Hûn jî nua qasawetê we heye, hama ez dîsa dê we bibînim, û dilê we dê şaz bin û şazîtiyê we yekê dê ji we der neyne. ²³ Û wê royê hûn dê ji min tîştê pîrs nekin, bîra bîra dibêm ji we ra, ko bi navê min çî ko dîleg bikin ji bavê min dê bide ji we ra. ²⁴ Hata nua bi navê Bavê min qat tîştê we dîleg nekirin; dîleg bikin û dê bistînin, ko şazîtiyê we temam bibe. ²⁵ Tîştê hana mi ji we ra bi temsîla go, lakîn

saat dê bê, ko wê çaxê hênî bi we ra bi [262] temsîlan dê xeber nedim; lê bi aşîkâr ji boy Bav dê ji we ra tarîf bikim. ²⁶ Wê royê dê bi navê min dîleg bikin, û ez nabêm ji we ra, erki ez ji boy we ji Bav ra dê lava bikim; ²⁷ Çima ko Bav aw bi xo we dihebîne; çünkî we ez hebandin, û bawur kirin ko ez ji Xodê rabûm. ²⁸ Ji Bav rabûm û li dinê hatim; dîsa dinê dihêlim û ji Bav ra diçim.

²⁹ Şagirdan gon jê ra: Va ha a nua bi aşîkâr xaber didî, û temsîlkî jî nabêjî. ³⁰ Nua em fehm dikin ko tu her tişt zanî, û tiştîkî jî lazim nin e ko yekê ji ta pîrs bike, bi vîa em dizanin ko tu ji Xodê rabûy. ³¹ Îsa cewab da ji wan ra û go: A? nua bawur dikin. ³² Va ha saat tê, û hatîe jî, ko dê bela bin, lakîn ez tenê nin im çima ko Bav bi mi ra e. ³³ Tiştê hana mi ji we ra go, ko bi mi ra selametê we hebe; lakîn pêt bin, çima ko mi dinê fath kir.

SER 17

¹ Ê gava ko Îsa vanan xaber da, çahvê xo li azümanan bilind kir û go: Ey! Bav saat gihîşdî, bi îzzet ke Kurê xo, ko Kurê ta jî ta bi îzzet ke. ² Çawan ko jê ra ta li ser her ten hûkmat da, hata ebedî hayat bide ji aw hemîan ra, ko ta jê ra da. ³ Vîa e ebedî hayat, ko nas bikin ta tenê haq Allah û Îsa el Mesîhê ko ta şîand awî. ⁴ Mi ta li ser ardê bi îzzet kir, aw şîxul ko ta ji mi ra da kirinê, mi tamam kir. ⁵ Ê a nua Ey! Bav, tu li ba xo mi bi îzzet ke; bi awî îzzetê, [263] ko ji bûnê dinê awul li ba ta ji mi ra hebû. ⁶ Mi navê ta beyan kir beyan kir ji aw merûvan ra, wan ko ta ji dinê da ji mi ra; ê ta bûn, û ta ji mi ra da wan, û kelamê ta girtin. ⁷ Nua fehm kirin, erki; aw hemî tişt ko ta ji mi ra da, ji ta ne. ⁸ Çima ko aw kelaman ko ta ji mi ra da mi jî ji wan ra da, û wan jî qabûl kirin û bi rasd zanîn ko ez ji ta rabûm, û îman anîn ko ta ez şîandim. ⁹ Nua ez ji boy wan lava dikim, û na ji boy dinê lava dikim; lê ji boy wan ko ta ji mi ra da, çima ko wan ê ta ne. ¹⁰ Ê hemî a minan, ê ta ne û çî ko ê ta e ê min e, û ez bi wan bi îzzet bûme. ¹¹ Ê ez hênî li dinê de nin im, lakîn wan li dinê da ne, û ez ji ta ra tîm, ey! azîz bav bi navê xo wan bipê, wan ko ta ji mi ra da; ko yek bibin, çawan ko em yek in. ¹² Çî qas ko ez li dinê da bûm bi wan ra, mi bi navê ta wan hifz kir, wan ko ta ji mi ra, û mi hifz kir û wan yekê wunda nebû, ji xayrê oxulê helakê, ko kitêb tekmîl bibe. ¹³ Hênî nua ji ta ra tîm û li nav dinê tiştê han xaber didim, ko şazîtîyê min li xo da tekmîl bigirin. ¹⁴ Mi kelamê ta ji wan ra da; û dinê ji wan îkrah kir, çima ko wan ji dinê nin in, çawan ko e jî ji dinê nin im. ¹⁵ Ji boy wan ji dinê helînî lava nakim; lê ko wan ji yaramazê hifz bikî. ¹⁶ Wan ji dinê nin in çawan ko ez

ji dinê nin im. ¹⁷ Wan bi rasdiyê xo muqades bike, ko kelimê ta haq e. ¹⁸ Çawan ko ta ez li dinê şîandim, e jî wan li dinê şîandim. ¹⁹ Ê li ser wan ez xo paqij dikim ko wan jî bi haqîyê paqij bibin. ²⁰ Ê tenê ji boy wan lava nakim, lakîn bi xabê wan ji boy hemî ji mi ra îman ano- [264] xan ra jî. ²¹ Ko hemîan jî yek bibin, çawan ko tu ey! Bav li nav min û ez li nav ta, ko wan jî li nav me da bibin; ko dinê jî bawur bike, erki ta ez şîandim. ²² Ê aw îzzet ko ta ji mi ra da, mi jî ji wan ra da, ko yek bibin; çawan ko em yek in. ²³ Ez li wan da û tu li mi da, hata ko li yek da tekml bibin, û dinê jî bizane ko ta ez hebandim. ²⁴ Ey! Bav wan ko ta ji mi ra da, dixwazim ko li ko kî ez im, wan jî bi mi ra bin; ko bibînin îzzetê min, aw ko ta ji mi ra da, çima ko ta ez hebandim ji awul bûnê dinê. ²⁵ Ey sadiq Bav dinê ta nas nekir, lakîn mi ta nas kir, û wan jî nas kirin erki ta ez şîandim. ²⁶ Mi navê ta ji wan ra da zanîn û dê bidim zanîn, ko aw muhabet, ko bi awî ta ez hebandim, li nav wan bibe, û e jî li nav wan.

SER 18

¹ Îsa gava ko xabê hana go, rabû bi tevî şagirdê xo li aliyê dinê nawalê Katiûnê bihurî, li ko kî baxçakî hebû li nav ê kê ketin aw û şagirdê xo. ² Cûda jî awî ko aw dê teslîm bikirana av cî dizanibû; çima Îsa pîr caran bi tevî şagirdê xo li wê hatibûn civandin. ³ Nua Cûda bôlîgê askeran û ji baş îmaman û ji farîsîan xizmetçian bi xo ra send, hati li aw der, bi maşhalan û bi feneran û bi çekan. ⁴ Hama Îsa gava ko dî aw hemîan li ser wî hat, rabû û go ji wan ra: hûn li kê? digerin. ⁵ Cewab dani jê ra: Îsayê Nasranî, go ji wan ra Îsa: Ez im, Cûda jî [265] ko awî dê teslîm bikirana, bi wan ra bû. ⁶ Gava ko go, erki ez im, bi şûnda çûn û li ardê ketin. ⁷ Dîsa pîr kir ji wan ra: li kê? digerin; wan jî gon, Îsayê Nasranî. ⁸ Îsa cewab da ji wan ra: Mi ji we ra go erki ez im; nua erki hûn mi dixwazin avana berdin ko biçun. ⁹ Ko tekml bibe aw xaber ki go, wan ko ta ji mi ra da, ji wan yekê jî mi wunda nekir. ¹⁰ Nua ji Şimhûn Petros ra şûrkî hebû, kşand awî, û lêxîsd li xizmetkârê baş îmamê, û goyê rasdê wî brand cîyê kir, û navê aw xizmetkârê Malxos bû. ¹¹ Îsa go ji Petros ra: Şûra xo dîsa li kalan deyne; aw kase ko Bavê min ji mi ra da, dê vexum awî.

¹² Nua bôlîgê askerê û bînbaşî û xizmetçiyê Yehûdîan girtin Îsa, û grêdan. ¹³ Ê awî îbtîda ji Hana ra brin ko xazûrê Kayafa bû, ko baş îmamê wê salê bû. ¹⁴ Vîa aw Kayafa bû ko ji Yehûdîan ra nasîhat kir, erki qanc e ko ji boy qawmê meşûvkî bimre. ¹⁵ Ê li pey Îsa diçobûn Şimhûn Petros û aw şagirdê din; û aw şagird nasê baş îmamê bûnê bi Îsa ra li hawşa baş îmamê ket. ¹⁶ Lakîn Petros derva li ba deriyê sekinî

bû; rabû aw şagirdê din ko nasê baş îmamê bû, û go ji qapucî ra: Petrosê li hindur send. ¹⁷ Nua aw qapucî²⁹⁹ qarwaş ji Petros ra go: Saqin tu jî şagirdanê wê meruvê nebî? wî jî go, nin im. ¹⁸ Li wê sekinîbûn xizmetkâran û hasasan ko agir şawutandibûn, çûnkî serma bû, û germ dibobûn; Petros jî bi wan ra sekinîbû û germ dibobû. ¹⁹ Û baş îmam ji Îsa ra pîrs kir ji boy şagirdan û talîmê wî. ²⁰ Îsa cewab da jê ra: mi li dinê da aşîkâr xaber da, mi her [266] çax li dêran û li dacar da hîn kir, li ko kî Yehûdîan gişk cem bobûn, û dizîka tiştê mi xaber neda. ²¹ Çima? ji mi ra pîrs dikî, wan ko bihîsdin ji wan ra pîrs ke erki mi çi bi wan ra xaber da, va ha mi çi ko xaber da wan zanin. ²² Gava ko vîa go; ji xizmetkâran yekê ko li wê sekinîbû, sîlakî lêxîd ji Îsa ra û go, Wusan? cewab didî ji baş îma ra. ²³ Îsa jî jê ra go: Erki mi koftî xaber da, ji boy koftîyê şehadet bike; lê erki mi qanc xaber da, tu çima? ji mi ra lêdixî. ²⁴ Û hana awî hati grêdan ji Kayafa ra şîand. ²⁵ Şimhûn Petros jî li wê sekinîbû û germ dibobû, goni jê ra, Saqin tu jî ji şagirdê wî nebî; awî înkâr kir û go, Erki nin im. ²⁶ Ji xizmetkârê baş îmamê yek jî, xisimê aw meruvê, ko goya ê kê Petros birandibû, go: Na? mi ta dî li nav baxçayê bi wî ra. ²⁷ Nua Petros dîsa înkâr kir, û zû va dîk ban da.

²⁸ Û Îsa ji mala Kayafayê li serayê walîyê birin, û hênî sibê bû, û wan li serayê neketin ko napak nebin, lê ko pasehê bixon. ²⁹ Pîlados li der hat ji wan ra û go: Li ser meruvê han çi? gilî datînin. ³⁰ Cewab dan û gon jê ra: Erki av meruv bi koftî xûy nebana, awî me ji ta ra dê teslîm nekirana. ³¹ Nua Pîlados ji wan ra go: Hûn bistînin avî, û li göra dîne xo awî hökm bikin; Yehûdîan gon ji ra; Cayîz nin e ko meruvkî bişujin. ³² Ko tekîl bibe kelamê Îsa, ko go: beyan kir erki bi çi mirinê aw dê bimre. ³³ Pîlados dîsa li serayê ket, gazî kir Îsa û go jê ra, Padîşahê Yehûdîyan tu? î. ³⁴ Îsa cewab da: vaya tu ji xo? dêjî, yaxod ji boy mi başqasîan ji ta ra gon. [267] ³⁵ Cewab da Pîlados, Meger e jî Yehûdî? me; mîlletê ta û baş îmamê ta ta ji mi ra teslîm kirin, ta çi? tiştê krîe. ³⁶ Îsa cewab da da: padîşahîtiye min ji dinê han nin e; erki ji dinê han bibana padîşahîtiye min, xizmetciyê min dê pev biçana ko ez li destê Yehûdîan teslîm nebin; nua padîşahîtiye min ji dinê han nin e. ³⁷ Pîlados go jê ra: Lê erki wusan e tu padîşah î; cewab da Îsa, tu dêjî erki ez padîşah im; lakî ez ji boy av tiştê han zame, û ji boy awî dinê hatim, ko ji boy haqîyê şehadet dikim, aw hemîan ko ji haqîyê ne, ji xaberê mi ra godarî dîkin. ³⁸ Pîlados go jê ra: Çi? e haqî; vîa ko go,

²⁹⁹ Di metnê de *qapucî* (nîşeya *wergêrê*).

dîsa li ber ket ji Yehûdîan ra, û go ji wan ra: ez qabhatkî nabînim li ser wî. ³⁹ Hama adetê we e ko li bayram da yekê ji we ra berdim; a nua dixwazin? ko padîşahê Yehûdîan ji we ra berdim. ⁴⁰ Hemîan jî bi qîrînê gon: Awî bermede, lê Barabayê û aw Baraba haramîkî bû.

SER 19

¹ Wê çaxê Pîlados girt Îsa, û kuta awî. ² Nua asker ji istirîan tackî çêkirin, li serê wî danîn, û jê ra xîlatkî dane wergirtin. ³ Û digotibûn: Selam ji ta ra ey! padîşahê Yehûdîan û jê ra sîleyan lê dixisdibûn. ⁴ Pîlados dîsa li der rabû, û go ji wan ra: Va ha awî ji we ra li der tînim, ko bizanin erki li ser wî ez cûrmkî nabînim. ⁵ Îsa li der rabû, û tacê istirîan û xîlat cilê wî hebû, û go ji wan ra: Va ha aw meruv. ⁶ Nua baş îmaman û xizmetkâran gava ko awî dîn, dengê [268] xo helanîn û gon: Li xaçê derîne, li xaçê derîne awî. Pîlados ji wan ra go: awî hûn bigirin, û li xaçê derînin, çima ko ez cûrmkî li wî da nabînim. ⁷ Yehûdîan cewab dan jê ra, nomosê me heye li göra nomosê me lazim e ko bimre; çima ko aw ko kurê Xodê kir. ⁸ Gava ko Pîlados xaberê han bihîsd hênî pîr tîrsîa, dîsa li sarayê ket û go ji Îsa ra. ⁹ Tu ji kuy?; lakîn Îsa jê ra cewabkî neda. ¹⁰ Go jê ra Pîlados: bi mi ra xaber nadi?; tu nizanî? ko hökmê min heye ta li xaçê biderînim, û hökmê min heye ta berdanê. ¹¹ Îsa cewab da: Li ser min qat hökmatê ta dê nebana, erki ji jor da ji ta ra nehatiba dayin; ji boy vîa, aw ko ez ji ta ra teslîm kir, güneyê wî hênî pîr mezin e. ¹² Hênî ji wê pê va Pîlados dixosdibû awî berde, lakîn Yehûdîan bi qîrînê digotibûn: erki awî berdî, tu dosta qayserê nin î, her kî ko aw xo padîşah dike, aw ziddê qayser e. ¹³ Nua gava ko sözê han bihîsd fîlados, li der xisd Îsayê, û döşümayê qevirê ko bi Îbranîyê gabata hati gotan cîyê li li ser kürsîyê şerîatê da ronişd. ¹⁴ Roya î'nê pasehê bû, û saat wexta şeşan da bû, û ji Yehûdîan ra go: Va ha padîşahê we ji we ra. ¹⁵ Û wan diqîrabûn ji nav me da helîne awî, helîne awî, û li xaçê derîne awî, Pîlados ji wan ra go: Ez padîşahê? we dê li xaçê derînim, baş îmaman cewab dan ji qayserê başqa padîşahê me tunne. ¹⁶ Wê çaxê awî li destê wan da, ko li xaçê rabe.

¹⁷ Wan jî girtin awî dibribûn, û xaçê xo awî helanîbû, û wusan radibobû li aw cî ko tê gotan, Qaf, ko bi Îbranîyê Golgota [269] dihatibû gotan; ¹⁸ Li wê awî li xaçê deranîn; û pê ra başqa didoyan jî, yekê ji yek alîyê û awê dîn ji yek alîyê, û li ortayê Îsa. ¹⁹ Û taxtakî jî nivîsand Pîlados, û danî li ser xaçê; û PADÎŞAHÊ YEHUDÎAN ÎSAYÊ NASRANÎ, hatibû nivîsandin. ²⁰ Nua yaftayê han ji Yehûdîan pîran xondin;

çima ko aw cî li nêza bajêr bû li ko kî Îsa hati xaç kirin; û bi Îbranîyê, û bi Rumanîyê hatibû nivîsandin. ²¹ Nua baş îmamê Yehûdîan ji Pîlados ra gon: Menivîs padîşahê Yehûdîan, lê binivîs ko aw go ez padîşahê Yehûdîan im. ²² Pîlados cewab da, Mi çi ko nivîsand nivîsand.

²³ Hama askeran gava ko Îsaê li xaçê deranîn, cilê wî send çar hîsse kirin, ji her yek asker ra paykî; û xaftanê wî jî send; çima ko ji jor da hata li jêr, bê dirûtin bû hûnayî. ²⁴ Gon ji hev û du ra avî em neqatînin, lê qura em bavêjin li wî ji kê ra ko derkeve; ko tamam bibe aw nivîsandin: Cilê min li nav xo da pay kirin, û li ser xaftanê min qura avêtin, askeran tiştê han kirin.

²⁵ Ê li ba xaçê Îsa sekinîbûn dîya wî; û xuşka dîya wî Meyremê, jina Klafasê û Meyremê Magdalînî. ²⁶ Gava ko Îsa dîya xo dî, û aw şagird ko diheband ko nêza wî sekinîbû, go ji dîyê xo ra, Ey! jin, va ha kurê ta. ²⁷ Paşê go ji şagirdan ra, Va ha dîya ta, û ji wê saatê aw şagird awî li mala xo send.

²⁸ Ji vê pê va gava ko Îsa zanî erki va ha her tişt tekîl e, ko aw nivîs jî tekîl bibe, go: Ez tî me. ²⁹ Nua li wê fraqkî bi sîrke tîja hebû, û wan jî sîngarkî bi sîrke tîji kirin; li ser qamişkî lefandî, û drêj kirin [270] alîyê deva wî. ³⁰ Nua gava ko Îsa sîrkeyê send, go: Her tişt tekîl bû, û serê xo bi xwar kirinê canê xo teslîm kir.

³¹ Nua Yehûdîan, çûnkî roya îne bû, ko aw gövdan nebe ko li ser xaçê bimînî hata roya şemûyê, çima ko aw şemû, rokî mezin bû, ji Pîlados ra lava kirin ko çoka wan bişikînin û bîn helandin. ³² Askeran hatin çokê awulî şikênandin û wusan jî ê awê din, ko pê ra li xaçê rabobû. ³³ Hama gava ko ji Îsa ra hatin, û dîn ko ji xo mirîbobû, çoka wî neşikênadin. ³⁴ Lakî ji askeran yekê rîma xo çikand li tenîşda wî, û zû va xuyn û av rabû. ³⁵ Ê aw ko dî tiştê³⁰⁰ hanan, şehadet kir û şehadetîyê wî rasd e, û awî dizani ko rasd dêje; ko hûn jî îman bînin. ³⁶ Tiştê han bû ko tamam bibe kitêb, erki astîyê wî dê neyê şikandin. ³⁷ Ê dîsa başqa kitêb dêje: dê binihêrî jê ra ko awî brîndar kirin.

³⁸ Ji vê pê va Yûsîf, ko ji Arîmatê bû, bi dizîka şagirdê Îsa bû ji tîrsa Yehûdîan, dîleg kir ji Pîladosê, ko gövdeyê Îsayê bihelîne, Pîlados jî emr kir, hat û helanî awî. ³⁹ Hem Nîgotîmos jî hat ko awî li şevê da awul ji Îsa ra hatibû, û anî qasa sad liîran zmur bi öd ra tevkirî. ⁴⁰ Nua gövdeyê Îsayê sendin û bi cawan û bi bixûran lefandin, çawan ko adetê Yehûdîan bû kefen kirinê. ⁴¹ Ê li wê derê li ko kî hatibû xaç

³⁰⁰ Di metnê de *tiştê* (nîşeya wergêrê).

kirin, baḫçakî hebû, û li nav aw baḫçayê tirbkî no hebû, ko li nava ê kê qat yekê nedanîbûn. ⁴² Nua ji boy îne Yehûdîan li wê danîn Îsayê, çima ko tirb nêz bû.

[271] SER 20

¹ Û li roya awulê haftê, hêja tarî, li serê sibê da Meyremê Magdalînî li tirbê hat, û dî ko kevir ji derîyê tirbê hatibû helanîn. ² Paşê dibazi tê ji Şimhûn Petros ra û ji aw şagirdê din ra, aw ko Îsa diheband, û dêje ji wan ra: Rabb ji tirbê helanîn, û em nizanin li ko danîn awî. ³ Rabû Petros û aw şagirdê din û li alîyê tirbê dihatibûn. ⁴ Herduyan jî tev dizanîbûn; û aw şagirdê din; bazîa zû ket li pêş Petrosê; û awul li tirbê hat. ⁵ Û nizm bû dî ko çarşafan li wê disekinîbûn; lakîn aw li hindur neket. ⁶ Şimhûn Petros jî gihîşt, ko li pey wî dihat, û li tirbê ket, û dî ko çarşafan li wê disekinîbûn. ⁷ Û aw dismal ko li serê wî da bû; bi tevî çarşafan da nebû lê hati lefandin cîyê li yek alîkî hatibû daînin. ⁸ Wê çaxê li hindur ket aw şagirdê din jî, ko awul li tirbê hatibû, dî û îman anî. ⁹ Çima ko hêja kitêban nedizanibûn; erki lazim e jê ra mirîan qiyam ke. ¹⁰ Nua şagirdan dîsa li cîyê xo çûn.

¹¹ Hama Meyrem li ba tirbê li derve sekinîbû, û digrîabû, nua gava ko aw digrîabû li nav tirbê nihêrt. ¹² Û dî du melean bi cilê sipî, ko ronîşdîbûn, li aw cî ko gövda Îsa hatibû danîn, yek ji alîyê serî, û yek jî ji alîyê lingan. ¹³ Û wan jê ra gon: Ey! jin çima? digirî; go ji wan ra boy awî ko efendiyê min ji tirbê helanîn, û nizamim li ko danîn awî. ¹⁴ Û gava ko wanan go bi şûnda [272] vegeîa û dî Îsa ko disekinîbû, û nedizanibû ko Îsa e. ¹⁵ Îsa go jê ra: Ya! jin çima digirî li kê digirî. Awî taxmîn kir ko baḫçawan e, go jê ra: Ya!³⁰¹ efendî; erki ta awî helanî bêje ji mi ra, li ko ta danî awî, ko ez awî bistînim. ¹⁶ Îsa jê ra go, Ya! Meyrem; wî jî vegeîa û bi Îbranî go jê ra: Rabî, ko xoca tercûme dibe. ¹⁷ Îsa go jê ra: Li min mekev; çima ko hêja li ba Bavê xo nerabûme, lê here ji brêyê mi ra, û bêje ji wan ra: Ez ji bavê xo ra û ji Bavê we ra û Xodêyê xo ra û ji Xodêyê we ra rasd bim. ¹⁸ Meyremê Magdalînî hat û ji şagirdan ra xaber da, erki awî Rabîyê dî; û jê ra tiştê hana go. ¹⁹ Nua li wê royê, li roya awulê haftê gava ko êvar bû, derîan jî qufilandî bûn li ko kî şagirdan ji tirsê Yehûdîan li yek cî hatibûn civandin; Îsa hat û li nav wan da sekinî û go ji wan ra: Selam ji we ra. ²⁰ Vîa kî go, dest û parsûê xo ji wan ra nşan da; şagirdan şaz bûn gava ko Rabîyê dîn. ²¹ Îsa dîsa go ji wan ra: Selam ji we ra; çawan ko Bavê min mi şîand, e jî we dişeyînim.

³⁰¹ Di metnê de Ya?.

22 Û vîa ko go pif kir ji wan ƣa û go: Rûh el Qudsê bistînin; erki güneyê yekê awf bikin, ji wan ƣa bê afw bûn. 23 Û erki ê yekê şûnda bigirin; bê girtin.

24 Hama Tûma ji dwanzdahan yekê, ko Cêwî dihatibû gotan, bi wan ƣa nebû, gava ko Îsa hat. 25 Aw şagirdê dinan digotibûn jê ƣa, erki me Rabîyê dîn; wî jî go ji wan ƣa: Erki li ser destê wî nşanê perçîman nebînim, û pêçîyê xo li cîyê perçîman neçikînim, û destê xo li parsûê wî neçikînim, qat bawur nakim.

[273] 26 Û li paşê haşt ƣoyan şagirdan dîsa li hindur da bûn, Tûma jî bi wan ƣa; hati Îsa gava ko derîan qufilî bûn, û sekinî li orta wan û go: Selam ji we ƣa. 27 Paşê go ji Tûma ƣa; pêçîyê xo li vir bîne, û mêze ke destê min, û pêçîyê xo bîne livir û destê min mêze ke; û destê xo bîne li parsûê min biçikîne îmansiz mebe, lê bi îman be. 28 Cewab da Tûma û go jê ƣa: Xodê û Allahê min. 29 Îsa go jê ƣa: Aw ko ƣa ez dîm û îman anî, xozî ji wan ƣa ko nedîne û dê îman bînin.

30 Nua Îsa li ber şagirdan başqa pîr keremetan kir, ko li kitêbê han da nivîsandin nin e. 31 Hama vîa, aw qas tişt hati nivîsandin, ko îman bînin erki Îsa, Mesîh Ƙurê Xodê e, hata ko bi îman aninê, bi navê wî ji hayat ƣa malîk bibin.

SER 21

1 Ji vê pê va Îsa dîsa aw ko ji şagirdê xo ƣa beyan kir li ser bahrê Tîberîyê, û ahwa beyan kir. 2 Li tev bûn Şimhûn Petros, û Tûma hati cêwî gotan, û Natanayel, ko ji Ƙana ji bajêrê Celîlê bû, û ƣurê Zebdîyê, û ji şagirdan didoyan jî. 3 Şimhûn Petros go ji wan ƣa: Ez diçum saydê mahsîan; gon jê ƣa: Em jî tîen bi ƣa ƣa, çûn û ketin li gemîyê; û li wê şevê tiştî negirtin. 4 Û gava ko sibê bû Îsa li kenarê bahrê disekinîbû; hama şagirdan nas nekirin erki Îsa e. 5 Îsa go ji wan ƣa: Gelê zarûkan tiştî xwarinê we heye, cewab dan jê ƣa û gon: Ná. 6 Go ji wan ƣa, Torê xo li alîyê ƣasdê gemîyê bavên [274] û dê bibînin; avêtin, ji zahfîyê mahsîan nedikâribûn kşandinê. 7 Aw şagirda ko awî Îsa diheband, go ji Petros ƣa: Av Rabb e; Şimhûn Petros gava ko bihîsd erki Rabb e, pêştimal li xo lefand çima ko ƣahzî bû, û aw xo li bahrê avêt. 8 Û aw şagirdê dinan bi gemîyê dihatibûn; çima ko ji zwayîyê dîr nebûn, ancax qasa du sed halabîyê, û torê bi mahsîan dikşandibûn. 9 Û gava ko li zwayîyê ƣabûn, li wê hati danîn közkî, û li ser wî hati danîn³⁰² mahsîkî û nan dîn. 10 Îsa ji wan ƣa go: Bînin ji aw mahsîan ko hûn nua girtin. 11 Şimhûn Petros ƣabû, û torê li zwayî

³⁰² Di metnê de *daiîn*.

da dikşad, bi sed û pêncê û sisê bi mahsîyê mezinan tîja; û aw qas tîşt hebû û tor neqatîa Îsa go ji wan ra: ¹² Wêrin tîştîyê bixun, hama ji şagirdan qat yekê cesaret nedikir pîrs kirinê, erki tu kî? î, çima ko fehm dikiribûn erki aw Rabb e. ¹³ Nua Îsa hat û nanê girt û da ji wan ra; wusan jî mahsî. ¹⁴ Vîa hala cara sisêyan e ko Îsa şagirdan ra xuyayî bû ji paşê ji mirîan qiyam kirinê. ¹⁵ Û gava ko tîştîyê kirin, Îsa go ji Şimhûn Petros ra; Ey! Şimhûn kure Yûnan tu mi ji av hemîan pêtir dihebînî?; wî go ji wî ra: Belî ya! Rabb, tu jî zanî ko ta dihebînim, go jê ra: Biçêrîne berkikê min. ¹⁶ Dîsa go jê ra: Ey Şimhûn kure Yûnan, tu mi dihebînî? go jê ra: Belî ya! Rabb, tu jî zanî ko ta dihebînim; go jê ra: Biçêrîne pezet min. ¹⁷ Go jê ra cara sisêyan: Ey! Şimhûn kure Yûnan, tu mi dihebînî? Petros bi qasawet bû, ji boy awî ko sê caran jê ra go, tu mi dihebînî?, û go jê ra: Ya! Rabb tu her tîşt [275] dizanî, û tu zanî ko ez ta dihebînim Îsa, go peze min biçêrîne. ¹⁸ Bîra bîra dibêm ji ta ra, gava ko tu gênc bûyî, tu ji xo ra pişt grêdidabûy û diçoybûy li ko kî dixosdibûy: hama wexta îxtîarîtîyê, tu destê xo dê li bilind bigrî û başqasîan dê ji ta ra pişt grêdin û dê bibin ta li ko kî nexwazî. ¹⁹ Vîa go, bi beyan kirinê erki awî bi çi mirinê dê Xodê bi îzzet ke; û gava ko ava xaber da go jê ra, Li pey min wêre. ²⁰ Û Petros vegeîa û dî aw şagird ko Îsa diheband ko li pey wî diçobû; ko awî li ser sînga wî ketibû, û gotibû: Ya! Rabb aw kî? e ko dê ta nebû bike. ²¹ Petros wîa bi dîtînê go ji Îsa ra: Ya! Rabb lê vîa dê çi bike. ²² Û Îsa go jê ra: Erki ez bixwazim ko awî bimîne hata ko ez bêm, ji ta? ra çi tu li pey min wêre. ²³ Nua sôza han li nav brêyan rabû, û wan şibandî ko aw şagird hênî dê nemire, lakîn Îsa jê ra nego erki dê nemire, lê erki ez bixwazim ko awî bimîne hata ko ez bêm, ji ta ra çi.

²⁴ Vîa aw şagird e ko şehadet dike li ser tîştê hana ko nivîsand jî tîştê hana, û em dizanin ko şehadetîyê wî rasd e. ²⁵ Hama hênî pîr tîşt jî hene, ko Îsa kir, ko erki awan yeka yek bi hata nivîsandin, aw hati nivîsandin kitêban taxmîn dikim dinê jî bas nebû li ê kê çûndin ra.

[276]



ŞİXULÊ RESÛLAN

SER 1

¹ Naqlîyetê awulîn ko mi kir, ya Teopîlos, li ser aw hemî tiştan ko Mesîh dest kir kirinê û hîn kirinê. ² Hata aw ro ko bi destê Rûh el Quds wasî kir ji bijartî resûlê xo ra û li jor hati helandin. ³ Ko aw xo ji wan ra sax nîşan da, li paşê elem kşandinê xo bi pîr îsbatan, li nav çil royan ji wan ra bi xuyayinê, û li ser padîşahîtiyê Xodê bi xaber dan. ⁴ Ê gava ko bi wan ra dihati civandin ji wan ra digoti ko ji Qudsê dîr meçûn, lê bipên wadê Bav, aw ko ji min bihîsdin. ⁵ Çima ko bîra Hanna Hanna bi av tahfil kir, hama hûn li paşê av çend royan dê bi Rûh el Quds tahfil bibin. ⁶ Nua wan li yek cî bi civandinê jê pîrs dikiribûn û digotibûn, Ya! Rabb, padîşahîtiyê Îsrayel li wexta han? da dê şûnda bidî. ⁷ Ê ji wan ra go, ji we ra naqeve zanin aw wext û zemanan aw ko Bav linav hokmata xo danî. ⁸ Hama Rûh el Quds gava ko li ser we bê quwet dê bistînin, ji boy min şahîdan dê bibin li Qudsê û li nava hemî Yehûdîstan û li nav Samarî û hata li para diê. ⁹ Ê gava ko av tiştan go, li jor hati helandin wan bi nihêrtinê, û ji ber çahvet [278] wan awî awurkî send. ¹⁰ Ê çi qas ko wan çahvê xo bi bilind kirinê li azümanan dinihêrt li ser çûndinê wî va ha du meruv li ba wan sekinîn bi cilê sipî. ¹¹ Hem jî gon, ey! celîlî çima? hûn sekinî li azümanan dinihêrin; aw Mesîh ko ji wê li azümanan hati helandin; wusan dê bê çawan ko we di çûndinê wî li azümanan. ¹² Wê çaxê li Qudsê vegeŕian ji zeytûnî hati gotan çiyê, ko li qasa rêê roya şemûê nêzê Qudsê e. ¹³ Ê gava ko li bajêr ketin, rabûn li çardaxê jorîn li ko kî sakîn dibobû, Petros û Yaqûb, Hanna û Anŕîas Fîlîbbos û Tomas, Bartûlîmeos û Madteos, Yaqûb Alfian, û Şimhûnê xeletos, û brêy Yaqûbê Cûda. ¹⁴ Avanan hemî bi yek dil bûnê cimet û dîleg dikiribûn dayîma bi jinan û bi dîe Mesîh bi Meyrem ra û bi brêyê wî tev.

¹⁵ Ê wan royan da rabû Betros li nav şagirdan, li ko kî qasa sed û bist ten hati civandin qalaba hebûn, û go: ¹⁶ Ey! cömer brêyan lazim bû ko tekmlî bibe nivîsê han aw ko Rûh el Quds ji awul go bi devê Dawûd ji boy Cûda, ko Mesîh grtoşan ra qalawuz bû. ¹⁷ Zîra aw ji hasabê me bû û nasîbê xizmetê han sendibû. ¹⁸ Nua aw ji nihaq ücretê zevîkî qazanc kir, û li ser serê bi ketinê ji nav da şeqya, û rûdîe wî gişk li der hati rijandin. ¹⁹ Ê tiştê han ji hemî li Qudsê sekînan ra malûm bû, hata ko zevîe

han bi zimanê wan Akeldama, yanî zevîê xuynê hati gotan. ²⁰ Zîra li kitêbê Zebûr da hati nivîsandin ko meskânê wî xarab bibê, û li wî da yekî nebe ko sakîn bibe, û xizmetê wî başxakî bis- [279] tîne. ²¹ Nua lazim e ko ji aw merûvan ko mi ra bûn li aw hemî zemana ko Rabb Mesîh li nav me da ket û rabû; ²² Ji dest kirinê tahfîlê Hanna hata li aw ro, ko li jor hati helandin; ji avanan yekî bi mer ra şahîdê qiyamê wî bibe. ²³ Ê du merûvan sekinadin, Yûsîf kî Parsapas dihati gotan, ko Hûsdos jî laxab tî kiribû, û Madatîa. ²⁴ Ê bi nimêc kirinê gotin, Tu ya! qalbê hemîan zanox Rabb, ji av herduyan yekî ko ta bijart, ji me ra malûm bike; ²⁵ Hata ko nasîbê xizmetê han û resûlîtyê bistîne; ko jê Cûda ket li cîyê xo biço. ²⁶ Ê ji boy wan qura avêtin, û qura ji Madatîa ra rabû; û aw bi yanzdah resûlan hasab bû.

SER 2

¹ Ê gava ko roya Bendegosdê hat, hemî jî bi yek dil li yek cî da bûn. ² Ê xafil ji azûmanan dengê bû, weka sawnda bakî bi zor, û mal gişk tja kir, li ko kî ronîşdî bûn. ³ Ê ji wan ra cihê bûn zimanan xuyayî bûn mîna agirî, û li ser her yekê wan ronîşt. ⁴ Ê hemî jî bi Rûh el Quds tja bûn, û dest kirin bi başxa zimanan xaber dan, çawan ko Rûh ji wan ra ji xaber dan ra qudret dida. ⁵ Ê li Qudsê sakîn bûn Yehûdîan hebûn, bi îtîqat merûvan, li bin azûmanan ji hemî mîlletan hatin civandin. ⁶ Ê gava ko dengê han bû, xalq hemî bi civandinê mat dimabûn, zîra her yek ji zimanê xo xaber dan ji wan dibihîstibûn. ⁷ Nua hemî şaş dibobûn û tacûb dikiribûn û ji hev û du ra digoti- [280] bûn, na? kî awan hemî jî xaber didin celîlî nin. ⁸ Ê çawan? em dibihîsin her yek bi zimanê xo, ko li wî da em zane. ⁹ Parîsîan, û Maran; û Yexamîan û wan ko sakîn dibin li nav Mîçaqedê û li Yehûdîstanê û li Gabatowgîayê; ¹⁰ Li Bondosê û li Asîaê û li Pürîkîaê, li Bampûlîaê, li Misîrê, û li nêza gürenê li semta Lîpean, hem jî mîsafîr romalîan; ¹¹ Erki Yehûdîan erki Dönmean, Gîrîtlîan û Araban, em dibihîsin ji wanan ko bi zimanê me xaber didin mezin tîştê Xodê. ¹² Nua hemî jî bi şaş bûnê û bi tacûb bûnê ji hev û du ra digotibûn: Acaba vîa dê çi? bibe. ¹³ Hinikan jî bi masqara kirinê digotibûn, ko van bi şîreê nû tja bûne.

¹⁴ Hama Petros bi yanzdahan yek cî rabû, dengê xo helanî û xaber da, Ey! Yehûdî merûvan û hûn hemîan ko li Qudsê sakîn dibin, vîa mahlûmê wê bibe, û godarî bikin sözê min. ¹⁵ Zîra vanan weka taxmîna wê serxoş nin in, çima ko hêja üçuncî saatê ro e; ¹⁶ Lê vîa aw e ko ji Howel peyember hati gotan: ¹⁷ Ê dê bibe ko li axir zeman da dibê Xodê, li ser hemî tenan ji Rûhê xo dê birîjim û kureş wê û qîzê

wé dê peyemberîtî bikin, xortê wé dîtinan dê bibînin û îxtîyarê wé dê xewan bibînin; ¹⁸ Ê li aw royan da li ser xulamêt xo û li ser qarwaşêt xo ezê ji Rûhêt xo dê birijim, û dê peyemberîtî bikin. ¹⁹ Ê li jor li azüman da hökmetan û li jer li ardê alamatan, xuyn û agir û dümanê dû dê bidim; ²⁰ Ro dê li tarî û hîv dê li xuyn tebdîl bibe, hêja roê mezin ê Xoyî nehatin. ²¹ Ê dê bibe ko her kî ko navê Xodê gazî bike dê xelas bibe. ²² Ya! meruvê **[281]** Îsrayel godarî bikin xaberêt hanan, Mesîhê Nasranî ji Xodê ji we ra hati nşan dayin meruvkî bi quwetan û bi hökmetan û bi alamatan, ko Xodê bi destê wî li nav wé da kir, çawan ko hûn jî zanin. ²³ Bi taqrîr bûn tedbîrê Xodê ji awul bi zani bûnê awî bi dest dayinê wé send û bi destê bînamûsan li ser darê bi mix kirinê wé kuşt; ²⁴ Awî ko Xodê sax kir, hêşa mirinê bi vekirandinê; zîra bê mümkün bû wî ji awî bê girtin. ²⁵ Çima ko Dawûd ji boy wî dibê, ji awul dayîma Xodê li ber mi mi didîti wî, zîra li alî saxê mi da e, ko nelibitim. ²⁶ Ji boy wî dilê mi şaz bû û zimanê min kenî, û tenê mi jî bi umud dê rahat bibe. ²⁷ Çima ko canê min dê li cehnem da terg nakî, û ji azîzê xo ra çuruklik dê nedî dîtin. ²⁸ Ji mi ra rêyêt hayatê ta da nas kirin, bi tava rûyêt xo tu mi dê tîji bikî. ²⁹ Ey! birêyan cayîz e ji we ra ji boy Dawûd Nahabedê gotin ko mir û defn bû, û tîrbê wî hata roya hana li nav me da e. ³⁰ Nua aw peyember bû û dizanibû ko Xodê qawî sond kir jê ra; ji meyweyê piştî wî ji alîyê ten Îsayê dê rake ko li taxta wî ronî; ³¹ Vîa ji awul bi zanibûnê ji ser haqê qiyamê Îsa go, ko canê wî li cehnem da nehîşt û tenê wî çuruglik nedî. ³² Mesîhê han Xodê sax kir, ko derhaqê wî em hemî jî şahîd in. ³³ Nua bi destê Xodê rasd bi bilind bûnê û ji Bav wada Rûh el Quds bi sendinê rijand, awî ko hûn nua dibînin û dibihîsin. ³⁴ Çima ko Dawûd li azümanan ra nebû; hama aw dibê, Xodê ji Xodê mi ra go, li alîê saxa mi da ronî, ³⁵ Hata ko dijminê ta li pêla linga ta deynim. ³⁶ Nua hemî mala **[282]** Îsrayel sahîh bra bizane ko Xodê awî Rabb jî û Îsa kir, aw Mesîh ko xaç kir.

³⁷ Ê aw ko bihîsdin li dilê xo da poşman bûn; û gon ji Petros ra û ji aw din resûlan ra: Ey meruv brêan, em çi? bikin. ³⁸ Ê Petros ji wan ra go: Toba bikin, û ji wé her yek bra tahfil bibe bi navê Mesîhê Îsa, ji boy awfitîê günean û baxşîşê Rûh el Quds dê bistînin. ³⁹ Çima ko wad ji we ra, û ji ewledê we ra e û ji aw hemî dîr bûnoşan ra awan ko Xoyî û Xodê me dê gazî ke. ⁴⁰ Ê bi başxa pîr sözan şehadet dida, û nasîhat dikir wan û digot, ji ters neslê han hûn xo xelas bikin.

⁴¹ Nua sözê wî bi şazîtî qabûl kroşan, tahfil bûn; û aw ro qasa sê hazar meruvan zêde bûn. ⁴² Ê dayîma li pey talîmê û îlhaqîtiê û nan parça kirinê û nimêcê

resûlan bûn. ⁴³ Û li ser hemî merûvan tirs ket; hem destê Resûlan pîr hokmetan û alametan îcra dibobûn. ⁴⁴ Û hemî îman anoxan li yek cî da dibûn, û hemî tiştê wan li nav wan da misêwî bû. ⁴⁵ Û mülk û warîyetê xo hemî difrotibûn ji her yekê ra ji görê mühtacê wî taxsîm dikiribûn. ⁴⁶ Û her ro bi yek dil li pey çûndinê dacarê bobûn, û li malan da nanê xo parçe dikiribûn û nanê xo dixwaribûn bi şazîtî û bi sade dil. ⁴⁷ Ji Xodê ra şirik dikiribûn û li ber hemî qawman kerem didîtibûn, û Xodê her ro xelas bûoxan zêde dikir li kîlîsayê.

SER 3

¹ Nua Petros û Hanna tev wexta nimêcê saat li nehan da li dacarê radibobûn. ² Û ji [283] rahma dîyê xo topal za merûvkî dianibû awî her ro li ber derîê Rîndê dacar didanîbûn, ko ji dacarê hindur çûndoxan sadaqa dîleg bike. ³ Wîa bi dîtîne Petros û Hannaê gava ko ji dacarê hindur diçobûn, ji boy sadaqa sendinê lava dikir. ⁴ Nua Petros bi Hanna ra tev li wî nihêrtin û go, ji mer a meze ke; ⁵ Wî jî li wan vegeîa, û umud dikir ji wan tiştê bistîne. ⁶ Û Petros go, zîv û zêrê min tunne, lê çi ko min heye, awî bidim ji ta ra, bi navê Îsa el Mesîhê Nasranî rabe û biger. ⁷ Û ji destê rastê wî girt û awî bilind kir û tevl daban û gûzakê lingê wî şidîa. ⁸ Û li ser xo rabû sekinî, û digerîa û bi wan ra ket li dacarê, diçobû û dibezbezîbû û Xodê mübarek dikir. ⁹ Û xalq gişk dîtîne wî ko digerîa û Xodê mübarek dikir. ¹⁰ Û nas dikiribûn awî ko ji boy sadaqayê li ber derîê dacarê Rînd hati gotan dironîştîbû, bi tacûb tîji bûn li ser aw hokmat ko bû. ¹¹ Û çi qas ko aw bi Petros û bi Hanna ra bû, û xalq hemî bi tacûb kirinê top bûn li cem wan li aw cî ko qubeê Süleyman dihati gotan.

¹² Û gava ko Petros dî, cewab da ji xalqê ra; Ey! merûvê Îsrayêl, çima? hûn mat mane li ser vîa, yaxod çima? çahvê wê bi sar bûnê li me dinihêrin, saykî em bi quwet û bi dîndarîtîê xo ji wî ra çûndin send. ¹³ Xodê Îbrahîmê û Yaqûbê û Îshaqê, kurê xo Mesîhê îzzet kir; awî ko hûn dest dani, li ber Pîladosê we înkâr kir, gava ko aw sîcîl kir ko berde. ¹⁴ Hama hûn aw azîzê û Sadîqê înkâr kirin û wê dîleg kir ko yekî qabûl ji we ra baxş bike. [284] ¹⁵ Hama hûn serwerê Hayatê kuştîne ko Xodê wî ji mirîan qiyam kir, ko em şahîdê wî ne. ¹⁶ Û bi aw îman ko bi navê wî e, navê wî qawî kir vîa, ko hûn dibînin û zanin, û aw îman ko bi awî e li ber we hemîan saxîtîe han da jê ra. ¹⁷ Û nua, ey! brêyan, ez zanim ko weka Hükümdarê xo hûn jî bi nazanîtî kirin. ¹⁸ Hama Xodê çi ko awul bi devê peyemberê xo beyan kiribû ji boy ezîyet kişandinê Îsa va ha tekmîl kir.

19 Nua toba bikin û begerin ko güneyê wê paqij bibin. 20 Hata ko ji ber Xodê zemana rahatîê bîn, û ji we ra awul hati mûjde bîn, Îsa el Mesîhê bişeyîne. 21 Ko awî lazim e ko azümanan qabûl bikin hata aw zemanan ko hemî tiştan îcra bibin, ji boy wanan ko Xodê ji îbtîdayê bi devê azîz peyemberê gotîa. 22 Mûsa ji bavanê me ra go ko, Xoyî û Xodê wê ji brêyê weka min peyemberkî dê biderxe ji we ra, jê ra godarî bikin, hemî çi ko ji we ra xaber bide. 23 Û dê bibe hemî kî ko ji aw peyember ra godarî neke, ji nav qawmê helak dê bibe. 24 Û peyemberan gişk ji Şemûelê jor xaber dan, ji boy royê hanan ji xaber kirin. 25 Hûn ji kurê peyemberê han û ahdê han; ko Xodê bi bavê me kir; û go ji Îbrahîm ra, û bi zürîyetê ta mübarek bin hemî mîlletê ardê. 26 Xodê kurê xo sax kir awul ji we ra şîand awî ko wê mübarek ke her yekê ji yaramazîyê wê vegeîne.

[285] SER 4

1 Û gava ko wan bi qawmê xaber didan, îmaman û serdarê dacarê û sadûqîan li ser wan gihîşdin. 2 Çûnkî ji boy xalqê ra talîm kirinê wan û bi Mesîhê ji mirîan qiyam kirinê xaber dayinê wan çetinê wan hat. 3 Û dest vêtin wan û dani wan li hapsê hata li aw royê din, çima ko hênî êvar bû. 4 Hama ji aw xaberê bihîsdoxan pîran îman anîn, û nufûsê merûvan qasa pênc hazaran bû.

5 Û bû kî li aw roya din li yek cî hatin civandin hûkûmdarê wan û îxtîar û kâtîban li nava Qudsê. 6 Hem baş îmam Hana û Qayîafa û Yûhanna; û Aleksandr û aw hemîan ko ji neslê baş îmaman bûn. 7 Û wan li ortayê bi sekinandinê, pîrs dikiribûn, hûn tiştê han bi quwetê û bi kîjan navê wê kir. 8 Û wê çaxê Petros bi Rûh el Quds tîja bûnê go ji wan ra: ey! hûkmdarê qawmê û îxtîarê Îsrayêlê. 9 Erki em ji boy aw qancîtî ko bû ji merûvkî naxoş ra îro teftîş dibin, erki bi çi? xelas bû awî; 10 Malûmê wê hemîan bibe, û ji qawmê Îsrayêlê, ko bi navê Îsa el Mesîhê Nasranî, aw ko wê xaç kir û aw ko Xodê ji mirîan qiyam kir; va ha bi awî vîa li ber we sax sekinî. 11 Vîa ji we yapîcîan redd bûn kevîr e, ko aw serîê rûknê dîwar bû. 12 Û qat bi başxa keskî ra xelas tunne, çima ko ji awî başxa navkî li bin azümanan néhati dayin ji merûvan ko bi awî em qadîr bibin xelas bûn.

13 Hama wan li cesaretê Petrosê û Hannayê bi dîtine û naxonidan û cahîl merûv bûnê [286] wan bi fehm kirinê; mat dimabûn, hem bi Mesîh ra bûnê wan nas dikiribûn. 14 Û aw sax bûn merûv bi dîtîne ko bi wan ra sekinîbû, nedikarîbûn ji wan ra qarşî tiştî gotinê. 15 Û ji wan ra bi emr kirinê, ko ji civatê derkevin, û bi hevûdu

şêwir kirin. ¹⁶ Û gon, Em çi? bikin ji av merûvan ra, çima ko li Qudsê ji hemî sakînan ra malûm e ko, bi destê wan mucûzatî mezin bû, û em nikarin inkâr bikin. ¹⁷ Lakîn li nav xalqê ji boy hênî pîr bela nebûnê, ji wan ra tîrskî zor em bidin, ko bi av nav carkî jî nebe ko ji merûv ra xaber bidin. ¹⁸ Û wan bi gazî kirinê tenbîh kirin ji wan ra, ko qat bi navê Mesîh xaber nedin û hîn nekin. ¹⁹ Hama Petros û Hanna cewab dan ji wan ra û gon: erki haq e li ber Xodê ji we ra ji Xodê zêde godarî bikin, hûn hûkim bikin. ²⁰ Çima ko em aw ko me dîn û bihîsdin nikarin xaber nedin. ²¹ Hama wan dîsa paşê tîrs dayinê berdan wan; tiştî nedîn erki çawan azab bidin ji wan ra ji semedê xalqê, zîra hemî jî ji Xodê ra şîkr dikiribûn ji boy aw tişt ko bû. ²² Zîra aw merûv ji çil salan zêde bû; li ser aw ko mucûzatê şîfayê han bû.

²³ Û ji wê bi hati berdanê hatin li havalê xo û xaber dan çi ko baş îmaman û îxtîaran ji wan ra gon. ²⁴ Û wan jî gava ko bihîsdin tev dengê xo ji Xodê ra helanîn û gon: Ya! Xodê tu î aw Xodê ko azûmanan û ardê û bahrê û aw hemî ko li nav wan da ne ta xalq kir; ²⁵ Ko bi debê qulê Dawûdê ta go; Çima? tayîfan har bûn û qawman tiştê boş dîşûmîş bûn. ²⁶ Padîşahê dinê hazir sekinîn û hûkmdaran li [287] yek cî cem bûn qarşî Xodê û Mesîhê wî. ²⁷ Bîra li bajêrê han cem bûn li ser azîz Kûrêta Mesîhê, awî ko ta mesh kir, Hîrodîs û Bondoslu Pîlados bi mîletan tev û bi qawmê Îsrayêl, ²⁸ Bikin çi ko destê ta û meramê ta ji awul taqdir kirin bibe. ²⁹ Û nua binêr, ya Rabb, li tîrs dayinê wan, û kerem ke ji qulê xo ra, ko bi serbestî kelamê ta xaber bidin. ³⁰ Hem tu ji boy şîfa dayinê destê xo dirêj ke û bi navê Kûrêta xo azîz Mesîhê alametên û hîkmetan îcra bibin.

³¹ Û wan gava ko nimêc dikiribûn, tevgerîa aw cî li ko kî cem bobûn û hemîan bi Rûh el Quds tîja bûn û kelaulahê bi serbestî xaber didabûn. ³² Û civatê îman anoşan yek dil û yek can bûn, qat yekê ji malê xo ji boy tiştî a xo nedigot, lê her tiştê wan misêwî hasab dikiribûn. ³³ Û resûlan bi mezin quwetê şahadetîyê qiyam kirinê Rabb Mesîhê didabûn, û li ser wan hemîan mezin kerem hebû. ³⁴ Çima ko li nav wan yekî muhtac tunnebû, çûnkî ji hemî zevîan ra û malan ra malîk bûoşan difîrotibûn û buhayê tiştê hati fîrotan dianîbûn; ³⁵ Ber lingê resûlan didanîbûn û ji her yekê ra ji gora mahtac bûnê wî pay dibobû. ³⁶ Û Oses, ko ji resûlan Parnapas hati gotan, ko tercûme dieb kûrê teselî, lewîlî aslê wî ji Qibrizê, ³⁷ Zevîkî wî hebû fîrot û diravê wî anî li linga resûlan danî.

SER 5

¹ Û meruvkî navê wî Ananîa bi jinê xo Sapîra ra tev mülkkî frot. ² Û ji buhay wî [288] dizî, ko jinê wî jî dizanibû, û hîsekî anî li linga resûlan danî. ³ Û Petros go, ey! Ananîa, çima? şeytan dilê ta tîja kir ko tu ji Rûh el Qudsê ra derew bibêjî, û ji bahayê zevî bidizî. ⁴ Na? kî aw ê ta bû çiqas ko disekiîbû, û gava ko hati frotin li bin hûkmê ta da bû, lê çima? ta tiştê han li dilê xo danî, ji meruvan ra ná lê ji Xodê ra ta derew go. ⁵ Û gava ko Ananîa xabera han bihîsd canê xo da, û tîrskî mezin ket li ser hemîan ko avaya bihîsdin. ⁶ Û xorten rabûn û kefen kirin wî û derve birin defn kirin. ⁷ Û gava ko qasa sê saan li ser bihurî, jina wî bi nizaninê çî ko bûbû, ket li hindurê. ⁸ Û Petros go jê ra, bê ji mi ra zevî bi av? qas buha wê frot, wî jî go, belî, av qas. ⁹ Û Petros go jê ra, av çî e ko hûn yek bûn Rûhê Xodê caribandinê váha aw lingên ko mêrê ta defn kirin li ber derîan, ta jî li der dê bibin. ¹⁰ Û tevî li ber lingê wî ket û rûhê xo da, û gava ko xortan li hindur ketin awî mirî dîn, û der anîn li ba mêrê xo defn kirin. ¹¹ Û tîrskî mezin ket li ser civatan û li ser aw hemîan ko tiştê han bihîsdin.

¹² Û bi destê Resûlan li nav qawmê pîr keramatan û hükümetan dibobûn; û hemîan bi îtîfaq li qubayê Süleyman da bobûn. ¹³ Û ji başqasîan yekê cesaret nedkiri, nêza wan bibe, hama ji wan ra îkram dikir. ¹⁴ Û îman anoxan hênî pîr zêde dibobûn, qalabayê mêran û jinan. ¹⁵ Wusan ko naxoşan li meydana dideranîbûn, û li ser lihêfan dōşegan didanîbûn, ko Petros gava ko tê barê sîê wî li ser yekê wan biqêve. ¹⁶ Hem jî ji çar [289] alî bajaran qalaba li Qudsê dihatîbûn civandin, naxoşan û ji napak rûhan azab kişandoşan bi anînê, û ji wan hemîan sax dibobûn.

¹⁷ Û baş îmam û aw hemî ko pê ra bûn rabûn, wan ko ji firqayê Sadûqîan bûn bi hasûdîtî tîja; ¹⁸ Û dest avêtin resûlan, û wan li hapsa begligê danîn. ¹⁹ Hama melekê Xodê bi çevê derîet zindanê vekir, û wan bi der anînê, go: ²⁰ Herin, û li nav dacarê bisekinandinê, ji qawmê ra bêjin gişk av söza hayatê. ²¹ Û gava ko vîa bihîsdin li sibê da ketin li dacarê û hîn dikirin, hama hat baş îmam û wan ko pê ra û li yek cî civatê gazî kirin; û hemî îxtîarê kureî Îsrayêlê, û meruv şîandin li zindanê ko wan bînin. ²² Û gava ko xizmetkâran çûn; wan li zindanê nêdîn, şûnda vegeîan û xaber kirin. ²³ Û gon, erki zindanê bi hemî emniyetê hati qufiladî me dî, û bekcîan li ber derîan hati sekinadin, hama gava ko me vekir li hindur da me keskî nedî. ²⁴ Nua îmamê mezin û sardarê dacarê û baş îmaman bihîsdin sözê hana, tacûb dikirin ji boy wanan erki çî dê bibe av. ²⁵ Û yekî hat xaber kir ji wan ra, erki va ha aw meruvan ko hûn li zindanê danîn, li dacar da sekinîn û ji xalqê ra hîn dikin. ²⁶ Wê çaxê serdar bi

xizmetkâran tev çû wan anî, bê zor, çima ko ji civatan ditîrsîaûn, ko nébe bèn kevîr bûn. ²⁷ Û anîn wan li dîwanê sekinandin, û baş îmam ji wan bi pîrs kirinê go: ²⁸ Na? kî me qawî ji we ra tenbîh kir, ko bi av nav hîn mékin, û va ha Xûdsê bi talîmê xo wê tîji kir, û xuyna av merûvê hûn dixwazin li ser me bînin. **[290]** ²⁹ Cewab da Petros û başqa resûlan û gon: Ji merûvan pêtir, ji Xodê ra îtîat kirin cayîz e. ³⁰ Xodêe bavanêt me Mesîhê qiyam kir, awî ko hûn ji darê bi alaqandinê kuştin. ³¹ Awî Xodê bi destê rastê xo bilind kir, ko Serwer û Xelas bibe, ji boy ji Îsrayêl ra toba û awfîtîe güneyan bide. ³² Û m ji boy tîştê hanan şahîdê wî nin û Rûh el Quds jî, awî ko Xodê ji xo ra îtîat kiroxan ra da. ³³ Û gava ko wan ava bihîsdin, pîr har bûn, û duşumîş dibobûn ko wan bikujin.

³⁴ Û li civat da farîsîkî li ser pîyan rabû ko navê ê kê kamazîel bû, xocayê nomosê, li ber hemî qawman yekî müteber û emr kir ko resûlan hinik derve bikin. ³⁵ Û ji wan ra go, ey! merûvê Îsrayêlê hûn ji xo ra saqin bin ji boy merûvê hana, erk[i] çi? dê bikin. ³⁶ Çima ko ji wan royan awul Tewtas rabû; ji boy xo bi gotinê, erki müteber e, û bi hîsab qasa çar sed merûvan pê ra yek bûn, ko wî hati kuştin û wan hemîan ko bi wî ra bûn, hatin bela bûn, û qat bûn. ³⁷ Li paş wî da li güna tahrîratê Yehûdahê celîlî rabû, û pîr xalq li alîe xo xist, wî jî wunda bû wan hemîan ko jê ra îtaat bûn, bela bûn. ³⁸ Û nua ji we ra dibêm, ji av merûvan dîr bin û wan berdîn, çima ko erki tedabîrê han, yaxod amelê han ji merûvan e dê bê heloşandin; ³⁹ Lê erki ji Xodê e, hûn nikarin awî heloşînin, nebe ko hûn bi Xodê pev çûndox bêne dîtin. ⁴⁰ Û jê ra qayîl bûn, û resûlan gazî kirin kûtan wan, û tenbîh kirin go[n] carkî jî bi navê Mesîhê xaber nedin, berdani wan.

⁴¹ Wan jî ji ber civatê çûn, bi şaz bûnê ko **[291]** ji boy nava Xodê layîq bûn rezalêt kişandinê. ⁴² Û hemî ro li dacarê û nav malan nedisekinîbûn ji hîn kirinê, û el Mesîhê müjde kirinê.

SER 6

¹ Û wê royan gava ko şagirdan pîr bûn, ji lîyê Yûnanî xaber dayoxan li ber Îbranîan gazinkî bû, çima ko jinebîe wan li nava xizmetê her royan bal li wan nedidan. ² Û dwanzdahan civatê şagirdan gazî kirin û gon: Ji me ra cayîz nin e ko kelamulahê berdîn û xizmetê sufran bikin. ³ Nua ey! brêyan, ji nav wê qanc hati şehadet bûn, bi Rûh el Quds û îlm tîje heft merûvan bibijêrin, ko wan li ser masilhatê han em nasb bikin; ⁴ Û em ji nimêc ra û ji xizmetê kelamê ra mijûl bin. ⁵ Û sözê han

li ber hemî civatan xoş hat, û bijartin Sdebanosê bi îman û bi Rûh el Qudsê tije meruvkî, û Pîlîbosê, û Brokoronê, û Nîganoraê, Dîmonaê, û Barmenaê, û dönme Nîgoxayosê Antakîali; 6 Ê awanan li ber resûlan sekinadin, û wan jî bi nimêc kirinê, destê xo li ser wan danîn. 7 Ê kelamulahê zêde dibobû, û li nava Qudsê nufûsê şagirdan pîr pîr dibobûn, û jî îmaman jî qalabakî mazin jî îman ra mûtî dibobûn.

8 Ê Stepanos ko bi lutf û quwetê tije li nav xalqê hîkmetan û alameta mezinan îcra dikiribû. 9 Hama hinikan jî aw cemaatê ko Azadlîan û Gürenali û Aleksantrîali dihati gotan, û hem jî Gîlîgîaê û jî Asîaê rabûn û bi Sdepanos ra mûcadele dikiribûn. 10 Ê nedikari- [292] bûn qarşî daninê li ber aw îlm û Rûh bi awî ko xaber dida. 11 Ê wê çaxê li bin destan meruavn danîn, ko wan dê gon: me bihîst ko vîa, küfr sözên digot jî Mûsa ra û jî Xodê ra. 12 Ê tahrîk kirin xalqê û îxtîaran û kâtîban û bazîan li ser, û awî girtin û li meclîsê brin. 13 Ê şahîdê derewan sekinandin ko digotin, meruvê han, jî cîê azîz ra û jî nomos ra qarşî sözê³⁰³ küfran gotinê nasekine. 14 Çima ko em bihîsdin jî wî ko digot: erki av Mesîhê Nasranî dê heloşîne cîê han û dê bigohrîne aw adatan ko Mûsa jî me ra teslîm kirî. 15 Ê wan hemîyan ko li meclîs da rodinibûn, gava ko lê nihêrtin rûya wî weka rûya melekê dîn.

SER 7

1 Wê çaxê baş îmam go: Bîra tiştê hanan ahwa? nin. 2 Ê awî go, ey! meruvan, brêyan û bavan godarî bikin: Celîl Allah jî bavê me ra jî Îbrahîm ra xuyayî bû, gava ko li mîçatê da bû, hêja wî li Xarân da sakîn nebobû; û jê ra go: 3 Rabe jî welatê xo û jî xisumê xo, û were li aw welat ko ez³⁰⁴ jî ta ra dê nşan bidim. 4 Wê çaxê jî welatê Kîldanîyan bi rabûnê li nav Xarânê sakîn bû û paşê mirinê bavê wî jî wê awî koç kir li welatê han li ko kî nua hûn sekinin. 5 Ê li wê jê ra qasa ling datîninê cî neda mîras, hama wad kir ko wîa jê ra weka mülk bide paşê mirinê wî jî zürîyetê wî ra, gava hêja kurê wî tunnebû. 6 Ê Xodê ahwa xaber da, erki zürîyetê wî li welatê xaribê da dê mîsair bibe, û çar sed [293] sal dê qul bikin wî û ezîyet dê bidin jê ra. 7 Ê aw mîllet jî ê kê ra ko dê qullux bikin e jî dê hükm bikim, go Xodê, û jî vê pê va dê rabin û li cîyê han dê jî mi ra îbadet bikin. 8 Ê jê ra ahdê sünêtê da, û paşê Îbrahîm za Îsaqê, û li roya haştan da awî sünêt kir, û Îsaq jî za Yaqûbê û Yaqûb jî dwanzdah nahabedan. 9 Ê nahabedan jî Yûsîf ra bi hasûdî kirinê li Misrê brin ra frotin, hama Xodê bi wî ra

³⁰³ Di metnê de *sezê* (nişeya wergêrê).

³⁰⁴ Di metnê de *ej* (nişeya wergêrê).

bû; ¹⁰ Û awî ji hemî sixletê wî xelas kir, û jê ra lutf û îlm da li ber Fîraḫon padîşahê Misrê, û aw jî awî li ser Misrê û li ser hemî mala xo serwer nasb kir. ¹¹ Û li ser Misrê û hem li ser hemî dîyarê Kanan qitlîxkî hat, û sixletkî mezin û bavêt me zaxîre nedikaribûn dîtinê. ¹² Û gava ko Yaqûb bihîst erki li Misrê da genim tê dîtin, cara awulê bavêt me şîand. ¹³ Û cara îkîncîê Yûsîf aw xo ji brêyêt xo ra da nas kirin, û nislê Yûsîfê ji Fîraḫon ra malûm bû. ¹⁴ Û Yûsîf şîand û dawet kir bavê xo û xisimêt xo gişk haftê û pênc can. ¹⁵ Û Yaqûb çû li Misrê û mir, awî û bavêt me. ¹⁶ Û li sükemê da hatin birin û li aw tîrbê da hatin daṭînin, awî ko Îbrahîm bi buhayê zîv kirîbû ji bavê Sükemê ji kûrêt Amorê. ¹⁷ Û gava ko wexta wade nêz bû, ko Xodê bi sond wad kiribû ji Îbrahîm ra, qawm li Misrê da zêde bû û pîr bû; ¹⁸ Hata ko başqa padîşahkî rabû ko nas nedikiribû Yûsîf. ¹⁹ Awî fendkî kir li ber mîlletê me, ji bavêt me ra ezîyet da, wusan ko kûrêt wan li derva avêtin da ko sax nemînin. ²⁰ Wê çaxê Mûsa jî za, û li ber Xodê rind bû, wî ko sê mehan li mala bavê xo da [294] mezin bû. ²¹ Û gava ko awî li derva hati avêtin, qîza Fîraḫonê awî helanî, û ji xo ra weka kûr mezin kir. ²² Û Mûsa bi hemî îlmê Misirlîan terbiye bû û li sözêt xo û li amelêt xo quwetlî bû. ²³ Û gava ko çil salan bû, li dilê³⁰⁵ wî ket ji brêyêt xo ra ji kûrêt Îsrayêlê zîyaret bike. ²⁴ Û nahaqî kşandinê yekî bi dîtinê, awî sîyanet kir, aw Misirlîyê bi kuştinê hayfa aw zulm kşandoxê send. ²⁵ Û aw taxmîn fikir ko brêyêt wî Xodê bi destê wî xelasê wan dayinê dê fehm bikin, hama wan fehm nedikirin. ²⁶ Û li roya dinê laqa wan hat gava ko pev diçobûn, wan ji sulhê da bi zor kirinê go, ey! meṛuvan, hûn brê nin, çima? ji hevûdu ra nahaqî dîkin. ²⁷ Hama aw ko ji havalê xo ra nahaqî fikir bi red kirinê wî go, ta li ser me kî? hûkmdar ya qadî tayîn kir. ²⁸ Mi jî kuştin? dixwazî çawan ko do ta aw Misirlîyê kuşt. ²⁹ Û mûsa ji boy xaberê han revî, û li dîyarê Maṭîameṭê xarîb bû, li ko kî du kûr za. ³⁰ Û gava ko çil sal tamam bû, li çîyê ê Sînayê li nava çolê melekê Xodê jê ra xuayî bû, bi pêtîyê agirê dirê nerm. ³¹ Û gava ko Mûsa dî, li ser av seyranê tacûb kir, û ji boy dîtinê gava ko nêz bû, dengê Xodê jê ra hat ko digot: ³² Ez im Xodêyê bavanêt ta, Xodêyêt Îbrahîm, Xodêyêt Îsaq, û Xodêyêt Yaqûb, Mûsa jî ji tîrsan dilêrzîa, cesaret nek fikir meze kirinê. ³³ Û Xodê go jê ra, Solêt lingê xo derîne çima ko aw cî ko tu sekinî aw cî azîz e. ³⁴ Mi li Misir da bûn ezîyetê qawmê dî, û hasret kşandinê wan mi bihîst, û ez hatim xwarî wan xelas kirinê, û nua were ez ta bişeyînim li Misrê. ³⁵ Aw Mûsa ko [295] wan înkâr kirin, û

³⁰⁵ Di metnê de *ailê*.

digotin, kî? ƭa h  kmdar   qad  tay n kir, Xod  heman aw  h  kmdar   xelas   and bi dest  aw melek  ko li nava dir   j   a xuyay  b . 36 Aw  wan deran  bi h  kmetan   alamet n kirin  li d ar  Misr    li nava bahr  sor    li nav  ol    il salan.

37 V a aw M sa e ko ji  ur    sray l  a go, Xoy    Xod   w  ji br y   w  d  ji we  a peyx emberk  der ne we a min, j   a godar  bikin. 38 V a aw e ko li  ol  da li nav k l se da b , li ser   y  S nay  bi w   a xaber dayox  melek  a   bi bav   me  a, ko aw ji boy ji me  a dayin  s za hayat  send. 39 Ko j   a bav   me nexosdin m t  b n , l  red kirin   bi dil  xo li Misr  vege an. 40   gon ji Har n  a ji me  a Xod  n   ke, ko li p   me he in;  ima ko aw M sa ko me ji d ar  Misr  deran , em nizanin ko  i b  j   a. 41   aw royan gol kk    kirin,   ji put  a qurban kirin,   bi amel   dest  xo sefa dikirib n. 42   Xod  ji wan vege a wan ji asker  az man  a  badet kirin  a tesl m kir,  awan ko li kit b  peyx emberan hat  niv sandin, Ya! mala  sray l , li  ol  da   il salan qat ji ma  a hati serj  b n dawaran   qurbanan we da?. 43    adir  Molok  we send   ist r  Xod   w  H rempay ; aw suretan ko we   kir, ji boy ji wan  a secde kirin , e ji w  d  ji Babel  w  da bibim. 44  adir   ahadet y  li  ol  da bi bavan  me  a b ,  awan ko bi M sa xaber dayox  emr kir, ko bi gora  rne  d tin  xo   ke aw . 45 Ko aw  bav   me sendin, bi tevl  Hes   an n li nava m lk  aw m letan, wan ko Xod  ji ber bav   me qawarand hata roya Daw d ; 46 Ko li ber Xod  [296] lutf d    xosd ko ji Xod   Yaq b  a mesk nk  bib ne. 47 Hama S leyman j   a xan k    kir. 48 Lak n Taala li nav bi dest hati   b n dacar da sak n nabe,  awan ko peyx ember dib je. 49 Az man k rs y  min e,   ard   y  da  nin  ling  min e; ji mi  a  awan mal d    k  dib  Rabb, yaxod   y  rahat y  min k jan? e. 50 Avanan hem an dest  min   nekir ?. 51 Ey hi k ast  yan   bi dil   bi goyan s n tsizan, h n day ma li qar   R  h el Quds d sekinin., h n we a bavan   xo. 52 Bav   w  ji peyx emberan k jan? neqawarandin,    u  din wan, ko ji awul xaber dan ji boy hatin  aw Sadiq, ko h n nua dest dayox    ku  ox  w  b n. 53 H n ko nomos  sendin bi  dare  melean,   w  negirt. 54   wan gava ko t    hanan bih  din li dil  xo da har b n dran  xo li ser w  diqir andin. 55 Hama aw bi R  h el Quds bi t ji b n , li az manan nih  t   cel l  Xod  d ,   Mes   j  d  ko li al   sax  Xod  d sekin b ,   go: Va ha ez dib nim azuman vekirand     ur  me uv , ko li al   rast  Xod  sekin . 56   wan bi bilind awazk , q r  kirin,   goy   xo girtin,   hem an tev li ser w  h c m kirin. 57   ji baj r der xistin w ,  evir dikirin w ;    ah dan cil  xo li ber linga xortk  didan  b n, ko nav    k  Soxos dihatib  gotan. 58    evir dikirib  Sdepannos , ko w  nim c dikir  

digot, Ya! Rabb Mesîh, rûhê min qabûl bike. ⁵⁹ Û li ser çokan bi hatinê bi bilind awazkî qîra, Ya! Xodê vîa ji wan ra gûne hîsab meke, û vîa bi gotinê xew da çû, û Soxos jî qatlê wî ra rîza dabû.

[297] SER 8

¹ Û li wê ro da, qawarandinkî mezin bû li ser aw kîlîseê ko li nava Qudsê da bû; û ji resûlan başqa hemîan jî bela bûn li nav memleketê Yehûdîan û Samarîayê. ² Û dîndar merûvan Sdepannosê birin defn kirin, û li ser wî mezin feryadkî kirin. ³ Hama Soxos pîr zararan didabû ji kîlîse ra, li malan diket gerek mêran gerek jinan ra dikşand û li hapsê dida datînin. ⁴ Û aw belabûnan digerîan û kelmê waz dikiribûn. ⁵ Û Fîlîbbos jî li yek bajarkî Samarîayê bi çûndinê, Îsayê waz dikir ji wan ra. ⁶ Û xalqê mûcûzatê Fîlîbbosê bi bihîsdinê û bi dîtinê, bi yek îtîfaq bûnê ji gotinê wî ra godarî dikiribûn. ⁷ Zîra ji pîr bi cinan napak rûhan bi bilind awaz bi qîrîn kirinê derdiketibûn. ⁸ Û pîr kötrûman û topalan sax dibobûn. ⁹ Û mezin şazlîxkî bû li aw bajar da, û li aw bajar da ji awul merûvkî hebû, ko nava ê kê Şimhûn bû, sîhîrbazîtî dikir, û xalqê Samarîayê heyran dikir, aw ji xo ra digot erki yekî mezin e. ¹⁰ Û ji piçûkan hata mezinan hemîan jî mezin quwetê Xodê vîa e bi gotinê, jê ra godarî dikiribûn. ¹¹ Ji pîr zemanan bi sehîrbazîtîyê ji boy wan heyran kirinê, jê ra godarî dikiribûn. ¹² Hama gava ko ji Fîlîbbos ra îman anîn ko waz dikir ji boy padîşahîtiyê Xodê û ji boy nava Mesîh el Îsa, tahfîl dibobûn gerek mêran gerej jinan. ¹³ Û Şimhûn bi xo jî îman anî, û bi tahfîl bûnê dayîma li ba Fîlîbbos bû, û îcra bûn alametana hem [298] mezin quwetlî tiştan bi dîtinê; Heyran dibobû. ¹⁴ Hama li Qudsê da bûn resûlan gava ko bihîsdin; Samarîan kelamulahê qabûl kirin, Petros û Hannayê ji wan ra şîandin. ¹⁵ Ko wan bi çûndinê ji boy wan nimêc kirin ko Rûh el Qudsê bistînin. ¹⁶ Zîra hêja li ser wan yekî Rûh neketibû, lê teng bi nava Rabb Mesîhê tahfîl bobûn. ¹⁷ Wê çaxê destê xo li ser wan bi danîbûn, û wan Rûh el Qudsê disendibûn. ¹⁸ Gava ko Şimhûn dî, erki resûlan dest datîninê, Rûh el Quds tê dayin, ji wan ra axçe pêşkêş kir, û go: ¹⁹ Ji mi ra jî hûkmatê han bidin, wusan ko li ser kî ko destê xo deynim aw Rûh el Qudsê bistîne. ²⁰ Hama Petros go jê ra: Axçeyê ta bi ta ra bra wunda bibe, çima ko ta taxmîn kir ko baxşîşê Xodê bi axçe tê sendin. ²¹ Zîra li tiştê³⁰⁶ han da han da hîsse û nasîbê ta tunne; çima ko dilê ta li ber Xodê doxîrî nin e. ²² Nua ji kotîyîtiyê han toba

³⁰⁶ Di metnê de *biştê* (nişeya wergêrê).

bike ji Xodê ra bi nîyaz kirinê, belkî ji ta ra awf bibe yaramaz fikrê dilê ta. ²³ Zîra ez ta dibînim kî li nav tahlâ ödê û li Grêdanê nahaqîtî da î. ²⁴ Ê Şimhûn cewab da û go: Ji boy min hûn ji Xodê ra nîyaz bikin ko ji av gotina wê tiştî li ser min neyê. ²⁵ Wan jî bi şahadet kirinê, paşê kelamulahê xaber danê, li Qudsê vegrîan, û li nav pîr gunda Samarîan încîlê waz kirin. ²⁶ Ê melekê Xodê bi Fîlîbbos ra xaber da, bi gotinê: Rabe û here li alîyê qible li aw rê, ko ji Qudsê li Qaza tê xwarî, ko li cîkî çöl e. ²⁷ Wî jî rabû çû; û va ha yek xadimkî Habeşî, ko li ser hemî xaznayê wî begçî bû, ê melîke Habaşîan Gantagayê; meruvê han li Qudsê secde kirin ra [299] hatibû. ²⁸ Ê ji wê vedigerîa, û li arabayê xo ronîştibû, û kitêbê Îşaya peyxemberê dixond. ²⁹ Ê Rûh ji Fîlîbbos ra go: Nêz be, û li ba aw arabayê here. ³⁰ Fîlîbbos jî bi bazî nêz çû, û godarî fikir ko kitêbê Îşaya peyxemberê dixond, û go: Acába av tişt ko dixoyînî fehm dikî?. ³¹ Wî jî go, Çawan? dikarim fehm kirin, erki yekê ji mi ra qalawuzîtî neke; û lava kir ji Fîlîbbos ra, ko rabe li ba wî ronî. ³² Ê li nav kitêba cîyê xondinê wî ava bû, Weka mî ji serjê kirin ra hati birin, û weka berx li ber qasandoxa xo bêdeng bûn, aw ahwa devê xo veneke. ³³ Li müdetê alçaxtîyê wî dikare naql bike; zîra ömrê wî ji ser ardê tê helandin. ³⁴ Nua xadim ji Fîlîbbos ra cewab da û go: Reca dikim ji ta peyxember ji boy kî dêje av, ji boy xo?, ya boy başqa yekê. ³⁵ Ê Fîlîbbos devê xo bi vekirandinê ji nivîsê han bi dest kirinê jê ra Mesîhê waz kir. ³⁶ Ê gava ko li rêya xo diçobûn, li ba av kî hatin; û go xadim: Va ha av hênî çî? min mén dike ji tahfil bûnê. ³⁷ Ê Fîlîbbos go, erki ji hemî dilê xo îman tînî, cayîz û aw cewab da û go: Îman tînim erki Îsa el Mesîh kurê Xodê e. ³⁸ Ê emr kir ko arabayê bidin sekinandin, û herduyan jî li avê ketin, Fîlîbbos û xadim; û tahfil kir wî. ³⁹ Ê gava ko ji avê der hatin, Rûha Xodê Fîlîbbosê qapmîş kir, û xadim awî hênî qat nedî, û bi şaz bûnê li rêya xo diçobû. ⁴⁰ Hama Fîlîbbos li nava Azovdosê hati dîtin, û bi gerandinê ji hemî bajaran ra încîl waz fikir, hata aw li Qayserîyê hat.

[300] SER 9

¹ Hama Soxos hêja li qarşî şagirdê Rabb tîrs û qatl bi pîf kirinê li ba baş îmamê çû. ² Ê jê mektûban xosd ko li Şam da ji civatan ra bibe, ko erki li pey av mezhebê çûndox keskî bibîne, mêr ya jin, hati grêdan li Qudsê bîne. ³ Ê gava ko diçobû, ko ji Şamê ra nêz bû, xafil ji azümanan rohnîkî li dorê wî parlamîş bû. ⁴ Ê aw li ardê bi ketinê dengkî bihîst, ko digot jê ra, Şawûl, Şawûl çima? min diqewarînî. ⁵ Ê aw go, Ya Rabb, tu kî? î; û Rabb go: Ez im Mesîh ko tu diqawarînî; çetin tişt e ji ta ra

li qarşî misasê pêl xisdin. ⁶ Û wî jî bi lerzanê û bi şaş bûnê go: Ya! Rabb, Çi dixwazî ko bikim. ⁷ Û rabb jê ra go: Rabe û li bajêr bikev, û ji ta ra çi gerek e kirin dê bê gotin, hama aw merûvan ko bi wî ra diçobûn hati şaş bûn sekinîn tenê aw deng dibihîstibûn, hama yekê nedidîbûn. ⁸ Û soxos ji ardê rabû çahv vekirî yekê nedidîbû, û ji destê wî girtin, li nava Şamê birin. ⁹ Û sê royan bê dîtin ma, ne xwar û ne jî vexwar. ¹⁰ Û li nav Şamê da şagirdkî hebû navê ê kê Ananîa, û Rabb li xewê da jê ra go: Ya Ananîa, wî jî go, Rabb va ha li vir im. ¹¹ Û Rabb jê ra go: Rabe û hare li aw kûçê ko Doxîrî tê gotin, û li wê li mala Yehûda yekî Tarsûslu Soxos bi nav aramîş bike; çima ko va ha nimêc dike. ¹² Û li xewê da bi Ananîa nav merûvkî dî, ko li hindur ket û li ser wî destê xo danî, ko bibîne. ¹³ Ananîa jî cewab da: Ya! Rabb ji [301] pîran mi bihîst ji boy av merûv, erki çi qas kotîtî kir ji azîzê li Qudsê; ¹⁴ Û li vir jî ji baş îmaman hûkmatê wî heye ko girêde aw hemîyan ko navê ta gazî dîkin. ¹⁵ Û Rabb go jê ra: Hare tu, zîra aw ji mi ra bijartî fraqkî e, ji boy navê min kşandinê li ber tayîfan û padîşahan û kûrê Îsrayêlê. ¹⁶ Zîra ez dê jê ra nşan bidim erki ji boy navê min jê ra lazim e çiqas ezîyetan bikşîne. ¹⁷ Nua Ahanîna çû, ket li mal, û li ser wî destê xo danî go, Ya! Soxos³⁰⁷ bra, Rabb min şîand, aw Mesîh ko li rê da³⁰⁸ ji ta ra xuya, va ha ko dihatî tu; ko çahvê ta bibîne, û bi Rûh el Quds tîjî bibî. ¹⁸ Û zû ve ji çahvê wî weka qaşikan tiştan ketin; heman li wî saatê dî û rabû tahfil bû; ¹⁹ Û bi taam xwarinê taqat li ser wî hat, û çend ro li Şamê da bûn li ba şagirdan sekinî. ²⁰ Û zû va li cîyê civatan Mesîhê waz dîkir, erki aw e kûrê Xodê. ²¹ Û hemî bihîsdoxan pîr acêb dimabûn û digotibûn; Vîa aw nin? e, ko li Qudsê xarab dîkir wan ko navê han gazî dikiribûn, û li vir jî ji boy aw tişt hatî, ko wan bi grêdan ji baş îmaman ra bide. ²² Hama Soxos hênî pîr bi quwet dibobû, û li Şamê da sakîn bûn Yehûdîan lal³⁰⁹ dîkir, û li aqilê wan dixist erki vîa e Îsa. ²³ Û paşê pîr royan, Yehûdîan meşweret kirin ko awî bikujin. ²⁴ Hama fitneyîê wan malûmê Soxos bû, zîra derîyan dipêbûn şev û ro ji boy awî kuştinê. ²⁵ Çima ko şagirdan sendin awî li şevê da, bi zenbîl ji bedenê bi aliqandinê kirin xwarî. ²⁶ Va ha ko Soxos hati li Qudsê dixabitibû bi şagirdan tev bûnê, hama hemîan jî jê ditir- [302] sîan, bawur nedikiribûn erki aw şagird bû. ²⁷ Hama Parnapas send wî û bir ji Resûlan ra, û ji wan ra naql kir erki çawan li rê da Rabb dî, û erki bi wî ra xaber da, û li Şamê da çawan serbest waz dîkir

³⁰⁷ Di metnê de *Savux*.

³⁰⁸ Di metnê de *li dê da* (nişeya wergêrê).

³⁰⁹ Di metnê de *şax* (nişeya wergêrê).

bi navê Mesîhê. ²⁸ Û li Qudsê da bi wan ra diket û radibû, û bi nava Rabb Mesîhê serbest³¹⁰ waz dikir. ²⁹ Û bi Yûnanî xaber dan Yehûdîan xaber dida, mûcadele dikir; hama wan awî kuştinê dixabitibûn. ³⁰ Hama gava ko brêyan bihîsdin awî Qayserîê birin, û ji wê şîandin awî li Tarsûsê. ³¹ Wê çaxê selametê cematan hebû, li hemî Yehûdistanê û Celîlê û Samarîayê, mamûr dibobû û bi tîrsa Xodê û bi dil pîrsinê Rûh el Qudsê çûndinê pîr dibobûn. ³² Û gava ko Petros li hemî cîyan digêrîa, li Lûtîya da sakîn bûn li ba azîzan jî çû. ³³ Û li wê Yenya nav merûvkî dî, ko ji haşt salan li lihêf da kötrûm raketî bû; ³⁴ Û Petros jê ra go: Ya! Yenya, Îsa el Mesîh ji ta ra şîfa dide, rabe lihêfê xo rasr ke, aw jî zû va rabû. ³⁵ Û aw hemîan ko li Lûtîayê û li Saronê dibobûn awî dîn, û li Rabb vegeîan. ³⁶ Û li Yafa da bi Dapîta nav şagird jinkî hebû, ko tercûme bibi Ceyran gotine, vîa bi xêr û sadaqa tîjî jinkî bû. ³⁷ Û bû kî li wî royan da aw naxoş bû û mir, awî şûşdin û li aywan da danîn. ³⁸ Û Lûtîa nêza Yafayê bû; Nua şagirdan bihîstin ko Petros li wê e, jê ra du merûvan şîandin, lava kirinê ko dereng naêve ji wan ra hatinê. ³⁹ Petros jî rabû bi wan ra hat; û gava ko hat, awî li aywanê bibin, û hemî jinebîyan li dorê wî sekinîn, digîan, û nşan [303] didan aw xaftanan û cilan, ko Ceyran dikir, gava ko bi wan ra bû. ⁴⁰ Û Petros jî hemîan derve kir li ser çokan hat û nimêc kir, û li cesedê vegeîa go: Ey! Dapîta rabe, wî jî çahvê xo vekir, û Petrosê dî, rabû rasd ronîşd. ⁴¹ Wî jî destê xo jê ra da, û helanî awî; û azîzan û jinebîan gazî kir, li ber wan awî sax sekinand. ⁴² Û tiştê han nava hemî Yasayê malûm bû, û pîran ji Xodê ra îman anîn. ⁴³ Û bû kî aw, li Yafa da li ba yekî dabax navê ê kê Şimhûn, pîr royan sekinî.

SER 10

¹ Li Qayserî da merûvkî hebû, navê ê kê Gornelîos, yüzbaşî, ji Îdalîalî hati gotan bölügê; ² Dîndar û ji Xodê tîrsox merûvkî bû bi hemî mala xo, ko ji xalqê ra sadaqa dida, û her wext ji Xodê ra nimêc dikir. ³ Merûvê han li ro saat li wexta nehan da li xew da aşîkâr melekê Xodê dî, ko li hindur li ba wî hat û go: Ya! Gornelîos; ⁴ Wî jî lê mêze kirinê û bi pîr û bi pîr tîrsinê, go: Çi? e, Ya! Efendî, wî jî go jê ra: Nimêc û sadaqayê ta ji boy zîkrê li ber Xodê rabûn. ⁵ Nua li Yafayê merûv bişeyîne, û gazî ke bi Şimhûn nav yekê, ko Petros tê gotan³¹¹; ⁶ Wîa weka mîsafîr li ba yekê Dabax bi nav Şimhûn disekine, ko mala ê kê nêza bahrê e. ⁷ Û gava ko çû aw melek

³¹⁰ Di metnê de *serjest* (nîşeya wergêrê).

³¹¹ Di metnê de *kotan*.

ko pê ra xaber dida, ji xulamêt xo diduyan gazî kir, û dayîma li ba wî sekinandoğan dîndar askerkî, ⁸ Ê hemî jî naql kir ji wan ra û wan li Yafayê şîand.

⁹ Ê li roya din gava ko wan li rê bi çûndinê, [304] nêza bajêr bûn; Petros saat li wexta şeşan da li xanîyê rabû nimêc kirinê. ¹⁰ Ê bi pîr brçî bûnê, dixosd taam kirinê; û gava ko hazir dikirin, li ser wî xayîş bûna fikrê hat; ¹¹ Ê dî azüman hati vebûn; mezin weka çarşaf ji çar alî hati grêdan firraqkî hati xwarî li ser ardê; ¹² Ko li nav ê kê da hebû hemî çar pê haywanêt ardê û canavaran û soxûnan û tayra azümanan. ¹³ Ê dengkî bû jê ra, Ya! Petros rabe serjê ke û bixor. ¹⁴ Hama Petros go: Haşa, Ya! Rabb; zîra mi qat cara tiştê napak ya murdar nexwarî. ¹⁵ Dîsa carkî jî dengkî hat jê ra, aw tişt ko Allah pak kirî tu napak hasab meke. ¹⁶ Ê vîa sê caran bû û av fîraq li azümanan hati helanîn. ¹⁷ Ê Petros gava ko li dilê xo da tacûb dima ji boy aw xew ko dî erki dê çi bibi, va ha ji Gornelîos hati şîyandin merûvan mala Şimhûn pîrs kirin; û li ber derî sekinin; ¹⁸ Ê bi gazî kirinê di pîrsîabûn, erki Şimhûn ko Petros tê gotan li vir mîsafîr? e.

¹⁹ Ê gava ko Petros li ser aw xewê difirîbû, Rûh el Quds go jê ra, va ha sê merûvan ta pîrs dîkin; ²⁰ Nua rabe xwarî hare û qat wesweskî meke û bi wan ra hare, zîra mi wan şîandî. ²¹ Ê Petros jî hati xwarî li ba aw merûvan û go: Va ha ez im aw merûv ko hûn lê digîrsin, ji boy çi? hûn hatin. ²² Wan jî gon: Gornelîos yûzbaşî sadiq û ji Xodê tîrsox hem ji hemî mîletê Yehûdîan hati şehadet bûn merûv, ji azîz melekî îzn send, ko ta li mala xo gazî ke, û ji ta xaberan bibihê. ²³ Wê çaxê wan gazî kir li hindur, û li ba xo qonax kir; û aw roya din [305] Petros rabû û bi wan ra çû û çend brêyan jî ji Yafayê pê ra çûn. ²⁴ Ê aw roya dinê ketin li Qaysariê, Gornelîos xisûmê xo û xas dostê xo civandibû û ji wan ra dipêbû. ²⁵ Ê gava ko Petros li hindur diketibû, Gornelîos li ber wî rabû, û linga wî ket û secde dikir. ²⁶ Hama Petros³¹² awî li ser lingan sekinand û go: Rabe bisek e jî merûv im. ²⁷ Ê pê ra bi xaber danê li hindur ketin, û li wê pîr merûvan hati civandin dî. ²⁸ Ê go ji wan ra: Hûn zanin ko ji merûvkî Yehûdî ra bi başqa mîlet ra alaqa kirinê, yaxod nêz bûnê, şerî nin e, hama Xodê ji mi ra nîşan da ko ji merûvan yekê ra murdar, yaxod napak nebêjin. ²⁹ Ji boy ê kê e jî ko hatim gazî kirin, bê zid gotinê hatim, hama nua pîrs dikim ko ji çi? semedê hûn mi gazî kirin. ³⁰ Ê Gornelîos jî go: Çar ro awul hata vê saatê mi rocî digirt, û saat nehan da li mala xo da nimêc dikiribûm, û va ha cilê beriqî merûvkî li ber min sekinî,

³¹² Di metnê de Ketros (nîşeya wergêrê).

û go: ³¹ Ey! Gornelîos nimêcê ta hati bihîsdin, û li ber Xodê sadaqayê ta zîkr bûn. ³² Nua meruv bişeyîne li Yafayê, û Petros hati gotan Şimhûnê gazî ke, wîa li mala dabax Şimhûnê li ba bahrê mîsafîr e, ko gava ko bê ji ta ra dê xaber bide. ³³ Nua li vê satê mi ji ta ra meruvan şîand, ta jî qanc kir ko hatî, nua em hemî jî li ber Xodê hazir in, godarî kirinê aw hemî tiştan, ko ji Xodê ra emr bûe.

³⁴ Ê Petros devê xo vekir û go: Asah ez fehm dikim ko Xodê li xatr mêze nake; ³⁵ Lê li nava hemî mîlletan, aw ko jê ditirse, û sadaqat dişixule, jê ra maqbûl e. ³⁶ Aw kelam ko kure [306] Îsrayêl ra Xodê şîyand selamet waz kirinê bi destê Îsa el Mesîhê, wîa e Xodê hemîan; ³⁷ Hûn qanc dizanin aw tişt ko li nav hemî Yehûdîstanê ji Celîlê hati dest kirin, ji tahfilê paş, ko Hanna waz kir. ³⁸ Mesîh ko ji Nasratê bû, ko Xodê awî bi Rûh el Quds mesh kir û bi quwetê ko gerîa bi qancî kirinê û ji Şeytanê ezîyet kşandoşan bi sax kirinê, çima ko Xodê bi wî ra bû. ³⁹ Ê em şahîd in ji aw hemî tiştan, ko kir li nav diyarê Yehûdîan û li nava Qudsê,³¹³ aw ko ji darê bi alaquadînê kuşdin jî. ⁴⁰ Xodê wîa li roya sisêyan da qiyam kir, û aşîkâr kir wî, ⁴¹ Na kî ji hemî qawmê ra, îlla ji Xodê ji awul hati nasb bûn ji şahîdan ra, yanî ji me ra ko aw ji mirîyan paşê qiyam kirinê bi wî ra tev me xar û vexwar. ⁴² Ê ji me ra tenbîh kir ko ji qawmê ra waz û şahadetî bikin erki ê mirîyan û saxan ji Xodê tayîn bûn hakîm aw e. ⁴³ Hemî peyxemberan jê ra şahadet dikan, ko hemî jê ra îman anoxan bi navê wî awfitîyê gûbeyan distînin.

⁴⁴ Ê gava ko Petros xaberê han xaber dida, Rûh el Quds li ser aw hemîan ket ko sôzê godarî dikiribûn. ⁴⁵ Ê ji sünêtê bûn îtîqatlîan awan ko bi Petrosê hatibûn, mat man, ko baxşîşê Rûh el Quds li ser tayfan jî hati rijandin. ⁴⁶ Zîra dibihîsdibûn ji wan ko başqa zimanan xaber didabûn û ji Xodê ra tazîm didabûn. ⁴⁷ Wê çaxê Petros cewab da; Dikârî? yekê av manî bike ko vanan tahfil nébin, wan ko Rûh el Qudsê jî sendin weka me. ⁴⁸ Ê emr kir, ko bi navê Xodê tahfil bibin, wê çaxê jê ra lava kirin ko çend royan li ba wan bisekine.

[307] SER 11

¹ Ê resûlan û brêyan ko li aliyê Yehûdîstanê da bûn bihîsin ko tayfan jî kelimulahê qabûl kirin. ² Hama gava ko Petros li Qudsê rabû, ji sünêtê bûoxan pê ra pev diçobûn. ³ Ê digotibûn ko tu li mala sünetsiz, meruvan ketî, û bi wan ra ta xwar;

³¹³ Di metnê de *Tutsê* (nîşeya wergêrê).

⁴ Û Petros jî dest kir bi sirayê ji wan ra naql kirinê Û go. ⁵ Mi li Yafa da nimêc dîkir, li xayîş bûna fikra xo da mi xewnik dî, fraqkî mezin weka caw ji çar alîyan ji azümanan hati alaquadin hati xwarî, hata gîhişti min; ⁶ Ko li ser ê kê mi çahvê xo bilind kirinê, û mi dî çar pê haywana ardê û canawaran û soxûnan û tayra azümanan. ⁷ Û mi dengkî bihîst ko ji mi ra go: Ya! Petros rabe serjê ke û bixor. ⁸ Hama mi go: Haşá Ya! Rabb, zîra napak ya murdar tiştê qat li devê min naçûe. ⁹ Û dîsa îkîncî caran ji azümanan³¹⁴ dengkî ji mi ra cewab da, tiştê paqij kirinê Xodê tu napak meke. ¹⁰ Vîa cara sisêan bû; û dîsa hemî jî li azümana hati helanîn. ¹¹ Û va ha li wê saatê li aw mal ko ez dibûm, ji Qaysariê ji mi ra hati şîandin sê meşûvan gîyan. ¹² Û Rûh jî ji mi ra go: Ko bi wan ra heşim, bê weswese kirinê, aw şeş brêyan jî bi mi ra çûn; û em ketin li mala aw meşûv. ¹³ Û aw ji me ra naql kir erki çawan li mala xo da melekê dî, ko sekinîbû û digot: Li Yafayê meşûv bişeyîne û gazî ke Şmîhûnê, ko Petros jî tê gotin; ¹⁴ Ko aw ji ta ra sözan dê xaber bide, ko bi wan hem tu û hem hemî mala ta dê xelas [308] bibin. ¹⁵ Û çawan ko mi dest kir xaber danê; Rûh el Quds li ser wan ket, çawan ko awul li ser me jî. ¹⁶ Wê çaxê mi bîra xo anî kelimê Rabb, ko digot, Hanna bi av tahfîl kir; hama hûn di Rûh el Quds dê tahfîl bibin. ¹⁷ Nua erki Xodê haman aw baxîş da ji wan ra, çawan ko ji me ra jî, gava ko Rabb Îsa el Mesîh ra îman anîn, ez kî? bûm ko qadir bibim Xodê manî kirinê. ¹⁸ Nua wan ko tiştê han bihîsdin, huskî bûn; û ji Xodê ra şikir kirin û gon: Wusan e Xodê ji boy hayatê ji tayfan ra jî toba da.

¹⁹ Nua ji semedê sixletê mirinê Sdepanosê bela bûnoşan hata hata li Pünegê û Qbiriszê û Antakîayê gîyan û ji yekê ra kelamulahê nadigotin, lê tenê ji Yehûdîan ra. ²⁰ Hama ji wan hinikan meşûvê Qibrizê û Gürenayê bûn, wan ko gava li Antakîayê ketin, bi yûnanîan ra xaber didabûn Rabb Mesîhê bi waz kirinê. ²¹ Û destê Xodê bi wan ra bû, û pîr meşûvan bi îman anînê li Rabb veşîyan.

²² Û li ser wan xaberê han li goya kîlisayê Qudsê gîya, û Parnapasê şîyandin, ko hata Antakîayê hare. ²³ Ko gava ko hat, lutfê Xodê dî, şaz bû; ji hemîyan ra nasîhat dîkir; bi pêtiyê dil ji Rabb ra sadîq bisekinin. ²⁴ Zîra meşûvkî qanc bû, û bi Rûh el Quds û bi îman tijî, û ji Rabb ra pîr xalq zêde bû. ²⁵ Û paşê Parnapas li Tarsûsê rabû, ko li Soxosê bigere, û awî bi dîtinê li Antakîayê anî. ²⁶ Û bû ko tamam salkî wan bi

³¹⁴ Di metnê de ji azümanan ji azümanan.

kîlîsayê yek cî bi civandinê, ji pîr xalqê ra hîn kirin, hem şagirdan awul li Antakîayê krîstîan nav girtin.

[309] ²⁷ Û li wê royan ji Qudsê peyemberan li Antakîayê çûn. ²⁸ Û ji wan bi Akapos nav yekê rabû bi quwetê Rûh beyan kir ko li hemî dinê xalayîkî mezin dê bibe, ko vîa li roya Gxotîyosê bû. ²⁹ Û ji şagirdan her yekê li göra quwetê xo her kes qarar kirin, li Yehûdîstan da sakîn bûn ji brêyan ra yardum bişeyînin; ³⁰ Ko îcra ji kirin ji yeretsan ra bi şîyandinê bi destê Parnapasê³¹⁵ û Soxosê.

SER 12

¹ Wê çaxê Hîrodîs padişah dest avêt ji kîlîsayê hinikan ezîyet kirinê. ² Û brêy Hanna Yaqûbê bi şûr kujt. ³ Û gava ko dî xoşa Yehûdîan têt, ji wî başqa Petros jî girt, û roya xamûrsizan bû. ⁴ Û gava ko awî girt li zindanê danî, û awî ji boy xodî kirinê, her yekî ji çar neferan îbaret ji çar taxim askeran ra teslîm kir, zîra dixosdibû ko, awî ji paşê basekê ji xalqê ra biderîne. ⁵ Nua Petros li zindan da dihat xodî kirin, hama kîlîsa bê sekinandin ji Xodê ra nimec dikir, ji boy wî. ⁶ Û gava ko Hîrodîs xosd awî deranîn, wê şevê Petros bi du zencîran hati grêdan, li nava aw askêran xew da diçobû; û li ber derîyê bekçîan zindanê dipêbûn. ⁷ Û va ha melekê Xodê hat, û li aw cî da rohnîkî parlamîş bû, û li tanişdê Petrosê bixisdinê, awî rakir, û go: Zû va rabe, û ji destê wî zencîran ketin. ⁸ Û melek go jê ra: Pişda xo grêde, û sola xo pêke, û wusan kir, û go jê ra: Cile xo wergir û were li dû min; ⁹ Û awî rabû û li pey wî çû, û nadizani- [310] bû erki ji aw melekê bûn tişt rasd e, lê taxmîn dikir ko xew dibîne. ¹⁰ Û gava ko bîrîncî hem îkîncî qaraqolê bihurtin li bajêr brox li derîyê asin hatin, ko ji wan ra aw ji xo hati vebûn, û wan derketin kûçakî bihurîn, û li wê saatê melek jê veqatîa. ¹¹ Û Petros aw ji xo hat û go: Nua bîra dizanim ko Xodê melekê xo şîand û ji destê Hîrodîsê xelas kir û ji hemî umudê qawmê Yehûdîan. ¹² Û fikirî hat li mala Marqos hati gotan Hanna dîa wî Meyremê, li ko kî pîran hati bûn civandin nimêc dikirin. ¹³ Gava ko derîyê hawşê xisd Hrovte nav qarwaşkî çû godarî kirinê; ¹⁴ Û gava ko dengê Petrosê nas kir ji şazîtlîyê derî venekir lê li hindur bazîla naql kir erki Petros li ber derîyê sekinî; ¹⁵ Hama wan gon jê ra: Tu dîn bûy, hama aw li söza xo disekinî bû erki ahwa e, nua wan gotin: Melekê wî e. ¹⁶ Hama Petros bê sekinandin lê dixisd, û gava ko vekirin awî bi dîtinê mat man. ¹⁷ Hama aw bi dest ji wan ra îşaret dikir ko

³¹⁵ Di metnê de *Padnapasê*.

hiş bin, û ji wan ra naql kir erki çawan Xodê awî ji zindanê deranî, û go: vîa ji Yaqûb ra ji brêyan ra naql bikin, û rabû başqa cî çû. ¹⁸ Ê gava ko sibê bû, acaba Petros çawan bû li nav askeran pîr welwelekî bû. ¹⁹ Ê Hîrodîs jî gava ko awî xosd, û nêdî, bekcîan teftîş kir, ji qatl bûn ra emr kir; û awî ji Yehûdîstanê çû li Qaysariyê û li wê disekinîbû.

²⁰ Ê Hîrodîs bi Dürosluan û bi Sîtonluan pîr dijmin bobû, wan jî bi yek îtfak jê ra hatin, û xas odabaşî padîşahê qandurmîş kirin Pîxasdosê, sulh bûn dîleg dikiribûn, [311] zîra welatê wan ji welatê padîşahê abûr disendibû; ²¹ Ê li malûm rockî Hîrodîs cilê padîşahanî wergirtibû li kürsî da ronîştibû ji wan ra xaber didabû. ²² Ê xalq jî diqîra erki av dengê Xodê e, û nâ dengê meruv. ²³ Ê li wê saatê melîkê Xodê awî xisd, zîra îzzet ji Xodê ra neda, û bi yê mê kurman bûnê, rûhê wî rabû.

²⁴ Ê kalamulahê pîr dibobû zêde dibobû. ²⁵ Ê Parnapas û Soxos gava ko xizmetê xo ada kirin, ji Qudsê vegeŕian, Hannâ Marqos hati gotan jî bi xo ra bi sendinê.

SER 13

¹ Ê li Antakîa da bûn li kîlîse da hinik peyemberan û xocayan hebûn, yanî Parnapas û Nûker hati gotan Şimhûn, û Xûgîosê Gürenî, hem bi rib başî Hîrodîs hati xodî bûn Manayen û Soxos. ² Gava ko wanan li xizmetê Xodê bûn, û rocî digirtibûn, Rûh el Quds go, Cîyê bikin ji mi ra, Parnapasê û Soxosê ji boy aw şixul, ji boy ê kê ko mi wan gazî kirî. ³ Wê çaxê wan paşê rocî girtinê û nimêc kirinê destê xo li ser wan danîn û şîandin.

⁴ Nua wanan ji Azîz Rûhê hatin şîandin li Selevgîayê çûn, û ji wê li Qibrisê bihurtin. ⁵ Ê li Saxamînayê bi gihîşdinê, li dêrê³¹⁶ Yehûdîan kalamulahê waz dikir[i]bûn; û Hanna jî xizmetcîkî wan bû. ⁶ Ê bi geŕandinê li aw hemî adayê hata Bamposê, li wê derew peyember falcî Yehûdîkî dîn, navê Pareyesû bû; ⁷ Ko aw bi qaymaqam ra bû, ko dihati gotan Serkîos Boxos, meruvkî bi aql, wîa Parna- [312] pasê û Soxosê gazî kir xosd ko kalamulahê bibihîse. ⁸ Hama falcî Elîmas ji wan ra qarşî sekinî çima ko ahwa tercûme dibe navê wî, ko dixosd qaymaqamê ji dînê vegeŕîne. ⁹ Hama Soxos ko Boxos jî tê gotin, bi Rûh el Quds hati tîji bûn çahv belîqand li ser wî, ¹⁰ Ê go, Ey! bi hemî hîle û bi hemî fendbazî tîji kurê şeytan,

³¹⁶ Di metnê de *aêrê*.

dijminê hemî sadaqatan doxrî roya Xodê xwar kirinê dê nasekinî?. ¹¹ Û nua va ha destê Xodê dê li ser ʔa bibe, û dê kõr bibî, zemankî dê tav nebînî, û li wê saatê li ser wî düman û ʔarî ket, û bi gerandinê yekî aramîş dikir ko ji destê wî bigire. ¹² Wê ʔaxê qaymaqam aw ʔişt ko bûn dî û îman anî, pîr heyran bû li ser talîmê Xodê. ¹³ Û wan ko bi Boxos ʔa bûn ji Baposê ʔabûn hatin li Berķê li bajêrê Bampûlîayê; hama Hanna ji wan veqatîa li Qudsê vegeʔîa.

¹⁴ Û wan jî ji Berķê ʔûn û hatin hatin li Antakîayê Bîsîʔîayê û li roya şemûê ketin li dêrê wan ʔonişdin. ¹⁵ Û ʔaşê nomosê û peyemberan xondinê, cemîyet başîan ji wan ʔa meʔuv şîandin û gon: Ey! brê meʔuvan erki ji qawm ʔa nasîhat sözkî wê heye bêjin. ¹⁶ Wê ʔaxê Boxos li ser lingan bi sekinandinê, bi destê xo îşaret kirinê go: Ey! meʔuvê Îsrayêlê hûn ko ji Xodê ditîrsin godarî bikin. ¹⁷ Xodê qawmê han bavêt me bijart, û qawmê li dîyarê Misrê bilind kir gava ko li qurbetê da bûn; û bi bilind, destê wan ji wê deranî. ¹⁸ Û qasa ʔil salan li ʔolê da wan xoyî kir. ¹⁹ Û li dîyarê Kananê da heft tayfan bi helak kirinê dîyarê wan ji wan ʔa da ko mîras bikin. ²⁰ Û ji³¹⁷ wê pê va qasa ʔar sed û pîncê salan ji wan ʔa qadîyanda hata **[313]** Samûel peyemberê. ²¹ Û ʔaşê padîşah xosdin û Xodê ji wan ʔa ʔurê Gîse Sawûxê da, ji qawmma Penîamînê meʔuvkî, ʔil salan. ²² Û gava awî gohrand, ji wan ʔa padîşah Dawûd ʔakir, ko ji boy wî şehadetî bi dayinê go: ʔurê Heseê Dawûd mi dî li göra dilê min mütabiq meʔuv ko dê hemî meramê min îcra bike. ²³ Xodê ji zürîyetê vîa li göra wadê ji Îsrayêl ʔa xelas Mesîhê ʔakir; ²⁴ Û hêja aw xizmetê xo dest nekir, Hanna ji hemî qawmê Îsrayêl ʔa ji awul tafîlê tobayê waz kir; ²⁵ Û gava ko Hanna rêya xo tamam dikir go: ez kî? me hûn taxmîn dîkin, ez Îsa nin im, lê va ha aw li pey min ʔê ko ez layîq nin im sola linga wî vekirinê. ²⁶ Ey! brê meʔuvan ʔurê cînsê Îbrahîmê, û wan ko li nav wê ji Xodê ditîrsin, söza xelasê han ji we ʔa hati şîandin. ²⁷ Zîra wan ko li Qudsê sakîn in û hükmdarê wan gerek awî gerek li her şemû da hati xondin denga peyemberan nas nekirin, îlla wan tamam kirin awî bi hükûm kirinê; ²⁸ Û ji mirin ʔa sebebki jî bi nedîtinê, ji Pîladosê dîleg kirin, ko aw bê ʔuşdin. ²⁹ Û gava ko ji der haqê wî aw hemî hati nivîsandin ʔiştan tamam kirin, ji darê anîn xwar, li tîrbê danîn. ³⁰ Hama Xodê awî ji mirîan ʔakir, ko aw pîr rocan ji wan ʔa xuyayî bû, ³¹ Wan ko ji Celîlê pê ʔa li Qudsê derketibûn, wan ko nua li ber qawmê şahîdê wî ne. ³² Em jî ji we ʔa waz dîkin aw wad ko ji bavêt me ʔa bobû. ³³ Em kî ʔurê wan in ko awî Xodê

³¹⁷ Di metnê de jê.

temam kir ji me ra Mesîhê bi qiyam kirinê, çawan ko li îkîncî zabûr da hatîe nivîsandin, tu kurê min î, mi îro ta za. ³⁴ Û ko awî ji mirîan rakir, û carkî jî çurugîtî [314] dê nebîne, ahwa dibê, erki ji we ra dê bidim emîn azîz wada Dawûdê. ³⁵ Nua li başqa zabûrkî jî dibê, ji Azîzê xo ra çurugîtî dîtin dê nedî. ³⁶ Çima ko Dawûd li asra xo da li gora meramê Xodê xizmet kir û mir, û li ba ejdadê xo hati datînin, û çurugîtî dî. ³⁷ Hama aw ko Xodê ji mirîan rakir, çurugîtî nedî.

³⁸ Nua malûmê we bibe Ey! merûvan ji semedê vîa ji we ra awfîtiyê güneyan tê waz bûn. ³⁹ Û ji aw hemî tiştan ko bi nomosê Mûsayê hûn qadîr nebûn sadiq bûnê bi wîa her kî ko îman tîne sadiq dibe. ⁴⁰ Nua saqin bin nebe ko li ser we bê aw ko li nav peyemberan hatîe gotin; ⁴¹ Mêze kin, ey! arhamarhoşan û şaş bin û helak bin; zîra amelkî dê bişixulim li roya we da, wusan amelkî, erki yekî ji we ra naql bike dê bawur nekin. ⁴² Û gava ko ji wê rabûn lava dikirin ji wan ra bê gotin. ⁴³ Û gava ko civatan bela bûn ji Yehûdîan û bi îtîqat li dînê hatoşan pîran li pey Boxosê û Parnapasê çûn ko wan bi wan ra xaber didabûn, û nasîhat dikirin wan, ko dayîma li lutfa Xodê da qayîm bisekinin.

⁴⁴ Û li aw roya şemûê dinê say kî bajêr hemî hatin civandin ji boy kelimulahê bihîstin ra. ⁴⁵ Hama Yehûdîan gava ko aw qalabayê dîn, bi hasûdîtî tîji bûn, û li qarşî gotina Boxosê, digotibûn, bi zid bûnê û bi küfr kirinê. ⁴⁶ Wê çaxê Boxos û Parnapas cesaret kirin û gon: Lazim bû ko awul kelimulahê ji we ra bê gotin, hama çûnkî hûn awî red dikin, û hûn xo ji ebedî hatat ra layîq hasab nakin, va ha [315] em jî ji tayîfan ra vedigerin. ⁴⁷ Çima ko Xodê ahwa ji me ra sipartîe, Mi ta ji tayîfan ra rohnî danî ko hata peşa dinê ji boy xelasê bibî. ⁴⁸ Û tayîfan vîa bi bihîsdinê şaz dibobûn û ji kelimulah ra îzzet didebûn, û aw hemî ko ji ebedî haayat ra tayîn bobûn îman anîn. ⁴⁹ Û söza Xodê li aw hemî cîwar da bela dibobû. ⁵⁰ Hama Yehûdîan îtîqatî û müteber jinan û ayana bajêrê qandurmîş kirin, û li ser Boxosê û Parnapasê qawarandin deranîn, û wan ji sînorê xo derxistin. ⁵¹ Û wan toza linga xo li qarşî wan da weşandin û li Qonyayê çûn. ⁵² Û şagirdan bi şazîtiyê û bi Rûh el Qudsê tîj dibobûn.

SER 14

¹ Û bû kî wan li Qonya da li yek cî li dera Yehûdîan ketin, wusan xaber dan ko pîr Yehûdîan û Yehûdîan îman anîn. ² Hama li îmanê nehatoş Yehûdîan dilê tayîfan fît kirin li qarşî brêyan, li fesadê dan. ³ Hama wan pîr wext li wê bi sekinandinê, bi Rabb serbest waz dikiribûn, ko ji boy söza lutfê xo şehadet fikir, û

keramatan û hîkmatan dida kirin bi destê wan. ⁴ Û qalabayê bajêr du fîrqa bû, hinikan li alîyê Yehûdîan bûn û hinikan jî li alîyê resûlan. ⁵ Û gava ko Yehûdîan û tayîfan bi hûkmdarê xo li ser wan hücûm kirin, jî boy wan kifr kirinê û kevîr kirinê. ⁶ Û gava ko wan bihîsdin revîan li bajêrê Lîgayonîan li Lûsdrayê û Terpeê, li aw alî semtan û li wê Încîlê waz dikiribûn. **[316]** ⁷ Û li Lûsdra da bi lingan zayîf meşuvkî ronîşdibû, jî rahma dîya xo topal za, ko qat nagefîabû.

⁸ Vîa söza Boşosê godarî fikir, wî jî li wî nihêrt û dî ko sax bûn ra îmanê wî heye, bi bilind awazkî go, ⁹ Râbe, rasd li ser linga xo bisek, aw jî dibazbazî û diçobû. ¹⁰ Qalaba gava ko kirinê Boşosê dîn bi zimanê Lîgayonê dengê xo helanîn û gon, Xodêan li kîswetê meşuvan bi ketinê jî me ra hatin xxwarî. ¹¹ Û jî Parnapas ra Tîos gazî dikirin, û jî Boşos ra Hermes, çima ko söz başî aw bû. ¹² Û li ber bajêr da bûn keşîşê pûta Tîosê li ber derfîyan noginan û tacan anî, bi xalqê ra tev dixosdibû qurban kirin. ¹³ Hama gava ko Parnapas û Boşos resûl bihîsdin, cilê xo qatanadin li nav qalabayê bi bazandinê diqîrabûn; ¹⁴ Û digotibûn, Ya! meşuvan tiştê hana çima? dîkin, em jî weka wê elem heboş meşun in, û waz dîkin jî we ra ko ji av hemî tiştê batalan li sax Allah ra veşerin, ko aw xalw kir azûman û ardê û bahrê û aw hemî tiştan ko li nav wan in. ¹⁵ Ko li aw geçmiş asîran da berda jî hemî mîletan ra li rêya xo biçin. ¹⁶ Bi aw hemî tiştan dîsa aw xo bê şehadet nahîşt, jî we ra ji azûmanan baranan û mahsûldar eyaman bi dayinê bi taaman û bi şazîfîan dilê wê bi tîji kirinê. ¹⁷ Û tiştê hana bi gotinê ancax qadir bûn civatan sekinandinê; ko qurban nekin. ¹⁸ Hama jî Antakiyê û jî Qonyayê Yehûdîan hatin û qalabayê qandu[r]mîş kirin û Boşosê kevîr kirin, û jî bajêrê der kşandin, bi taxmîn kirinê, erki mirîe.

¹⁹ Lakîn gava ko şagirdan li çar alîyê wî girtin, **[317]** rabû li bajêr ket û aw roya dinê bi tevlî Parnapas ra li Terpeê çû. ²⁰ Û wan li aw bajêr da bi waz kirinê û pîran bi şagird kirinê veşerîan li Lûsdrayê li Qonyayê û Antakiyê. ²¹ Û dilê şagirdan bi qawî kirinê, û bi nasîhat kirinê ko li îman da qawî bimînin, û digotin erki jî me ra lazim e bi pîr sixletan li padîşahîyê Xodê ketin. ²² Û gava ko ji wan ra ji her yek kîlîsa ra yeretsan nasb kirin, bi rocî û bi nimêc kirinê, wan jî Rabb ra hawala kirin, jî aw ra ko îman anîbûn. ²³ Û li Bîsîtîa da bi geşandinê hatin li Bampûlîyê. ²⁴ Û li Berke da kelamulahê bi xaber danê li Adalîyê çûn. ²⁵ Û jî wê ji bahrê li Anakîyê çûn, jî wê ko ji lutfê Xodê ra hawala bobûn jî boy aw şîxul ko tamam kirin. ²⁶ Û gava ko hatin kîlîsa li yek cî civandin û naql kirin çî ko Xodê bi wan ra kiribû; ko jî tayîfan ra derîyê Îmanê vekiribû. ²⁷ Û li wê pîr zemanan bi şagirdan sekinîn.

SER 15

¹ Û hinikan ji Yehûdîstanê hatin brêyan hîn dikiribûn, ko erki li gora adata Mûsa hûn sûnet nebin nikarin xelas bûn. ² Nua Boxos û Parnapas li qarşî wan paşê pîr nîzâ û mûcadele kirinê qarar dan ko Boxos û Parnapas û çend nas jî ji wan ji boy mesele han bi çûn li Qudsê ji resûlan ra û ji îxtîaran ra. ³ Nua wan gava ko ji kîlîsayê hatin şîandin vegezan ardê tayîfan bi naql kirinê ji Pünîgayê û ji Samarîayê dibihuribûn û ji hemî brêyan ra mezin şazîtî didabûn. ⁴ Û gava ko gihîş- **[318]** din li Qudsê ji kîlîsayê û ji resûlan û ji îxtîaran qabûl bûn, û naql kirin çî ko Xodê bi destê wan kiribû. ⁵ Û hinikan ji mezhebê farîsîan ko li îmanê hatibûn rabûn, û digotin: Erki lazîm e wan sûnet kirin û tenbîh bikin ko nomosê Mûsayê bipen. ⁶ Û resûlan û îxtîaran hatin civandin ji boy tiştê han şawir kirinê. ⁷ Û paşê pîr mûcadeleê Petros rabû ji wan ra go: Ey brê meşûvan hûn zanin ko roya awul Xodê ez bijart ji nav me, ko bi devê min tayîfan söza încîlê bibihên û îman bînin. ⁸ Û qalban zanox Xodê şehadet kir ji wan ra, rûh el Quds jî da ji wan ra, çawan ko ji me ra jî. ⁹ Û mabêna me û wan qat farqê nekir bi îman dilê wan bi paqij kirinê. ¹⁰ Nua çima? Xodê dicarabînin, li ser astûyê şagirdan wusan nîrîkî bi datîninê, ko awî ne bavêt me û ne jî em qadîr bûn helanînê. ¹¹ Hama em îman tînin ko bi lutfê Rabb Mesîhê xelas dibin, çawan ko wan jî. ¹² Û civat hemî hûs bobûn û godarî dikiribûn ji Parnapas ra û ji Boxos ra, wan ko naql dikiribûn, erki Xodê çiqas alaman û hikmatan kiribû bi destê wan li nav tayîfan. ¹³ Û gava ko wan xabêrê xo bîrîn, Yaqûb cewab da û go, Ey! brê meşûvan ji mi ra godarî bikin. ¹⁴ Şimhûn naql kir erki Xodê çawan awul zîyaret kir ko ji tayîfan qawm bistîne ji boy navê xo. ¹⁵ Û ji tiştê han ra xabêrê peyemberan jî mûtabîq in, çawan ko hatîe nivîsandin; ¹⁶ Ji vê pê ve dê vegeşim û çadîrê hati ketin e Dawûdê dîsa dê çî kim, aw cî ko hatîe heloşandin dîsa dê temel bikin û awî dîsa dê qurmîş bikin; ¹⁷ Ko baqîman meşûvan e Xodê **[319]** aramîş bikin, û hemî tayîfan li ser wan ko navê min hatîe gazî kirin, dibê Rabb, ko av hemî tiştan dike. ¹⁸ Ji Xodê ra ji awul da hemî amelê wî jê ra malûm in; ji temel bûnê dinê. ¹⁹ Ji boy vîa ez mînasîb dibînim sixlet nedin ji wan ra, ko ji tayîfan li Xodê vedigerin. ²⁰ Lê kaxîdkî binivîsîn ji wan ra ko şûnda bisekinin ji murdarîtiyê putan û ji zînayê û ji hati xaniqandin û ji xuynê. ²¹ Zîra ji kevn asîran vir da li nav hemî bajêran e Mûsa xondoxê wî hene, û li nav dêran li hemî roya şemûan dê xondin. ²² Wê çaxê ji resûlan ra û ji îxtîaran ra ji hemî kîlîsa ra li yek cî qanc xuya ko ji wan meşûvan bibijêrin li Antakîayê bişeyînin

bi Boxos û bi Parnapasê, Parsapayê ko laxabê wî Yehûda e, û Şîlayê ko wan li nav brêyan müteber merûvan bûn. ²³ Ê bi destê wan kaxîdkî şîandin, va ha hati nivîsandin bû: Resûlan û îxtîaran û brêan, silavan li Antakîayê û li Sûriyayê û li Gîlîgîayê ji tayîfan bûn ji brêan ra. ²⁴ Zîra em bihîsdin ko hinikan ko hinikan ji me bi rabûnê bi xaberan wê şaş kirin û canê wê xerab kirine, bi gotinê, erki lazim e sûnet bûn û nomosê bipên, ko ji wan ra em ahwa tenbîh nekirî. ²⁵ Em ko bi yek îtîfaq hatini civandin ji me ra mînasîb xuya ko merûvan bi bijartinê ji we ra bişeyînin bi mühib brêyê me bi Parnapasê û Boxosê. ²⁶ Wan ko ji boy navê Mesîh el Îsa Rabbê me canê xo dayox meruv in. ²⁷ Nua Yehûdaê û Şîlayê me şîand, ko wan jî bi dev heman av tîştan ji we ra xaber bidin. ²⁸ Zîra ji Rûh el Quds ra û ji me ra jî qanc xuya ko li ser wê barê zêde daneynin, ji av îxtîzâlî [320] tîştan pêtir. ²⁹ Ko dûr bisekinin ji qurbanê putan û ji xuynê, û ji hati xaniqandinê, û ji zînayê, ko ji av tîştan³¹⁸ hûn xo bi xoyî kirinê dê qanc bikin, sax bin. ³⁰ Ê wan jî li rê bi hati da dîtinê, çûn li Antakîayê, û cematani li yek cî civandinê kaxîdê dan. ³¹ Ê gava ko xondin, şaz bûn li ser aw dil pîrs bûnê. ³² Hama Yehûda û Şîla ko wan jî peyşember bûn, bi pîr xaberan ji brêan ra pîr dil pîrsî dan, û wan qawî kirin. ³³ Ê paşê wextkî li wê sekinandinê, bi selametî ji birêan rêwî bûn ji resûlan ra bi vegeşin. ³⁴ Hama ji Şîla ra qanc xuya ko li wê bisekine. ³⁵ Boxos û Parnapas jî li Antakîayê disekinîbûn, û bi pîran kelamulahê bi hîn kirinê waz dikiribûn.

³⁶ Ê paşê çend royan Boxos go ji Parnapas ra: Vegeşin û brêyan em zîyaret bikin li her yek bajêran li ko kî em kelamulahê waz kirin; û meze kin erki çawan in. ³⁷ Nua Parnapas Hannaê dixosd ko tev bi xo ra bisdîne, ko Marqos dihatibû gotan. ³⁸ Hama Boxos layiq nedî ko li Bampûliayê ji wan veqatox û bi wan li şîxul nehatox bi xo ra bisdîne. ³⁹ Ahwa li nav wan nîzakî bû, hata ko ji hevûdu veqatîan, û Parnapasê bi xo ra send Marqosê û bi bahr li Qibrizê çû. ⁴⁰ Ê Boxos jî Şîlaê bijart û rabû ji brêyan ji lutfê Xodê ra bi hawala bûnê. ⁴¹ Ê li Sûriyayê û Gîlîgîayê da digerîa û kîlîsan qawî dikir.

³¹⁸ Di metnê de *jîştan*.

SER 16

¹ Û li Terpeê û li Lüsdrayê gîya; û li wê şagirdkî hebû navê ê kê Dîmoteos, ko li îmanê [321] hatox kure jinkî Yehûdî bû, û bavê wî Yûnanî bû. ² Wîa Lüsdra da û li Qonya da bûn ji brêan meruvkî qanc şehadet bobû. ³ Boxos xosd ko wîa pê ra rabe, girt awî sûnet kir, ji boy li wê deran da bûn Yehûdîan, zîra hemî jî dizanibûn ko bavê wî Yûnanî bû. ⁴ Û gava ko ji bajêran dibihuribû, ji wan ra li Qudsê da bûn ji resûlan û ji îxtîaran hati mûnasîb dîtin qanonan ji boy xoyî kirinê bûn. ⁵ Û kîlîsan jî li îman da qawî dibobûn û ro bi ro nufûzê wan zêde dibobû. ⁶ Û li Prûkîayê û li alîyê Kaxadîayê gerîan, û ji Rûh el Qudsê mén bûnê, ko kelamulaê li Asîa da nebêjin; ⁷ Gava ko li alîê Mûsîayê hatin dixabitibûn ko li Pütanîayê herin, û Rûha Mesîhê berneda ji wan ra. ⁸ Û Mûsîayê bi bihurtinê li Drowatayê ketin. ⁹ Û li wê ji Boxos ra li şevê da xewkî xuyayî bû, yekî Masetonî sekinî jê ra lava dikir û digot: Li Magetonîayê bibihur û ji me ra îmdad bike. ¹⁰ Û gava ko xewê dî, zû ve ma xosd ko li Magetonîayê herin, bi fehm kirinê ko Xodê dixwaze ko em ji wan ra încîlê waz kin. ¹¹ Nua em bi gemîê ji Drowatayê rabûn û rûsd li Samotragê çûn, û aw roya dinê li Neabolîse. ¹² Û ji wê jî li Filîbê, ko ji qismkî Magetonîayê meşhûr bajêrkî e Goxovnîa, û çend roc li wî bajêrê em sekinîn. ¹³ Û li roya şemûê ji bajêrê der li kenarê çayê em rabûn li ko kî adetê wan hebû nimêc kirinê, û bi ronîşdinê, bihati civandin jinan me xaber dida.

¹⁴ Û ji Tüadîr bajêrê dzîranî frotax jinkî nava ê kê Lîtîa, ko ji Xodê tirsox yekî bû; godarî dikir, dilê ê kê Xodê vekir [322] ko ji gotina Boxos ra godarî bike. ¹⁵ Û gava ko tahfil bû aw û mala wî, lava kir û go: Erki mi emînê Xodê hasab dîkin, li mala min bişevîn û bisekinin, û ji me ra zor kir.

¹⁶ Û bû kî, gava ko em li nimêcê diçobûn, qîzkî rûsdê me hat, ko rûha falçîligê wî hebû, ko bi falçîlig kirinê ji axayêt xo ra pîr qazanc dianîbû. ¹⁷ Qîzê han li pey Boxosê û a me bi ketinê bi qîranê digot: Meruvê hana qulê Xodê Taala nin, ko wan ji me ra rêya xelasê waz dîkin. ¹⁸ Û tiştê han li pîr royan da dikir, û Boxos bi tacîz bûnê vegeîra, û ji rûh ra go: Ji ta ra bi navê Îsa el Mesîhê emr dikim, ko ji wî der bêy, û li wê saatê rabû.

¹⁹ Gava ko dîn axayêt wî ko umudê kêrê wan; hati brandin, girtin Boxosê û Şîlayê, û li ber hükmedaran li meydan da kşandin. ²⁰ Û wan li ba serdaran bi anînê gon: Meruvê han bajêrê me li ser hev dîkin wan Yehûdîan. ²¹ Û wusan adetan waz dîkin, ko ji me ra cayîz nin e qabûl kirin, ne jî amel kirin, çima ko em Romalî ne. ²²

Û qalaba li ser wan hücüm kir, û serdaran jî cilê xo qatandin, û emr kirin ko wan biqutîn. ²³ Û paşê wan pîr kutanê, dani wan li zindanê, û ji beqçiyê zindanê ra tenbih kirin, ko wan şedît xoyî bikin. ²⁴ Wî jî ahwa emrkî bi sendinê, wan li zindanê hindurê bi daninê, û linga wan li tumruxê xisd.

²⁵ Û li nivê şevê da Boxos û Şîla nimêc dikiribûn, û Xodê mübarek dikiribûn, û mahbûsan jî ji wan ra godarî dikiribûn. ²⁶ Û qafil zelzelekî mezin bû, wusan ko hemî zindanan hatin hejandin, û zû va hemî derîan hatin [323] vebûn, û grêdanê hemîan hatin vebûn. ²⁷ Û gava ko bekçîê zindanê heşar bû, û derîyê zindanê hati vebûn dî, şûrê xo kişand, û aw xo dixosdi kuştin, taxmîn dikirin ko mahbûsan revîan. ²⁸ Hama Boxos bi bilind sawndkî gazî kir û go, Tu ji xo ra kotî tiştî meke, zîra em hemî jî li vir in. ²⁹ Û aw çirakî xosd û li hindur bazîa, û bi lerezandinê ket li ber Boxosê û Şîlayê. ³⁰ Û wan li der anî û go: Ey! efendîan ji mi ra çi? lazim e kirin ko xelas bibim. ³¹ Wan jî gon: Ji Rabb Îsa el Mesîh ra îman bîne, û dê xelas bibî tu û mala ta. ³² Û kelamulahê jê ra xaber dan, û ji aw hemîan ra ko li mala wî da bûn. ³³ Û send wan li wê saatê şevê, û brînê wan şûşt, û zû ve tahfil bû wî û aw hemî ko ê wî bûn. ³⁴ Û wan li mala xo bi birinê li ber wan sînî danî, û bi hemî mala xo ji Xodê ra bi îman anînê şaz bû. ³⁵ Û gava ko sibê bû, serdaran xulaman şîandin û gon: Merûvê hanan berde. ³⁶ Û bekçîê zindanê xaberê han ji Boxos ra naql kir, erki serdaran şîandin ko hûn bên berdan, nua rabin bi selamet hevin. ³⁷ Hama Boxos go ji wan ra, me bê mahkeme aşkâr kutan ko em merûvkî Romalî ne, li zindanê danîn, û nua bi dizîka? derdixin, wusan nabe, lê bra wan bên û me derxin. ³⁸ Û xulaman xaberê hana ji serdaran ra naql kirin, wan jî gava ko bihîsdin erki Romalî ne, tirsîan, hatin ji wan ra lava kirin. ³⁹ Û li der bi anînê lava dikirin ji wan ra ko ji wî bajêr hêvin. ⁴⁰ Wan jî ji zindanê bi der hatinê ketin li mala Lîtiayê, û brêyan dîn, û dilê wan pîrs kirin û çûn.

[324] SER 17

¹ Û ji Ampîbolîsê û ji Aboxonîayê bi gerandinê, htin li Selanîgê, li ko kî dêrkî Yehûdîan hebû. ² Û Boxos jî li gora adetê xo li nav wan ket û sê roya şemûê bi wan ra ji kitêban xaber didabû, ³ Bi mana dayinê û li ber wan bi daftîninê, erki lazim bû ji Îsa ra eleman kşandinê û ji mirîan qiyam kirinê, û aw Mesîh ko ez ji we ra waz dikim go; Îsa e. ⁴ Û ji wan hinikan îman anîn, û bi Boxos û bi Şîla tev bûn hem ji Xodê tirsox Yûnanîan pîran û ji mütaber jinan jî çendan çendan.

5 Hama îman neanox̣ Yehûdîan hasûdî kirin çend meruvê boş boxaz yaramazan bi xo ra bi sendinê fesad deranîn û bajêrê dan welweleyê, bazîan li ser mala Hasownê û dixosdin wa li ber cûmhûrê birin. 6 Û gava ko wan nedîn, Hasownê û çend brêyan bi kaş kirinê birin li ber zabîte bajêrê bi qîranê, erki wan ko dinê li hevûdu kirin, li vir jî gihîştin. 7 Ko wan Hasown qabûl kirî, û wan hemîan li qarşî fermana xunkâr amel dikan, zîra başqa yekê yanî Mesîh padîşah e dibên. 8 Dan fesadê civatê û zabîte bajêrê wan ko tiştê han dibihîsdibûn. 9 Hama gava ko ji Hosawnê û ji başqan kefalet sendin, wan berdan.

10 Û brêyan zû ve³¹⁹ bi şevê Boxosê û Şîlayê şîandin li perîaê, û wan gava ko li wê gihîştin; çûn li dêra Yehûdîan. 11 Avan li Selanîg da bûn meruvan ji wan hênî aslzade meruv bûn ko kelamulahê bi tekmlîl dil qabûl kirin, û [325] her ro kitêban teftîş dikiribûn, erki tiştê han ahwa? ne. 12 Nua ji wan pîran îman anîn, û ji mahtaber Yûnanî jinan û meruvan îman anoxan hindik nebûn. 13 Hama gava ko Yehûdîe Selanîgê sah kirin, erki li Perîa da jî kelamulahê ji Boxosê waz bû, li wê jî hatin û civatê dani fesadê. 14 Wê çaxê brêan Boxosê şîyandin ko hata³²⁰ li kenarê bahrê here, hama Şîla û Dîmoteos li wê sekinîn. 15 Û wan ko Boxosê dibir[i]bûn, hata³²¹ Atîna anîn awî, û jê bi îzn sendinê ji boy Şîlayê û Dîmoteosê, ko zû ve jê ra bèn, û çûn.

16 Û Boxos li Atîna da wan bi beklemîş kirinê rûha wî li nav wî da bê huzûr bû, zîra bajêr hemî tîji li pûtparêzîtî didîtibû. 17 Nua li dêran da bi Yehûdîan û bi îtîqat meruvan xaber dida, û her ro li meydan da jî kê ra ko rast dihatibû. 18 Û ji Yebîgarî û ji Sdoiyîgî feylesofan hinikan bi wî ra bahs dikiribûn, û hinikan, av xaber bela kirox çi? dixwaze gotin, hinikan jî başqa xodêan³²² waz krox dê bibe digotibûn, zîra Mesîhê û qiyametê ji wan ra waz dikiribû. 19 Û awî bi girtinê birin li Arîbağ mehkeme da, û gotin: Em dikarin sah bikin av talîmê hana ko tu dibêy; 20 Zîra tu li goya me hinik tiştê xarîban tînî; çima ko em dixwazin zanin erki dê çi bibin wan. 21 Hemî Atînalîan û yabançî mîsafîran ji başqa tiştêkî ra godarî nedikibûn ji xayrî tiştêkî no gotinê û bihîsdinê.

22 Nua Boxos li orta Arîsbağ da bi sekinadinê go: Ya! meruvê Atîniyan ez wê ji her xusûs da ehlî mezheb dibînim. 23 Çima ko ez bi ge- [326] randinê gava ko mi cê îbadetê we tamaşa dikir; seşankî jî mi dî ko li ser ê kê da JI NAMALÜM XODÊ

³¹⁹ Di metnê de *zûze* (nîşeya wergêrê).

³²⁰ Di metnê de *hate* (nîşeya wergêrê).

³²¹ Di metnê de *heta* (nîşeya wergêrê).

³²² Di metnê de *Xodêan* (nîşeya wergêrê).

RA, hatibû nivîsandin; zîra awî ko hûn bê nas kirin jê ra îbadet dikin hemen e jî awî ji we ra waz dikim. ²⁴ Xodê ko dinê xalq kir, û li nav wî da bûn hemî tiştan aw Xodîê azümanan û ardê e, bi dest hati çêbûn li dacaran da sakîn nabe, ²⁵ Hem je ra weka ji tiştê kî ra mühtac bi destê insanan xizmet nabe, zîra ji hemîan ra ömr û nefes û her tiştê dayox aw e. ²⁶ Ê li ser rûya hemî ardê ji sakîn bûn ra, hemî mîlletê merûvan ji yek xuynê xalq kir, û ayrî zemanan îcra kir, û hem sînorê meskânê wan, hata ko Xodê aramîş dikin, ²⁷ Ko belkî bi destan³²³ awî sah bikin, faraza aw ji her yekê me dûr jî nin e; ²⁸ Zîra em bi wî dijîn, û dilebitin û em hene; çawan ko hinikan ji şairê wê gotin, Zîra em ji cînsa wî ne. ²⁹ Nua çûnkî em ji cînsa Xodê ne, lazim nin e ko em wusan hasab bikin ko Allahî bengzemîşê zêrê, ya zîvê, ya kevîrê bibe, ko bi sanaat û hûnerê merûvan qalem Îşî bûe. ³⁰ Nua Xodê wexta nazanîtiê bi nadîtin kirinê, nua li her cî ji her merûvan ra tenbîh dike ko toba bikin. ³¹ Zîra rockî taqtîr kirî, ko li wê ro da dinê bi adaletê hükm bike, bi destê aw merûv ko, awî aw tayîn kir, û ji hemîan ra îtimat da awî ji mirîan bi qiyam kirinê.

³² Ê wan gava ko qiyamê mirîan bihîstin, hinikan henak dikiribûn, û hinikan jî digotibûn, Ji boy tiştê han başqa carkî jî em dê ji ta ra godarî bikin. ³³ Ê ahwa Boxos ji nav wan rabû. ³⁴ Hama çend merûvan bi wî [327] tev bûnê îman anîn, ko li nav wan da bû Tîonesîos Arîsbaqalî, û jinkî nava ê kê Tamarîs û bi wan ra başqa kesan jî.

SER 18

¹ Ê ji wê pê ve Boxos ji Atînayê bi veqatanê li Gorintosê hat; ² Ê Yehûdîkî dî nava ê kê Agûxas cînsê wî ji Bondosê, ko bi Brîsgîxa tevî jina xo no hatibû ji Îdalîayê li gora emra Gxoîosê ko hemî Yehûdîan ji Hromê dûr bin û li cem wan çû. ³ Çûnkî ji yek saatê bûn li cem wan sekinî, û dişixulibû, çima ko sanaatê wan çadirçîti bû. ⁴ Ê li her roya şemû da li dêra wan da xaber dida, û Yehûdîan û Yûnanîan qandurmîş dikir. ⁵ Ê gava ko Şîla û Dîmoteos ji Magetonê hatin, Boxos li Rûha Xoda bi teng bûnê ji Yehûdîan ra bi şehadetî Îsbat dikir, erki Mesîh, Îsa e. ⁶ Ê wan jî gava ko qarşî sekinin û dijmînan dikiribûn, aw cilê xo bi da we şandinê go ji wan ra: Xuyna wê li ser we, ez pak im, ji wê pê ve ji tayîfan ra dê herîm.

⁷ Ê ji wê bi çûndinê ket li mala yekê, ko nava wî Husdos bû ji Xodê tirsox merûvkî, ko mala ê kê li joxovaranê zeliqî bû. ⁸ Ê cemîyet başî Grîsbox bi hemî mala

³²³ Di metnê de di *dîstan*.

xo ji bihîsdinê îman anîn û tahfil bûn. ⁹ Û Xodê li şevê da li xew da ji Boşos ra go: metirs, lê xaber bide, û hiş mebe. ¹⁰ Zîra ez bi ta ra me, û qat yekê ji ta ra ezîyet dayinê li ser ta dê nebaze, zîra li bajêrê han pîr xalqê min hene. ¹¹ Û li wê salkî û şeş mehan [328] sekinî, û kelamulahê li nav wan hîn dîkir.

¹² Li roya Qaxîon qaymaqamê Akayayê, Yehûdîan bi yek dil bÛnê li qarşî Boşosê rabûn û awî li siwanê birin; ¹³ Û digotin ko, Vîa merûvan qandurmîş dike ko nomos ra muxayîr ji Xodê ra îbadet bikin. ¹⁴ Û gava ko Boşos hazir bû devê xo vekirandinê, Qaxîon ji Yehûdîan ra go: Erki nahaqîtkî, yaxod yaramaz fendkî bibana, ey! Yehûdîan ji mi ra cayîz bû ji we ra godarî kirin. ¹⁵ Lakîn erki bahsa we li ser söz û navan û li ser nomosê we e, hûn bibînin ji xo ra, zîra ez hakîmê tiştê hanan naxwazim bibim. ¹⁶ Û wan ji mehkemeê qawarand. ¹⁷ Û wê çaxê hemî Yûnanîan cemîyet başî Sostenesê bi girtinê li ber mehkemeê kutan, û ji boy tiştê hana qat hacetê Qazîan nebû.

¹⁸ Û Boşos ji hêja paşê gelik ro li wê sekinandinê ji brêyan bi veqatandinê, ji bahrê li Sûriyê çû; Û bi wî ra Brîsgîxa û Agûxasê wî hebû. ¹⁹ Û li Yepesosê gihîşt û wan li wê hişt, hama aw li dêrê ket bi Yehûdîan ra xaber dida. ²⁰ Û jê ra lava dîkiribûn ko hênî pîr zemanan bi wan ra bimîne, lakîn qayîl nebû. ²¹ Lê ji wan ji veqatandinê go: Lazim e ko helbet helbet bayrama han ez li Qudsê bikim; hama bi îzna Xodê dîsa ji we ra dê vegeřim; û ji Yepesosê bi gemî rabû; ²² Û çû li Qayserîê û ji wê li Qudsê û ji kîlîsa ra selam da, û paşê çû li Antakîayê. ²³ Û paşê wextkî li wê sekinandinê rabû, û bi sira li eyaletê Qaxadîayê û Prîkîayê dewr dîkir, û hemî şagirdan qawî dîkir.

[329] ²⁴ Û bi nav Aboşos cînsê wî ji Îskenderê ehlî kelam, merûvkî Yehûdî hati gîya li Yepesosê ko wîa li azîz kitêb da pîr zanayî bû. ²⁵ Merûvê han rêya Xodê hîn bobûn, bi heraretê rûhê ji xusûsa Xodê xaber dida û hîn dîkir bi dîqatê, hama awî tenê tahfilê Hannaê dizanibû. ²⁶ Wîa li dêrê da bi cesaret dest kir xaber danê, û gava ko Sgûxayê û Brîsgîxê jê bihîsdin, hênî awî li cem xo sendin, û rêya Xodê hênî temam jê ra hîn kirin. ²⁷ Û gava ko awî xosd li Akayayê biçu brêan dil dan jê ra û kaxîd nivîsandin ji şagirdan ra ko awî qabûl bikin, ko gava ko li wê gîya, pîr yardum kir bi lutf ji îman anoxan ra. ²⁸ Zîra li meydan da pîr tazîl dîkir Yehûdîan, ji azîz kitêban bi nşan dayinê erki Mesîh Îsa ye.

SER 19

¹ Û bû kî gava ko Aboxos li Gorntos da bû, Boxos li alîyê jorîn da bi dewir kirinê hat li Yepesosê, û çend brêan dî û go ji wan ra: ² Gava ko we îman anî acaba Rûh el Qudsê we sendin; wî jî gon jê ra, Hebûnê Rûh el Quds bile me nebihîsdîe. ³ Û go ji wan ra: Lê bi çi? hûn tahfil bûn, wan jî go, bi tahfilê Hannaê. ⁴ Boxos jî go: Hanna bi tahfilê tobaê tahfil kir, ji xalqê ra go: Erki aw ko li pey wî dê bê jê ra îman bînin, yanî Mesîh el Îsaê. ⁵ Û gava ko awa bihîsdin bi navê Rabb Mesîhê tahfil bûn. ⁶ Û gava ko Boxos li ser wan dest danî Rûh el Quds li ser wan hat û ziman xaber didan aw peyxemberîtîê dikirin. ⁷ Û aw hemî merûvan qasa dwanzdahan bûn. **[330]** ⁸ Û li dêrê bi ketinê, sê mehan bi serbest li ser padîşahîtîê xaber dida, û qandurmîş dikir. ⁹ Hama gava ko hinikan înadî dikirin û qarşî disekinîbûn li ber qalabayê ji mezhebê han ra bi kotî gotinê, aw ji wan dîr bû, û şagirdan cîyê kir, û her ro li medreseê yekê bi Dûran nav xaber didabû. ¹⁰ Û vîa du salan kşand hata ko li hemî Asîa da sakîn bûn Yehûdîan û Yûnanîan kelamulahê bihîsdin. ¹¹ Û Xodê bi destê Boxosê acayîb keramatan dikir. ¹² Wusan ko ji cesedê wî li ser naxoşan bile dismalan, yaxod pêştîmalan dibir[i]bûn û ji naxoştîan sax dibobûn, hem yaramaz rûhan der dihatibûn.

¹³ Û ji aw dewr kroş Afsûnçî Yehûdîan hinikan, li ser wanan ko yaramaz rûhê wan heye nava Rabb Mesîhê zîkr kirinê bi dest datîninê digotibûn; Bi aw Mesîhê ko Boxos waz dike, em we sond didin xwarin. ¹⁴ Tîştê han kiroşan haft kûrê baş îmamkî Sgea ahti gotan Yehûdîkî bûn. ¹⁵ Û Rûhê yaramaz cewab da û go: Mesîhê ez nas dikim, Boxos jî dizanim, lakîn hûn kî? nin. ¹⁶ Û aw merûv ko li hindura ê kê bû Rûha yaramaz, li ser wan bi bazanê, girt wan û yengmîş kir, hata ko ji aw mal çiplax û brîndar derve rewîan. ¹⁷ Û tîştê han li nav Yepesos da sakîn bûn ji hemî Yehûdîan ra û Yûnanîan ra malûm bû; û li ser hemîan tîrskî ket, û ji nava Rabb Mesîh ra tazîl dibobû. ¹⁸ Û ji îman anoxan pîran dihatibûn û îqrar dikiribûn û kirina xo naql dikiribûn. ¹⁹ Û ji fal kiroşan pîran kitêbê xo bi xo ra dianîbûn û li ber hemîan bi dişawutandibûn; û qiymetê **[331]** wan hîsab kirin dîn ko pêncê hazar parça zîv bû. ²⁰ Û ahwa kelamulahê bi quwetê zêde dibobû û quwwet disendibû.

²¹ Û gava ko tîştê hana tekmlî bû, Boxos li nîyetê xo danî ko ji Mageţonîayê û ji Akayîayê bi dewr kirinê li Qudsê here, û digot, Erki paşê çûndinê min li wê lazim e ji mi ra ko Hrom jî bibînim. ²² Û jê ra xizmet kroşan diduan Dîmoteosê û Yerasdosê şîyand li Mageţonîê, û wî zemankî jî li Asîayê sekinî. ²³ Û li wê zeman da ji boy

mezhebê han pîr welwel bû. ²⁴ Zîra bi Têmedrîos nav zîvkerkî ji Ardemîs ra ji zîvê dacarê piçûkan çêdikir, ji ustan ra qazancan dianîbû. ²⁵ Nua wan û weka tiştê hana şixuloxan li yek cî civand û go: Ya! merûvan hûn zanin ko abûrê me ji tiştê hane. ²⁶ Ê hûn dibînin û dibihên ko Boxosê han, bi dest hati çêbûnan Allahani in bi gotinê na tenê e Yepesosê, îlla heman hemî xalqê Asîayê bi qandurmîş kirinê dilê wan gohrand. ²⁷ Nua zarar heye na kî tenê av sanaatê me dê nafiye bibe, lê dacarê Ardemîs Xodê mezinê jî dê nafiye hîsab bibe, û dê mezin azametî wî batal bibe, awî ko jê ra hemî Asîa û dinê îbadet dikan. ²⁸ Ê gava ko vîa bihîsdin bi hers bûn diqîrabûn û digotibûn: Mezin e Ardemîsê Yepesosîan. ²⁹ Ê bajêr bi qarîşixlixê tîji bû, û heman girtin Qayîosê û Arîsdarkos Mageṭonalîan, heval rêwîyê Boxosê hemain li yek caran li meydanê bazîan. ³⁰ Hama gava ko Boxos xosd li nava qalabayê çûndinê, şgirdan nehîştin wî. ³¹ Hem ji hûkmdarê Asîayê hinikan wan ko dostê wî bûn, jê ra şîandin lava dikiribûn [332] ko li cî meydanê neçe. ³² Nua yekî türlikî û awê din türlikî diqîrîbûn, zîra aw cûmhûr li nava qarîşixlixê bû, û pîran jî nedizanibû erki ji boy çî? hatine civandin. ³³ Ê ji nava qalabayê li ber anîn Aṭeksantrosê awî ko yehûdîan li pêş axotîn, Aṭeksantros jî destê xo bi libidandinê dixosd ko ji xalqê ra cewab bide. ³⁴ Hama gava ko zanîn aw Yehûdî e hemî jî bi yek dev bûnê qasa du saatan diqîrîbûn, erki mezin e Ardemîsê Yepesosîan. ³⁵ Hama kâtib qalabayê bi hinikî huskot kirinê go: Ey! merûvê Yepesosîan aw kîjan merûv e ko nizane bi bajêrê Yepesosîan mezin Ardemîsê û Tîsbîdes xamilandox dacarê putan. ³⁶ Nua erki asah tiştê han ahwa e, lazim e ji we ra rahat bisekinin, û ne maqbûl tiştê nekin, ³⁷ Zîra merûvê han anîn; wanan ko ne dacarê talan kirine ne jî ji Xodê we ra küfr kirine. ³⁸ Nua erki e Têmedrîos û bi wî ra bûn ustayan tiştê wan bi yekê ra dîwan vekirî û qaymaqam heye, bra murafe bibin. ³⁹ Lê ji boy başqa tiştê bahsa wê, bra li nava li ser qanûn qurilmîş meclîs da fasl bibe. ⁴⁰ Zîra em jî li nav zarar da ne ji boy welweleê roya han, çûnkî bîla sebeb bû; wusan ko em dê qadîr nebin ji boy cûmhûrê han cewab dayinê; û ahwa bi gotinê cûmhûrê bela kir.

SER 20

¹ Û paşê welwelê sekinandin Boşos şagirdan ji xo ra gazî kir, û silavê cîê bûnê ji wan ra da rabû ko li Mageţonîayê here. ² Û paşê li [333] li aw alîan dewir kirinê û bi pîr sözan dilê wan pîrs kirinê hati li Yûnanîstanê. ³ Û paşê li wê sê mehan sekinandinê, Yehûdîan jê ra fendkî danîn gava³²⁴ ko dixos li Sürîayê rabû, ji boy wî qarar kir ko ji Mageţonîayê vegere. ⁴ Û hata li Asîayê bi wî ra diçobûn Perîali kurê Bîrosê Sobadros, û ji selanîgîan Arîsdarkos û Segundosê Dükîgos û Dropîmosê. ⁵ Wanan li pêş me çûn li Drovaţa ji me ra dipêbûn. ⁶ Em jî paşê roya fetîran ji filîbeê ji bahrê rabûn, li nava pênc royan li Drovaţaye li cem wan hatin, û li wê heft ro sekinîn. ⁷ Û li roya yek şemûê gava ko ji boy nan parça kirinê hati bûn civandin, Boşos ji wan ra waz dikir, çima ki li aw roya din dê rêwî bibana, û xaber dirêj bû hata li nîva şevê. ⁸ Û li aw odaê jorîn, li ko kî em hatibûn civandin pîr çirêan hebûn. ⁹ Û xortkî nava ê kê Yevdîkos gava ko pacê da rodinişdibû, li gran xew da çûbû, gava ko Boşos xaberê xo drêj kir aw li gran xew da bi xerk bûnê ji sê taqan xwarî ket û awî mirî helanîn. ¹⁰ Û Boşos hati li xwarî, li ser wî ket û awî helmêz kir û digot, Xam mexun, zîra canê wî li wî da e. ¹¹ Li jor rabû nan parça kir û xwar, û hata sibê gelik jî xaber da û paşê rabû çû. ¹² Û aw xortê sax anîn û dilê wan pîr hati pîrs bûn.

¹³ Em jî li gemîê bi ketinê li Asonê rabûn; umudê me hebû ko ji wê dîsa em Boşosê bistînin, çima ko wusan sipartibû, zîra aw ji zuwayîê dê biçana. ¹⁴ Û gava ko li Ason da laqa me hat me em awî sendin li Mîfîlîê hatin. [334] ¹⁵ Ji wê jî bi bahrê em rabûn li aw roya dinê em li ber Saqîzê gîyan, û li aw roya dinê li Samosê em gîyan, û li şevê em li Droqîlîun da bi sekinandinê aw roya dinê li Melîosê hatin. ¹⁶ Çima ko Boşos li dilê xo danibû ko bi gemî ji ba Yepesosê bibihure, ko nebe li Asîa da wext bibihurîne, zîra zû dikir erki qabîl e jê ra li roya Bendegosdeê li Qudsê da bibe.

¹⁷ Û ji Melîdosê meruv şîyand li Yepesosê û îxtîarê kîlîsayê gazî kir. ¹⁸ Û gava ko hatin jê ra, go ji wan ra, Hûn zanin ko ji roya awulê pê va ko ez li Asîayê hatim, çawan bi we ra bûm li her wext. ¹⁹ Bi mahcûbîtîê ji Xodê ra mi bi xizmet kirinê, û bi pîr îstêrkan û bi tercîbean, ko ji fendê Yehûdîan rasta mi hatin. ²⁰ Çawan ji tiştê faydelîan ez şûnda nesekinim ji we ra gotinê û ji we ra aşkâr kirinê hem mal bi mal talîm kirinê netîrsîam. ²¹ Û bi şehadetî dayinê li ber Yehûdîan û Yûnanîan li alîyê Xodê ji boy tobayê; û ji boy aw îman ko li ser Rabbê me Îsa el Mesîh e. ²² Û

³²⁴ Di metnê de gava gava.

nuwa va ha ez bi Rûh hatim grêdan li Qudsê diçum, û li wê çi dê ber min bê nizanîam. ²³ Tenê Rûh el Quds li bajar li bajar ji mi ra şhadetî dike û digo: Erki grêdan û ezîyetan ji mi ra dipên. ²⁴ Hama qat yekî jî hasab nakim, û canê xo bi qiyet hasab nakim ji xo ra, lê tenê rêya xo bi şazîtiyê tamam bikim û aw xizmet ko mi ji Rabb Mesîhê send ji boy Încîlê lutfê Xodê şahîd bûnê. ²⁵ Ê nuwa va ha ez dizanim hênî hûn hemîan rûya min dê nebînî, ko li nav we da ez gerîam padîşahîtiyê Xodê bi waz kirinê. ²⁶ Nua ez ji we ra şhadet dikim ko ez pak im ji xuyna we [335] hemîan. ²⁷ Zîra ez şûnda nesekim hemî meramê Xodê ji we ra ji boy beyan kirinê. ²⁸ Nuwa saqin bin ji xo ra û ji boy aw cölê hemî ko li ser ê kê Rûh el Quds we naziran danî, ji boy kîlîsayê Xodê çêrandinê, awî ko bi xuyna xo qazanc kir.

²⁹ Zîra vîa ez dizanim ko paşê çûndinê min li nav we da dê gurê haran bişevî ko cölê dê qaîrmîş nekin. ³⁰ Ê ji we jî dê wusan merûvan rabin ko tiştê xwaran dê xaber bin, ji boy şagirdan li dû xo kşandinê. ³¹ Nuwa heşar bin û bîra xo bînî ko sê salan şev û ro ez nesekim her yekê bi îstêrkan ji nasîhat kirinê. ³² Ê nua ey! brêan, we ji Xodê ra û ji söza lutfê wî ra teslîm dikim, ko qadîr e ji çêkirin ra û bi hemî îtîqatlîan ra ji we ra dayinê. ³³ Ji zîvê yekê ra, ya ji zêrê yekê ra, ya ji wergirtinê yekî ra mi tama nekir. ³⁴ Hûn ji xo dizanî ko ji mi ra, ya awan ko bi mi ra bûn aw tişt ko ji me ra lazim bûn av destê min xizmet kirin. ³⁵ Her tişt mi ji we ra nşan da ko ahwa gerek e ji we ra xabitandin, û ji faqîran ra îmdad kirinê; û xaberê Rabb Îsa el Mesîhê ko aw go, Dayin ji sendinê hênî mübarek e. ³⁶ Ê gava ko tiştê hana xaber da, li ser çokan hat û bi wan hemîan nimêc kir. ³⁷ Ê hemîan jî pîr digrîan û li ser asîûyê Boxosê bi ketinê awî dîramîsabûn. ³⁸ Dilê wan hênî pîr dişawutîbû ji boy aw xaber ko digot: Hênî rûya min dê nebînî û awî li re danî hata li gemî bi wî ra bi çûndinê.

[336] SER 21

¹ Ê gava ko em rabûn û ji wan û ji wan veqatîan rast bi gemî li Gov em hatin, û aw roya din Rodosê û ji wê li Badaraê. ² Ê me gemî dîn, ko li Pünîgê diçobû; em ketin li ê kê, li rê rabûn. ³ Ê gava ko Qibris xuya, awî li alîê çepê xo me bi hiştinê li alîê Sürîayê em diçobûn, û li Dürosê em rabûn, zîra gemî li wê dê barêt xo bixana. ⁴ Ê şagirdan me dî û heft ro li wê em sekinin, wan ko digotibûn bi Rûh el Quds ji Boxos ra li Qudsê neçe. ⁵ Ê gava ko aw roya me bihurt, em rabûn û diçobûn hemî jî bi jinan û bi zarûkan hata ji bajêrê der me rê danî û li kenarê bahrê da me li ser

çokan bi hatinê nimêc kir. ⁶ Silavê veqatîanê ji hevûdu ra bi dayinê em li gemîê suwar bûn, wan jî li cîê xo vegeŕian. ⁷ Û em paşê rêwîtiê bahrê tamam kirinê ji Dûrosê li Bdoxemayîsê gîan û brêan bi silav kilav kirinê rokî li ba wan em sekinîn. ⁸ Û li aw roya dinê em ji wê rabûn û li Qayserîê gîan û li mala Fîlîbosê Încîlçîê em ketin, ko aw ji haŕtan yekê bû, li ba wî em sekinin. ⁹ Ji wî ra çar qîzê bakir hebû, ko peyemberîti dikiribûn. ¹⁰ Û li wê gava ko em pîr royan sekinîn, ji Yehûdîstan Akapos nav da peyemberkî hat; ¹¹ Û gava ko li ba me hat, pişta Boxosê send û dest û linga xo grêda û go, Rûh el Quds ahwa dibêje, av meruv xodîê piştê han awha dê grêdin Yehûdîan li Qudsê da û li destê tayîfan dê teslîm bikin. ¹² Û gava ko vîa em bihîsdin lava kirin em û yêrlîan ko li Qudsê neçe. [337] ¹³ Hama Boxos cewab da, hûn çi? dîkin û çima? digrin û dilê min diasarînîn; zîra ez ne tenê li Qudsê da ji boy grêdanê, lê ji mirin ra jî hazir im ji Rabb Mesîhê. ¹⁴ Û gava ko aw godarî nekir em hiş bûn û gon: Muradê Xodê bra bibe. ¹⁵ Û paşê roya hana me tedarîk dî ko li Qudsê harîn. ¹⁶ Ji Qayserlî şagirdan çend kesan bi me ra hatin, û me brîn ji Qibrizlî Mnason ra ji awul bûn şagirdkî ra, ko li ba ê kê em dê qonaş bikirina. ¹⁷ Û gava ko li Qudsê ketin brêan bi şazîti me qabûl kirin. ¹⁸ Û li aw roya dinê Boxos bi me ra li ba Yaqûbe çû; û hemî yeretsan jî hatin. ¹⁹ Û ji wan ra bi silavan yeka yek naql fikir her çi ko bi xizmetê wî kir li nava tayîfan. ²⁰ Wan jî bi bihîsdinê, hamd dikirin ji Xodê ra, û gotin jê ra: Dibînî?, ya! brê çend? hazaran îman anox Yehûdîan hene û hemî jî xayretkeşê nomosê ne. ²¹ Hama ji boy ta hasîan erki tu li nav hemî tayîfan da bûn ji Yehûdîan ra ji Mûsa awî asî bûn hîn dikî, dibêy ko kureş xo sûnet nekin û li gîra adetan neçûn. ²² nua dê çer bibe helbet qalaba dê bîn civandinê bibihên erki tu hatîy. ²³ Nua tiştê han bike ko em dibên. ²⁴ Li ba me çar meruv hene; ko wadê wan heye, wanan bistîn û bi wan ra paqij be, û ji boy wan masraf bike, ko serê xo kur bikin wusan ko hemîan jî bizanibin erki çi ko li ser da hasîane nafîle nin, lê tu jî bi me ra diçuy li nomos da awî xoyî kirinê. ²⁵ Hama ji boy li îmanê hatox tayîfan me kaxid şîyand çawan ko me mînasîb dî, ko wan qat tiştê ahwa nepên lê [338] tenê saqin bin ji qurbanê putan û ji xuynê û ji hati xanaqandinê û ji zînayê. ²⁶ Wê çaxê Boxos aw meruvan send û aw roya dinê bi wan ra hati paqij bûn li dacarê ket, ji boy royê paqij bûnê tamam bûnê wî nşan dayinê hata ko ji boy yekê wan hedîye hati dayin. ²⁷ Û gava ko heft royan tamam dibana, Asîalî Yehûdîan awî li dacar da bi dîtinê hemî qalabayê li welweleê xisdin û dest avêtin awî û diqîrabûn. ²⁸ Ya! meruvê Yehûdîan, werin li îmdadê, vîa aw meruv e, ko li her cî ji xalqê ra, û ji nomos ra û ji cîê han ra qarşî tiştan hîn dike ji

hemîan ra, hata ko Yûnanîan jî bir li dacarê, û cîê naha azîz, murdar kir. ²⁹ Zîra ji awul Dropîmosê Yepesoslî bi wî ra li bajêr da dîbûn, û taxmîn dikiribûn ko Boşos awî li dacarê dîn. ³⁰ Ê hemî bajêr li hevûdu bû, û xalq hatin civandin, û girtin Boşosê ji dacarê der kşandin, û zû ve derîan hati qufilandin. ³¹ Ê gava ko wan dixosdibûn awî kuştinê xaber gîya ji bînbaşîê bölügê ra erki hemî Qudsu şerîf li hevûdu bûe. ³² Wî jî li wê saatê askeran û yüzbaşîan send û li ser wan bazîa wan jî gava ko askerê û bînbaşîê dîn Boşosê ji kutanê sekinîn. ³³ Wê çaxê bînbaşî bi nêz bûnê girt awî û emr kir ko awî bi du zencîran grêdin û pirs dikir erki aw kî? e û çî? kirîe. ³⁴ Ê qalabayê yekî tarzî û awê din başqa tarz tiştî diqîrabûn, hama ko ji gürültîyê nikâribû sahihê bizane emr kir ko awî li orduê bibin. ³⁵ Ê gava ko li nerdîwanê gîya; wusan rast hat ko ji zorê qalabayê askeran awî li jor [339] helînin. ³⁶ Çima ko qalabayê xalqê li dû wî diçobûn û digotibûn: Awî helîne. ³⁷ Ê wexta ko Boşos li nava orduê diketibû, ji bînbaşî ra go: Acaba îzn heye ko ta ra tiştî bêjim. ³⁸ Wî jî go: Bi Yûnanî dizanî?, acaba tu aw Misrlî nin? î ji av royan awul çar hazar merûvê keleşan ta asî kir û li çölê bir. ³⁹ Ez merûvkî Yehûdî me, ji Darsonê Gîlîgîayê û bajarîê meşhûr bajêrkî û lava dikim ji ta ji mi ra îzn bide ko ji xalqê ra xaber bidim. ⁴⁰ Ê gava ko awî îzn da, Boşos li ser nerdîwanê bi sekinandinê, ji xalqê ra bi destê xo îşaret kir; û gava ko qanc huskûtî bû, bi zimanê Îbranîan xaber da ji wan ra û go:

SER 22

¹ Ya! merûv brêan û bavan, ji mi ra godarî bikin, ko nua ji we ra cewab didim. ² Gava ko bihîsdîn ko bi zimanê Îbranî ji wan ra xaber dida, hênî pîr huskot bûn. ³ Ê awî go: Bîra ez merûvkî Yehûdî me, li bajêrê Gîlîgîayê li Tarsîs da zame, û li bajêrê han linga Kamaşîel da terbîa bûm, li gora nomosa bavanê me hatim terbîa bûn, û xayretkeşê Xodê bûm, çawan ko îro hûn hemî³²⁵ ne. ⁴ Ko ez mêran û jinan bi grêdanê û li hapsan bi teslîm kirinê, mezhebê ha mi hata li mirinê diqawarand; ⁵ Çawan ko ji derhaqa min baş îmam jî û hem hemî îxtîarê qawmê şehadet dîkin, ko ji wan kaxîdan jî mi send ji boy brêan li Şamê diçobûm, ko li wê da bûnoşan bi grêdanê li Qudsê bînim ko bêne tedîb bûn. [340] ⁶ Ê bû kî gava ko diçobûm, û li Şamê nêz bûm, li wexta nîvro ji azümanan rohnîkî mezin li çar alîyê min şawq da. ⁷ Ê li ardê ketim û dengî mi bihîst ko digot ji mi ra: Ya! Sawux, Sawux, tu çima? mi diqawarînî. ⁸ Mi jî

³²⁵ Di metnê de *hmî*.

cewab da, Ya! Rabb, tu kî? î, wî jî ji mi ra go: Ez Mesîhê Nisranî³²⁶ me, ko tu mi diqawarînî. 9 Hama wan ko bi mi ra bûn, rohnê dÎn û bi tîrs tîjî bûn, lakîn aw ko bi mi ra xaber dida dengê wî nebihîsdin. 10 Ê mi go: Çi? bikim, ya! Rabb; û Rabb go ji mi ra, Rabe li Şamê hare, û li wê dê bê ji ta ra gotin ji boy aw hemî tiştan ko tayîn bûe ji ta ra kirin. 11 Ê gava ko mi nedidî ji boy celalê aw nûrê û wan ko bi mi ra bûn ji destê min girtin û ketim li Şamê. 12 Ê bi Ananîa nav meruvkî li gora nomosê dîndar û li Şamê da ji hemî sakîn bûnoşan hati qanc şehadet bûn, 13 Hati ji mi ra û li ba min bi sekinadinê ji mi ra go: Ya! Sawux brê, li jor mêze ke. 14 Mi jî li wê saatê li jor jê ra mêze kir, û go: Xodêt bavanê me ji awul ta tayîn kir, ko meramê wî bizanî û aw sadiqê bibînî, û ji devê wî deng bibihê, 15 Zîra li ber hemî meruvan ji boy aw hemî tiştan şahîd dê bibî, ko ta dî û bihîsd. 16 Ê nua hênî çima? darangî dikevî, rabe tahfîl be; navê wî bi gazî kirinê güneyêt bişo. 17 Ê bû kî gava ko ez li Qudsê vegeřiam, û li dacar da mi nimêc fikir, weka li xew da ketim, û mi wî dî ko ji mi ra got: 18 Zû ke? zû ve ji Qudsê rabe, zîra ji boy min şehadetê ta dê qabûl nekin. 19 Mi jî go: Ya! Rabb wan qanc dîzanin ko awan ko ji ta ra îman tînin li dêran da di- [341] kutabûm, û li hapsê didanibûm. 20 Ê gava xuyna şahîdê ta Sdepannosê dihatibû rijandin, ez bi xo li rê hazir bûm, û ji qatlê wî ra mi rîza da, û cilê awî kuştoşan mi dipêbûm. 21 Ê ji mi ra go: Hare, zîra ez ta li dûr ji tayîfan ra dê bişeyînim. 22 Ê wan hata söza naha jê ra godarî dikiribûn, paşê dengê xo helanîn û gon: Ji dinê helîne meruvê han, zîra jê ra sax mînin layiq nin e. 23 Ê gava ko diqîrabûn û cilê xo davêtibûn û tozê li hawayê davêtibûn, 24 Bînbaşî emr kir ko awî li orduyê bibin, û go kî bi kutanê awî teftîş bikin, hata ko bizane ji boy çî qabhatê ji boy wî diqîrabûn. 25 Ê gava ko biqayîşan awî grêdanni, Boxos ji nazîr yüzbaşî ra go: Ji we ra cayîz e ko Romalî û bê şerat meruvkî kutan. 26 Yüzbaşî gava ko vîa bihîst çû ji bînbaşî ra naql kir û go: Çi? dê bikî, zîra meruvê han Romalî e. 27 Bînbaşî jî çû li balê û go jê ra: Bêje ji mi ra, tu Romalî? î, wî jî go: Belî. 28 Bînbaşî cewab da, mi bi pîr dravan hîmayetê han li dest anî, û Boxos go, ez heman li wî da zame. 29 Nua meruvê han ko awî teftîş dikiribûn zû ve jê dûr ketin û bînbaşî jî tîrsîa, gava ko bihîsd erki Romalî e; zîra awî grêdabû. 30 Ê li aw royâ dinê xosd ko rastîê bizane, erki çî? e gilê Yehûdîan li ser wî, awî berda, emr kir ko baş îmaman û hemî cemîyetê wan li yek cî bîn, û Boxosê anî û li ber wan sekinand.

³²⁶ Di metnê de *Nidranî*.

[342] SER 23

¹ Û Boḫos çahvê xo li ser civatê bi helanînê go, Ya! brê merûvan; ez hata li roya han li ber Xodê bi zamîrê qanc geçinmîş bûme. ² Û baş îmam Ananîa li ba wî sekinandoḫan ra emr kir ko li devê wî xin. ³ Wê çaxê Boḫos jê ra go: Xodê dê li ta xe, ey! dîwarê hati dayinandin, ko tu ronîşdîy li gora nomosê mi hokm bikî, ji nomosê der emr dikî ko li min xin. ⁴ Û li wê sekinandoḫan gon, Ji baş îmamê Xodê ra tîjmînan? dikî. ⁵ Boḫos daxî go: Ya! brêan mi nadizanibû erki baş îmam e, zîra nivîsandî e, erki ji hûkmdara qawmê xo ra kôtî mébêj. ⁶ Boḫos alîê yek sadûqî ne û awê din farîsî ne bi zanibûnê diqîrabû li nav civatê, ya! brê merûvan, ez farîsî û kûrê farîsî me, ez ji boy umudê mirîan û qiyametê mehkeme dibim. ⁷ Û gava ko vîa go li nava farîsîan û satûqîan firqa ket, û qalaba hati cîê bûn. ⁸ Zîra satûqîan dibên, erki qiyamet tunin e, û ne melek, ne jî Rûh; Hama farîsîan herduan jî îqrar dikin. ⁹ Û şamatakî mezin bû, û aw kâtîban ko ji alîê farîsîan bûn rabûn û bi pev çûnê digotibûn: li merûvê han tiştî kotî me nedîn, lê erki Rûhkî ya melekî jê ra xaber daye, em bi Xodê ra pev neçin. ¹⁰ Û gava ko pîr nîza bû bînbaşî pîr tîrsîa nebe ko Boḫos ji wan bê qatandin, ji askeran ra emr kir ko bèn Boḫos ji orta wan rakşînin, û li orduê bibin. ¹¹ Û li aw şeva din Rabb li ba wî hati û go: Ya! Boḫos pêt be, zîra çawan ko li Qudsê ji boy mi ta şehadet kir, wusan jî [343] li Roma da lazim e ko şehadet bikî. ¹² Û gava ko sibê bû, ji Yehûdîan hinikan yek bûn, û aw xo li bin lanetê danîn, bi gotinê, erki ne bixun û ne vexun hata ko Boḫosê bikujin. ¹³ Û ji çilan pêtir bûn wan ko wadê han bi hevûdu kiribûn. ¹⁴ Ko vanan ji baş îmaman ra û ji rûsipîan ra û gon: Em xo bi mezin lanetê ma grêda, ko tiştî taam nekin hata ko Boḫosê bikujin. ¹⁵ Nua hûn bi civat ra tev ji bînbaşî ra xaber bikin, ko awî sibê ji we ra bîne xwarî, göya kî ji derhaqê wî hênî qanc hûn hûn teftîş dikin, em hêja aw negîya, hazir in awî bikujin. ¹⁶ Û kûrê xuşka Boḫosê gava ko fendê han bihîsd, çû li orduyê ket, û ji Boḫos ra xaber kir. ¹⁷ Û Boḫos ji yûzbaşîan yekê ji xo ra gazî kir, û go: Kûrê han ji bînbaşî ra bibe, zîra xaberkî wî heye jê ra. ¹⁸ Wî jî awî bi sendinê ji bînbaşî ra bir, û go: Boḫosê mahbûs mi gazî kir bi lava kirinê ko kûrê han ji ta ra bînim, ko ji ta ra gotinê wî heye. ¹⁹ Û bînbaşî ji destê wî bi girtinê li alîkî çû, û pîrs kir, erki çi tiştê ta heye ji mi ra xaber kirin ra. ²⁰ Û awî go, Yehûdîan qawil û qarar kirin ko ji ta ra lava bikin, ko sibê Boḫosê ji civat ra bînî, göya kî ji derhaqê wî hênî qanc dê teftîş bikin.

21 Nua tu wan godarî meke, zîra ji wan ji çilan pêtir merûvan ji boy wî duzax³²⁷ danîne, wan ko aw xo li bin lanetê danîn, ko nexun û venexun, hata ko awî bişujin û nua hazir in û emrê ta ra dipên. 22 Wê çaxê bînbaşî kurîkê berda, jê ra bi tenbîh kirinê ko ji yekê ra nebêje, tiştê han ko ta ji mi ra xaber kir. 23 Ê [344] ji yûzbaşîan didoyan gazî kir, û go: Li şev saat li sisê da, du sed asker û heftê suwaran û du sed jî mizraqlî hazir bikin, ko hata li Qayserîê biçun. 24 Ê haywanan hazir bikin ko Boşosê suwar bikin, û sax selîm ji Pelîks walî ra bibin. 25 Ê kaxîdkî nivîsand li wî gorayê. 26 Gxoş Lûsîas ji qudretlu Pelîks walî ra selam dike. 27 Meruvê han ji Yehûdîan hatibû girtin, û ji wan dê bihata kuştin, lakîn ez bi askeran li ser gîyam mi xelas kir awî, gava ko hasîam Romalî e. 28 Ê mi xosd aw sebebê bizanim ji boy ê kê ko li ser wî gilî dikiribûn, awî mi anî li meclîsê wan; 29 Ko mi dî hati gilî bûn ji boy mûcadelekî li gora nomosê wan, ji mirin ra yaxod ji grêdan ra qabahatê wî tunne bû. 30 Ê gava ko mi xaber send ko Yehûdîan ji boy av meruv faq dê deynin, wê saatê mi ji ta ra şîand, û bi emr kirinê ji dawacîan ra jî ko li ber ta xaber bidin li ser wî, Sax be.

31 Nua asker jî li gora ji wan ra emr bûnê Boşosê sendin û li şevê da li Antîbadros birin. 32 Ê aw roya dinê bi wî ra çûndox suwaran awî hişdin û li orduê vegeşîan. 33 Wan jî li Qayserîê ketin û kaxîd ji wan ra dan û Boşosê li ber wî sekinandin. 34 Ê gava ko xosd, pîrs kir erki ji kîjan eyaletê e, û hasîa ko ji Gîlîgîaê e, go. 35 Gava ko dawacîê ta bên dê ta godarî bikim, û emr kir ko awî dîwanxanayê Hîrodîsê xoyî bikin.

SER 24

1 Ê paşê pênc royan Ananîa baş îmam, bi îxtîaran û bi Derdûxos nav bi yekê ehl-î kelam [345] hat; û wan ji walî ra xaber kirin dawa xo li qarşî Boşosê. 2 Ê gava ko awî gazî kirin, Derdûxos dest kir gilê û go, Zîra bi destê ta pîr selametan û bi taqdîrê ta tiştê mîlletê han ra av qanûnê qanc me qabûl dîkin, 3 Ya! qudretlu Pelîks, bi her xusûs da li her cî da yek car bi şikir bûnê em ji ta razî ne. 4 Lakîn nebe ko hênî zêde ta aciz bikin îcra dîkin ko tu bi hurmetê xo me godarî bikî, ko muxtarkî em ê dê xaber bidin. 5 Meruvê han me dî fesad kroş û şaş kroş hemî Yehûdîan ko li nava dinê ne; û erbaşê firqayê Nîsrânîan. 6 Ko dacar jî xosd murdar kirinê, awî ko me girt, û li gora nomosê me, me xosd şeratê wî bibînin. 7 Hama Lûsîas bînbaşî hat, bi cebr awî ji

³²⁷ Di metnê de *duçax*.

destê me send. ⁸ Û emr kir ko dawacîê wî ji ta ra bên, awî³²⁸ ko tu bi teftîş kirinê dê qadîr bibî bi zanînê ji boy aw hemî tiştan ko em li ser wîa gilî dikin. ⁹ Û Yehûdîan hemî bi yek bûnê, goni erki wusan e. ¹⁰ Gava ko walî jê ra çahv şikênand ko xaber bide, cewab da Boxos: Bi zanibûnê ko tu ji pîr salan hakîmê mîlletê han î ji derhaqê xo hênî zêde bi xoşnûdîtîyê cewab didim; ¹¹ Çünkî tu qadîr dibî bi zanînê ko ez ji dwanzdah royan zêde nin e, çiqas ko ez rabûm li Qudsê secde kirinê. ¹² Mi li dacar da bi yekê ra bahs kirinê, yaxod qalabayê li yek cî hati civandox ne dîn, ne jî li nav dêran da, ¹³ Û ne jî li bajêr da, ne jî dikârin îsbat kirinê aw tiştan ji boy ê kê ko nua li ser min gilî dikin. ¹⁴ Hama vîa ji ta ra îqrar dikim ko³²⁹ li gora aw mezhebê ko wanan firqa dibên, li nomos da hem li peyemberan da ji aw [346] hemî tiştan ra ko hatine nivîsandin bi îman anînê, ji Xodê ê bavanê xo ra wusan îbadet dikim. ¹⁵ Û ji Xodê ra umudê min heye çawan ko umudê wan jî heye, ko ji mirîan ra dê qiyam bibe, erki ji sadîqan ra û erki ji nahaqan ra. ¹⁶ Û ez her wext ji boy tiştê han dixabitin ko pak zamîrê min bibe, erki li ber Xodê, erki li ber meruvan. ¹⁷ Û paşê pîr salan ji mîlletê xo ra sadaqa û hedîyê kirinê hatim. ¹⁸ Bi wî havayê çend Asîalî Yehûdîan mi li dacar da dîn hati pak bûn, ne bi qalabayê û ne jî bi cûmhûr, ¹⁹ Ko ji wan ra lazim bû jî ko li huzûra ta bên, û erki li ser min tiştê wan hebû gilî bikirana. ²⁰ Yaxod wanan bra bêjin çi? sûc li ser mi dîn gava ko li mehkeme da sekinîbûn; ²¹ Tenê ji boy xaberê han ko li nav wan sekinîbûn mi gazî kir, erki ji boy qiyamê mirîan, îro ez ji we hökm dikim. ²² Û Pelîks wan ji başqa wextkî ra tayîn kir; zîra ji xusûsê mezhebê han qanc dizanibû, û go: Gava ko Lûsîas bînbaşî bê li vir, dê teftîş bikim bahsê wê. ²³ Û ji yûzbaşî ra tenbîh kir ko awî bipvê, û rahatî bida jê ra; û ji meruvêt wî jê ra xizmet kirinê, yaxod li balê çvûndinê ji yekî ra manî nebe. ²⁴ Û paşê çend royan Pelîks bi jia xo Trûsîxayê hat ko jin Yehûdîkî bû; û Boxosê gazî kir, û jê bihîsd ji boy aw îmanê ko li ser Îsa el Mesîhê e. ²⁵ Û gava ko aw ji derhaqê sadaqatê û nefse xo zabt kirinê, û li ser aw hökmê ko dê bê; xaber dida, Pelîks bi tîrs tîji bûne cewab da, Tu a nua hêre û kînga ko wext bibe dîsa ez ta gazî dikim. ²⁶ Û umud jî fikir ko ji alîyê Boxos jê ra dê axçe [347] bê dayin, ji boy ê kê pîr caran awî gazî fikir û bi wî ra xaber dida. ²⁷ Hama ko du sal temam bû, li cîê Pelîksê, Borgîos Pesdos hat, Pelîks jî xatrê Yehûdîan dixosd xoş kirinê, Boxosê hati grêdan hişt.

³²⁸ Di metnê de *dwî*.

³²⁹ Di metnê de *bo*.

SER 25

¹ Nua Pesdos gava ko eyalatê hokmatê xo gîya; paşê sê royan ji Qayserîê li Qudsê rabû. ² Ê baş îmam û mezinê Yehûdîan jê ra xaber kirin gilîê xo li ser Boxosê. ³ Ê jê ra lava dikiribûn û li ser wî hurmet dîleg dikiribûn ko awî li Qudsê anîn de, û wan li ser rê faq didanîbûn ko awî bikujin. ⁴ Hama Pesdos cewab da, ko Boxos li Qayserî da bimîne, û aw bi xo jî zû ve dê li wê biçubû. ⁵ Nua ji we qudretê kî ko heye go, bi mi ra bra bên; û erki sûckî av meruvê heye bra li ser wî gilî bikin. ⁶ Ê li ba wan hi heşt, yaxod deh royan zêde bi nesekinandinê li Qayserî çû, û li roya dinê li kursîê şeraatê bi ronîşdinê, emr kir ko Boxosê bînin. ⁷ Ê gava ko aw hat, ji Qudsê hatox Yehûdîan li ber wî bi sekinandinê pîr û gran gilîan dikiribûn li ser Boxosê, ko wan ji îşbat kirinê qadîr nedibobûn; ⁸ Zîra Boxos cewab dida, erki mi ne bida nomosê Yehûdîan û ne dacarê û ne jî li qarşî xundkârê mi sûckî kirî. ⁹ Hama Pesdos ji boy xatirê Yehûdîan xoş kirinê, cewab da ji Boxos ra û go, Dixwazî? li Qudsê çûndinê û li wê ji boy tiştê hana mehkeme bibî li ber min. ¹⁰ Boxos jî go: ez li ber kursîê şeraatê xundkârê di- **[348]** sekinim, li wê kî ji mi ra lazim e mehkeme bûn, mi ji Yehûdîan ra nahaqîtkî nekirî, çawan ko tu jî qanc dizanî. ¹¹ Zîra erki mi nahaqîkî, ya ji mirin ra mustahaq tiştî kirî ez ji mirinê nâtîrsim, lakîn erki tunne li ser mi jî av tiştan yek jî wan ko vanan li ser min gilî dîkin, qat yekê nikare mi ji wan ra baxş bike, ji xundkâr ra îfade dikim. ¹² Wê çaxê Pesdos bi şûrayê xaber da, û go: Ji xundkâr ra ta îfade kir, ji xundkâr ra hare. ¹³ Ê paşê çedn royan Akribas padîşah û Perîmîgê li Qayserîê hatin Pesdosê selam kirinê. ¹⁴ Ê pîr royan ko li wê bihurtin, Pesdos ji derhaqê Boxos ji padîşah ra xaber kir û go: Li vir meruvkî heye ko Pelîks mahbûs hiştî, ¹⁵ Ji bos ê kê gava ko ez li Qudsê çûm baş Îmaman û mezinê Yehûdîan ji mi ra xaber kirin, û dîleg dikiribûn ko li ser wî jî hokm bûn ra sîcîl bê dayin. ¹⁶ Ê mi ji wan ra cewab da, ko adetê Romalîan nin e ko meruvkî ji helak bûn ra baxş bikin, hata ko aw hati gilî bûn meruv bi gilîcîan rû be rû nebe, ji boy cewab dayin gilîê jê ra fursent nâyî dayin. ¹⁷ Nua gava ko wan bi mi ra li vir hatin, qat bi drengî naxisdinê aw roya din li kursîê şeraatê bi ronîşdinê mi emr kir ko aw meruv bînin. ¹⁸ Ê gava ko gilîcîê wî hazir bûn ji derhaqê wî ji aw tiştan ko mi taxmîn dikir; qat sûckî li ber neanîn. ¹⁹ Lakîn li ser dinê wan çend bahsê wan bi wî ra hebû, û li ser mirîkî nava ê kê Mesîh, ji boy ê kê Boxos digo, Erki sax e. ²⁰ Ê gava ko ez li weswese da bûm ji boy teftîşê tiştê han mi go, Ko dixwazî li Qudsê **[349]** biçuy û li wê ji boy tiştê hana mehkeme bibî. ²¹ Hama gava ko Boxos îfade kir li ber hûkma Alîşanê rabe, mi emr kir ko awî xoyî kin, hata

ko ji xundkâr ra bişeyînim. ²² Û Akrîbas go ji Pesdos ra, E jî dixwazim av merûvê godarî bikim; wî jî go, Sibê godarî dikî. ²³ Û li aw roya din gava ko Akrîbas û Perînîgê bi mezin saltanatê hatin û li dîwanxaneê ketin bi bînbaşîan û kîbarêt bajêrê tev, Pesdos jî emr kir ko Boşosê bînin. ²⁴ Û go Pesdod: Ya! Akrîbas padîşah û hemî bi me ra bûn merûvan vîa dibînin, ji boy wîa hemî cûmhûrê Yehûdîan hatin li huzûra min li Qudsê û li vir jî, diqîrabûn, erki hênî lazim nin e vîa sax bimîne. ²⁵ Hama gava ko ez hasîyam erki ji mirin ra mustahaq tiştêkî nékirîe, hem jî aw ji Alîşan Xundkâr ra îfade kir, mi dilê xo danî ko awî bişeyînim. ²⁶ Hama ji derhaqê wî ji efendîê me ra ji nivîsandin ra asah tiştêkê min tunne, ji boy tiştê han mi wî li ber wê anî, îlla li ber ta, ya! Akrîbas padîşah, hata ko bi teftîş kirinê ji nivîsandin ra tiştêkê min hebe. ²⁷ Zîra ji mi ra mînasîb nexuyae ko mahbûskî bişeyînim û li ser wî hati danîn cûrman beyan nakim.

SER 26

¹ Û Akrîbas go ji Boşos ra: Ji ta ra îzn e ko tu ji boy xo xaber dî, wê çaxê Boşos destê xo bi drêj kirinê ji boy xo cewab da. ² Ya! Akrîbas padîşah vîa keremkî mezin ji xo ra hasab dikim, ko îro li huzûra ta cewab di- [350] dim ji boy aw hemî tiştan ko Yehûdîan li ser min gilî dikin. ³ Îlla kî tu hemî ayn û adetê Yehûdîan qanc dizanî ji boy vîa lava diikim ji ta ra bi sabr ji mi ra godarî bikî. ⁴ Nua ji cuwanîtîê mi hata nua mi çawan ömrê xo geçurmîş kirîe ji îbtîdayê, li Qudsê li nav mîlletê min hemî Yehûdîan dizanin. ⁵ Zîra ji awul da mi dizanin, erki bixwazin şehadet kirin, li dîne me da li gora aw ala firqayê mi farîsî ömrê xo geçurmîş krîe. ⁶ Û nua li dîwan da bi sekinandinê mehkeme ji bavane me ra bû. ⁷ ko dwanzdah sîlsîlayê me daîma şev û ro bi îbadet kirinê umudê wan heye jê ra gîyandinê, ez ji boy umudê han ji Yehûdîan gilî dibim, ya! Akrîbas padîşah. ⁸ Çi?; bê bawur tiştêkî ji we ra dixuya erki Xodê dê mirîan qiyam ke. ⁹ Bîra mi jî ji xo ra deyn hasab fikir ko li qarşî nava Mesîhê Nisranîê pîr tiştê zidan bikim; ¹⁰ Ko mi kir jî li Qudsê da û ji baş îmaman mi hükmat bisendinê ji azîzan pîran mi haps kir û li wexta kvuştinê wan mi rîza dida. ¹¹ Û li hemî dêran da mi ji wan ra azab dida, û mi zor fikir ko küfr bikin, û li ser wan bi pîr har bûne, hata li derve bûn bajêran da jî wan diqawarandim. ¹² Bi vî havayê gava ko li Şamê diçobûm ji baş îmaman hükmat û emr bi sendinê, ¹³ Li rê da li wexta nivro da, ya! padîşah, ji azümanan mi rohnîkî dî ji rohnîtîê royê zêde, li dorê min û li dorê wan jî ko bi mi ra diçobûn rohnî ket. ¹⁴ Û gava ko em hemî jî li ardê ketin, mi dengkî

bihîst ko bi zimanê Îbranî ji mi ra digot, Sawûx Sawûx, çima? [351] mi diqawarînî, tiştê ketin e li zixtê pêl kirinê. ¹⁵ Û mi jî go, Tu kî? î, ya! Rabb, û aw go: Ez im Mesîh ko tu mi diqawarînî. ¹⁶ Nua rabe û li ser lingan bisek, ji boy ê kê mi ji ta ra xuya; ko ta dest xo bigirim ji mi ra xizmetçî û şahîd bibî ji boy tiştan ko ta dî, û ji boy aw tiştan ko dê ji ta ra xo nşan bidim. ¹⁷ Û ji av qawmê û ji tayîfan dê xelas bikim, ji wan ko ta ji wan ra dişeyenim. ¹⁸ Ko çahvê wan vekî wusan ko ji tarîê ji rohnî ra û ji hûkmatê şeytanê ji Xodê ra vegeşin, ko wan bi aw îman ko li ser min e awfitîê günean û li nava hati azîz bûnan mîrasan bistînin. ¹⁹ Ji boy vîa, ya! Akribas padîşah; ji xewn ra mi îtiatsizîti nekir. ²⁰ Lê hemen awul li Şamê da bûoxan ra û li hemî welatê Yehûdîstanê û ji tayîfan ra mi waz kir ko toba bikin, û ji Xodê ra vegeşin û ji toba ra layîq amelan bikin. ²¹ Ji boy tiştê hana Yehûdîan mi li dacar da girtin û dixabîtibûn ko mi bişujin. ²² Lakîn ji Xodê mi yardum send û hata sax mame, ji piçûk ra û ji mezin ra; mi şehadet kir, ji aw tiştan tiştê me derva xaber neda, ko peyemberan û Mûsa xaber dan, erki dê bibin; ²³ Erki Îsa dê alem bikşanda û erki aw ji hemîan awul ji mirîan bi qiyam sendinê rohnî dê waz bikrana ji qawm ra û ji tayîfan ra. ²⁴ Û gava ko aw ji derhaqê xo ji tiştê han cewab dida Pesdos bi bilind awazkî go: Dîn dibî, ya! Boxos, pîr xonidanîtiê ta, ta şaş dike. ²⁵ Boxos jî go, Ez dîn nabim, ya! Hurmetlî Pesdos, îlla doxrîti û söza temam aqlê xaber didim. ²⁶ Zîra padîşah daxî dizani tiş- [352] tê han; ko li ber wî e jî bi cesaret xaber didim, zîra bawur nakim ko ji tiştê hana yekî malûmê wî nebe, zîra tiştê han li kunçkî nébûe. ²⁷ Ji peyemberan ra îman tîni?, ya! Akribas padîşah, ez zanim ko îman tîni. ²⁸ Û Akribas ji Boxos ra go, Pîr namîne ko mi qandurmîş bikî krîstîan bibim. ²⁹ Boxos jî go: Kêşkî Xodê bidana gerek ji hindikan gerek ji pîran ne tenê tu, îlla aw hemîan jî ko îro mi godarî dikan, ahwa heman weka min bibana ji av grêdanê başqa. ³⁰ Nua padîşah hem walî û Perînişê û bi wan ra tev ronîşdoxan rabûn. ³¹ Û gava ko li der rabûn bi hevûdu xaber didan û gon: Meruvê han ji mirin ra ya ji grêdan ra mustahaq tiştê nake. ³² Akribas ji Pesdos ra go: Meruvê han erki ji günekar ra îfade nekirana, berdan ra mûmkûn bû.

SER 27

¹ Û gava ko qarar dan ko bi gemî em li Îdalîayê heṛin, Boḫos û çend grêdan teslîmê yüzbaşîkî kirin nava ê kê Hûlîos, ko ji Alîşan bolîgê bû. ² Û li yek gemîkî Edremîdê em ketin û li re ṛabûn; û li alîyê Asîayê em ê dê biçuana; ji Selanîgê bûn Arîsdarkos Mageṭonâlî jî bi me ṛa bû. ³ Û li aw roya din li Sîṭonê em gîyan, û Hûlîos ji Boḫos ṛa bi murwet kirinê jê ṛa rusqat da ko haṛe li ba dostêṭ xo rahat be. ⁴ Û ji wê bi ṛabûnê ji bin Qibrizê em bihurîn ji boy ba li qarşî me bûnê. ⁵ Û paşê ji orta bahra Gîlîgîayê û Bampûlîayê em çûn, hatin li bajêrê Lîgîayê li Mîṛa. ⁶ Û yüz- [353] başî li wê li Îdalîayê çûndox Îskenderîali gemîkî, me li wî swar kir. ⁷ Û pîṛ royan bi hêdî hêdî çûndinê ancax kî li alîê Gnîdosa em gîyan, û ba li qarşî me bûnê ji bin Grîdê ji ba Saxmonaye em çûn. ⁸ Û bi zor em ji wê bi bihurînê li cîkî em hatin ko îskeleê Rînd dihati gotan ko li nêza ê kê bû bajêrê Xasea. ⁹ Û paşê pîṛ zemanan ko bihurt, û bi gemî rêwîṭî hênî zerarlî bû, wexta rocî jî ji xo bihuribû Boḫos şîret dida û digot: ¹⁰ Ya! meṛuvan ez dibînim ko ava rêwîṭî bahrê na tenê ji bar û ji gemî ṛa, lê îlla ji canê me ṛa jî bi zahmet û bi zarar dê bibe. ¹¹ Lakîn yüzbaşî ji sözê Boḫos ṛa pvêtir ji dümencî ṛa û reîsê ṛa bawur dikir. ¹² Û çûnkî aw îskele qanc nabû kî li wê em zivistanê bibihurînin, pîṛan fekirin, ko ji wê heṛin, ko belkî qadîr bibin li Pünîgeê bigîyên; li îskeleê Gîrîdê qîşla bikin, ko li alîê qible e û li zwaîê mêze dike. ¹³ Gava ko lodos pîf kir, wan taxmîn kirin ko dê bigîyên li aw der ko dê biçun, û li rê bi ṛabûnê ji ba Gîrîdê³³⁰ dê bibihuribûn. ¹⁴ Û pîṛ nebihurî bakî werimî kroş ṛabû li qarşî wî, ji ê kê ṛa Yevragîglon dibên. ¹⁵ Va ha ko gemî hati girtin û li ber ba qadîr nebû sekinandin, hati berdan em diçobûn û dihatibûn. ¹⁶ Û em çûn li bi adakî biçûk ko Gxoṭa dihati gotan, û bi zor em qadîr bûn sandalê zabt kirin. ¹⁷ Awî kosendin, û yardım qullanmîş kirin gemî ji binî grêdan û tîrsîan nebe ko li gîrdabê biḫevin û yelkenê li xwarî bi sendinê wusan diçobûn û dihatibûn. ¹⁸ Û em ko li nava mezin furtuna da bûn, û aw roya din baran avê- [354] tin li der. ¹⁹ Û li roya sisêan da aletê gemîyê em bi destê xo avêtin li der. ²⁰ Û gava ko pîṛ royan ne ro û ne jî istêran dixuyabûn û boblisk jî pîṛ bû li ser me, hênî ji bin umudê xelas bûnê me qatîa. ²¹ Û çima ko ji pîṛ royan birçî bûn wê çaxe Boḫos li nav wan bi sekinandinê go: Ya! meṛuvan gerek ko ji sözê mi ṛa we godarî bikirana û ji Gîrîdê ṛanebana û zahmetê han û zararê han nekşandana. ²² Hama nua ji we ṛa nasîhat didim ko şen bin, zîra ji

³³⁰ Di metnê de *Gîrîdên*.

we yekî ra dê zerarkî nebe, lê tenê ji gemî ra. ²³ Zîra îşev melekê aw Xodê ji mi ra xuya ko ez ê wî me, û jê ra îbadet dikim, ²⁴ Ê go ji mi ra: Metîrs ya! Boxos, li ber xunkârê lazim e ko tu rabî, û Xodê aw hemîan ko bi ta ra li gemî da ne baxş kir ji ta ra. ²⁵ Ji boy vîa, ya! merûvan şen bin, zîra ez ji Xodê ra îman tînim, ko ahwa dê bibe, çawan ko ji mi ra hati gotin. ²⁶ Hama lazim e ko em li adakî bişevîn. ²⁷ Ê gava ko çardeh şeva me bû ko em li bahra Andriyê diçobûn û dihatibûn; gemîcîan li nivê şevê da taxmîn kirin ko li zuwaîkî digîyên. ²⁸ Ê glockê avetin li nav bahrê bîst qulac hebû û hinik jî li pêş bi çûndinê glockê dîsa avêtin, dîn ko panzdeh qulac e. ²⁹ Ê bi tîrsanê ko nebe ko li cîê bi zinaran bişevîn, ji alîê paş da çar asinan avêtin, û dixosdîn³³¹ ko sibê bibe. ³⁰ Ê gemîcîan ji boy ji gemîê revandinê sandalê li bahrê kirin, goya kî li alîê paş da jî asinan dê bavêjin. ³¹ Hama Boxos go ji yûzbaşî ra û ji asker ra, Erki wanan li gemî da nemînin, hûn nikarin xelas bin. ³² Wê çaxê askeran hênî sandalê brîn û berdani ko li der bişeve. ³³ [355] Ê gava ko hênî sibê dibobû; Boxos lava dikir ji hemîan ra ko taam bixun, û digot, Îro çardeh ro e, ko hûn brçî mane û tiştîkî nexwarine. ³⁴ Ji boy vîa ji we ra lava dikim ko taam bixun, zîra vîa jî ji boy xelasê we e; çima ko ji we ji yekê mûkî ji serîê we dê wunda nebe. ³⁵ Ê gava ko tiştê hana go, nan send li ber hemîan ji Xodê ra şikir kir û bi şikenandinê³³² dest kir xwarinê. ³⁶ Ê hemîan jî bi şen bûnê, wan jî taam kirin. ³⁷ Ê li gemî da em hemîan du sed û haftê û şeş can bûn. ³⁸ Ê gava ko ji taamê têr bûn, gemî sivik kirin genim li bahrê da bi rijandinê.

³⁹ Ê gava ko sibê bû, zuwaî nas nadikarin, lê tenê kuncikkî sezmîş dikiribûn, ko kenarê wî hebû, û difekiribûn erki qabîl e gemî li wê tahandin. ⁴⁰ Ê asinan brandîn û li bahrê avêtin, û girê dûmenê vekirin, û li bahrê berdan, û yelkan li ber ba bi vekirinê li alîê aw kenarê diçobûn. ⁴¹ Hama wusan cîkî ketin ko herdu alî jî bahr bû, gemî dane ronîşdandin, û alîê pêşê gemî hati şikenandin³³³ na libitandin me, û alîê paşê wî ji zora dalxan dihelosîa. ⁴² Hama askeran şewir kirin ko mahbûsan bikujin, nebe ko yekî bi asnav bireve. ⁴³ Hama yûzbaşî ko dixosd Boxosê xelas bike wan ji av nîetê men' kir; hem emr kir, ko wan ko dikarin asnav kirinê awul bra xo bavên li bahrê û li zuwaîê rabin. ⁴⁴ Rûê dinan, hinikan li ser taxdan, hinikan jî li ser tiştîkî gemîê rabûn; û ahwa bû kî hemîan jî li zuwaîê sax rabûn.

³³¹ Di metnê de *gi xosdîn*.

³³² Di metnê de *şikennandinê*.

³³³ Di metnê de *çikênandin*.

[356] SER 28

¹ Û gava ko wan xelas bûn, fehm kirin ko navê aw adayê Malta bû, û ehalîê wî ji me ra pîr însanîet kirin; ² Zîra agir kirin û me hemî jî qabûl kirin, ji semedê aw baranê û sermayê ko li ser me hat. ³ Û gava ko Boxos pîr qirş û mirşan berev kir, û li ser agirê danî ji şera germîfîê gorimahrkî rabû destê wî girt. ⁴ Û ehalîê li wê gava ko dîn aw canavar ji destê wî hatibû alaquadin ji hevûdu ra digotibûn, meruvê han helbeta qatûl e, ko faraza ji bahrê xelas bû, lakîn hükmê Xodê nehişd ko sax bimîne. ⁵ Hama aw wî canavarê li agir da dawêşand, qat zerarkî nedî. ⁶ Û wan dipêbûn ko aw dê biwerimî, yaxod xafil dê bikeve bimre; lakîn gava ko pîr sekinîn û dîn ko jê ra zerarkî nebû, nîyetê xo bi gohrandinê digotibûn, jê ra, Allahkî e. ⁷ Li wê deran gundê serdarê aw adayê hebû, navê ê kê Bobxîos bû, ko aw me qabûl kir û sê ro me misafir kir li ba xo. ⁸ Û bû kî bavê Bobxîosê ji tayê û ji îhsal hati girtin radiketibû; û Boxos li ba wî çû û nimêc kir û destê xo li ser wî danî û awî sax kir. ⁹ Nua gava ko vîa bû, başqa naxoşan ko li aw ada da bûn dihatibûn û sax dibobûn. ¹⁰ Û wan ji me ra bi pîr îkraman îkram kirin, û gava ko em ji wê diçobûn aw tişt ko ji me ra lazim bû send. ¹¹ Û paşê sê mehan bi Îskenderlî gemîkî em li rê rabûn, ko zivistanê li aw ada da qışla bobû, û nşanê Tîosgûrosê wî hebû. [357] ¹² Û li Sîragûsaê em gîyan, û sê ro em li wê mane. ¹³ Ji wê em bi dewr kirinê li Hretîonê em gîyan, û paşê rockî ko lodos pif kir, li roya diduyan li Badîxosê em hatin. ¹⁴ Û li wê me brêan dîn, wan lava kirin ko heft ro em li ba wan bimînin, û paşê li Hromê herin. ¹⁵ Û ji wê gava ko brêan li ser me bihîsdin hata bazara Apîosê li ber me hatin, û hata lê sê xanan û gava ko Boxos wan dî, şikir kir ji Xodê ra û şen bû. ¹⁶ Û gava ko em hatin li Hiromê; yûzbaşî mahbûsan ji ordu serdar ra teslîm kir, lakîn ji Boxos ra emr bû ko bi beqçî askerê xo tev başqa bisekine. ¹⁷ Û bû kî paşê sê royan mezinê Yehûdîan gazî kir, û gava ko hatin li yek cî, go ji wan ra: Ya! brê meruvan ez ji qawm ra, yaxod ji adetê bavanê me ra qarşî zid tiştîkî nekirin ji Qudsê li destê Romalîan ez mahbûs teslîm kirin. ¹⁸ Wan gava ko mi teftîş kirin, xosdin ko mi berdin, zîra li ser min ji mirin ra müstahaq qabhatkî tunne bû. ¹⁹ Hama gava ko Yehûdîan zid sekinin, lazim bû ko ji xundkâr ra îfade bikim, lakîn na kî weka yekê ko li ser mîlletê xo gilîkî wî bibe. ²⁰ Nua ji wî semedê mi we gazî³³⁴ kir ko we bibînim û ji we ra xaber bidim, zîra ez ji boy umudê Îsrayelê

³³⁴ Di metnê de *gezî*.

zencîrê han dikşînim. ²¹ Wan jî gon jê ra: Em li ser ta ji Yehûdîstanê na kaxîdan sendin, û ne jî ji brêan yekê li vir hatî li ser ta tîştîkî kotî naql kirî, yaxod xaber daye. ²² Lakîn em ji ta lava dîkin ko ji ta em bibihên erki tu li ser çî nîyet î, zîra ji boy av firqayê malûmê me e ko li her cî da zida wî dibên. ²³ Ê jê ra rockî tayîn kirin li ba wî [358] pîran qonax hatin, ko ji wan ra beyan dîkir padîşahîtê Xodê bi îsbatan û wan qandurmîş dîkir ji boy Mesîhê ji nomosê Mûsa û ji peyemberan, ji sibê hata êvarê. ²⁴ Ê hinikan îman dianîbûn ji gotinê wî ra û hinikan îman nedianîbûn. ²⁵ Ê bi hevûdu ra îtîfaq nekirinê bela bûn, gava ko Boxos sözkî go: Erki Rûh el Quds qanc xaber da bi bavanê me ra, bi destê Îşaya peyemberê, û go: ²⁶ Hêre ji qawmê han ra û bêje, Bi bihîsdinê dê bibihên, hama qat fahm dê nekin, û bi dîtinê dê bibînin, hama qat dê nebînin. ²⁷ Çima ko dilê qawmê han qalin bû, û bi goya xo gran bihîsdin, û çahvê xo girtin, nebe ko bi çahvê bibînin û bi dilê xo fehîm bikin û vegeşin, û ez ji wan ra şîfa bidim. ²⁸ Nua malûmê we bra bibe, ko xelasê Xodê ji tayîfan ra hati şîandin, û wan dê godarî bikin. ²⁹ Ê gava ko av xaberê han go, Yehûdîan li der ketin, li nava xo da pîr mûcadele kirin. ³⁰ Ê tamam du sal li aw mala xo sekinî, ko kirê kirîbû. ³¹ Ê ji wan ra, ko li cem wî dihatibûn. ³² Padîşahîtê Xodê waz dîkir, û li ser Rabb Îsa el Mesîhê hîn dîkir bêtiş û bi bêmanî bû.

MEKTÛBÊ RESÛLÊ BOXOS JI ROMALÎAN RA

SER 1

¹ Boxos, xulamê Îsa el Mesîhê, ji resûl bûn ra hati gazî bûn, ji boy Încîlê Xodê hati cîê bûn, ² Aw ko ji awul bi destê peyemberê xo bi azîz kitêban wad kir; ³ Ji xusûsa kure wî Rabbê me Îsa el Mesîhê, ko ji alîê tenê ji zurîyetê Dawûdê bû, ⁴ Aw ko ji alîê azîzîtiê Rûhê Kure Xodê hati beyan bû bi quwet, ji mirîan bi qiyam sendinê; ⁵ Bi awî ko me lutf û Resûlitî sendin ji boy îtaatîê îmanê li nava hemî mîlletan, ji boy navê wî. ⁶ Ko li nava wan hûn jî ji Îsa el Mesîh ra hatin gazî bûn. ⁷ Ji wê ji hemîan ra ko li nav Roma da ne, ji we ra ji delalîê Xodê ra, ji azîz bûn ra hati gazî bûn ra; lutf û selamet ji we ra ji Xodê ji Bavê me û ji Rabb Îsa el Mesîhê.

⁸ Awul şikir dîkin ji Xodê xo bi xo bi destê Îsa el Mesîhê ji boy wê hemîan, ko îmanê wê li hemî dinê da naql dibe. ⁹ Zîra Xodê şahîdê min e, aw ko ez jê ra îbadet dikim bi Rûhê xo, li nav Încîlê Kure wî. ¹⁰ Erki çawan her wext ez wê bîra xo tînim, her wext li nimêcê xo da bi dîleg kirinê, meger carkî bi îzna Xodê rast bê ji [360] mi ra ji we ra bêm. ¹¹ Çima ko pîr hasret dikşînim we bibînim, ko ji we ra rûhanî baxşîşkî îlhaq bikim, hata ko hûn qawî bibinan. ¹² Yanî bi aw îman ko gerek li mabeynê wê gerek a min e bi we tev bêmi dil pîrs bûn. ¹³ Lakîn naxwazim, ya! brêan ko hûn nizanibim, pîr caran mi nîyet kir ko ji we ra bem, hama hata nua ez mam, hata ko li nav we da weka li nava başqa tayîfan meywe bibe. ¹⁴ Gerek ji Yehûdîan ra gerek ji Ecnabîan ra, hem ji alîman ra hem ji cahîlan ra ez deyndar im. ¹⁵ Nua çiqas ko ji destê min tê haz dikim ji we ra jî ko li Roma da ne Încîlê waz bikim.

¹⁶ Zîra ez ji boy Încîlê Îsaê şerm nakim; çima ko aw quwetê Xodê e, ji boy hemî îman anoxan ra ji boy xelasê, awul ji Yehûdî ra û paşê ji Yûnanî ra. ¹⁷ Zîra bi destê wî, aw sadaqat ko ji îmanê Xodê e ji îman ra aşîkâr dibe, çawan ko hatîe nivîsandin, erki sadîq bi îman dê xelas bibe.

¹⁸ Zîra xazabê Xodê dê ji azûmanan aşîkara bibe li ser hemî fisq û nahaqîti merûvan, wan ko doxrîtî bi nahaqîê girtin. ¹⁹ Zîra ji derhaqê Xodê malûm bûn tişt, li navbêna wan beyan e, zîra Xodê ji wan ra beyan e. ²⁰ Çima ko tiştê naxuyanê wî ji îbtîdayê dinê bi maxlûqan fehm dibin, tîn dîtin, yanî ebedî quwetê wî û Allahîtiê wî, wusan ko bê cewab bimînin. ²¹ Çima ko wan Xodê nas kirin, weka xodê hê ra îzzet

nekirin, yaxod şikir nekirin, lê li fikrê xo da batal bûn, û dilê wan bi bê fehmtîê tarî bû. ²² Aw xo li cîê mezinan danîbûn, dîn bûn. ²³ Û xarab nabûn îzzetê Xodê gohrandin, bi şibandinê [361] hati xarab bûn sûretê merûvan û tayran, û çarpêan û soxunan. ²⁴ Ji boy wî Xodê jî wan ji murdarîti ra teslîm kir bi bijandinê dilê wan tenê wan li nav wan da rezîl kirinê. ²⁵ Wan ko doxrîtîê Xodê bi derew ra gohrandin, secde û îbadet kirin ji maxlûqan ra, na kî ji Xodê ra, aw ko ji ebedîê mübarek e, amîn. ²⁶ Ji vî sebebê Xodê wan ji rezalet arzûyan ra teslîm kir, ko mêê wan daxî ji tabîat ra lazîm bûn tiştê, ji tabîat ra zîd lazîm bûn tiştê, ji tabîat ra zîd lazîm bûn tiştê ra bi wî gohrandin. ²⁷ Kezalik nêrîan ji tabîat ra lazîm bûnê jinan berdan bi bijandinê xo li hevûdu germ bûn, nêrîan bi nêrîan rezalet dişîxulîbûn, û ecrê azxîntîê xo li ser xo disendibûn. ²⁸ Çima ko wan Xodê red kirin, Xodê jî wan ji rezalet şewran ra teslîm kir, na layîq tiştan kirinê; ²⁹ Wan ko tîji bobûn bi hemî nahaqîtiê, zînaê, yaramazîtiê, tamakârîtiê, kotîtiê, hasêdê tîji, bi qatl, bi nîza, bi hîle, bi kemlik. ³⁰ Û bûn xamazan, xeybet kroxan, dijminê Xodê, kîfir kroxan, kîbîran, fodûlan, kotîtiê dîtoxan, ji bav û diê ra îtaatsîzan bûn; ³¹ Fehmsuzan wad xarab kroxan, rahmsuzan, baruşutî nakroxan, xîyanetan; ³² Ko wan şerîatê Xodê dizanibûnê, erki wan ko tiştê wusan dikin ji mirin ra mustahaq in, na tenê av kroxan, lê wan jî ko meramê wan yek e bi av kroxan ra.

SER 2

¹ Nua, ya! merûv, her kî ko dibî, ko hokm dikî, bê cewab î, zîra bi aw tişt ko başqasîan hokm dikî, bi wî tu xo hokm dikî; zîra [362] tu ko hokm dikî tu jî hemen aw tiştan dikî. ² Hama em dizanin hokmê Xodê bi rastî dibe li ser wan, ko tiştê hana dişîxulin. ³ Lakîn, ya! merûv tu ko tiştê wusan kroxan hokm dikî, û tu hemen aw tiştan dişîxulî, vîa bîra xo tînî, ê tu ji şerîatê Xodê dê azad bimînî; ⁴ Yaxod awqas qancîtîê wî û sabr û tahmûla wî li ber tiştîkî daneynî, nadizani? ko qancîtîê Xodê ta li alîê tobayê qalawuzîti dike. ⁵ Hama tu bi dengserîti û bi bê toba dilê xo, tu xo ra xazab diabîni, ji boy aşîkâr bûnê roya xazab û haq şerîatê Xodê. ⁶ Aw ko ji her kesê ra li gora amelê xo dê bedel bike. ⁷ Ebedî hayat ji wan ra, ko li nav xayr amelan bi sabr disekinî, îzzet û îkram û nemirîti dîleg dikin; ⁸ Hama ji pevçûndoşan ra, û ji doxrîti ra, xîşm û xvazab dê bibe; ⁹ Sixlet û sixintî li ser hemî merûv ko şer dişîxule, awul ji Yehûdî ra û paşê ji Yûnanî ra. ¹⁰ Îzzet û îkram û selamet ji aw hemîan ra ko xayr dişîxulin, awul ji Yehûdî ra û paşê ji Yûnanî ra. ¹¹ Çima ko li ber Xodê xatr mêze kirin tunne. ¹² Zîra wan ko bê nomos güne kirin, dê bê nomos helak bin, û wan

ko li bin nomos da güne kirin, bi nomos dê hükm bibin. ¹³ Çima ko li ber Xodê nomos bihistoxan sadiq nin in, îlla nomosê îcra kroxan dê sadiq bibin. ¹⁴ Zîra tayîfan ko nomosê wan tunne gava ko bi tabîat amelê nomos dişixulin, nomosê wan bi tunne bûnê, aw ji xo ra asl nomos in. ¹⁵ Ko şixulê nomosê li dilê xo da nîşan didin bi şehadetîê zamîrê xo, û bi hevûdu tazîr kirinê fikrê wan, yaxod bi haq dayinê; ¹⁶ Li aw [363] ro da li gora aw Încîlê min, ko ez waz dikim, Xodê bi destê Îsa el Mesîhê sira merûvan dê hokm bikim.

¹⁷ Va ha tu Yehûdî tîy gotan, û pişda xo li nomosê ta danîe; û bi Xodê pasna xo didî; ¹⁸ Ê meramê wî dizanî, û ji nomosê tu hîn bûy, tîştê qancan ayirmîş kirinê. ¹⁹ Ê tu ji xo ra güvenmîş dibî, erki ji koran ra qalawuz î, ji darîan ra, rohnî. ²⁰ Ji cahîlan ra şîret dayox, ji masûman ra xoca, erki ji îlmê û ji doxrîtîê ji nomosê şiklê ta heye. ²¹ Nua tu ko başqasîan talîm dikî, tu xo talîm nakî?, ko waz dikî dizî nekirin, tu dizî dikî?. ²² Ko dêjî zîna nakirin, tu zîna? dikî, tu ko ji putan îkrah dikî, seşanan talan dikî?. ²³ Tu ko bi nomos pasna xo didî, nomosê bi xarab kirinê, Xodê li ber tîştê danaynî?. ²⁴ Zîra ji boy wê li nav tayîfan ra ji navê Xodê ra küfr dibe, çawan ko hatîe nivîsandin. ²⁵ Zîra erki nomosê dipêy sûnet fayde dike, hama erki nomosê xarab dikî, sûnetê ta bê sûnet bû. ²⁶ Zîra erki bê sûnet haqê nomosê îcra bike, na? kî bê sûnetê wî sûnet dê hasab bibe. ²⁷ Ê ji tabîatê bûn bê sûnet nomosê bi îcra kirinê dê ta hokm bike, ko bi nivîs û bi sûnetê nomosê xarab dikî, ²⁸ Çima ko aw Yehûdî nin e ko ji derve e, û sûnet nin e aw ko ji derve e bi ten. ²⁹ Lê Yehûdî aw e ko ji hindur ve e, û sûnetê dilê, bi rûh, û na bi nivîs; ko medhê wî ne ji merûvan e, lê ji Xodê e.

SER 3

¹ Nua ji Yehûdî ra çî? tîştê zêde heye, yaxod ji sûnetê çî? fayde. ² Pîr tîştan bi [364] her tarz, awul vîa e ko, kelamulahê ji wan ra emanet bû. ³ Nua erki ji wan hinikan îman neanîn, çî?; meger îmansîzîtîê wan îmanê Xodê batal dikir?, haşa!. ⁴ Lakîn Xodê doxrî, û hemî merûvan bra derew bibin, çawan ko hatîe nivîsandin, hata ko li söza xo da sadiq bibî, çaxa mehkeme bûnê tu fath bikî. ⁵ Hama erki nahaqîtîê me adaletê Xodê aşîkar dike, em çî? bibêjin, aceb Xodê nahaq? e, ko xazeba xo li ser me tîne, bi însanîtîê dibêm, haşa!. ⁶ Erki ná Xodê dinê dê çawan? hokm bike. ⁷ Zîra erki doxrîtîê wî bi derewê min zêde dibe ji boy îzzetê wî, hênî çima? ez weka günekârê hokm dibim. ⁸ Yaxod çima? nabêjî, çawan ko li paş me kotî xaber didin, erki em dibên, em kotîî bikin ko qancîî bê, ko azabê wan haq e.

9 Nua çi?, em ji wan qanc in, qat na, zîra gerek Yehûdîan gerek Yehûdîan me ji awul nşan da ko, hemî jî li bin güne ne. 10 Çawan ko hatîe nivîsandin; qat sadiqî tunne. 11 Yek jî tunne, fehîm kroş tunne, û Xodê aramîş kroş tunne. 12 Hemî jî şaş bûn, li yek cî kotî bûn, qancîti kroşî tunne, yek jî tunne. 13 Qirika wan hati vebûn tirb e, bi zimanê xo hîle şîxulin, li bin lêva wan axûê gohrimahran heye. 14 Deva wan bi bedua û bi tahlîlê tîji e. 15 Linga wan ji xuyn rijandin ra zû e. 16 Li rêya wan da qirxin û sefîlîti heye. 17 Ê rêya selametê nas nekirin. 18 Li ber çahvê wan tîrsa Xodê tunne. 19 Lakîn em zanin ko çi ko nomos dibê, ji wan ra dibê ko li bin nomos da ne, hata ko hemî dev bê girtin, û cümle amel li ber Xodê bi suç bibe. 20 Zîra li [365] ber wî da yek tenkî sadiq nabe bi amelê nomosê, zîra bi nomos e güne nas kirin.

21 Hama nua bê nomos adaletê Xodê beyan bûe, ji nomosê û ji peyemberan bi hati şehadet bûnê. 22 Yanî adaletê Xodê, ko ji îmanê Îsa el Mesîhê e, û farq tunne. 23 Zîra hemî jî güne kirin, û ji îzzetê Xodê dûr bûne. 24 Ê bi lutfê wî belaş sadiq dibin bi aw xelas ko bi Îsa el Mesîhê e. 25 Ko Xodê awî kefarete taqdîr kir, li xuyna wî da bûn bi av îmanê adaletê xo nşan bide, bi tahmûlê Xodê ji awul da bûn ji boy kefarete aw günean. 26 Yanî ji boy adaletê xo li zemana han da nîşan dayinê, ko aw adîl bibe, û sadiq bike wan ko ji îmanê Mesîhê ne. 27 Nua pasin li ko? ma, batal bû, bi kîjan? nomosê, ji nomosê amelan?, na, lê ji nomosê îmanê. 28 Nua em qerar didin ko, merûv bi îman sadiq dibe, bê amelê nomosê. 29 Meger tenê Xodê ji Yehûdîan ra e, ji tayîfan ra jî nin e?, bêlê, ji tayîfan ra jî e. 30 Çünkî Xodê yek e, ko sünêti ji îmanê sadiq dike, û sünetsîzîti jî bi av îmanê. 31 Nua em bi îman nomosê batal? dîkin, haşa!, îlla nomosê sabîti dîkin.

SER 4

1 Nua bavê me Îbrahîm ji alîê tenê çi? dî em bibên. 2 Zîra erki Îbrahîm bi amelan sadiq bibana, bîra pasnê wî dê bibana, hama li ber Xodê na. 3 Zîra kitêb çi? dibê, û Îbrahîm ji Xodê ra îman anî, û aw jê ra sadiqîti hasab bû. 4 Hama aw ko şîxulkî dike, ücret [366] ji înetê hasab nabe, îlla ji deynê. 5 Lakîn aw ko naşîxule, hama îman tîne ji awî ra ko fasîqan sadiq dike, îmanê jê ra sadiqîti tê hesab bûn. 6 Çawan ko Dawûd jî ji boy xozîtiê aw merûvê, ê kê ko Xodê jê ra sadiqîti hasab dike bê amelan. 7 Xozî ji wan ra dibê, ko bênamûsîti wan afw bû, û güneê wan hati veşartin. 8 Xozî ji aw merûvan ra ko Xodê jê ra güne hasab nake. 9 Nua Xozîtiê han li ser sünêti? e, ya li ser sünetsîzîti jî e; zîra em dibên, Erki îman ji Îbrahîm ra sadiqîti

hati hasab bûn. ¹⁰ Nua çawan? hîsab bû wexta aw li sûnetê da bû, yaxod li sûnetsîzîtî da, wexta ko li sûnetê da ná, lê îlla wexta ko li sûnetsîzîtî da bû. ¹¹ Ê li sûnetsîzîtî bûn sadaqatê îmanê ji boy möhra wî nşanê sûnet send, hata ko li sûnetsîzîtî [î] [d]a bavê hemî îman anoxan bibe, ko ji wan ra daxî sadaqat bê hasab bûn. ¹² Hem bavê sûnetê bibe, na tenê ji sûnetê bûoxan ra, îlla li rêya aw îmanê ko li sûnetsîzîlik da hebû ji bavê me ji Îbrahîm ra li aw rê da ji çûndoşan ra jî. ¹³ Zîra ji Îbrahîm ra û ji zürîetê wî ra ji boy ji dinê ra warîs bibe hati dayin wad, bi nomosê nebû, lê bi sadaqatê îmanê. ¹⁴ Zîra erki ji nomosê bûoxan warîs bibana, îman dê nafîle bibana, û wad dê hati batal bûn. ¹⁵ Zîra nomos xazab tîne; çûnkî li aw cî da ko nomos tunne asîlik jî tunne. ¹⁶ Ji boy vîa sadaqat ji îmanê e, hata ko ji înetê bide, wusan ko wad ji hemî zürîet ra asah bibe, tenê ji nomosê bûox ra na, îlla ji me ji hemîan ra jî ko ji îmanê bavê me ji Îbrahîmê ne. ¹⁷ Çawan ko nivîsandî e, mi ta [367] bavê pîr mîlletan kir, li ber Xodê, ji awî ra ko îman anî, aw ko mirîan sax dike û mewcûd nebûn tiştan weka tiştê mewcûd bûnan gazî dike. ¹⁸ Ko ji bê umud tişt ra bi umud îman anî, erki aw dê bavê pîr ometan bibe, çawan ko hati gotan jî, erki zürîetê ta dê ahwa bibe; ¹⁹ Ê aw li îman da nahti zayîf bûn, û nenihêrt ji tenê xo ra zatî ji mirin bûn ra, çûnkî ömrê wî tenê qasa sad salê hebû, ne jî li mirî li rahma Sarayê nihêrt. ²⁰ Ê bi îmansîzîtî weswes nekir ji boy wada Xodê, lê bi îman hati pêt bûn ji Xodê ra şikir kir. ²¹ Ê asah zanî ko, aw ko wad kir, wad kirinê xo jî îcra kirin ra jî qadîr e. ²² Ji boy jê ra sadaqat hati hasab bûn.

²³ Hama tenê ji boy wî nehati nivîsandin, ko jê ra hati hasab bûn. ²⁴ Lê ji boy me jî, ji wan ra ko dê bê hasab bûn, ko em jê ra îman tînin, ko ji mirîan qiyam kir Xodîê me Mesîhê. ²⁵ Aw ko ji boy suçê me teslîm bû, û ji boy me sadiq kirinê qiyam kir.

SER 5

¹ Nua em bi îman hati sadiq bûn selametê me heye bi Xodê ra, bi destê Rabbê me Îsa el Mesîhê. ² Bi destê ê kê ko bi îman me qabûl kir nêz bûnê înetê han, li nav ê kê ko em sekinin, û em pasna xo didin bi umudê îzzetê Xodê. ³ Av qasa tenê ná, lê li nav sixletan em pasna xo didin; çima ko em dîzanin ko, erki sixlet sabr dişixule, ⁴ Ê sabr carabandin û carabandin umud; ⁵ Ê umud bi şerm nake; çima ko bi destê Rûh el Qudsê [368] muhabetê Xodê li nav dilê me hatîê rijandin, ko ji me ra hatîe dayin. ⁶ Çima ko gava ko em hêja zayîf bûn li wextê da Îsa ji boy fasîqan mir. ⁷ Zîra ji uxura sadiqê yekê bi zor dimire, çûnkî li uxura qancê belkî yekê ji mirin ra cesaret bike. ⁸

Lakîn muhabetê Xodê ko li ser me hebû aşîkâr kir ko gava ko em günekâr bûn, Îsa ji boy me mir. ⁹ Erki wusan e nua ko em bi xuyna wî sadiq bûn, hênî³³⁵ çiqas pêtir bi wî em dê xelas bibin ji xazabê. ¹⁰ Zîra erki gava ko em dijmin bûn bi Xodê sulh bûn bi mirinê kurê wî, hênî çiqas pêtir wexta sulh bûnê³³⁶ em dê bicon bi ömra wî. ¹¹ Û tenê vîa ná, lê bi Xodê jî em pasna xo ddin bi destê Rabbê me Îsa el Mesîhê, bi wî ko nua me sulh bûn.

¹² Zîra çawan ko bi destê yek merûvkî güne li dinê ket, û ji aw güne mirin, û wusan mirin li ser hemî merûvan ket, zîra hemî jî güne kirin. ¹³ Zîra hata li wexta nomosê li dinê güne hebû; hama güne hasab nabe li ko kî nomos tunne. ¹⁴ Lakîn mirin ji Ademê hata Mûsaê padîahîti kir, hem li ser wan jî ko weka güneê Ademê jî güne nekroşan, ko aw orînegkî bû jê ra, ko li paşê dê bihata. ¹⁵ Lakîn na kî suç çawan e baxşîş jî wusan, zîra erki bi suçê yekê pîran mirin, hênî çiqas pêtir baxşîşê Xodê û aw baxşîş ko bi îneyetê yek merûv Îsa el Mesîhê e, li ser pîran zêde bû. ¹⁶ Û na kî baxşîşê han wusan e, çawan ko ji yek merûvê ko güne kir, çima ko hûkûm ji yek güneê li nava azabê xisd; lakîn îneyet ji pîr günean li sadiqîtiê bir. ¹⁷ Zîra erki bi suçê yekê, mirin bi desta yekê padîşahîti kir îse, [369] hênî pêtir wan ko îneyet û zanî baxşîşê sadaqatê sendin, ê yekê yanî bi destê Îsa el Mesîhê li hayat da padîşahîti dê bajon. ¹⁸ Nua ji semedê han çawan ko bi suçê yekê ji hemî merûvan ra ji boy hûkmê azab bûn ra hûkm bû îse, ahwa jî bi sadaqatê hayat dayox baxşîş bûe. ¹⁹ Zîra çawan ko bi îtaatsîzîtiê yek merûvê pîran günekâr bûn, wusan jî bi îtaatiê yekê pîran dê sadiq bibin. ²⁰ Lakîn nomos li mabeynê ket ko suç pîr bibe, lakîn li ko kî güne pîr bû, hênî pîr bû îneyet. ²¹ Ko çawan ko güne bi mirin padîşahîti ajot, wusan jî îneyet padîşahîti bike bi sadaqatê hata li ebedî hayatê bi destê Rabbê me Îsa el Mesîhê.

SER 6

¹ Hênî nua me çi bêjin, ji boy îneyet pîr bûnê li nav günean em bimînin?. ² Haşa!, em ko ji boy günean mirin, hênî çawan? li nav wî da bisekinin. ³ Nizanin?, erki em ko bi Îsa el Mesîhê tahfil bûn, li mirina wî da tahfil bûne. ⁴ Bi wî ra em hatin nixaftin bi tahfilê ji boy mirinê, ko çawan ko Îsa bi îzzetê Bav ji mirîan qiyam kir, wusan jî em li tazetîê hayatê bigerin. ⁵ Zîra erki bi wî ra tev amsalê mirinê em hati danîn şaz bûn îse, li qiyamet da jî helbeta dê bibin. ⁶ Vîa em dizanin ko, merûvê

³³⁵ Di metnê de *henî*.

³³⁶ Di metnê de *sulh bûnê mi*.

kevnê bi wî ra hati xaç bûn, hata ko tenê güneê batal bibe, ko hênî ji güne ra qullux em nekin. ⁷ Zîra aw ko ji güne mirîe, ji güne sadiq bûe. ⁸ Zîra erki [370] em bi Îsa mirin, îman tînin ko bi wî ra dê bijîn jî. ⁹ Zîra em dizanin ko ji mirîan bi qiyam sendinê, dîsa namire, hênî mirin li ser wî hûkmat nake. ¹⁰ Zîra mirinê han, yek car ji boy güne e mir, û ömr kirinê han ji boy Xodê ömr dike. ¹¹ Ahwa jî hûn xo ji güne ra mirin hasab bikin, hama ömr kirin ji boy Xodê bi destê Rabbê me Îsa el Mesîhê. ¹² Nua hênî güne li ser mirin tenê wê bra hûkmat néjo, ko ji murdarîtî wî ra îtaat bikin. ¹³ Ê azayêt xo ji nahaqî ra alet bûn ra medin ji güne ra, îlla hûn xo ji Xodê ra aletê sadaqatê bidin. ¹⁴ Zîra güne li ser wê dê hükm neke; çünkî li bin nomosê nin in, îlla li bin îneyetê danin.

¹⁵ Nua çi?, em güne? bikin, ko li bi nomos da nin in, lê li bin îneyetê, haşa!. ¹⁶ Hûn nizanin? erki ji kê ra ko hûn xo qul dîkin ji îtaat ra qul in jê ra, ji kê ra ko îtaat dîkin, erki ji güne ra, ko ji mirin ra dibe, û erki ji sadaqat ra îtaat, ko li hayatê dibe. ¹⁷ Hama şikir ji Xodê ra, ko faraza hûn qulê güneê bûn, lakîn ji dil hûn Îtaat kirin ji îbretê aw talîmê ko ji we ra teslîm bû. ¹⁸ Nua hûn ji güneê bi azad bûnê ji sadaqat ra qul bûn. ¹⁹ Bi insanîtî dibêm, ji boy zayîfîtî tenê wê; zîra çawan ko hûn azayêt xo dani ji nahaqîtî ra ji bînamûsîtî ra û ji nahaqîtî ra qul bûn ra, wusan jî nua azayêt xo bidin ji boy azîzîtî, ji sadaqat ra qul bûn ra. ²⁰ Zîra gava ko hûn qulê güneê bûn, wê çaxê ji sadaqatê hûn azad bûn. ²¹ Nua wê çaxê çi meywey wê hebû ji aw tiştan, bi wan ko nua hûn şerm dîkin, çima ko netîceê wan [371] mirin e. ²² Hama nua ji güneê bi azad bûnê ji Xodê ra bi qul bûnê bi azîzîtî meywey wê heye, ko netîcey wî ebedî hata e. ²³ Zîra ücretê güne mirin e, lakîn baxşîşê Xodê ebedî hata e, bi destê Rabbê me Îsa el Mesîh.

SER 7

¹ Meger hûn nizanin, ya! brêan zîra ez jî³³⁷ wan ra dibêm ko nomosê zanin ko nomos li ser meruv hökm dajo, çiqas ko sax e. ² Zîra jin e hati zewicî, bi sax mêrê xo bi nomos hatîe grêdan, hama mêr dimire, ji nomosê mêrê tê vebûn. ³ Erki wusan e çi qas ko mêr sax e, erki ji başqa mêrkî ra hare, dê zînakâr bê gotin; hama erki mêr bimre, ji wî nomosê azad dibe, wusan ko zînakâr nabe, erki ji başqa mêrkî ra hare. ⁴ Ahwa, ya! brêan, bi tenê Îsa ji nomos ra hûn mirin, ko ji başqa ra bibin, ji wî ra, ko ji

³³⁷ Di metnê de ev peyv kêr in: *wan ra dibêm ko nomosê zanin ko* (nîşeya wergêrê).

mirîan qiyam sendîe ko ji Xodê ra meywe anoş bibin. 5 Zîra çiqas ko em bi ten bûn hawesê güneê, ko bi nomos dibûn, ko li azayêt me dişixulabûn, ko em meyweyê mirinê bînin. 6 Lakîn nua em ji aw nomosê hatin vebûn, çima ko em mirin ji wî ra bi awî ko em hatibûn girtin; ko em bi tazatîê rûhê xizmet bikin û na bi kevîntîê nivîsê.

7 Nua em çi? bibêjin, nomos güne? e, haşa!, lakîn ez güne nas nadikiribûm, erki na bi nomos, çawan arzû jî nâdizanibûm, erki nomos nâgotiba, Arzû nâke. 8 Lakîn güne bi destê tenbîhê bi fursend sendinê, li mi da her türî arzûê li husûl anî; zîra bê nomos güne mirîe. 9 E jî bê nomos wextkî sax bûm, lakîn [372] gava ko tenbîh li ser min gîya, güne sax bû. 10 Ê ez mirim, û aw tenbîh ko ji boy hayatê bû, aw ji mi ra ji boy mirinê bû. 11 Zîra güne bi destê tenbîhê bi fursent sendinê ez xapand, û bi wî semedê ez kuşt. 12 Wusan ko nomos azîz, hem tenbîh azîz û haq û qanc e.

13 Nua tiştê hana qanc?, ji mi ra ji boy mirinê? bû; haşa, îlla güne, wusan ko güne xuyayi bibe ko bi aw tiştê qanc li mi da mirin şixulî, ko güne bi tenbîh hênî pîr günekâr bibe. 14 Zîra em dizanin ko firotan cîsmanî me. 15 Zîra çi ko dikim nas nakim, na çi ko dixwazim awî dikim, lê ji çi ko îkrah dikim aw dikim. 16 Lê erki aw ko naxwazim dişixulim; zîra dikim erki nomos qanc e. 17 Nua hênî ez nin im awî şixuloş lê güne, ko li mi da sakîn e. 18 Zîra ez zanim ko li hindura mi da, yanî li tenê mi da tiştê qanc sakîn³³⁸ nin e; zîra li mi daxwazin hazir e, hama tiştê qanc îcra kirinê nabînim. 19 Zîra na kî aw tiştê qanc ko dixwazim aw dikim, lê kotî ko naxwazim aw dişixulim. 20 Zîra erki ez aw tişt ko naxwazim dişixulim, hênî awî kroş ez nin im, lê li hindura mi da sakîn bûn güne e. 21 Nua ez nomoskî dibînim, ko gava tiştê qanc kirinê dixwazim, kotî li ba min e. 22 Zîra li gora meruvê hindurê ji nomosê Xodê haz dikim. 23 Hama li azayêt mi da bi bûn, ji nomosê güne ra esîr dike. 24 Ez çi? meruvkî bîçare me, ez ji tenê hana mirinê kî? dê xelas bike. 25 Şikir ji Xodê ra bi destê Rabbê me Îsa el Mesîhê, erki wusan e ez bi aql ji nomosê Xodê ra, û bi ten ji nomosê güne ra qullux dikim.

³³⁸ Di metnê de *sakîn*.

[373] SER 8

¹ Erki wusan e hükmî azab tunne li Îsa el Mesîh da bûoxan ra, wan ko li gora ten naçûn. ² Çima ko li Îsa el Mesîh da bûn nomosê hayatê rûhê ez azad kir ji nomosê günne û mirinê. ³ Zîra aw ko bê mûmkûn bû ji nomos ra, çima ko bi ten zayîf bû; Xodê Qurê xo şîand bi tarza tenê güneê û ji boy kefaertê güneê, û güne li aw ten da hükm kir; ⁴ Ko sadaqatê nomosê li me da tekmîl bibe, em ko li gora tenê naçun, lê li gora Rûhê diçun. ⁵ Çima ko wan ko bi ten in li gora tenê difêkirin, û wan ko bi rûh in tiştê rûhê difêkirin. ⁶ Zîra fikra tenê mirin e, hama fikra Rûhê hayat û selamet e. ⁷ Zîra fikra tenê ji Xodê ra îtaat nake, zîra îtaat kirinê ra jî qadîr nin e. ⁸ Zîra wan ko bi ten in, ji Xodê ra maqbûl bûn ra qadîr nin in. ⁹ Hama hûn li ten da nin in, lê li rûh da ne, erki Rûha Xodê li me da sakîn e, lakîn erki ji yekê ra ko Rûhê Îsaê tunne, aw ê wî nin e. ¹⁰ Ê erki Îsa li nav we da e, hênî ten ji boy güneê mirîe, rûh sax e ji boy sadaqatê. ¹¹ Hama erki Rûhê awî ko Îsa ji mirîan qiyam kir, li we da sakîn e, hênî aw ko Îsa ji mirîan qiyam kir, dê hayat bide ji mirin tenê we ra bi destê Rûhê wî, ko li we da sakîn e.

¹² Nau li wî tarz da, ya! brêan, li gora tenê ömr kirinê, ji ten ra em deyndar nin in. ¹³ Zîra erki hûn li gora tenê ömr dikin dê bimrin, hama erki bi Rûh amelêt tene diçujin, dê [374] bijîn. ¹⁴ Zîra wan hemîan ko bi Rûha Xodê qalawuz dibin, wan Qurê Xodê nin. ¹⁵ Zîra hûn dîsa ji boy tîrsê rûha qulluxê nesendin, lê rûha ewladîê wê sendin, ko bi wî em Appa, Bav gazî dikin. ¹⁶ Ê Rûh bi xo, bi rûha me tev şehadet dike, ko em ewladê Xodê ne. ¹⁷ Ê erki em ewlad in, mîrasçî jî ne, mîrasçîê Xodê û mîrasxorê Îsa ne, hata ko em tev erki eleman dikşînin, em tev jî dê ji celalê ra layiq bibin.

¹⁸ Zîra ez wusan qiyas dikim ko elema wexta han li ba aw îzzet ko dê bê, tiştêkî nin in, ko ji me ra dê aşîkâr bibe. ¹⁹ Çima ko bi arzû umuda maxlûqan ji aşîkâr bûnê Qurêt Xodê dipê. ²⁰ Zîra maxlûq ji batalîtî ra bi îradetê xo tabî nebû, lê ji boy awî ko da îtaat kirin; ²¹ Bi wî umudê, ko maxlûqan wan jî, ji qulluxîtiê fesadê bi xelas bûnê, bi celal azadîtiê Qurêt Xodê jê³³⁹ ra bigihên. ²² Zîra em dizanin ko hata nua hênî maxlûqan li yek cî, ah û hêşanê zayinê dikşînin. ²³ Ê vîa tenê nin e, lê em jî malîkê meyweê awulî ne Rûhê bûoxan, em ji xo li Xo da ah dikşînin, ji ewladîtiê ra yanî ji xelas bûnê tenê xo ra bi beklemîş kirinê. ²⁴ Zîra em bi umud xelas bûn, hama aw

³³⁹ Di metnê de jî.

umud ko tê dîtin umud nin e, zîra yekê ji aw tişt ra ko dibîne, ji boy wî hênî çima? dê umud bike. ²⁵ Hama erki em ji aw tişt ra ko me nadîe umud dikin, hênî bi sabr em jê ra dipen. ²⁶ Wusan jî Rûh daxî ji zayîftî ra me ra yardum dike; zîra li gora layîqê em nedizandin çî nimêc dê bikin; hama Rûh bi xo bi hati tarîf nabûn bi ahan ji boy me şefaata dike. ²⁷ Zîra aw ko dilan [375] teftîş dike meramê Rûhê çî e dizane; û mûtabiqê meramê Xodê ji boy azîzan şefaata dike.

²⁸ Û em dizanin ko, wan ko Xodê dihebînin li gora muqaderê ji dawet bûoxan ra, her tişt ji qacîti ra yardum dike. ²⁹ Zîra wan ko pêşîn dizanibû, mîna sûretê Qurê xo bû in ra gazî kir, wusan ko aw li nav pîr brêan xaye awulîn bibe. ³⁰ Wan ko ji awul tayîn kir, heman wan gazî kir; û wan ko gazî kir, heman wan sadiq kir, wan ko sadiq kir heman wan bi îzzet kir. ³¹ Nua ji tiştê han ra em çî? bibên, erki Xodê li alîê³⁴⁰ me da e, ji me ra qarşî kî? dikâri bibe. ³² Aw ko Qurê xo qayîrmîş nakir; lê awî ji boy me hemîan teslîm kir, hênî çawan bi wî ra hemî tiştan ji me ra dê baxş neke. ³³ Li ser bijartinê Xodê kî? dê dâwa helîne, Xodê e ko sadiq dike; ³⁴ Erki wusan e aw kî? e ko hükm dike, Îsa e ko mir; îlla ko qiyam jî send, û li alîê rastê Xodê e, hem daxî ji boy me şefaata dike. ³⁵ Nua kî? dê me cîê bike ji muhabetê Îsaê, sixlet? ya sixintî?, ya qawarandin?, ya birçîtî?, ya tazîtî?, ya cefa?, ya şûr. ³⁶ Çawan ko hatîe nivîsandin, li uxura ta her ro em tenê kuştin, em weka hati serjê bûn mîyan hasab bûn. ³⁷ Lê li av hemî tiştan da, hênî pîr em fath dikin, bi awî ko me heband. ³⁸ Zîra ez asah dizanim ko né mirin, né ömr; né melekan, né hükmetan, né aw tişt ko hazir in, né aw tiştan ko dê bên, na quwetan. ³⁹ Û né bilindîtî, né kûrîtî, û né başqa maxlûqkî dikârin me cîê bike ji muhabetê Xodê, ko bi Rabbê me Îsa el Mesîhê e.

[376] SER 9

¹ Bi Îsa dibêm û derew nakim, zamîrê mi jî ji mi ra şehadet dike bi rûh el Quds; ² Ko qasaweta min mezin û dayîma li dilê mi da derdê min heye. ³ Zîra ez bi xo dixosdibûm, ji Îsaê lanet bibama, ji alîê tenê ji boy brê û qisûmê min. ⁴ Wan ko Îsraelî nin, ewladîtî ê wan e, û îzzet, û ahdan û nomos da yin, û îbadet, û wadan ê wan in. ⁵ Ko babayan ê wa in, ko Îsa jî ji alîê ten ji wan e, aw ko li ser hemîan ji ebedî mübarek Xodê e; amîn. ⁶ Hama qabîl nin e ko kelamulahê li ardê biqeve; zîra aw hemîan ko ji Îsrayelê ne, Îsrayelî nin in. ⁷ Hem ji boy ji zürîetê Îbrahîmê bûnê,

³⁴⁰ Di metnê de *elîyê*.

hemî jî ewlad nin in; lê bi Îshaq ji ta ra zürîyet dê bê gazî kirin. ⁸ Yanî wan ko kure ten in kure Xodê jî nin in; îlla zürîet, ewladê wadê hasab dibin. ⁹ Zîra söza wadê vîa bû: Erki li wexta han da dê bêm, û ji Sara ra kurekî dê bibe. ¹⁰ Û tenê avqas ná, lê ji Repega jî aşîkâr e, ko avis me ji yekê; yanî ji bavê ma³⁴¹ ji Îshaq; ¹¹ Çima ko kuran hêja náza, û hêja tiştî kotî ya qanc naşîxulin, ko taqdîrê Xodê li gora bijartinê wî qawî bimîne, ¹² Na ji amelan, lê ji wî ko dawet kir, jê ra hati gotin, ¹³ Erki mezin dê ji piçûk ra xulamîti bike; çawan ko hatî nivîsandin, Erki mi Yaqûb heband û ji Yesav mi îkrah kir.

¹⁴ Nua em çi? bibêjin, li ber Xodê nahaqîti heye?, hâşa! ¹⁵ Çima ko ji Mûsa ra dibê, ¹⁵ Ji kê ra ko merhamet dê bikim, merhamet dikim, û li ser kî ko dê rahm bikin, rahm dikin. ¹⁶ Erki [377] wusan e, ne ji wî e ko dixwaze, né li dest wî da e ko dibaze, lê ji Xodê ko merhamet dike. ¹⁷ Zîra ktêb ji Fîraxon ra dibê, Mi ta heman ji boy vîa helanî, ko quwetê xo bi ta nîşan bidim, hata ko navê mi li hemî dinê da naql bibe. ¹⁸ Nua ji kê ra ko dixwaze merhamet dike, û kî ko dixwaze, pêti dike. ¹⁹ Nua ji mi ra dê bêji, erki wusan e, Hênî çima? suç dibîne; zîra kî? zid sekinî ji meramê wî ra. ²⁰ Hama tu kî? î, ya! meruv, ko ji Xodê ra cewab didî; meger maxlûq ji Xaliqê xo ra dikare? bêje, erki ta çima? mi ahwa çêkir. ²¹ Li ser harî hokmatê prûdê tunne?, ji aw yek acirandinê fraq çêkirin ra, yekî ji boy îzzetê aw ê din ji boy alçaxîti. ²² Lê çi? gotinê yekê heye, erki Xodê ji boy xazabê xo nîşan dayinê, û qudrêtê xo aşîkar kirinê, bi pîr tahmûlê sabr kir ji boy helak bûn ra hati hazir bûn ji fraqê xazabê ra; ²³ Û yaxod azametê îzzet xo ko aşîkar dike li ser fraqê ji boy merhamet kirinê, wan ko ji awul ji boy îzzetê hazir kir, ²⁴ Yanî me ko dawet kir, ji Yehûdîan tenê né, lê ji tayîfan jî. ²⁵ Çawan ko li Ose da jî dibê: Li xalqê min nebûoxan ra xalqê min û nahebandox ra hebandî dê gazî kim. ²⁶ Û dê bibe erki li aw cî da ko ji wan ra hati gotan, Erki hûn xalqê mi nin in, li wê wan dê kure Sax Allahê bèn gotin. ²⁷ Hem Îşaya jî ji derhaqê îsrayelê gazî dike, erki hasabê kure Îsrayelê qasa quma bahrê bibe, ancax baqîkî dê xelas bibe. ²⁸ Zîra bi sadaqatê qerar kir sözê dê temam bike, çima ko Rabb li ser ardê sözê kî dê îcra bike. ²⁹ Û çawan ko Îşaya ji awul go: Erki Rabbê askeran ji me ra zürîetkî ne- [378] hişdana, em weka Soţomê dê bibana, û ji Komoşa dê bengzemîş bibana. ³⁰ Nua em çi bibêjin erki tayîfan ko li dû sadaqatê nedîqûbana, ji sadaqat ra gîyan ji aw sadaqat ra ko ji îmanê e. ³¹ Hama Îsrayel ko li

³⁴¹ Di metnê de me.

dû sadaqat nomosê diçûbû, ji sadaqat nomosê ra negîya. ³² Çima?, zîra na ji îmanê, lê weka ji amelê nomosê xo da sadiq bûn; çima ko li ser zinaçê xwar bûnê xwar bûn. ³³ Çawan ko hatîe nivîsandin, Va ha li Sîon da kevirkî xwar bûnê datînim, zinaçê ji boy xwar bûnê, û hemî kî ko jê ra îman tîne dê şerm neke.

SER 10

¹ Ya! brêan, arzûe dilê min we nimêcê min li Xodê ji boy xelasê wan e. ² Zîra ji boy wan ez şehadet dikim ko xayretê Xodê wan heye, lakîn bi zanîti nin e. ³ Çima ko wan sadaqatê Xodê bi nizaninê û sadaqatê xo bi xosdinê sabît kirin, ji sadaqatê Xodê ra tabî nêbûn. ⁴ Zîra ji hemî Îman anoxan ra ji boy sadaqatê, nîhayetê nomosê, Îsa e.

⁵ Zîra Mûsa ji nomos da bûn ji boy sadaqatê dinivîse ko, wan îcra kroç meruv, bi wanan dê bijî. ⁶ Hama ji îmanê bûn sadaqat ahwa dibê: Li dilê xo da me bê ko kî? dê rabe li azümanan, yanî ko Îsaê bîne xwarî; ⁷ Yaxod kî? dê biço xwarî li bin zikê ardê, yanî Îsaê ji mirîan biderîne. ⁸ Lê çi? dibê: Söz nêz e, li devê ta da, û li dilê ta da e, yanî söza îmanê ko em waz dikin. ⁹ Zîra erki tu bi devê xo Mesîhê Rabb îqrar dikî, û li dilê [379] xo da îman bînî erki Xodê awî ji mirîan qiyam kir, dê xelas bibî. ¹⁰ Zîra ji boy sadaqatê bi dil îman tîe anîn, û ji boy xelasê, bi dev tîe îqrar bûn. ¹¹ Zîra ktêb dibê, hemî her kî ko jê ra îman tîne dê şerm neke. ¹² Çima ko farqê tunne li mabeynê Yehûdî û Yûnanîê; zîra Rabbê hemîan³⁴² heman aw e; basê hemîan ko jê ra gazî dikin. ¹³ Zîra ji navê Rabb ra gazî kroç dê xelas bibe.

¹⁴ Erki wusan e dê çawan jê ra gazî bikin, ji awî ra ko îman nenaîn, yaxod dê çawan? îman bînin ji awî ra, ko ji boy wî nêbihîsdin, yaxod dê çawan? bibihên, erki yekê waz nêke, ¹⁵ Yaxod dê çawan? waz bikin erki náyin şîandin, çawan ko hatîe nivîsandin: Lînga selamet müjde kroçan xayr tîşt müjde kroçan çawan? rind e; ¹⁶ Lakîn ji müjde ra hemîan îtaat nekirin; zîra Îşaya dibê: Ya! Rabb ji xaberê me ra kî? bawur kir. ¹⁷ Nua îman ji ji bihîsdin, û bihîsdin ji kelimê Xodê e. ¹⁸ Lakîn dibêm, nabihîsdin?, belî; Dengê wan li hemî dinê, û sözê wan li hata para dinê rabûe. ¹⁹ Lakîn dibêm, meger Îsrayel nazanî?; awul Mûsa dibê, Ez wê bi tayîfe nâbûn xalqê li xusûmetê da dê bavêjim, wê bi fehmsîz tayîfakî dê bidim zayîfandin. ²⁰ Îşaya jî bi cesaret kirinê dibê: Wan ko mi aramîş nadikiribûn ji wan ra hatim dîtin, wan ko mi

³⁴² Di metnê de *himîan*.

pirs nedikiribûn ji wan ra aşîkâr bûm. ²¹ Hama ji boy Îsrayelê dibê: Her ro mi destê xo ji îtaat nekroş, zid xaber dayoş qawm ra mi dirêj kir.

[380] SER 11

¹ Nua dibêm, Xodê xalqê xo red? kir, hâşa; zîra ez bi xo ji Îsrayelê me, ji zürîetê Îbrahîmê û ji sîlsîleê Penîamînê me. ² Xodê xalqê xo red nakir, awî ko aw ji awul nas kir, yaxod li ser Eliaê gotinê ktêbê hûn nizanin?; çawan ji Xodê ra bi gilî kirinê dibê li ser Îsrayelê. ³ Ya! Rabb, peyemberê ta kuştin, û sexanê ta heloşandin, û ez tenê mam, û canê min aramîş dikin. ⁴ Lakîn çi? dibê jê ra cewabê rabbanî, dibê: Mi ji xo ra hişt, heft hazar merûvan, wan ko ji Baal ra çok nekirin. ⁵ Nua li wexta han da jî ahwa, li gora bijartinê îneyetê baqîkî bû; ⁶ Ê erki ji îneyetê e; hênî ji amelan nin e, erki ná îneyet hênî îneyet nabe, û erki ji amelan bibe, hênî îneyet nin e; erki ná amel hênî amel nabe. ⁷ Nua çi? bû; Îsrayel ji aw tişt ra nagîya ko aramîş dikir; hama bijartîan gîyan, û baqîan kör bûn. ⁸ Çawan ko hatî nivîsandin: Xodê ji wan ra hata roya han, Rûhkî sersemîtîê ta, çahvkî ko nabîni, û goykî ko nabihê. ⁹ Dawûd daxî dibê, Sexanê wan ji wan ra ji boy faqê û seydê û ji boy xwar bûnê û cezayê bibe. ¹⁰ Çahvê wan tarî bibin, ko nebînin, û piştê wan dayîma li jêr xwar bike. ¹¹ Nua dibêm, meger ji boy ketinê wan suç? kirin; hâşa; lê bi suç kirinê wan ji tayîfan ra xelas bû; ko wan li haraketê bîne. ¹² Nua ketinê wan xanîmetê dinê, û kê m bûnê wan³⁴³ xanîmete tayîfan bû îse; lê tekmlîtîê wan çiqas zêde dê xanîmet bibe. ¹³ Hama ji we ra [381] ji tayîfan ra dibêm, çima ko ez Resûlê tayîfan im, xizmetê xo bi îzzet dikim; ¹⁴ Belkî wan ko ji tenê min in, li haraketê bi anînê, ji wan hinkan xelas bikim. ¹⁵ Zîra erki red bûnê wan lê hatinê dinê e, lê qabûl bûnê wan dê çi? bibe, başqa tişt nin e, ji mirîan sax bûn. ¹⁶ Ê erki mûbar azîz e, hevîr jî; û erki qurm azîz e, gulîê wî jî wusan e. ¹⁷ Ê erki ji aw gülîan hinikan hatin qurufandin, û tu kî darê zeytûnê yabanî bûy, li nav wan da hatî tahmandin, û hîsedarê qurmê darê zeytûnê û qalawîtîê wî bûy, ¹⁸ Li ser gülîan pasna xo mede, lê erki pasna xo didî, tu qurmê helnayînî, îlla qurm ta heltîne. ¹⁹ Nua dê bêjî, Gülîan hatin brandin ko, ez bêmi tahmandin. ²⁰ Qânc, wan ji boy îmansîzîtîê hatin brandin, û tu bi îman disekinî; pasna xo mede lê bitîrs; ²¹ Zîra erki Xodê asl gülîan qayîrmîş nékir, saqin be belkî ta jî qayîrmîş neke. ²² Nua mêze ke xoşîfî û hükmê Xodê, li ser wunda bûoxan hükmê wî, û li ser ta xoşîfîê wî, erki li

³⁴³ Di metnê de wan wan.

nav xoşîtiê bisekinî, erki ná, tu jî dê bêy brandin. ²³ Û wan jî erki li nav îmansîzîtiê xo násekinin, dê bêne tahmandin, zîra Xodê qadîr e wan dîsa bi tahmîne. ²⁴ Zîra erki tu ji xo ra ji aslê bûn ji yabanî darê zeytûnê hatî brandin, û li ser aw darê zeytûnê qanc ko ji ta ra ji tabîatê nebû; tu hatîy tahmandin, hênî çiqas wan ko asl gulî ne dê bêne tahmandin li ser darê zeytûnê xo. ²⁵ Zîra, ya! brêan, ez naxwazim ko hûn sirê han nizanibin, hata ko hûn li xo da bi aqîl nabin, ko gelikî kôrîti bû ji Îsrael ra, hata ko [382] tekmîlîtiê tayîfan bikeve; ²⁶ Û ahwa hemî Îsrayel dê xelas bibe, çawan ko hatîe nivîsandin, ji Sîonê dê bê xelas kroş, û ji Yaqûbê fasîqîtiê dê vegeîrîni; ²⁷ Û vîa e wadê min bi wan ra, gava ko güneê wan helînim. ²⁸ Bîra li gora Încîlê ji semedê wê wan dijmin in, hama li gora bijartîniê, ji semedê bavan wan delalî nin. ²⁹ Zîra baxşîş û dawetê xo bê poşmanîti ne. ³⁰ Zîra çawan ko hûn jî zemankî ji Xodê ra îman nédianîbûn, û nua hûn merhamet dîn, li wexta îmansîzîtiê wan, ³¹ Wusan jî wan nua îmansîz bûn li wexta merhamet dîtinê wê ko wan jî merhamet bibînin. ³² Zîra Xodê hemîan jî li bin îtaatsîzîtiê girt, hata ko ji hemîan ra merhamet bike.

³³ Ey! kûrîtiê xanîmetê û îlmê farasetê Xodê, hîkmetê wî çawan! bê yoxlamîş in, û rêya wî çawan! bê teftîş in. ³⁴ Zîra aqlê Xodê kî? zane, yaxod kî? sirdeşê wî bû. ³⁵ Yaxod ji awul kî? tiştêkî da jê ra, ko bedelê wî bê jê ra dayin. ³⁶ Zîra her tişt jî wî ne, û bi wî, û ji boy wî ne, jê ra ji ebeden hamd bibe, amîn.

SER 12

¹ Nua, ya! brêan, ji boy merhametê Xodê ji we dîleg dikim, ko tenê xo ji Xodê ra bidim sax, azîz û maqbûl qurbankî, ko vîa aqlanê îbadetê wê e. ² Û tawra dineê han mekevin, lê bi tazetîê aqlê xo tebdîl bin, ko teftîş bikin, erki çi? e meramê Xodê, aw ko qanc û maqbûl û tekmîl e. ³ Zîra bi aw îneyet ko ji Xodê ji mi ra hatîe dayin, li we da bûn ji her yekê ra dibêm, ko ji layiq bûnê zêde tiştêkî fikir [383] neke, lê bi aql bûn sekinandin fikir bike, çawan ko Xodê ji her yekê ra hîse kir li gora îmanê. ⁴ Zîra çawan ko li yek tenê me da pîr azay me heye, û şîxulê hemî azayan heman yek nin e; ⁵ Ahwa jî em pîran bi Îsa yek ten in, û em her yekê azayê hevûdu nin. ⁶ Nua li gora aw îneyetê türli türli baxşîşê me bi hebûnê ko ji me ra hatîe dayin, erki peyxemberîti, li gora îmanê em qulanmîş bikin. ⁷ Erki xizmet, li xizmetê da em bibin, erki talîm, talîm diki bra li pey talîmê bibe, ⁸ Erki aw ko şîret dide; li pey şîret bibe, aw ko baxş dike bra bi cömerdî bike, aw ko serkâr e, bi caht, bibe, aw ko merhamet dike bi şen dil bike; ⁹ Muhabet bê mürayîti bibe; ji yaramazê bi îkrah

kirinê ji qancîtî ra bizaliqin. ¹⁰ Li branî muhabetê da rahmanî bin, li îkrah kirin da li hevûdu bibihurin; ¹¹ Li caht da tenbel mebin, li rûh da bi hararet bibin, ji Rab ra xizmet bikin; ¹² Bi umud şaz bin, li sixintî da bi sabr bin, bê sekinandin nimêc bikin. ¹³ Li mühtacîtê azîzan îlhaq bin, müsafir qabûl kirinê, ji dest bermedin. ¹⁴ Wê qawarandoşan ra xayr dua bikin, xayr dua bikin, û beddua makin. ¹⁵ Bi şaz bûoşan ra şaz bin, û bi wan ko digirin, bigirin. ¹⁶ Bi hevûdu li yek fikr da bibin, tiştê bilinda fikir mekin, kbarîti mekin, lê bi mahçûban mahçûb bin, hûn xo li cîê alîman da maynin. ¹⁷ Li dêla kemlikê kemlik mekin, li ber hemî merûvan ji tiştê³⁴⁴ qancan ra muqayet bin. ¹⁸ Erki münkîn heye çiqas ko ji destê wê tî bi hemî merûvan baruştî bikin. ¹⁹ Ya! muhîbîan, ji boy xo hayf mestînin, îlla ji xazab ra cî bidin, çima ko hatî nivîsandin, [384] hayf a min e cez[a] ez didim dibê, Rabb. ²⁰ Nua erki dijminê ta birçî e, nan dibe ê kê, û erki tî e, av bide ê kê; zîra avî bi kirinê çêlê agran li ser serê wî dê biabînî. ²¹ Ji şerê fath mebe, îlla bi xayr şerê fath bike.

SER 13

¹ Her can, li serî da bûn ji hükümdaran ra bra îtaat bike, zîra hökmat tunne ko ji Xodê nebe, û aw hükmatan ko hene ji Xodê tayîn bûne; ² Wusan ko ji hükmat ra qarşî sekinandoş, ji tertîbê Xodê ra qarşî disekine; û wan ko qarşî disekinin, ji xo ra hüküm û azab dê bistînin. ³ Zîra hükmdaran ji xayr amelan ra tîrs dayoş nin in, lê ji kotî amelan ra, dixwazî ji hükmatê netîrsin, xayr bişixul, û ji wî medh dê bibî. ⁴ Çima ko ji ta ra ji boy qancîtî xizmetçîê Xodê e; hama erki aw tişt ko kotî e dişixulî, bitîrs; çima ko şûr nafîle li piştê xo grênade; zîra xizmetçîê Xodê e, bi xazab hayf sendinê ji wî ko kotî tiştê dişixule. ⁵ Ji boy vîa tenê ji boy xazabê ná, lê ji boy zamîr jî îtaat kirin farz e. ⁶ Çima ko ji wî semedê xarac jî hûn didin; zîra xizmetçîê Xodê ne ji boy tiştê han mêze kirinê. ⁷ Nua ji hemîan ra deynê xo eda bikin, ji awî ra ko xarac, lazim e, xarac; ji awî ra ko gümrük lazim e, gümrük; ji awî ra ko tîrs lazim e, tîrs; ji awî ra ko îzzet lazim e, îzzet.

⁸ Ji hevûdu hebandinê mada qat ji kesê ra, qat tiştêkî deyndar mebin, zîra aw ko hevalê xo dihebîni, nomosê tekmîl dike; ⁹ Zîra [385] aw Zîna ne kirin, Qatil ne kirin, Dizî ne kirin, Derew şehadetî ne kirin, Arzû ne kirin, û hênî başqa çi tenbîh ko

³⁴⁴ Di metnê de *biştê*.

heye, hemî jî li söza han da mewcûd e, erki Hevalê xo weka nefsê xo bihebînî. ¹⁰ Muhabet ji hevalê xo ra kemlik naşixule, erki wusan e muhabet tamamîtiê nomosê e.

¹¹ Vîa bizanin ji boy wextê ko nua wext e ji me ra ji xewê rakirin, zîra nua xelasê me ji me ra nêz e, ji aw wext ko me îman anîn. ¹² Şev bihurî û ro nêz bûe, nua amelê tarîê bertaraf bikin, û sîlahê rohnîê li ser xo wergirin. ¹³ Weka royê bi hüsn û haraketê em bigerîn, li zewq û sefa da ná, li serxoşîti da ná, li murdará lihêfan da û li edebsîzîti da na, li pev çûn û li hased da na; ¹⁴ Lê li ser xo wergirin Rabb Îsa el Mesîhê, ji boy tenê xo tedarîk mebînin, ji boy murdarîtiê.

SER 14

¹ Ê li îman da zayîf bûn qabûl bikin, ji boy bi weswese bahsan na. ² Yekê bawur dike ko her tişt dikare bixor, û aw ko zayîf e pencar dixo. ³ Xwarox, nexwaroxê bra ser hev da neke; û nexwarox li ser xwaroxê bra hükm neke, zîra Xodê awî qabûl kirî. ⁴ Tu kî? î ko xizmetkare xalqê hükm dikî, aw ji Efendîê xo ra ya disekine, ya dikeve, hama dê bisekine; zîra Xodê awî sekinandin ra qadîr e. ⁵ Yekê, yek roki ji aw roya din pêtir hasab dike, û awê din her ro yek hasab dike, her kes bra li aqlê xo da qanmîş bike. ⁶ Aw ko royê fikr dike, ji Xodê ra dike, û aw ko roye [386] fikr nake, ji Xodê ra nake, û aw ko dixo ji Xodê ra dixo, zîra ji Xoê ra şikir dike; û aw ko náxo, ji Xodê ra şikir dike. ⁷ Zîra ji me qat yekê ji boy xo ömr nake, û qat yekê ji boy xo námîre. ⁸ Çima ko erki em ömr bikin, ji boy Xodê ömr dikin, û erki bimrin ji boy Xodê dimirin; nua em erki ömr bikin erki bimrin a Xodê ne. ⁹ Zîra Îsa jî ji boy vîa hem mir, hem sax bû; hata ko hem li ser mirîan hem li ser saxan hükmat baje. ¹⁰ Hama tu çima? li ser brêy xo hükm dikî, yaxod tu çima? brêy xo serhevde dikî, zîra me hemî jî li ber diwanê Îsa dê bisekinin. ¹¹ Zîra hatîe nivîsandin: ez sax im dibê Rabb, ko her çok ji mî ra dê nîzm be; û hemî ziman ji Xodê ra dê îqrar bike. ¹² Nua erki wusan e ji me her yekê ji Xodê ra dê hasab bide, ji boy nefsê xo. ¹³ Nua hênî em hevûdu hükm mékin; lê hênî pîr ahwa hükm bikin li aqlê xo da ji brê ra manîkî, yaxod xwar bûnkî da neynin. ¹⁴ Vîa dizanim û bi Rabb Mesîhê qanmîş bûm, ko qat tiştî aw ji xo murdar nin e; lê kî ko murdar hasab dike tiştî jê ra murdar e aw. ¹⁵ Hama erki brêy ta ji boy taamê qasawet dikşîne, hênî tu bi muhabet naçî, bi taamê xo awî helak méke, ji boy ê kê ko Îsa mir. ¹⁶ Nua xayrê we bra zemm nébe.

¹⁷ Zîra padişahîtiê Xodê taam û vexwarin nin e, îlla bi Rûh el Quds sadaqat û selamet û şazîti e. ¹⁸ Zîra erki yekê bi tiştê hana hi Îsa ra xizmet dike, aw Xodê ra

maqbûl e, û li ber merûvan rind. ¹⁹ Erki wusan e li pey selametê û mamûrê hevûdu bibin. ²⁰ Nebe ko ji semedê taamê şixulê xarab bikî, her [387] tişt pak e, tenê ji aw meruv ra kotî e, ko ji başqasî ra bi xwar dayinê dixo.

²¹ Qanc e goşt nexwarin û şerab venexwarin, ne jî tiştê kirin, bi awî ko brêy ta dikeve, yaxod xwar dibe, yaxod zayîf dibe. ²² Îmanê ta heye, awî ji xo ra li ber Xodê bigir, xozî ji awî ra ko nefsê xo hükm nabe bi awî ko aw xo dihesibîne. ²³ Lakîn aw ko weswese dike, erki bi xo hükm dibe; zîra bi îman náxo, çima ko çi ko bi îman nin e aw güne e.

SER 15

¹ Lazim e ji me ra ko em qadîr in zayîfîtî bê quwetan em helîlin, û ná tenê nefsê xo xoş bikin. ² Lê ji me her yekê ji boy mamûrîtî ji hevalê xo xoş dike, li nav taîştá qanc; ³ Zîra Îsa jî aw xo xoşnûd nekir, lê çawan ko hatîe nivîsandin, Serhevdaê ta serhevda kroşan li ser min ketin. ⁴ Zîra çi ko ji awul hate nivîsandin, ji boy talîmê me hate nivîsandin; wusan ko bi sabr û bi dil pîrsinê kitêban ji umud ra em malîk bibin.

⁵ Ê Xodêê sabrê û dil pîrsinê bide ji we ra ko hûn bi hevûdu bi yek nîfir bibin, li gora xosdinê Îsa el Mesîhê; ⁶ Hata ko bi yek dil û bi yek dev ji Xodê ra hamd bikin, û ji Bavê Rabbê me Îsa el Mesîh ra. ⁷ Ji boy vîa hevûdu qabûl bikin çawan ko Îsa jî wê qabûl kir ji boy îzzetê Xodê.

⁸ Ê dibêm ko Îsa el Mesîh ji boy doxîrîtî Xodê xizmetcî sünê bû, ko aw wad ko ji bavan ra bû pê ke. ⁹ Ê tayîfan ji boy merha- [388] metan ji Xodê ra şikir bikin, çawan ko hatîe nivîsandin, Ji boy vîa li tayîfan da ji ta ra hamd dê bidim, û ji navê ta ra îlahî dê bixoyim. ¹⁰ Ê dîsa dibê, Ya! tayîfan bi qawmê wî tev şaz bin. ¹¹ Ê dîsa ji Xodê ra hamd bikim, ey! hemî tayîfan, û awî medh bikin hemî qawman. ¹² Ê dîsa Îşaya dibê: Ji Hesseê qurmî dê bibe, û aw ko ji tayîfan ra dê hûkmdar bisekine; û tayîfan jê ra umud bikin. ¹³ Ê Xodêê umudê wê li îman da bi her şazîtî û selamet tîjî bike; hata ko hûn bi quwwetê Rûh el Qudsê li umud da bi zêde bûnê bibin.

¹⁴ Ê ez bi xo jî ji boy wê qanmîş bûme, ya? brêy min, ko hûn bi qancîtî tîji ne hûn tîji bi hemî îlham, û hûn qadîr in hevûdu nasîhat kirinê. ¹⁵ Hama ji alîkî bi cesaret mi ji we ra nivîsand, ya! brêy min, wusan ko li bîra wê bînim tiştê hana li gora aw îneyetê ko ji mi ra hati dayin, ¹⁶ Ko ez xizmetcî Îsa el Mesîhê bibim li nav tayfan û xizmetê încîlê Xodê bikim, hata ko bi destê Rûh el Qudsê hedîye bûnê tayîfan bi azîz

bûnê maqbûl bibe. ¹⁷ Nua pasna min heye li ba Xodê bi Îsa el Mesîhê. ¹⁸ Çima ko cesaret nakim gotinê ji aw tiştan yekê, ko Îsa bi destê min nêşixulîe ji boy tayîfan îtaat kirinê, bi xaber û bi amel, ¹⁹ Bi quwetê alametana û hîkmetana, bi quwetê Rûh el Qudsê, wusan ko mi ji Qudsê bi dest kirinê û bi dewir kirinê hata alîê Lûrîgîan mi Încîlê Îsayê tîji kir. ²⁰ Ê Încîlê waz kirinê mi ahwa xayret kir, na kî li aw deran ko navê Îsayê zîkr bobû, ko nebe li ser temelê başqasîkî çêkin, lê çawan ko hatîe nivîsandin. ²¹ Erki ji wan ra ko nehata naql [389] bûn li ser wê dê bibînin, û wan ko nebihîsdin dê fehm bikin. ²² Ji boy vîa jî pîr şûnda mame ji we ra hatinê. ²³ Hama nua ko li alîê hana jî cîlê min tunne, û ji pîr salan vir da pîr arzûê min heye ji we ra hatinê, ²⁴ Gava ko li alîê Sbanîayê biçûm, û kînga ko bihurim umudê min heye we bibînin, û ji we bêm şîyandin li wê, erki awul hinik ji wê tîr bim. ²⁵ Hama a nua li Qudsê diçûm ji boy ji azîzan ra xizmet kirinê. ²⁶ Zîra ji birêêt Mageţonîayê û Akayîaê xoş bûya ko li Qudsê da bûn ji faqîr azîzan ra hinik îlhaqîtî bikim. ²⁷ Ji wan ra xoş xuya, çima ko ji wan ra deyndar jî ne, zîra erki tayîfan ji rûhanî tiştê wan ra îlhaq bûn, deyndar dibin ko îlhaq bibin ji wan ra li nav tenawî tiştan jî. ²⁸ Nua vîa bi tekmîl kirinê û bi mîhr kirinê meyweyê han, ji li Sbanîayê dê bibihurim. ²⁹ Ê vîa dizanim ko gava ko ji we ra bêm, bi tîji bereketê Încîlê Îsa dê bêm.

³⁰ Ji we lava dikim, ya! brêan, bi Rabbê me Îsa el Mesîh, û bi muhabetê Rûhê, ko ji boy min ji Xodê ra li nimêc da bi tevlî min xayret dikin, ³¹ Ko li Yehûdîsdan da ji îtaatsîzan xelas bibim, hata ko li Qudsê da bûn xizmetê min ji azîzan ra maqbûl bibe, ³² Wusan ko bi îzna Xodê, ji we ra bi şazîtî bêm, û bi wê tev rahat bibim. ³³ Ê Xodêê selametê bi we hemîan bibe, amîn.

[391] SER 16

¹ Xuşka me Pîpe ji we ra teslîm dikim, ko xizmetçîê kîlîsayê Genkraye; ² Ko awî bi Rabb qa- [390] bûl bikin, çawan ko ji azîzan ra layiq e, lê mêze kin ji boy her çî ko ji yardumê wê mîhtac bibe; zîra wî jî ji pîran ra yardum kir, û ji mi ra jî. ³ Bi Îsa el Mesîh bi mi ra şîxuloş ji Brîsgîxa ra û ji Agûxasê ra silavan bikin; ⁴ Ko wan li uxura canê min astûyê xo dan, ko ji wan né tenê ez razî me, lê hemî kîlîsayê tayîfan jî. ⁵ Li mala wan da bûn ji kîlîsa ra jî silavan bikin, ji delalîê mi ra ji Ebenedos ra silavan bikin, ko aw e mûbarê kîlîsayê Asîayê bi Îsa. ⁶ Silavan bikin ji Meyremê ra ko ji boy min pîr zahmet kşand. ⁷ Silavan bikin ji Antronîgos ra û ji Hûnîa ji xisûmêt mi ra, û mahbûsdaşê mi ra, ko wan li nav resûlan meşhûr in, wan ko ji min awul jî a

Îsaye bûn. ⁸ Ailavan bikin ji muhabetlîê mi ra Ambxîa ra. ⁹ Bi me ra şixulox ji Urpanos ra û ji muhabetlîê me ra ji Sdakesê ra silavan bikin. ¹⁰ Silavan bikin ji Abexes ra ko bi Îsa hatîe bijartin. ¹¹ Silavan bikin ji wan ra ko ji mala Arîsdapuxos in, silavan bikin ji Hîrodîon ji xisûmê mi ra; Silavan bikin ji wan ra ko ji mala nargesen in bi Rabb. ¹² Bi Rabb zahmet kşandox ji Drîpon û ji Drîpos ra silavan bikin, bi Rabb pîr zahmet kşandox ji delalî Bersîtê ra silavan bikin. ¹³ Bi Rabb hati bijartî ji Rupos ra û ji diê wî û a min ra. ¹⁴ Silavan bikin ji Asîngrîdos, ji Pxiķon, ji Ermas, ji Badropa, ji Ermes, û bi wan ra bûn ji brêan ra. ¹⁵ Silavan bikin ji Pîxoķokos û ji Hulîa, ji Nereos, û ji Xuşka wî ra, û ji Voķîmbos û bi wan ra bûn ji hemî azîzan ra. ¹⁶ Silavan bikin ji hevûdu ra bi azîz ramîsanê; hemî kîlîsayê Îsayê ji we ra silavan dîkin.

¹⁷ Ê ji we rîca dikim, ya! brêan, ko bizanin wan ko li qarşî aw talîm ko hûn hîn bûn nîzan û xwarbûnan dîkin, û ji wan dûr bisekinin, ¹⁸ Zîra ahwa nasan ji Îsa Rabbê me ra xizmet nakin, lê ji zîķê xo ra, û güzel sözan hem bi xoş kelaman dixapînin dilê wan ko kotî tîştan dîşîmîş nakin. ¹⁹ Zîra îtaatîê wê ji hemîan ra gîyae, nua ji boy wê şaz dibim; lakîn dixwazim ko hûn li qancîtî da alîman û kemlîk da bê zararan bibin. ²⁰ Ê Xodêê selametê Şeytan li bin lingê wê xurdûxaş bike zû ve; îneyetê Rabbê me Îsa el Mesîhê bi we hemîan bibe, amîn.

²¹ Bi mi ra şixulox Dîmoteos, û xisûmê min Xugîos û Hason û Sosîbadros ji we ra silavan dîkin. ²² Ez kaxîdê han nivîsandox Derdîos ji we ra bi Rabb silavan dikim. ²³ Silavan dike ji we ra mûsafîr qabûl kroķê min û ê hemî kîlîsayê Kayîos; ji we ra kedxüdayê bajêrê han Yerasdos û Guardos brê silavan dîkin. ²⁴ Îneyetê Rabbê me Îsa el Mesîhê bi wê hemîan bibe, amîn.

²⁵ Nua ji wî ra ko qadîr e we pêt ke, li gora Încîlê min û waza Îsa el Mesîhê, li gora keşf bûnê aw sirrê, ko ji ebedî zemanan vir da hatibû veşartin, ²⁶ Ê nua aşîkâr bû, û bi destê ktêbê peyxemberan li gora emrê ebedî Xodê ji hemî tayîfan ra hati nas bûn ji boy îtaatê îmanê, ²⁷ Yanî tenê ji alîm Allah ra, bi destê Îsa el Mesîhê, ebedî hamd bibe, amîn.

MEKTÛBÊ AWULÎN Ê RESÛLÊ BOXOS JI GORNTOSLÎAN RA

SER 1

¹ Boxos bi îradetê Xodê ji Îsa el Mesîh ra hati dawet bûn resûlê û hem Sostenes brê, ² Li Gorintos da bûn ji kîlîsae Xodê ra, bi Îsa el Mesîhê hati paqij bûnan ra, ji azîz bûn ra hati gazî bûnoşan ra, bi aw hemîan ra ko li hemî der navê Rabbê me Îsa el Mesîhê gazî dîkin, ê wan û a me, ³ Ji we ra îneyet û selamet bide, ji Rabb ji Bavê me û ji Rabb Îsa el Mesîhê.

⁴ Ji boy we li her wext ji Xodê min şikir dikim, li ser îneyetê Xodê, ko ji we ra hatîe dayin bi Îsa el Mesîhê. ⁵ Ko hûn bi wî li nava hemî tiştan zengîn bûn bi hemî sözan, û bi hemî îlman; ⁶ Çawan ko şehadetê Îsa li we da sabît bû. ⁷ Wusan ko ji aşîkâr bûnê Rabbê me Îsa el Mesîhê bi beklemîş kirinê qat li baxşîşkî da kê nabin; ⁸ Ko aw dê wê qayîm bike hata paşê, bê suç bûnê li roya Rabbê me Îsa el Mesîhê. ⁹ Xodê emîn e ko bi awî hûn hatin dawet bûn ji Qurê wî ra îlhaq bûnê ji Rabbê me Îsa el Mesîhê ra.

¹⁰ Ji we ra lava dikim, ey! brêan, bi navê Rab- [393] bê me Îsa el Mesîhê, ko xaberê we hemîan yek bibe, û li nava we firqaan nebin, lê hûn li ser yek fikir û li ser yek şewir qawî bibin. ¹¹ Zîra ji boy we ji mi ra xaber hat, ey! brêan, ji wan ko ji mala Kxove nin, erki li nav we da firqaan hene. ¹² Nua vîa dibêm, erki ji we her yekê dibê bûe, erki ez ê Boxos im, û awê din ez ê Aboxos im, û awê din ez ê Gepas im, û awê din erki ez ê Îsa me. ¹³ Meger? Îsa hatîe pay bûn, meger Boxos? ji boy we li xaçê rabûe, yaxod hûn bi navê Boxos tahfil bûn; ¹⁴ Şikir dikim ji Xodê, ko ji we yekê mi tahfil nekir, lê tenê Grîsbosê û Kayîosi, ko yekê nebe; ¹⁵ Erki bi navê min tahfil bû. ¹⁶ Bîra kufletê Stepanosê jî mi tahfil kir, hênî başqasîkî qat nizamim, erki mi tahfil kirîe.

¹⁷ Zîra Îsa ez ji boy tahfil kirinê neşîand, lê Încîlê waz kirinê şîand; bi îlma sözan ná, ko xaçê Îsaê nafîle nebe. ¹⁸ Zîra waza xaçê ji helak bûnoşan ra dînîti e, hama ji me ra ji hati xelas bûn ra quwetê Xodê e. ¹⁹ Zîra hatîe nivîsandin; ko îlmê alîman dê wunda bikim, û fehmê fehmlîan dê yox bikim. ²⁰ Li ku? e alîm, li ku? e kâtîb, li ku? e teftîş kroşê vê dinê, Xodê îlmê dinê han li dînîtî nevegerand?. ²¹ Zîra çûnkî dinê bi îlmê Xodê, Xodê nas nekir bi îlmê wî; Xodê razî bû bi dînîtlê wazê îman anoşan xelas bike. ²² Çûnkî Yehûdîan alamatan dixwazin, û Yûnanîan îlman aramîş

dikin. ²³ Hama em hati xaç bûn Îsaê waz dikin, ji Yehûdîan ra xwar bûn û ji Yûnanîan ra dînîti; ²⁴ Hama ji wan ra ko hatin dawet bûn, gerek ji Yehûdîan ra, gerek ji Yûnanîan ra, quwetê Xodê û îlmê Xodê Îsa e. [394] ²⁵ Zîra dînê Xodê ji merûvan alîm e, û zayîfê Xodê ji merûvan hênî xort e. ²⁶ Zîra ey! brêan, hûn dawetê xo dibînin, ko ji alîê tenê ji we pîran quwetlî nin in, ji we pîran asilzade nin in. ²⁷ Lakîn Xodê dîwaneê dînê bijart ko bi şerm bika alîman, û zayîfê dînê Xodê bijart ko bi şerm bike quwetlîan. ²⁸ Ê Xodê alçaq zadeê û raşbetsizê dînê han bijart û nafîlean, ko wan tiştê tîne hasab bûn, wan batal bike; ²⁹ Hata ko li huzûra Xodê qat tenkî pasna xo nede. ³⁰ Hama hûn ji wî ne bi Îsa el Mesîh, ko aw ji me ra ji Xodê Îlm û sadaqat û azîzîti û xelas bû; ³¹ Çawan ko hatî nivîsandin, Aw ko pasna xo dide, bira bi Rabb pasna xo bide.

SER 2

¹ Ê ez ey brêan, ko ji we ra hatim, na kî bi azametê sözê, ya îlman hatim ji boy şehadetê Xodê ji we ra beyan kirinê. ² Zîra mi li nav we da qat tiştê zanin mînasîb nedî, îlla Îsa el Mesîhê aw jî li xaçê hati rabûn. ³ Ê ez bi zayîfîtiê û bi tîrsê û bi pîr tîrsanê li ba we da sekinim. ⁴ Ê sêze min û hem waza bi qandiricî söza îlmê merûvan e, lê bi îsbata Rûh û quwwetê bû. ⁵ Hama ko îmanê wê bi îlmê merûvan na, lê bi quwwetê Xodê bibe. ⁶ Hama li nav kâmilan em îlm xaber didin, lakîn îlmê dînenê han na û ne jî hati batal bûn a hûkmdaranê asîrê han. ⁷ Îlla li sir hati veşartî bûn îlmê Xodê em xaber didin, ko Xodê awî ji boy îzzetê me ji awul da taqdîr kir. ⁸ Ko awî hûkmdarê asîrê han yek jî [395] nizanî, zîra erki bi zanibûna hênî Rabbê celalê li xaçê dê der neanina. ⁹ Lê çawan ko hatî nivîsandin: Aw tiştan ko çahw nedî û go nebihîsdî û li dilê merûvan neketî, Xodê ji delalîanê xo ra hazir kir. ¹⁰ Lakîn Xodê ji me ra aşîkâr kir bi Rûha xo, zîra Rûh her tiştan teftîş dike, tiştê kurê Xodê jî. ¹¹ Zîra ji merûvan tiştê merûvan kî? dizani, lê tenê rûhê merûv ko li wî da e, ahwa jî tiştê Xodê yekê nizane, lê tenê Rûhê Xodê. ¹² Hama em rûhê dînê han nesendin, lê aw Rûh ko ji Xodê e, ko em naskin aw tiştan ko ji Xodê ji me ra hate dayin; ¹³ Ko wan em dibêjin, bi xaber û hîn kirinê îlmê merûvan na, îlla bi söz û hîn kirinê Rûhê Azîzê, û tiştê rûhanîan, bi rûhanîan em rûbar dikin. ¹⁴ Lakîn nefsanî merûv tiştê Rûhê Xodê qabûl nake, zîra wan jê ra dînîti ne, û zanin jî qadîr nin e, zîra bi tarza rûhanî teftîş dikin. ¹⁵ Hama aw ko rûhanî e, her tiştan teftîş dike, û aw ji yekê teftîş nabe. ¹⁶ Zîra fikirê Xodê kî zane, ko jê ra hîn bike, hama li me da fikirê Îsaê heye.

SER 3

¹ Û ez ya! brêan, ji wek̄a rûhanî xaber danê qadîr nebûm, îlla wek̄a cîsmanîan,
² Wek̄a bi Îsaê ji masûman ra, mi ji we ra şîr da xwarin, û na taam, zîra hûn hêja qadîr nebûn, hem nua jî hûn qadîr nin in. ³ Çünkî hêja hûn cîsmanî ne; zîra gava ko li nav we da hasedan û pevçûndanan û nîzayan bibe, hûn cîsmanî nin? in, û bi tarza nasan hûn na- [396] çun. ⁴ Zîra gava ko ji wê yekê dibê, ez ê Boxosê me û awê din, erki ez ê Aboxosê me, hûn cîsmanî nin in. ⁵ Nua Boxos kî? e û Aboxos kî? e, îlla wanan xizmetkâr in, ko bi wan hûn îman anîn, û çawan ko Rabb da ji wan her yekê ra. ⁶ Mi danî û Aboxos av da, lakîn Xodê mezin kir. ⁷ Wusan ko danox tîştîkî nin e, û av dayox tîştîkî nin e, îlla awî mezin krox Xodê. ⁸ Hama danox û av dayox yek in, lakîn her yekê li gora zahmetê xo dê ücret bistîne. ⁹ Zîra em bi Xodê tev şixulox in; hûn palayî û bînaê Xodê ne. ¹⁰ Li gora aw îneyet ko Xodê ji mi ra da, wek̄a alîm mîmarkî mi hîm danî, hama li ser wî çêkîrox başqa e, hama her kes bra mêze ke aw çawan çêdike. ¹¹ Zîra yekê hênî başqa ko aw Îsa el Mesîh e. ¹² Û erki yekê li ser hîmê hana zêr, zîv cewahîr kevîran, dar, gîya, qamîş bîna dike, ¹³ Amelê her kes dê kifş bibe, zîra ro awî dê beyan bike, çima ko bi agir kifş bibe, û amelê her kesê bi çi tarz bûnê, agir dê bicerîbine. ¹⁴ Û erki çêbûn amelê yekê bimîne, awî dê ücret bistîne. ¹⁵ Û yekê amelê yekê dişewite zerar dê xelas bibe. ¹⁶ Nizanin? ko hûn dacarê Xodê ne, û li we da Rûhê Xodê sakîn dibe. ¹⁷ Erki yekê dacarê Xodê xarab dike, Xodê awî helak dê bike, zîra dacarê Xodê azîz e, ko aw hûn in.

¹⁸ Nébe ko yekê aw xo bixapîne, erki ji we yekê aw xo alîm dihasibîne li nav dinêê han, bra dîn bibe, ko alîm bibe. ¹⁹ Zîra îlmê dinêê han li ber Xodê dînîti e; zîra hatîe nivî- [397] sandin, alîman li ferzandîtîe wan girtox aw e. ²⁰ Û dîsa hatîe nivîsandin: Rabbê fikrê alîman dizane ko batal in. ²¹ Wusan ko yekê bi merûvan bra pasna xo nede. ²² Çima ko her tîştî e we e erki Boxos, erki Aboxos, erki Gepas, erki dinê, erki ömür, erki mirin, erki tîştê a nwaîn, erki aw tîştî ko dê bibin hemî jî e we e. ²³ Hûn jî e Îsa nin û Îsa jî e Xodê e.

SER 4

¹ Me meruvan bra ahwa, yanî xizmetkârê Îsaê û weka wekîlxarcê sira Xodê hasab bikin. ² Nua dimîne ko ji wekîlxarcan hati xosdin vîa e, ko yekê emîn bê dîtin. ³ Hama ji mi ra, ji we, yaxod ji hûkma meruv hûkm bûn tiştêkî nin e, ez xo jî hûkm nakim. ⁴ Zîra ez li ser xo kotî tiştêkî nianim; hama bi vîa ez sadiq nabim; lê ez hûkm kroş Rabb e. ⁵ Nua ji zemanan awul qat tiştêkî hûkm mekin, hata ko Rabb bê, ko aw tiştê veşartîê tarîê dê li rohnîê bîne, hem tedbîrê dilan dê aşîkâr bike, û li wê çaxê medha her kesê dê ji Xodê bibe.

⁶ Û vîa ji boy wê ey! brêan, mi ji xo ra û ji Aboxos ra temsîl anî, ko hûn ji me hîn bibin li ser meruvan ji hati nivîsandinê zêde tiştêkî fikir nekin; ko yek ji we ji boy başqasîkî kîbîrlemîş nebe li ber başqasîkî. ⁷ Zîra aw kî? e ko ta farqlî dike ji başqasîan, û çi? ê ta heye ko ta nesendîe, û erki ta sendîa, çima? weka nasendox pasna xo didî.

⁸ Hênî hûn têr bûn, hênî hûn zengîn bûn, bê me hûn padîşah bûn, û kâşkî hûn padîşah³⁴⁵ [398] bibana, ko em jî bi we ra padîşahîti bikirana. ⁹ Zîra ez taxmîn dikim ko Xodê me resûlan edna nasan kir weka qatûlan, zîra em tamaşayê dinê, û melekan û meruvan bûn. ¹⁰ Em ji boy Îsayê diwanê nin, hûn bi Îsa aqîlî ne; em zayîf in, hûn bi quwet in; hûn îzzetlî ne, lakîn em bê raxbet in. ¹¹ Hata li saatê han hem birçî bûn û hem tî bûn em diqşînin; hem tahzî dimînin, hem em tîni kutan, hem bê rahat bûn. ¹² Hem bi destê xo em bi şîxulandinê zahmet diqşînin, gava ko me dijmînan didin, em xayr dua dikin, gava ko me diqawarandin em sabr dikin. ¹³ Gava ko me zem dikin em lava dikin, hata nua em kevnîkê paqij kirinê dinê û weka îbretê alemê bûn. ¹⁴ Wanan ji boy we şerm kirinê nanivîsim, lê weka ewladê min delalî wê şîret dikim. ¹⁵ Zîra erki bi Îsa deh hazar xocaê wê bibe, pîr bavêti wê tunne; zîra bi Îsa el Mesîhê bi destê Încîlê mi wê za. ¹⁶ Nua ji we ra lava dikim, ji mi ra uymîş bibin. ¹⁷ Ji boy vîa mi ji we ra şîand Dîmoteosê, ko kurê min delalî e, û bi Rabb emîn; ko aw dê bîra we bîne bi Îsa bûn rêa min; çawan ko li her cî li nava hemî kîlîsan da hîn dikim. ¹⁸ Hinikan kîbîrlemîş bûn, weka ez ji we ra dê neyim. ¹⁹ Lakîn zû ve dê bêm ji we ra, erki îznê Xodê bibe, ná tenê söza kîbîran, îlla quwwetê wan jî dê bizanim. ²⁰ Zîra padîşahîtiê Xodê bi sözan nin e, lê bi quwwet e. ²¹ Çi? dixwazin, bi çov? ji we ra bêm, yaxod bi muhabet û bi rûha mazlûmîtiê.

³⁴⁵ Di metnê de *paşah* (nîşeya wergêrê).

[399] SER 5

¹ Misewî li nav we da zîna tê bihîsdin, û wusan zîra, ko li nav tayîfan jî tunne, yanî yekê jina bavê xo bigre. ² Û hûn kîbîr bûne û baxusûs hûn şîn nâkşandin, ko amelê han kroş ji nava wê bê helanîn. ³ Zîra faraze ez bi gowda ji wê dûr im, lakîn bi rûh hazir im, nua weka li nav we da hazir bûnê mi cayîz dî, ko tiştê han kroşê; ⁴ Gava ko bi navê Îsa el Mesîhê hûn li yek cî tene civandin û rûha min bi quwwetê Rabb Îsa el Mesîhe, ⁵ Wusan kroş ji Şeytan ra teslîm bikin, ji boy helak bûnê govdey wî, ko rûha wî xelas bibe li roya Rabb Mesîhê. ⁶ Aw pasna wê qanc nin e, hûn nizanin? ko piçîkî hevîr tîrş gişk hevîran tîrş dike. ⁷ Hevîr tîrşê kevin paqij kin, ko bibin hevîrê nû, çawan ko bê hevîr tîrş in; zîra pasehê me Îsa ji boy me qurban bû. ⁸ Nua em bayram bikin, na bi hevîr tîrşê kevin, û na bi hevîr tîrşê kotîtî û yaramazîtî, lê bi hevîr tîrşê, xulûsê pak û doxrîtî. ⁹ Mi nivîsand ji we ra li mektûb da ko bi zînakâran qarişmîş nebin. ¹⁰ Û nivîsandinê min helbet na bi zînakâr, ya bi tamakâr, ya bi qapîcî, ya bi putperestê dinê han e; çûnkî erki wusan bibe, ji we ra dinê han rabûn lazim tê. ¹¹ Hama hala mi ji we ra nivîsand ko qarişmîş nébin, yanî erki yekê rê anglamîş bûe zînakâr, ya tamakâr, ya putperest, ya dijmîn kroş, ya bekrî, ya qapîcî bibe, bi ahwa kesê ra taam bîle méxun. ¹² Zîra ji mi ra çi? lazim e ko ê derve ne jî hükm bi- [400] kim; na? kî hûn aw ko ê hindurê ne hükm dîkin. ¹³ Hama wan ko ê derve ne Xodê dê hükm bike, nua yaramazê ji xo helînin.

SER 6

¹ Ji we yekê erki dawakî wî hebe bi hevalê wî, cesaret dike? li ber nahaqan mehkeme bibe, û ne li ber azîzan. ² Hûn nizanin? ko şeraatê dinê azîzan dê bibînin, û erki şeraatê dinê ji wê dê bibînin, şeraatê pîr piçûk maslahatan layiq nin? in hûn bibînin. ³ Hûn nizanin ko şeraatê melekân em dê bibînin, lê li? ko dimîne tiştê asîrê han. ⁴ Nua erki mehkemeê dayîrê asîrê han li we da heye, alçağ kesê kîlîsayê ji xo ra qadî deynin. ⁵ Ez wê ji boy şerm kirin dayinê dibêm, awqasa bûn kî li nav we da alîmkî tunne, ko li nav brêan şeraat kirinê qadîr bibe. ⁶ Lakîn brê bi brê ra mahkeme bide, vîa jî li ber îmansizan. ⁷ Hala vîa gîjk ji we ra qabahat e, ko bi hevûdu ra daway wê heye; çima? îlla hûn nahaqîti nakşînin; çima? îlla hûn ji kêmanî ra qayîl nabin. ⁸ Lê hûn nahaqîti û kêmanî dîkin, vîa jî ji brêan ra dîkin. ⁹ Hûn nizanin? ko nahaqan warîsê padişahîti Xodê dê nebin; hûn xo méxapînin, gerek fahîşan, gerek

putperestan, gerek zînakâran; ¹⁰ Gerek zenparan, gerek xulamparan, gerek dizan, gerek tamakâran, gerek serxoşan, gerek kufirbazan, gerek qapicîan li padîşahîtiê Xodê dê warîs nebin. ¹¹ Û hûn hinikan, li zemanan ahwa bûn lakîn nua hatin şûşdin, lakîn hatin azîz bûn, lakîn hatin sadîq bûn bi navê Rabb Mesîhê û bi rûhê Xodê me.

[401] ¹² Ji mi ra her tişt cayîz e, hama her tişt faydelî nin e, ji mi ra her tişt cayîz e, hama ez li bin hûkmatê tiştîkî dê nebin. ¹³ Taaman ji boy zîkr ne û zîk jî ji boy taaman; lakîn Xodê avanan jî û wan jî dê batal bike, lakîn gowda ji boy fahîştîtiê nin e, lê ji boy Rabb e, û Rabb ji boy gowda e. ¹⁴ Û Xodê ko Rabbê da qiyam kirin, me jî dê bidî qiyam kirin bi quwwete xo. ¹⁵ Hûn nizanin? ko tenê wê azayê Îsa ne, nua azayê Îsaê em bistînin û azayê fahîşan bikin, hâşa. ¹⁶ Hûn nizanin ko erki aw ko ji fahîş ra nêz dibe bi wî ra yek ten dibe, çima ko ktêb, Herduan yek ten dê bibin. ¹⁷ Hama aw ko ji Xodê ra nêz dibe, bi wî ra yek rûh dibe. ¹⁸ Ji fahîştîtiê bîravin; meruv her çi günê ko dike ji tenê wî derve e; hama zîra kroş, ji tenê xo ra güne dike. ¹⁹ Hûn nizanin ko tenê wê ducarê Rûh el Qudsê ne ko li nav we da e, ko awî ji Xodê ji we ra heye, û hûn Xodê xo nin in. ²⁰ Zîra hûn bi baha hatin krandin, nua bi tenê xo û bi rûhê ji Xodê ra îzzet bikin, ko wan ê Xodê ne.

SER 7

¹ Zîra ji boy aw tiştan ko hûn ji mi ra nivîsandin; ji meruv ra qanc e ko ji jin ra nêz nébe. ² Hama ji semedê zînyan ji her kes ra jina wî hebe, û ê her jin mêrê wî hebe. ³ Mêr bra deynê jina xo ada bike, wusan jî jin deynê mêrê xo. ⁴ Jin li ser xo hûkmat néke, lê mêrê wî; hem wusan jî mêr li ser xo hûkmat neke, lê jinê wî. ⁵ Hûn hevûdu mahrûm mehêlin; meyer ko, ji boy wexta îba- **[402]** detê wê bûnê, hata wextîkî bi yek xaber bibe; û dîsa ji hevûdu ra vegezin ko Şeytan wê nécarîbîne ji boy né zabt bûnê wê. ⁶ Vîa dibêm bi berdanê, û ná bi tenbîh kirinê. ⁷ Zîra mi dixosd ko her kes weka min bibana; lakîn ê her yekê baxşîşê wî heye ji Xodê, yekê va ha û awê dîn bi wê havayê. ⁸ Hama ji nezevicîan ra û ji jînebîan ra dibêm, ji wan ra qanc e ko weka min bimînin. ⁹ Hama erki aw xo nikarin zabt kirinê, bra bizewicin; zîra zewicandin ji germ bûnê qanc e. ¹⁰ Hama ji zewicandoşan ra tenbîh dikim, né ez, lê Xodê, ko jin ji mêrê xo bra cîne nebe; ¹¹ Lê erki bibe jî bê zewicandin bimîne, yaxod bra bi jinê xo li hev bê, û mêr jina xo bra nehêle. ¹² Hama ji başqasîan ra ez dibêm, na Rabb, erki ji brêkî ra îmansîz jînkî heye, aw bi wî ra sakîn bûnê razî e, awî bra ber nede. ¹³ Û ji jin kî ra îmansîz mêr hebe, wî bi aw ra sakîn bûnê razî e, bra awî ber

nede. ¹⁴ Çima ko îmansiz mêr, bi jin tê azîz bûn û îmansiz jin bi mêr tê azîz bûn; zîra erki wusan nebana ewladê wê dê murdar binana, hama nua azîz in. ¹⁵ Zîra îmansiz bûn erki cîê dibe, bra cîê be; brêkî ya xuşkî li ahwa tiştan da yêşîr nin e, lakîn Xodê me ji selamet ra gazî kir. ¹⁶ Zîra tu çi? zanî, ey jin, tu dê mêrê xoxelas kî, ya tu çi? zanî ey! mêr, belkî tu dê jinê xo xelas kî. ¹⁷ Faqat Xodê çawan dawet kir bra wusan here; û bi vî havayê li hemî kîlîsan da ez tenbîh dikim.

¹⁸ Erki yekê bi sünnet ji îman ra dawet bû, bra dîsa bê sünnet nebe, ji bê sünnetan yekê dawet bû bra sünnet nebe. ¹⁹ Zîra sünnet [403] qat tiştî nin e û bê sünnet qat tiştî nin e; lê pê kirine tenbîhê Xodê lazîm e. ²⁰ Zîra her kes li çi da dawet bû, bra li wî da bisekine. ²¹ Tu qul? dawet bûy, bra hacetê ta nebe, lakîn erki dikârî azad bî, hênî qanc, awî li dest bîne. ²² Zîra aw qul ko bi Rabb dawet bûe aw azadê Xodê e; wusan jî aw azad ko dawet bûe, qulê Îsa e. ²³ Hûn bi baha hatin kirandin, qulê însanan mebin. ²⁴ Her kes, ey! brêan, li çi da dawet bû li ber Xodê bra li wî da bisekine.

²⁵ Hama ji boy bakîran, ji Xodê tenbîhê min tunne; hama mi ji Rabb emîn bûn ra bi merhamet ditinê, ji we ra rey didim. ²⁶ Nua ez taxmîn dikim ko qanc e li zemana han da ji boy sizletê, yanî qanc e ji merûv ra ko ahwa bibe. ²⁷ Bi jin hatîy grêdan, vekirin aramîş meke, ji jin berday?, jin aramîş meke. ²⁸ Hama erki bizewicî jî güne nakî, û erki bakîre jî bi zewice güne nake, lakîn sixintîê ahwa kesan li xo da dê bibe, hama ez wê qayîrmîş dikim. ²⁹ Hama vîa dibêm, ey! brêan, erki wext kîn bûe; dimîne ko wanan ko jinê wan heye jî bra weka wan bibin ko jinê wan tunne. ³⁰ Ê wan ko digirin, weka ko nagirin, û wan ko dikenin weka ko nakenin, û wan ko dikişin, weka ko tiştî wan tunne. ³¹ Hem wan ko dinêê han qullanmîş dikin, awî weka bi tarza kotîê qullanmîş bûoxan bra nebin; zîra sefaê dinêê han dibihure. ³² Hama ez dixwazim ko hûn bê xem bibin; zîra merûvê nezewicandin ji boy tiştê Xodê xem dixo, erki çawan ji Xodê ra xoş be. ³³ Hama merûvê zewicandin ji boy tiştê dinêê han xem dixo, erki çawan ji [404] jinê xo ra xoş be. ³⁴ Ê jinê zewicandin û bakîre ji hevûdu farqê wan heye; zîra bakîre ji boy tiştê Xodê xem dikîşîne erki aw bi rûh û bi gowda azîz bibe, hama jinê zewicandin ji boy tiştê dinêê han xem dixo, erki çawan ji mêrê xo ra xoş bibe. ³⁵ Hama tiştê han ji boy faydeê wê dibêm ná kî li ser wê grêdankî bavêjim, lê ji boy edebê, û ji boy bê zayîlê ji³⁴⁶ Xodê ra xizmet kirinê. ³⁶

³⁴⁶ Di metnê de ji Ji.

Hama erki yekê ji boy bakîre xo ayîb dihasabîne ji boy wexta xo bihurandinê, û wusan bûn lazîm e, çî ko dixwaze bra bike, günê naxîxule, bra bizewicin. ³⁷ Hama aw ko li dilê xo da qawî disekine, û mecbûr jî nin e; û îradetê wî li dest da e, li dilê xo da ahwa mînasîb dîe ko bakîre xo xoyî bike qanc dike. ³⁸ Nua aw ko bakîre xo dizewicîne qanc dike, û aw ko nâzewicî ne hênî qanc dike. ³⁹ Jin bi mêrê xo çiqas ko sax e bi nomosê grêdane, hama erki mêrê wî bimre, bi kê ra ko bixwaze zewicandin azad e faqat bi Rabb bra bibe. ⁴⁰ Hama hênî pîr xozî ji wan ra ko li ser rêyê min disekine, û ez taxmîn dikim ko li mi da jî Rûhê Xodê heye.

SER 8

¹ Lakîn ji boy qurbana putan em dizanin ko îlmê me hemîan jî heye, îlm kîbîrîtî tîne, hama muhabet mamûr dike. ² Û erki yekê taxmîn dike ko tiştî dizane, hêja qat tiştî nizane çawan ko lazîm e zanin. ³ Hama erki yekê Xodê dihabîne, aw ji wî hatîe zanin. ⁴ Nua ji boy xwarinê qurbana putan em di- [405] zanin ko putan li dinê han da tiştî nin in; û ko ji yekê başqa Xodêkî tunne. ⁵ Zîra erki bi nav hebin jî xodêan grek li azûman da û gerek li arde çawan ko hene pîr xodêan û rabban. ⁶ Lakîn e me yek Xodê heye Bav ko her tişt jî wî ne û em jî bi wî ne û yek Rabb Îsa el Mesîh, ko her tişt bi wî ne, û em jî bi wî ne. ⁷ Hama îlmê han li hemîan tunne, û hinikan hata nua bi nîyetê putê qurbana putê dixun, û zamîrê wan ji boy zayîf bûnê murdar dibe. ⁸ Zîra taam me maqbûlê Xodê nake, lakîn erki em bixun zêde nâbin, û erki em nexun qem nabin. ⁹ Lakîn meze kin av hûkmetê wê ji zayîfan ra bi tarzî xwar bûn nebe. ¹⁰ Çima ko erki yekê bibîne ta ko îlmê ta heye li putxane de roniştî, na? zamîrê aw merûvê zayîf dê cesaret bike qurbanê putê xwarinê. ¹¹ Û bi îlme ta aw brêê zayîf de helak bibe, ji boy ê kê ko Îsa mir. ¹² Hama bi vê tarzê ji brêan ra bi günê kirinê, û zamîrê wan zayîf bi brîndar kirinê ji Îsa ra günê dîkin. ¹³ Nua erki taam brêy min xwar dike li ebedê goşt dê xum, ko brêy min xwar nebe.

SER 9

¹ Ez azad nin? im, ez Resûl nin? im, mi Rabbê me Îsa el Mesîhê bi çahvê xo nedî?; bi Rabb amelê min hûn nin? in. ² Erki ji başqasîan ra Resûl nebim jî, lakîn ji we ra helbet Resûl im; zîra bi Rabb mohra resûlîtîe min hûn in. ³ Cewabê min ez teftîş kroş ra vîa e: ⁴ Ji xwarinê û vexwarinê ra hûkmetê me tunne?. ⁵ Me- [406] ger hûkmetê me tunne? bi Îsa xuşk bûn jinkî bi xo ra gerandinê, çawan ko başqa resûlan,

û brêêt Rabb û Gepas dîkin. ⁶ Tenê ji mi ra û ji Parnapas? ra wusqat tunne, ko em nekin. ⁷ Qat yekê bi masrafê xo li cengê diçû?; kî? rez didanî ji mahsûlê wî naxo; yaxod kî? bizinan diçêrîne û ji şîrê bizinan náxo. ⁸ Vanan bi tarza merûvan? dibêm, nomos jî vanan nabêje?. ⁹ Zîra li nomosê Mûsa jî hatîe nivîsandin: Devê aw ga, ko li bêder da dixabite grênedî. ¹⁰ Meger ji boy gayan hacetê? Xodê e, na? kî ji boy me dibêje, zîra ji boy me hatîe nivîsandin; çûnkî aw ko cot dike jê ra lazim e ko bi umud cot bike û bêder kutox bi umud bike ko ji umudê xo hîsedar bike. ¹¹ Erki em ji we ra rûhanî tiştan ajotin ,pir? tiştî e, erki em ji we dünyawî tiştan biçînin. ¹² Erki başqasîan li ser we hûkmetê han dîkin, em hênî pêtir, lakîn em hûkmetê han naşîxulandin, lê ji her tiştan ra sabr dîkin em, ko em ji Încîlê Îsa ra engel nebin. ¹³ Hûn nizanin? ko wan ko li dacar da dişîxulin ji dacarê dixon; û wan ko sexanê ra xizmet dîkin ji sexanê hîse distînin. ¹⁴ Ahwa jî Rabb emr kir ko wan ko Încîlê waz dîkin ji Încîlê abûr bikin. ¹⁵ Hama mi ji tiştê hana yekê qullanmîş nékir; né jî mi tiştê hana nivîsand ko ji mi ra ahwa bibe, çima ko hênî qanc e ji mi ra ko bimrim, ná kî yekê îftîxarê min batal biderîne. ¹⁶ Zîra erki ez Încîlê waz dikim ji mi ra îftîxarkî túnne, çûnkî li ser min farz e, lê way ji mi ra erki ez Încîlê waz nekim. ¹⁷ Zîra vîa erki bi îradetê xo bikim ücreti min heye, erki bê xwazin bikim, ji mi ra îdareê tiştê an hatîe spar- **[407]** tin. ¹⁸ Nua çi? ücretê min dibe, gava ko Încîlê Îsaê bê masraf bikim hata ko li Încîl da hûkmetê xo bi kotî tarzî qullanmîş nebin. ¹⁹ Zîra faraza ez ji hemî tiştan azad bûm, mi xo xulamê hemîan kir, ko pîran qazanc bikim. ²⁰ Bi Yehûdîan ra weka Yehûdî bûm, ko Yehûdîan qazanc bikim. ²¹ Li bin³⁴⁷ nomos da bûoxan ra weka li bin nomosê bûoxî bûm , na kî ez li bin nomos da bûm, ko li bin nomos da bûoxan qazanc bikim, li bin³⁴⁸ nomos da nebûoxan ra weka li bin nomosê nebûoxê bûm, ná kî ji Xodê nomosê min tunne bû, lê li bin nomosê Îsa da bûm, ko nomos tunnoşan ji qazanc bikim. ²² Ê bi zayîfan weka zayîf bûm, ko zayîfan qazanc bikim bi hemîan hemî tişt bûm, ko bibe hinikan xelas bikim. ²³ Ê vîa ji boy Încîlê dikim, hata ko îlhaqê wî bibim. ²⁴ Hûn çi? zanin ko li meydan da bazoxan bîra hemî jî bazdidin, hama nîşanê îftîxarê yekê distîne, li wê tarzê bazdin ko bigên. ²⁵ Ê her pehlîvanan ji her tiştan xo zabt dîkin, wan ji boy xarab bûn tacê, û em ji boy xarab nebûn. ²⁶ Nua ez ahwa pev diçum ná weka ko bayê bikutim. ²⁷ Lê ji tenê xo ra cefa didim, û mütî dikim; nebe ko paşê ji başqasîan ra waz kirinê ez bixorê faydesiz bêm dîtin.

³⁴⁷ Di metnê de *bibin*.

³⁴⁸ Di metnê de *bibin*.

SER 10

1 Û ez naxwazim ko hûn nedan bibin, ey! brêan, ko bavêt me hemîan li bin awrê da bûn û hemîan jî ji bahrê bihurîn. 2 Û hemîan jî li awr da û li bahr da ji Mûsa ra tahfîl [408] bûn. 3 Û hemîan jî heman aw rûhanî taamê xwarin. 4 Û hemîan jî heman aw rûhanî vexwarinê vexwarin; zîra li pey wan çûndox ji aw rûhanî zinarê vedixwaribûn, û aw zinar Îsa bû. 5 Zîra Xodê ji wan ji pîran razî nebû, çima ko li çölê da li ardê hatin raxisdin. 6 Û tiştê han ji me ra ji îbretê bûn; hata ko ji tiştê kotîan ra arzû kroşan nebin, çawan ko wan arzû kşandin. 7 Hem putperestan mebin weka wan hinikan, çawan ko hatîe nivîsandin: Xalqê³⁴⁹ ji boy xwarinê û vexwarinê ronîştin, û ji boy leyîstinê rabûn. 8 Hem em zîna nékin; çawan ko ji wan hinikan zîna kirin, û li yek ro da bîst û sê hazar kesan ketin. 9 Hem Îsaê em necerîbînîn, çawan ko ji wan hinikan cerîbandin û ji mahran helak bûn. 10 Hem dirdiran mekin, çawan ko ji wan hinikan dirdir kirin, û ji telef kroşê helak bûn. 11 Hama av hemî tiştan ji boy îbretê rast dihatibû ji wan ra, lakîn ji me ra ji wan ra ko li axirê dinê gîyan ji boy şîretê hati nivîsandin. 12 Nua aw ko xo qayîm sekinandin taxmîn dike bra mêze ke ko nebe ko bîkeve. 13 Ji we ra ji însanî tercîbeê mada başqa tercîbe rast nehatîe, hama Xodê emîn e ko ji qudretê wê zêde awê wê dê nehêle bêne tercîbe bûn, lê hûn ji boy sabr kirinê qadîr bibin, bi tercîbeê tev xelas jî dê bibe.

14 Ji boy vîa, ey! muhabetlîan, ji putperestîê birevin. 15 Weka ko bi alîman xaber didim, gotinê min hûn farq bikin. 16 Kâsikê mübarekîtiê ko em mübarek dikin, na? ko îlhaqîtiê xuyna Îsaê e; aw nan ko em dişikînin, na? ko îlhaqîtiê tenê Îsaê e. 17 Çima ko em hemîan yek [409] nan û yek gowda nin, zîra em hemîan jî ji aw yek nan ra hîsedar dibin. 18 Li tenawî Îsrayelê mêze kin, na? ko aw qurbanan xwaroxon ji sexan ra îlhaq in. 19 Nua çi? dibêm put tiştî e, yaxod qurbanê put tiştî kî e. 20 Hama vîa dibêm ko aw tiştan ko tayîfan qurban dikin, ji cinan ra qurban dikin, û ná ko ji Xodê ra; û ez naxwazim ko hûn îlhaqê cinan bibin; hûn nikarin hem kâsikê Rabbê vexwarinê û hem kâsikê cinan. 21 Ji sexanê Rabbê hem ji sexanê cinan ra hîsedar bûnê hûn qadîr nin in. 22 Li xarezê em rakin Rabb, em jê taqatî? ne.

23 Ji mi ra her tişt cayîz e lakîn her tişt faydelî nin e; ji mi ra her tişt cayîz e, hama her tişt mamûr nake. 24 Nébe ko yekê tenê li dû faydeê xo bibe, lê ê hevalê xo jî. 25 Her çi ko li qasabxane de tê frotan bixum û ji boy zamîrê teftîş mekin; 26 Zîra

³⁴⁹ Di metnê de *Jalqê* (nîşeya wergêrê).

dinê bi tîjîtî xo ê Rabb e. ²⁷ Nua erki ji îmansizan yekê wê dawet dike û hûn dixwazin çûndin her çi ko li ber wê dê datînin bixun, û ji boy zamîrê teftîş mekin. ²⁸ Lê erki yekê ji we ra bêje erki, av qurbanê put e, wê çaxê ji boy awî ko ji we ra xaber kir û ji boy zamîrê mexun. ²⁹ Hama zamîr dibêm a wê ná, lê a hevalê. ³⁰ Zîra çima? azadîtî min ji zamîrê başqasîan dê hükm bibe, û erki ez bi îneyetê hîsedar dibim çima? bême dijmîn bûn, ji ê kê ko şikir dikim. ³¹ Nua hûn erki bixun û erki vexun û erki kî bişixulin, her tişt ji boy îzzetê Xodê bikin. ³² Gerek ji Yehûdîan ra gerek ji Yûnanîan ra, gerek ji kîlîsayê Xodê ra, xwar bûn mebin. ³³ Çawan ko e jî bi her tarz ji hemîan ra xoş dibim, û li dû faydeê xo nin im, lê ê pîran, hata ko xelas bibin.

[410] SER 11

¹ Ji mi ra mîna bin, çawan ko e jî ji Îsa ra bûm. ² Nua wê medh dikim, ey! brêan, ko mi li her tişt da bîra xo tînin û çawan ko mi ji we ra spêrtîe tenbîhan dipên. ³ Nua dixw[a]zim ko hûn bizanin, erki serê hemî cyamêran Îsa e; û serê jin mêrê wî e; û serê Îsa Xodê e. ⁴ Her cyamêr ko serê xo diveşêrîne gava li îbadetê disekine, ya peyemberîtî dike awî serê xo bê îzzet dike. ⁵ Û her jin ko serê xo bi vekirandin li îbadetê disekine, yaxod peyemberîtî dike, serê xo bê îzzet dike, zîra heman weka hati kur bûne. ⁶ Zîra erki jin serê xo naveşêrîne, bra tambûrê xo kur bike; hama erki şerm e ji jin kî ra biskê xo brandin, ya kur kirin, brá bê veşêrandin. ⁷ Ji cyamêr ra cayîz nin e ko serê xo biveşêrîne; zîra sûret û îzzetê Xodê e, hama jin îzzetê mêrê xo e. ⁸ Zîra ná kî cyamêr ji jin e, lê jin ji cyamêr e. ⁹ Zîra cyamêr ji boy jin xalq nebû; lê jin ji boy cyamêr. ¹⁰ Ji wî semedê jin desydar e, ko ji boy melean nîşanê hükmê li serê xo da bigra. ¹¹ Lakîn bi Rabb na jin bê cyamêr dibe, Û na jî cyamêr bê jin. ¹² Zîra çawan ko jin ji cyamêr e wusan jî cyamêr ji jin e, lakîn hemî jî ji Xodê ne. ¹³ Hûn li xo da hükm bikin ji jin ra bê veşêrdin ji Xodê ra îbadet kirin yaqîşmîş³⁵⁰ dibe?. ¹⁴ Na? ko tabîat jî ji we ra hîn dike, erki ji cîmêr ra biskê dirêj jê ra ayib e. ¹⁵ Zîra erki jin bi biskê drêj e jê ra îzzet e; çima ko biskê jê ra li cîê keremê hatîe dayin. ¹⁶ Hama erki yekê mûcadelecî bûn dixwaze, [411] adetê me wusan tunne; ne jî a kîlîsayê Xodê.

¹⁷ Hama vîa bi tenbîh kirinê ez wê medh nákim, zîra ji boy hênî qanc tişt na, lê ji boy hênî kotî hûn tîne civandin. ¹⁸ Zîra awul gava ko hûn li kîlîse da li yek cî

³⁵⁰ Di metnê de *yaqilmîş* (nîşeya wergerê).

têne civandin ez dibihîsim ko li nav we da firqaan hene û ji alîkî bawur dikim. ¹⁹ Zîra li we da firqaan bûn jî gerek e; hata ko li nav we da maqbûl bûoxan beyan bibin. ²⁰ Nua hûn ko li yek cî têne civandin, aw ji boy şîvê Rabbanî xwarinê nin e. ²¹ Zîra wexta xwarinê her kes awul şîva xo distîne; û yekê birçî dimîne û awê dîn serxoş dibe. ²² Meger ji boy xwarinê û vexwarinê mala wê tunne?, yaxod kîlîsaê Xodê? bê îtîbar dîkin, û bi şerm dîkin wan ko tiştê wan tunne; çî? bibêm ji we ra; wê medh bikim?, li tiştê han da wê medh nakim. ²³ Zîra mi ji Rabb send awî ko mi we ra teslîm kir, erki Rabb Mesîh li şevê nebû bûnê xo nan send; ²⁴ Ê bi şikir kirinê parça kir, û go: Bistînin, bixun, vîa ji boy zîkrê min bikin. ²⁵ Kezalîk paşê şîvê kâsikê send û go: Kâsikê han bi xuyna min ahda no e; vîa bikin çend caran ko hûn vexwarinê bibin, ji boy zîkrê min. ²⁶ Zîra çend caran³⁵¹ ko nanê han bixun, û kâsikê han vexun mirinê Rabbê naql dîkin, hata ko aw bê. ²⁷ Nua kî ko bi bê layiq tarzê nanê han dixo, yaxod kâsikê Rabbê vedixo; suçlu dibe ji xuyn û tenê Rabb ra. ²⁸ Nua meruv brá xo teftîş bike û bi vî hawayê ji aw nanê bixu û ji wî kâsikê vexo. ²⁹ Zîra bi bê layiq tarzê xwarox û vexwarox [412] gava ko tenê Rabbê farq nake, ji boy hükm û azabê xo dixo û vedixo. ³⁰ Ji boy wî semedê li nav we da pîr zayîfan û naxoşan hene; û pîran jî dimirin. ³¹ Zîra erki em xo teftîş bikirana, em dê hükm nebana. ³² Hama gava ko em hükmdibin, ji Rabb tedîb dibin, hata ko em bi dinê tev li hükm û azabê dê nekevin. ³³ Nua ey! brêy min gava ko hûn li yek cî têne civandin ji boy xwarinê, ji hevûdu ra beklemîş bikin. ³⁴ Hama yekê brçî e bra li mala xo da bixu, ko né ji boy hükm û azabê hûn bêne civandin. ³⁵ Ê başqa tiştan wexta ko ez bêm dê li nîzamê deynin.

SER 12

¹ Ê li xusûsa baxşîşet rûhanîan, ey! brêan, ez nexwazim ko hûn nezan bibin. ² Hûn zanin gava ko hûn tayîfan bûn çawan ji bédeng³⁵² putan ra dihatibûn birin û anîn. ³ Ji boy vîa ji we ra xaber didm ko qat yekê gava ko bi Rûhê Xodê xaber dide ji Mesîh ra lanet bêje, û qat yekê ji Mesîh ra Rabb nikâre bêje, erki na bi Rûh el Qudsê. ⁴ Bîra baxşîşan tarz bi tarz in, hama Rûh heman aw e. ⁵ Ê xizmetan tarz bi tarz in, hama Rabb aw e. ⁶ Wusan jî amelan tarz bi tarz in, lakîn heman aw Xodê e ko amel dike hemîan li nav hemî tiştan. ⁷ Ê ji her kes ra aşîkâr bûnê Rûhê tê dayin ji boy

³⁵¹ Di metnê de *çaran*.

³⁵² Di metnê de *dê deng* (nişeya wergêrê).

faydaê³⁵³. 8 Zîra ji yekê ra bi destê Rûh kelimê ilmê hatîe dayin, ji başqasî ra kelimê zanin heman bi ölçîê aw Rûhê hatîe dayin. 9 Ji başqasîkî ra heman bi aw Rûh îman, ji aw ê din ra heman bi aw Rûhê [413] baxşîşê şîfan. 10 Ê ji başqasî ra îcra bûnê quwwetlî tiştan û ji yekê ra peyemberîti, ji başqasî ra farq kirinê rûhan, ji yekê ra tawur tawur zimanan û ji başqasî ra tercîme kirinê zimanan hatîe dayin. 11 Lakîn heman aw yek Rûh amel dike, aw hemîan û ji her yekê ra başqa başqa pay dike, çawan ko dixwaze.

12 Zîra çawan gowda yek e û pîr azaê wî heye, û hemî azaê aw gowda ko pîr in yek gowda ne, wusan jî Îsa. 13 Çima ko em hemîan bi yek Rûh ji boy yek gowda bûn ra hatin tahfîl bûn, erki Yehûdîan, erki tayîfan, erki qulan, erki azadan, em hemî jî ji Rûh vexwarin. 14 Çima ko gowda yek aza nin e, lê pîr. 15 Erki ling bêje: Çima ko ez dest nin im ji gowda nin im, bi awî aw ji gowda nin e. 16 Ê erki go bêja, Çima ko ez çahv nin im, ji aw gowda nin im, bi awî aw ji gowda nin? e. 17 Erki gowda hemî çahv ibana, bihîsdin ji ko? dê bibana; û erki bihîsdin bibana, bîn sendin ji ko dê bibana. 18 Lakîn nua Xodê azayan danî ji wan her yekê li gowda da danî çawan ko aw xosd. 19 Ê erki aw hemîan yek aza bibana, gowda ji ko dê bibana. 20 Hama a nwa her çiqas ko aza pîr in, gowda yek e. 21 Çahv ji dest ra nikare bêje, Tu ji mi ra lazim nin î, û ná dîsa ser ji lingan ra erki hûn ji mi ra lazim nin in. 22 Îlla aw azaêt gowda ko pîr zayîf xuyan, hênî pîr lazim in. 23 Ê aw azaêt gowdaê me, ko pîr bê îtîbar bûn em dihasabînin li ser wan em hênî pîr îzzet datînin, û bi wî tarzê ji bê hurmet azaêt me ra hênî pîr hurmetê wan heye. 24 Ê ji hurmetlî azayêt me ra tiştîkî lazim nin e, lakîn Xodê gowda bi wî tarzê îmtîzac kir, û aw ko [414] kêmanîê wî heye jê ra hênî pîr îtîbar da. 25 Hata ko li gowda da firqa nebe, lê azayan heman aw yek xamê wan bibe li ser hevûdu. 26 Ê erki azakî ezîyet bikşîne, hemî azayan pê ra zîyet dikşînin, û erki bi îzzet bi azakî hemî azayan şaz dibin pê ra. 27 Nua hûn gowdaê Îsa nin, û başqa başqa azaê wî. 28 Ê Xodê li kîlîsaê xo da danî hinikan, awul resûlan; îkîncî peyemberan, üçüncî xocayan, paşê alametan, paşê baxşîşê şîfayan, yardiman, müdîran, tarz tarz zimanan. 29 Meger hemîan resûl? in, meger hemîan peyember? in; meger hemîan xoca? nin, meger hemîan alametan? dişîxulin. 30 Meger ji hemîan ra baxşîşê şîfayan hene, meger hemîan zimanan? xaber didin, meger hemîan tercîme? dîkin.

³⁵³ Di metnê de faydaêê.

31 Nua ji boy aw hemî pir qanc baxşîşan xayret bikin, û ez hênî pir qanc rêkî ji we ra nîşan bidim.

SER 13

1 Erki bi zimanê meşruvan û melekane xaber bidim, û muhabetê min tunne be, ez weka deng dayox baxir, yaxod weka şamata kroş santûr bûm. 2 Ê erki peyemberîtî min hebe, û bizanin hemî siran û hemî îlman, û erki ji hemî îman ra malîk bibim wusan ko çîan ji cî da helînim; hama muhabetê min tunne be, qat tîştîkî nin im. 3 Ê erki hemî warîetê xo ji faqîran ra bidim xwarin, û erki gowday xo ji şawutandî ra teslîm bikim, û muhabetê min tunne be, faydakî ji mi ra nabe. 4 Muhabet tehmûl dike, şîrîn e, muhabet hased nakşîne, [415] muhabet fodûlîtî û kîbîrîtî nake, 5 Arsizîtî nake, faydeê xo aramîş nake, hêrs nake, kotîîtî dîşûmîş nake, 6 Li ser nahaqîîtî nakene, lakîn li doxîrîtî da şaz dibe. 7 Ji her tîştî ra dayax dike, ji her tîştî ra îman tîne, ji her tîştî re sabr dike. 8 Muhabet qat zewal nabîne, hama erki peyemberîtî bibin, dê batal bibin, erki zimanan dê huskot bibin, erki zanin dê batal bibin. 9 Zîra muxtarkî em dizanin û muxtarkî em peyemberîtî dikan. 10 Hama gava kelam bê, wê çaxê aw muxtarkî dê batal bibe. 11 gava ko ez masûm bûm weka masûm xaber didabûm, weka masûm dîşûmîş dibobûm, weka masûm fikr dikiribûm, hama gava ko kâmil meşruv bûm tîştê masûmîtî mi alîkî danî. 12 Zîra nua em weka ji lîlîkê dibînin bi bê aşîkâr tarzî, hama li wê çaxê rû be rû dê bibînin, nua muxtarkî dizanim, hama li wê çaxê çawan ko tekmîl bêm zanin, tekmîl dê bizanim. 13 Zîra nua av her sisêan dimîne: îman, umud, muhabet, hama mezinê vanan muhabet e.

SER 14

1 Li dû muhabetê hêrîn, ji rûhanî baxşîşan ra xayret bikin, îlla ji peyemberîtî kirin ra. 2 Zîra bi xarîb zimanan xaber dayox bi meşruvan xaber nade lê ji Xodê ra, zîra keskî sah nake, hama aw bi Rûh siran xaber dide. 3 Hama peyemberîtî kroş, ji meşruvan ra ji boy mamûr bûnê û şîret kirinê û dil pîrsinê xaber dide. 4 Bi xarîb zimanê xaber dayox aw xo mamûr dike, û aw ko peyemberîtî di- [416] ke, kîlîsaê mamûr dike. 5 Ez dixwazim ko hûn hemîyan bi xarîb zimanan xaber bidin, hama îlla peyemberîtî bikin, zîra peyemberîtî kiroş ji xarîb zimanan xaber dayox petir e, meger tercûme dike, hata ko kîlîsa jî mamûr bibe.

⁶ Û nua, ey! brêan, erki ez ji we ra bêm bi xarîb zimanan bi xaber dan, çi? fayde dê bikim ji we ra, erki ji we ra xaber nâdim, ya bi fehî kirin kelaman, ya bizanî, ya bi peyxemberîtî, ya bi talîman. ⁷ Hem deng dayox cansîz tîştan bîle, erki dîdûg, erki tambûr, erki farqê dengan nekin, çawan? dê bîn nas bûn, bidîdûg, ya bi tambûr hati pîf bûn. ⁸ Zîra erki boru jî bellîsîz deng derxe, ji ceng ra kî? dê hazîr bibe. ⁹ Wusan jî hûn bi zîman erki bi anglemîş kelaman xaber nedîn, hati xaber dan çawan? dê fehî bibîn, zîra bi hawa xaber dan dê bibîn. ¹⁰ Mesela li dinê da awqas tûrlî dengan hene; û ji wan qat yekê manasîz nîn e. ¹¹ Nua erki quwwetê dengê nîzanim, ez ji xaber dayox ra acemî dibim, xaber dayox jî ji mî ra acemî dibe. ¹² Wusan jî hûn çîma ko ji rûhanî baxşîşan ra xayretşe in, ji boy mamûr bûnê kîlîsayê cehd dîkin ko zêde bîn. ¹³ Ji boy vîa aw ko bi xarîb zimanan xaber dide, bra nîmêc bike ko tercûme jî bike. ¹⁴ Zîra gava ko ez bi xarîb zimanan nîmêc bikim, rûhê min nîmêc dike, hama aqlê mî bê meywe e. ¹⁵ Nua çi? e, bi rûh nîmêc bikim, hama bi aql jî nîmêc bikim, bi Rûh îlahî bi xoynîn, hama bi aql jî îlahî bixoynim. ¹⁶ Çîma ko erki tu bi Rûh bereket bikî, aw ko cîê nazan da ronîşdî, çawan dê Amîn bêje li wexta şîkir dayîne ta, çîma ko aw gotîne ta fehî [417] neke. ¹⁷ Zîra bîra tu qanc şîkir didî, lakîn başxasî mamûr nabe. ¹⁸ Şîkir dikim ji Xodê ko ji wê hemîan pvetîr bi zimanan xaber didim. ¹⁹ Lakîn li kîlîse da dixwazim ko bi aql pênc kelaman bibêjim hata ko ji başxasîan ra jî şîret bikim û na ko bi xarîb zîman deh hazar sôzan xaber bidim.

²⁰ Ey! brêan, bi aql zarûk mebin, lê li kotîl da zarûk bîn, hama li aqîl da temam bibîn. ²¹ Li nomos da hatîe nivîsandîn ko: Bi xalqê han ra bi xarîb zimanan û bi xarîb lêvan dê xaber bidim, û wusan ko dê min godarî nekin, dibê Rabb. ²² Nua zimanan ji boy nîşan in, na ji boy îtîqatlîan, lê ji boy îmansîzan, lakîn peyxemberîtî, na ji boy îmansîzan, lê ji boy îtîqatlîan e. ²³ Nua erki civat hemî li yek cî bîn, û hemî jî bi xarîb zimanan xaber bidîn, û li wê bîkêvin nazanan, yaxod îmansîzan, dê nebêjin?: hûn dîn bûne. ²⁴ Hama erki hemî jî peyxemberîtî bikin û li hindur îmansîzkî, yaxod nazankî bîkêve, ji hemîan tazîr dibe ji hemîan teftîş dibe, ²⁵ Û li dilê wî da veşartin tîştan aşîkâr dibîn, û ahwa li ser rûya xo bi ketîne ji Xodê ra dê secde bike, û dê îqrar bike ko, bîra Xodê li nav we da e.

²⁶ Nua çi? e, ey! brêan, gava ko li yek cî tîne civandin, ji wê her yekê zabûrê wî heye, talîmê wî heye, xarîb zîmanê wî heye, tercûmê wî heye, hemî jî ji boy mamûrîtîe bra bibe. ²⁷ Û erki bi xarîb zîman xaber dide, didoyan yaxod pîr sisêan bra bibîn, û aw jî bra bi newbetê bibe; û yekê bra tercûme bike. ²⁸ Hama erki tercûme

kroḡ tunne be li kîlîse da bra hîskot bibe aw ji xo ra û ji [418] Xodê ra bra xaber xaber bide. ²⁹ Hama peyḡemberan didoyan, yaxod sisêan bra xaber bidin, û awê dinan bra teftîş bikin. ³⁰ Lê erki ji roniştoxan başqasî ra tiştîkî bê aşîkâr bûn, awulîn bra hîskot be. ³¹ Zîra hûn hemîan yeka yek dikârin peyḡemberîti bikin, hata ko hemîan hîn bin û hemîan li dil bêne pîrs bûn. ³² Hem rûhe peyḡemberan ji peyḡemberan ra îtaat dike. ³³ Xodê Xodê nîzamsizîtiê nin e, lê ê selametê, çawan ko hemî kîlîsaê azîzan.

³⁴ Jina wê li kîlîsan da hîskot bin, çima ko ji wan ra rusqat tunne ji xaberdan ra, lê mûteh bibin, çawan ko nomos jî dêje. ³⁵ Hama erki tiştîkî hîn bûn dixwazin, li mal ji mêrê xo bra pîrs kin, zîra li nav kîlîsan da ji jinan ra ayib e xaber dan. ³⁶ Meger kelamulahê ji ji ww? rabûn, yaxod tenê ji we? ra gîya. ³⁷ Erki yekê taxmîn dike ko aw peyḡember e, yaxod rûhanî, bra qanc bizanibe ko mi çi ko ji we ra nivîsand tenbîhê Xodê ne. ³⁸ Erki yekê nizane bra nizanibe. ³⁹ Nua ey brêan peyḡemberîti kirinê xayret bikin, û bi xarîb zimanan xaber dan jî mên mekin. ⁴⁰ Ê her tişt bi maqûlîti û bi nîzam bra bibe.

SER 15

¹ Ê ey! brêan, ji we ra nîşan didim aw Încîlê, ko mi ji we ra waz kir, aw ko wê qabûl kirin, hem li wî da ko disekinîn. ² Ko bi awî xelas jî dibin, erki bigirin aw kelamê, çawan ko mi ji we ra waz kir, meger ko li nafiîle cî da hûn hati îman anîn nin in. ³ Zîra awul mi ji we ra teslîm kir awî ko mi jî qabûl kir, Erki Îsa [419] ji boy güneê me mir li gora kitêban. ⁴ Ê erki hati defn bûn û li roya sisêan qiyam kir, li gora kitêban. ⁵ Ê erki ji Gepas ra xuya û paşê ji dwanzdahan ra; ⁶ Ê paşê ji pênc sed brêan ra zêde li yek cî da xuya, ji wan pîran hata nua hene, û hinikan jî li xew da çûne. ⁷ Ê paşê xuya ji Yaqûb ra, û paşê ji resûlan hemîan ra. ⁸ Ji paşê hemîan weka ji edna kî ra ji mi ra jî xuya. ⁹ Zîra ez ji resûlan ji hemîan edna me, ko resûl gotin ra layîq jî nin im, çima ko kîlîsaê Xodê mi qawarand. ¹⁰ Hama ez çi? ki me, bi îneyetê Xodê me, û îneyetê awî ko li ser min e batal tiştîkî nebû, lê ji wan hemîan pîr ez xabitim, û na kî ez, lê îneyetê Xodê ko bi mi ra bû. ¹¹ Nua gerek ez, gerek wan ahwa me waz kir, û we ahwa îman anîn.

¹² Ê erki Îsa tê waz bûn ko ji mirîan qiyam kirî, çawan? ji wê hinikan dibên: Erki qiyamê mirîan tunne. ¹³ Ê erki qiyamê mirîan tunne, wusan e Îsa jî qiyam nesendî. ¹⁴ Ê erki Îsa qiyam nesendî wusan e wazê me boş e, û îmanê we jî boş e. ¹⁵

Û em jî deraw şahîdê Xodê tîne dîtin; zîra ji derhaqê Xodê me şehadetî kir, ko Îsa ji mirîan rakir, ko bîra awî mi mirîan ranekir, erki mirîan qiyam nastînin. ¹⁶ Zîra erki mirîan qiyam nastînin, Îsa jî qiyam nesendî. ¹⁷ Û erki Îsa qiyam nesendî îmanê we betal e. ¹⁸ Û hûn, hêja li güney xo da ne, Wusan jî bi Îsa li xew da çûndoğan helak bûn. ¹⁹ Erki tenê ji boy ömrê han ji Îsa ra me umud krî, em ji emî merûvan zêde sefîl in. ²⁰ Hama nua Îsa ji mirîan qiyam sendî, meyweê awulînê li xew da çûndoğan e. ²¹ Zîra çima ko bi merûv bû mirin, bi **[420]** merûv jî qiyamê mirîan. ²² Zîra çawan ko bi Aтам hemîan dimirin; wusan jî bi Îsa hemîan dê bijîn. ²³ Lakîn her li siraê xo da, meyweê awulîn Îsa, paşê wan ko a Îsa ne wexta hatinê wî. ²⁴ Ji wê pê ve tê axir, gava ko padîşahîti dê bide li destê Xodê û Bav, gava ko batal bike hemî saltanat û hükümetê û her quwwetê. ²⁵ Çima ko jê ra lazim e padîlahîti kirin, hata ko hemî dijaminê xo³⁵⁴ li bin lingê xo deyne. ²⁶ Dijminê paşêin ko dê batal bibe mirin e, zîra kitêb dibê, Her tişt li bin linga wî da îtaat kirin. ²⁷ Lakîn gava ko dibê: Her tişt jê ra îtaat bû, malûm e ko ji awî başqa ko her tişt jê ra da îtaat kirin. ²⁸ Û gava ko her tişt jê ra tabî bibe, wê çaxê Kur bi xo jî jê ra dê tabî bibe, ji aw ro ko hemîan da jê ra îtaat bûn, wusan ko Xodê bibe hemî û li nav hemî tiştan. ²⁹ Erki na, dê çi? bikin wan ko ji boy mirîan tîne tahfîl bûn, erki qat mirîan dê qiyam nestînin, wusan e çima? ji boy wan tîne tahfîl bûn. ³⁰ Em çima? li her saatê li nadametê da dikevin. ³¹ Şahîd tînim aw îftîxarê min ko li ser we heye bi Îsa el Mesîh bi Rabbê me ko her ro dimirim. ³² Erki ez li Yepesos da bi tarza merûvan bi canawaran cengleşmîş bûm ji mi ra çi? fayde, erkiqiyamê mirîan tunne, em bixun û vexun, zîra sibê em dimirin. ³³ Meên xapandin, kotî ûlfetan, xûyê qanc xarab dîkin. ³⁴ Bi sadaqatê hêşar bin, û günê mekin; çima ko ji wê hinikan ra îlmê Xodê tunne, ji boy wê şerm kirinê dibêm.

³⁵ Hama yekê dê bêje erki, Mirîan çewan? dê qiyam bistînin, û bi çi? gowdayê ten. ³⁶ Ey! aqil- **[421]** siz tu aw ko tov dikî, erki nemîre nâjî. ³⁷ Û aw ko tov dikî, na kî aw gowda ko tov dikî dê şîn bibe, lê çiplax habkî; erki ê genim be û erki ê başxa tovkî. ³⁸ Û Xodê jê ra gowda dibe çawan ko dixwaze, û ji her yek tov ra maxsûs gowda xo. ³⁹ Her gowda yek gowda nin e, lê gowda merûv başxa e, û gowda davarên başxa, ê mahsîan jî başxa û ê teyran başxa. ⁴⁰ Azümanî gowdan jî hene, dünyawî gowdan jî; lakîn şerefê azümanî başxa e û ê dünyawî başxa. ⁴¹ Şerefê tavê başxa e, şerefê hîvê başxa e; û ê istêran başxa, û istêr ji istêrê li şeref da başxa e. ⁴² Û qiyamê

³⁵⁴ Di metnê de xî.

mirîan jî ahwa e, gowda bi çürügîti da tê tov bûn û bê çürügîti qiyam distîne. ⁴³ Li bê şerîfîti da tê tov bûn, û li şerîf da qiyam distîne, bi zayîfîti da tê tov bûn, û bi quwwet qiyam distîne. ⁴⁴ Nefsanî gowda tê tov bûn û rûhanî gowda qiyam distîne; nefsanî gowda heye û rûhanî gowda jî heye. ⁴⁵ Hem ahwa hatîe nivîsandin, Meruvê awulîn Aţam nefsanî can bû, Aţamê paşîn hayat dayox Rûh bû. ⁴⁶ Lakîn awul rûhanî nin e, lê nefsanî e, û rûhanî jî wî paşê e. ⁴⁷ Meruvê awulîn jî ardê ji ax bû, meruvê îkîncî ji azüman Rabb e. ⁴⁸ Çawan bû ji axê wusan jî wan ko ê axê ne, û çawan azümanî wusan jî wan ko ê azüman in. ⁴⁹ Ê çawan ko kîswetê a axê em wergirtîe, kîswetê ê azümanî jî em dê wergirin. ⁵⁰ Hama vîa dibem, ey! brêan, ko ten û xuyn li padîşahîtiê azümanan nikârin warîs bûn, û ne jî çürügîti li çürügsizîti da qadîr e warîs bûn.

⁵¹ Va ha ji we ra sirkî dibêm, Em hemîan dê li [422] xewê neçîn, lakîn em hemî jî dê tebdîl bin. ⁵² Xafil li gora çahv vekirin û girtinê, li wexta pif bûnê boruê paşînê; çima ko boru dê bê pif bûn û mirîan dê qiyam bistînin bê çürügîti û em jî dê qiyam bistînin bê çürügîti û em jî dê tebdîl bin. ⁵³ Zîra lazim e ko çürüg gowdaê han bê çürügîti wergire, û mirin gowdaê, nemirîti wergire. ⁵⁴ Hama gava ko aw mirin gowda ne mirîti wergire, û aw çürüg bê çürügîti wergire, we çaxê dê temam bibe aw söz ko hatîe nivîsandin, Erki mirin li fathîti da xarq bû. ⁵⁵ Ey! mirin, li? ku e derzîe pêvadanê ta, ey! tirb li? ku e, fathîtiê ta. ⁵⁶ Derzîe pêvadanê mirinê güne e, û quwwetê güneê nomos e. ⁵⁷ Lakîn şikir ji Xodê ra ko ji me ra fathîti dide bi destê Rabbê me Îsa el Mesîhê. ⁵⁸ Nua ey! brêy min delalîan, möhkem bin melibitin dayîm li şîxulê Rabb da zêde bin, û bizanin ko zahmetê wê bi Rabb nafîle nin e.

SER 16

¹ Hama ji boy azîzan ji boy sadaqa civandinê çawan ko ji kîlîsaê Qaxadîan ra tenbîh da hûn jî wusan bikin. ² Li hemî royêti yek şemûan ji we her yek, çi ko ji destê wê tê bi cem kirinê bra li cem xo deyne. ³ Ko nebû gava ko ez bêm wê çaxê civandinan bibin, û gava ko ez bêm, bi kê ra ko hûn mînasîn dîn, wan bi mektûban dê bişeyînim, hedîeê wê li Qudsê birinê. ⁴ Ê erki çûndinê min jî mînasîb be, bra bi mi ra herin. ⁵ Hama ez ji we ra dê bêm gava ko ji Mageţonîaê bibihurim; zîra ji Mageţonîaê dibihurim. ⁶ Ê qabîl e ko li ba we bi- [423] mînim, yaxod zivistan jî bibihurînim, ko hûn ez rêwî bikin, li ko kî ez dê biçum. ⁷ Çima ko ez naxwazim nua we ayretî bimînim, lakîn umudê min heye ko zemankî li ba we bimînim; erki îznê Xodê bibe. ⁸

Lakîn ez hata li Bendegosdê da li Yepesos da dê bimînîm. 9 Zîra ji mi ra derîkî mezin û faydelî hatîe vebûn, û pîr qarşî sekinandoşan hene.

10 Nua erki Dîmoteos bê, mêze kin ko li ba we bêtîrs bibe; zîra aw şîxulê Xodê dişîxule, çawan ko e jî. 11 Nua neba ko awî yekê serhevde bike, lê bi selamê awî li rê deynin, ko ji mi ra bê, çima ko bi brêan tev jê ra beklemiş dikim. 12 Hama ji boy Aboşos brê, mi pîr jê ra lava kir, ko ji we ra bê bi brêan tev; hama nua hatinê qat dilê wî tunne bû, hama dê bê kînga mînasîb wext bibîne.

13 Hêşar bin, li îman da bisekinin, cesûr bin, pêt bin. 14 Her tiştê we bi muhabet be.

15 Ji we ra lava dikim, ey! brêan, mala Sdepanosê hûn dizanin, ko meyweê awulînê Akayîaî e; û aw xo ji boy xizmetê azîzan yatîn kirin. 16 Ko hûn mûtêh bibin ji wusan merûvan ra, û ji aw hemîan ra ko bi me ra tev dişîxule û dixabite. 17 Ez pîr şaz bûm li ser hatinê Sdepanosê û Pordunadosê û Akayîgosê, ko temanîê wê wan tîji kirin. 18 Zîra rahat kirin canê min û e we; nua wusan merûvan nas kin.

19 Silavan dîkin ji we ra kîlîsaê Asîayan; pîr silavan dîkin ji we ra bi Rabb Agûxasê û Brîsgîxaê, li mala wan da bûn bi tevlî kîlîsaê. 20 Silavan dîkin ji we ra hemî brêan, [424] silavan bikin ji hevûduan ra bi azîz ramîsan.

21 Silavê han bi destê min e Boşosê e. 22 Erki yekê Rabbê me Îsa el Mesîhê nahubîne, anatema maranata bibe. 23 Înayetê Rabb Îsa el Mesîhê bi we ra bibe. 24 Muhabetê min bi wê hemîan bibe bi Îsa el Mesîhê; Amîn.

MEKTÛBÊ ÎKÎNCÎ Ê RESÛLÊ BOXOS JI GORNTOSLÎAN RA

SER 1

¹ Boxos bi îznê Xodê Resûlê Îsa el Mesîhê û Dîmoteos brê, li Gorntos da bûn ji kîlîsaê Xodê ra û li Akayîa da bû ji hemî azîzan ra. ² Înayet û selamet ji Xodê ji Bavê me, û ji Rabb Îsa el Mesîhê.

³ Mübarek bibe Xodê û Bavê Rabbê me Îsa el Mesîhê, Bavê merhametan û Xodêê hemî dil pîrsan. ⁴ Aw ko dilê me dipîrse³⁵⁵ li nav hemî sixletê me, ko em qadîr bin dilê wan pîrs kirinê ko li nava sixletê ne, bi aw dil pîrsinê ko bi awî em tene dil pîrsin ji Xodê. ⁵ Zîra çawan ko elemê Îsaê li ser me pîr bûn, wusan jî bi destê Îsa dil pîrsinê me jî pîr dibe. ⁶ Ê erki em sixlet bikşînin, ji boy dil pîrsin û xelasê wê e, ko îcra dibe bi sabr kirinê, ji aw eleman ra bi wan ko em jî elem dikşînin. ⁷ Ê ji boy wê umudê me qawî e, çima ko em dizanin, erki çawan ko ji eleman ra îlhaq in, wusan jî dil pîrsin ra dê bibin. ⁸ Zîra ey! brêan li Asîa da li ser aw eleman ko ji me ra qawmîn ez naxwazim ko hûn nedan bin; erki ji taqatê me zêde em giranîti kişandin, hata ko em ji ömrê Xo jî bê umud bûn. ⁹ Lakîn [426] li me li xo da sîcîlê mirinê hebû, hata ko³⁵⁶ em ji xo ra gügenmîş nebin; lê ji Xodê ra ko mirîan sax dike. ¹⁰ Aw ko me ji wusan mezin mirinkî xelas kir û xelas dike. ¹¹ Ji awî em umud dikin ko hêja dê xelas bike; ji boy me bûn bi yardumê nimêcê wê; ko ji semedê nimêcê pîran ji boy aw înayetê ko ji me ra bû, pîran ji boy me şikir bikin.

¹² Zîra îftîxarê me vîa e, şahadetê zamîrê me, ko em li ber Xodê bi xülûsî pak û bi sade dil û nâ bi îlmê cîsmanîkî, lê bi lutfê Xodê li dinê da em geçimîş kir, îlla li cem wê. ¹³ Zîra em başqa tîştîkî ji we ra nanivîsin, lê aw ko hûn dixoynin û nas dikin; û ez umud dikim ko hata paşê hûn dê nas kin. ¹⁴ Çawan ko pîr hindik hûn me nas kirin; ko em îftîxarê we ne, çawan ko hûn jî a me ne li roya Rabb Mesîhê.

¹⁵ Ê bi îtîqatê han mi di xosd awul ji we ra bêm, hata ko hûn ji îkîncî keremê ra layiq bibim. ¹⁶ Ê ji wê li Mageţonîaê bibihurim, ji Mageţonîaê dîsa ji we ra bêm; û ji we rêwî bim li alîê Yehûdîstanê. ¹⁷ Nua gava ko mi vîa düşûmîş kir, acab mi

³⁵⁵ Di metnê de *di pîrsen*.

³⁵⁶ Di metnê de *ka*.

sivîqîtîkî³⁵⁷? kir, yaxod aw ko ez düşümîş dibim mi tarza cîsmanîê! ez düşümîş bibim, ko ji alîê min, belî, belî, û na ná bibe. ¹⁸ Hama Xodê emîn e ko söza me ko ji we ra gîya, belî bû û ná na bû. ¹⁹ Zîra bi me, yanî min, û ji Sîxuanosê û ji Dîmoteosê li naha wê hati waz Kûrê Xodê Îsa el Mesîhê, belî bû, û ná na bû, lê li wî da bû, belî. ²⁰ Zîra her çiqas ko wadê Xodê heye li wî da Belî û li wî da Amîn e, ji boy celalê Xodê bi destê me. ²¹ Ê me bi wê tev li Îsa da sabît kroş û me mesh kroş Xodê e. ²² Aw ko me [427] möhr jî kir, û li dilê me da da gerewê Rûhê. ²³ Lakîn ez ji xo ra Xodê şahîd bigirim, ko ji boy wê qayirmîş kirinê ez li Gorntosê nehatin; lakîn na ko ser îmanê wê em hûkûmdarlik dibin, lê ji şazîtîê we ra em yardimçî ne. zîra hûn li îman da disekinin.

SER 2

¹ Ê mi ji xo ra vîa mînasîb dî ko ji we ra dîsa bi qasawetê neyîm. ² Çima ko erki wê ez bi qasawet dikim hênî aw kî e ko dê min şaz bike; erki na aw ko ji min qasawet dikîne. ³ Ê vîa mi nivîsand ko nabe gava ko bêm qasawet bikînim ji wan, ji ko ku lazim e ji mi ra şaz bûn, zîra li ser we hemîan³⁵⁸ gûgenmîş dibim, ko şazîtîê min ji wê hemîan³⁵⁹ ra e. ⁴ Zîra ji pîr sixletan û ji sixintîê dil, ji we ra bi pîr hêstran mi nivîsand; na kî hûn bi qasawet bin, lê ko bizanin aw muhabetê min ê pîr ko li ser we heye.

⁵ Ê erki yekê da qasawet kirin; mi nade qasawet kirin, lê ko ji alîkî, hata ko ji we hemîan ra granîtî nebin. ⁶ Bas e ji wusan merûv ra aw xazeb, ko ji pîran bû. ⁷ Nua li zi da wî, lazim e ji we ra jê ra baxş kirin, û dil pîrs kirin, ko nebe wusan merûv ji pîr qasawetê zarq be. ⁸ Nua ji we ra lava dikim ko li ser wî muhabetê xo qawî bikin. ⁹ Zîra heman ji³⁶⁰ boy wî jî mi ji we ra nivîsand, ko we bi ceribandîne bizanim, ko li nav hîmî tîştan hûn mûtêh in. ¹⁰ Ê ji kê ra ko hûn baxş dikin tîştîkî, e jî dikim, zîra erki e jî çî ko baxş bikim ji boy wê e ji alîê Îsa. ¹¹ Ko nebe ji Şey- [428] tanê em alt bibin³⁶¹, zîra em qastê wî nezan nin in.

³⁵⁷ Di metnê de *sivîqîtîkî*.

³⁵⁸ Di metnê de *gemîan*.

³⁵⁹ Di metnê de *hîmean*.

³⁶⁰ Di metnê de *ki* (nîşeya wergêrê).

³⁶¹ Di metnê de *babin* (nîşeya wergêrê).

¹² Nua gava ko ez li Drowatayê gîyam încîlê Îsaê waz kirinê, ji Rabb ji mi ra derîkî hatibû vebûn. ¹³ Li rûhê mi da rahatê min tunnebû, Çima ko brêy min Dîadosê mi li wê nedî, lê ji wan bi cîyê bûnê li Mageṭonîaê çûm.

¹⁴ Lakîn şikir ji xodê ra ko dayîma fathox dike bi Îsa, û bîna awî nas kirinê bi me aşîkâr dike li hemî der. ¹⁵ Zîra em li ber Xodê bîna xoş ê Îsa ne, li nav helak bûnan. ¹⁶ Ji hinikan ra ji boy mirinê bîna mirinê, ji hinikan ra ji boy hayatê bîna hayatê ne em, û ji tiştê han ra kî? qadîr dibe. ¹⁷ Zîra em weḵa pîran li kelamulahê da dek û dolaban kirox nin in, îlla weḵa ji xülüsê pak, îlla weḵa Xodê, li ber Xodê bi Îsaê em xaber didin.

SER 3

¹ Berdidin? dîsa em xo ha hawala kirinê, yaxod weḵa hinikan lazim e ji me ra mektûbê hawala kirinê, ji we ra, yaxod ji wê. ² Li dilê me da hati nivîsandin, ji hemî meṛuvan hati nas bûn û hati xonidan mektûbê me hûn in. ³ Bi malûm bûnê ko hûn mektûbê Îsa nin bi xizmetê me, na bi mürekkebê hati nivîsandin, lêbi Rûhê sax Allahê, na li ser taxtayê kevîrîn, lê ê dil li ser taxtayê cesadîn. ⁴ Ê ahwa îtîmatê me heye li ser Xodê bi destê Îsa. ⁵ Na kî em ji xo tiştî, weḵa ji xo ji dîşîmîş bûnê qadîr in. ⁶ Îlla qadîr bûnê me ji Xodê e. ⁷ Ko me qadîr jî kir xizmetcîyê ahda nû bûnê, na ê nivîsê; lê ê Rûhê, zîra nivîs diḵuje³⁶², hama Rûh ha- [429] yat didi. ⁸ Nua erki li ser kevîr bi nivîs hati kole xizmetê mirinê bi celal bû, ko kureṭ Îsrayelê qadîr nabûn li rûya Mûsayê nihêrtinê, ji boy celalê rûya wî ko dê batal bibana. ⁹ Erki wusan e, xizmetê Rûhê çawan dê hênî pîr bi celal nebe. ¹⁰ Zîra erki xizmetê azabê, bi celal bû, çiqas? hênî pîr xizmetê sadaqatê bi celal dê bibe. ¹¹ Zîra aw ko bi celal bû, li alîyê han bi celal nin e, ji semedê xayet celalê. ¹² Zîra erki aw ko dê batal bibana bi celal bû çiqas? pêtir aw ko dimîne, bi celal lazim e bûn. ¹³ Nua erki ahwa umudê me heye, bi pîr cesaretê em diçun li söza xo da. ¹⁴ Ê na ko weḵa Mûsa ko li ser rûya xo xêlî diavêtibû, hata ko kureṭ Îsrayelê, li paşê aw celalê ko dê batal bibana mêze nekin. ¹⁵ Zîra aqlê wan kûr, çima ko hata li roya han av xêlî disekine li ser xondanê ahda kevinê; û nayê helanîn, çima ko bi Îsa tê batal bûn. ¹⁶ Lê hata li roya han gava ko Mûsayê dixoynin, li ser wan xêlîkî disekine. ¹⁷ Hama kînga ko li Rabb vegeṛin aw dê bê helanîn. ¹⁸ Ê Rabb Rûh e, û li ko kî Rûha Xodê li wê azadîtî heye. ¹⁹ Hama em

³⁶² Di metnê de diḵuje.

hemîan, bi bê nixaftin rû celalê Xodê weqa³⁶³ li lîlik da bi seyr kirinê, heman li av sûretê da weqa ji Rûhê Xodê, ji celalê celal tebdîl dibin.

SER 4

1 Ji boy vîa xizmetê han li me da bi hebûnê li gora merhamet bûnê ji me da, em acîz nabin. 2 Îlla bi dizîka tiştê rezaletê bi red kirinê bi fend em naçûn; hem li kelamê Xodê da [430] em hîle tev nakin; lê li huzûra Xodê weqa aşîkâr bûnê doxrîtîê em xo li zamîrê hemî merûvan hawale dikin. 3 Nua erki Încîlê me hatîe nixaftin jî' li nav helak bûoxan da nixaftîe. 4 Ko li nav wan da xodê³⁶⁴ dinêê han aqilê wan kûr kir, ko nûra celîl Încîlê Îsa li ser wan nekeve, ko aw e taswîrê Xodê. 5 Zîra em xo waz nâkin, lê Rabb Îsa el Mesîhê, û em xo ji boy Mesîhê ji we ra xulaman. 6 Zîra ji tarîê rohnî dayin ko Xodê emr kir, aw li dilê me da rohnî da; ji boy rohnîê celal zaninê Xodê dayinê bi Îsa el Mesîhê. 7 Nua ê me xazneê han li nav firqaê axîn heye hata ko pîr zêde bûnê quwwetê ji Xodê bibe, û na ji me. 8 Li her tişt da em sixlet dikşînin, lakîn li sixintî dê nekevin, neçarîti em dikşînin, lakîn em li umudsizê dê nekevin. 9 Em tene qawirandin, hama terk nabin, li ardê em tene xistn; lakîn em helak nebûne. 10 Li her wext mirinê Mesîhê em li gowda xo da dikşînin ko hayatê Mesîhê jî li gowda ma da aşîkâr bibe. 11 Zîra em ko sax in, ji boy Mesîhê her çax ji mirin ra teslîm dibin, hata ko ömra Mesîh jî, li mirin gowda me da aşîkâr bibe. 12 Hata ko mirin li me da û ömr we da amel dike. 13 Lakîn Rûhê heman av îmanê me heye; çawan ko hatîe nivîsandin, Mi îman anî, ji boy ê kê mi xaber da; em jî îman tîtin, ji boy ê kê xaber didin. 14 Ava bizanin erki aw ko Mesîhê rakir, me jî bi Mesîhê dê bide rakirin; û li ber wî da dê bide sekinandin, bi wê tev. 15 Zîra her tişt ji boy wê e; hata ko îneyet bi pîr bûnê bi şîkra pîran ji celala Xodê zêde bibe.

16 Ji boy vîa em acîz nâbin, lakîn erki me- [431] rûvê me dervayîn çürümîş dibe jî, ro bi ro merûvê me hindurîn tazelenmîş dibe. 17 Zîra sivik zemanî sixletê me ji me ra zahf pîr giranîtiê celalê ebedî amel dike. 18 Çima ko em li aw tiştan ko dixuyane; mêze nakin, lê li aw tiştan ko naxuyane, zîra awan ko xuya ne zemanî ne, hama awan ko naxuyan in ebedî ne.

³⁶³ Di metnê de weqa.

³⁶⁴ Di metnê de Xodêê (nişeya wergêrê).

SER 5

¹ Zîra em dizanin ko erki mala dÿnyawî ê meskânê me xarab bibe, ji Xodê, bê dest hati çêbûn mal, li azûman da ebedî bînakî me heye. ² Çûnkî li vir li mala dÿnyawîa han em ax dikşînin meskânê me azûmanî ji wergirtin ra bi hasret kişandinê. ³ Tenê gava ko awî em bêne wergirtin tahzî neyin dîtin. ⁴ Zîra em ko li meskânê han da ne, li bin bar da ax dikşînin, çima ko em naxwazin ji ser xo derxistin, lê awî li ser vîa wergirtin hata ko cesedê mirin ji hayatê xarq bibe. ⁵ Hama aw ko me ji tiştê han ra hazir dike Xodê e, ko aw ji me ra rehenê Rûhê jî da. ⁶ Nua dayîma em cesaret dikin, zîra em dizanin ko çiqas ko em li gowdada bimînin, ji Xodê dÿr in. ⁷ Zîra em bi îmanê diçun na bi gûmanê. ⁸ Nua em cesaret dikin, û hênî pîr dixwazin ji gowda dÿr bûn, û li ba Rabb sekinandin. ⁹ Ê ji boy vîa em xayret jî dikin, erki em bimînin û erki dÿr bin, jê ra maqbûl bin. ¹⁰ Zîra lazim e ko em hemî jî li huzûra dîwana Îsaê bisekinin, hata ko her kas li gora amelê xo li gowda xo da şîxulî gerek xayr gerek şer awezê xo bistînin.

¹¹ Nua tîrsê Xodê bi bizanînê merûvan qen- [432] durmîş dikin, hama em ber Xodê aşîkâr in, û umud dikim ko li zamîrê we da jî em aşîkâr in. ¹² Zîra em xo dîsa ji we ra ji alîê me sebebê îftîxarê em didin; hata ko li rû da û na li dîl da îftîxar kroşan ra gotinê wê hebe. ¹³ Zîra erki em bêxûd bûne, ji boy Xodê e û erki aqlê me tamam e, aw ji boy wê e. ¹⁴ Çima ko muhabetê Îsa ji me ra zor ji boy hemîan mir, erki wusan e hemîan jî mirî bobûn. ¹⁵ Ê li uxura hemîan mir, hata ko wan ko dijîn hênî ji boy xo nejîn, lê ji wî ra ko ji boy wan mir û qiyam kir. ¹⁶ Wusan ko em ji vê pê ve hênî yekê bigowda nizanin, û faraza em Îsaê bi gowda nas kir, lakîn nua hênî wusan em nizanin. ¹⁷ Wusan ko her kî ko li Îsa da e; maxlûqê nû e; tiştê kevnan bihurîn; û va ha her tişt nû bû. ¹⁸ Lakîn her tişt ji Xodê e, ko me bi xo ra li hev anî bi destê Îsa el Mesîhê, û ji me ra da xizmetê li hev anînê. ¹⁹ Yanî Xodê bû ko bi Îsa dinê bi xo ra sulh kir, û sûcê wan ji wan ra hasab nekir; û söza sulhê li me da danî. ²⁰ Erki wusan e em ji alîê Îsa elçîtî dikin, weka Xodê bi me lava dikir, em ji alîê Îsa ji wê lava dikin, bi Xodê sulh bin. ²¹ Zîra aw ko güne nadizanibû, ji boy güneê me qurban kir Xodê, hata ko em bi awî dadîqê Xodê bin.

SER 6

¹ Nua em tev bi amel kirinê lava jî dikin ko îneyetê Xodê li nafiye cî da qabûl kroş nebin. [433] ² Zîra dibê ko, Li maqbûl zeman da mi şa godarî kir, û mi ji şa ra li roya xelasê da yardum kir, va ha nua e maqbûl zeman û va ha nua e roya xelasê. ³ Qat li tiştê da xwarbûnkî em nadin, ko xizmetê me bi noksanê ba. ⁴ Lakîn li her tişt da em xo weka xizmetcîê Xodê hedîe dikin, bi pîr sabr, bi sixintîan, bi derdan bi sixletan. ⁵ Bi kutan, bi habsan, bi fesadan, bi zahmetan, bi bê xewan. ⁶ Bi birçîtîan, bi pakîtî, bi zanîn, bi sabr, bi xoşnûdîtî, bi Azîz Rûh bi bê mûrayîtî muhabetê. ⁷ Bi söza doxrîtîê, bi quwwetê Xodê bi sîlahê sadaqatê, ko ji alîê rast û çepê e. ⁸ Bi îzzet û bi bê îfîbarê, bi bednam û bi nam û bi şan; weka şaş kroşan û doxrîan, weka beylisizan û malûm nasan. ⁹ Weka mirîan û va ha em dijîn; weka hati xazeb bûnan, û nehati kuşdînan. ¹⁰ Weka qasawetlîan û dayîma em şaz in, weka faqîran û pîran em xort dikin, weka tiştê tunnebûnan, û her tiştan me zabt kirîe. ¹¹ Devê me ji we ra hatîe vebûn, ey! Gorintoslian, û dilê me hatîe fîra bûn. ¹² Hûn ji alîê me sixlet nakşînin, lakîn li zikê xo da sixletan dikşînin. ¹³ Weka ji ewladan ra dibêm ji we ra, dêla hana hûn jî ji me ra fîra bin.

¹⁴ Bi îmansizan li yek nîr da mekevin, zîra çî hîsse sadaqatê bi nahaqîtîê heye û çî? îlhîaqê rohnîê bi tarî heye. ¹⁵ Ê çî? îtîfaqê Îsaê bi Peliarê heye, û yaxod çî hîsseê îtîqatî bi îmansizê heye. ¹⁶ Ê çî? mûnasîbetê dacarê Xodê bi putan heye, zîra hûn dacarê Sax Xodê nin, çawan ko Xodê go, Li nav wan da dê sakîn bim, û li nav wan da dê bigerim: û Xodê wan dê bibim, û wan qawmê min dê bibin. [434] ¹⁷ Ji boy vîa ji nav wan derkevin û cîê bin, dibê Rabb û li tiştê nâpakan mekevin. ¹⁸ Ê ez wê dê qabûl bikin bikim û ez ji we ra Bav dê bibim, û hûn ji mi ra lawikan û qîzikan dê bibin, dibê ji her tişt ra qadîr Rabb.

SER 7

¹ Nua, ey! muhabetlîan, çûnkî wada hana me bi hebûnê em xo ji her türî murdarîtîe tenê û Rûhê pak kin û azîzîtî bişixulin bi tîrsa Xodê.

² Me qabûl bikin, me qat ji yekê ra nahaqîtî nekirîe, û qat yekê jî me fesadê nada, qat ji yekê ra me xvadr nekir. ³ Ji boy hükm kirinê nabêm; zîra mi pêşîn ji we ra go kî hûn li dilê me da nin ji mirin ra û ji sax mayin ra, bi wê tev. ⁴ Li ber we da pîr cesaretê min heye, ji boy wê pîr pasna min heye, bi dil pîrsinê ez tîji bûme, li hemî sixintîe me da, bi şazîtîe zêde bûme. ⁵ Zîra gava ko em li Mageţonîaê gîyan, qat

canê me rahatîti nedî; lê ji hemî alî me sixlet dikişandibûn, ji derve qawxayan hebûn û ji hindur ve tîrsan. 6 Lakîn Xodê ko ji gönül alçağan ra dil pîrsin dide, dilê me jî pîrs kir bi hatinê Dîdosê. 7 Û na tenê bi hatinê wî îlla bi aw dil pîrsinê jî, bi awî ko aw jî hatibû dil pîrsin bi we, gava ko ji me ra naql pîr hasretê we, şîna we, ji boy xayretê we, wusan ko hênî pîr ez şaz bûm. 8 Zîra erki mi bi qasawet kir bi aw mektûbê ez poşman nin im, faraza ez poşman bobûm, zîra ez dibînim ko aw mektûb we da qasawet kirin ancax li zemankî. 9 Nua ez [435] şaz dibim, na kî ji boy qasawet bûnê wê, îlla ko hûn ji boy toba bûnê qasawet bûn, zîra li gora xosdinê Xodê ûn hatin qasawet bûn, wusan ko qat bi tiştê kî ji me zerar nakşînin. 10 Zîra li gora xosdinê Xodê bûn qasawet ji boy xelasê bê poşman toba hasil dike; zîra qasawetê dinê han mirin hasil dike. 11 Zîra tiştê han, ko hûn li gora xosdinê Xodê qasawet kirin, li we da çiqas! ceht amel kir, çiqas! özr, çiqas! haridîn, çiqas! tîrs, çiqas! hasret, çiqas! xayret, çiqas! hayf, bi her türlü we xo nîşan da ko li tiştê han da hûn pak in. 12 Nua aw ko mi ji we ra nivîsand, na kî ji boy nahaqîti ki rox bû, û na kî ji boy nahaqîti kişandox bû, lê li ber Xodê ji boy we bûn cehtê me ji we ra malûm bû. 13 Nua ji boy aw dil pîrsinê we em hatin dil pîrsin, hênî pîr zêde jî em şaz bûn ji boy şazîtiê Dîdosê, çima ko canê wî ji we hemîan rahat dibû. 14 Zîra çi ko mi li ber wî ji boy we mi pasna xo da, bişerm nabûm, lê çawan ko her tişt bi doxrîti xaber da ji we ra, wusan jî pasna me li ber Dîdosê doxrî³⁶⁵ derket. 15 Û muhabetê wî li ser wê hênî pîr e, gava ko naql dike îtaatê wê hemîan, erki çawan bi tîrs û bi lerzanê awî wê qabûl kirî. 16 Nua şaz dibim ko li her tişt da ji we ra îtîmatê min heye.

SER 8

1 Nua, ey! brêan, ji we ra beyan dikim înetê Xodê, ko ji kîlîsayê Mageŋonîan ra hatî dayîn. 2 Ko li nav pîr sixintî tercûbe da zêde bûnê şazîtiê wan xuyayîbû, û pîr gran faqîrîtiê [436] wan hênî pîr cömerdîti bû. 3 Zîra ez şehadet dikim ko bi qudrêtê xo, û ji qudrêtê xo zêde jî îradet nîşan dan. 4 Çima ko ji me ra bi pîr nîyazan lava dikiribûn ko îhsana hana, û ji azîzan ra bûn îlaqîtiê xizmetê em qabûl bikin. 5 Û weka umud kirinê me na, lê awul aw xo ji Rabb ra teslîm kirin, û paşê bi îradetê Xodê ji me ra. 6 Ko me ji Dîaos ra lava kir, erki çawan ko ji awul dest kir, wusan jî li nav we da tekîl bike îhsana han. 7 Lakîn çawan ko bi hemî tişt hûn zêde

³⁶⁵ Di metnê de *aoxrî*.

bûne; bi îman û bi söz û bi zanîn, û bi hemî cehd, û ji wê li ser me da bûn bi muhabetê, mêze kin ko bi îneyetê han jî zêde bin. ⁸ Bi tenbîh kirinê nabêm, lê ji semedê cehdê başqasîan û hasil bûnê muhabetê wê bi caribandinê dibêm. ⁹ Zîra dizanin îneyetê Rabbê me Îsa el Mesîhê, erki aw ji boy wê faqîr bû, aw ko zengîn bû; ko hûn bi faqîr bûnê wî zengîn bin. ¹⁰ Ê li tiştê han da şîretkî didim, zîra vîa ji boy faydeê wê e, hûn ko na tenê kirinê, li xosdin jî ji awul da dest kirin ji par ve. ¹¹ Nua kirin jî tekîl bikin, çawan ko gönûlê xosdin heye, wusan kirin bi qasa hebûnê wê bibe. ¹² Zîra erki awul gönûl bibe, dayin li qasa hebûnê maqbûl e û na li qasa tunne bûnê. ¹³ Çima ko na ko ez rahatîê başqasîan dixwazim, û ji we ra sixlet. ¹⁴ Lê bi yek hal bûn li wexta han da zêde bûnê wê kêmanîtîê wan diji bike wusan ko wextkî zêde bûnê wan jî ji kêmanîê we ra yardum bibe; çawan ko hatîe nivîsandin. ¹⁵ Erki aw ko pîr civand, zêde nebû, û aw ko hindik kêman nebû. ¹⁶ Lakîn şikir ji Xodê ra, ko av cehd li ser wê li dilê [437] Dîdos da danî. ¹⁷ Çima ko aw recayê me qabûl kir, û cehdê wî bi pîr bûnê, bi îradetê xo rabû ji we ra hat. ¹⁸ Ê bi wî ra me şîyand aw brê, ko medha wî li încîl da e, li nav hemî kîlîsean da. ¹⁹ Ê na tenê awqas, lê ji kîlîsean nasb bû ji me ra li rêwîti da heval bûnê li nav îhsana han; ko em xizmet dîkin ji boy îzzetê Xodê û bi îradetê xo. ²⁰ Lakîn li xusûsa han da me saqinmîş dibobûn ko nebe yekê qusûrkî deyne li ser me li nav xanîmetê han da, ji wî ra em xizmet dîkin. ²¹ Çima ko ná tenê li ber Xodê, îlla li ber merûvan jî tiştê qanc kirinê em cehd dîkin. ²² Ê bi wan ra me brêy xo şîyand, awî ko li pîr tiştan da me bi ceribandinê pîr me awî xayretkeş dîe, û nua hênî pîr xayretkeş be aw mezin îtîmatîtîê ko li ser we heye. ²³ Lakîn erki ji boy Dîdosê hûn pîrs dîkin, aw hevalê min ³⁶⁶ û li nav we da yardumçîê min; hama brêyê me, mamûrê kîlîsean e û şanê Îsa ne. ²⁴ Nua îsbatê muhabetê wê îftîxarê me ji boy wê ji wan ra li ber kîlîsean nîşan bidin.

SER 9

¹ Zîra ji boy azîzan bûn li xusûsa xizmetê ji we ra nivîsandin ji mî ra zêde e. ² Zîra ez hazir gönûlîê wê dizanim, ko boy ê kê ji boy wê ji Mageţonîan ra pasna xo didim ko Akayîa ji par ve hazir e, û xayretê we pîran li haraketê anî. ³ Ê vaha mi brêan şîand, ko pasna min ji boy wê li xusûsa han da nafîle dernekeve, lê hazir bêne gotîe. ⁴ Ko nebe gava ko Mageţonîan bi mî ra bèn, û wê bê [438] tedarik bibînin, em,

³⁶⁶ Di metnê de a.

nabêm hûn li îftîxara han da em rezîl bin. ⁵ Nua mi îxtîza hasiband ko ji brêan ra mi lava kir ko awul ji we ra bên û awul li rê deynin bibe, wusan ko weka pêşkêş bibe û na weka tamakârîtî. ⁶ Lakîn wan dibêm ko erki aw ko bi nekesîtî tov dike bi nekesîtî dê biçîne, û bi bereketê tov kroş, bi bereketê dê biçîne. ⁷ Her kes ji dilê xo li gora îradet kirinê xo bra bide bi qasawet û ya bi cebr na, zîra Xodê bi dil dayoxê dihubîne. ⁸ Ê Xodê ji we ra her îneyetê zêde kirinê qadîr e; hata ko li her tişda dayîma تمام kîfayetê we bi bûnê li her amelê qanc da hûn zêde bibin. ⁹ Çawan ko hatîe nivîsandin, Raxisd û ji faqîran ra da sadaqata wî ebeda³⁶⁷ dimîne. ¹⁰ Ê aw ko ji tov kroş ra tov îhsan dike, û ji boy xwarinê nan tovê wê jî dê zêde bike û mahsûlatê sadaqatê we dê pîr bike. ¹¹ Hata ko li her tişt da zengîn bibin bi her türlü cömerdîtî ko bi destê me sebeb dibe ji Xodê ra şikir dayin. ¹² Zîra îcraê xizmetê han tenê kêmanîtî azîzan tijî nake îlla ji Xodê ra bi pîr şikran jî zêde bibe. ¹³ Gava ko bi tecrûbeê xizmetê wê ji Xodê ra îzzet bikin, ji boy ji încîlê Îsa ra îqrar kirin îtaatê wê, ji boy cömerdîtî wê ji wan ji hemîan ra îlhaq bûnê wê. ¹⁴ Ê wan ji boy wê bi nîyazan, ji boy li ser wê bûn pîr mezin îneyetê Xodê ji we ra hasret bikşînin. ¹⁵ Ê ji Xodê ra i boy bê tabîr bûn baxşîşan şikir bibe.

[439] SER 10

¹ Lakîn ez Boşosê ji we ra lava dikim bi gönül alçaxîtî û xoşîtî Îsaê, ko gava ko em rû be rû mahcûb im li nav we da, lakîn ji dûr ve cesaret dikim ji we ra. ² Reça dikim, ko nebe ko ji nêz ve jî cesaret bikim bi aw îtîmatî, li ser hinikan, li ser wan ko li ser me wusan taxmîn dîkin ko em li gora cesedê diçun. ³ Zîra faraza em li cesed da diçun, hama na kî weka i cesedê em qawxa dîkin. ⁴ Çima ko sîlahê cengê me li gora cesedê nin e, lakîn ji boy hîsaran heloşandinê, bi Xodê quwwetlî ne. ⁵ Ê quruntîan hem li ser zanînê Xodê hati bilind bûn her bilindan em dihelosînin, û hemî fikran ji îtîatê Îsa ra esîr dîkin. ⁶ Ê gava ko îtaatî wê tekmlîl bibe, ji her îtaatsîzîtîan em ji hayf sendin ra hazir in. ⁷ Ji der ve bûn tiştan? ra hûn mêze dîkin, erki ji xo ra gügenmîş dibe ko ê Îsa e, aw ji xo dîsa vîa bra düşünmîş bibe ko, aw çawan ê Îsa e, em jî wusan ê Îsa ne. ⁸ Zîra erki pîr jî pasna xo bidim li ser aw hükmata me ko Rabb ji me ra da ji boy mamûrîrî wê û na ji boy xarab kirinê, dê şerm nekin. ⁹ Hata bi mektûban weka wê ditîrsînim naxuyam. ¹⁰ Zîra yekê dibê ko mektûban gran û bi

³⁶⁷ Di metnê de *ebîda* (nîşeya wergêrê).

quwwetlî ne, hama gava gowda li huzûr tê zayîf û söz alçağ e. ¹¹ Meruvê wusan bra düşûmiş be ko em ji dût ve çawan in bi söz û bi mektûban, ji nêz jî em dê wusan bibin bi amel. ¹² Zîra em cesaret nakin xo li mêzîn da danîn û xo wezn kirin bi hinikan, wan ko aw xo medh dikan, lakîn wan aw [440] bi xo bi çapandinê û aw bi wezn kirinê fehîm nakin. ¹³ Hama em ji ölçîê der bi tîştan dê pasna xo nedin, lê li gora ölçîê aw qanûnê, ko Xodê ji me ra taxmîn kir, ko hata li wê em bigên. ¹⁴ Na ko weka em ji we ra nagîyane, û em xo ji ölçîê zêde dirêj dikan, çima ko bi Încîlê Îsa em hata li wê gîyane. ¹⁵ Ê na ko ji ölçîê der bi tîştan em pasna xo didin bi emegê başqasîan, lê umudê me heye gava ko îmanê wê zêde bin li gora ölçîê qanûnê me, bi wê em hênî mezin bin. ¹⁶ Ji alîê wê wêda Încîlê waz kirinê, û na ko li gora qanûnê başqasîan, li ser hazir tîştan pasna xo didim. ¹⁷ Lakîn aw ko pasna xo dide, bra bi Rabb pasna xo bide. ¹⁸ Zîra aw ko xo medh dike maqbûl nin e, îlla aw ko Xodê medh dike aw maqbûl e.

SER 11

¹ Xozîka ji aqilsizîtîê mi ra hinikî hûn tahmûl bikirana, û bîra tahmûl bikin ji mi ra. ² Zîra ji boy wê bi xayretê Xodê xayret dikşînim, çima ko mi wê ji mêrkî ra xosd, weka bakr qîzkî li ber Îsaê sekinandinê. ³ Hama ez ditîrsim ko, çawan mahr bi fitneyîtîê xo Hawaê xapand, nebe ko fikrê we jî wusan, li Îsa da bûn saf dilê we li fesadê heye. ⁴ Zîra erki yekê bê başqa Mesîh waz bike aw ko me waz nekir, yaxod başqa Rûh bistînin, ko wê nesend yaxod başqa Încîl, aw ko qabûl nêkirîe, ji wusan ra hûn qanc tahmûl dikiribûn. ⁵ Zîra ez qiyas dikim ko ji en mezin resûlan qat kêmanîê min tunne. ⁶ Ê faraza ji alîê sêzê pelît im, lakîn ji alîê îlme nâ; çûnkî li [441] her tîşt da li hemî da em ji we ra malûm bûn. ⁷ Meger mi suçkî? kir, ko Încîlê Xodê mi ji we ra bi ceba waz kirinê, mi xo alçağ kir ko hûn bilind bin. ⁸ Ji boy xizmetê wê ûlfet bi sendinê başqa kîlîsean mi talan kir. ⁹ Ê gava ko li ba we de bûm erki mi neçarîkî kişand mi qat ji yekê ra zahmet neda; ji Mageţonê hatox brêan, kêmanîê min tîjî kirin; û mi xo li her tîştan ji we ra bar³⁶⁸ bûn ra dût girt û dê dût bigirim. ¹⁰ Li mi da doxrîtîê Îsaê heye ko, îftîxara mi hana li alîê Akasîaê dê nabê bîrandin. ¹¹ Çima?, weka ez we nahebînim?, aw Xodê zane. ¹² Lakîn aw ko dikim dê bikim jî ko bibîrim sebebê wan, wan ko sebeb aramîş dikan, ko bi çî tîşt da pasna xo didin, wan jî weka

³⁶⁸ Di metnê de ber.

me bêne dîtin. ¹³ Çima ko awhanan derew resûlan û hîlebaz palayan bi bûnê, kîswetê resûlê Îsa li ser xo distînin. ¹⁴ Û aceb nin e; zîra Şeytan aw bi xo jî biqêve li sûretê melekê rohnîê. ¹⁵ Hênî mezin tiştêkî nin e, ko xizmetcîê wî jî diqêvin li sûretê xizmetcîê sadaqatê, lakîn paşê wan li gora amelê wan dê bibe. ¹⁶ Dîsa dibêmi ko mi yekê aqilsiz qiyam neke; erki na barê mi weka aqilsiz qabûl bikin, ko e jî hinik pasna³⁶⁹ xo bidim. ¹⁷ Aw ko ez dibêmi, li gora Rabb nabêmi, lê weka bi aqilsizîtkî bi serbestîê aw îftîxarê. ¹⁸ Çûnkî pîran ji alîê cesedê pasna xo didin, ez daxî dê pasna xo bidim. ¹⁹ Zîra çûnkî hûn alîm in ji aqilsizîan ra bi gönûl xoşnûdîtîê tahmûl dîkin. ²⁰ Çima ko hûn sabr dîkin, erki yekê wê qul bike, erki yekê malê we bixor, erki yekê ji we tiştêkî bistîne, erki yekê li ser wê pasna xo bide, erki yekê li rûya wê bixe. ²¹ Ji boy şermê dibêmi, **[442]** goyakî em zayîf bûn; hama li tiştêkî da cesaret kirinê yekê bi aqilsizîtkî dibêmi, e jî cesaret dikim. ²² Wan Îbranî? ne, e jî, Îsrayelî ne, e jî, zürîyetê Îbrahîmê? ne e jî. ²³ Xizmetcîyê Îsa ne, weka aqlê wî tunne bûn dibêmi, ez hênî pîr, li zahmet da ez hênî pîr, li kutan da, hênî pîr li hasb da hênî pîr, li mirin da pîr caran. ²⁴ Ji Yehûdîan pênc caran ji çilê kêmi yek ez çov xwarim. ²⁵ Sê caran ez hatim kutan, carkî hatim kevîr kirin, sê caran bi gemîê li zuwayî da kirim, şevkî û rokî li bin bahrê da mam. ²⁶ Pîr caran li rêwîtkî da mi ezîyet kişand, ji çayan cefa, ji dizan cefa, ji mîlletê mi cefa, ji tayîfan cefa, li bajêr da cefa, li çol da cefa, li bahr da cefa, li nav derew brêan mi cefa kişand. ²⁷ Li zahmet da û mîhnê da, pîr caran³⁷⁰ li bê xew da çûn da, brçîtî û li tî bûn da pîr caran li rocî da li rocî da li serma da û li tahzîtî da bûm. ²⁸ Li alîkî deyne berde derve, mijûlîyê hemî ro, xemê hemî kîlîsean li ser min dihatibû abandin. ²⁹ Kî? zayîf dibe û ez zayîf nabim, kî? xwar dibe, û ez qizmiş nabim. ³⁰ Erki îftîxar kirin lazim be, ji alîê zayîfîtkî dê îftîxar bikim. ³¹ Xodê û Bavê Rabbê me Îsa el Mesîhê ko ji ebedê mübarek e, dizane ko derew nabêmi. ³² Li Şam da mîllet başîê ardê Şamlîan bekcîan danibû. ³³ Û ez ji hîsarê berjêr ji şibakkî hatim alaqaandin, û ji destê wî revîyam.

³⁶⁹ Di metnê de *pasana xo* (nîşeya wergêrê).

³⁷⁰ Di metnê de *ceran* (nîşeya wergêrê).

[443] SER 12

¹ Bira pasn kirin ji mi ra fayde nake, zîra li xewêt û dîtînê Rabbê dê bêm. ² Bi Îsa meruxkî zanim ji çardeh salan awul li gowda da nizanim û erki bê gowda nizanim, Xodê dizane ko aw kes hata li üçüncî azüman da hati rakişandin. ³ Ê meruvkî va ha ez dizanim; (erki bi gowdaê û erki bê gowda, nizanim, Xodê dizane). ⁴ Ko li cenetê da hati rakişandin û wusan xaberan bihîsd ko naye gotin, ko aw xaberan ji meruv ra cayîz nin e gotin. ⁵ Ez ji boy wusanî dê pasn bidim, lakîn ji boy xo dê pasna xo nekim, lê tenê li ser zayîfîtî xo. ⁶ Zîra erki îftîxar jî bikim dê aqilsiz nebim, çima ko rast dê xaber bidim, çünkî ji xaberê xo ra saqinmîş dibim, ko nebe yekê li ser min tiştîkî zêde qiyam bike, ji dîtîn û ji min bihîsdinê. ⁷ Ko nebe ez kîbîr bibim ji boy pîr xewan, ji mi ra zixtkî gowdaê hati dayin melekê Şeytanê ji boy ji mi ra ezîyet kirinê, ko nebe ko kîbîr bibim. ⁸ Ji boy vîa sê caran mi ji Rabb ra lava kir ko ji min alîkî bike. ⁹ Ê ji mi ra go: Înayetê min ji ta ra bas e, zîra quwwetê min li zayîfîtî da tekmlî dibe; nua bi pîr xoşnûdîtî hênî pîr li ser zayîfîtî xo dê pasna xo bidim, hata ko quwwetê Îsaê li ser min sakîn bibe. ¹⁰ Ji boy avî li uxura Îsaê, ji zayîfî, ji serhevdeê, ji derdan, ji qawarandinan ji sixintîan razî me, çima ko gava ez zayîf im, wê çaxê taqatî me. ¹¹ Bi îftîxar kirinê ez aqilsiz bûm, hûn ji mi ra zor kirin, zîra ji mi ra lazîm bû [444] ko ji wê şehadetî sendinê, çünkî erki qat tiştîkî jî nin im, ji ên mezin resûlan kêmânîkî min nebû. ¹² Bîr nîşanê resûlan bi temam sabr, bi alametên û bi hûkmetên û bi quwwetî tiştan li nav we da îcra bû. ¹³ Zîra bi çi? tişt ji başqa kîlîsean hûn şûnda mane, tenê aw ko mi we ra acizîtî neda, sûcê han ji mi ra afw bikim.

¹⁴ Ê gav vîa sê caran e ko hazîr dibim ji we ra hatinê, û ez ji we ra dê azizîtî nedim; zîra ez tiştê we aramîş nâkim, îlla wê; çünkî zarûkan ji boy bavan mal top nakin, lê bavan ji boy zarûkan. ¹⁵ Ê ez bi xosdinê xo dê xarc bikim, û li uxura we dê xarc bibim jî, faraza ez we bi pîr hebandinê ji wê hindîk bêm hebandin jî.

¹⁶ Lakîn bira bibe ko, mi ji we ra giranîtî neda, hama bi fennbaz bûnê, mi we bi hîle girt. ¹⁷ Bi dest wan ko mi ji we ra şîyand mi ji we ra xatîr kir? ¹⁸ Mi ji Dîdos ra lava kir, û bi wî ra aw brêê mi şîyand, Dîdos ji we ra xatîr kir?, heman li yek rûh da, heman li yek tarîq da em negerîyan?.

¹⁹ Dîsa, hûn qiyas dîkin ko li ber we em xo medh? dîkin, li huzûra Xodê bi Îsa em xaber, didin lakîn her tişt; ey! delalîan ji boy memûrîyetê we e. ²⁰ Zîra ditîrsim ko nebe gava ko bêm wê weka xosdinê xo nebînim û e jî ji we ra weka xosdinê we neyîm dîtîn; nebe ko li we da bê dîtîn, nîzayan, hasedan, qaxdayan, xeybetan

xamazîtian, kîbîrîtian, nîzamsizîtian, hayfan. 21 Nebe ko hawadîsan bêm, Xodê min,
ez li ba wê alça bike, û şîn bikim ji boy pîran, ko ji awul günê kirin, û toba nekirin li
ser aw şîxulê napakîti, û zîna, edebsizîti.



[445] SER 13

¹ Vîa sê caran e ko ji we *ra tēm*, bi devê du û sê şahîdan her söz dê sabît bibe.
² Ji awul mi gotîê û dîsa dibê m weka li ba wê bûnê; faraa ji dîrve dinivîsinim, ji awul
gûne kroşan *ra* û ji başqa hemîan *ra*, erki dîsa bêm, dê qayîrmîş nekim. ³ Çûnkî îsabet
aw ko Îsa bi min xaber da aramîş dîkin, ko aw li ser wê zayîf nebûe, lê li nav we da
quwwetlî e. ⁴ Ko faraza bi zayîftîê hat xaç bûn, hama bi quwwetlê Xodê diji; zîra
faraza em jî bi wî zayîf in, lakîn li nav we da bi wî bi quwwetê Xodê em dê bijîn. ⁵
Hûn xo bi cerîbînî erki li nav aw îman da ne, hûn xo teftîş bikin, hûn xo nizanin? ko
Îsa el Mesîh li nav we da e, erki hûn faydesiz nebûne. ⁶ Hama ez umud dikim ko hûn
dê bizanin erki em faydesiz nin in. ⁷ Ê ji Xodê dîleg dikim ko; hûn *temanîkî* dê
nekin, na ko em qabûl bûn bêne xuyayî, lê ko hûn *tiştê* xayr bikin, bra em weka
faydasiz bibin. ⁸ Çima ko li qarşî doxrîtîê qudrêtê me heye. ⁹ Em şaz in, gava ko em
zayîf dibin û hûn quwwetlî dibin, hem jî dîlegê me vîa e ko hûn kâmil bibin. ¹⁰ Nua
vîa ji we *ra* dinivîsinim ji dîr ve³⁷¹ ko nabe gava ko bêm li gora aw hûkmatê sertîtî
qulanmîş bibim, ko Xodê ji mi *ra* da ji boy mamûr kirinê û na ji boy heloşandinê.

¹¹ Nua ey! brêan, şaz bin, kâmil bin, bêne dil pîrsîn li yek fikir da bin, selamet
bikin, û Xodêê muhabetê û selametê û selametê bi we *ra* [446] bibe. ¹² Hevûduyan
azîz *ramîsanê* dila wan dîkin, hemî azîzan ji we *ra* silavan bikin³⁷². ¹³ Înayetê Rabb
Îsa el Mesîhê û muhabetê Xodê û îlhaqîtîê Rûh el Qudsê bi wê hemîan bibe, Amîn.

³⁷¹ Di metnê de *qûrve* (nîşeya wergêrê).

³⁷² Di metnê de *dîkin* (nîşeya wergêrê).

MEKTÛBÊ Ê RESÛLÊ BOXOS JI KAXADALÎAN RA

SER 1

¹ Boxos hati resûl bûn, na ji merûvan û na bi destê merûv, lê bi destê Îsa el Mesîhê û bi destê Bav Xodê ko awî ji mirîan rakin. ² Û hemî brêan ko bi mi ra ne ji kîlîsaê Kaxadîa ra; ³ Ji we ra Bav Xodê û ji Rabbê me Îsa el Mesîhê; îneyet û selamet bibe. ⁴ Ko aw xo ji boy güneê me da, hati ko me li gora îradetê Xodê û Bavê me, ji yaramaz asîrê han xelas bike; ⁵ Ko jê ra ebed il ebed hamd bibe; amîn.

⁶ Tacûb dikim ko hûn ahwa zû ve li başqa încîlkî tene gohrandin ji awî ko wê ji îneyê Îsa ra gazî kir. ⁷ Ko tunne başqa încîl, lê tenê hene hinikan, ko we şaş dikim û dixwazin Încîlê Îsa biqulubînin. ⁸ Lakîn erki em, yaxod ji azümanan melekî bê ji we ra încîlê waz bika ji awî zêde, ko me ji we ra încîl waz kir, lanet bibe. ⁹ Çawan ko me awul go, nua dîsa dibêm³⁷³, erki yekê ji hati qabûl kirinê wê zêde ji we ra încîl waz bike, lanet [448] bibe. ¹⁰ Nua ji merûvan ra maqbûl bibim, ya ji Xodê ra, yaxod ji merûvan? ra maqbûl bûn aramîş dikim, erki hala ji merûvan ra maqbûl biba me qula Îsa nedibame.

¹¹ Û ji we ra malûm dikim, ey! brêan, aw încîl ko ji min hati waz bûn, erki aw şixulê merûv nin e. ¹² Zîra e jî daxî awî merûvkî nesendim, û ji yekê jî hîn nabim, lê ji kelamê Îsa el Mesîhê. ¹³ Zîra çawan bûnê min zemankî li Yehûdîti da hûn bihîstin; çawan bê hasab mi di qawarandibûm kîlîsaê Xodê û mi xarab fikir awî. ¹⁴ Û ji sipêrta bavanê xo ra bi pîr xayretlî bûnê, li mîlletê xo da ji pîr xisûmê xo zêde li Yehûdîti da li pêş diçûbûm. ¹⁵ Hama gava ko Xodê xosd ko mi bijart ji rahma dîya min, ¹⁶ Û bi îneyetê xo Kûrê xo ji mi ra aşîkâr bike ko awî ji tayîfan ra waz bikim, bîra bîr ez danişmîşê gowda û xuynê nebûm. ¹⁷ Ne jî li Qudsê rabûm li ba ji min awul resûl bûoxan, lê li Arabistanê çûm, û dîsa li Şamê vegeîyam. ¹⁸ Paşê ji paşa sê salan li Qudsê rabûm, ji boy Bedrosê bîninê û panzdeh ro li ba wî sekinîm. ¹⁹ Lakîn ji resûlan başqa yekê mi nedî, lê tenê Yaqûb brêy Rabb. ²⁰ Û aw tiştan ko ji we ra dinivîsînim va ha li ber Xodê îqrar dikim, ko derew nabêm. ²¹ Ji vî pê ve hatim li semta Sûrîaê û Gîlîgîaê. ²² Û mi rû be rû nas nedikiribûm aw kîlîsean ko bi Îsa li nav Yehûdîstan da bûn. ²³ Lê tenê wan bihîsdibûn; erki aw ko li zemana me diqawarand,

³⁷³ Di metnê de *abêm*.

nua wî aw îmanê waz dike; ko wextkî xarab dikir. ²⁴ Û ji boy min ji Xodê ra şikir dikir[i]bûn.

[449] SER 2

¹ Ji vî pê ve paşê çardeh salan dîsa li Qudsê rabûm Dîdosê bi xo ra sendinê bi tevî Parnapasê. ² Û li gora kelimullahê rabûm, û mi ji wan ra beyan kir aw încîlê, ko li nav tayîfan waz dikim, lakîn ji wan ra tenê ko müteber bûn, ko nebe li betal cî da bazdim, ya bême bazdan. ³ Lakîn bi mi ra bûn Dîdos jî bi Yûnanî bûnê, ji sünnet bûn ra mecbûr nebû. ⁴ hama ji boy aw derew brêan ko li nav civatê ketin, wan ko li hindur ketin ji boy bi Îsa el Mesîhê azadîtî me çasudîtî kirinê ko me qul bikin. ⁵ Ko ji wan ra hinikî wext bîle me godarî nekir îtaat kirinê, ko doxrîtî încîlê li nav we da qawî bimîne. ⁶ Lakîn ji müteber bûoxan wextkî her kî ko dibin bra bibin, hacetê min nin e, Xodê xatrê meruvan mêze nake, zîra müteber bûoxan ji mi ra tiştî xaber nekirin. ⁷ Lê zidda wî da gava ko dîn ko încîla bêsünnetan ji mi ra emanet bûe, çawan ko ji Bedros ra jî a sünetlîan. ⁸ Zîra aw ko ji Bedros ra rast anî ji sünnetlîan ra resûlîti kirinê, ji mi ra jî rast anî ji tayîfan ra. ⁹ Û gava ko Yaqûb û Gepas û Hanna zanîn aw înayet ko ji mi ra hati dayin, wan ko astûnan hasab bobûn, ji mi ra hem ji Parnapas ra ji boy îlhaqîtî destê rastê xo dan, ko em li nav tayîfan herin û wan li nav sünnetlîan. ¹⁰ Tenê dixosdibûn ko em faqîran bîra xo bînin, ko e jî razî bûm tiştê han kirinê. ¹¹ Hama gava ko Gepas hat li Antakîaê ez li ber wî sakinim, [450] çima ko ji tazîr ra müstahaq bû. ¹² Zîra ji cem Yaqûbê hêja çend tenan nehat aw bi tayîfan tev dixwar, hama gava ko wan hatin, ji sünnetlîan bitirşinê, aw xo li şûnda bi kişandinê cîê diobû. ¹³ Û bi wî ra mûraî bûn aw Yehûdîe dinan ji, wusan ko Parnapas jî li mûrayîtî wan xwar bû. ¹⁴ Hama gava ko mi dî li doxrîtî încîlê da rast naçun; li ber hemîan ji Gepas ra mi xaber da, erki tu kî Yehûdî î, weka tayîfa û na weka Yehûdî geçinmîş dibî, çima? ji tayîfan ra zor³⁷⁴ dikî ko weka Yehûdîan geçinmîş bibin. ¹⁵ Em ji tabîatê Yehûdîan in, û ne ji tayîfan günekâr in. ¹⁶ Vîa bizaninê, ko meruv ji amelê nomosê nikare sadiq bûn, lê ji îmanê Îsa el Mesîhê, em jî ji Îsa el Mesîh ra îman anîn, ko sadiq bibin ji îmanê Îsa, û na ji amelê nomosê, çima ko ji nomosê qat cankî dê sadiq nebe. ¹⁷ Nua erki em ko dixwazin bi Îsa sadiq bûn; günekâr em bêne dîtin, erki wusan e Îsa xizmetçîe güne? bû, haşa. ¹⁸ Zîra erki ez aw tişt ko, mi helweşand dîsa çêdibim,

³⁷⁴ Di metnê de *bor*.

ez xo qabhatlî dikim³⁷⁵ dîtîn. ¹⁹ Çima ko ez bi destê nomosê mirin ji boy nomosê, ko ji Xodê ra sax bim. ²⁰ Bi Îsa ra ez li xaç rabûm, lakîn sax im, na ez, lê Îsa sax e li mi da, lakîn ez ko nua bi gowda dijîm bi îmana Qurê Xodê dijîm aw ko mi heband, û aw³⁷⁶ xo li uxura mi danî. ²¹ Ez îneyetê Xodê batal dernaxim, çima ko erki sadaqat ji nomosê bû, erki wusan e Îsa li nafiye cî da mir.

[451] SER 3

¹ Ey! aqilsiz Qaxadalîan, kî? we ji serî derxîsd ko ji doxrîtî ra îtaat nekin; ko li ber çahvê we Îsa el Mesîh li nav we da li xaçê hati rabûn resm bû. ² Ji we tenê vîa dixwazim hîn bim, bi destê amelê nomosê? we rûh sendin, ya bi bihîsdinê îmanê. ³ Hûn avqas bi ten? temam dibin? ⁴ Avqas tiştan li nafiye? cî da we kişand, erki bîra nafiye jî bibe. ⁵ Nua ji we ra Rûhê baxş kroş, bi amelê nomosê?, ya bi bihîsdinê îmanê dike. ⁶ Çawan ko Îbrahîm ji Xodê ra îman anî û jê ra sadaqat hasab bû. ⁷ Erki wusan e bizanin, erki wan ko ji îmanê ne wan in Qurê Îbrahîm. ⁸ Ê kitêb ji awulê bizanibûnê, erki Xodê tayîfan bi îmanê sadiq diki bi destê ta hemî tayîfan dê mûbarek bibin. ⁹ Nua wan ko ji îmanê ne bi tevî dîndar Îbrahîmê mûbarek dibin. ¹⁰ Zîra wan ko ji amelê nomosê ne, wan li bin beddua ne, çima ko hatîe nivîsandin, erki, Melûn bin aw hemî merûvan ko li kitêbê nomosê da li aw hemî tiştê hati nivîsandin nasekinin wan îcra kirinê. ¹¹ Ê erki bi nomos yekê nikare li ber Xodê sadiq bûnê, aw malûm e, zîra sadiq ji îmanê dê bijî. ¹² Lakîn nomos ji îmanê nin e, lê aw ko aw tiştan îcra dike bi wan dê bijî. ¹³ Îsa me kirî ji bedduaê nomosê, aw ji boy me bedduwa bûnê, zîra hatîe nivîsandin ko, Melûn in, aw hemîan, ko ji darê tene alaqandin. ¹⁴ Ko bereketê Îbrahîmê li ser hemî tayîfan bi- **[452]** be bi Îsa el Mesîhê, ko em jî wadê Rûhê bistînin bi îmanê. ¹⁵ Ey! brêan, bi adetê merûvan xaber didim; bîra ko wasîyetê merûvkî ko hat qa bûn yek jî batal nake; ne jî li ser wî tenbîhkî zêde. ¹⁶ Lakîn wadan ji Îbrahîm ra û ji zürîetê wî ra bûn, nâbêjî û ji zürîetê ta ra weka ji boy pîran, lê weka ji boy yekê ra, û ji zürîetê ta ra, ko aw Îsa e. ¹⁷ Vîa bibêm, aw wasîet ko ji awul da ji xodê hati qawî bûn bi Îsa, nomos ko ji çar sad û sî sala şûn da hati nivîsandin, nikari awî ji cî da tevgerandin, ji boy sîetê batal kirinê. ¹⁸ Zîra erki mîras ji nomosê dibe, wusan e ji wadê nin e; hama Xodê ji Îbrahîm ra bi destê wadê baxş kir.

³⁷⁵ Di metnê de *didim* (nîşeya wergêrê).

³⁷⁶ Di metnê de *ah* (nîşeya wergêrê).

19 Lê hata ko bê aw zürîet ji awî ra ko wad bobû; bi destê melekani hati dayin, bi destê mîyancîkî. 20 Hama mîyancî, mîyancîê yekê yekê nin e, lakîn Xodê yek e. 21 Nua nomos zidê wadê Xodê? e, haşa, zîra erki wusan nomoskî bihatina dayin, ko qadîr bibana hyat dayinê; wê çaxê bîra sadaqat ji nomosê dibana. 22 Lakîn kitêb hemîan li bin güneê danî ko wad bi îmanê Îsa el Mesîhê bê dayin ji dîndaran ra. 23 Lakîn çiqas ko îman nehatibû; li bin nomosê hti veşartin em mebûn, bi beklemiş kirinê ji aw îman ra ko dê aşîkâr bibana. 24 Erki wusan e nomos xocaê mebû, me ji Îsa ra anin ra, ko em bi îmanê sadiq bibin. 25 Hama gava ko îman hat, hênî em li bin xoca da nin in. 26 Zîra em hemî jî kure Xodê ne, bi aw îman ko li ser Îsa el Mesîhê e. 27 Zîra hûn hemîan ko bi Îsaê hatin tahwîl bûn, Îsa li ser xo wergirtin. [453] 28 Ji vî pê ve né Yehûdî heye, né Yûnanî, né qul heye, ná jî azad, né mêr heye, ná jî me; zîra hûn hemî jî yek in bi Îsa el Mesîhê. 29 Ê erki hûn ê Îsa ne, wusa ne hûn zürîetê Îbrahîmê ne, li gora wadê hûn mîraxsor in.

SER 4

1 Hama vîa dibêm: Çiqas zeman ko mîraxsor sabî e, ji qulê qat farqkî tunnê, faraza Xodê hemî tiştan e. 2 Îlla hata wexta tayîn kirinê baba, li bin wasîan û ketxuda ne. 3 Va ha jî em gava ko sabî bûn, li bin adetê dinê em qul bobûn. 4 Hama gava ko wext temam bû, Xodê Kure xo şîand ko ji jinkî bû, û li bin nomosê ket. 5 Wusan ko li bin nomos da bûn ra layiq bibim. 6 Ê çûnkî hûn ewlad in, Xodê Rûha Kure xo şîand li dilê we da, ko feryad dike Appa Bav. 7 Ji vî pê va hênî qul nin î, lê ewlad, û erki ewlad hênî bi destê Îsa mîraxsorê Xodê. 8 Lakîn wê çaxê ko hûn nêdizanbûn Xodê, ji awan ra wê qulux fikir wan ko ji aslê Xodêan nebûn. 9 Hama nua ko hûn Xodê nas kirin, îlla ko hûn ji Xodê hatin nas bûn, hûn çawan? dîsa vedigerin ji zayîf û faqîr adet ra, ko ji wan ra hûn dîsa qulux kirinê dixwazin. 10 Ruyan û mehan û zemanan û salan hûn farq dikin. 11 Ez ji we ditîsim, ko nébe li ser we li nafîle cî da emeg bikşînim.

12 Ey! brêan, ji we ra lava dikim weka min bibin, zîra e jî weka we bûm, ji mi ra we qat nahaqîtkî nekirin. 13 Ê hûn dizanin, ko ji awul da mi [454] bi zayîfîtî tenê Încîl ji we ra waz kir. 14 Ê li tenê mi da bûn tecrûbeê min wê li ber tiştîkî nêdanîn; lakîn mi weka melekê Xodê; weka Îsa el Mesîhê hûn qabûl kirin. 15 Nua medhê wê çi e?, zîra ji boy we ez şehadet dikim ko, erki mûnkûn bibana, çahvê xo dê bi derînana û ji mi ra bidana. 16 Nua ez dijaminê? we bûm, ji boy ji we ra rast gotinê. 17 Ji we ra

ḫayretkeş dibim na, ji boy qancîtîê, îlla we şûnda dîkin, hata ko hûn ḫayretkeşê wan bibin. ¹⁸ Hama ji boy qancîtî ḫayretkeş bûn dayîma qanc e, û ná tenê gava ko li ba we da bibim. ¹⁹ Ey! ewladê mi piçûkan, ko ji boy wê dîsa zahmetê zayinê dikşînim hata ko sûretê Îsa li nav we da mewcûd bibe. ²⁰ Lakîn mi dixosd ko nua li nav we da bibim, û denga xo bigohrînim, zîra ez ji boy wê li şübhe da me.

²¹ Bêjin ji mi ra, hûn ko li bin nomosê dixwazin bişevîn, nomosê godarî nakin?. ²² Zîra hatîe nivîsandin ko, Ji Îbrahîm ra du kur hebû, yek ji xalayıqê û awê din ji azad jinê. ²³ Lakîn aw ko ji xalayıqê bû, li gora tenê zabû; hama aw ko ji jina azadê, li gora wadê bû. ²⁴ Ê tiştê hana bi temsîla hatin gotan; zîra vanan du ahd in; yek ji çîyaê Sînaê ji boy qulluxê dize, ko aw Haqar e. ²⁵ Zîra Haqar li Arabîsdan da çîayê Sîna e; û mütabîqê Qudsê anwayi ne; zîra bi tevî kurê xo qullux dike. ²⁶ Hama Qudsê jorîn azad e, ko dîa me hemîan e. ²⁷ Zîra hatîe nivîsandin: Tu ey! nazayox istovir jin, şaz be; ey! zahmetê zayinê³⁷⁷ nekişandox, biqîre û gazî bike, zîra kurê hati terk bûn jin, kurê hênî pîr dê bibe ji awî ko mêrê wî heye. ²⁸ Hama em, ey! brêan, weka Îsaqê li gora wadê ewlad in. ²⁹ Lakîn çawan ko li [455] aw zemanê li gora tenê hati zabûn, li gora rûhê hati zabûnê, diqawarand, nua jî wusan e. ³⁰ Hama kitêb çi? dibê, xalayıqê hem kurê wî bi derîne; zîra kurê xalayıqê bi kurê azadê dê mîras nestîne. ³¹ Nua ey! brêan, em kurê xalayıqê nin in, lê kurê azad in.

SER 5

¹ Nua pêt bisekinin bi aw azadîtîê ko bi awî Îsa me azad kir; û dîsa li bin nîra qulluxîtîê méşevîn. ² Va ha ez Boxos ji we ra dibêm ko, erki hûn sûnet bibin, Îsa ji we ra qat dê faydekî neke. ³ Ê dîsa ji her sûnetlî meruv ra şehadet dikim, ko gişk nomosê îcra kirin ra deyndar e. ⁴ Hûn kî bi nomosê xo sadiq dîkin ji Îsaê hûn veqatîane, ji îneyetê ketin. ⁵ Zîra em bi Rûh ji îman da bûn ji umudê sadaqat ra beklemiş dîkin. ⁶ Zîra bi Îsa el Mesîhê né sûnet û né jî sûnetsizîtî tiştî e, lê bi muhabet mel kroş îman. ⁷ Hûn qanc dibazîan, kî? we şûnda xîsd ko ji doxrîtî ra îtaat nékin. ⁸ Fîtê han ji awî nin e ko we gazî kir. ⁹ Hinik hevîr tîrş hemî hevîrê amen dike. ¹⁰ Hama ez, umudê min li ser wê heyebi Rabb, ko henî başqa tarz tiştî dê düşûmiş nebin, lakîn aw ko we qarişdurmîş dike her kî dibe, güne dê li astûyê wî bibe. ¹¹ Lakîn ey! brêan, erki ez hêja sûnet waz dikim, hênî çima? tême qawarandin, erki

³⁷⁷ Di metnê de zayine.

wusan e xwar bûnê xaçê batal bûe. ¹² Xozîka ji binî bi hatina birandin wan, ko wê qarişdurmîş dikin.

¹³ Zîra ey! brêan, hûn ji azadîtî ra hatin dawet bûn, tenê ko azadîtî we sebebê dil bijandinê tenê nebe; lê bi muhabet ji hevû- [456] du ra xizmet bikin. ¹⁴ Zîra hemî nomos li aw yek söz da tekmlî dibe, ko hevalê xo weka xo bihebînî. ¹⁵ Hama erki hevûdu waz bikin û bixun, mêze kin nebe ko ji hevûdu telef bibin. ¹⁶ Tenê vîa dibêm, Bi rûh herin, û arzûyê tenê asla îcra mekin. ¹⁷ Zîra ten zida rûhê û rûh jî zida tenê arzû dike; û vanan ji hevûdu ra zid in, ko nebe ko awî ko dixwazin awî bikin. ¹⁸ Hama erki ji Rûhê hûn tene qalawuz bûn, hênî li bin nomosê nin in. ¹⁹ Nua amelê tenê malûm in, ko van in, zîra, fahşîtî, murdarîtî, edebsizîtî. ²⁰ Putperezîtî, sihîrbazîtî, dijmînîtî, pev çûndinan, hasûdîtî, sûhatinan, nîzayan, veqatandinan, firqayan. ²¹ Kem nazaran, qatlîtî, serxoşîtî, bekrîtî, û her çî ko emsalê wanan in, ko we ra digotibûm, ko tiştê ahwa şîxuloşan ji padîşahîtî Xodê ra dê warîs nebin. ²² Lakîn meyweê Rûhê vîa e, muhabet, şazîtî, selamet, tehamûl; ²³ Latîfîtî, qancîtî, îman, mahcûbîtî, nefse xo zabt kirin; zida ahwa tiştan nomos tunne. ²⁴ Ê awan ko ê Îsa ne tenê xo xaç kirin bi tevî asil arzûyan û hawesan. ²⁵ Erki em bi Rûh dijîn, li gora Rûhê em biçûn. ²⁶ Batal îftîxar kroşan em nébin; hevûdu bi fit kirinê, û ji hevûdu ra bi hased kirinê.

SER 6

¹ Ey! brêan, erki yekê xafil li qabahatkî bê girtin, hûn ko rûhanîa ahwa yekê bi rûha mahcûbîtî îslah bikin; tu li xo mêze ke, nebe ko li nav tecrûbeê bişevî. ² Barê hevûduan helînin, û ehwa nomosê Îsaê tekmlî bi- [457] kin. ³ Zîra erki yekê xo tiştî hasab dike û nin e, aw xo dixapîne. ⁴ Lakîn her kes bra şîxulê xo biwezîne, û wê çaxê tenê pasna xo li ser xo bide û ná li ser başqasîkî. ⁵ Zîra her kes barê xo dê helîne.

⁶ Ê aw ko li hîn bûnê kelimê e, xocae xo li her türlü nîmetan da hîsedar bike. ⁷ Hûn xo mexapînin, Xodê zewqlenmîş nabe. ⁸ Zîra meruvkî çî ko tov dike heman awî dê bişîne; aw ko li tenê xo da dajo, ji tenê çürügîtî dê biçîne, û aw ko ji Rûh ra tov dike, aw ji Rûhê ebedî hayat dê biçîne. ⁹ Hama em ji xayr amel şîxulandinê acîz nebin; zîra li mînasîb zeman da em dê biçînin, erki em sist nebin. ¹⁰ Nua çiqas ko wext li dest me da e, ji her kes ra em qanîtî bikin, û baxusûs ji mala ehlî îmanê buoşan ra.

¹¹ Mêze kin, bi çawan harfan mi nivîsand ji we ra bi destê xo. ¹² Wan ko dixwazin ji alîê gowdaê dîlber bêne xuya in, wan wê zoj dîkin ko hûn sûnet bibin, tenê ko ji boy xaçê Îsaê néyin qawarandin. ¹³ Zîra wan ko sûnet bûne, wan nomosê îcra nakin, lê dixwazin ko hûn sûnet bin ko wan bi gowdaê wê pasna xo bidin. ¹⁴ Hama ez, haşá ko pasna xo bidim, lê tenê bi xaçê Rabbê me Îsa el Mesîhê, ko bi awî dinê ji mi ra xaç bûe, û e jî dinê ra. ¹⁵ Zîra bi Îsa el Mesîhê né sûnet tiştê e û ne jî sûnetsîzîti; lê maxlûqê nû bûn tiştê e. ¹⁶ Ê her kes ko li gora qanûnê diçon, ji wan ra û ji Xodê Îsrayel ra selamet û merhamet bibe. ¹⁷ Ji vî pê ve yekê ji mi ra zahmet bra néde, zîra ez nîşanê brîna Rabb Mesîhê li ser gowdaê xo dikînim. ¹⁸ Ey! brêan, înyetê Rabbê me Îsa el Mesîhê bi Rûhê we bibe; Amîn.



MEKTÛBÊ Ê RESÛLÊ BOXOS JI YEPESOSLÎAN RA

SER 1

¹ Boxos bi îradetê Xodê resûlê Îsa el Mesîhê, li Yepesos da bûn ji azîzan ra û bi Îsa el Mesîhê ji îtîqatlîan ra. ² Ji we ra ji Bavê me ji Xodê û ji Rabb Îsa el Mesîhê înayet û selamet bibe.

³ Mübarek bibe Xodê û Bavê Rabbê me Îsa el Mesîhê, aw ko me li meskânê azümanan bi Îsaê bi her rûhanî bereketê me bereket kir. ⁴ Çawan ko me ji îbtîda temel bûnê dinê bi awî bijart, ko li ber wî em bi muhabetê azîz û bê qusûr bibin. ⁵ Û ji awul da me taqdîr kir ji xo ra oxul bûn ra bi destê Îsa el Mesîhê, li gora xoşnûdîtîê îradetê xo. ⁶ Ji medha celîl înayetê xo, ko bi awî me bi destê delalîê ji înayet ra nayîl kir. ⁷ Ko bi awî bi destê xuynê wî, ji fîda ra yanî li gora xvanîmetê înayetê ji afwîtîê suçan ra em malîk in. ⁸ Ko aw ji me ra, bi her îlm û fîrasetê zêde kir. ⁹ Û ji me ra li Xodê çawan ko nîyet kir li gora rîzaê xo, sirra îradetê xo ji me ra da zanîn. ¹⁰ Hata ko li temam bûnê zemanan li gora tertîbê her tiştê, gerek li azüman da gerek li [459] ser ardê bûn tiştan bi Îsaê li yek cî bîne. ¹¹ Li wî da ko bi awî em mîras girtin li gora müradê îradetê xo li gora tedbîrê her tiştê îcra kroxê bi taqdîr bûnê. ¹² Em ji Îsa ra ji awul da umud kroxan, ji boy medha celalê bibin. ¹³ Li ser ê kê ko hûn jî umud kirin, gava ko bihîsdin söza doxritîê, yanî încîlê xelasê wê; ji awî bi îman anînê bi Azîz Rûhê wadê hûn mûhûr bûn. ¹⁴ Ko aw hata îcra bûnê hati qazanc bûn fîdayê ji boy merha celalê wî, geregê mîrasê me e.

¹⁵ Nua gava ko mi jî bihîsd îmanê wê ko li ser Îsa Rabbê me e, û li ser hemî azîzan bûn muhabetê we. ¹⁶ We li duwaet mi da bi zîkr kirinê, ji boy we şîkir kirinê feraxet nakin. ¹⁷ Hata ko Xodê Rabbê me Îsa el Mesîhê, Bavê celalê, awî ji xusûsê zanînê ji we ra Îlm û rûhê îlhamê bide. ¹⁸ Û çahvê dilê we rohnî bibe, ko bizanin, umudê dawetê wî çi? e; û li nav azîzan xanîmetê celalê mîrasê wî çi? e. ¹⁹ Hem li gora amelê qudretê quwwetê wî, ji me ji îtîqatlîan ra ji hadê zêde azametê quwwetê wî çi? e. ²⁰ Aw quwwet ko li ser Îsaê amel kir; gava ko awî ji mirîan rakir; û awî da ronîşdin li meskânê azüman da li alîê saxê xo. ²¹ Li ser hemî hûkmetê û saltanatê, û quwwetê û zabîtîê, û li ser hemî navan ko tê gazî bûn, tenê li dinê han da ná, lê li aw

dinê de ko dê bê. ²² Û her tişt li bin lingê wî danî û awî li ser her tiştan serê kîlîsayê danî. ²³ Ko av tenê wî e, temamê wî ko tiji diki hemîan li nav hemî tiştan.

[460] SER 2

¹ Û hûn ko li nav suçan da û günean miribûn, awî wê ganî kir. ² Ko li nav wan da bi zemanan hûn diçobûn bi rêya dinêya han; li gora aw rûh ko nua li hindûra îtaatsiz welatan dişixule. ³ Li wan da ko bi zemanan em hemîan digerîabûn li gora arzûê tenê me, û îradetê tenê û fikrê xo em dikir û weka başqasîan ji tabîatê kureî xazabê em bûn. ⁴ Lakîn Xodê ko xanî e bi merhametê, li gora azîm muhabetê xo bi awî ko me heband, ⁵ Gava ko em li suçan da miribûn me bi Îsaê ganî kir (bi înetê hûn xelas bûn.) ⁶ Û me tev rakir, û li meskîna azûman da bi tevî Îsa el Mesîhê da ronîşdin. ⁷ Hata li aw asîran ko tê, bi Îsa el Mesîhê, ji hedê zêde xanîmetê înetê xo nîşan bide, bi aw xoşnûdîtî ko bi Îsa el Mesîhê ji me ra nîşan da. ⁸ Zîra bi înetê bi destê³⁷⁸ îmanê hûn xelas bûne; û vîa ne ji we e, lê baxşîşê Xodê e. ⁹ Ji amelê nin e, ko yekê pasna xo nede. ¹⁰ Zîra em amelê wî ne; bi Îsa el Mesîhê em xalq bûne ji boy amelê qancan, ko ji boy wan ji berê Xodê me hazir kir, ko li wan da em bigerin.

¹¹ Ji boy vîa li bîra xo bînin, ko hûn li zemankî bi ten tayîfa bûoxan, li gora tenê bi dest hati çêbûn sûnet ji hati gazî bûoxan, sûnetsizîtî hati gazî bûoxan. ¹² Ko li zeman da hûn bê Îsa û ji cûmhûrê Îsrayelê xarîb û ji ahdê wadê yabancî û umudsuz û li dinê da bê Xodê bûn. ¹³ Hama nua bi Îsa el Mesîhê, hûn ko wextkî dîr bûn, bi xuy-[461] nê Îsaê nêz bûn. ¹⁴ Zîra selametê me aw e, aw ko herduan yek kir; û li mabeyn da cîê kroş dîwarê, yanî bi hevûdu bûn dijmînîtî bi tenê xo heloşand. ¹⁵ Û emran hati bûn nomosê tenbîhê batal kir; hata ko li xo da herdu jî meşuvkî nû bi xalq kirinê, selamet îhdas bike. ¹⁶ Û herdu jî yek gowda kirinê bi Xodê li hev bîne bi xaç, çima ko bi awî adawetê helak kir. ¹⁷ Û hat selamet mûjde kir ji we ra, ko dîr bûn û ji wan ra ko nêz bûn. ¹⁸ Zîra bi destê wî em herduan jî bi yek Rûh ji Bav ra nêz bûn ra euqsatê me heye. ¹⁹ Nua ji vî pê ve hênî hûn yabancî û mûsafîr nin in, lê hemşerîê azîzan û kufletê Xodê nin. ²⁰ Çûnkî li ser hîmê resûlan û peyemberan hûn hatin temel bûn, ko serê rukneê wî Îsa el Mesîh e. ²¹ Bi awî temel gîjk li yek cî da bi uydurmîş kirinê mezin dibe bi Rabb dacarkî azîz dibe. ²² Ko bi awî hûn jî, li yek cî da çêdibin, wusan ko bi Rûh meskînê Xodê bibin.

³⁷⁸ Di metnê de *eestê*.

SER 3

¹ Nua ez Boḡos ji boy wé tayîfan mahbûsê Îsa el Mesîhê. ² Ko helbet ji mi ra ji boy wé hati dayin îdareê îneyetê Xodê wé bihîsdin. ³ Ko ji mi ra sirrê han bi îlhamê beyan kir, çawan ko ji awul da mi ji we ra muxtarî nivîsand, ⁴ Ko awî bi xondanê li sirra Îsa da fehmê min dikârî zanin. ⁵ Ko li başqa asîran da ji kureş meşûvan ra xuyayî nêbû; çawan ko nua bi Rûh el Quds hati beyan bûn ji azîz Resûl û peyemberê wî ra. ⁶ Yanî ko tayîfan bi Îsa warîs û li yek ceseda, bi destê Încîlê [462] hîssedarê wadê wî bibin. ⁷ Ji wî ra ko ez xizmetcî bûm, li gora baxşîşê îneyetê Xodê, ko ji mi ra hati dayin, bi amelê quwwetê wî. ⁸ Îneyetê han ji mi ra, ji ednayê azîzan ra hati dayin, ko bê teftîş xanîmetê Îsa ji tayîfan ra mûjde bikim. ⁹ Ê hemîan rohnî kirinê, ko bizanin erki çî? e îdareê sirrê han, ko ji awul da veşartî bû li ba Xodê, aw ko her tişt xalq kir. ¹⁰ Hata ko nua bi destê kîlîsaê li meskâna azûman da ji saltanat ra û ji hükûmetan ra türlü türlü îlmê Xodê aşîkâr bibe. ¹¹ Li gora ebedî taqdîrê wî, ko kir bi destê Rabbê me Îsa el Mesîhê. ¹² Bi awî serbestî me heye jê ra nêz bûnê bi îtimad kirinê jê ra îman anînê.

¹³ Nua dîleg dikim ko hûn acîz nebin ji semedê sizletê min ko boy wé e û îzzetê we ne. ¹⁴ Ji boy vîa li ser çökan tîm li ber Bavê Îsa el Mesîh Rabbê me. ¹⁵ ko li azûman da û li ser ardê her sînsîle jê tîm gazî kirin. ¹⁶ Dîleg dikim ko ji we ra bide li gora xanî celalê xo, bi qudretê pêş bin bi Rûha wî li hindur meşûvê nû da. ¹⁷ Ko Îsa bi îman li dilê we da sakîn bibe û hûn bi muhabetê qurm bigirin û temelenmîş bibin. ¹⁸ Ko qadîr bîn bi tevî hemî azîzan fehm kirinê, erki çî e berîtî û drêjîtî û kurtî û bilindîtî, ¹⁹ Yanî bi bizanîbin muhabetê Îsaê ko ji aqil dûr e hata ko bi hemî kemalîyetê Xodê tîja bibin. ²⁰ Ê li me da li gora amel kroş quwwetê ji aw tiştan ko em dîleg dikin, Ya dîşûmîş dibim, li her xusûs da ji haddê zêde kirinê qadîr bûox ra, ²¹ Jê ra bi destê Îsa el Mesîhê li kîlîse da, li hemî dewrê ebed il ebedê hamd bibe; amîn.

[463] SER 4

1 Nua ji we dîleg dikim, ez ko ji boy Rabb hatime gredan, ko hûn wusan biçun, çawan ko cayîz e ji dawetê we ra, bi awî ko hûn hatin gazî bûn. 2 Bi hemî gönül alçaqîtiê û bi mahcûbîti; bi sabr, û bi hevûdu ra bi muhabetê tehamül bikin. 3 Caht bikin îtîfaqîtiê Rûh el Qudsê bi grêdanê selametê hûn bipên 4 yek ten û yek rûh, çawan ko hûn hatin gazî bûn li gora dawetê wê bi yek umudê. 5 Rabb yek e û îman yek, tahfil yek e. 6 Yek e Xodê û Bavê hemîan, ko li ser hemîan, û bi hemîan, li nav me hemîan e. 7 Lakîn ji me her yekê ra înayet hatîe dayin bi ölçîê baxşîşê Îsaê. 8 Ji boy vîa dibê ko, Li bilindan rabû, esîrîtiê, esîr girt, ji merûvan ra hedîan da. 9 Aw rabûn gotin çî e, tenê ko aw awul li taqa jêrînê dinê hati xwarî. 10 Aw ko hati xwarî, hemen aw brxo e, ko ji hemî azûmanan jor rabû, ko her tişt tîjî bike. 11 Ê awî tayîn kir, hinikan resûlan, hinik peyxemberan, hinik mûjdeçîan, hinikan jî şivan û xocayan. 12 Ji boy kemalîyetê azîzan, ji boy amelê xizmetê; ji boy mamûrîtiê tenê Îsaê. 13 Hata ko em hemî jî bigên li îman û li îtîfaqîtiê zanînê kure Xodê li tekmiîl merûv bûn ra, li tekmiîlîtiê çaxê Îsaê. 14 Hata ko hênî ji boy fendê xapandinê bi ferzandîtiê, bi hîleê merûvan, bi hemî bayê talîmê hati hijikandin û wergerantîn masûman em nebin. 15 Lê bi muhabetê bi doxrî gotinê her tişt li wî da em zêde bikin, ko aw, yanî Îsa ser e. 16 Ko hemî gowda ji wî, bi hemî [464] yardum kroş parçayan bi uydurmîş û îlhaq bûnê, li gora her yek amelê ölçîê azayê bi muhabetê, ji boy mamûr bûnê xo, mezin bûnê wücûdê îcra dike.

17 Nua vîa dibê û bi Rabb şehadet dikim, ko hûn carkî wusan neçin, çawan ko aw tayîfanê dînan diçun, li batil aqlê xo da. 18 Ko li wan da bûn ji semedê cahîltîê bi korîtiê dilê wan, tarî aqlê wan qaplamîş kirîe, çima ko ji hayatê Xodê xarîb bûne. 19 Ko wan bi sersem bûnê, aw xo dani ji edebsizîti ra, bi tamahkârîtiê, her türlü nepakîti bi şîxulandinê. 20 Lakîn hûn ahwa hîn nebûn Îsa e. 21 Erki li ser wî hûn bihîsdin û jê talîm bûn, çawan ko doxrîti li nav Mesîh da e. 22 Ko hûn ji ser xo tahzî bikin aw li gora awul çvundînê wê bûn merûvê kevn, aw derewî bi arzûê tenê hati fesad bûn. 23 Ê bi rûhê aqlê xo nû bin. 24 Ê bi azîzîtiê sadaqatê û doxrîtiê, li gora xodê hati xalq bûn, merûvê nû li ser xo wergirin. 25 Ji boy aw derewî bi redd kirinê, hûn her yekê bi hevalê xo doxrîti xaber bidin; çima ko em azayê hevûdu ne. 26 Erki hûn sê bêne, güne meşîxulin; ro li ser haridîê wê bra ava nêçe. 27 Ê ji Şeytan ra cî medin.

28 Aw ko dizî dikir, hênî bra dizî néke, lê bi destê xo şîxule xayr bi amel kirinê emek bikşîne, hata ko qadîr bibe ji mühtacan ra bide. 29 Ji devê wê qat çürüg

söz derneye, lê ji mamûr kirin ra hati îqtîza bûn xaberkî qanc heye; hata ko ji bihîsdanrojan ra lutf bide. ³⁷⁹ 30 Ê azîz Rûhê Xodê bi qasawet mekin; ko bi awî ji boy roya xelasê hûn hatin mûhr bûn. 31 Hemî tahlîtî û xirs û xazab û qîrîn [465] û küfr, bi hemî kötütîê tév³⁸⁰ ji wê bê helandin. 32 Ê bi hevûdu ra xoşnûd bibin, merhametlî, ji hevûdu ra afw kroş, çawan ko Xodê bi Îsa ji me ra afw kir.

SER 5

1 Nua weka kurêt delalî ji Xodê ra bengzemîş bibin. 2 Ê li muhabet da herin, çawan ko Îsa jî me heband, û aw xo li uxura me da da ji xodê ra ji boy bîna xoş hedîye û qurban bû. 3 Hama navî zîyanê û her türlo napakîtîê, yaxod tamakârîtîê li nava we da neyê gotin; çawan ko ji azîzan ra yaqîşmîş dibe. 4 Ê tiştê rezaletan, yaxod sözê şaşxunîtîê, yaxod qaşmerîtî, ko cayîz nin e, îlla şikir bibe. 5 Zîra vîa bizanibin ko qat mîrasê zînakârê, ya murdarê, ya tamakârê, ko putperest e, li padîşahîtîê Îsaê, û Xodê da tunne. 6 Nebe ko yekê we bi bixapîne³⁸¹ bi çurug sözan, zîra ji boy tiştê hana xazebê Xodê tê li ser kurêt îtaatsizîtan. 7 Nua ji wan ra hîsedar mebin. [8] (Zîra faraza zemankî hûn tahrî bûn, lakîn nua hûn rohnî ne bi Rabb, weka kurêt rohnîê herin.) 9 Zîra yemîşê rohnîê li her qancîtî da û li sadaqat da û li doxrîtî da e. 10 Teftîş bikin ji Xodê ra maqbûl çî? e. 11 Ê ji amelê meywesîz tarîê îlhaq mebin, lê baxusûs wan tazîr bikin. 12 Zîra li wan da li dizîka hati şixulî tviştan, gotin bîle şerm e. 13 Hama hati tazîr bûn tiştan bi destê rohnîê beyan dibe zîra hati beyan bûn tiştan hemî rohnî e. 14 Ji boy vîa dibê, Ey! li xew da çûndoş rabe, û ji [466] mirîan ganî be, û Îsa ji ta ra dê rohnî bibe.

15 Nua mêze kin ko çawan bi dîqatê hûn hen in, ná weka aqilsizan. 16 Lê weka alîman, wextê bi kirin çima ko royan yaramaz in. 17 Ji boy vîa aqilsîz mebin, lê bizanin erki çî e meramê Xodê. 18 Ê bi mey serxoş mebin, li wî da ko murdarîtî heye, lê bi Rûh tîja bin. 19 Ê hûn li nav xo da zabûran û îlahîan û rûhanî bereketan bixoynin, bistêrin û zabûr bibên ji Rabb ra li dilê xo da. 20 Ê dayîma ji boy her tişt ji Xodê ra û Bav ra bi navê Rabbê me Îsa el Mesîhê şikir bikin.

21 Hûn ji hevûdu ra bi tîrsa Îsaê mütîh bibin. 22 Jinan bra ji mêmê xo ra mütîh bibin weka ko ji Rabb ra. 23 Zîra serê jin mêm e, çawan ko Îsa jî serê kîlîsa e û xelasê

³⁷⁹ Di metnê de *so* (nîşeya wergêrê).

³⁸⁰ Di metnê de *tev*.

³⁸¹ Di metnê de *bi bixapîne*.

wücüdê aw e. ²⁴ Nua çawan ko kîlîsa ji Îsa ra mütîh diba, jinan jî li her tişt da ji mêrê xo ra bra wusan bibin. ²⁵ Ey! mêran, jina xo bihebînin, çawan ko Îsa jî kîlîsaê heband û li uxura wî da aw xo teslîm kir. ²⁶ hata ko awî bi şuştîne avê bi paqij kirinê bi destê kelamê azîz bike. ²⁷ Ko aw kîlîsaê li ber bi îzzet dibe sekinandin, ko lekekî wî, yaxod murdarîtkî, yaxod başqa tiştî wî wusan tunne be, wusan azîz û bê qusûr bibe. ²⁸ Wusan jî lazim e ko mêran jina xo bihebînin, weka wücûda xo, aw ko jina xo dihebîne wücüdê xo bihebîne. ²⁹ Zîra yekê qat ji wücüdê xo îkrah nake, lê awî xoyî dike û mêze dike, çawan ko Îsa jî kîlîsaê. ³⁰ Zîra em ji wücüdê wî aza nin ji wücüdê wî û ji azîyê wî nin. ³¹ Ji wî semedê, meruv bav û dîyê xo dê terg bike, û li jina xo bizaliqa, û her- [467] duyan yek ten dê bibin. ³² Sirra han mezin e, hama ez ji boy Îsa û ji boy kîlîsaê dibêm nua hûn xo jî her yekê jina xo ahwa, weka nefsa bihebîne; û jin bra ji mêrê xo bitirse.

SER 6

¹ Ey ewladan, ji bav û dîyê xo ra mütîh bin bi Rabb zîra vîa haq e. ² Ji bav û dîyê xo ra îzzet bike, ko bi wad tenbîhê awulîn e. ³ Ko ji ta ra xayr bibe, û li ser ardê ömra ta dirêj bibe. ⁴ Ê hûn, ey! bavan, kurê xo medin sû kirin; lê wan bi talîm û bi nasihatê Xodê mezin bikin. ⁵ Ê hûn eyê qulan, mütîh bin ji tenavî axayêt xo ra, bi tirs û bi lertzîti, bi safitî dilê xo, weka ko ji Îsa ra. ⁶ Na weka xoşnûd kroş li ber çahvan bi xizmet kirinê, lê weka xizmetcîê Îsa, bi dil îradetê Xodê bi kirinê. ⁷ Ji meruvan ra ná, îlla weka ji Rabb ra bi xoşnûdîtî³⁸² xizmet bikin. ⁸ Bizanin ko her yekê çi xayr ko bike, awî dê ji Xodê bistîne, erki qul bibe, erki azad. ⁹ Ê hûn jî, ey! efendîan avî bikin ji wan ra, û xazabê terk bikin, û bizanin ko, heman efendî we jî û ewan jî azüman da e, û li ber wî xatr mêze kirin tunne.

¹⁰ Hênî ji vî pê ve, ey! brêan, bi Rabb û bi qudretê quwwetê wî pê bin. ¹¹ Sîlahê Xodê li ser xo wergirin ko qadîr bin li ser fendê Şeytanê sekinandinê. ¹² Çima ko seferê me bi xuyna wücûd nin e, lê bi saltanatan û bi hûkmetan e; bi zabîtetî dinê han tahrî e, li nava azümanîan bûn bi yaramaz rûhan e. ¹³ Ji boy vîa li ser xo bistînin sîlahê Xodê, ko qadîr [468] bibin li roya yaramazîti da li ber wî sekinandinê, û paşê her tiştê tamam kirinê qawî sekinandinê. ¹⁴ Nua tiştê xo bi doxrîtî hati grêdan bisekinin; û zirxa sadaqatê wergirin. ¹⁵ Ê li pê kin hazirîti selametê încîlê.

³⁸² Di metnê de xoşnûdîtî (nişeya wergêrê).

¹⁶ Û li ser hemîan martalê îmanê bistînin, ko bi awî hûn dê qadîr bibin hemî tîrêt yaramazê bi bişamazin. ¹⁷ Û kûlahê hasinînê xelasê bistînin, hem şûrê Rûhê, ko kelimullah e. ¹⁸ Bi hemî nimêc û bi nîyaz her wext nimêc bikin bi rûh, û li ser tiştê han bi temam dayax kirinê û bi heşar bûnê bi nîyazan, ji boy hemî azîzan. ¹⁹ Ji boy mi jî ko ji mi ra kelim bê dayin ko devê xo bi serbestî vekim, ji boy sirra încîlê beyan kirinê. ²⁰ Ko ji boy awî li zencîr da elçîtî dikim, ko bi awî serbestî min bibe ji xaberdan ra, çawan ko lazim e.

²¹ Lakîn ko hûn jî bizanibin li ser min erki ez çî dişixulim, her tiştê dê ji we ra nîşan bide, Dükîdos muhabetlî bra û emîn xizmetcî bi Rabb. ²² Awî ko maxsûs ji boy tiştê han mi ji we ra şîyand ko hûn ser mi bizanin, û awî dilê we pîrs bike.

²³ Selamet ji brêan ra û muhabet bi tevî îmanê, ji Bav Xodê û ji Rabb Îsa el Mesîhê. ²⁴ Înayet bi aw hemîan, wan ko bi xûlûsê pak Rabbê me Îsa el Mesîhê dihebînin, Amîn.

MEKTÛBÊ Ê RESÛLÊ BOXOS JI FÎLÎBBELÎAN RA

SER 1

¹ Boxos û Dîmoteos qulêt Îsa el Mesîhê; bi Îsa el Mesîhê ji hemî azîzan ra ko li alîê Pîlîbbelîa da ne, bi yebîsgobosan û sargavağan. ² Ji we ra ji alîê Bavê me Xodê û ji Îsa el Mesîhê îneyet û selamet bibe.

³ Şikir dikim ji Xodê ra her caran, ko bîra xo tînim, ⁴ Û dayîma ji boy we hemîan li her nîyazê mi da, bi şazîtî nîyaz dikim. ⁵ Ji Încîl ra ji boy îlhaq bûnê wê, ji roya awulê hata nua; ⁶ Ji xusûsê han ra ez qanmîş bûme, erki aw ko li nav wê şîxulkî qanc dest kir, hata li roya Îsa el Mesîhê dê îcra bike. ⁷ Çawan ko ji mi ra ji derhaqê wê hemîan li fikra han da bûn haq e, çima ko ez wê li dilê xo dipê, gerek li grêdanê mi da û gerek li cewabê Încîl da û li îsbat da, hûn hemîan hîssedarê îneyetê ne. ⁸ Zîra Xodê şahîdê min e ko, çawan ez hasret dikînim li ser wê hemîan, bi rahma Îsa el Mesîhê. ⁹ Û dîlegê han dikim ko, muhabetê wê li îlm da û li fehîm da hênî pîr zêde bibe. ¹⁰ Ko hûn [470] aw ko qanc e ayirmîş bikin, hata li roya Îsaê û bi xûlûsê pak û bê xwar bûn bibin. ¹¹ Ji boy şan û medha Xodê bi aw yemîşê ko bi destê Îsa el Mesîhê dibe tîja bibin.

¹² Û dixwazim ey! brêan, hûn bizanin ko, hal û kêfîyetê min hênî zêde ji pêş çûndinê încîl ra sebeb bû. ¹³ Hata ko girê min, ko ji boy Mesîhê ne, li hemî dîwanxane da û ji başqa hemîan ra beyan bû. ¹⁴ Û bi Rabb ji brêan pîran, cesaret sendin ji grêdanê min kelamullahê bê tîrs gotinê hênî zêde cesaret dîkin. ¹⁵ Bîra hinikan ji boy hasedê û qawxayê û hinikan jî ji xoşnûdîtî dil Mesîhê waz dîkin. ¹⁶ Vanan ji boy muhabetê dîkin çima ko, dizanin ko ez ji boy cewabê încîlê tayîn bûme. ¹⁷ Hama wan Mesîhê ji boy nîzayê waz dîkin, xûlûsane nin e, îlla bi aw meramê ko li grêt mi da sixlet zêde bikin. ¹⁸ Nua çi? e, bi çi tarz ko dibe bra bibe, erki bi sebeb, û erki bi doxrîtî, Îsa tê waz bûn, û li ser vîa şaz dibim, û dê şaz jî bibim. ¹⁹ Û ez dizanim ko vîa ji mi ra, bi dowayê wê û bi yardumê Rûhê Îsa el Mesîhê ji xelasê mi ra sebebî dê bibe. ²⁰ Li gora hasret û umudê min, ko qat bi tîştî bi şerm nebin, lê bi tekmlî cesaretê, çawan ko li her wext, wusan jî nua, Îsa li wûcûdê mi da dê bi îzzet bibe, erki bi ömrê min, erki bi mirinê min. ²¹ Zîra ji boy min ömrê kirin Îsa e û mirin kêr e. ²² Lê erki li wûcûd da ömrê kirin meyweê min tîne, hênî nizanim kîjanê bijêrim.

23 Lakîn ji aw herdu tiştan sixilmîş dibim, yanî arzûê min, mirin û bi Îsa bûn da e, zîra aw ji mi ra hênî pîr qanc e. 24 Lakîn li wücûd da mayin, ji [471] derhaqê we hênî iqtîza e. 25 Ê li tiştê han da bi qanmîş bûnê, bizanin ko bi we hemîan dê bisekinin û bimînin ko hûn li îman da li pêş biçun û şaz bibin. 26 Ko îftîxarê wê li ser min hênî zêde bibe bi Îsa el Mesîhê, bi sebebê dîsa ji we ra hatinê min.

27 Ancax çawan ko ji încîlê Îsa ra cayîz e, wusan hejrin, hata ko ez bêm û we bibînim û yaxod li dûr bibim³⁸³, li ser we bibihêm ko hûn qawî disekinin li yek rûh da, û li yek can da cehd dîkin ji boy îmanê încîlê. 28 Ê qat bi yek tiştê metirsîn ji wan ko qarşî disekinin ko ji wan ra ji boy helakê û ji we ra ji boy xelasê îsbatkî e. 29 Ê vîa ji Xodê e, çima ko ji we ra ji boy Îsaê vîa keremkî e, na tenê hûn jê ra îman bînin, lê ji boy wî eleman jî bikînin. 30 Ê hûn heman li aw qawxa da bin ko li ser mi dîn û nua li ser min dibihên.

SER 2

1 Nua erki bi Îsa dil pîrsinkî heye, erki sefayê muhabetê, erki îlhaqîtkî rûhê, erki rahm û merhametkî, 2 Şazîtî min hûn temam bikin, ko li yek fikir da bibin, muhabetê we yek, can yek, yek fikrê we bibe. 3 Qat tiştê bi nîza, yaxod bi batil îftîxarê ji xo bilind hasab bikin. 4 Tenê li fayde xo mêze mekin, lê her kes faydey hevalê xo jî. 5 Zîra li we da heman fikrê han bra bibe ko li Îsa el Mesîh da hebû. 6 Ko aw li sûretê Xodê da bûn bi Xodê beraber bûn, weka tiştê qapmîş kirinê hasab nekir. 7 Lakîn aw xo edna kir, sûretê qulê [472] send, li şekla merûvan ket, û li şekl da weka merûv bi hati dîtinê, 8 Aw xo alçaq kir, hata li mirinê mütîh bû, û aw jî, mirinê xaçê. 9 Ji boy awî Xodê jî awî pîr bilind kir, û jê ra navkî da ko ji hemî navan jor e. 10 Hata ko ji navê Mesîh ra hemî çokan çok bidin, ê wîan ko li azûman da ne, ê wan ko li ser ardê ne, ê wan ko li bin ardê ne. 11 Ê hemî zimanan îqrar bikin ko ji boy şana Pederullahê, Îsa el Mesîh Rabb e. 12 Nua, ey! delalîet min, çawan ko her wext hûn îtaat kirin ná gava li ba we da bûm, lê baxusûs hênî pêtir nua ko li ba we da nin in, xelasê xo bi tîrs û bi lerzîtî îcra bikin. 13 Zîra li we da, gerek xosdin gerek şixulandin, li gora rîzayê amel kroş Xodê e. 14 Her tişt bê gazinan û bê mûcadelaê bikin. 15 Ko hûn bibin bê ayb û bê zarar, kureş Xodê bê gazinan, li orta xwar û ters neslê da, ko li nav wan da li dinê da weka nûran hûn rohnî didin. 16 Kelamê hayatê bi

³⁸³ Di metnê de *bibêm* (nîşeya wergêrê).

qawî girtinê ji boy ji mi ra îftîxar bûnê li roya Îsaê, erki li nafîle cî da ez nâcûm, û li nafîle cî da nâxabitum. ¹⁷ Lakîn li qurbana îmanê wê û xizmetê, weka pêşkêşê şerbetê birijim jî, şaz dibim û bi wê hemîan şaz dibim, ¹⁸ Wusan jî hûn bin, û bi mi ra şaz bin.

¹⁹ Nua bi Rabb Mesîhê, umud dikim ko Dîmoteosê zû ve ji we ra dê bişeyînim, ko dilê mi jî rahat bibe, gava ko halê wê bizanim. ²⁰ Zîra weka wî li gora dilê min yekê tunne, ko xûlûsane ji we ra muqayet bibe. ²¹ Zîra hemî jî ji boy nefse xo aramiş dikin, û ná e Îsa e Mesîhê. ²² Lakîn tercûbeê wî dizanin, ko li încîl da bi mi ra weka bav bi kur, xizmet kir. ²³ Nua [473] umud dikim awî bişeyînim, zû ve gava ko halê xo ez bizanim. ²⁴ Lakîn li Rabb da îfîmatê min heye, ko ez bi xo jî dê zû ve bêm. ²⁵ Hama mi îqtîza hasab kir ko brêê min, îşdaşê min, û cengdaşê min, resûlê wê û xizmetcîê muhtacê min bûox Yebaprofîdosê ji we ra bişeyînim. ²⁶ Zîra aw ji boy wê hemîan hasret dikişandibû, û qasawet dikir, ko hûn bihîsdibûn, erki aw naxoş bû. ²⁷ Ê bîra aw naxoş bû nêza mirinê, lakîn Xodê merhamet kir jê ra, na tenê jê ra, lê ji mi ra jî, ko qasawet li ser qasawetê min tunnebe. ²⁸ Nua mi wî alel acele şîyand ko, awî hûn bi dîsa dîtinê şaz bin, ji mi ra jî hindik qasawet bibe. ²⁹ Nua awî bi Rabb bi her şazîtî qabûl bikin, û ahwa merûvan mûteber hasab bikin. ³⁰ Zîra ji boy îşê Îsaê hata li mirinê nêz bû û ji boy kêmanîtî xizmatê we ji mi ra tîja kirinê, ji nefse xo ra muqayet nebû.

SER 3

¹ Nua, ey! brêê min, bi Rabb şaz bin, heman av tîştan ji we ra nivîsandin ji mi ra acizîtî nin e, û ji we ra emîntî e. ² Ji san saqin bin, ji yaramaz palayan saqin bin, ji derewî sûnetê saqin bin. ³ Zîra sûnet em in, ko bi rûh ji Xodê ra îbadet dikin, û bi Îsa el Mesîhê îftîxarê me heye, û îftîxarê me li ser wücûd nin e. ⁴ Faraza a mi jî heman aw îftîxar heye li ser wücûd, erki başqasîkî taxmîn dike erki îftîxarê wî heye li ser wücûd hênî pîr a min. ⁵ Li haşt royan da sûnet bûm, ji mîlletê Îsrayelê, ji sînsîlê Penîamînê, Îb- [474] ranî ji Îbranî zam, li gora nomosê farîsî me. ⁶ Ji alîê xayretê kîlîsayê mi diqawarand, ji alîê sadaqatê nomosê bê qusûr bûm. ⁷ Lakîn aw tîştan ko ji mi ra kêr bûn, ji boy Îsaê mi zarar hasiband. ⁸ Hama ez bîra me, ji boy ala îlmê Rabbê min Îsa el Mesîhê, her tîşt jî zarar dihasibînim, û ji boy awî ji her tîşt mahrûm, û naci hasab dikim hata ko Îsa qazanc bikim. ⁹ Ê wî da bêm dîtin, na li gora nomosê bi sadaqatê min, lê bi îmanê Îsa li gora sadaqatê, yanî aw ko ji Xodê e bi îman. ¹⁰ Ko

awî hem quwwetê qiyamê wî, û îlhaqîttî elemêt wî fehm bikim, û li sûretê mirinê wî biqevim. ¹¹ Ko bibe ji qiyama mirîan bigem. ¹² Na ko ji nua sendim, yaxod ji nua tekmîl bûme, lê li dû ketime ko bigirim, ji boy ê kê ji Îsa el Mesîhê hatim girtin. ¹³ Ey! brêan, ez xo gîhîşt taxmîn nakim, lakîn tiştê dikim, aw li şûnda bûn tiştan mi bîr kirî, û dibazim ji wan ra ko li paş da ne. ¹⁴ Bi Îsa el Mesîhê bûn ji boy nîşanê îftîxarê daweta jorînê Xodê rast li nîşanê dibazim. ¹⁵ Nua em hemîan ko tekmîl bûne li fikrê han da bibin, û erki tiştê bi başqa tarzê düşümîş bibin, aw jî Xodê ji we ra dê beyan bike. ¹⁶ Faqat li aw tişt ko em gîhîştin heman li gora aw qanonê em herin; heman li yek fikir da em bibin. ¹⁷ Ey! brêan, bengzemîşê min bibin, û çawan ko hûn me îbret girtin li ahwa çûndoşan mêze bikin. ¹⁸ Zîra pîran diçun, ji boy wan pîr caran ji we ra digotim û nua bi grînê jî dibêm, yanî ji boy dijminê xaçê Îsa. ¹⁹ Ko paşê wan helak e, ko Xodê wan zikê wan e, û îzzetê wan aybê wan e, û wan tiştê [475] dinewî fikr dikim. ²⁰ Hama wetanê me li azûman da e, ji wê ko em ji boy xelasê dipên, Rabb Îsa el Mesîhê. ²¹ Ko aw alçaşa wücûdê me li sûretê celîl wücûdê xo ketinê dê tebdîl bike, bi aw quwwetê ko qadîr e hemî jî ji xo ra tabî kirinê.

SER 4

¹ Nua, ey! delalî brêan û pîr bi arzû û şazîtî min û tacê min li Rabb da li ser tarzê han qawî bisekinin ey! delalîan.

² Ê ji Yêvoûia ra lava dikim, hem ji Sündîk ra lava dikim li Rabb da li yek fikr da bibin. ³ Ê ji ta jî rîca dikim ey! xalîs heval, ji wan ra yardum bike, wan ko bi mi ra xabitin li nav încîl da bi Gxemes û bi başqa yardumcîan tev, ko navê wan li hayat kîtabê da nivîsandinê. ⁴ Bi Rabb dayîma şaz bin, dîsa dibêm ko şaz bin. ⁵ Maxlûmîtî we ji hemî merûvan ra bra malûm bibe, Rabb nêz e, ⁶ Qat ji boy tiştê xam mekşînin, lê li nav hemî tiştan bi nimêc û bi dîleg bi tevlî şikir îfadeê we ji Xodê ra malûm bibe. ⁷ Ê selametê Xodê ko ji her aqlan bilind e dilê we û fikrê we bi Îsa el Mesîhê hifz bike. ⁸ Ji vê û pê ve, ey! brêan, çî ko bi doxrîtî e, çî ko bi haq e, çî ko bi mühteber e, çî ko bi ehlî edeb e, û çî fazîlet û medh heye aw tiştan düşümîş bikin. ⁹ Aw tiştan ko hem hûn hîn bûne, û qabûl kirine û bihîsdine, û li ser mi da we dîne, awan amel bikin, û Xodê selametê bi we ra dê bibe.

¹⁰ Ê bi Rabb ez pîr şaz bûm, ko aw xam ko [476] ji boy min we dikşandibûn nua taze bû, çawan ko we xam dikşandibûn jî, tenê ko fursendê we tunnebû. ¹¹ Ji boy tunne bûnê nabêjim, zîra ez hîn bûme qanaat kirinê li aw hal ko ez hatim dîtin. ¹²

Alçak bûn jî dizanim, û zêde bûn jî têr bûn jî birçî bûn jî kişandin ez qanc hîn bûme. ¹³ Ji her tiştan ra qadîr im bi awî ko ji mi ra quwwet da. ¹⁴ Lakîn we qanc kir ko li naçarîtîê mi da ji mi ra îlhaq bûn. ¹⁵ Hûn jî dizanin, ey! Pîlîbbean, ko îbtîdayê încîlê da, gava ko ez ji Mageţonîaê der ketim, qat kîlîsakî jî bi mi ra îlhaqîti nekir ji dayin û sendin ra, lê tenê hûn. ¹⁶ Zîra gava ko ez li Selanîk da bûm, yek du caran ji mi ra lazîm bûn tiştan we şîyand. ¹⁷ Na ko ez hedîyeê aramîş dikim, lê meyweê aramîş dikim ko li ser hasabê wê zêde bibe. ¹⁸ Nua her tiştê min heye zêde bîle heye, têr bûme, bi destê Yebaproţîdosê aw tiştan ko we şîand mi qabûl kir, ko bînkî xoş e, maqbûl qurban, ji Xodê ra maqbûl. ¹⁹ Ê Xodê min li gora xanîmetê xo, bi îzzetê li Îsa el Mesîh da her muhtacîtiê we dê tîja bike. ²⁰ Nua ji Xodê ra û ji Bavê me ra ebed il ebed hamd bibe, amîn.

²¹ Silavan bikin ji hemî azîzan ra bi Îsa el Mesîhê. ²² Ji we ra silavan dîkin aw brêan ko bi mi ra ne. ²³ Ji we ra silavan dîkin hemî azîzan, baxusûs wan ko ji mala gayserê ne. ²⁴ Înayetê Rabbê me Îsa el Mesîhê bi we hemîan bibe, amîn.

MEKTÛBÊ Ê RESÛLÊ BOXOS JI GOXOSALÎAN RA

SER 1

1 Boxos bi îradetê Xodê resûlê Îsa el Mesîhê, û Dîmoteos bra, li Goxosa da bûn ji azîzan ra, û bi Îsa ji emîn brêan ra. 2 Ji we ra ji alîê Bavê me û ji Rabb Îsa el Mesîhê înetet û selamet bibe. 3 Dayîma ji boy we bi nimêc kirinê, şikir dikim ji Xodê Bavê Rabbê me Îsa el Mesîhê.

4 Çima ko me bihîsd aw îmanê we ko li ser Îsa el Mesîh e, û aw muhabetê we ko li ser hemî azîzan e. 5 Ji boy aw umudê ko li azûman da tê veşartin, li ser ê kê ko we bihîsd ji awulê bi söza doxrîtîê încîlê. 6 Ko ji we ra gihîşt çawan ki li hemî dinê da û bi meywe dayinê zêde bibe, çawan ko li nav we da jî ji wê royê ko we bihîsd û nas kir bi doxrîtî înetetê Xodê. 7 Çawan ko hûn hîn bûn ji muhabetlî quldaşê me ji Yebaprasê, aw ko ji boy wê emîn xizmetcîkî e ji Îsa ra. 8 Ko aw jî ji me ra naql kir muhabetê we bi rûh.

9 Ji boy vîa em jî ji aw royê ko bihîsdin, em nasekinin ji boy wê nimêc kirinê, ko hûn tek- [478] mîl bibin, ji xusûsa zaninê îradetê wî, bi hemî rûhanî ilm û fehmê. 10 Ko ji Rabb ra layiq li gora hemî rîzayê wî biçin, û li hemî xayr amel da bi meywedan bûnê li zaninê Xodê da zêde bibin. 11 Ê li gora qudretê celalê wî, bi hemî quwwetê hati quwwet bûn, bi şazîtîê hemî tehamul û sabrê. 12 Bi şikir kirinê ji Bav Xodê, ko me li nûr da sakîn bûn ji nasîbê azîzan ra hîssedar kirin ra layiq kir. 13 Ko me xelas kir ji hûkmetê tahrîê, û tebdîl kir me li padîşahîê Kure wî delalîê. 14 Ko bi awî xelasê me heye bixuyne, yanî afwîtiê günêan. 15 Ko aw taswîrê nabadîd Xodê e, û zayê awulînê hemî maxlûqatan e. 16 Çima ko bi awî her tişt hati xalq bûn, çî ko li azûman da ne, çî ko li ser ardi ne, wan ko dixuyaye wan ko naxuya ne, gerek taxtan, gerek saltanatan, gerek zabîdîti, gerek hûkmetan her tişt bi awî û ji boy wî hati xalq bûn. 17 Ê aw ji hemîan awul e, û hemî jî bi awî mewcûd in. 18 Ê aw e a wücûdê, yanî serîê kîlîsayê, ko aw îbtîdayê û zayê awulînê mirîan ne hata ko ji hemîan pêş aw bibe. 19 Çima ko Bav razî bû ko hemî kemalîetê Xodêti li wî da sakîn bibe. 20 Ê bi awî hemî jî bi xo ra li hev bîna, û selamet bike bi aw xuyn ko li ser xaçê hatîe rijandin, gerek bi awan ko li ser ardê ne, gerek bi awan ko li nav azûman e.

21 Û we jî ko li zemankî xarîb bûn, û bi yaramaz amel û fikrê xo dijminan. 22 Nua li hev anî bi asil wücûdê xo bi mirin, ko we li huzûra xo da azîz û bê qusûr û bê suç bide sekinandin. 23 Erki li îman da hati temel bûn û [479] qawî bisekinin, û bê libitandin ji umudê Încîlê, ko we bihîsdin, ko li bin azûman da bûn ji hemî maxlûqatan ra hati waz bûn, ji awî ra ko ez, Boxos xizmetcî bûm. 24 Nua ez şaz im, ji boy we li ser aw eleman ko mi kişand, û kêmanîtî sixletê Îsaê li wücûdê xo da tîja dikim, Ji boy cesadê wî, ko kîlîsa e. 25 Ji awî ra ko ez xizmetcî bûm, li gora îdareê Xodê, ko ji boy we ji mi ra hati dayin, Kelamullahê tamam waz kirinê. 26 Aw sirr ko ji dewrê awulan û ji mîlletan hatibû veşartin, û nua ji azîzê wî ra beyan bû. 27 Ji wan ra ko Xodê xosd bide zaninê, erki çi e xanîmetê celalê sirrê han li nav tayîfan ko aw li we da umudê celalê Îsa e. 28 Ko awî em waz dikin, û her kes şîret dikin, û hîn dikin hemî merûvan bi hemî îman, ko her kes tamam bidin sekinandin bi Îsa el Mesîhê. 29 Û ji boy tîştê han em jî bi quwwetê li gora hati şîxulî amelê wî bi cehd kirinê, emek dikşînin.

SER 2

1 Zîra ez dixwazim ko hûn bizanin erki çawan pîr cehd dikim ji boy we û ji boy Lawotîgîan, û ji boy aw hemîan ko bi wücûd rûya min nedîne. 2 Ko dilê wan pîrs bûn bi muhabetê yek bibin, û ji tamam fehm ra ji hemî xanîmet ra bigên, yanî ji zanina sirra Bav Xodê û Îsaê. 3 Ko li nava ê kê da hemî xazîeê îlmê û zaninê hati veşartin. 4 Û vîa dibêm, hata ko yekê we bi söza weka rast xuyayinê nexapîne. 5 Ko faraza bi wücûd ji we dûr im, hama bi rûh bi we ra me, û şaz dibim gava ko [480] nîzamê we dibînim, û qawîtî aw îmanê wê ko li ser Îsa e. 6 Nua çawan ko Rabb Îsa el Mesîhê we qabûl kir, li wî da herin. 7 Û li wî da bi qurm girtinê û bi mamûr bûnê li îman da sabîtin, çawan ko hûn talîm bûn, li wî da zêde bin bi şîkr. 8 Saqîn bin nebe ko yekê we talan bike, bi feylesofîtî û bi nafiye xapandinê, ko li gora sipartinê merûvan e, û li gora adetê dinê û na weka talîmê Îsa e. 9 Zîra hemî kemalîetê Allahîtî li wî da sakîn dibe li gora wücûdê. 10 Û hûn li wî da tekmîl bûne, ko aw serê hemî saltanatan û hükmatan e. 11 Li wî da ko hûn bê dest bi sünêtê jî hûn sünêt bûn, cesedê güneê bi tahzî bûnê, bi sünêtê Îsaê. 12 Bi nexaftinê bi wî ra hûn qiyam sendin, ji quwwetê Xodê ra bi îman anînê ko awî ji mirîan rakir. 13 Û we ko li zemankî li nava qabhatan û li nava bê sünêtî wücûdê we miribûn ganî kit bi wî ra suçê me ji me ra baxş kir. 14 Û bi adet nivîsê destê ko ji me ra zid disekinîbû xarab kir, awî ji

ortayê helanî, û li ser darê xaçê bismar kir. ¹⁵ Û saltanatan û hem hükmetan tahzî kir û bi aşîkâr bi îbret kirinê; wan fahm kir.

¹⁶ Nua bra we yekê ji boy xwarinê, ya vexwarinê, ya bayramê, ya serê mahê, ya ji alîê royat şemûan hükm neke. ¹⁷ Ko wan sîê wan tiştan bûn ko dê bihatana, lakîn asil cesed ê Îsa e. ¹⁸ Nebe ki yekê we mahrûm bike ji nîşanê îftîxarê we, ko bixwaze bi gönül alçağîtî û bi îbadetê melekan, bikeve li nav aw tiştan ko nadîe, cîsmanî aqilê xo li nafiê cî da bi kîbîr bûnê. ¹⁹ Û negire Serî, [481] ji awî ko hemî gowda bi aqd û grêdanê bi îlhaq bûnê û li yek cî tev bûnê, bi mezin kirinê Xodê mezin dibe. ²⁰ Nua erki hûn bi Îsa mirin ji adetê dinê, hênî çima li dinê da weka ganîan ji ahwa qanona ra îtaat dikin bi gotinê. ²¹ Nêz mebe, tahm meke, lê mekev. ²² Ko aw hemîan ji boy fesadê ne, li gora tenbîh û talîmê ji boy fesadê ne, li gora tenbîh û talîmê meşûvan. ²³ Li wan da ko sûretkî ilmê heye, bi gönül îbadetê û bi gönül alçağîtîê, û ji gowda ra bi qiyâmîş nebûnê, lakîn na ko ji îtibarkî ra layiq in, lê ji boy gowda têr kirinê ra nin.

SER 3

¹ Nua erki hûn bi Îsa qiyam kirin tiştê jorînan aramîş bikin, li ko kî Îsa li alîê saxê Xodê rodine. ² Tiştê jorînan düşümîş bin, na aw tiştan ko li ser ardê ne. ³ Zîra hûn mirin û ömrê we bi Îsa li ba Xodê hatîe veşartin. ⁴ Gava ko hayatê me Îsa bê aşîkâr bûn, wê çaxê hûn jî bi wî dê bêne aşîkâr bûn bi îzzetê.

⁵ Nua cîsmanî azayêt xo bikujin, fahşîtîê, murdaarîtî harsê bê zabt, arzûê kotî, û tamakârîtî, ko putperezîtî e. ⁶ Ji boy wan li ser îtaatsiz ewladan xazebê Xodê tî. ⁷ Ko li zemankî hûn jî li nav wan da diçûbûn, gava ko li wan da hûn ömrê dikiribûn. ⁸ Hama nua hûn jî aw hemîan, yanî xazabê, sû hatinê, kotîtîê, dijmînan, û edebsiz xabêran ji devê xo bavên. ⁹ Ji hevûdu ra derewan mebên, meşûvê kevn bi hemî amelê xo ji ser xo tahzî kin. ¹⁰ Û meşûvê nû wergirtin, ko aw li gora tas- [482] wîrê Xaliqê li ilm da nû bûe. ¹¹ Ko li wî da, Yûnanî, ya Yehûdî tune, sünê, sünetsizîtî, acemî, tatar, qul, azadlî, tunne; lê her tişt û li hemîan da Îsa e. ¹² Nua weka hati bijartî azîzan û delalîê Xodê, li xo wergirtin, rahmê, merhametê, şîrînîtîê, gönül alçağîtîê, mahcûbîtîê, û sabrê. ¹³ Û ji hevûdu ra tahmül bikin, erki ê yekê ra li ser başqasîkî gilîkî heye, ji hevûdu ra baxş bikin, çawan ko Îsa ji we ra baxş kir, hûn jî wusan bikin. ¹⁴ Û li ser aw hemî tiştan li ser xo wergirin muhabetê, ko aw girê tekmlîtî e. ¹⁵ Û selametê Îsaê, li dilê we da padîşahîtî bike, ko hûn jê ra hatin gazî bûn bi yek gowda, û şikir kroş bibin. ¹⁶ Söza Îsaê li we da bi xanîmetê sakîn bibe, ji hevûdu ra bi

her îlmê talîm û nasîhat bikin, bi zabûran û îlahîan, û bi rûhanî îlahîan ji Xodê ra li dilê xo da bi înayetê hamd bikin. ¹⁷ Û her çi ko hûn dîkin, erki bi xaber û erki bi amel hemî jî bi navê Rabb Mesîhê bikin, ji Xodê ra û ji Bav ra bi şikir kirin bi destê wî.

¹⁸ Ey! jinan, mütêh bibin ji mêrê xo ra çawan ko bi Rabb cayîz e. ¹⁹ Ey! mêran, jinê xo bihebînin, û tahl mebin ji wan ra. ²⁰ Ey! ewladan, li her tişt da ji bav û diyetê xo ra mütêh bin, zîra li ber Xodê aw e maqbûl. ²¹ Ey! bavan, kurê xo medîn xaxeb kirin, ko bédil nebin. ²² Ey! qulan, li her tişt da ji cîsmanî azayê xo ra mütêh bin, na li ber çahvan bi xizmet kirinê, weka merûvan xoşnûd kroşan, lê bi dil safidîtî, ji Xodê bi tîrsanê. ²³ Çi ko dîkin bi dil bikin, weka ji Xodê ra û ná ji marûvan ra. ²⁴ Û bizanin ko aweza mîrasê bi Rabb dê [483] bistînin, zîra ji Rabb Îsa ra hûn xizmet dîkin. ²⁵ Hama nahaq cezayê nahaqîtî dê bistîne, û xatr mêze kirin tunne.

SER 4

¹ Ey! efendîan, ji xizmetkârê xo ra aw ko haq û rast e eda bikin, û bizanin ko efendî wê jî li azûman da heye.

² Tim li pey nimêcê bin, bi şikir kirinê li wî da bimînin. ³ Hem ji boy me ji nimêc bikin, hata ko Xodê ji me ra ji boy kelmê derî veke, ko sirra Îsaê em bêjin, ji boy awî ko hatim grêdan jî. ⁴ Ko awî beyan bikim, çawan ko ji mi ra cayîz e gotin. ⁵ Bi aql herin bi wan ko ji derwe ne, wextê bikirin. ⁶ Xaberê wê her wext bi lutf, say kî bi xoy hati terbiê bibe, ko hûn ji her yekê ra cewab dayin çawan lazim e bizanin.

⁷ Ehwalê min hemî, muhabetî brê û emîn xizmetcî û bi Rabb hati quldaş bûn Dükîgos dê beyan bike. ⁸ Awî ko ji boy tiştê han mi ji we ra şiyand, ko ehwalê me bizanin, û dilê we pîrs bike. ⁹ Bi Vonesîmos emîn û muhabetî brê ko ji we yek e wan ji we ra her tişt dê xabar bikin çi ko livir heye. ¹⁰ Silavan dike ji we ra Arîsdarkos mabûsdaşê min, û Marqos kurê brêy Parvnapasê, ko ji boy wî ji we ra tenbîh bû, erki ji we ra tî, awî qabûl bikin. ¹¹ Yesûh, hati gotan Husdos jî, ko wan ji sûnetê ne, ji boy padîşahî Xodê bi mi ra xabitoşan tenê wanan in ko wan ji mi ra dil pîrsibûn. ¹² Yebapras ko ji we yek e, ji we ra silavan dike, aw ko dayîma ji boy wê li dowî da cehd dike, hata [484] ko li hemî îradetê Xodê da tekmlî û temam bisekikin. ¹³ Zîra ji boy wî ez şehadet dikim, erki ji boy wê pîr xayret dike, û ji boy wan ko li nava Lavotîgê û Herobolîsê nin. ¹⁴ Delalî Hekîm Luqas hem Têmas ji we ra silavan dîkin. ¹⁵ Silavan bikin ji brêan ra, ko li Lavotîgîa da ne ji Nîmpas ra, û li mala wî da bûn ji

kîlîsa ʁa. ¹⁶ Gava ko mektûbê han li nav we da bê xondin, û hûn jî ji Lavoṭîgîaê hat mektûbê bixoynin. ¹⁷ Ê ji Arkîbbas ʁa bêjin, bi Rabb hati sendin ji xizmet ʁa muqayet bibe, ko awî tekmîl bikî. ¹⁸ Silavê han destê min ê Boḡosê e, girêṭ min bra li bîra we da bibin; îneyet bi we ʁa bibe; Amîn.



MEKTÛBÊ AWULÎN Ê RESÛLÊ BOXOS JI TESAXONÎGÎAN RA

SER 1

¹ Boxos, Siḡvîanos û Dîmoteos ji kîlîsâê Tesaxonîgîan ra bi Bav Xodê û bi Rabb Îsa el Mesîhê; Înayet û selamet ji we ra ji Xodê Bavê me û bi Rabb Îsa el Mesîhê. ² Em şikir dîkin ji Xodê her çax ji boy we hemîan, bi bê sekinandin we bi zîkr kirinê li nimêcê xo da. ³ Dayîma bi zîkr kirinê amelê îmanê we, û zahmetê muhabetê we, û bi Rabb Îsa el Mesîhê sabrê umudê we, li huzûra Xodê û Bavê me. ⁴ Çima ko ey! ji Xodê hati hebandin brêan, ji Xodê hati bijartîne we em zanin. ⁵ Ko Încîlê me tenê bi söz nebû ji we ra, lê bi quwwet jî û bi Rûh el Quds jî, û bi pîr keskunîtî; çawan ko hûn dîzanin jî, erki em çawan sekinin li nav wê ji boy we. ⁶ Hûn jî ji me ra û ji Rabb ra bi bengzemîş bûnê li nav pîr sixlet da hûn kelimê qabûl kirin, bi şazîtî Rûh el Qudsê. ⁷ Wusan ko hûn li Mageṭonîa da û li Akaîa da bûn ji hemî îtîqatîan ra örnek bûn. ⁸ Zîra kelimullahê ji wê na tenê li Mageṭonîaê [486] û li Akaîaê hati bela bûn îlla li Allah da bûn îmanê we li her der rabûe wusan ko qat tiştîkî ji gotin ra ji me ra hacet nema. ⁹ Zîra wan naql dîkin ji boy me ko li nav we da ketinê me çî tarz bû, û ji putan ji Xodê ra hûn çawan vegeṛîan, ko ji Ganî û ji haq Allah ra qulux bikin. ¹⁰ Ê em li hîvîê Qurê wî disekinîn ji azümanan; ko aw ji mirîan awî rakir; yanî Mesîhê, ko me xelas dike ji aw xazebê ko dê bê.

SER 2

¹ Zîra ey! brêan, hûn dîzanin ko ketinê me li nav wê nafîle nebû. ² Lakîn weka ko hûn dîzanin li Pîlîbbe da ji wî awul bi ezîyet kişandinê em serhevda jî bûn, Încîlê Xodê bi pîr cehdê ji we ra gotinê bi înayetê Xodê, me cesaret kir. ³ Zîra nasîhatê me ji xapandinê, ya ji napakîtî, ya ji hîlleê nebû. ⁴ Lê çawan ko em ji Xodê hatin bijartin û Încîlê ji me ra hati bawur bûn, wusan em xaber didin ná ji boy merûvan ra xoşnûd bûnê, lê ji Xodê ra ko dilê me teftîş dike. ⁵ Zîra me qat xaberê bi rûmetê neşîxuland, çawan ko hûn bizanin, ne jî sebebî tamakârîtî, Xodê şahîd e. ⁶ Ê ji merûvan me îzzet aramîş nekirin, né ji we, ne jî ji başqasîan. ⁷ Faraza em dikâribûn, weka resûlê Îsaê, ji we ra giranîti dayinê, lakîn em mûlayîm bûn li nev we da, çawan ko dadakî ji boy sabîet xo zahmetan dikîşîne. ⁸ Wusan jî em ji boy we hasret dikîşandibûn, na tenê

ko Încîlê Xodê ji we ra bidin lê canê xo jî, çima ko hûn delalîê me bûn. 9 Zîra ey! brêan, hûn bîra xo tînin emeg û zah- [487] matê me; ko ji we yekî ra em granîtî nadin, şev û ro bişixul kirinê, ji we ra Kelamullahê me wáz kir. 10 Hûn û Xodê ji şahîd in, çawan li nav we îtîqatlîan bi azîzîtî û sadaqat û bi bê qusûrîtîê me haraket kir. 11 Çawan hûn zanin jî ko ji we her yekê çawan ko bavkî kurêt xo; wusan em şîret dikiribûn û dilê we dipîrsîabûn. 12 Ê em şahîdîtî dikiribûn ko hûn weka ji Xodê ra layiq bûnê herin aw ko we li padişahîtîê û li îzzetê xo dawet kir. 13 Ji boy vîa em jî bê fexat kirinê şikir dîkin ji Xodê, ko ji me Kelamullahê we bihîsd û qabûl kir, na weka xaberê merûvan; lê çawan ko rastî e, weka xaberê Xodê, aw ko li nav we îtîqatlîan amel û îcra dike. 14 Zîra hûn ey! brêan, bi Îsa el Mesîhê hûn li Yehûdîstan da bûn, weka kîlîsayê Xodê bûn, zîra hûn jî ji alîê mîlletê xo, heman aw tîştan kişandin, ko wan jî ji Yehûdîan kişandin. 15 Ko wan hem Rabb Mesîhê hem peyemberêt xo kuştin, û me qewarandin, û ji çahvê Xodê rabûn, hem ji hemî merûvan ra zid in. 16 Ê me nehelin xaber bidin ji boy xelasê tayîfan, ko her şaz çapê güneyêt xo tîji bikin, û tekmîl xazeb li ser wan gihîştî e.

17 Hama em ey! brêan, bîra em ji we bi rû hinik zeman sêvî man, na bi dil, lakîn em pîr xvayret kirin, bi pîr arzûê rûya we dîtinê. 18 Ji boy av baxusûs ez Boxosê carik didu mi xosd ji we ra bêm lakîn Şeytan me nehişt. 19 Zîra umud û şazîtî û tacê îftîxarê me çi? e, li huzûra Rabb Îsa el Mesîhê, wexta hatinê wî hûn nin? in. 20 Zîra şan û şazîtîê me hûn in.

[488] SER 3

1 Ji boy avî hênî bi tehamûl nékirinê tenê li Atîna da mayinê razî bûm. 2 Ê brêê me hem xizmetcîê Xodê û li Încîlê Îsa da yardumcîê me Dîmoteosê me ji we ra şîand ko wê qawî bike, û ji boy îmanê we ji we ra dil pîrsin bike. 3 Ko li sixletê han da yekê nalibite, zîra hûn bi xo dizanin ko ji boy vîa em sekinin. 4 Zîra gava ko em li ba we da bûn jî, em ji we ra pêşîn digotibûn ko sixintîan em dê bikşînin, çawan ko bûe jî û hûn dizanin. 5 Ji boy vîa mi jî hênî bi tehamûl nékirine, mi merûv şîand îmanê wê bizanin, nébe ko tecrûbe kroş we li tecrûbe da bixe, zahmetê me nafiê bibe. 6 Lakîn nua gava ko Dîmoteos ji wêji me ra hat, û müjdeê îman û muhabetê wê ji me ra da, ko her çax me li qancîtî da bîra xo tînin, û hasret dikşînin me dîtinê, çawan ko em jî wê. 7 Ji boy vîa ey! brêan, em dil pîrsin bûn li nav hemî sixlet û sixintîê me da, bi îmanê we. 8 Zîra nua em ganî ne; erki hûn qawî bisekinin bi Rabb.

^{9,384} Zîra em çi? şikir dikârin ji Xodê ra bibin ji boy wê, ji boy aw hemî şazîtî ko em şaz dibin li huzûra Xodê ji boy wê. ¹⁰ Û li şev û ro em pîr dîleg dikin ji boy rûya wê dîtîne, û kêmânîtî îmanê we tîjî kirinê. ¹¹ Û Xodê bi xo, yanî Bavê me û Rbbê me Îsa el Mesîhê rêya me li alîê we da rast ke. ¹² Û Xodê pîr bike û zêde bike muhabetê wê li ser hevûduan, û li ser hemûan, çawan ko ê me jî li ser we heye. ¹³ Hata ko li huzûra Allah û Bavê me, li hatina Rabbê [489] me Îsa el Mesîhê bi tevî hemî azîzê xo, li azîzîtî da bê qusûr bûn ra dilê wê qawî bike.

SER 4

¹ Ji vî pê ve, ey! brêan, ji we ra em lava dikin û şîretê didin bi Rabb Mesîhê, ko ji we ra çawan çûndin lazim e û ji Xdê ra maqbûl bûn, çawan ko hûn ji me sendin li wî da hênî pîr zêde bin. ² Zîra hûn dizanin em çi tenbîhan dane ji we ra bi Rabb Îsaê; ³ Zîra îradetê Xodê vîa e, yanî azîz bûnê we, û ji zînaê dûr bisekinin. ⁴ Û ji wê her yekê bizane fraqê xo bi paqîjîtî û bi îtîbarê kesb kirinê. ⁵ Ná bi hersa arzûan çawan ko tayîfan, wan ko Xodê nas nâkin. ⁶ Ko li tiştê han da yekê ji brêê xo ra xadr û nahaqîtî néke, çima ko Xodê ji boy av hemî tiştan hayf sendox e çawan ko em ji awul da ji we ra gon û şehadetî bikin. ⁷ Zîra Xodê me ji murdarîtî ra gazî nékir; îlla ji azîzîtî ra. ⁸ Ji boy vîa red kroş, né meşuvê red dike, lê Xodê red dike, awî ko ji we ra Rûh el Qudsê xo jî da.

⁹ Û ji semedê brê hebandinê hacet nin e ji we ra tiştî nivîsandinê, zîra hûn bi xo ji Xodê hîn bûne hevûdu hebandin. ¹⁰ Û bîra tiştê han hûn dikin li nav Mageţonîa da bûn ji hemî birêan ra, lakîn ey! brêan, em ji we ra lava dikin ko hênî zêde hûn pîr bin. ¹¹ Û xayret bikin ko, li halê xo da bisekinin, û ji wê her yekê şîxulê xo bi edebê herin, û ji tiştî ra mühtac nébin.

¹² Û em naxwazin ey! brêan, ko hûn ji boy xew da çûndoxan bê xaber bibin, ko hûn qa- [490] sawet nékin weka başqasîan, wan ko umudê wan tunne. ¹³ Zîra erki em îman tînin ko Mesîh mir û qiyam kir, wusan jî Xodê li xew da çûndoxan bi Mesîhê, ji wî ra tev dê bîne. ¹⁴ Zîra vîa em bi kelimullahê ji we ra dibên ko em ko hata hatinê Rabb ganî dibînin, qat li pêş li xew da çûndoxan dê nebihurin. ¹⁵ Zîra Rabb bi xo bi emrkî azîmê bi dengê baş melekê û bi borûê Xodê ji azümanan dê bê xwari, û bi Îsa hati mirîan awul dê qiyam bistînin. ¹⁶ Paşê em jî ko ganî mane bi wan

³⁸⁴ Di metnê de 3.

tev li hawa da Rabbê qarşîlemîş kirinê, li awran da em dê bêne qapmîş bûn; û bi vê hawayê dayîma em bi Rabb dê bibin. ¹⁷ Nua bi xaberê hana ji hevûdu ra teselî bidin.

SER 5

¹ Hama ji boy zemanan û wextan ey! brêan, tu hacet nin e ji we ra nivîsandinê. ² Zîra hûn qanc zanin ko roya Xodê li şevê da weka diz wusan tê. ³ Gava ko bibên selamet û emînîti e, dê çaxê helak xafil li ser wan dê bigîye wekva sancîê jina hamîle û dê xelas nebin. ⁴ Hama hûn ey! brêan, li tarî da nin in, ko aw weka diz li ser wê bigîe. ⁵ Zîra hûn hemîan jî ewledê rohnî nin, û ewledê ro nin, ê şevê, ya ê tahrî nin in. ⁶ Wusan e li xew da nêçûn em weka başqasîan, lê heşar û bi fîraset bin. ⁷ Zîra awan ko li xew da diçun li şevê da li xew diçun, û awan ko serxoş dibin li şevê da serxoş dibin. ⁸ Hama em çûnkî ê ro nin bi fîraset bibin, û zirxa îmanê û muhabetê em li ser xo wergirin, û kûlahê hasinê xelasê û umudê li ser xo deynin. ⁹ Zîra **[491]** Xodê me ji boy xazebê tayîn mêkir, lê bi destê Rabbê me Îsa el Mesîhê ji boy xelasê em nayîl bibin. ¹⁰ Ko aw li uxura me da mir, hata ko gerek em li xew da biçun gerek heşar bin, bi wî ra tev em bijîn. ¹¹ Ji boy av ji hevûdu ra teselî bidin û hevûdu mamûr bikin çawan ko dîkin jî.

¹² Ê ji we ra lava dîkin, ey! brêan, ko hûn nas bikin wan ko li nav we da zahmet dikşînin û bi Rabb li ser we da memûr in, û ji we ra şîretan dîkin. ¹³ Ê ji wan ra ji boy amelê wan, bi muhabetê pîr zêde raxbet bikin, û bi hevûdu ra selametê bibin. ¹⁴ Ê ji we ra lava dîkin, ey! brêan, ji tîrsokan ra dil bidin, ji zayîfan ra yardum bikin, ji hemîan ra jî bi sabr bin. ¹⁵ Mêze kin nebe ko yekê ji yekê ra dêla xarabîtlê xarabîtlê bike, lê her çax li dû qancîtîê bibin, gerek ji hevûdu ra û gerek ji hemîan ra. ¹⁶ Dayîma şaz bin. ¹⁷ Her çax nimêc bikin. ¹⁸ Li her tişt da şikir bikin, çima ko vîa e meramê Xodê bi Îsa el Mesîhê li ser wê. ¹⁹ Rûh el Qudsê meşamarînin. ²⁰ Peyxemberîtîan li bin lingan mevên. ²¹ Her tişt bicerîbînin, aw ko qanc e pêt bigirin. ²² Ji her tarz yaramaz tiştan dûr bisekin. ²³ Ê Xodê selametê aw bi xo we tamam azîz bike, û büsbütûn rûhê we û canê we û hem gowdaê we bê qusûr bê veşartî hata li wexta hatinê Rabbê me Îsa el Mesîhê. ²⁴ Emîn e aw ko we dawet kir, ko aw dê îcra jî bike.

²⁵ Ey! brêan, ji boy me dowâ bikin. ²⁶ Ji hemî brêan ra bi azîz ramîsayê silavan bikin. ²⁷ Ji we ra bi Rabb sondan dikim ko mektûbê han ji hemî azîz brêan ra bê xondin. ²⁸ Înayetê Rabbê me Îsa el Mesîhê bi we ra bibe; amîn.

MEKTÛBÊ ÎKÎNCÎ Ê RESÛLÊ BOXOS JI TESAXONÎGÎAN RA

SER 1

¹ Boxos û Sîxvanos û Dîmoteos bi Bavê me Xodê û bi Rabb Îsa el Mesîhê ji civatê Tesaxonîgian ra; ² Ji we ra ji alîê Bavê me Xodê û Rabb Îsa el Mesîhê înetet û selamet bibe.

³ Lazim e ko em her çax ji boy wê Xodê şikir bikin ey! brêan, çawan ko cayîz e, zîra îmanê we bi pîr zêde bûnê zêde dibe, û muhabetê we li ser hevûduan pîr dibe. ⁴ Wusan ko em bi xo ji boy aw sabr û îmanê wê ji boy qawarandin û sixlet kişandinê, ji boy wê li nav hemî civatê Xodê pasna xo didin. ⁵ Ko vîa îsbatê haq şerîatê Xodê e, hata ko ji padîşahîtiê Xodê ra hûn nayîl bibin; ko ji boy wî daxî hûn ezîyetan dikşînin. ⁶ Çûnkî li ber Xodê haq e, ko ji wan ra ko ji we ra sixletan didin cezayê sixletê û ji we ra ko sixletan dikşînin bi me ra tev îwazê rahatîtiê bide. ⁷ Aw zeman ko Rabb Mesîh bi quwwetlî melekê xo ji azûmanan dê aşîkâr bibe bi alewê agrê³⁸⁵. ⁸ Ko hayf bistîne ji wan ko Xodê nizanin û ji încîlê Rabbê me Îsa el Mesîhê îtaat nakin. ⁹ Ko [493] azaba wan ji rûya Xodê ji quwwetlî celalê wî ebedî helakîtiê dê bibe. ¹⁰ Li wê ro da, yanî li wexta hatinê, li nava azîzan bi îzzet bûnê û li beyna hemî îtîqatlîan bi heyran bûnê, çima ko şehadetîtiê me li nav we da hati bawur bûn. ¹¹ Ê ji semedê han jî her çax ji boy wê em nimêc dîkin, ko Xodê me we nayîl bike ji dawetê we ra, û hemî rîzayê qancîtiê xo û amelê îmanê bi quwwetê tekmîl bike. ¹² Hata ko navê Rabbê me Îsa el Mesîhê li we da bê îzzet bûn û hûn jî li wî da li gora înetetê Xodê û Rabbê me Îsa el Mesîhê.

SER 2

¹ Ey! brêan, em ji we ra lava dîkin ji boy hatinê Rabbê me Îsa el Mesîhê û ji boy civandinê me li ba wî. ² Ko aqîlê we zû ve neyê hejandin, û nab[i]zdin hûn, ne bi rûh û ne bi söz û ne jî bi mektûbkî weka ji me hati nivîsandin, goya gûna Rabb gîhîştî. ³ Ne be ko yekê we qat tarzî bixapîne, zîra aw ro dê neyê, hata ko asîtî awul neya û aşîkâr nebe meruvê günah û kûrê helakê. ⁴ Aw meruvê zid li ser aw hemîan hati kîbîrlemîş bûn ko Xodê tê gotin, yaxod tê îbadet bûn, hata aw li nav dacarê Xodê

³⁸⁵ Di metnê de *agdê*.

dê bê ronîşdin, aw xo dê nşan bide ko Xodê e. ⁵ Hûn bîra xo naynin ko gava li ba we bûm, mi ji we ra tiştê han digot. ⁶ Ê nua hûn bi xo dizanin ko çî e aw ko manî dibe, ko aw li wextê xo bê aşîkâr bûn. ⁷ Zîra sirra bînamûsîtîê ji nua da dişîxule, lakîn aw ko nua manî dibe, dê manî biba hata ko aw ji nav da bê helandin. ⁸ Ê li wê zeman [494] bînamûsê han dê zuhr bike, ko Rabb Mesîh awî bi Rûhê devê xo dê telef bike, û bi aşîkâr bûnê hatinê wî dê awî helak bike. ⁹ Ko hatinê wî bi amel û îcrayê Şeytan e bi her hîmî mûcûzatan û alametên û bi derew hîkmetan. ¹⁰ Ê li ser wan ko dê helak bibin, bi hemî xapandinê nahaqîfîan, çima ko wan muhabetê doxrîtîê qabûl nêkirin, ko xelas bibin; û bi vî sebebê³⁸⁶ Xodê ji wan ra amel û îcraê derewîtîê dê bişeyîne, ko wan ji derew ra bawur bikin. ¹¹ Ko hükm bibin aw hemîyan ko ji doxrîtî ra îman néanîn, lê ji nahaqîfî ra rîza dan.

¹² Lakîn em deyndar in dayîma ji Xodê şikir bikin ji boy wê, ey! ji Rabb hati hebandin brêan, ko Xodê wê bi azîzîtîê Rûh û bi doxrîtîê îmanê ji boy xelasê bijart. ¹³³⁸⁷ Ê ji wî ra bi destê Încîlê me wê dawet kir, ko ji îzzetê Rabbê me Îsa el Mesîhê hûn nayîl bibin.

¹⁴ Nua ey! brêan, pêt bisekinin, û pêt bigirin aw tenbîh ko hûn hîn bûn, gerek bi söz û gerek bi mektûbê me. ¹⁵ Ê Rabbê me Îsa el Mesîh aw bi xo û Xodê hem Bavê me, ko me heband û bi înetê teselîfê ebedê û umudê qanc da, ¹⁶ Ji dilê we ra teselî bide, û wê li her hemî amelê qanc da û söz da pêt bike.

SER 3

¹ Axir kelam ey! brêan, ji boy me dowa bikin ko kelamullahê li pêş da biçû û şeref bigire, çawan ko li nav we da. ² Hem ko ji kötî û yaramaz merûvan em xelas bibin; zîra îmanê her kesan tunnê. ³ Lakîn Rabb emîn e, ko aw wê dê pêt [495] bike û ji yaramazê xelas bike. ⁴ Ê ji boy we îtîmatê me heye bi Rabb erki çî ko me ji we ra tenbîh kir dikin û dê bikin jî. ⁵ Ê Rabb dilêt wê li muhabetê Xodê û li sabrê Îsaê rast bike.

⁶ Ê ji we ra em tenbîh dikin ey! brêan, bi navê Rabbê me Îsa el Mesîhê; ko hûn şûnda bisekinin ji aw hemî brêan, ko nîzamsiz diçin, û ná weka aw tenbîhê ko ji me sendin. ⁷ Zîra hûn dizanin ko ji we ra çawan lazim e ji me ra bengzemîş bûn, çima ko em li nav we da bê nîzam neçûn. ⁸ Ê ne jî em nanê yekê belaş xwarin, lê bi

³⁸⁶ Di metnê de *sewebê*.

³⁸⁷ Di metnê de *14*.

zahmet û emegê li şev û ro em dixabitibûn, ji boy ji wê yekê ra granîtî nêdin. 9 Nâ kî hûkmetê me tunnê; îlla ko em xo ji we ra örneg bidin, hata ko hûn jî bengzemîşê me bibin. 10 Zîra gava ko em li ba we da bûn, vîa ji we ra me şîret fikir, erki aw ko nâxwaze şîxul kirin, bra nan jî nêxo. 11 Zîra em dibihên ko li nav we da hinikan bê nîzam diçun û qat şîxulkî nâşîxulin, lê tawş digerin. 12 Ê ji meruvê wusan ra em tenbîh dikin û bi Rabbê me Îsa el Mesîhê lava dikin; ko rahat bişîxulin û nanê xo bixun. 13 Lakîn hûn ey! brêan, ji qancîtî kirinê bêzar mebin. 14 Ê erki yekê îtaat nâke ji söza mektûbê hana me ra, hûn nîşan bikin awî, û bi wî ra xaber medin ko, şerm bike. 15 Lakîn weka dijminan hasab mekin, lê nola brê şîretan bikin. 16 Ê Rabbê selametê aw bi xo bi hemî tarz ji we ra selamet bide her dayîma, Rabb bi wê hemîan ra bibe.

17 Silava han bi destê min ê Boxosê e, ko li nav hemî mektûban nşan e, ahwa dinivîsînim. 18 Înayetê Rabbê me Îsa el Mesîhê bi we hemîan ra bibe; Amîn.

MEKTÛBÊ AWULÎN Ê RESÛLÊ BOXOS JI DÎMOTEOS RA

SER 1

¹ Boxos, resûlê Îsa el Mesîhê, bi emrê xelasê me Xodê û umudê me bûn Îsa el Mesîhê. ² Li îman da ji Dîmoteis ji xass ewlad ra ji Bavê me Xodê û ji Rabbê me Îsa el Mesîhê îneyet, merhamet, û selamet bibe.

³ Çawan ko mi ji ta ra lava kir ko li Yepesos da bimînin, gava ko ez li Mageŕonîaê diçobûn; ko tenbîh bikî ji hinikan ra ko başqa talîm hîn nekin. ⁴ Û ji çîrokan ra go nedin, û ji sîlsîlan ra ko paşê wan tunné, ko wan baxusûs mûcadalan li husûlê tînin, û nâ nîzamê Xodê ko li îman da e. ⁵ Zîra netîceê tenbîhê, muhabet e, bi qalbê pak û bi zamîrê qanc û bi îmanê bê mûrayîtî. ⁶ Ji wan ko hinikan bi şaş bûnê li pey bêhude sôzan çûn. ⁷ Û dixwazin xocayê nomosê bibin, lakîn ne çi gotinê xo, ne jî ji xusûsa aw tiştan ko îdda dîkin fehîm dîkin. ⁸ Nua em dizanin ko nomos qanc e; erki yekê awî li gora layîqê qullanmîş dike. ⁹ Lakîn vîa bra bizanibe, ko ji boy sadîqan nomos tunné, lê ji boy bînamûsan, û îtaatsizan [497] û fasîqan û gûnekâran, û napakan û murdaran, ji bav û dê lêxisdoxan ra, ji qatîlan ra, ji zînakâran ra. ¹⁰ Ji lûtîan ra, ji merûv dizoxan ra, ji derewîan ra, ji derew sond kroxan ra, hem ji boy aw hemî tiştan ko zida sax talîmê e. ¹¹ Li gora celal Încîlê mubarek Xodê ko ji mi ra emanet bû. ¹² Û ji mi ra quwwet dayoxî ji Rabbê me Îsa el Mesîhê ra şikir dikim ko min emin hîsab kir û li xizmetê han da danî. ¹³ Ko ji awul da ez kûfrbaz bûm û qawirandox û dijmîn krox; lakîn min merhamet dît, zîra li îmansizîtî da mi fikir, bê zaninê. ¹⁴ Û îneyetê Rabbê me ji hadê zêde bû ji mi ra, bi îman û bi muhabet, ko bi Rabb Îsa el Mesîhê e. ¹⁵ Söza han emîn e, û bi her türî ji qabûl kirin ra layîq e ko, Îsa el Mesîh li dinê hat gûnekâran xelas ke, ko serê wan hemîan ez im. ¹⁶ Lakîn ji boy vîa ez merhamet dîtîm, hata ko Îsa el Mesîh hemî sabran ji hemîan awul li mi da nîşan bide, ko ez îbretê wan bibim, wan ko dê jê ra îman bînin, ji boy ebedî hayatê. ¹⁷ Hama ji ebedî Padîşah ra, aw ko naye xarab bûn û naye dîtin îzzet û hamd bibe; amîn.

¹⁸ Ji ta ra tenbîhê han dispêrim ey! kûrê min Dîmoteos, ji derhaqê ta da li gora aw peyemberîtîan, ko ji awul da bûn, ko bi wan aw cengê qanc ceng bikî. ¹⁹ Û îman

û qanc zamîrê ƚa bibe, awî ko hinikan bi terk kirinê ji der haqê îmanê li zuwayîdê da ketin. ²⁰ Ko mi ji Şeytan ƚa teslîm kir, hata ko ji boy küfr kirinê terbîa bibin.

[498] SER 2

¹ Nua ji hemîan awul lava dikim ko ji boy hemî merûvan, nîyazan, dawayan, recaan şikran arz bibin. ² Hem ji boy padîşahan, û ji boy wan hemîan jî ko li mansûb da ne, ko bi tekml dîndarîtî û bi edebê selamet û rahat ömürkî em bajon. ³ Zîra vîa li huzûra xelasê me Xodê qanc û maqbûl e. ⁴ Ko aw dixwaze xelasê hemî merûvan, û zaninê doxrîtî bîn. ⁵ Zîra yek Xodêkî heye, û yek mîyancîkî li mabeynê Xodê û merûvan meruv Îsa el Mesîh. ⁶ Ko aw xo ji dêla pîran fîda kir, ji boy şehadet bûnê li tayîn bûn zemanan. ⁷ Ko ez wazcî û resûlê wî, li xusûsa îmanê û doxrîtî ji tayîfan ƚa xoca tayîn bûm bi Îsa rast dibêm, û derewan nabêjim. ⁸ Nua dixwazim ko camêran li her deran destê pak bi bilind kirinê bê xazeb û bê hêrsan dowa bikin. ⁹ Wusan jî jinan aw xo bi cayîz cilan, hem jî bi edeb û bi hîcaban bixemalînin, na bi hûnayîê poran, ya bi zêr, ya bi încuyan, yaxod bi pîr buha cilan. ¹⁰ Lê bi xayr amelan çawan ko cayîz e ji Îbadetkâr îqrar kroş jinan ƚa. ¹¹ Jin bra bi sükût hîn bibe, bi hemî îtaatê. ¹² Hama ji jin ƚa hîn krinê, yaxod li ser camêran hükûmet ajotinê îzîn nadim. ¹³ Zîra awul Aşam xalq bû, paşê Hawa. ¹⁴ Ê Aşam nehati xapandin, lê îman û li muhabet da û azîzîti da bi edebanê erki disekine, bi ewlad zayinê dê xelas bibe.

[499] SER 3

¹ Söza han emîn e, erki yekê ji yebîsgobosîti ƚa hawes dike, amelê qanc arzû dike. ² Nua ji yebîsgobos ƚa gerek e ko bê qusûr, mêrê yek jin, kâmî; aqlê tam, ehli irz, müsafir hebandoş, hîn kroş bibe. ³ Dijmin kroş nebe, lêxistox nebe, lê mülâyîm, qawxva nekroş drav nahebandoş bibe. ⁴ Ji mala xo ƚa qanc nazar kroş bibe, ko wladê wî hebin, li her türlü li îtaat da û li edeb da grtox bibe. ⁵ Ê erki yekê ji mala xo ƚa qanc nazar kirin nizane, lê ji kîlîsayê Xodê³⁸⁸ ƚa çawan? dê îdare bike. ⁶ Ji dîn ƚa nû hatoş nebe ko nebe bi kibîr bûnê li azaba Şeytanê bikeve. ⁷ Hama jê ƚa gerek e ko ji meruvê derwan şehadetê qanc jî hebe, nebe ko li ruswayê û li duzaxê Şeytanê bikeve.

⁸ Wusan jî sargavağan ehli edeb bibin, ne du xabaran, ne şarabxoran, ne haramkâr bibin. ⁹ Lê sîra îmanê bi zamîrê pak girtoş bibin. ¹⁰ Ê awan jî awul bira

³⁸⁸ Di metnê de *xodê* (nişeya wergêrê).

bêne caribandin û paşê erki bê qusûr bêne dîtin, xizmetê sargavaqîtî bira îcra bikin.
11 Wusan jî jina wan ehlî edeb bibin, îftîracî nebin, lê kâmîl, û li her tiştê emîn bibin.
12 Sargavaqan mêrê yek jin bibin, ji ewladê xo ra û ji mala xo ra qanc nazaret kroş bibin.
13 Zîra qanc sargavaqîtî kroşan, aw ji xo ra qanc mertebe û li Îsa el Mesîh da bûn îman da pîr serbestîtî qazanc dîkin.

14 Ji boy li cem ta bi zû ve bêm bi umud kirinê, tiştê hana mi ji ta ra nivîsand.
15 Lakîn erki dereng bimînin, ko bizanî erki çawan ca- [500] yîz e ji ta ra li mala Xodê garandin, ko kîlîsayê Ganî Xodê e, astûn û dayaxê doxrîtî. 16 Ê malûm e ko sîra dîndarîtî mezin e; Xodê li cesed da hati aşîkâr bûn, li Rûh da sadîq bû, ji melekên ra xuya li nav putpehrîzan waz bû li dinê da hati îman bûn, bi celalê li jor hati sendin.

SER 4

1 Ê Azîz Rûh aşîkâr dibê ko li axir zeman da hinikan dê ji îmanê murtad bibin, ji derewî, rûhan ra û ji talîmê cinan ra dê dîqat bikin. 2 Bi mûrayîtî derewîan, wan ko zamîrê wan dax bû. 3 Wan ko ji zewicandinê dê men bikin, û dê şûnda bixin ji taaman, ko Xodê xalq kirî ko îtîqatîan û doxrîtî fehm kroşan bi şîkrê sefa bikin.
4 Zîra hemî maxlûqê Xodê qanc in gava ko bi şîkrê tene sendin, û qat tiştê tunne ji red bûn ra. 5 Zîra bi kelimullahê û bi nîyazê tene azîz bûn. 6 Ji birêan da şîretê hen bi dayinê, ji Îsa el Mesîh ra xizmetcîkî çê dê bibî û dê terbîya bibî bi söza îmanê û bi aw talîmê qanc ji awî ra ko tabî bûy. 7 Lakîn ji napak û ji masala pîrekan şûnda bisek, û tu xo li dîndarîtî da talîm bike. 8 Zîra talîmê cesedê pîr faydelî nin e, lakîn dîndarîtî ji her tiştê ra faydelî e, çûnkî li wî da a nwayîn û aw ko dê bê wada ömrê heye. 9 Söza han emîn e û bi her tarz qabûl bûn ra layîq e. 10 Zîra asl ji boy vîa em zahmet dikşînin û tahqîr dibin, çima ko em ji Ganî Xodê ra umud dîkin, ko Xelasê hemî merûvan e [501] baxusûs mûmî[n]an. 11 Tiştê hanan bispêr û hîn bike. 12 Qat yekê cuwanîtî ta tahqîr neke, lakîn li söz da li tawr da û haraket da, li muhabet da, li îman da, li paqijîtî da, îbretê mûmî[n]an bibe. 13 Hata ko ez bêm, ji xondin ra, ji şîret ra ji talîm ra muqayet be. 14 Ji boy aw baxşîş ko li ser ta bû îhmal mebe; ko aw ji ta ra bi destê peyemberîtî li meclîsê yeretsan da li ser ta bi dest datîninê ji ta ra hati dayin. 15 Li ser tiştê han bi fikr, li tiştê han da be; ko li ber çûndinê ta ji hemîyan malûm bibe. 16 Li xo û li talîmê mêze ka û dayîma li wan da bisek, zîra bi ahwa kirinê tu xo jî dê xelas bikî; û wan jî ko ji ta ra godarî dîkin.

SER 5

¹ Îxtîaran pîr tazîr meke, lê weka bavan lava bike, civandin weka brêan, ² Îxtîar jinan weka dêkan jina cwanan weka xuşkan, bi tekml pakîtî nasîhat bike. ³ Jinebîan ra raxbet bike, wan ko rast jinebî ne. ⁴ Ê erki ji jinebîkî ra ewladan, ya toran heye, ji hemîan awul, ji ehalî mala xo ra raxbet bi nişan dayinê, ji bav û dîya xo ra îwaz eda kirinê bra hîn bibin, zîra li ber Xodê maqbûl vîa e. ⁵ Lakîn aw ko sahîh jinebî e û aw tenê mayîe umudê xo li ser Xodê danîe, û şî şev û ro li dû nimêc û nîyazan da e. ⁶ Hama aw ko ehlî zewq e, gava ko dijî, mirîe. ⁷ Ê tiştê han tenbîh bike hata ko bê qusûr bibin. ⁸ Hama erki yekê ê xoyan û baxusûs ehalî mala xo qaîrmîş nake aw îmanê [502] înkâr kirîe, û ji îmansizan jî bêter e. ⁹ Aw jinebî bra li srey jinebîan hasab bibe ko ji şêşt salan kêr nin e, ji yek mêr ra jin bûe. ¹⁰ Bi xayr amelan hati şehadet bûn, erki ewladan mezin kirîe, erki mûsafîran qabûl kirîe, erki lingê azîzan şûşdîe, erki ji wan ra ko li sixlet da ne yardum krîe, erki li her tûrlû li xayr amelan krîe. ¹¹ Lakîn cwan jinebîan terk bike, zîra çî çax ko li zida Îsaê li muxalîf zewqan da dikevin, zewicandin dixwazin. ¹² Ê ji boy îmanê xo awulîn li alîkî da tînin li bin xazebê dikevin. ¹³ Hem jî li malan bi gerandinê, tenbel hîn dibin, û nâ tenê tenbel, lê pîr xabaran û tewş xabar kroşan û tiştê bê cayîz xabar didin. ¹⁴ Nua dixwazim ko cwanan bizewicin, kuran bînin mal ava bibin, ji dijmîn ra qat sebebki zemmê nedin. ¹⁵ Zîra hala hinikan li dû Şeytanê xwar bûn. ¹⁶ Erki ji mûmî[n] mêrkî ra, ya jinkî ra jinebîyêt wî bibin; bra ji wan ra yardum bike, ko ji kîlîsa ra bar nebe ko sahîh jinebîan îdare bike.

¹⁷ Memûretîe xo qanc îcra kroş yeretsan, ji du qat îzzet ra mûstahaq hasab bibin baxusûs wan ko li söz da û li talîm da emeg dikşînin. ¹⁸ Zîra kitêb dibêje ko, Devê aw ga ko li zevî da dixabite grê nedî, û erki Pala ji ücretê xo ra layiq e. ¹⁹ Li ser yeretsê gilîan qabûl meke, meyer bi devê du ya sê şahîdan bibe. ²⁰ Wan ko qabahat dîkin li ber hemîan tazîr bike ko başqasîan bitîrsin. ²¹ Li ber Xodê û Îsa el Mesîhê û hati bijartin melean ko tiştê hana tu bipêy, bê dil çêkirin û qat tiştê bi xatr nekî. ²² Qat li ser [503] yekê zû ve dest dameyin û ji güney başqasîan ra îlhaq mebe tu xo paqij bipê.

²³ Hênî ji vî û pê ve sade av vemexu, lê hinik jî şarab qullanmîş bibe ji boy mîdeyê ta û ji boy pîr naxoştîyêt ta.

24 Meruv hene ko güneyê wan aşîkâr in, û li pêş wan li hükmê diçun, û ê hinikan jî li pêş wan diçun. 25 Wusan jî xayr amelê hinikan ayan aşîkâr in, û wan ko başqa tarz tiştî ne nikârin bêne veşartin.

SER 6

1 Aw hemîan ko li bin nîra qulîtî ne efendîet xo ji her îzzet ra layîq hasab bikin, hata ko ji navê Xodê ra û ji talîmê ra küfr nebe. 2 Ê wan ko mûmî[n] efendîet wan heye, bra wan serhevde nekin, ko brê ne, lê ji wan ra û muhabetî ne, û li qancîtî da yardum kroş meruv in, tiştê hana hîn bike û şîretan bide. 3 Erki yekê başqa talîmkî hîn dike, ji sax söza Rabbê me Îsa el Mesîh ra û li gora dîndarîtiê bûn talîm ra rîza nade. 4 Aw fodul bûe tiştî nizane lê bi mücadelan û bahsan naxoş bûe, ko ji wan hasedan, nîzan, küfran, şübheyê yaramaz hasîl dibin. 5 Aqlê wan fasîd û ji doxrîtiê mahrûm mayoş, batil lafê wan hasîl dibe ko dîndarîti ticaret taxmîn dikin, ji ahwa meruvan şûnda bisek. 6 Hama dîndarîti bi qanaatê tev, ticaretî mezin e. 7 Zîra me tiştî neanîn li dinê, û malûm e ko e tiştî jê nikârin bibin. 8 Nua ji xwarin ra û ji wergirtin ra [504] tiştê me gava ko hene, em ji wan ra qanaat bikin. 9 Hama wan ko zengîn bûn dixwazin, dikevin li nav tecrûbê û duzaşê û li nav pîr dîwanê û bi zarar arzûan; ko wan meruvan li helak da û li zayat da xarq dikin. 10 Zîra qurmê hemî tiştê kotîan, dirav hebandinê³⁸⁹ ko ji wî ra hinikan bi hasret kişandinê, ji îmanê xwar bûn, û aw xo li nava pîr zahmetan avêtin.

11 Lakîn tu ey! meruvê Xodê, ji tiştê hana bîrev, bîkev li dû sadaqatê, dîndarîtiê, îmanê, muhabetê, sabrê, mahcûbîtiê. 12 Li cehda îmanê qanc cehd bike, ji ebedî hayat ra bizaliq, ko ji wî ra dawet bûy, û li ber pîr şahîdan îqarê qanc ta îqar kir. 13 Li ber Xodê ji ta ra tenbîh dikim ko ganî dike hemîan û li ber Îsa el Mesîhê, ko li ber Bondoslu Pîladosê şahadet kir îqarê qanc. 14 Ko tu aw tenbîh bê leke û bê qusûr bipêy, hata zuhûra Rabbê me Îsa el Mesîhê. 15 Ko awî li yatîn bûn zeman da dê nîşan bide, aw Mübarek û tenê Sultan bûn Padîşahê padîşahan, û Xodîet xodêan. 16 Ji nemirîti ra tenê malîk bûn, li nêz nebûn rohnî da sakîn bûn, awî ko ji meruvan qat yekê nedît, û ji dîtin ra jî qadîr nin e; ko ji wî ra îzzet û ebedî hükmê bibe; amîn.

17 Li dinê han da ji zengîn bûoşan ra tenbîh bike, ko maxrûr nebin, ji bê sahihîti zengîniê ra güvenmiş nebin, lê ji Ganî Xodê ra ko her tişt bi xanî ji me ra

³⁸⁹ Di metnê de *hebûndinê*.

dide ji qulanmîş kirin ra. ¹⁸ Ko qancîtî bikin, li xayr amelan da zengîn bibin, destê vekirî, cömerd bibin. ¹⁹ Ê ji boy aw zemanan ko dê bîn aw ji xo ra hemî **[505]** qurmîş bikin; hata ko sahîh hayatê li dest bînin.

²⁰ Ey! Dîmoteos, emanetê bipê, ji navê derew îlmê ji murdar nafîle lafan û ji bahsan şûnda bisek. ²¹ Ko awî hinikan bi îqrar kirinê ji îmanê xwar bûn; îneyet bi ta ra bibe; Amîn.



MEKTÛBÊ ÎKÎNCÎ Ê RESÛLÊ BOXOS JI DÎMOTEOS RA

SER 1

¹ Boxos resûlê Îsa el Mesîhê bi îradetê Xodê li Îsa el Mesîh da li gora qada hayatê. ² Ji delavî kurê min Dîmoteos ra ji alîê Bav Xodê û ji Rabbê me Îsa el Mesîhê, îneyet, merhamet û selamet bibe.

³ Ji ejdadanê min bi pak zamîrê ji aw Xodê ra ko îbadet dikim şikir dikim, çima ko li şev û ro li nimêcê xodê bê kêmanî ta zîkr dikim. ⁴ Hasret çahvê ta li bîra xo bi anînê, o ez ta bibînim hasretan dikşînim; hata ko bi şazîtî tîja bibim. ⁵ Çûnkî li ser ta da bûn bê mûrayîtî îmanê li bîra xo tînim; ko aw awul li ser dêka ta Lavoşa da û li ser dîya ta Yevnîgê da sakîn bû û ez bawur dikim li ser ta jî heye. ⁶ Ji semedê han bîra ta tînim ko baxşîşê Xodê qulanmîş bikî, ko ji ta ra hati dayin bi destê min li ser ta hati datîninê. ⁷ Zîra Xodê ji me ra rûhê trsokê neda, lê rûha quwwetê û muhabetê û tam aqlê. ⁸ Nua ji boy şehadetê Rabbê me, û ji boy min ko mahbûsê wî me [507] şerm meke, lê li încîl da û li meşaqat da hîssedar be li gora quwwetê Xodê. ⁹ Ko me xelas kir, û bi azîz dawetê dawet kir, na li gora amelê me lê li gora taqdîr û îneyetê wî; ko bi Îsa el Mesîhê ji me ra hati dayin ji qadîm zemanan. ¹⁰ Ê nua bi xuyayî bûnê xelasê me Îsa el Mesîhê aşîkâr bû, ko aw mirin batal kir û hayat hem ne mirin li aşîkâr anî bi destê încîle. ¹¹ Ko ez wazcîyê wî û resûl û xocayê tayîfan tayîn bûm. ¹² Ji boy vîa ezîyetê han da jî dikşînim, lakîn şerm nakim, zîra ji kê ra ez îman tînim dizanim, û îtîmatê min heye ko emanetê min ji veşartin ra qadîr e hata wê royê. ¹³ Pê bigir resma aw sözan ko ji min bihîsdîy bi îman û bi muhabet ko bi Îsa el Mesîhê e.

¹⁴ Aw emanetê qanc xoyî bike bi destê Rûh el Quds ko li me da sakîn bûe. ¹⁵ Vîa dizanî ko li Asîa da bûn aw hemîan ji min dûr ketin ko Pîkexos û Hermokînes jî wan in. ¹⁶ Rabb ji mala Vonesîporos ra merhamet bide; zîra pîr caran mi rahat kir û ji zencîrê min şerm nekir. ¹⁷ Lê gava ko li Romayê hat bi pîr qayretê mi aramîş kir û dî ez. ¹⁸ Rabb jê ra bide, ko aw ro merhamet bibîne û li Yepesos da jî çî qas ji mi ra xizmet kir tu awî qanc dizanî.

SER 2

1 Nua tu ey! ewladê min, li Îsa el Mesîh da bûn înet da pê be. 2 Û aw tiştan ko ta ji min bihîsd pîr şahîdan ji emîn merûvan ra hawala bike ko wan jî qadîr bibin [508] ji başqasîan ra hîn kirinê. 3 Nua tu li meşaqat da sabr bike weka cengcîkî qancê Îsa el Mesîhê. 4 Qat askerkî li maslahatê dinê han qarîş nebe, ko ji asker civandox ra bê xoş dîtin. 5 Hem daxî erki yekê güleş digire, li gora qanûnê güleşlemiş nebe, tacê nasdîne. 6 Ji xabitandox cotkâr ra awul ji masûlê sendin gerek e. 7 Fehm bike gotinê min, Xodê ji ta ra fehm bide li her tişt ra. 8 Li bîra xo bîne ji zürîyetê Dawûd bûn Îsa el Mesîhê ko aw li gora hati waz bûn încîlê min qiyam kir. 9 Ko li wî da weka yaramazkî ezîyetan dikşînim, bi grêdan bîlê; lakîn kelimullahê nagrêdaye. 10 Ji sedemê vîa ji boy hati bijartîan ji her tişt ra sabr dikim, hata ko wan jî bi ebedî îzzetê ji aw xelas ra ko bi Îsa el Mesîhê e nayîl bibin. 11 Söza han emîn e; zîra erki em bi wî ra tev mirin, tev jî dê bijîn. 12 Erki em tehamûl bikin, bi wî ra tev dê padîşahîti em bajon, erki em înkâr bikin, aw jî me dê înkâr bike. 13 Erki em îmansîz bibin; aw emîn dimîne; aw xo înkâr kirinê qadîr nin e. 14 Tiştê han li bîra wan bixe, û li ber Xodê şehadet bike ko bahs kroxe sözê nebin, ko ji tiştî ra faydelî nin e, lê tenê ji boy xarabetê bihîsdoxan ra e. 15 Xayret bik tu xo bê ayb li ber Xodê nîşan bidî, wusan încîkî ko dê şerm neke, söza doxrîtîê bi rast hîn kirinê. 16 Hama ji murdar nafîle lafan şûnda bisek, zîra awan fasîqîtiê ji bêter kirinê sebeb dibin. 17 Söza wan weka derbê siripençe e bi xwarinê li pêş diçe; ko Hîmenos û Pîxedos jî ji wan in. 18 Ko wan dibên henî qiyamet bûe, û ji doxrîtîê xwar dibin; û îmanê hinikan [509] xarab dikin. 19 Lakîn hîmê Xodê qawî sekine, û möhrê wî hana heye, ko Rabb nas dike awan ko ê wî ne û ji nahaqîtiê bra şûnda bisekinin aw hemîan ko navê Xodê gazî dikin. 20 Lakîn li malkî mezin da ná tenê fraqet zêrîn û zîvîn hene, lê fraqê darîn û harîn jî hene, û hinikan ji boy xizmetê bi îzzetê ne û hinikan jî ji boy xizmetê edna nin. 21 Nua erki yekê aw xo ji tiştê hana paqij dike, aw ji boy îzzetê dê fraqî bibe hati azîz bûn û ji xodîê xo ra lazîm bûn ji boy her xayr amelan hati hazîr bûn. 22 Lakîn tu ji şehwetê cwanan birav û bi qalbê pak ji Rabb ra bi nîda kroxan tev, li dû sadaqatê, îmanê, muhabetê, selametê here. 23 Hama ji cahîl û bê mana meselan birav; çima ko dizanî ko aw sebebê qawxayan dibin. 24 Lakîn ji qulê Rabb ra qawxa kirin cayîz nin e, îlla ji hemîan ra mûlayîm bûn hîn krox ji zulmê ra sabr krox. 25 Awan ko zîd in bi mahcûbîtiê talîm kirin cayîz e, bibe ko Xodê ji wan ra tewbe bide ji boy doxrîtîê

fehm kirinê. ²⁶ Ko ji duza³⁹⁰ Şeydanê bifelitin, ko jê hatin girtin, ji îradetê wî ra qulux kirinê.

SER 3

¹ Û vîa bizane ko li roya paşîn da dê kötî zemanan bèn. ² Zîra merûvan dê bibin, nefsê xo hebandox, tamakâran, kîbîran, maxrûran küfûrbazan, ji bav û dîyê xo ra îtaatsizan namkôran, napakan, ³ Bê merhametan, baruşîtî nâxwazan, xammazan, aw xo zabt nekro³⁹⁰xan, azxûnan, qancî nehebandoxan, ⁴ Xayinan, edebsizan, qurayan, ji Xodê pêtir [510] zewqê hebandoxan; ⁵ Û li wan da sûretê dîndarîtîê dê bibe, lakîn quwwetê wî dê înkâr bikin, û tu ji wan da bisek. ⁶ Zîra ji wanan in, ko dikevin bi mala mal, û yêşîr dîkin bi gûne hati bar bûn bi fikir zayîf bûn jinan, ji çeşît çeşît îştahan hatin ajotin, ⁷ Ko dayîma hîn dibin, û qat li doxrîtîê fehm kirinê nikârin bigên. ⁸ Lê çawan ko Hanes û Hamres ji Mûsa ra zid sekinîn wusan ji vanan ji doxrîtîê ra zid disekinin, bi aql fasîd merûv in, li îman da nafiê ne. ⁹ Lakîn hênî pêş dê neçûn, zîra aqlsîzîtîê wanan ji hemîan ra dê aşîkâr bibe, çawan ko ê wan jî bû. ¹⁰ Hama tu tabî bûy ji mi ra; li talîm da, li hal û keyfîyet da, li nîyet da li îman da, li sabr kirin da, li muhabet da, li tehamüş da, li qawarandin da. ¹¹ Li aleman da, çawan ji mi ra bû li Antakîa da, û li Konea da, û li Lusdra da; çî qawarandin da mi kişand, û ji hemîan mi xelas kir Rabb. ¹² Û aw hemîan ko dixwazin bi dîndarîtîê³⁹¹ li Îsa el Mesîh da geçimîş bûnê, qawarandinan dê bikşînin. ¹³ hama yaramaz merûvan, û xapandoxan bi xapandinê, û bi hatin xapandinê hênî beter dê bibin. ¹⁴ Hama tu qawî bisek li aw tîştan da, ko hîn bûy, û ta îtîqat kir, zîra tu zanî ko ji kê hîn bûy. ¹⁵ Hem ji masûmîtîê jor azîz kitêban dizanî, ko wan ta bi destê aw îmanê ko li ser Îsa el Mesîh da e, ji boy xelasê alîm kirinê qadîr³⁹² in. ¹⁶ Kitêb hemî bi nufûsê Xodê ne, û ji talîm ra, û ji tazîr ra, ji îslah bûn ra ji boy sadaqat ra bûn ji tedîb ra faydelî ne. ¹⁷ Hama ko merûvê Xodê tam bibe, ji hemî xayr amel ra hati hazir bûn.

³⁹⁰ Di metnê de *duçaxê*.

³⁹¹ Di metnê de *dîndarîtîê*.

³⁹² Di metnê de *qaîr*.

[511] SER 4

1 Şehadetîê han da tînim li ber Xodê û Îsa el Mesîhê, ko dê hûkm bike saşan mirîan, li wexta zuhûr û padişahîtê wî. 2 Söze waz bike, wextsuz, hazir bisek, tazîr bike, tekdîr bike, şîret bike, bi temam sabra talîmê. 3 Zîra dê wext bê ko, ji saş talîm ra dê tehamûl nekin, lê nola xurînê goyê xo li gora arzûyê xo aw ji xo ra xocayan dê bicivînin. 4 Ji doxrîtê goyê xo dê vegeînin û li dû masalan dê biçun. 5 Lakîn tu li nav hemî tîştan heşar bisek, li meşaqat da sabr bike, amelê avedaranîcê îcra bike, xizmeta xo eda bike. 6 Zîra ez ji nua da ji qurban bûn ra hatim pêşkêş bûn, û wexta mirinê min gîhîştî. 7 Cengê qanc mi ceng kir, rêya xo mi tekmîl kir, îmanê mi girt. 8 Ji vî pê ve heye û dimîne ji mi ra taca sadaqatê ko awî ji mi ra Rabb, aw sadiq li wê royê dê bide, û tenê ji mi ra na lê ji wan hemîan ra jî ko zuhûrî wî dihebînin.

9 Xayret bike tu ji mi ra bêy. 10 Zîra Têmas mi terk kir dinêy han heband, û çû li Selanîgê, Gresges li Qaxadîayê û Dîdos li Taxmadîayê çû. 11 Luqa tenê bi mi ra e, Marqosê bisdîn bi xo ra bîne zîra ji boy xizmetê ji mi ra faydelî e. 12 Ê mi Dükîgosê li Yepesosê şîyand. 13 Aw yaxmurluxê, ko mi li Drovaşa da hişt li cem Garbosê, gava ko bêy bîne, kitêban jî, baxusûs maqaxatan. 14 Hadad Aşeksantros ji mi ra kötîti kir, Rabb jê ra li gora amelê wî bedel dê bike. 15 Ê tu jî jê saqîn be, zîra ji söze me ra pîr zid sekinî. 16 Cara awulîne [512] li cewab dayîne mi da bi mi ra keskî nehat; lê hemî jî ez terk kirin, ji Xodê dîleg dikim ko aw ji wan ra güne hasab nebe. 17 Lakîn Rabb li ba mi seknî û mi pêti kir, ko waz bi destê min temam bibe, û tayîfan hemî jî bibihîsin, û ez ji devê aslanê felitim. 18 Hem Rabb ez ji hemî şîxulê yaramazê dê xelas bike, û saş selîm li padişahîtê xo azûmanîe dê bibe, ko jê ra ebed il ebed hamd bibe; amîn.

19 Ji Brîsge ra û ji Agûxas ra, û ji mala Vonesîporos ra silavan bike. 20 Erasdas li Gorntos da ma, û Dropîmosê naxoş mi li Melîdos da hişt. 21 Xayret bike ji zivîsdanê awul bêy ji ta ra Yevpuxos û Putes, û Lînos û Gxoîfa û hemî brêan silavan dîkin. 22 Rabb Îsa el Mesîh bi rûhê ta da bibe, îneyetê bi we ra bibe.

Amîn.

MEKTÛBÊ Ê RESÛLÊ BOXOS JI DÎDOS RA

SER 1

1 Boxos qulê Xodê û resûlê Îsa el Mesîhê; li îmana hati bijartînet Xodê û weka dîndarîtîê bûn, li gora îlmê doxrîtîê; 2 Ji boy umudê hayatê ebedî, ko aw bêderew Xodê wad kir, ji zemana qadîman awul. 3 Ê li tayîn bûn zemanan da li gora emrê xelasê me Xodê, ji mi ra hati emanet bûn bi destê wazê, söza xo beyan kir. 4 Li gora îmanê misewî ji xass ewladê mi ra ji Dîdos ra, ji Bav Xodê, û ji Rabb Îsa el Mesîhê xelasê me înayet û selamet bibe.

5 Ji boy vîa mi ta li Gîrîd da hişt ko çi kêmanî heye tekmîl bikî, weka ko mi ji ta ra sipert li her bajêr da yeretsan nasb bikî. 6 Erki yekê bê qusûr bibe, mêrê yek jin, mûmîn ewladê wî hebin, wan edebsiz, ya îtaatsiz, gazinan nebin. 7 Zîra ji yebîsgobos ra gerek e ko weka wekîlxarcê Xodê bê qusûr bibe; ne edebsiz, ne sû hatox, ne şarab xor, ne lêxisdox, ne haramkâr. 8 Lê mûsafîr hebandox, [514] qancîtî hebandox, bi tam aql, sadiq, azîz, aw xo zabt krox. 9 Li gora talîmê bûn ji emîn söz ra tabî be, hata ko sax talîmê şîret dayînê, hem awan ko zid disekinin tektîr kirinê jî qadîr bibe. 10 Zîra îtaatsiz nafîle xaber dayoxan, hem aqil xapandoxan pîr hene, baxusûs awan ko ji sûnetê ne. 11 Ko wan şaş kirin gerek e, ko temam mala xarab dîkin, û cayîzsiz tiştan hîn dîkin, ji boy haramkârîtîê. 12 Ji wan yekê ji peyemberê wan go: Gîrîdlîan dayîma derewê canawarêt kötî, tenbel boşboxaz nas in. 13 Şehadetê han doxrî e, ji vî semedê wan şedîd tazîl bike; hata hata ko li îman da sax bimînin. 14 Ê dîqat nekin ji masalêt Yehûdlîan ra ji tenbîhê aw merûvan ko ji doxrîtîê dûr disekinin. 15 Ji pak merûvan ra her tişt pak e, hama ji murdarîan ra û ji îmansizan ra, qat tiştî pak nin e, lê gerek aqilê wan, gerek zamîrê wan hatîe murdar bûn. 16 Îqrar dîkin ko Xodê nas dîkin, û bi amelê xo înkâr dîkin, çûnkî mekrûh û îtaatsiz û ji boy her xayr amelê yaramaz in.

SER 2

1 Hama tu bibêj çi ko sax talîm ra cayîz e. 2 Ko îttîaran heşar, ehli irz, aqilê tam; li îman da, li muhabet da, li sabr da, sax bibin. 3 Wusan jî îxtîar jinan ji azîzan ra yaqîşmîş bûn li qiyafet da ne xamazan, ne bekrîan, îlla qanc hîn kroşan bibin. 4 Ko şîret bikin jinê cwanan, mêrê xo hebandoş û kurê xo hebandoş bibin. 5 Bi tam aql, pak, mal ava, xayr amel, ji mêrê xo ra îtaat bûnê hîn bi- [515] kin, hata ko ji kelimullah ra küfr nebe. 6 Wusan jî ji cwanan ra şîret bike, ko bi tam aql bibin. 7 Ji her alî tu xo ji xayr amel ra orîneg nîşan bide li talîm da ji fesadê xalîs bi edeb. 8 Bê zem bûn sax sax kelim, ko aw ko ji me ra zid disekine bi şerm be, û li ser me xaberkî wî kötî tunne be gotinê. 9 Ji qulan ra nasîhat bike ko ji efendîê xo ra mütêh bibin, li her tişt da xoş, zid gotoşan nebin. 10 Ê na jî dizan, lê li her tişt da emînîyetê qanc nîşan bidin, hata ko li her tişt da ji talîmê xelasê me Xodê ra zînet bikin. 11 Zîra xelas kroş îneyetê Xodê ji hemî merûvan ra xuyayî bû. 12 Ko me nasîhat dike, ko fasîqîtiê û dünyawî arzûan em înkâr bikin, li dinê han da bi aqlê tam, û bi sadaqatê û bi dîndarîtiê geçimîş bibin. 13 Ê ji aw mübarek umud ra hem ji celîl zuhrê azîm Allahê, û xelasê me Îsa el Mesîhê beklemiş bikin. 14 Ko aw xo ji boy me da, ko me ji her bînamûsîtiê xelas bike, û pak bike ji xo ra xas qawm bike, ji her xayr amel ra xayretkeş. 15 Tiştê hana bibêj, û nasîhat bike, û bi şedîd tekdîr bike, nebe ko yekê ta li ser gazinan bike.

SER 3

¹ Bîra wan bîne, ko ji saltanat ra û ji hûkûmetan ra îtaat bikin mûteh bibin, ji her xayr amel ra hazir bibin. ² Qat yekê ra küfr nekin, qawxaci nebin, mülayîm bibin, ji her kes ra tamam mahcûbîti bra nîşan bidin, ³ Zîra wextkî em jî aqilsiz, îtaatsiz, hati xapandin bûn, û ji türli türli ar- [516] zûan ra û zewqan ra qulux dikir; li kötîti da û li hased da ömrê xo geçimîş dikir; em mekrûh bûn û ji hevûduan jî îkrah dikiribûn. ⁴ Lakîn gava ko qancîti û merûv hebandîtiê xelasê me Xodê aşîkâr bû. ⁵ Na ji xayr amelê me ko em şîxulin, îlla li gora merhametê wî me xelas kir, û bi nû bûnê azîz Rûhê. ⁶ Ko awî bi destê xelasê me Îsa el Mesîh e, li ser me bi xanîmetê rijand. ⁷ Wusan ko bi înyetê wî paşê sadiq bûnê me, li gora umudê ebedî hayatê em warîsan bibin. ⁸ Söza han emîn e, û dixwazim ko tu li xusûsa tiştê hana tahqîq bikî hata ko ji Xodê ra îman anox kesen ji amelê qanc ra cehd kirinê muqayed bibin, ji merûvan ra qanc û faydelî tiştan vanan in. ⁹ Hama tu ji diwanê bahsan û ji hasab kirinê sîlsîlan û ji nîyazan û ji pevçûnê nomosê şûnda bisek; zîra faydesiz û batil in. ¹⁰ Ji herîdîgos merûvê bîrîncî bisek. ¹¹ Ê bizane ko merûvê ahwa xwar bûe, û güne dike, çûnkî aw ji xo hükm bûe.

¹² Gava ko Ardemaê, ya Dükîgosê ji ta ra bişeyînim, xayret bike ji mi ra bêy li Nîgobolîsê; zîra mi nîyetê xo danî ko zivîsdanê li wê biderînim. ¹³ Xocaê nomosê Zenas û Aboxosê zû ve rêwî bike, hata qat tiştê kîmanîê wan nebe. ¹⁴ Hem ê meyan jî bra bibin, ji boy lazim bûn hacetan ji boy xayr amelê cehd kirinê, hata ko bê meywe nebin. ¹⁵ Silavan dîkin ji ta ra aw hemîan ko bi mi ra ne, silavan bide ji wan ra ko me dihebînin bi îmanê, înyet bi wê hemîan bibe; Amîn.

MEKTÛBÊ Ê RESÛLÊ BOXOS JI PÎLÎMON RA

SER 1

1 Boxos mahbûsê Îsa el Mesîhê û Dîmoteos brê ji delalî û îşdaşê me ra Pîlîmon ra. 2 Û ji delalî Abpîa ra û ji cengdaşê me Arkîbbos ra û li mala ta da bûn ji kîlîsa ra. 3 Ji we ra ji Bavê me Xodê û ji Rabb Îsa el Mesîhê îneyet û selamet bibe.

4 Dayîma şikir dikim ji Xodê xo, ta li nimêcê xo da bi zikir kirinê. 5 Gava ko dibihîsim muhabet û ta, ko heye li ser Rabb Mesîhê, û li ser hemî azîzan. 6 Ko îlhaqîtî îmanê ta meywedar bibe, bi Îsa el Mesîhê li ser we da bûn bi malûmîtî hemî qancîtîan. 7 Zîra ji boy muhabetê ta şaz bûnê me heye û teselî; çima ko bi destê dilê azîzan pîr rahat bûne, ey! brê.

8 Ji boy vîa erki pîr cesaretê mi bi Îsa hêja jî, aw ko cayîz e ji ta ra emr kirinê. 9 Lakîn hênî pêtir ji boy muhabetê lava dikim, ez ahwa meruvkî, yanî îxtîar Boxos û nua ji boy Îsa el Mesîhê weka mahbûskî im. 10 Ji ta [518] reca dikim ji boy Vonesîmos ewladê min, awî ko mi li grêdanê xo da za. 11 Ko wextkî ji ta ra yaramaz bû, lakîn nua ji ta ra jî û ji mi ra jî faydelî e. 12 Awî ko mi şûnda şîand, tu jî awî qabûl bike çima ko rûdîa min e. 13 Awî ko mi dixosd li ba xo hiştinê, ko dêla ta da ji mi ra xizmet bike li grêdana încîlê da. 14 Lakîn bê rêya ta mi naxosd tiştê kirinê, ko qancîtî ta weka ji mecbûrîtî nebe, lê bi îradetê bibe. 15 Zîra belkî ji semedê han ji ta wextkî cê bû, ko aw ê ta bibe ebedî. 16 Hênî weka qul ne, lê ji qul pêtir, weka muhabetî brê, û erki ji mi ra awqas delalî e, çiqas? pêtir dê bibe ji ta ra, erki ji alîê cesed û erki ji alîê Rabb. 17 Nua erki tu min ji xo ra îlhaq hasab dikî awî jî weka min qabûl bike. 18 Û erki ji ta ra nahaqîtîkî kirîe, ya deyndar e, awî li hîsabê mi da binivîs. 19 Ez Boxos mi bi destê xo nivîsand, ez eda dikim, ko nabêm ji ta ra, erki tu jî xo ji mi ra deyndar î. 20 Belî, ey! brê, bra bi destê ta faydeê han ji mi ra bibe bi Rabb rahat bike rûdîa min bi Îsa. 21 Ji îtaatî ta ra mi bi îtîmad kirinê, ji ta ra nivîsand, zîra ez dizanim ko tu ji gotinê min pêtir jî dê bikî.

22 Hem daxî ji mi ra qonaxkî jî hazir bike, zîra umud dikim ko bi bereketê nimêcê we ji we ra dê bême baxîşlamîş bûn. 23 Silav dike ji we ra Yebasras mahbûsdaşê min, bi Îsa el Mesîhê. 24 Hem îşdaşê min Margos, Arîsdarkos, Têmas, Luqa daxî. 25 Îneyetê Rabbê me Îsa el Mesîhê bi rûhê we da bibe; Amîn.

MEKTÛBÊ Ê RESÛLÊ BOXOS JI ÎBRANÎAN RA

SER 1

¹ Xodê ji zemanê qadîm da ji ejdadan ra li pîr deran da û li pîr tarz da bi destê peyemberan xaber da, ² Li av roya paşîn da bi me ra bi destê Qurê xo xaber da, ko awî ji her tiştê ra warîs kir, ko bi destê wî dinê jî xalq kir. ³ Ko aw rohnê celalê wî û asil sîkeê wî, aw ko bi qudret kelamê xo her tiştê zabt dike, aw bi xo güneyêt me bi paqij kirinê, li bilindan, li destê rastê azametê Xodê ronişd. ⁴ Ê awqas ji melean pêtir bû çiqas ko ji wan pêtir ji qanc nav kî ra warîs bû. ⁵ Zîra çî wext ji melean ra yekê ra go, Tu Qurê min î îro mi ta za; û dîsa, ez jê ra Bav dê bibin û aw ji mi ra Qurê dê bibe. ⁶ Ê dîsa gava ko awul zayin li dinê daxîl dike dibê, Melekê Xodê gişk jê ra bra secde bikin. ⁷ Ê ji derhaqê melean dibê ko: Melekêt xo rûhan dike û xizmetcîyêt xo ji alevê agir. ⁸ Hama ji derhaqê Qurê dibê, Ya! Xodê taxtê ta abed il ebedî e, û asayê padîşahîtiyê [520] ta asayê doxrîtî e. ⁹ Sadaqat ta heband û ji bê namûsîti ta îkrah kir, ji boy vîa; ya! Xodê, Xodê ta, ta bi rûna şazîtî mesh kir ji havalêt ta pêtir. ¹⁰ Hem dibê, Ji îbtîda, ya! Rabb, ta dinê temel kir, û azûmanan amelê destê ta nin. ¹¹ Wan helak dibin, lakîn tu baqîy û hemî jî weka cilan dê kevin bin. ¹² Ê wan wekva libas dê badî, û tebdîl dê bibin, hama tu heman aw î, û salê ta dê neqedin. ¹³ Ê ji melean ra ji kîjan? ra zemankî go, Li dest da rastê min ronî hata ko dijaminêt ta li pêla lingê ta deynim. ¹⁴ Na? ko hemîan xizmet kirox rûh in, wan ko ji boy xizmetê tîen şîyandin ji boy wan ko ji xelas ra dê warîs bibin.

SER 2

¹ Ji boy vîa lazim e ji me ra ko ji aw hati bihîsdin tiştan ra hênî pêtir em dîqat bikin, ko nebe dilê me sizt bibin. ² Zîra erki bi destê melean aw xabar ko hati gotin sabît bû, û hemî îsyân û îtaatsizîti cezayê haq send, ³ Lê em ji azabê çawan? dê xelas bibin, erki em êhmal bikin ji boy wusan xelaskî mezinê ko îbtîdayê xabardanê ji Rabb send, û bi destê bihîsdoxan ji me ra sabît bû. ⁴ Xodê jî şehadet kir bi alametên û hûkmetan û bi dîrla dîrla bi quwwetlî tiştan, û bi baxşîşê Azîz Rûhê, çawan ko aw xosd.

5 Zîra aw dinê ko dê bê ji boy aw ko em xaber didin ji melean ra tabî kir. 6 Lakîn li derkî yekê bi şehadet kirinê go, Meruv çî e? ko tu awî zîkr dikî, yaxod ewladê insan ko awî zîyaret dikî. 7 Awa ji melean ta hinik [521] jêr kir, awî bi celal û bi îzzetê tva taclemîş kir, û awî li ser amelê destê xo nasb kir, 8 Her tişt li bin lingê wî ta tabî kir; zîra her tişt jê ra bi tabî bûnê, qat tiştê bê îtaat nehişt, lakîn nua her tişt jê ra hati tabî bûn em nabinin. 9 Lakîn Mesîhê bi celal û bi îzzetê hati tac bûn em dibînin ko ji melean hinikî jêr bobû ji boy alemê mirinê, ko bi înetê Xodê ji boy hemîan tahma mirinê bistîne. 10 Lakîn Jê ra cayîz bû, ji boy awî hemîan û bi wî her tişt bûnê, pîr lawan wexta li îzzetê xisdinê qalawuzê xelasê wan bi alemê tekmlî bibe.

11 Zîra aw ko azîz dike û aw ko tê azîz bûn hemî jî ji yekê nin, ji boy vîa fedî nake wan brêan gazî kirinê. 12 Çûnkî dibê, Navê ta ji brêet xo ra dê naql bikim, li nava kîlîsê ji ta ra tesbîh dê bikim. 13 Ê dîsa, Ez jê ra dê îtimad bikim, û dîsa, Va ha ez û aw weladan ko Xodê ji mi ra da. 14 Nua çûnkî weledan ji cesed û xuyn ra hîssedar bûn, aw bi xo jî heman ji tiştê hanan ra hîssedar bû ko bi destê mirinê xo mahf bike awî ko jê ra hûkûmetê mirinê hebû, yanî Şeytanê. 15 Ê wan hemîan xelas bike ko li ömrê xo da ji tîrsa mirinê li bin qulîtî da bûn. 16 Zîra qat ji destê melean nagre, lê ji destê zürîyetê Îbrahîmê digre. 17 Ji boy vîa îqtîza bû jê ra ko ji³⁹³ bin weka brêan bibe, wusan ko ji Xodê ra hati mütaliq bûn li tiştan da merhametlî û emîn baş îmam bibe ko ji güneê qawm ra kefarete bike. 18 Zîra aw bi xo ji tecrübe ra bi dûçar bûnê ji samedê alem kişandinê ji wan ra ko tecrübe dikşînin yardum kirinê qadîr e.

[522] SER 3

1 Ji samedê han, ey! azîz brêan û îlhaqê dawetê semawîê, li Resûl û baş îmanê îqrarê me li Îsa el Mesîhê mêze kin. 2 Ko aw ji wî ra ko nasb kir emîn bû çawan ko Mûsa jî li gişk mala wî da bû. 3 Zîra vîa ji Mûsê awqas pêtir ji îzzet ra layîq bû, çiqas ko îzzetê mal çêkroş pîr hedibe ji malê. 4 Zîra her mal ji yekê bîna dibe, hama aw ko her tişt kir, Xodê e. 5 Ê mûsa bîra li gişk mala wî da weka xizmetkâr emîn bû, ji boy şehadetîê aw tiştan ko dê bihata gotinê. 6 Lakîn Îsa li ser malê weka ewlad e, ko mala wî em in, erki serbestîê û îftîxarê umudê hata paşê em pê bigirin,

7 Ji boy vîa weka ko Azîz Rûh dibê: 8 Êro erki dengê wî dibihên, li çölê da li gûna tecrübe da wexta hêrs kirinê dilê xo hişk mekin. 9 Ko li wê bavêt wê ez

³⁹³ Di metnê de jo.

cerabandin, ez teftîş kirin, û çil salan amelêt mi dîn. ¹⁰ Ji boy av mi îkrah kir ji aw sîlsîleê û mi go, Dayîma bidil xwarin û hem tarîqê min nas nekirin. ¹¹ Wusan ko li xazabê mi da mi sond kir, Li rahatê min dê nekevin. ¹² Mêze kin ey! brêan, nebe ko ji we yekê da dilê yaramaz îmansizîtîê bibe; ko ji³⁹⁴ Ganî Xodê ra asî bibe. ¹³ Îlla hevûdu şîret bikin her ro, çiqas ko îro tê gotin, nebe ko ji we yekê dil hişk bibe bi xapandinê gûnean. ¹⁴ Zîra em îlhaqê Îsa bûne, faqat îbtîdayê aw qawîtîê hata paşê em pêt bigirin. ¹⁵ Çiqas ko tê gotin, îro erki dengê wî dê bibihên dilê xo hişk kin, weka wexta awî hêrs kirinê. ¹⁶ Zîra hinikan bihîsdin û awî hêrs ki- [523] rin; lakîn na aw hemîan ko ji Misrê ra bobûn bi destê Mûsa. ¹⁷ Nua ji kê? îkrah kir li aw çil salan da, na? ko ji gûne kiroxan ra, ko astîê wan li çölê da ketin. ¹⁸ Ê Ji boy kî? sond kir ko li rahatê wî nekevin; faqat ji boy aw îmansizan. ¹⁹ Nua em dibînin, ko ji semedê îmansizîtîê wan li rahatê ketinê qadîr nebûn.

SER 4

¹ Nua em bitîrsin, ko nebe li rahatê wî ketinê wadê ko ji me ra mayî e, ji we yekê jê mahrûm bibe. ² Zîra em jî weka wan mûjde sendine; lakîn ji wan ra aw kelamê bihîsdinê faydekî nekir, çima ko bi îmanê tev nebû li nava bihîsdoxan. ³ Zîra em ko îman anîne li rahatê dikevin, çawan ko go: Nua mi sond kir li wexta xazabê mi da, ko li rahatê min dê nekevin faraza amelê wî ji îbtîdayê dinê bobûn. ⁴ Zîra kitêb ahwa dibê li derkî ji boy yedîncî royê, û Xodê li roya haftan da ji hemî şîxulê xo vêsa bû. ⁵ Ê livir dîsa dibê erki Rahatê min dê nekevin. ⁶ Nua çima ko ji hinikan ra dimîne li wê ketinê, û wan ko ji awul da mûjdeê sendibobûn ji boy îtaatsizîtîê neketin; ⁷ Tekrar rokî tayîn dike, û dibê, Îroy han bi devê Dawûd ji paşê awqas zemanan, çawan ko hati gotin: Îro erki dengê wî dê bibihên, dilê xo hişk mekin. ⁸ Zîra erki wan Hesû rahat bikirabû hênî ji vê pê ve ji boy başqa rokî nedigot. ⁹ Erki wusan e ji qawmê Xodê ra hêja rahatkî dimîne. ¹⁰ Zîra aw ko li rahatê wî da ket, hênî vêsa bû ji şîxulê xo çawan ko Xodê jî ji [524] şîxulê xo. ¹¹ Nua em xayret bikin li aw rahatê bikevin; nebe ko yekê tarza bi aw îtaatsizîtîê bikeve. ¹² Zîra kelamullahê ganî e û tûj û ji hemî du dev şûran brandox; ko dibihure hata can û rûh û parçayan û mejîê pay kirinê, û teftîş dike fikr û nîyetê dilê. ¹³ Ê tunne maxlûqkî li ber wî naxuyay in, lê her tişt li ber çahvêt wî tahzî û vekirin in, ji awîra ko hasabê me dê bê dayin.

³⁹⁴ Di metnê de jo.

¹⁴ Nua, ji me ra ko mezin baş îmamkî heye li azüman da hati bihurî; Mesîh Kûrê, pêt bigrin îqrarê xo. ¹⁵ Zîra ná ko wusan baş îmamêkî me heye, ko qadîr nebe ji zayîftîlê me ra hemderd bûn, lê aw bi her türlü tecrübe kişandîe weka me, faqat bê günean. ¹⁶ Nua, bi serbestîe em nêz bin li ber taxtê îneyetê, hata ko em merhamet bistînin, û münasîbê wextê ji boy yardumê, em îneyet bibînin.

SER 5

¹ Zîra hemî baş îmaman ji nav merûvan hatin sendin, ji boy merûvan disekinin li alîe Xodê ko hedîyan û qurbanan ji boy güneyan pêşkêş bike. ² Ê qadîr e derddaş bibe ji wan ra, ko cahîl û şaş bûn in çima ko aw bi xo jî li nav zayîftî da e. ³ Ji boy vê sedemê jê ra farz e çawan ko ji boy qawmê, wusan jî ji boy xo qurbanê günean pêşkêş bike. ⁴ Ê îzzetê han kesê ji xo ra nastîne, lakîn aw ko ji Xodê dawet bûe distîne, çawan ko Aharon jî. ⁵ Wusan jî Îsa, ji boy baş îmam bûnê, aw xo bi îzzet nekir, lê awî; Tu kûrê min î îro mi ta za jê ra gotox aw bi îzzet kir. ⁶ Çawan ko başqa [525] derkî jî dibê; Tu li gora tertîbê Melkîsetegê, ebeden îmam î. ⁷ Ko aw, gava ko li cesed da bû, bi azîm feryadê û bi hasrimê çahvan duwa û recaan kir jê ra, ko qadîr bû wî ji mirinê xelas bûnê. ⁸ Faraza aw Kûr e, lakîn ji aw azaban ko aw kişand îtaat hîn bû. ⁹ Ê gava ko tekîl bû, sebebê xelasê ebedîe, aw hemîan bû, wan ko jê ra îtaat bûn. ¹⁰ Ê ji Xodê gazî bû, li gora tertîbê Melkîsetegê baş îmam. ¹¹ Ko ji derhaqê wî da pîr gotinê me heye, ji tarîf kirin ra ezîyet in, çûnkî ji bihîsdin ra sist bûn. ¹² Ko lazîm e ji we ra li gora wextê xocayan bibin, lakîn carkî jî lazîm e ji we ra hîn bûn, erki çi ne îlk harfê sözê Xodê, û hîn ji şîr ra muhtac bûn û na ji tekîl taam ra. ¹³ Zîra aw hemîan ko şîr xwarin, ji xusûsa söza sadaqatê nezan in; çima ko masûm in. ¹⁴ Hama tekîl taami ji tam merûvan ra maxsûs e, ko hasê wan bi hîn bûnê talîm bûne xayr û şerê farq kirinê.

SER 6

¹ Nua li ser Îsaê aw hîn bûne awulîan bi berdanê, ji kemalîet ra em bîn; bê nû hîm danînê ji mirî amelan tövbe kirinê, û li ser Xodê îman hebûnê. ² Ê li talîmê tahfîl bûnan, û li dest danînan; û li qiyama mirîan û li şerîatê ebedîe. ³ Ê vîa emê dê bikin, erki Xodê îzn bide. ⁴ Zîra mümînsîz e ko, carkî ji rohnî ra nayîl bûoxan ra, û ji tahma semawî baxşîşan sendoxan ra, û ji Azîz Rûh ra îlhaq bûoxan ra, ⁵ Ê ji qanc söza Xodê ra, û ji [526] tahma quwwetê aw dinê ko dê bê sendoxan ra, ⁶ Gava ko

biqevin, dîsa ji tobe ra tebdîl bibin; çima ko aw li xo da Qurê Xodê, tekrar bi xaq kirinê rûswa dîkin. ⁷ Zîra aw ard ko li ser xo pîr caran hati baranê vedixo, û mahsûl tîne yaramîş dibe ji wan ra ko cot dîkin li ser wî ji Xodê beraket distîne. ⁸ Hama aw ko istirîan û istirîê mişkan tîne lazimsiz e ji bedua ra nêz e, û encamê wî ji boy şewutandin e. ⁹ Lakîn em ey! delalîan, li ser û ji xelas ra mütaliq hênî qanc umudê me hene; faraza em ahwa xaber didin. ¹⁰ Zîra Xodê nahaq nin e; ko amelê we bîr bike, û aw muhabetê ko ji boy navê wî we nîşan da, ko ji azîzan ra we xizmet kir û xizmet dîkin jî.

¹¹ Hama em arzû dîkin ko ji we her yekê av cehdê nîşa bide ji qawî bûnê umudê hata paşê. ¹² Ko hûn tenbel nebin, lê bi destê îman û sabrê ji wadan ra ji warîs bûoxan ra bengzemîş bibin. ¹³ Zîra gava ko Xodê ji Îbrahîm ra wad kir, çûnkî ji wî mezin tunnebû ko li ser wî sond bikirana, ¹⁴ Li ser xo sond kir, û go: Helbete ta bi bereket kirinê dê bereket bikim; û bi pîr kirinê dê pîr bikim. ¹⁵ Ê ahwa bi sabr kirinê ji wadê han ra nayîl bû. ¹⁶ Zîra merûvan li ser wan ko ji wan mezin in sond dîkin û ji boy îsbatê, sond encamîê nîzanê wan e. ¹⁷ Ji boy vîa Xodê, ji warîs bûoxanê wadê wî ra bê tebdîl bûnê tedbîrê wî hênî pîr bi nîşan dayinê bi xosdinê sond li ortayê anî. ¹⁸ Wusan ko bi bê tebdîl bûn herdu tiştan; ko ji Xodê ra li wan da derew gotinê bê mümkin e, ji qawî teselî ra em malîk bibin, em ko li ber me da ji boy girtinê [527] umudê hîvî dîkin. ¹⁹ Ko av umudê me hebe weka yek emîn û qawî lengerkî ji canê me ra, ko li alîê hindurê perdeê dikeve. ²⁰ Li ko kî Mesîh, weka qalawuz ket ji boy me, ebedî baş îmam bûnê li gora maqamê Melkîsetegê.

SER 7

¹ Zîra av Melkîseteg padîşahê Saxîmê bû, û îmanê Allah Taalaê, ko aw Îbrahîmê qarşîlemîş kir, gava ko aw ji şikenandinê padîşahan digerrîa, û jê ra xayr duwa kir. ² Ko Îbrahîm ji her tiştan jê ra uşur jî da, ko awul padîşahê sadaqatê û paşê padîşahê Saxîmê, yanî padîşahê selametê tabîr dibe. ³ Bê bav, bê dê, bê sîlsîle ko ne îbtîdaê royêt wî heye, ne jî paşê ömrê wî û nola Qurê Xodê heye û disekine, û dayîma îmam dimîne.

⁴ Ê meze kin vîa çiqas mezin bû ko jê ra baş baba Îbrahîm ji yaxmê uşur jî da. ⁵ Ê ki qurêt Xevî bûoxan ko îmanîti distînin, ji qawmê, yanî ji brêtê xo li gora nomosê, uşur sendinê tenbîhê wan heye; her çiqas ko ji piştê Îbrahîmê rabûne jî. ⁶

Lakîn aw ko sîlsîleê wî ko ji wan nebû, ji Îbrahîmê uşur send; û xayr duwa kir jê ra, ko wade hatibû sendin. 7 Lakîn bîla îxtîlaf, xayr duwa mezin ji piçûk ra dike.

8 Û livir meruvê mirinan uşur distînin, lakîn li wê aw distîne, ko ji derhaqê wî hati şehadet bû, erki ganî e. 9 Û dikare bê gotin ko, bi destê Îbrahîmê, uşur sendox Xevî jî, uşur da. 10 Zîra gava ko Melkîseteg awî qarşîlemîş kir aw hêja li piştê bavê xo da bû.

[528] 11 Nua erki tekmlîtî bi destê îmanîtîê Xevîlîan bibana, çûnkî ji xalqê ra li ser vîa nomos hati grêdan; hênî çî? lazim bû li gora tertîbê Melkîsetegê, başqa îmamkî rabe, û naye gotin li gora tertîbê Harûnê. 12 Zîra îmanîtî gava ko tebdîl bû, bîliqtîza tebdîlîtîê nomos jî dibe[.] 13 Û bîra bû, zîra aw ji boy ê kê ko ahwa hati gotin, ji başqa sîlsîlekî bû; ko ji av sîlsîleê qat yekê ji sexan ra nêz nebû. 14 Zîra malûm e ko ji sîlsîleê Cûdaê zuhr kir, Rabbê me, ko ji boy av sîlsîleê Mûsa ji boy îmanîtîê qat tîştîki nego. 15 Û hênî pîr malûm e ko hati tebdîl bûn her çiqas ko li gora tertîbê Melkîsetegê başqa îmamkî ra dibe; 16 Ko aw, li gora nomosê cîsmanî tenbîhê na, lê li gora baqî me hayatê quwwetê bû. 17 Zîra şehadet kir ko, Tu li gora tertîbê Melkîsetegê ebedî îmam î. 18 Zîra aw tenbîhê awulîn tê batal bûn ji boy zayîfîtî û faydesîzîtîê xo. 19 Çûnkî nomos qat tîştîki tekml nekir, lakîn li ser wî hênî umudkî qanc hat, ko bi destê wî em ji Xodê ra nêz dibin.

20 Û baxusûs ko Mesîh bê sond îmam nebû. 21 Çûnkî wan, bîra bê sond bûn îmam, lakîn vîa, bi sond bû, bi destê jê ra gotoxê, ko go: Rabb sond kir û dê poşman nebe; Tu li gora tertîbê Melkîsetegê ebedî îmam î. 22 Mesîh avqasa hênî qanc kefilê ahdê bû.

23 Û hati bûn îmaman pîr in, ji dayîma mayinê wan ra ji boy manî bûnê mirinê. 24 Hama vîa ji boy ebedî mayin ra, bê bihurtin îmanîtîê wî heye. 25 Û ji sebebê han jî ji wan ra ko ji destê wî ji Xodê ra nêz dibin, tamam xe- [529] las kirinê qadîr e çima ko ji boy wan şefaata kirinê dayîma dijî.

26 Zîra ji me ra ahwa baş îmam yaqîşmîş dibobû, azîz bê güne, bê leke ji günekâran hati cîê bûn, û ji azümanan jî hati bilind bûn. 27 Ko jê ra weka aw baş îmaman awul ji boy xo û paşê ji boy qawmê, her ro qurbanan pêşkêş kirinê hacetê wî tunnê, zîra aw xo bi pêşkêş kirinê vîa carkî kir. 28 Çün nomos meruvan baş îmam tayîn dike, ko zayîfîtîê wan heye; hama kelamê sondê, ko paşê nomosê bû, ji ebedan hati tekml bûn Qurê tayîn dike.

SER 8

¹ Û xûlasê hati xaber dan tiştan vîa e ko, Wusan baş îmamê me heye, ko i azûman da li alîê saxê taxta azamet da ronîşd. ² Ko xizmetcîê srparanê û aw sahîh çadirê bibe; ko aw né meşuvan, lê Rabb qurmîş kir. ³ Zîra her baş îmaman ji boy qurbanan û hedîyea pêşkêş kirinê tayîn bûne; ji boy vîa, ji vîa ra jî îqtîza bû tiştê pêşkêş kirinê. ⁴ Zîra erki li ser ardê bibana; îmam jî lazim nâdibo; çima ko li gora nomos hedîean pêşkêş kirinê îmaman hene. ⁵ Ko wan li gora tiştê azûmanîan û li gora sîe xizmet dikan, çawan ko ji Mûsa ra hati sipertin, gava ko çadirê çêdikir zîra go, Mêze ke ko li gora orînegê çîê hemî jî çêkî ko ji ta ra hati nşan dayin. ⁶ Hama nua ji aw ala xizmetê ra nayîl bû; çiqas ko hênî qanc mîyancîê ahdê e, ko li ser hênî qanc ahdan hati brêan.

⁷ Zîra erki aw awulîn bê qusûr bibane, ji **[530]** boy îkîncîê cî aramîş nadibane. ⁸ Zîra tazîl dike wan û dibê, Va ha royan tîn di go Rabb, ko bi mala Îsrayelê û bi mala Cûdayê ahdî nû dê sabît bikim. ⁹ Na weka aw ahdê, ko mi bi bavê wan kir wê royê ko mi ji destê wan grt wan ji welatê Misrê ji boy derxistinê; çima ko wan li ahda mi da nasekinin, mi jî wan terk kir, dibê Rabb. ¹⁰ Zîra ji paşê aw royan bi mala Îsrayelê ahd ko dê bikim vîa e, dibê Rabb: Nomosê xo li fikrê wan dê deynim, û wan li ser dilê wan dê binivîsim, û ez Xodê wan dê bibim û wan qawmê min dê bibin. ¹¹ Û wan her yekê ji hemşerîê xo ra û her kes ji brêy xo ra Rabbê bizan bi gotinê talîm dê nekin, zîra ji mezinê wan hata piçûkê wan hemî jî dê mi bizanin; ¹² Zîra ji nahaqîtiê wan ra afw kroş dê bibim, û güneê hem bînamûsîtiê wan dê hênî li bîra xo nayinin.

¹³ Ahdê nû bi gotinê, awulîn kevin nîşan dayie, û kevin bûn hem îxtîyar bûn tişt ji helak ra nêz e.

SER 9

¹ Nua ji aw awulîn ra qanonê îbadetê hem ji dinê ra dayîr srparan hebû.

² Zîra aw çadrê awulîn ko Srparan dihati gotin, ahwa hati çêbûn, ko li nav ê kê da hebû şamdan û sofra û nanê huzûrê. ³ Û li du îkîncî perdeê pîr azîz der hati gotin çadr bû, ⁴ Ko li nav wî da buxurdanê zêrîn û ji her alîê bi zêr hati qablanmîş bûn sandûxê ahdê hebû, ko li nav wî da bû mana- **[531]** nayê veşartox cêra zêrîn, û asayê Aharonê ko gulî bû taxtayê ahdê. ⁵ Û li ser wî da ji kefaret ra sî kroş celîl keropean hebû; ko ji derhaqê wan nua yeka yek gotinê hacet nin e.

6 Û vanan ahwa bi hati çêbûnê, li çadra awulîn da xizmetê dînê îcra kroş
 îmaman dayîma diketibûn li hindur. 7 Hama li îkîncî da li salê carkî tenê baş îmam
 diketibû, aw jî ne bê xuyn ko aw ji boy xo û ji boy sûca qawmê arz dikir. 8 Azîz Rûh
 vava bi beyan kirinê ko çiqas ko aw çadrê awulîn disekinibû, hêja rêya srparanê
 beyan nébobû. 9 Ko aw ji zemana han ra temsîl e ko li wî da îbadet kroşê li gora
 zamîrê ji tekmlî kirin ra qadîr nébûn hedîcan û qurbanan pêşkêş dibûn. 10 Ko wan,
 tenê qanûnê cesedê deyîl, xwarin û vexwarin, û bi türli türli şûşdinê hata wexta îslah
 bûnê hatin danînê. 11 Hama baş îmamê aw nîymetan ko dê bê Îsa bi hatinê aw ko bi
 dest çênebû, yanî ji yapuyê han nebûn, lê hênî qanc û hênî tekmlî ji çadrê. 12 Li
 srparanê car carkî bi ketinê ne bi xuyna kelecane û mozinan lê bi destê xuyna xo ebedî
 xelasê qazanc kir. 13 Zîra erki xuyna mozinan û kelecane; û xolîyan nayelê gava da
 weşinandinê napakan paqij dikir ji alîê paqijîtîê cesedê. 14 Hênî çiqas pêtir xuyna Îsaê
 ko aw xo bi destê ebedî Rûhê ji Xodê ra bê qusûr pêşkêş kir, zamîrê we ji mirî
 amelan dê paqij bike ko ji Ganî Xodê ra hûn îbadet bikin.

15 Ji boy vîa aw mîyancîê ahda nû e, ko mirina wî ji boy kefarete suçê wexta
 ahda awu- [532] lîne bû, hati dawet bûoxan mîrasa ebedî wadê bistînin. 16 Zîra li ko
 kî ahdkî bibe, îqtîza e ko mirinê ahdê kroşê li ortayê bê. 17 Zîra ahd ji paşê mirinê
 sa[b]ît bibe, çûnkî asla quwwetê wî tunne çiqas ko wadê kroşê sax e. 18 Ji boy vîa ahda
 awulîn jî bê xuyn sabîte nadibe. 19 Zîra gava ko Mûsa gişk tenbîhê nomosê mi hemî
 qawm ra naql kir; xuyna mozinan û kelecane bi sendinê, bi av û herîê sor û bi zobayê
 asl li ser kitêbê û li ser qawmê gişk da weşand, û go. 20 Vîa e xuyna aw ahdê ko Xodê
 ji we ra tenbîh kir. 21 Û ji aw xuynê li ser çadrê jî û li ser gişkê fraqêt xizmetê kezaîk
 da weşand. 22 Û li gora nomosê heman her tiştê bi xuynê tê paqij bûn, û bê xuyn
 rijandinê afwîte nabe.

23 Nua îqtîza e ko orînegê tiştê semawîan bi tiştê hana bîni paqij bûn, hama
 asl semawî tiştan ji vanan hênî qanc bi qurbanan tên paqij bûn. 24 Zîra Îsa bi dest hati
 çêbûn, li srparanê na, ko resma sahîhê e, lê asl li azûmanê ket, ko nua ji boy me li ber
 Xodê bisekine. 25 Na ko pîrê caran aw xo qurban pêşkêş bike, çawan ko baş îmam, ko
 her sal li srparanê dikeve, bi xuyna başqasîê. 26 Erki na îqtîza bû jê ra ji temel bûnê
 dinê pîrê caran elem kişandin, lakîn nua li tekmlî bûnê asran, bi destê qurbana xo, ji
 boy batal kirinê gûnean, carkî aşîkâr bûe. 27 Û çawan ko ji merûvan ra taqdîr bûe
 carkî mirin, û ji vî pê ve şeraat; 28 Wusan jî Îsa yek car hati qurban pêşkêş bûn, ji boy

günee pîran helanînê, lakîn cara îkîncî, bê güne dê aşîkâr bibe ji boy xelasê wan, wan ko jê ra beklemiş dikan.

[533] SER 10

¹ Zîra nomos sîyê aw nîymetan ko dê bên bû, û na asl sûretê aw tiştan, dayîma her sal hati pêşkêş bûn bi aw qurbanan qat nikâre tekmîl bike wan ko nêz dibin. ² Erki na dê feraxet nabana? ji pêşkêş kirinê, çûnkî îbadet kroşan carkî gava paqij bibana, hênî li zamîrê wan da dê xaberê günean nebima. ³ Lakîn bi wan li salê da carkî zîkrê günean dibe. ⁴ Zîra xuyna mozinan û kelecane nikâre günean helîne. ⁵ Ji boy vîa gava ko li dinê dikevi dibê: Qurban û hedîye ta naxosd, hama ji mi ra ta cesedkî tedarîk kir. ⁶ Ji voşçagezan û qurbanan ta haz nekir. ⁷ Wê çaxê mi go, Va ha ez tîm (li naqla kitêb da ji boy min hatî nivîsandin) ko müradê ta bikim, ey! Xodê. ⁸ Awul gotibû ko, Ta qurban û hedîe û voşçagezê û qurbanê günean nexosd û ji wan ta haz nekir; wan ko li gora nomosê tîn pêşkêş bûn; paşê dibê. ⁹ Va ha ez tîm, ko müradê ta bikim, ya! Xodê, awulîn red dike; ko aw paşînan qayîm bike. ¹⁰ Ko bi av müradê em jî tîne paqij bûn bi yek car hati qurban bûn bi cesedê Îsa el Mesîhê.

¹¹ Ê bîra her îmam her ro bi sekinandinê xizmet dike û pîr caran heman aw qurbanan pêşkêş dike; ko wan asla günean helinandinê qadîr nin in. ¹² Lakîn vîa qurbankî bi pêşkêş kirinê ji boy günean ji boy dayîma li alîê rastê Xodê ronîşd. ¹³ Ji vî pê ve dipê hata ko dijminê wî li bin pêla lingê wî bêne datînin. ¹⁴ Zîra bi yek qurbanê ji boy dayîma hati azîz bûnan tekmîl kir. [534] ¹⁵ Zîra Azîz Rûh jî ji me ra şehadet dike, zîra ji paşê awul gotinê; ¹⁶ Ko vîa e, aw ahd ko dê bi wan ra bikim paşê aw royan, dibê Rabb, nomosê xo dê li dilê wan deynim, û li fikrê wan dê binivîsinin wan. ¹⁷ Paşê dibê, Erki güneyê wan û bînamûsîtî wan hênî dê li bîr neynim. ¹⁸ Nua li ko kî afwîfê vanan heye hênî ji boy günean qurban lazim nin e.

¹⁹ Nua ey! brêan, serbestî me heye, bi xuyna Mesîhê li srpvaranê ketinê. ²⁰ Bi aw nû û rêya hayatê, ko ji me ra vekir ji nava perdeê, ko aw cesedê wî e. ²¹ Ê îmankî me mezin bi hebûnê li ser mala Xodê. ²² Bi dilê doxrî em nêz bin, û bi tîjî îmanê dilê me ji yaramaz zamîrê hati paqij bûnê; û cesedê me b ava pak hati şûşdinê. ²³ Îqrara umudê bê tev geşandin em bipên zîra wad kroş emîn e. ²⁴ Ê ji hevûdu ra muqayed bikin, ji muhabet ra û ji amelê qanc ra xayret bidin. ²⁵ Ê li yek cî civandinê xo em nehelin, çawan ko adetê hinikan e, lê em şîret bikin, û baxusûs çiqas ko nêz bûnê aw ro hûn dibînin.

²⁶ Zîra paşê sendinê îlmê doxrîtîê, bi îradetê gava em güne bikin, hênî ji vî pê ve, ji boy günean qurban namîne. ²⁷ Lê beklemîşê tîrsinê şeraatê û xazabê agirê ko aw zid sekinoxan dê bixor. ²⁸ Erki yekê nomosê Mûsayê red bikra, bi dido, ya sisê şahîdan bê merhamet dihatibû kuştin. ²⁹ Hênî çiqas? beter ji azab ra mustahaq dê hasab bibe aw, ko Qurê Xodê li bin lingê xo send, û xuynê ahdê napak hasab kir, ko bi awî aw hati paqij bûn û ji Rûha înetet ra küfr kir. ³⁰ Zîra em dizanin awî kî go, Hayfa min e, cezaê ez dê bi- [535] dim, dê bê Rabb û dîsa, Rabb şeraatê qawmê xo dê bibîne. ³¹ Li destê Ganî Xodê ketin, tîrskî mezin e.

³² Ê aw roya awulan li bîra xo bînin, ko paşê hati rohnî bûnê, hûn elemê pîr ezîyetan kişandin. ³³ Ji alîkî bi serhevdan û sixletan ji alem ra hûn tamaşa dibûn, û ji alîkî jî ji ahwa sixlet kişandoşan ra hûn îlhaq dibobûn. ³⁴ Çima ko bi hati grêdanan hûn hemderd bûn, û talana malê xo, hûn bi şazîtîê qabûl kirin, çûn hûn fehî kirin ko li azûman da hênî qanc û baqî mayin warîyetê wê heye, ³⁵ Nua serbestîê xo bermedin, ko azîm îwazê wî heye. ³⁶ Zîra ji we ra lazîm e sabr, ko meramê Xodê bi îcra kirinê, ji wad ra layîq bibin. ³⁷ Zîra hênî hinik zeman heye, û aw ko dê bê, dê bê, û dereng dê nekeve. ³⁸ Hama sadiq bi îman dê xelas bibe, û erki yekê li şûnda disekine, canê min ji wî haz nake. ³⁹ Hama em li şûnda nasekinin ko helak bibin, lê îman tînin, ko canê me xelas bibe.

SER 11

¹ Ê îman tekmîl îtîmatê umud bûn tîştan, û îbadet nexuyan tîştan e. ² Zîra bi vîa ji awulan ra şehadet hati dayin.

³ Bi îman em dizanin ko dinê bi kelamullahê îhtas bû, û ji nexuyan tîştan, aw xuyayîan bûn.

⁴ Bi îman Apel ji Xodê ra ji Gayen pêtir qurban pêşkêş kir, ko bi awî ji sadiq bûnê wî ra hati şehadet bûn, çima ko ji boy hedîeê wî, Xodê şehadet kir, û bi awî faraza mir, hama hêja xaber dide.

[536] ⁵ Bi îman Yenok ji ardê hati gohrandin, ko mirin nebîne, û nedîtin bû, çima ko Xodê awî gohrand, zîra ji gohrandnê wî awul hati şehadet bûn ko ji Xodê ra maqbûl e. ⁶ Lakîn bê îman ji Xodê ra maqbûl bê mûmkîn e, zîra aw ko ji Xodê ra nêz dibe, lazîm e ko îman bîne, ko Xodê heye, û îwaz dayox e ji wan ra ko awî aramîş dibin.

7 Bi îman Nûh ji Xodê bi emr sendinê hêja ji boy tiştê nexuyan bitirsîa gemî çêkir, ji boy mala xo xelas kirinê, ko bi awî dinê suçlî xuyayî kir, mîraxor bû ji aw sadaqat ra ko bi îman bide.

8 Bi îman Îbrahîm gava ko gazî bû godarî kir li aw der rabe; û ko dê mîras bisendana, û rabû çû; û nedizanibû li ko diço. 9 Bi îman li aw dîyara wadê da weka li qurbetê da mûsafîr bû; û heman bi aw hem warîsê wadê Îshaq û Yaqûbê tev li çadran da sakîn bû. 10 Zîra ji aw hati temel bûn bajêr ra beklemîş dikiribû, ko awî bîna kirox mîmar Xodê e.

11 Bi îman Sara jî zürîyet hifz kirin ra quwwet send, û paşê wexta xo bihurtinê ewlad za, çima ko wad kroxê emîn hasab kir. 12 nua ji aw yekê zan, aw jî weka mirîê, ji alîê pirîtiê qasa îstêrê ezûmanan û weka li kenarê bahrê da bûn qûmê bê hasab.

13 Avanan bi îmanê mirin wadê hêja nesendin, lê ji dûr ve wan bi dîtinê şaz bûn, û îqrar kirin ko wan yabancî û mûsafîr in. 14 Zîra wan ko ahwa tiştan dibên, beyan dikin ko watankî aramîş dikin. 15 Ê bîra erki awî zîkr bikirana ji ko kî rabûn, li wê derê şûnda vegeṛandinê wexta wan hebû. 16 Hama nua ji [537] hênî qanc watankî ra arzû dikin, yanî ji azûman ra, ji boy Xodê Xodêê wan hati gotinê, ji boy wan fedî nake, zîra ji wan ra bajêrkî hazr kir.

17 Bi îman Îbrahîm gava carîbandinê Îsaqê qurban pêşkêş kir, aw ko wadê sendibû yek kvurvikê xo pêşkêş dikir. 18 Ji awî ra hati gotin ko bi Îsaq ji ta ra zürîyet dê bê gazî bûn. 19 Çima ko dîşûmîş bû ko Xodê ji mirîan jî qîyam kirinê qadîr e, ji ko kî bi temsîlkî awî send.

20 Bi îman Îsaq ji boy aw tiştan ko dê bên bi peyṁberîti kirinê xayr kir ji Yaqûb ra û ji Yesav ra. 21 Bi îman Yaqûb gava ko dîmir, ji kurêti Yûsîf ra ji her yekê ra xayr dowa kir, û li ser asayê xo bi ketinê secde kir. 22 Bi îman Yûsîf gava ko dîmir, zîkr kir ji kurêti Îsrayel ra rabûnê wan ji Misrê, û ji boy astîê xo tenbîh kir.

23 Bi îman gava ko Mûsa za sê meh ji bav û dîyê xo hati veşartin, çima ko zarûkê dîlber dîn, û ji fermanê padîşahê netîrsan; 24 Bi îman gava ko Mûsa mezin bû, qabûl nekir ji qîza Fîraon ra ewlad bê gotinê. 25 Çûnkî bi qawma Xodê tev ezîyet kişandinê hênî pêtir hasab kir, na ko zemanî sefayê gûnê ajotin. 26 Zîra serhevdeê Îsaê ji xazneyêti Misirê hênî pîr mezin zengînîti hasab kir, zîra bi zaninê beklemîş dikir ji iwaz ra. 27 Bi îman Misrê hişt, û ji xazabê padîşahê netîrsîa çima ko sabr kir

weka ko nedîtin dibîne. ²⁸ Bi îman kir basekê û reşandinê xuynê; hata ko aw awul zayoxan helak kroş ji wan ra neqeve³⁹⁵.

²⁹ Bi îman ji bahrê Sor bihurin weka ji zuwa- [538] yê; ko Misîrlîyan vîa bi çeribandîne xarq bûn. ³⁰ Bi îman hîsarê Yerîkovê ketin, haft ro li dorê wî bi gerandinê.

³¹ Bi îman fahîşe Raxap casûsan ji boy bi selametê qabûl kirinê bi îmansizan tev helak nebû.

³² Ê hênî çi? bêm, çima ko wext tunne ji mi ra ko naql bikim, ji boy Ketone, Paragê û Samsonê û Heptayê û Dawûdê û Samuelê û ji başqa peyxemberan. ³³ Wan ko bi îman padîşahîtan fath kirin, sadaqat şixulin, ji wadan ra gihîştin, devê aslanan girtin. ³⁴ Quwwetê agrê tamarandin, ji devê şûrê xelas bûn, gava ko zayîf bûn, quwwet sendin, li ceng da bi quwwet bûn orduyê xarîban bela kirin. ³⁵ Jinan meyîte xo hati qiyam kir sendin; hinikan îskence kişandin, û azadîti qabûl nekirin, ko ji qiyamet ra nayîl bûn. ³⁶ Ê hinikan jî serhevdan û kutan, hem daxî grêdan û habsan kişandin. ³⁷ Hatîn kevîr bûn, bi birîkê hatin brandin, û tercûban kişandin bi qatlê şûrê hatin kuştin, bi posta mîyê û bi posta bizinan hati wergirin; tunne bûn hem sixintî û ezîyet bi kişandinê gerîan. ³⁸ Ko dinê ji wan ra layîq nebû, li çolan da, li çîyan da û li maxaran da û li qulê dinê da aware hatin gerandin.

³⁹ Ê avanan hemî bi îman hatin şehadet bûn, wadê nesendin. ⁴⁰ Çima ko Xodê ji boy me hênî qanc tiştî tedarîk kir, hata ko wan bê me tekmlî nebin.

[539] SER 12

¹ Nua ê me jî ko ko avqas cûmhûrê şahîdan li dorê me da hati danîn heye; hemî granîte ji ser xo li alîkî em bavên, û me bi qolay zabt kroş güneê berdîn, û li ber me da hati danîn li meydanê cehdê da bi sabrê bazdîn. ² Ji qalawuz û tekmlî kroş îmanê meza mêze kin, ko aw ji boy aw şazîtî, ko li ber wî da sekinîbû, xaç bûn li ser xo send, şerm bûn hasab nekir, û li alîê rastê taxta Xodê ronîşd.

³ Nua bîra xo bînin awî, ahwa sabr kir ji günekâran ra jê ra zid gotin ra, ko nebe li canê xo da raht bin û sist bin. ⁴ Hêja qasa xuyn rijandinê bi cehd kirinê li qarşî günean hûn nesekinîne. ⁵ Ê aw şîretê hûn bîr kirin ko, ji we ra weka kuran ra bibê: Kurê min şîretê Xodê red meke, û gava ko jê tektîr dibî sist mebe. ⁶ Zîra Rabb awî ko

³⁹⁵ Di metnê de neqeve.

dihebîne tedîb dike, û dikute aw hemî ewladan ko qabûl dike. 7 Erki ji tedîb ra hûn dayanmîş bikin, Xodê bi we ra weka bi ewladan ra muamele dike, zîra kîjan? kur e aw ko bavê wî awî tedîb nake. 8 Hama hûn erki bê tedîb bibin, ji awî ra ko hemîan hîssedar bûn, bû kî hûn pîc in û na ewladan. 9 Ji vî başqa ji alîê cesedê bavêt me ji me ra tedîb kroş in ji wan ra em hürmet dikiribûn, hênî pêtir ji Bavê rûhan ra, em îtaat nekin, ko em bijîn. 10 Zîra wan hinik zeman weka ji wan ra çawan xoş dihatibûn dîtin aw gora tedîb dikiribûn, hama aw ji boy [540] faydeê me dike, ko ji azîzîtiê wî ra em hîssedar bin. 11 Ê bira her tedîb li wî wextê da ji boy şazîtiê naxuyaye, lê ji boy qasawetê, lakîn paşê selametê sadaqatê tîne ji wan ra ko bi awî talîm dibin.

12 Ji boy vîa aw dest ko sist in û aw çokan ko zayîf in bişidînin. 13 Ê ji lingê xo ra rêya rast çêkin, hata ko aw ko diqûle xwar nebe, lê şîfa bibe. 14 Li dû selametê bin, bi hemûan ra û li dû sadaqatê, ko bê wîa yekê nikare Xodê bibîne. 15 Saqin bin nebe ko yekê ji îneyetê Xodê mahrûm bibe, nebe ko qurmî tahlîtiê li jor xuyayî bibe, mazaratkî bibe, û bi sebebê wî, pîranmurdar bin. 16 Nebe ko yekê zînakâr, ya murdar bibe, weka Yesavê ko dêla taamkî haqa awul zayinê xo frot. 17 Zîra hûn dizanin ko faraza paşê xosd warîsê bereketê bibe; lakîn red bû; çima ko cîê poşmanîtiê nedît li ser bavê xo, faraza bi hêsrane çahvan lê gerîa.

18 Zîra hûn bi dest hati girtin li çîyayê nêz nebûn; ko bi agir heldîba, ne jî li dûmanê û tahrîtiê qasirxayê. 19 Ê li dengê boruê, û dengê xabera ko awî bihîsdoşan şûnda kişîan, bi lava kirinê ko carkî aw söz neye gotin ji wan ra. 20 Zîra nedikaribûn tehamûl kirinê ji aw tenbîh ra, erki canawarkî jî li çîyê ra bi ketina, dê bi hatina kevîr bûn. 21 Ê ewqas hîybetlî bû aw hati dîtin tişt ko Mûsa go: Xayet ditîrsim û dilerzim. 22 Hama hûn li Sîon çîê ra nêz bûne, li bajêrê Ganî Xodê ra, li semawî Yerusaxem ra, û li cemîyetê deh hazaran melean. 23 Ê li azûman da hati qayd bûn li kîlîsayê hati a-[541] wul zayinan, û li Şeraatcîê hemîan li Xodê ra, û li hati tekmîl bûn rûha sadîqan ra. 24 Ê li Mesîh ra ko mîyancîê ahda nûê e, û li hati rijandin xuyn ko ji xuyna Apelê hênî qanc xaber dibe.

25 Saqin bin, nebe ko red bikin awî ko bi we ra xaber dide, zîra erki wan li ser ardê kelamullahê xaber dayox bi red kirinê xelas nebûn, hênî çîqas pêtir em, erki ji azûmanê xaber dayox rûya xo ba din. 26 Ko dengê wî wê çaxê ardê hişkand, hama a nwa, wad kirîe û dibê, Teqrar³⁹⁶ dê bi bihişkînim na tenê ardê, lê azûman jî daxî. 27 Ê

³⁹⁶ Di metnê de *Teqrar*.

av tekrar³⁹⁷ xaber nîşan dide tebdîl bûnê hati hişkandin tiştan, weka tiştê çêbûn; ko hati nehişkandin tiştan qawî bimînin. ²⁸ Nua nehişkandin padîşahîtiê em bi qabûl kirinê, em pêt bigirin aw îneyetê ko bi awî ji Xodê ra maqbûl in, bi edeb û bi dîndarîtiê îbadet bikin. ²⁹ Zîra Xodê me telef kirox agir e.

SER 13

¹ Brê hebandin li nav we da qawî bimîne. ² Müsafîr qabûl kirinê bîr mekin; zîra bi avî hinikan bi nezaninê melean qabûl kirin. ³ Li bîra we da bin mahbûsan, weka ko hûn jî bi wan ra mahbûs in, û ezîyet kişandoxan weka ko ê we jî cesed heye. ⁴ Zewicandin ji bin îzzetlî e, û lihêf bê leke e, lakîn fahîşan û zînakâran Xodê dê hükm bike. ⁵ Meşrebê we bê tama bibe, bi aw hazir hati dîtin tiştan qanaat bikin; zîra aw go kî, Qat ezê ta dê nehêlim, û qat ezê ta dê terk nekim. ⁶ Wusan ko [542] bi cesaret kirinê bibên, Rabb yardimcî min e, û ez dê netîrsim, meruv ji mi ra dê çi? bike. ⁷ Bîra xo bînin qulaXuza xo, wan ko kelamullahê ji we ra gotin, û li axirê heraketê wan bi mêze kirinê, ji îmana wan ra uymîş bin, ⁸ Îsa el Mesîhê do û îro ji ebedê heman av e.

⁹ Dür la dür la û bi ecnebî talîman ji derê dermeyin kaşandin, zîra qanc e ko dil bi îneyetê sabît be; û na bi taaman, ko bi wan faydekî kesb nekirin wan ko wusan çûn. ¹⁰ Sexankî me heye ji wî ko hükmâtê wan tunne xwarinê, ko ji çadîra xizmet dikin. ¹¹ Zîra xuyna aw haywanan ko srparanê dihatibû birin ji boy güneyan bi destê baş îmamê, cesedê wan ji orduê derve dihatibû şawutandin. ¹² Ji boy vîa Mesîh daxî, bi xuyna xo qawmê ji boy paqij kirinê ji derê derve ezîyet kişand. ¹³ Nua werin em jê ra rabin ji orduê derve, serhevdeê wî li ser xo bi sendinê. ¹⁴ Zîra livir baqî mayin bajêrê me tunne lê aw ko dê bê, em awî aramîş dikin. ¹⁵ Nua bi destê wî ji Xodê ra dayîma qurbana hamdê pêşkêş bikin, yanî meyweê lêva me ko navê wî zîkr dikin. ¹⁶ Ê qancîti kirinê hem tesaduqê bîr mekin; zîra Xodê ji ahwa qurbanan haz dike. ¹⁷ Ji qulaXuze xo ra îtaat bikin û mütêh bibin; zîra wan ji boy canê we heşar disekin, weka ko dê cewab bidin, wusan ko vîa bi şazîtiê bikin, û na bi ax kişandinê, zîra vîa ji we ra bê fayde dibe. ¹⁸ Ji boy me dowa bikin, zîra em qanmîş bûne, erki qanc zamîrê me heye, û li her tişt da em dixwazin ko qanc heraketê me bibe. ¹⁹ Ê baxusûs reca dikim ko vîa hûn bikin; wusan ko ji we ra zû vegeirim. [543]

³⁹⁷ Di metnê de *Teqrar*.

²⁰ Û Xodêê selametê ko ji mirîan rakir Rabbê me Mesîhê, ko bi xuyna ebedî ahdê mezin şivanê mîyan e, ²¹ We li hemî amelê qanc da qawî bike, meramê wî kirinê, û li nav we da li ber wî hati xoş bûn bike bi destê Îsa el Mesîhê, ko ji wî ra ebed il ebed îzzet bibe; Amîn.

²² Û ji we ra lava dikim, ey! brêan, ji söza şîret ra tehamûl bikin; çünkî ji we ra mi muxtasar nivîsand. ²³ Bizanin ko brêê me Dîmoteos hatîe berdan, bi wî ra erki zû bê dê wê bibînim. ²⁴ Silavan bikin ji hemî qulawuzêt xo ra, û ji hemî azîzan ra ji we ra silavan dîkin wan ko ji Îdalîan in. ²⁵ Înayet bi we hemîan bibe, Amîn.



MEKTÛBÊ GATOXÎGÊ Ê RESÛLÊ YAQÛB

SER 1

¹ Yaqûb qula Xodê û Rabb Îsa el Mesîhê, ji we ra ji dwanzdeh sîlsîlan ra ko li hemî alî bela bûn e; silavan dike.

² Ey! brêan, gava ko hûn dikevin li nava dûrla dûrla tecrûban da, vîa tekmlîl şazîtî hasab bikin. ³ Û bizanin ko, îmtîhanê îmanê we sabr dişixule. ⁴ Hama tekmlîl amelê sabrê bibe; hata ko qat li tiştêkî da kêmanîê we tunne be, tekmlîl û tam bibin.

⁵ Û erki yekê ji we li îlm da kêm e, bra ji Xodê dîleg bike, ko ji hemîan ra bi cömerdîtî dide, û serhevde nake, û ji wî ra dê bê dayin. ⁶ Lakîn qat şûphakî nekirinê, bi îman bra dîleg bike; zîra aw ko bi weswese e dimîne, ji ba hati hişkandin û tevgerîan dalxayê bahrê. ⁷ Bra aw meruv taxmîn neke ko ji Xodê tiştêkî dê bistîne. ⁸ Meruvê du fikr, li hemî rêya xo da qararsiz e.

⁹ Li alçağ hal da bûn brê, li ser bilindîtîê xo bra pasna xo bike. ¹⁰ Û aw ko zengîn e, li ser alçağîtîê xo; zîra weka gula gîyaê dê bi- [545] hure. ¹¹ Zîra gava ko tav heraretê radibe, gîyaê hişk dike, û gula wî dirije, û hati xuyan dîlberîtîê wî zay dibe, ahwa jî zengîn li rêya xo da dê solmîş bibe.

¹² Xozî ji aw meruv ra ko li tecrûba da sabr dike; zîra bi tecrûbe bûnê, taca hayatê dê bistîne, awî ko Rabb, awî hebandoğan ra wád kir. ¹³ Né be ko yekê ko li nav tecrûbe da e, bêje, erki ez ji Xodê tecrûbe dibim; ne jî aw yekê diceribîne. ¹⁴ Hama her kes tê ceribandîn, ji arzûê xo hati kişandin û xapandin. ¹⁵ Ji vî pê ve arzû bi avis mayinê günean dibe, û gava ko güne îcra dibe, mirin dibe. ¹⁶ Méyin xapandin, eyê delalî brêan. ¹⁷ Her dayinê qanc û tekmlîl baxşîşan ji jor in, û ji Bavê rohnîê tîne xwarî; ko li wî da qat tebdîlîtî, ya veğerandî sîkî tunne. ¹⁸³⁹⁸ Bi mûrad kirinê me za bi söza doxrîtîê ko em turfandakî maxlûqatê wî bibin. ¹⁹ Nua, ey! delalî brêet min her kes ji bihîsdin ra zû bra bibe; û ji xaberdan ra gran, û ji sû hatin ra gran. ²⁰ Zîra her sê meruv sadaqatê Xodê neşixule.

²¹ Ji boy wî her murdarîtî û pirîtîê kötîfî, bi terk kirinê, li nav we da hati ajotin sözê bi mahcûbîtîê qabûl bikin, ko aw canê wê xelas kirinê qadîr e.

³⁹⁸ Di metnê de ¹² (nîşeya wergêrê).

22 Îcra kroxê sözê bibin û né tenê bihîsdox û hûn xo mexapînin. 23 Zîra erki yekê tenê bihîstoxê sözê dibe, û îcra krox nébe, aw dimîne meşuvkî, ko li nav lîlikê da sûretê wucûdê xo nazar dike. 24 Zîra bi nazar kirinê aw xo dî, û bihurî çû, û zû ve bîr kir, [546] erki aw çî tarz meşuvkî e. 25 Lakîn aw ko bi dîqat kirinê li tekmlî nomosê azadîtîê dinihêre, û li wî da disekine, bi bîr krox bihîsdox nábe, lê amel krox e, av meşuv li amelê xo da saadetlu dê bibe. 26 Erki yekê aw xo dîndar taxmîn dike, û zimanê xo zabt néke, lê dilê xo dixapîne, dinê awî batal e. 27 Li ba Xodê û Bav, pak û bê qusûr dîn vîa e; oxramîşê sêvîan û jinebîan bibe li wexta sixintîê wan da, û aw xo ji dinê bê qusûr bipê.

SER 2

1 Ey! brêt min, nébe ko bi xatr bigrin îmanê Rabbê me Îsa el Mesîhê, ko aw Rabbê celalê e. 2 Zîra erki li nav cemaatê wê meşuvkî bi cilê qanc bê, ko gûstîrê zêrîne wî hebe, li wê faqîrkî jî bê bi cilê nêşuşdî. 3 Û hûn mêze kin li ser awî ko cilê qanc heye, û bêjin erki tu livir ronî bi xoş, û ji aw faqîr ra bêjin, erki tu li ser pîan li wê bisek, yaxod ronî li bin pêla lingê min. 4 Wê çaxê zamîrê wê tazîl nake?, û hûn bi yaramaz fikr hakîman nabin?. 5 Bibihên, ey! delalî brêan, Xodê faqîrê dinêê han nabijart?, wan ko bi îman zengîn in, û mîrascîê aw padîşahîtian, ko wad kir wan ra ko awî dihebînin. 6 Lakîn faqîran rezîl kirin, zengînan ni? nin ko ji we ra zulm dîkin, û wê li mehkeman da dikşînin. 7 Wan ni? nin ko küfr dîkin aw navê qanc ko li ser wê hatîe gazî kirin. 8 Nua erki hûn li gora Kitêbê, Cîranê xo weka xo bihebînî, nomosê padîşahanê îcra dîkin, [547] hûn qanc dîkin. 9 Hama erki bi xatr bikin, güne dîkin, ji nomosê weka qabahatlîan tazîr dibin. 10 Zîra kî ko gîjk nomosê îcra bike, û li tiştîkî da xata dike, aw ji hemî nomos ra suçlî dibe. 11 Zîra aw Qatl méke gotox, zîna jî méke go; nua erki zîna nekî, hama qatl bikî, nomosê xarab krox dibî. 12 Wusan xaber bidin, û wusan amel bikin, weka ko bi nomosê azadîtîê hûn dê hükm bin. 13 Zîra bê merhamet şeraat dê bibe ji awîra ko merhamet náke, merhamet li ber şeraatê pasna xo dide.

14 Çî? fayde, ey! brêan, erki yekê bibê, Îmanê min heye, û amel tunne be, meger îman dikâre³⁹⁹ awî xeelas bike. 15 Û erki brêkî, ya xuşkî tahzî bibe, ya mühtacê taamê hemî royan. 16 Û ji wê yekê ji wan ra bêje, Heşin bi selametê, germ

³⁹⁹ Di metnê de *dikâra*.

bin, û têr bin, hama erki ji wan ra, ji gowda ra îqtîza tîştan nêdin, çî? fayde. ¹⁷ Ahwa jî îman erki bi xo ra amel tunné be, aw ji xo ra mirî e. ¹⁸ Hama yekê dê bêje, ê ta îmanê ta heye, a min jî amelê min heye, ji mi ra tu îmanê xo bê amel nîşan bide, û ez ji ta ra nîşan bidim îmanê xo ji amelê xo. ¹⁹ Tu îman tînî ko Xodê yek e, qanc dikî, şeytanan jî îman tînin, û dilerizin. ²⁰ Hama dixwazî? bizanî, ko îman bê amel mirî e, ey! merûvê batal. ²¹ Îbrahîm bavê me bi amel sadiq nébû, gava ko kurê xo Îsaqê li ser sexanê deranî qurban kirinê. ²² Mêze dikî?, ko îman bi amelê wî tev şîxulî, bi wî amelê îman tekmîl bû. ²³ Ê xaberê kitêbê temam bû, ko dibê, Îbrahîm ji Xodê ra îman anî, û aw ji wî ra sadaqat hati hasab bû, û aw dos- [548] tê Xodê hati gotin. ²⁴ Dibînin? ko merûv bi amelan sadiq dibe û ná tenê bi îman. ²⁵ Wusan jî fahîşe Raxap, na? ko bi amelan sadiq bû, gava ko casûsan⁴⁰⁰ qabûl kir, û bi başqa rêkî wan berda. ²⁶ Zîra çawan ko gowda bê can mirî e, ahwa jî îman bê amel mirî e.

SER 3

¹ Pîr xocaan mébin, eyé brêan, çûn bizanin ko, hênî mezin azaban em dê bistînin. ² Zîra em hemîan li pîr tîştan da xata dikin; erki yekê, li söz da xata nâke; kâmil merûv aw e, û hemî gowdayê xo jî qadîr e zabt kirin. ³ Mêze ke ko em li devê hasban da gem datînin, ko wan ji me ra îtaat bikin, û hemî vücûdê wan em divegerînin. ⁴ Va ha gemîan jî çiqas tîştê meizn in, ji şîdet bayan tîne ajotin; lakîn bi pîr piçûk dûmenê tîne zivîrandin, kîjan alî ko dûmencî bixwaze. ⁵ Ahwa jî ziman azakî piçûk e, û tîştê mezinan xaber dide; va ha piçûkî agir, çiqas kereste dide vexistin. ⁶ Ziman jî agirkî e, dinê nahaqîtiê, ziman li azaêt me da wusan hatîe danîn, ko gowda hemî bi leke dike, û dewra ömrê dide vexistin; û aw ji cehennemê tê alev bûn. ⁷ Zîra gerek e canawaran, gerek e teyran û gerek e soxûnan hem li av da bûn tabîatê haywanan, ji tabîatê însan zabt bidin, hem zabt bûne. ⁸ Hama ziman, ji merûvan qat qadîr nin e zabt kirinê, zabt nébûn tîştê kötî e, ji mirin anox axûê tîja e. ⁹ Bi awî em mübarek dikin Xodê û Bavê, bi awî em ji merûvan ra bedduwa [549] dikin, wan ko li sûrata Xodê xalq bûne. ¹⁰ Heman ji aw devê tîne xayr duwa û bedduwa; tîştê hana, ey! brêêt min, lazim nin e ko ahwa bibe. ¹¹ Qat ji kanîkî, heman ji aw yek devê ava tahl û şîrîn dertê?. ¹² Meger qabîl? e ey! brêêt min, ko dara hêjêlê zeytûn bîne, yaxod mêw hêjîlan bîne; wusan jî qabîl nin e ko ji yek kanîê bi xoy û

⁴⁰⁰ Di metnê de *casûdan*.

şîrîn aw der bê. ¹³ Li nav we da alîm û bi aql kî? heye; bra aw bi heraketê qanc nîşan bide amelê xo bi mahcûbîtîê îlmê. ¹⁴ Hama erki li dilê we da hasedê tahl û rûha nîzaê heye, pasna xo médin û doxrîtîê derew mederînin. ¹⁵ Îlmê han ji jor nin e, lakîn dînyawî, nefsanî û şeytanî e. ¹⁶ Zîra li ko kî hased û nîza heye, li wê e nîzamsizîtî û hemî tiştê kotî. ¹⁷ Hama îlmê jorîn awul pak e, paşê bi selamet, mahcûb, bi îtaat; ji merhametê û ji meyweê qanc tîjî, bê xaraz, û durîtî nâke. ¹⁸ Ê meyweê sadaqatê bi selametê tê ajotin ji wan ra, wan ko selamet îcra dîkin.

SER 4

¹ Li nav we da cengan û qawxayan ji ko? dibin, ji vîa nin? e, yanî li azaê we da ceng helandox ji dil bijandinê. ² Arzû dîkin, û malîk nâbin; qatl dîkin, û hased dîkin, û li dest naynin; qawxa dîkin, û pêş diçun, û malîk nâbin; çima ko dîleg nâkin. ³ Dîleg dîkin, û nâstînin; zîra bi kötî nîyetê dîleg dîkin; hata ko ji arzûet xo ra xarc bikin. ⁴ Ey! zînakâr mêr û jinan, hûn nizanin? ko dostîtîê dinê han li ber Xodê dijmînîtî e; nua her kî ko dixwa- [550] ze dostê dinê be, dijminê Xodê dibe. ⁵ Yoxsa taxmîn dîkin hûn, ko Kitêb nafîle? dibê: Li nav me da sakîn bûn rûh, ji hased ra pîr meyl dike. ⁶ Lakîn Xodê ji maxrûran ra zid disekine, hama ji alçağ gönûlian ra înyet dide. ⁷ Nua ji Xodê ra mûtêh bin; zida Şeytanê bisekinin, û ji wê dê bireve. ⁸ Ji Xodê ra nêz bin, û aw ji we ra dê nêz bibe; ey! günekâran, destê xo paqij bikin. ⁹ Derd bikşînin, û qasawet bikin, û bigirin; keninê wê ji qasawet ra, şazê wê ji derd ra tebdîl bibe. ¹⁰ Li ber Xodê alçağ bin, û awî wê dê bilind bike.

¹¹ Ey! brêan, hevûdu zem mekin, brê xo zem kroğ, nomosê zem dike; û nomosê hükm dike; û erki nomosê hükm bikî, nomosê îcra kroğ nin î, lê hükm kroğ î. ¹² Nomos grêdayox û hükm kroğ yek e, aw ko ji xelas kirin ra helak kirin ra qadîr e; hama tu kî? î, ko başqasîan hükm dikî.

¹³ Nua godarî bikin hûn ko dibên: Îro, ya sibê emê herî filan bajêrê, û li wê salkî dê bisekinin; emê alişverîş bikin û qazanc bikin. ¹⁴ Hûn ko çi bûnê sibê nizanin, zîra ömrê wê çi e; çûnkî aw hêlmkî; ko hinik wext dixuya û paşê nabadîd dibe. ¹⁵ Li dêla wî gerek bigotana, erki Xodê rast bîne û em bijîn; tiştê han, ya aw, emê dê bikin; ¹⁶ Lakîn nua li ser max, rûrîtîê xo îftîxar mekin, hemî ahwa îftîxaran ji yaramazê ne. ¹⁷ Nua her kî ko qanc kirinê dizane û nâke aw güne e jê ra.

[551] SER 5

1 Nua wérin, ey! zengînan, ji boy aw belayan ko li ser we dê bên, bişîn kirinê bigirin. 2 Zengînitîê wê çürümüş bûe, û cilê we taamê gizûz bûe. 3 Zêr û zîvê wê pars bûe, û parsê wan lê qarşîê wê ji boy şehadetê dê bibe; û goştê wê weka agir dê bixo, ji boy roya paşnê hûn xazna top nekirin. 4 Va ha ücretê zevîê wê hasad kroş palayan ko hûn li cem xo danîne, feryad dike û feryadê hasadvoran li goya Rabbê askerê gîhîşt. 5 Li ser ardê hûn zewq û sefa ajotin, dilê xo xoyî kirin weka ko ji boy roya serjêkirinê. 6 Wê hükm kir û kuşt sadîqê, ko ji we ra nadisekinibû.

7 Nua ey! brêan, hata hatinê Rabbê sabr bikin, va ha cotkâr ji qiymetlî mahsûlê ardê ra beklemiş dike, hata ko baranê awulîn û paşîn bistîne. 8 Hûn jî sabr bikin, dilê xo qawî bigrin, Zîra hatinê Rabbê nêz e. 9 Ey! birêan li qarşî hevûduan ax mekşînin, hata hükm nebin, va ha hakîm li ber derîê disekine. 10 Ey! brêêt min, li meşaqat kişandin da û sabr da bi nêva Xodê xaber dayox peyemberan ji xo ra îbret bigrin. 11 Va ha ji sabr kroşan ra em xozî dikin, sabrê Eyûbê hûn bihîstin, û encamîê Rabbê wê dîn, ko Rabb bipir merhamet û merhametlî e.

12 Ji hemîan awul ey! brêan, sond mekin ne bi azüman û bi ardê û ne jî bi başqa sondê, lê belêê wê belê bibe, û nêê wê ná, hata ko li bin hükm û azabê nekevin.

13 Erki ji wê yekê li meşaqat da e, bra dowa [552] bike, erki dilê yekê şen e, bra îlahî bixoyne. 14 Erki ji we yekê naxoş e yeretset kîlîseyê bira gazî bike, li ser wî bra duwa bikin, bi navê Rabb bi rûn, rûn bikin awî; 15 Ê duwayê îmanê ji naxoş ra dê şîfa bide, û Rabb awî dê rake; û erki güne jî kirîê dê jê ra afw bibe. 16 Ji hevûdu ra qabihatêt xo îqrar bikin û ji boy hevûdu duwa bikin, ko şîfa bibînin, pir quwwetê heraretlî duwaê sadîqê heye. 17 Elîa bi me ra elemdaş meşuv bû û duwa kir ko baran nebare, û li ser ardê sê sal û şeş meh baran nebarî. 18 Ê dîsa duwa kir, û azüman dîsa baran da û ard mahsûlê xo da.

19 Ey! brêan, erki ji we yekê ji doxrîtîê şaş bibe û yekê awî bivegerîne. 20 Bizanibe ko aw ko günekarê ji rêya xo şaş divegerîne, cankî ji mirinê xelas dike û pir günean dinixêfe.

MEKTÛBÊ GATOXÎGÊ AWULÎN Ê RESÛLÊ BEDROS

SER 1

¹ Bedros resûlê Îsa el Mesîhê, ji wê ji mûsafîran ra ko bela bûne li Bondosê, li Kaxadiyê, li Gapaŧovgîyê, li Asîyê, û nava Pütanîyê, ² Ko li gora taqdîrê Pederullahê bi azîzîtîê Rûhê, ji boy îtaatê û ji boy rişkandinê xuyna Îsa el Mesîhê, hûn hatin bijartin, îneyet û selamet li ser wê pîr bibe.

³ Mûbarek e Xodê û bavê Rabbê me Îsa el Mesîhê, aw ko me, li gora pîr merhamet xo, bi destê ji mirîan qiyam kirinê Îsa el Mesîhê, ji ganî umud ra me tekrar za. ⁴ Ji boy xarab nêbûn, nêpak nêbûn, û solmîş nêbûn mîrasê; ko li azûman da ji boy we veşartîe. ⁵ Ko bi quwwetê Xodê hûn hatin veşartin bi îmanê ji boy aw xelasê, ko hazir bûe li axir zeman da aşîkâr bûnê. ⁶ Ko bi awî hûn şaz dibin; farza nua çawan ko îqtîza dike, hinik wext hûn bi qasawet bûne bi dûrla dûrla tecrûbean. ⁷ Wusan ko tecrûbeê îmanê wê ko ji hati helak bûn zêrê hênî bi qiymetlî [554] e, farza aw bi agir qal dibe, bê dîtin, bi medh û bi îzzet û bi celal wexta aşîkâr bûnê Îsa el Mesîhê. ⁸ Aw ko hûn nêdîn, hebandin, ko awî nua nâbînîn, hama hûn îman anîn û hûn şaz in bêtabîr bûn û bi celîl şazîtîe. ⁹ Ê ji netîceê îmanê xo ra, yanî ji xelasê canê xo ra nayîl dibin. ¹⁰ Ko ji boy aw xelasê lêgerîan û teftîş kirin peyemberan, wan ko peyemberîtî kirin ji boy aw îneyet ko ji wan ra dê bibana. ¹¹ Ê teftîş dikiribûn erki kînga, yaxod çawan wextkî beyan dikir li wan da bûn Rûhê Îsaê ko awul şehadet dikir elemet Îsaê ji vî pê ve îzzet bûnê wî. ¹² Ko ji wan ra aşîkâr bû, av tiştan né ji wan ra, lê ji me ra xizmet dikiribûn wan ko a nwa ji we ra naql bûn bi destê wan, ko Încîlê ji we ra waz kirin bi Rûh el Qudsê ko ji azûmanan hati şîyandin, ko ji av tiştan ra melean nazar kirinê arzû dikîşînin.

¹³ Ji boy vîa piştka aqlê xo bi grêdanê, heşar bisekinin, tekmlîl umud bikin ji aw îneyet ra ko li ser wê dê bigê, li wexta aşîkâr bûn Îsa el Mesîhê. ¹⁴ Weka îtaatlî ewladan, nâ weka cahîlîtîe wexta awulîn ji arzûê xo ra bi uymîş bûnê. ¹⁵ Lê weka we dawet kroş Azîzê azîz bin, li her abûrê we da. ¹⁶ Zîra nivîsandî e ko, Azîz bin, çûnkî ez azîz im. ¹⁷ Ê erki Bav gazî dîkin awî, ko bê xatr hükm dike her yekê li gora amelê xo, wusan e wext mûsafîrîtîe xo bi tîrsan bibihurin. ¹⁸ Bizanin ko ji ejdadên mayîn ji batal geçinmean bi xarab tiştan, yanî bi zêr û zîv xelas nêbûne. ¹⁹ Lê bi qiymetlî

xuyna Îsaê, weka ko bê qusûr û bê leke berxkî. ²⁰ Ko aw, bira ji temel bûnê [555] dinê awul taqdîr bobû, hama li axir zeman ji boy wê beyan bû. ²¹ Ko bi destê wî hûn ji Xodê ra îman anîn, ko awî ji mirîan qiyam kir, û jê ra îzzet da, ko îmanê wê û umudê wê li ser Xodê bibe. ²² Canê wê bi pak kirinê bi destê Rûhê ji doxrîtî ra bi îtaat kirinê, li muhabetê brê[t]î da bê murayîtî bin, bi dilê pak hevûdu bi heraretê bihebînin. ²³ Bi tekrar zayinê, na ji çürüg toxumê, lê ji bê çürüg toxumê, yanî bi ganî û ebedî Kelamulahê. ²⁴ Zîra her weka gîya e, û her îzzetê meşuv weka güla gîyayê e; gîya hişk dibe, û gülê wî dirije. ²⁵ Hama xaberê Xodê ebedî dimîne; yanî aw xaber, ko ji we ra bi Încîlê hati waz bûn.

SER 2

¹ Nua bi terk kirinê her kötîtî, û her hîleê, û mürayîtan, û hasedan, û hemî xîybetan. ² Weka nû zayox masûman, ji xalîs şîra sözê ra arzû bikin, ko bi awî mezin bibin, hata xelasê. ³ Erki tama şîrîn bûnê Xodê hûn sendin. ⁴ Ji awî ra hûn nêz bûne ji ganî ji ganî ji ganî Zinaş ra, ko faraza ji meşuvan red bûe, lakîn ji Xodê hatîe bijartin û qiymetlî e. ⁵ Hûn jî weka ganî kevîran tene çêbûn; rûhanî dacarkî; azîz îmamîtîkî bi Îsa el Mesîhê ji Xodê ra maqbûl rûhanî qurbanan pêşkêş kirin ra. ⁶ Zîra li Ktêb da jî heye, Va ha li Sîon da hati bijartin qiymetlî kevîrkî rûknê da tînim; û kî ko ji wî ra îman bîne dê bi şerm nébe. ⁷ Nua ji wê ji mûmî[n]an ra qiymetlî e av; lakîn ji îmansizan ra, av kevîr, [556] ko yapîcîan red kirin, aw kevîrê rûknê bû. ⁸ Ê ji wan ra zinaşê fitneîtî û kevîrê xwar bûnê, ko bi îman né anînê, ji sözê xwar dibin; ko ji awî ra tayîn daxî bobûn. ⁹ Hama hûn, hati bijartin mîllet, padîşahanî îmamîtî, azîz tayîfe, xas qawm in; ko waz bikin fazîletê wî, ko wê tahrîê ji acayîb rohnê xo ra gazî kir. ¹⁰ Ko wextkî hûn mîllet nebûn, lakîn nua hûn qawmê Xodê ne, ko hûn bê merhamet⁴⁰¹ bûn, hama a nwa merhamet dîn.

¹¹ Ey! delalîan, lava dikim, weka xarîban arzuan, ko li ser canê wê çekan dihelînin. ¹² Ko li nav tayîfan da geşînmeê wê qanc bibe; ko bi çî tîşt da wê qanc bibe; ko bi çî tîşt da wê weka fenakâran zemm dikin, xayr amelê we bi dîtinê ji Xodê ra şikir bikin li roya zîyaretê da. ¹³ Nua ji boy Rabbê, ji her însanî nîzam ra îtaat bikin; gerek ji padîşah ra ji boy muazzam bûnê; ¹⁴ Gerek ji walian ra, weka ji alîê wî ra hati şîandoşan ra, ji boy ji fenakâran hayf sendinê, û qanc amel kroşan medh

⁴⁰¹ Di metnê de merhamet.

kirinê. ¹⁵ Zîra îradetê Xodê ahwa e; ko bi qancîtî kirinê, cahîlîtê aqlsîz merûvan lal bikin. ¹⁶ Weka azadîan, û né azadîtê ji kötîtî ra, weka nixaftin kroşan, lê weka qula Xodê bibin. ¹⁷ Hemî ra raxbet bikin, brêtê bihebînin; ji Xodê bitirsîn; ji padîşah ra hürmet bikin.

¹⁸ Xizmetkâran bi temam tirsan ji efendîet xo ra mütîh bibin; tenê ji qancan ra û ji mülayîman ra ná, lê ji tersan ra jî. ¹⁹ Zîra înyet vîa e ko, yekê gava ko li nehaq cî da ezîet dikşîne, ji Xodê ra daîr ji boy zamîrê, ji qasawetan ra tehamül bike; ²⁰ Zîra çi? medhê [557] wê dibe, erki bi qabahat kirinê bêne kutandin, hama erki bi qancîtî kirinê, ezîet bikşînin, û sabr bikin; vîa li ber Xodê înyetkî e. ²¹ Zîra hûn ji boy vîa dawet bûne, ko Îsa jî ji boy wê ezîet kşand, û ji we ra îbret hişt, ko li pey rêça wî biçûn. ²² Ko aw güne nékir, û li devê wî da hîlekî nehati dîtin. ²³ Ko aw dihatibû serhevde û li dêla wî aw serhevde nedikir, ezîyet dikşand tehdîd nêdikir; hama aw xo weka bi haq ji şeraat dîtoş ra teslîm dikiribû. ²⁴ Ko güneet me bi cesedê xo li ser dara xaçê heland, ko em ji günean xelas bibin, û ji boy sadaqatê em bijîn, ko bi brîne wî em şîfa bûn. ²⁵ Zîra hûn weka rêya xo şaş kroş bizinan bûn, hama a nwa ji Şivan û Nazîrê canê xo hûn vegeşîan.

SER 3

¹ Wusan jî jinan, ji mêrê xo ra îtaat bikin, hata ko erki hinikan ji sözê ra înan nâkin, bi destê haraketê jinan bê kelam qazanc bin. ² Bi tîrs pak geşînmeê wê bi dîtinê. ³ Ê zîynetê wan ji derve nêbe, bi hünayînê poran û bi zîlfê zêran, yaxod ala cilan bi wergirtinê; ⁴ Lê merûvê dizîka dilê, bi bê fesad, yawaş û mahcûb xemalandinê rûhê bra bibe, ko li ber Xodê pîr qîtmelî e. ⁵ Zîra li zemanê qadîman da ji Xodê ra umud kroş azîz jinan jî ji mêrê xo ra bi îtaat kirinê, aw xo ahwa dixemalandibûn. ⁶ Çawan ko Sara ji Îbrahîm ra îtaat bû, û awî efendî gazî fikir, ko hûn xayr amel bişîxulandinê û ji tîrskî bi nâtîrsînê, ewladê wî dibin.

[558] ⁷ Wusan jî mêran, bi wan ra bi aqilane sakîn bin, weka fîraqê zayîf, ji jinan ra îkram bikin, çima ko ji înyetê hayatê ra mîrasdaş in, ko ji nimêcê we ra manî nebe.

⁸ Axir kelam hûn hemî jî li ser yek fikr da bibin; hemderd, brêan hebandox, merhametlî û alçağ gönülî brêan. ⁹ Ji dêla kêmanîtî kêmanîtî eda nékin, ya ji dêla serhevdan serhevde; lakîn zîde vîa, xayr dowa bixoynin; çima ko ji boy vîa hûn dawet bûne, ko ji beraket ra warîs bibin. ¹⁰ Zîra aw ko ömr dihebîne û royaq qancan

bibîne, zimanê xo bra ji kôtîtî dide sekinandin, û lêva xo ji hîle xaberdanê. ¹¹ Ji kôtîtî bra şûnda bisekine; û qancîti bra bişixule, selamet aramîş bike, û li dû wî biço. ¹² Zîra çahvêt Xodê li ser sadiqan e, û goya wî li nimêcê wan da hama Xodê li qarşî şer kroşan e. ¹³ Hem erki hûn, ji qanc bûn tiştan ra uymîş bibin, ji we ra kêmanî kroş kî? e. ¹⁴ Lakîn erki ji⁴⁰² boy sadaqatê hûn ezîyet jî bikşînin, xozî e ji we ra, û ji tîrsê wan metîrsin; û şaş mebin. ¹⁵ Lakîn Rabb Xodê li dilê xo da azîz bikin; û dayîma hazir bibin, bi mahcûbîtî û bitîrs cewab dayînê ji hemîan ra, ko sebebê umudê wê ji wê pîrs dîkin. ¹⁶ Ê qanc haraketê wê bibe; hata ko wê weka fenakâran li çi? tişt da zemm dîkin li Îsa da qanc haraketê we fasl kroşan şerm bikin. ¹⁷ Zîra hênî qanc e xayr amel bi krînê ezîyet kşandin, erki meramê Xodê aw bibe, û ne bi kôtîtî kirînê ezîyet kşandin. ¹⁸ Çima ko Îsa jî ji boy güneyan yek car elem kşand, Sadiq li uxura nehaqan, ko me ji Xodê ra nêz bike, ko faraza bi ceset mir, hama bi rûh [559] ganî e. ¹⁹ Ko bi awî; li mahbûs da li zemanê qadîman da asî bûn ji rûhan ra jî çû waz kir. ²⁰ Aw zeman ko sabra xodê beklemîş dikiribû, li royê Nûhê gava ko gemî çêbû, ko li wî da hindik, yanî heşd can ji avê xelas bûn. ²¹ Ko me jî weka av temsîlê anwa tahwîl xelas dike bi şûşdina cesedê na, lê bi taqrîra zamîrê qanc ji Xodê ra bi qiyamê Îsa el Mesîhê. ²² Ko aw, li azûman da çû, li alîê saxê Xodê ra e, û melekên hem hükmetan û quwetan, jê ra tabî dibin.

SER 4

¹ Nua Îsa ko ji boy me eleman kşand bi cesedê, hûn jî bi aw nîyetê çekê xo li ser xo bigirin; zîra li cesed da elem kşandoş ji günean feraxet kirî. ² Ko hênî ne bi weka arzûê merûvan, lê wekva meramê Xodê çiqas wext ko yaşamîş bibe, li cesedê da e. ³ Zîra bas e ji me ra awqas wext ko me ömrê xo bihurt, li wan da ko meramê tayîfan me îcra kir; û bi edebsizîtîan, bi kôtî arzûan, li heraketê şerab da, bi zewqan, bi serxoşîtîan, bi nahaqputperestîan, em çûn. ⁴ Ê li tiştê han da tacûb dîkin, ko hûn li aw pîr edebsizîtî da bi wan ra nçun, û küfr dîkin. ⁵ Wan ko cewab dê bidin ji wî ra, ko hazir e hükûm kirînê ganîan û mirîan. ⁶ Zîra ji boy vîa ji mirîan ra jî încîl hati wáz bûn, ko li gora merûvan bi cesedê bêne hükûm bûn, hama li gora Xodê ganî bibin bi rûh.

⁴⁰² Di metnê de ci.

7 Lakîn axirê her tişt nêz bûe, nua bi tamaql bin û li nimêc da, heşar bisekinin. 8 Û ji [560] her tiştan awul bi hevûdu ji dil muhabetê wê bibe, zîra muhabet pîrîtîê günean dinixêfe. 9 Ji hevûdu ra müsafir hebandin nişan bidin bê gazinan krinê. 10 Her yekê li gora aw baxşîşan ko hûn sendin, weka qanc îdare cîan dürla dürla înayetê Xodê, awî ji hevûdu ra li îcra kirin da bibin. 11 Erki yekê xaber dide, weka Kelamulahê bra xaber bide, erki yekê xizmet dike wekva ko ji quwwetê înayetê Xodê bra bike, ko li her tişt da Xodê bi îzzet be bi destê Îsa el Mesîhê, ko ji wî ra îzzet û qudret maxsûs e, ebed il ebed; amîn.

12 Ey! delalîan, ji boy îmtîhanê wê bûn ji hedaretlî sixlet ra ji we ra weka acayîb wuquhkî bûn, tacûb mekin. 13 Lê şaz bin, çiqas ko hûn ji alemê Îsa ra îlhaq bûne, ko li wexta aşîkâr bûnê îzzetê wî jî bi mesrûr şaz bin. 14 Erki ji boy navê Îsa hûn bêne serhevde bûn xozî e ji we ra; zîra Rûha celal û Xodê li ser we da meskân dike; bîra ji alîê wan aw küfr dibe, lakîn ji alîyê wê îzzet dibe. 15 Nebe ko ji wê yekê ezîyet bikşîne weka qatîl, ya diz, ya fenakâr, ya weka tiştê başqasîan ra qarîşmîş bûox. 16 Lakîn erki weka xirîstîan ezîyet dikşîne, brá şerm neke, îlla ji boy vê xusûsê ji Xodê ra bra, şikir bike. 17 Zîra wext e ko hükm ji mala Xodê dest bike, û erki awul ji me dest dike; paşê ji Încîlê Xodê ra îtaat nékroxan dê çi? bibe. 18 Û erki sadiq bi ezîyetê xelas dibe, lê fasiq û günekâran li ko? dê bêne dîtin. 19 Nua wan ko li gora meramê Xodê ezîyet dikşînin, bi xayr amel şixulandinê rûha xo bra ji wî ra teslîm bikin, weka emîn Xaliqê ra.

[561] SER 5

1 Li nav we da bûn ji yeretsan ra lava dikim, e jî weka wan bi yerets bûnê, û ji elemê Îsa ra şahîd, û hem ji aw îzzet ra ko dê aşîkâr bibe îlhaq im. 2 Cöla Xodê ko li nav we da e, biçêrinin, û awî nazar bikin, ná bi cebr, lê bi îradetê, ná bi pîs tamakârîtîê, lê ji can û dilê. 3 Ná li ser teman bi hükm kirinê, lê cölê ra bi îbret bûnê. 4 Û wexta zuhr kirinê baş şivanê tacê bê solmîş a celalê dê bistînin.

5 Wusan jî hûn cuvanan ji îxtîran ra mütêh bibin; û hûn hemîan jî hevûdu ra îtaat bikin, û alçağ gönîlîtîê wergirin, zîra Xodê ji kîbîran ra zid disekine, hama ji alçağ gönûlian ra înayet dide. 6 Nua li bin qudretlî destê Xodê alçağ bin, hata ko wê li wext da bilind bike. 7 Û hemî xema xo li ser wî bixin, zîra aw ji boy wê xam dikşîne.

⁸ Heşar bin, hayê xo li wê be, zîra xesma wê Şeytan weka qîrox aslanê digere, û aramîş dike kî? dê bibelîne. ⁹ Ê li îman da qawî bisekinandinê, jê ra qarşî bisekinin, û bizanin ko brêêt we jî li dinê da av eleman dikşînin.

¹⁰ Ê Xodê her îneyetê ko me ji ebedî îzzet ra dawet kir bi destê Îsa el Mesîhê hinikkî wext ji paşê ezîyet kşandinê, aw wê tekîl bike, qawî bike, pê bike, û bi temel bike. ¹¹ Jê ra hamd û quwet ebed il ebed; amîn.

¹² Bi destê emîn brê Sîxvîanosê çawan ko taxmîn dikim, muxtarkî mi ji we ra nivîsand, û bi şîret û şehadet kirinê, erki asah îneye [562] -ê Xodê vîa e, li wî da ko hûn qayîm sekinin.¹³ Silavan dike ji we ra li Pîlîlon da bûn kîlîsaê, ko bi we ra bijartîe û kure min Markos jî. ¹⁴ Silavan bidin ji hevûdu ra bi ramîsa muhabetê, selamet bi we hemîan ra, ko li Îsa el Mesîh da, amîn.

MEKTÛBÊ GATOXÎGÊ ÎKÎNCÎ Ê RESÛLÊ BEDROS

SER 1

¹ Şimhûn Bedros qula Îsa el Mesîhê û resûl, ji we ra ko bi me ra ji aw qiyetlî îman ra gihîştin, ji sadaqatê Xodê û xelasê me Îsa el Mesîhê. ² Înayet û selamet li ser wê pîr bibe, bi îlmê Xodê û rabbê me me Mesîhê.

³ Çawan ko îlahî quwetê wî ji me ra, ji hayat ra û ji dîndarîti ra mütaliq her tiştan baxş kir, bi îzzet û bi fazîletê, bi destê îlmê me dawet kroxe. ⁴ Ko bi wan ji me ra azîm û qiyetlî wadan hatin baxş bûn, hata ko bi destê wan li dinê da bi kötî arzû bûn ji fesadê bi rewandinê, ji tabîatê îlahî ra îlhaqan bibin. ⁵ Ê heman li tiştê han da tekml cehd bi nşan dayinê li ser îmanê xo fazîlet zam bikin; ⁶ Ê li ser fazîletê zanin, û li ser zaninê xo zabt kirin û li ser zabt kirinê sabr, û li ser sabrê dîndarîti. ⁷ Ê li ser dîndarîtiê, brê hebandin, û li ser brê hebandinê muhabet. ⁸ Zîra her çiqas ko tiştê hana li ser wê tene dîtin û pîr dibin, [564] nafîle û bê meywe nâkin wê nav Rabbê me Îsa el Mesîhê zaninê. ⁹ Zîra li ba kî ko tiştê hana tunne aw kûr e ji dûr ve nâbine, ko bîr kirî ji awul güneet xo pak bûn. ¹⁰ Ji boy vîa, ey! brêan, baxusûs cehd bikin ko dawetê xo û hati bijartinê xo qawî bikin; zîra vîa bi kirinê qat hûn dê şaş nébin. ¹¹ Zîra bi tarzê ji we ra ketinê li ebedî padîşahîtiê Rabbê me û xelasê Îsa el Mesîhê bi xanîmetê dê îhsan bibe.

¹² Ji boy avî tiştê hana daîma li bîra wê anînê îhmal dê nekim; faraza hûn zanin û li doxrîtiê hana jî möhkem bûe jî. ¹³ Ê rast hasab dikim, her çiqas ko li cesedê han da me, li bîra wê bi anînê wê heşar dikim. ¹⁴ Zîra ez dizanim ko Rabbê me Îsa el Mesîhê ji mi ra aşîkâr kir. ¹⁵ Nua dê cehd bikim, ko li paşê mirinê mi jî daîma tiştê hana li bîra xo anînê qadîr bibin. ¹⁶ Zîra quwet û zuhûra Rabbê me Îsa el Mesîhê, ji düzme masalan ra bi tabî kirinê ji we ra me beyan nekir, lê azametê wî bi çahvê xo me bi dîtinê ji we ra beyan kir. ¹⁷ Zîra aw ji Bav Xodê îzzet û celal bi sendinê jê ra ji azîmuşşan celalê awazkî ahwa hat, Qurê min delalî vîa e, ko jê ez razî bûm. ¹⁸ Ê ji azûman hati dengê han em bihîsdin ko bi wî ra tev li ser çîê azîz da bûn. ¹⁹ Ê li nav me da hênî sahîh kelamê peyxemberîtiê heye, û hûn qanc dikin erki jê ra go bidin; weka li cîê tahrî da rohnî dayox çirêkî ra, hata ko ro rohnî bibe û istêrê sibê li dilê we da bize. ²⁰ Zîra awul vîa bizanin ko qat peyxemberîtiê ktêbê aw ji xo maneê xo [565]

tunné. ²¹ Zîra bi îradetê merûv qat zemankî peyemberîtî nehat, lê azîz merûvê Xodê ji Rûh el Qudsê bi heraket bûnê xaber dan.

SER 2

¹ Û li qawm da derew peyemberan jî bûn, çawan ko li nav we da jî derew xocayan dê bibin ko wan dizîka hertsovadzoxyunê helakîtiê dê îcad bikin, û wan kroş Xodî bi înkâr kirinê, aw li ser xo zû ve dê helakîti bikin. ² Û ji edebsizîtiê wan ra pîran dê tabî bibin ko ji semedê wan rêya doxritîê dê küfr be. ³ Û bi tamakârîtiê wê bi düzme sözan ticaret dê kesb bikin, ko xazebê wan ji zû ve hazir bûe li direng nekeve, û helakîtiê wan nâhonije.

⁴ Zîra erki Xodê ji melean ra qiymiş bû gava ko güne kirin, û bi tahrî zencîran li cehennem da avêt, ji boy muhakeme bûn veşart wan. ⁵ Û ji qadîm dinê ra jî qiymiş bû, û li ser dinê fasîqan tûfan bi anînê, wazcîê sadaqatê Nûh bi heşt nufûsê xelas kir. ⁶ Û hem bajêrê Soîom û Komorê xolî bi veğerandinê û bi xarab kirinê hükm û xazeb kir, ji wê pê ve ji merûvê fasîqan ra îbret kir wan. ⁷ Û xelas kir sadiq Xovdê ko bi bê edeb geçînmeê bînamûsan aw tacîz bobû. ⁸ Zîra aw merûvê sadiq li nav wan da bi sekinandinê û bi çahv dîtinê û bi goh bi bihîsdinê bi bînamûs hareketê wan ro be ro sadiq canê wî ezîyet dikşand. ⁹ Rabb dizane dîndaran ji tecrûbeê xelas kirinê û nehaqan ji boy azabê li roya qiyamê hişdinê.

[566] ¹⁰ Baxusûs wan ko bi murdar arzûê ji ten ra tabî dibin, û hükmê tiştî nâhasabînin; aw xo begenmiş bûn û bê perwa nin, nâtîrsin ji celîl merûvan ra küfr kirinê. ¹¹ Gava ko melean li qudret da û li quwwet da ji wan pîr mezin in, li ser wan li huzûra Rabbê hükmê küfrê nayînin. ¹² Lakîn wanan weka bê aql haywanan ko ji aslê ji boy seydê û helakê bûne; aw tiştan ko nizanin ji wan ra küfr dikin, û bi xarabîtiê xo dê xarab bibin. ¹³ Ücretê nahaqîtiê bi qabûl kirinê, ko li nav ro da bûn sefaê zewq dihasabînin; lakîn û ayb in, gava ko bi wê li zîyafet da dixun bi hîleê xo zewq dajon. ¹⁴ Ji zînaê tijî û ji güneê şûnda nésekinandoş çahvê wan heye, û dixapînin wanan ko bê möhkem in; û ji tama ra hîn bûn dilê heye, wan mel'ûn ewlad in. ¹⁵ Rêya rastê bi berdanê şaş bûn, û li rêya kurê Peovrean Paşaamê da geşîan, ko aw ücretê nahaqîtiê heband. ¹⁶ Û ji boy bînamûsîtiê xo tekrîr bû, çima ko bê ziman haywankî bi zimanê merûvan bi xaberdanê ji aqilsizîtiê peyember ra manî bû. ¹⁷ Wanan bê av kanî ne, ji tûfanê hati ajotin awr in, ko dûmanê tahrîtiê ebedan ji wan ra hatîe veşartin. ¹⁸ Zîra xayet pîr qabarmiş bûn sözan bi xaberdanê, bi arzûê cesedê, bi

edebisizîti, li yanglišîti da gerandox hêja nû revandox kesan dixapînin. ¹⁹ Ji wan ra azadîti wad dîkin; û aw xo qula fesad in, zîra ji çi ko yekê yengmîş dibe, ji awî ra qul jî dibe. ²⁰ Zîra erki bi zanîne Rabb û xelasê me Îsa el Mesîhê ji murdarîti dinê paşê re- [567] vandinê, dîsa ji aw tiştan bi yengmîş bibin, paşê wan ji awulê xarab dibe. ²¹ Zîra ji wan ra qanc bû, ko qat rêya sadaqatê nezanibana çiqas ko bi zanîne şûnda bi vegeandinê ji aw tenbîhê, ko ji wan ra hati teslîm bûn. ²² Zîra ji wan ra rast hat tiştê aw sahîh meselê, Se li qulubandinê xo divegere û hati şûşdin donxuz li nav harîe divezele.

SER 3

¹ Ey! delalîan, vîa nua ji we ra hati nivîsandin îkîncî mektûb e, ko bi mektûbê hana xülüsane zîhnê wê didim rakirin, ji boy zîkr kirinê, ² Ko ji azîz peyxemberan peşîn hati xaber dan sözan, tenbîhê a me, yanî resûlê Rabb û xelas kroxê bîra xo bînin. ³ Hama awul bizanibin ko li axir zeman da, arsız masqaracî kesan dê bîne, ko weka arzûe xo dê biçun. ⁴ Ê dê bêjin: Li ko? e wadê hatinê wî, zîra çiqas ko babayan li xew da çûne, her tişt wusan disekin jin îbtîdaê maxlûqê pêve. ⁵ Zîra vîa, bi îradetê xo nezan dibin, ko azümanan ji qadîm zemanan bûn, û dinê, ji av, û bi avan bi kelimullahê mewcûd bû. ⁶ Ko bi semedê wan dinêe wê zimanê li tûfan da bi xarq bûnê, ji avê helak bû. ⁷ Ê azüman û dinêe nuayîn, bi aw kelamê hifz bûne, hata li şeraatê û li roya helakê merûvê fasîqan ji boy agirê hatîe veşartin. ⁸ Ê tiştê hana yekê nezan nébin, ey! delalîan, ko li ba Xodê yek ro weka hazar sal e, û hazar sal weka yek ro e. ⁹ Rabb wada xo li dûr naxe, çawan ko hinikan li dûr taxmîn dîkin, lê ji [568] me ra sabr dike, çima ko naxwaze yekê wunda bibe, lê ko hemîan toba bikin. ¹⁰ Hama roya Rabbê weka diz dê bê ko wê çaxê azümanan bi gürültîe dê bê bibihurin, û zadan bişewutandinê dê bihelin, û çi amelan ko li nav wî da tîne dîtin, dê bişewutin. ¹¹ Nua erki aw hemî tiştan ko dê bihelin, ji we ra çawan merûvan bûn caîz e, bi azîz geçînmeyê û bi dîndarîti. ¹² Bi beklemîş kirinê û bi hasret kşandinê ji hatinê royê Xodê ra, li awî da ko azümanan bi agir hat şewutandinê dê bihelin. ¹³ Hama li gora wada wî ji nû azümanan ra û ji nû dinêra em beklemîş dîkin; ko li wan da sadaqat sakîn e.

¹⁴ Nua ey! delalîan, ji tiştê hanan ra bi beklemîş kirinê cehd bikin, ko li wî da bi selametê, bê leke û bê qusûr bêne dîtin. ¹⁵ Ê sabra Rabbê me xelas hasab bikin; çawan ko brêy me delalî Boxos jî jê ra hati dayin li gora îlmê, ji we ra nivîsand. ¹⁶

Çawan ko li her mektûb da li ser tîştê hana xaber dide, ko li nav wan da çend söza çetin anglemîş bûn têne dîtin, ko wan cahîl nasan û nêmoşkeman li alîê xwar divegerînin, çawan ko başqa kitêban jî ji boy helakê xo. ¹⁷ Nua hûn ey! delalîan, vîa⁴⁰³ peşîn bizanin saqin bin, ko nebe bi xapandinê bînamûsan bêne girtin, ji qawîtîê xo bi_{ke}vn. ¹⁸ Lê zêde bin bi înayet û îlmê Rabb û xelas kiroxê me Îsa el Mesîhê, ji wî ra hem a nwa, hem hata li roya ebedîê jî hamd; Amîn.



⁴⁰³ Di metnê de *vîa*.

MEKTÛBÊ GATOXÎGÊ AWULÎN Ê RESÛLÊ HANNA

SER 1

¹ Ji xusûsa Kelamê Hayatê, ko ji îbtîda bû, ko ji ê kê em bihîsdin, aw ko me bi çahvê xo dîn ji awî ra ko me nazar kir û destê me dest kirin. ² Û Hayat beyan bû, û em dîn, û şehadet dîkin, û ji we ra naql dîkin aw ebedî hayatê, ko li ba Bav bû, û ji me ra beyan bû. ³ Aw ko em dîn û bihîsdin ji we ra naql dîkin, hata ko îlhaqîtîê wê bi me ra bibe, û îlhaqîtîê me jî bi Bav û bi Qurê wî Îsa el Mesîhê e. ⁴ Û vanan em ji we ra dinivîsînin hata ko şazîtîê wê tekmîl bibe.

⁵ Û vîa e aw xaber ko em jê bihîstin û ji we ra naql dîkin, erki Allah nûr e, û li wî da qat tahrî tunne. ⁶ Erki em bêjin erki îlhaqîtîê me pê ra heye û li tahrî da bigerîn derew dibêjin û doxrîtîê em îcra nakin. ⁷ Lê erki em li rohnî da biçin çawan ko aw⁴⁰⁴ li rohnî da e bi hevûdu îlhaqîtîê me dibe û xuyna Qurê wî me ji her güneê pak dike. ⁸ Erki em bêjin güneê me tunne em xo dixapînin [570] û li me da doxrîtî tunne. ⁹ Erki em güneê xo îqrar bikin, aw emîn û sadiq e ko, güneê me afw bike, û me ji her nahaqîtîê pak bike. ¹⁰ Erki em bêjin ko me günekî neşixulîne awî em derewîn dîkin, û kelamê wî li me da nin e.

SER 2

¹ Ey! kurêt piçûkê min, tiştê hana ji we ra dinivîsînim ko güne nekin, û erki güne bike; li ba Bav şefaadcîê me⁴⁰⁵ heye, yanî sadiq Îsa el Mesîhê. ² Û aw kefarete güneyêt me e, û na tenê ê me, lê ê dinê gijik jî.

³ Û bi vîa em dizanin erki em awî nas kirin, erki tenbîhê wî em bipên. ⁴ Aw ko dibê, erki ez wî nas kirime û tenbîhê wî nagire, derewî e û awî da doxrîtî tunne. ⁵ Lakîn aw ko xaberê wî digire, bîra li awî da tekmîl e muhabetê Xodê bi vîa em nas dîkin erki li nav wî da nin. ⁶ Aw ko dibê erki ez li wî da sakîn dibim, wusan lazim e ko biçê, çawan ko aw çû.

⁷ Ey! delalîan, na ko ji we ra tenbîhkî nû dinivîsînim, lê aw tenbîhê ko ji kevn aw söz e ko hûn ji îbtîdayê bihîstin. ⁸ Dîsa ji we ra tenbîhkî nû dinivîsînim ko aw li

⁴⁰⁴ Di metnê de *an*.

⁴⁰⁵ Di metnê de *ma*.

wî da hem li wê da haq e, zîra tahrî dibihure, û rohnî rast ji nua da dixuye. 9 Aw ko dibê erki li rohnî da me, û ji brêy xo îkrah dike, aw hêja li dahrî da e. 10 Aw ko brêy xo dihebîne, li rohnî da sakîn dibe, û li wî da fitneîtî sebebki tunne. 11 Hama aw ko ji brêy xo îkrah dike, li tahrî da e, û li tahrî da [571] diço, û nizane ko li ko diço, zîra tahrî çahvê wî kûr krê.

12 Ji we ra dinivîsînîm: ey! kure min piçûkan, çima ko ji boy navê wî gûney wê ji we ra afw bûe. 13 Ji we ra dinivîsînîm, ey! bavan: çima ko hûn awî nas kirin; ko ji îbtîda e, ji we ra dinivîsînîm, ey! cuvanan, çima ko hûn yaramazê yengmîş kirin. 14 Ji we ra dinivîsînîm, ey! zarûkan, çima ko hûn Bav nas kirin, mi nivîsand ji we ra, ey! bavan, hûn nas kirin awî ko ji îbtîda e, mi nivîsand ji we ra ey! cuvanan, çima ko hûn bi quwet in, û Kelamullahê li we da sakîn dibe, û yaramazê hûn yengmîş kirin. 15 Mehebînin dinê, û çî ko li dinê da e, 16 Erki yekê dinê dihebîné li hindura wî da muhabetê Bav tunne, zîra her tişt ko li dinê da e, yanî şehwetê cesedê û arzûê çahvan û kibîrîtîê ömrê, ji Bav nin e, lê ji dinê e. 17 Dinê jî dibihure, arzûê wî jî; hama aw ko meramê Xodê îcra dike li ebedê dê bimîne.

18 Ey zarûkan, axir zeman e; û çawan ko hûn bihîstin erki tecal dê bê, ji nua da pir tecalan hatine, ji wê em dizanin ko axir zeman e. 19 Ji me rabûn hinikan, hama ji me nebûn, çima erki ji me bibana, bi me ra dê bimana, lê ji me ra bûn, ko beyan bin, erki wan ji me nébûn. 20 Hama ê wê ji Azîzê mesîhê wê heye, û her tişt dizanin. 21 Mi nênivîsand ji we ra ko hûn doxrîtîê nizanin; li ko hûn awî dizanin, û hem hemî derewan ji doxrîtîê nin e. 22 Derewîn kî? e, erki na aw ko înkâr dike ko Mesîh Îsa nin e, tecal aw e ko bav û Kur înkâr dike. 23 Her kî ko Kur înkâr dike ji Bav ra jî malîk nin e, Kurê îqrar kroş ji Bav [572] ra jî malîk e. 24 Wusan e çî ko hûn bihîstin ji îbtîdaê, bra li nav we da sakîn bibe, erki aw çî ko ji îbtîda e hûn bihîstin li nav we da sakîn bibe, hûn jî li Kur da û li Bav da dê sakîn bibin. 25 Ê vîa e aw wad, ko aw ji me ra wad kir, yanî ebedî hayatê. 26 Tiştê hana mi ji we ra, ji boy wê şaş kroşan nivîsand. 27 Ê aw mesh ko hûn jê qabûl kirin li we da dimîne, û lazim nin e ko yekê ji we ra şîret bike, lê çawan ko aw mesh li ser her tiştan ji we ra hîn dike, û doxrî e, û derew nin e, û çawan ko aw ji we ra hîn kir, li nav wî bisekinin.

28 Û a nwa, ey! kurêt min piçûkan, li nav wî da bisekinin, û gava ko awî beyan⁴⁰⁶ bibe, serbestîtî me bibe, û li wexta hatinê wî em bi şerm nebin. 29 Erki sadiq bûnê wî dizanin, dizanin ko, her sadaqat şixulox jê zae.

SER 3

1 Mêze kin Bav çawan muhabet ji me ra îhsan kir ko em kurê Xodê bêne gotin, ji boy vîa dinê me nas nake, çima ko awî jî nas nekir, 2 Ey! delalîan a nwa em kurêt Xodê ne, û hêja malûm nin e ko dê çi bibin, lakîn em dizanin ko gava aw aşîkâr bibe, weka wî dê bibin, zîra awî em dê bibînin çawan ko e.

3 Wê her keskî umudê han li wî da heye aw xo paqij dike çawan ko aw paqij e. 4 Her kî ko güne dişixule bînamûsîtî jî dike, û güne bînamûsîtî e. 5 Û hûn dizanin ko ko aw ji boy vîa zuhûr kir, ko güneê me helîne, û li wî da güne tunne. 6 Her kî ko li wî da disekine güne naşixule, her kî ko güne⁴⁰⁷ [573] dişixule, awî nedîe, û awî nas nekirîe. 7 Ey! kurêt min yekê we nexapîne; aw ko sadaqat dişixule, sadiq e, çawan ko aw sadiq e. 8 Û aw ko güne dişixule ji Şeytan e, zîra Şeytan ji îbtîdayê güne dişixule⁴⁰⁸ ji boy vîa Kurê Xodê zuhr kir, ko amelêt Şeytan xarab ke. 9 Her kî ko ji Xodê zae güne naşixule; zîra tovê wî li awî da dimîne û nikare jî; zîra ji Xodê zae. 10 Bi vîa malûm in kurêt Xodê û kurêt Şeytanê.

Her kî ko sadaqat naşixule aw ji Xodê nin e; û aw jî ko brêy xo nahebîne. 11 Zîra vîa aw xaber e ko hûn ji îbtîdayê bihîstin, ko em hevûdu bihebînin. 12 Na weka Gayen ko ji yaramazê bû û brêy xo kuşt û çima awî kuşt: ji boy aw ko amelê wî yaramaz bûn, û amelê brêy wî sadiq. 13 Erki dinê ji wê îkrah dike tacûb mekin, Ey! brêan. 14 Em dizanin ko ji mirinê li hayatê em bihurîn, çima ko em brêan dihebînin, aw ko brêy xo nahebîne li mirin da dimîne. 15 Her kî ko ji brêy xo îkrah dike, qatûl e, û dizanin⁴⁰⁹ her qatûl li xo da ebedî hayatî wî tunne. 16⁴¹⁰ Bi vîa em fehîm kirin muhabetê Îsa; ko aw canê xo ji boy me danî; gerek e ko em jî ji boy brêyê xo deynin. 17 Hama kî ko ji malê dinê ra malîk e, û brêy xo ji tiştêkî ra mahtac dibîne û rahmê xo ji wî dibîre, muhabetê Xodê çawan li wî da disekine. 18 Ey? kurêt min piçûkan, ne bi söz û bi ziman em bihebînin, lê bi amel û bi doxrîtî.

⁴⁰⁶ Di metnê de *bîyan* (nîşeya wergêrê).

⁴⁰⁷ Di metnê de *gîne*.

⁴⁰⁸ Di metnê de *dî Şixule*.

⁴⁰⁹ Di metnê de *dizahin*.

⁴¹⁰ Di metnê de *11*.

19 Û ji vîa em dizanin ko em ji doxrîtîê ne, û li huzûra wî da em dilê xo dê rahat bikin. 20 Zîra erki dilê me, me tazîl dîkin, Xodê [574] ji dilê me mezin e, û her tişt dizane. 21 Ey! delalîan, erki dilê me tazîr nake, li ba Xodê serbestîê me heye. 22 Û çî ko em dîleg bikin, jê distînin, zîra tenbîhê wî em dipên, û li ber wî da tiştê maqbûlan dîkin. 23 Û tenbîhê wî vîa e, ko ji navê Kûrê wî Îsa el Mesîh ra îman bînin; û hevûdu bihebînin, Çawan ko ji me ra tenbîh da. 24 Û aw ko tenbîhê wî dipê li wî da dimîne, û aw jî li vîa da, û ji vîa em dizanin ko aw li me da dimîne, yanî ji aw Rûhê ko ji me ra da.

SER 4

1 Ey! delalîan, ji her rûh ra bawur mékin, lê rûhan biceribînin erki ji Xodê ne, zîra li dinê da pîr peyxemberê derewîn rabûne. 2 Bi vîa dikarin naskin Rûha Xodê; her rûh ko Îsa el Mesîhê bi cesedê hatinê îqrar dike, ji Xodê e. 3 Û her rûh ko Îsa el Mesîhê bi cesedê hatinê îqrar nake; aw ji Xodê nin e; û vîa rûhê Tecal e, ji boy ê kê ko hûn bihîstin dê bê, û ji a nwa da jî li dinê da e. 4 Hûn ji Xodê ne, ey! kûrê piçûkan, û hûn wan yengmîş kirin; zîra awê ko li we da e, ji wê ko li dinê da e mezin e. 5 Wan ji dinê nin, ji boy aw li ser dinê xaber didin, û dinê ji wan ra godarî dike. 6 Em ji Xodê ra aw ko Xodê nas dike, ji me ra godarî dike, aw ko ji Xodê nin e, ji me ra godarî nake, bi vîa em nas dîkin rûhê doxrîtîê û rûhê xapxapokê.

7 Ey delalîan, em hevûdu bihebînin, zîra muhabet ji Xodê e; û nas dike Xodê, her kî ko dihebîne ji Xodê zae. 8 Aw ko na he- [575] bîne, Xodê nas nake, zîra Xodê muhabet e. 9 Muhabetê Xodê ji me ra bi vîa beyan bû ko Xodê Kûrê xo yek zayin li dinê şîyand ko em bi wî bijîn. 10 Muhabet li vî da e ko na em Xodê hebandin, îlla ko aw me heband û Kûrê xo ji boy kefarete güneê me şîyand. 11 Ey! delalîan, erki Xodê me ahwa heband em jî gerek e ko hevûdu bihebînin. 12 Qat wextkî kesê Xodê nedîtî, erki em hevûdu bihebînin Xodê li nav me da sakîn dibe; û muhabetê wî li nav me da tekmlî e. 13 Bi vîa em dizanin erki em li wî da sakîn dibin; û aw li me da, ko aw ji Rûhê xo da ji me ra. 14 Û me dî û şehadet dîkin ko Bav Kûrê xo şîyand ji boy xelas bûnê dinê. 15 Kî ko îqrar dike erki Mesîh Kûrê Xodê e, Xodê li wî da sakîn dibe aw jî li Xodê da. 16 Û em nas dîkin û bawur kirin ji aw muhabetê Xodê ra ko li ser me hee; Xodê muhabet e, û aw ko li muhabet da sakîn dibe, li Xodê da sakîn dibe û Xodê li wî da. 17 Muhabet bi vîa li ser me tekmlî dibe, hata ko li roya mahşalê serbestîtîê me bibe, zîra aw çawan ko e, em jî li dinê da wusan in. 18 Li muhabet da tirs tunne, lê

tekmîl muhabet tîrsê bertaraf dike, zîra azabê tîrsê heye û aw ko ditîrse li muhabet da tekmîl nin e. ¹⁹ Em awî dihebînin çima ko awul aw me heband. ²⁰ Erki yekê bêje ko, ez Xodê dihebînim û ji brêy xo îkrah bike, aw derewî , zîra aw ko brêy xo dibîne nahebîne, Xodê ko nabîne çawan? dikârîhebandin. ²¹ Ê ji vî tenbîhê han ji me ra heye erki aw ko Xodê dihebîne, brêy xo jî dihebîne.

[576] SER 5

¹ Her kî îman dîni ko Îsa Mesîh e, ji Xodê zae, û her kî ko zayox dihebîne jê hati zayin jî dihebîne. ² Bi wî em nas dîkin ko ewladê Xodê em dihebînin gava ko em Xodê bihebînin û tenbîhê û bigirin. ³ Zîra muhabetê Xodê vîa e ko em tenbîhê wî bipên û tenbîhê wî gran tiştêkî nin in. ⁴ Zîra aw hemî ko ji Xodê zae dinê yengmîş dike, û vîa e yengmîş bûn ko dinê yengmîş dike yanî îmanê me. ⁵ Aw kî e ko dinê yengmîş dike, erki na aw ko îman tîne ko Îsa Qurê Xodê e.

⁶ Vîa e ko hat bi av û bi xuyn, yanî Îsa el Mesîh na tenê bi av, lê bi av û bi xuyn û şehadet kroş Rûh e, zîra Rûh doxrîtî e. ⁷ Ê li azüman da sisê ne şehadet kroş yanî Bav Kelam û Azîz Rûh û aw sisêyan jî yek in. ⁸ Ê li adrdê da şehadet kroşan sisê ne, yanî Rûh û av û xuyn; û sisêyan yek tişt in. ⁹ Erki em şehadetê merûvan qebûl dîkin şehadetîê hênî mezin e; zîra şehadetîê Xodê vîa e, ko ji boy Qurê xo şehadet kir. ¹⁰ Aw ko ji Qurê Xodê ra îman tîne, şehadetî li xo da heye, aw ko ji Xodê ra îman nayine, awî derewîn⁴¹¹ dike; zîra bawur nake ji aw şehadetî ra ko Xodê ji boy Qurê xo şehadet kir. ¹¹ Ê şehadet vîa e ko Xodê ji me ra ebedî ömir îhsan kir; û hayatê han li Qurê wî da e. ¹² Ji Qurê ra malîk bûox ji hayat ra malîk e; ji Qurê Xodê ra malîk nebûn, ji hayat ra jî malîk nin e.

¹³ Tiştê han dinivîsînim ko bizanin hûn ebe- [577] dî hayatê we heye ko ji navê Qurê Xodê ra îman tînin. ¹⁴ Ê aw serbestîê me ko li ba wî heye vîa e, her tişt ko em dîleg bikin li gora meramê wî ji me ra dibihê. ¹⁵ Ê erki em bizanin ko ji me ra dibihê, çi ko em dîleg bikin, erki wusan e em zanin ko dîlegê xo distînin ko jê dîleg dîkin.

¹⁶ Erki yekê bibîne ko brêy wî günekî kir na li gora mirinê, bra reca bike, û Xodê jê ra ömr dê bide ji li gora mirinê güne nekroş ra, güne heye ko li gora mirinê

⁴¹¹ Di metnê de *devrewîn*.

e, nabêm ko ji boy wî reca bike. ¹⁷ Her nahaqîti gûne e, û gûne heye ko li gora mirinê nin e.

¹⁸ Em dizanin her kî ko ji Xodê zae gûne naşîxule, lê aw ko ji Xodê zae aw li xo mêze dike, û yaramaz jê ra nêz nabe. ¹⁹ Dizanin ko em ji Xodê ne, û dinê hemî li yaramaz da e. ²⁰ Ê em dizanin ko Qurê Xodê hat û ji me ra aql da ko em doxrîtî bîzanin û li nav aw doxrîtî da ne, li Qurê wî da Îsa el Mesîh da ne, vîa e haq Xodê û ebedî hayat. ²¹ Ey! qurê min piçûkan, hûn xo ji putan bipen.



MEKTÛBÊ ÎKÎNCÎ Ê RESÛLÊ HANNA

¹ Ji yeretsê ji hati bijartin xatûn ra, û ji kurêt wî ra, ko ez bi rastî dihebînim û na tenê ez, lê aw hemî jî ko rastî nas dîkin. ² Ji boy aw doxrîtî ko li me da dimîn[e], û ebedî bi me ra dê bimîne. ³ Înayet merhamet, selamet ji Bav Xodê û ji Rabb Îsa el Mesîhê ji Kurê Bav bi we ra bibe bi rastî û bi muhabetê.

⁴ Ez pîr şaz bûm ko ji kurêt ta mi dît ko bi doxrîtî diçun li gora wî tenbîhê ko em ji Bav sendin. ⁵ Ê nua ji ta reca dikim ey! xatûn, na ko weka tenbîhkî nû ji ta ra dinivîsênim, lê aw ko ji îbtîdaê me hebû, ko em hevûdu bihebînin. ⁶ Ê muhabet vîa e ko li gora tenbîhê wî em biçun, û tenbîh vîa e ko çawan ji îbtîdaê hûn bihîstin li gora wî biçun. ⁷ Zîra pîr şaz kroşan rabûn li dinê wan ko Îsa el Mesîhê li cesed da hat îqrar nakin, wusan yekê şaş kiroş û Tecal e. ⁸ Hûn li xo mêze kin, ko xabitandinê me zay nebe, lê ko tamam ücret em bistînin. ⁹ Her kî ko qabhat dike û li talîmê Îsa da nasekine ji awî ra Xodê tunne aw ko li talîmê Îsa da disekine ji awî ra Bav jî heye û Kur jî. [579] ¹⁰ Ê erki yekê ji we ra bê û talîmê han neyne awî li mala xo qabûl mekin û jê rva silavan medin. ¹¹ Zîra kî ko jê ra silavan dide ji yaramaz amelê wî ra îlhaq dibe.

¹² Pîr tiştê min hebû ji we ra nivîsandinê, lakîn mi nexosd bi kaxîd û bi mûrekebê nivîsandin zîra umudê min heye ko ji we ra bêm û dev bi dev bibêjim hata ko şazîtî me tekmlî bibe. ¹³ Silavan dîkin ji ta ra hati bijartin kurêt xuşka ta.

MEKTÛBÊ ÜÇÜNCÎ Ê RESÛLÊ HANNA

1 Ji yeretsê ji Qayîos delalî ra, aw ko bi rastîê ez dihebînim. 2 Ey delalî, ez duwa dikim ko tu li her tişt da berxordar bibî û sax bibî çawan ko canê ta jî berxordar dibe. 3 Zîra ez pîr şaz bûme gava ko çend brêan hatin û ji boy rastîê ta şehadet kirin çawan tu bi rastîê diçuy. 4 Ji vîa pîr şazîtî min tunne gava ko dibihêm ko kuret min bi rastîê diçun. 5 Ey! delalî tu bi emniyetî dikî, çî ko dikî ji brêan ra û ji yabancian ra, 6 Ko wan li ber kîlsayê ji boy muhabetê ta şehadet kirin, ko wan erki ji Xodê ra layîqane li rê deynî qanc dê bikî. 7 Zîra ji boy navê Xodê rabûn û ji tayîfan tiştî nastînin. 8 Nua ahwa kesane ji me ra qabûl kirin farz e hata ko li doxrîtî da tev xabitoşan em dibin.

9 Ji kîlîsa ra mi nivîsand hama Tîodrepes, ko li nav wan da awulîn bû dixwaze, me qabûl nake. 10 Ji boy vîa erki bêm şîxul ko aw şîxulîe dê zîkr bikim, çima ko ji me ra qarşî bi yaramaz sözan lafan dike û bi vîa jî bi qanaat ne kirinê aw xo brêan jî qabûl nake û wan ko dikin nahêle, û ji kîlsayê jî der dixê. 11 Ey! delalî, ji şerr ra uymîş [581] mebe, lê ji xayrê ra xayr, şîxuloş ji Xodê e, hama şerr şîxuloş aw Xodê nedîe. 12 Ji boy Temedrîosê hemîan jî şehadet dikin asl doxrîtî jî, em jî şehadet dikin û hûn zanin ko şehadetê me rast e.

13 Pîr tiştê min hebû ji nivîsandin ra, lakîn naxwazim ko bi mûrekebê û bi qalemê nivîsandin. 14 Lakîn umudê min heye ko li nêzî da ta bibînim; û dev bi dev em dê xaber bidin. 15 Ji ta ra selamet bibe, dostan ji ta ra silavan dikin, ji dostan ra yeka yek bi nevan silavan bike.

MEKTÛBÊ GATOXÎGÊ Ê RESÛLÊ CÛDA

¹ Cûda qulê Îsa el Mesîhê û brêy Yaqûbê ji we ra ko ji Bav Xodê hatin paqij bûn û ji Îsa el Mesîhê hatin veşartin û dawet bûn. ² Ji we ra merhamet û selamet û muhabet pîr bibe.

³ Ey! delalîan, ji derhaqê alesewî xelasê xelasê ji we ra nivîsandinê hemî xayretê mi li ser xo sendinê mi ji xo ra farz hasab kir nivîsandinê, û lava kirinê ji boy aw îmanê cehd bikin ko carkî ji azîzan ra hati teslîm bûn. ⁴ Zîra ji hükm û xazebê han ra ji awul da hati tayîn bûn hinik fasiq kesan bi dizîka li hindur ketin, ko wan îneyetê Xodê me ji edebsizîti ra tebdîl dikan, û tenê Xodê û Rabbê me Îsa el Mesîhê înkâr dikan. ⁵ Nua dixwazim li bîra wê anînê faraza ji xo hûn zanin vîa erki Xodê ko qawmê ji diyarê Misrê xelas kir, paşê bê îmanan dîsa helak kir. ⁶ Û aw helakan ko aslê xo hifz nekirin, lê meskânê xo terk kirin, bi ebedî bendan li bin tahrîti da veşart ji boy roya mezinê muhakemeê. ⁷ Çawan ko Soṭom û Komor û li dorê wan bûn bajêran, wan ko weka wanan zîna kirin li dû gowdaê hevalê xo bi çûndinê li ber me [583] îbret disekin, azabê agirê ebedî bi kşandinê. ⁸ Wusan jî av xew dîtoxan⁴¹² cesedê murdar dikan; ji hükmât ra asî dibin û ji celîl kesan ra küfr dikan. ⁹ Hama baş melek Mîxayel gava ko ji boy cesedê Mûsaê mûcadele dikir qarşî Şeytânê bi sekinandinê, cesaret nekir hükmâ küfrê li ser wî anînê, lê go Xodê ta tekdîr bike. ¹⁰ Vanan ji aw tiştan ra ko fehîm nakin küfr dikan, li aw tiştan⁴¹³ da ko ji aslê weka bê aql haywanan dizanin li fesadê da diçûn. ¹¹ Way! ji wan ra, ko li rêya Gayenê da çûn, weka şaş bûnê Paaxamê li dû ücretê bazdan, û li asîtiê Gorx da helak bûn. ¹² Vanan li muhabet zîyafetê we da leke nin, bi wê tev li xwarin û vexwarin da gava ronîşdinê bê tîrs nefsa xo diçêrînin, bê meywe daran, bê mahsûl, du caran mirî, ji qurm da hati kşandin. ¹³ Azxun dalxayê bahrê ko ayba nefsa xo kef dikan, hati şaş bûn îstêran, ko ji boy wan hatîe veşartin dûmanê tahrîe ebedîe.

¹⁴ Li ser vana peyemberîtiê kir Yenok jî, ko ji Ademê yedîncî bû û go, Va ha Rabb bi dah hazar azîzê xo hat. ¹⁵ Ji hemîan ra şeraat kirin ra, û ji boy hemî fasiqan tekdîr kirin ra ji boy hemî fasiq amelê wan ko kirin û ji boy hemî sert sözê wan, ko

⁴¹² Di metnê de *dîtoxai*.

⁴¹³ Di metnê de *tiştîdanda*.

fasiq günekâran zida wî xaber dan. ¹⁶ Vanan d̡rd̡ran kroḡ û ji halê xo gazinan kroḡ in, wan ko li gora arzûê xo diçun û xaberêṯ kîbîran dibên, û ji boy kêrê rûya meruv dikenin. ¹⁷ Lakîn hûn ey! delalîan, bîra xo bînin aw xabera ko resûlêṯ Rabbê me Îsa el Mesîhê ji awul da hati gotin. ¹⁸ Ko ji we ra digotin erki [584] li axir zeman da, mesqaracîan dê bibin, wan ko li gora fasiq arzûê xo dê biçun.

¹⁹ Vanan, aw xo ay[i]rmîş kroḡan, nefsanî, Rûhê tunne bûn kesan in. ²⁰ Lakîn hûn, ey! delalîan, hûn xo bi bîna kirinê li ser xayet azîz îmanê wê, û bi Rûh el Qudsê bi nimêc kirinê. ²¹ Hûn xo li muhabetê Xodê hifz bikin, û ji boy ebedî hayatê ji merhametê Rabbê me Îsa el Mesîhê ra beklemîş bikin. ²² Ê bi tazîr kirinê ji hinikan ra merhamet bikin. ²³ Ê hinikan bi tîrs azad bikin, ji agrê wan bi qapmîş kirinê, û ji cesedê hati leke bûn ji qaftanê bile îkrah dikan.

²⁴ Ê ji wî ra ko qadîr e wê leke bê leke veşartinê, û li ber îzzetê xo bê qusûr bide sekinandin bi şazîtîê; ²⁵ Ji yek Xodê ji xelasê me ra, bi destê Rabbê me Îsa el Mesîhê îzzet û azamet, qudret û hûkmet bibe, hem nua hem li ebedîan, Amin.

WAHÎ Ê RESÛLÊ HANNA Û ASDVADZAPAN ÎNCÎLÇÎÊ

SER 1

¹ Wahî Ê Îsa el Mesîhê e; ko awî Xodê jê ra da ko zû ve bûn gere bûn tiştan ji qulê xo ra nîşan dide; û melekê xobi şîyandinê beyan kir ji qulê xo Hanna ra. ² Ko aw ji kelamullahê ra û ji şehadetê Îsa el Mesîhê ra, ji hemî hati dîtin tiştan ra şehadet kir. ³ Xozî ji wî ra, ko söza peyxemberîtî hana dixoyne hem ji godarî kroşan ra û li wî da hati nivîsandin bûn tiştan ji hifz kroşan ra; zîra wext nêz e.

⁴ Ji Hannaê ji haft kîlîsan ra ko ki nav Asîa da ne; Înayet û selamet ji we ra ji awî, ko e, û bû, û dê bê; û ji aw haft Rûhan ko li ber taxta wî ne. ⁵ Ji emîn şahidê Îsa el Mesîhê ko awul zaê mirîan e, û serê padîşahê ardê; ji awî ra ko me heband, û me bi xuyna xo ji güneê me şûst. ⁶ Ê me pa- [586] dişahan û îmaman kir ji Xodê ra û ji Bavê xo ra, ji wî ra û quwwet ji abed el ebed; amîn.

⁷ Va ha bi awran tê, û her çahv awî dê bibîne, û wan ko awî brîndar kirin; û li ser wî dê şîn bikin hemî ömetê ardê, belî; amîn. ⁸ Ez im Alfa û Omexa dibê Rabb Xodê, aw ko mewcûd e, û mewcûd bû, û ko dê bê, aw Qadîrê hemîan e.

⁹ Ez Hanna, ko brêy we me û li sixlet û li padîşahîtî û li sabra Îsa el Mesîhê bi we ra tev îlhaq im ji boy kelamullahê û ji boy şehadetê Îsa el Mesîhê li Badmos hati gotan ada da bûm. ¹⁰ Ê li roya giragê da Rûh li ser min hat; û ji paş xo da awazkî bilind mi bihîst weka⁴¹⁴ dengê boruê; ko digot. ¹¹ Çiko dibînî li nav ktêbkî binivîs, û bişeyîne ji kîlîsan ra, ko li nav Yepesosê û Îzmîrê û Berķemosê û Tüadîrê û Sartîgeê û Pîxatexpîaê û li Lavoûgîa da ne. ¹² Ê ez vegeŕîam aw dengê bibînim ko bi mi ra xabar dida; û gava ko vegeŕîam, haft şamdanê zêrîn dîm. ¹³ Li orta şamdanan ji Kure meruv ra bengzemîş bûn meruvkî ko li ser linga wî digihîşt libaskî wergirtî bû; û li ser singê xo pişkî zêrîn grêda. ¹⁴ Ê serê wî û pora wî, weka herî sipî û û weka berf, û çahvê wî weka alevê agir. ¹⁵ Ê linga wî weka tunca Îsa, weka li ocaş da sor bûn bû, û dengê wî weka dengê pîr avan bû. ¹⁶ Ê li destê rastê wî da haft hab istêran hebû, û ji devê wî hati tûj bûn du dev şûrkî ra diba, û çehrey wî weka tav bû, ko bi quwwetê xo parlemîş dibe. ¹⁷ Ê gava ko mi di awî, weka mirî li ber [587] linga wî ketim, û destê rastê xo li ser min bi datîninê go, Metîrs, ez im awulîn û paşîn. ¹⁸ Ê ez sax im, û

⁴¹⁴ Di metnê da weqa.

ez aw im ko mirin, û va ha ji abed el ebedê sax im; û ji miftahê mirinê û cehenemê ra malîk im. ¹⁹ Binivîs her çi ko dibînî, aw ko heye û aw ko paşê dê bibe. ²⁰ Li destê rastê mi da hati dîtin sirra haft istêran û haft hab şamdanê zêrîn; haft istêran melekê haft kîlîsan e; haft şamdanan haft kîlîsan e.

SER 2

¹ Ji melekê kîlîsayê Yepesos ra binivîs: haft istêran li destê rastê xo grtoxê li orta haft şamdanê zêrîn garandox ahwa dibê. ² Amelêt ta û sabrê ta ez dizanim; hem ji kotîan ra tehamûl nikarî bikî, hem ta ceriband wan ko dibên em resûl in û nin in, û ta dî wan ko derewîn e. ³ Ê tehamûlê ta bi hebûnê ji boy navê min ta ezîyet kişand û tu sist nebûy. ⁴ Lakîn li ser ta gilîkî min heye, çima ko ta muhabetê xo awulîn hişt. ⁵ Nua bîra xo bîne ko tu ji ko ketîy, û erki na ez zû ve ji ta da tîm, û şamdanê ta ji cî da dê bilibitînim, erki toba nekî. ⁶ Lakîn li ta da tiştê han heye, ji amelêt Nîgoxosan ra îkrah dikî, ko ji wan ez daxî îkrah dikim. ⁷ Ji kê ra ko ji bihîsdin ra go heye bra bibihê, erki Rûh çi dibê ji kîlîsan ra: aw ko feth dike ji darê hayatê jê ra xwarin dê bidim, ko li nav cenetê Xodê ra e.

⁸ Ji melekê kîlîsayê Îzmîrê ra binivîs, Ahwa [588] dibêje, Awulîn û axirîn aw ko mir û ganî bû. ⁹ Ez dizanim amelêt ta û sixlet û faqîrîtyê ta, hama tu zengîn î, û küfrê wan ko dibên, em Yehûdî ne; hama nin im; lê cemîyetê Şeytanê nin. ¹⁰ Qat metîrs ji aw tiştan ko dê bikşînî; va ha şeytan ji we hinikan li hapsê dê deyne, ko bêne ceribandî, û dah ro sixletê we dê bibe, hata li mirinê emîn be, û ji ta ra dê taca hayatê didim. ¹¹ Ji kê ra ko ji bihîsdin ra go heye bra godarî bike, erki Rûh çi dibêje ji kîlîsan ra, aw ko feth dike, ji îkincî mirinê zerar dê nekşîne.

¹² Ji melekê kîlîsaê Berķemonê ra binivîs, Ahwa dibêje aw ko hati tûj bûn du dev şûrê wî heye. ¹³ Şixulê ta dizanim, û erki tu li ko sakîn dibî, yanî li wê der ko taxtê Şeytanê heye û navê min digrî, û îmanê min ta înkâr nekî, li va royan da bîle ko Antîbas emîn şahîdê min li nav we da hati kuştî, li ko kî şeytan sakîn dibe. ¹⁴ Lakîn li ser ta gilîkî min heye, zîra li wê ê ta talîmê Paşaamê girtoşan heye, ko ji Paşag ra hîn kir li ber Qurê Îsrayel da xwar kroş deyne; ko wan qurbana putan bixun û zîna bikin. ¹⁵ Ahwa jî ê ta talîmê Nîgoxosyanê grtoşan heye, aw ko ez jê îkrah dikim. ¹⁶ Nau toba bike; erki na, ez zû ve ji a ra tîm, û bi şûra devê xo bi wan ra dê pev biçum. ¹⁷ Ji kê ra ko ji bihîsdin ra go heye bra bibihê erki Rûh çi dibê ji kîlîsan

ra: Kî ko feth dike ji hati veşartin mananayê jê ra⁴¹⁵ xwarin dê bidim, û dê bidim jê ra nivîsê azîzîyê û li aw nivîs da navkî nû hati nivîsandin ko awî ji sendoxê pêtir yekê nizane.

[589] ¹⁸ Ji melekê kîlîsayê Tüadîrê ra binivîs, Ahwa dibê Kurê Xodê: ko weka alevê agrê çahvê wî heye, û lingê wî weka tunca xas in. ¹⁹ Ez dizanim amelê ta û muhabetê ta, û îmanê ta, û xizmetê ta, û sabrê ta, û erki şîxulê ta paşin ji awulîn pîr in. ²⁰ Lakîn li ser ta gilîkî min heye ko dihêlî Hezapel jin ko aw xo peyember dibê, û qulê min hîn dike û azdirmîş dike, ko zîna bikin, û qurbana putan bixun. ²¹ Ê mi ji wî ra wext da ji boy zînayê xo toba kirinê hama toba nekir. ²² Va ha ez wî dê li dîşegê bixim, û bi wî ra zîna kroşan li nav sixletê mezin, erki li ser şîxulê xo toba nekin. ²³ Ê ewladê wî bi mirinê dê bişujim, û kîlîsan gişk dê bizanin erki ez aw im, ko gurçikan û dilan tevtîş dikim, û ji wê her yekê ra li gora we didim. ²⁴ Lakîn ji we ra ji aw ê dinan ra dibêm. ²⁵ ko li nav Tüdadîrê da nin, û talîmê we hana tunne, ko hûn nas nekirin tiştê kurê Şeytanê çawan ko dibên, li ser wê başqa granîti naxim. ²⁵ Li we da bûn tiştê bigirin, hata ko ez bêm. ²⁶ Ê aw ko feth dike û hata paşê amelê min digre, jê ra li ser tayîfan dê hûkmet bidim; ²⁷ Ê wan bi asayê asinîn dê biçêrîne, û wan weka fraqê pirudan dê bişikêne. ²⁸ Ê Çawan ko mi ji ji Bavê xo send, û jê ra dê bidim îstêrê sibê. ²⁹ Ji kê ra ko ji bihîsdin ra go heye bra bibihê erki Rûh çi dibê ji kîlîsan ra.

SER 3

¹ Ji melekê Sartîgê ra binivîs: Ahwa dibê aw ko malîkê haft Rûhê Xodê û haft îstê- [590] ran e; ez dizanim amelê ta, navê ta ganî heye, hama tu mirî î. ² Heşar be û qawî bike aw tiştê mayin ko li ser mirinê me, zîra amelê ta li ber Xodê mi tekmlî nedî. ³ Nua bîra xo bîne çawan ta send û bihîst û hîfz bike, û toba bike; nua erki heşar nebî, li ser ta weka diz dê bêm; û tuê qat dê nizanibî ko çi şaz dê li ser ta bêm. ⁴ Lakîn çend meruvê ta hene li nava Sartîgê da, ko wan cilê xo neharamandine, û bi cilê sipî dê bimîra bigerî, zîra layiq in. ⁵ Aw ko feth dike, cilê spîan dê wergire; û ez navê wî ji kitêbê hayatê dê resîd nekim; û navê wî li ber Bavê min û li ber melekê wî dê îqrar bikim. ⁶ Ji kê ra ko ji bihîsdin ra go heye bra bibihê erki Rûh çi dbîbê ji kîlîsan ra.

⁴¹⁵ Di metnê de *zêra*.

7 Ji melekê kîlîsayê Pîxatexpîa ra binivîs, Ahwa dibê aw Salêh, aw Doxrî, aw ko malîkê mifteê Dawûd e, vedike, tunne yekê ko biquflîne, diquflîne, tunne yekê ko veke, 8 Amelêt ta dizanim, va ha mi li ber ta derîkî vekirî danî, ko kesê nikâre biqufilîne, zîra hinik quwwetê ta heye, û söza min ta hifz kir, û navê min ta înkâr nekir. 9 Va ha ji civatê Şeytanê bûoxan ez ji ta ra didim, wan ko dibên: wan Yehûdî ne, û nin in, lê derew dibên, va ha ez wan dê mecbûr bikim ko bên û li ber linga ta secde bikin; û bizanin ko ez ta dihebînim. 10 Çima ko ta söza sabrê min hifz kir, e jî ta dê hifz bikim li wexta tecrûbeê ko hazir e bê li ser hemî dinê, jî boy ceşibandinê wan ko li ser ardê sakîn in. 11 Va ha ez zû ve tîm, aw ko bi ta ra e hifz bike, hata ko tacê ta yekê nestîne, aw ko feth dike, 12 Awî li nav [591] dacarê Xodêê xo dê astûn bikim, û hênî dê li der neye û li ser wî dê navê Xodêê xo binivîsinim, û navê bajêrê Xodê ê min, yanî navê Yerusâlimê nû, ko ji azûmanan ji Xodêê min tî xwarî, û navê min ê nû. 13 Ji kê ra ko ji bihîsdin ra go heye bra bibihê erki Rûh çî dibê ji kîlîsan ra.

14 Ji melekê kîlîsayê Lavoîgê ra binivîs, Ahwa dibê: Amîn, Emîn û Şahîdê doxrî awulîne maxlûqê Xodê. 15 Amelêt ta dizanin ne tu sar î ne jî germ î, xozî sar ya germ bibana. 16 Nua tu kî sarogerm î, ne sar î û na jî germ, ta ji devê xo li ser qulubandinê me. 17 Zîra dibêy; Ez zengîn bûm û mezin û jî tiştîkî rva muhtac nin im û nizanî ko, tu sefîl û zawalî û faqîr û kîr û tahzî î. 18 Ji ta ra şîretkî bidim, jî min li agr da hati qall bûn zêr jî boy fîrorînê bikir, ko zengîn bibî û cilê sipî ko wergirî û ayba tahzîtî ta xuyayî nebe; û çahvê xo kil⁴¹⁶ deyne ko bibînî. 19 Ez her kî ko dihebînim tazîr û tedîb dikim nua xayret bike û toba bike. 20 Va ha ez li derî da sekinim û lê dixim û erki yekê dengê min binihê û derî veke li cem wî dê biçum, û ez pê ra dê şîvê bixum û aw jî bi mi ra. 21 Aw ko fath dike dê bidim jê ra ko bi mi ra li taxta mi da ronî, û çawan ko mi jî fath kir û bi Bavê xo ra li taxtê wî da ronîşdim. 22 Ji kê ra ko ji bihîsdin ra go heye bra bibihê ko Rûh çî dibê ji kîlîsan ra.

SER 4

1 Paşê tiştê hana mi dî; û va ha li azûman da derîkî hati vebûn hebû, û dengê awulîn [592] ko mi bihîsd weka denga borûê bû, ko bi mi ra xaber dida û dîgo: Livir rabe û ji vê pê ve hati bûn tiştan ji ta ra nîşan bidim. 2 Ê zû ve Rûh li ser min hat, û va ha taxtkî hatibû danîn li azûman da. 3 Ê li ser taxtê yekê hatibû ronîşdin, û aw

⁴¹⁶ Di metnê de *qil*.

ronişdox weka xuyayinê yemîş û yaqût kevîran bû. 4 Ê li dorê aw taxtê bîst û çar taxt jî hebû û li ser aw taxtan mi dî ko bi cilê sipî hati wergrtin bîst û çar yeretsan ronîştî bûn li ser serê wan da taca zêrîn hebû. 5 Ê ji aw taxtê birûskan sawtan û gurultîan ra dibobûn; û li ber taxtê dihati şewutandin haft hab mahşala agir hebû, ko wanan haft Rûha Xodê ne. 6 Ê li ber taxtê mîna bîlûr bahrkî weka sirça hebû, û li orta taxtê hem dorê taxtê çar haywanan hebû, ko jî pêş û jî paş paş da bi çahvan tîja bûn. 7 Ê birîncî haywan mîna bû aslanê, û îkîncî haywan mîna bû conaga û li üçîncî haywan da rûyê merûv hebû, û dördîncî haywan mîna qartal bû. 8 Ê ê çar haywanan, ê her yekê jî çar aliyê şeş parên hebû, û jî hindur va bi çahvan tîjî bûn û rahat nedisekinibûn bi gotinê, Azîz, azîz azîz e li her tiştê ra qadîr Rabb Xodê aw ko mewcûd bû, û mewcûd e û dê bê. 9 Ê gava ko aw haywanan hamd û îzzet û şûkr didan li ser taxtê hati ronîşdox ra aw ko ganî e li abed el ebedê. 10 Bîst û çar yeretsan li ber li ser aw taxtê hati ronîşdox ra diketibûn û secde dikiribûn, jî abed el ebed Ganî ra, û tacê xo li ber taxtê da tînbûn bi gotinê. 11 Tu layiq î, ya Azîz Rabb Xodê me, hamd û îzzet û qudret sendinê, [593] zîra her tiştê ta xalq kir, û bi îradetê ta xalq bûn, û mewcûd in.

SER 5

1 Ê li destê rastê aw ko li ser taxtê hati ronîşdî bû Kitêbkî mi dî, jî hindur ve û jî derve hati nivîsandin, û bi haft mûhran hati mûhr bûn. 2 Ê mi dî quwwetlî melekî, bi bilind sawntkî diqîrabû: Kî? layiq e kitêbê han vekirinê û mûhrê wî bişkavtinê. 3 Ê ne li nav azûmanan, ne li ser ardê, û ne li bin ardê hati dîtin yekê ko qadîr bibe aw kitêbê vekirandinê, ne jî li ser wî nihêrtinê. 4 Ê e jî pîr digrîabûm, ko yekê layiq nebû aw kitêbê vekirandinê, û ne jî li ser wî nihêrtinê. 5 Ê ji yeretsan yekê jî mi ra go: Megirî, va ha aw salan ko jî zurîyetê Cûdaê e, jî qurmê Dawûdê e yengmîş kir aw kitêbê û haft mû[h]rê wî bişkavtinê. 6 Ê mi dî li nav aw taxtê û nav çar haywanan û yeretsan Berxkî hebû weka hati serjê bûn, ko haft qoç û haft çahvê wî hebû, ko wan haft Rûhê Xodê ne, ko li hemî dinê hatin şîyandin. 7 Ê aw hat û jî destê rastê li ser taxtê hati ronîşdoxê kitêbê send. 8 Ê gava ko kitêbê send; aw çar haywanan û bîst û çar yeretsan li ber Berxê diketibûn; û jî her yekê ra tambûran û buxûrdanê zêrîn bi buxûr tîji hebûn ko wanan duwaê azîzan in. 9 Ê îlahî nû dixondibûn û digotibûn: Tu layiq î av kitêbê sendinê, û mûhrê wî vekirandinê; zîra tu hatîy serjê bûn, û bi xuyna xo me ji Xodê ra ji her mîlletan [594] û zimanan, û tayîfan û qawman kirî. 10 Ê me ji Xodê me ra ta padîşahan û îmaman kir, û li ser ardê em padîşahî dî bajon. 11 Ê mi

nihêrt û dengê pîr melean mi bihîst, wan ko li dorê aw taxtê û çar haywanan û yeretsan sekinîbûn, û hasabê wan dah car hazaran hazar, û hazar hazar bû. ¹² Wan ko bi bilind awazan digotibûn, Hati serjê bûn Berx, qudret û xanîmet û ilm û quwwet û îzzet û hamd û bereket qabûl kirinê layiq e. ¹³ Ê hemî maxlûqan, ko li azûmanan û li ser ardê ne, û çî ko li nav wan da heye, mi bihîsd ko digotibûn: Li ser taxtê hati ronîşdox ra û jî Berxê ra, maxsûs e bereket, û îzzet, û hamd û qudret bi abed el ebed. ¹⁴ Ê çar haywanan digotibûn: Amîn, û yeretsan li ber wî diketibûn û secde dikiribûn.

SER 6

¹ Ê mi dî ko Berxê jî aw mûhran yekê vekir, jî aw çar haywanan yekê sawtkî weka gürültî mi bihîst ko digot: Were û bibîne. ² Ê mi nihêrt û va ha haspkî sipî dî, û li ser swar bûox ra kawankî wî hebû, û jê ra tackî hati dayin, û aw fath kirox hat ko fath bike.

³ Ê mûhra îkîncî gava ko vekir, jî îkîncî haywanê mi bihîst ko go: Were. ⁴ Ê başqa haspkî sor rabû, û li ser wî da swar bûox ra jî ardê selamet sendin ra hûkmet hati dayin, hata ko hevûdu qatl bikin, û jê ra şûrkî mezin hati dayin.

⁵ Ê gava ko mûhra⁴¹⁷ üçüncî vebû, jî üçüncî [595] haywanê mi bihîst ko go: Were, û mêze ke û mi mêze kir, û va ha hasbkî reş, û li destê ser wî da swar bûoxê mezînkî hebû. ⁶ Ê jî nav çar haywanan mi sawtkî bihîst, ko digot: Şînegê genimê yek dînarê, û sê şînegê cehê yek dînarê bibe, û jî rûnê zeytûn ra û jî meyê ra zarar nedî.

⁷ Ê gava ko mûhrê dördîncî vekir, jî dördîncî haywanê mi swatkî bihîst ko go: Were û mêze ke. ⁸ Ê mi dî û va ha haspkî zer, û navê li ser wî swar bûoxê mirin bû, û cehnem li dû wî diçobû, û jê ra li ser riba ardê hûkmat hati dayin ko bi şûr û bi birçîtî û bi mirinê, û bi destê canawara ardê gebermîş bike.

⁹ Ê gava ko beşîncî mûhrê vekir, rûhê aw hemî merûvan mi li bin sexanê dî ko qatl bobûn jî boy kelamullahê, û jî boy şehadetî wî ko jî wan ra hebû. ¹⁰ Wan ko bi sawtkî bilind digotibûn, Ya! azîz û doxrî Rabb hata kînga? tu dê şeraat nebînî, û hayfa xuyna me li ser ardê jî sakîn bûoxan nastînî; ¹¹ Ê jî wan her yekê ra cilê sipî hati dayin, û jî wan ra hati gotin ko hinik zeman jî rahat bibin; hata ko quldaşê wan û brêy wan tekmîl bibin, wan ko weka wan li ser hati kuşdinê bûn.

⁴¹⁷ Di metnê de mûra (nîşeya wergêrê).

12 Û gava ko altincî mührê vekir, mi nihêrt, û zelzelkî mezin bû, û ro weka cilkî mûyin reş bû, û hîv gijk weka xuyn bû. 13 Û istêrê azümanan li ardê hatin rijandin, weka pelê darê hêjîlê, ko ji bayê mezin tê hejandin. 14 Û azümanan weka kitêbê maqaxatê gilok dibobû, û hemî çîyan û adayan ji cîê xo tevge- [596] rîyan. 15 Û padîşahê ardê, hem kîbaran, û bînbaşîyan û zengînan û xodîê quwwetan hem her qul û her azad kesan li maxaran û li nav zinaran ra digotibûn: 16 Li ser me biqevin, û me binixêfin ji rûê wî, ko li ser taxtê rodine û ji xazabê Berxê. 17 Zîra roya azîm xazabê wî hat, û kî? dikare li ber wî bisekine.

SER 7

1 Û ji vî pê ve mi dî çar melean, ko li çar perê dinê sekinîbûn û çar bayê ardê girtibûn, hata ko ne li ser ardê ne li ser bahrê û ne jî li ser darkî ba pif neke. 2 Û mi başqa melekî dî, ko ji ro halatê rabû, û jê ra mührê Xodê Ganî hebû, û bi bilind awazkî gazî kir ji aw çar melean ra, ji wan ra ko hükmat hebû li ser ardê û bahrê zîyan dayinê. 3 Û digot, Ji ardê ra zîyan mekin, ne ji daran ra ne ji bahrê ra hata ko henîê qulê Xodê xo mühr bikim. 4 Hasabê mühr bûnan mi bihîst; ji kurê Îsrayelê ji hemî zürîyetan sad û çil û çar hazar kes hatibûmühr bûn. 5 Ji zürîyetê Cûda dwanzdah hazar hati mühr bûn; ji zürîyetê Rûpen dwanzdah hazar hati mühr bûn, ji zürîyetê Kaş dwanzdah hazar hati mühr bûn. 6 Ji zürîyetê Aser dwanzdah hazar hati mühr bûn; ji zürîyetê Neptalîmê dwanzdah hazar hati mühr bûn; ji zürîyetê Manaseê dwanzdah hazar hati mühr bûn. 7 Ji zürîyetê Şmûn dwanzdah hazar hati mühr bûn, ji zürîyetê Xevî dwanzdah hazar hati mühr bûn; ji zürîyetê Îsa- [597] kar dwanzdah hazar hati mühr bûn. 8 Ji zürîyetê Zapuxon dwanzdah hazar hati mühr bûn, ji zürîyetê Yûsîf dwanzdah hazar hati mühr bûn, ji zürîyetê Penîamîn dwanzdah hazar hati mühr bûn.

9 Û ji vê pê ve mi dî, û va ha qalabalixkî pîr, awî jimarîtinê yekê qadîr nedibo; ko ji hemî tayîfan û mîlletan û qawman û zimanan wan ko li ber taxtê û Berxê sekinîbûn, cilê sipî hati wergirtin, û li destê wan gülîyê xurmayê hebû. 10 Û bi bilind awazê bi qîrinê digotibûn, Xelas li ser taxtê ronîşdox ji Allahê me ra û ji Berxê ra maxsûs e. 11 Û hemî melean li çar alîyê taxtê û yeretsan û çar haywanan sekinîbûn, û li ber taxtê li ser rûyê xo bi ketinê, û ji Xodê ra bi secde kirinê gotin: Amîn. 12 Beraket, û hamd û îlm û şîkr, û îzzet û qudret û quwwet ji Rabb Allahê me ra bi abedül ebed, amîn. 13 Û ji aw yeretsan yekê ji mi ra go vanan ko cilê sipî wergirtin, kî? ne yaxod ji kû? tîn. 14 Mi jî go jê ra, Ey! efendîm tu zanî, û ji mi ra go vanan in

ko ji sixletê mezin tîn, ko cilê xo şûşdin, û bi xuyna Berxê sipî kirin. ¹⁵ Ji boy vîa li huzûra taxtê Xodê ne, û jê ra xizmet dîkin li ro û li şev li nav dacarê wî da, û li ser taxtê ronîşdox li nav wan sakîn dibe. ¹⁶ Ê hênî ne dê birçî bibin û ne dê tî bibin, û yekê ji wan ra dê zerar neke, û ne ro û ne germ. ¹⁷ Zîra li orta taxtê bûn Berx wan dê biçêrîne, û wan li kanîyê ava hayatê dê bibe û Xodê ji çahvê wan hênî hestran dê paqij bike.

[598] SER 8

¹ Ê gava ko yedîncî mührê vekir li azüman da qasa nîv saat hûskût bû.

² Ê haft melekên mi dî ko li ber Xodê sekinîbûn û ji wan ra haft boru hati dayin. ³ Ê başqa melekê hat, li ber seşanê sekinî û ji wî ra pîr buxûran hati dayin, hata ko bi cümle dowaê azîzan li ber taxtê bûn li ser seşanê zêrîn arz bike. ⁴ Ê dümanê buxûran bi dowaê azîzan bi destê melekê li huzûra Xodê rabû. ⁵ Ê melek buxûrdanê ji agrê seşanê tijî kir, û awî li ser ardê rijand, û bû gürültî û sawndan û birûskan û zelzelekî mezin. ⁶ Ê haft boruyan girtox haft melekên, boru pîf kirinê aw xo hazir kirin.

⁷ Ê bîrîncî melek boruê pîf kir, û bû teyrik, û agir bi tevlî xuyn, û li ser ardê ket, û sê paran yekê ê şawutî, û sê paran yekê ê daran şawutî, hem her gîyayê hêşîn şawutî. ⁸ Ê îkîncî melek boruê pîf kir, û weka ko çîyakî mezin bi agir hati şawutî li bahrê ket, û ji sê paran parkî bahrê xuyn bû. ⁹ Ê aw maxlûqan ko xcanê wan heye li bahrê da ji sê paran yekê mirin, û ê gemîyan ji sê paran yekê telef bû.

¹⁰ Ê üçîncî melek boruê pîf kir, û ji azümanê weka hata şawutî maşal istêrkî mezin ket, û ket ji sê paran yekê li ser çeman û kanîyan. ¹¹ Ê navê av istêr tahl bû, û pîran ji tahlîtiyê avan mirin.

¹² Ê dördîncî melek boruê pîf kir; û ji sê para yekê ê ro hem ê hîv û hem ê istêran hati [599] lê xisdin; û ji sê paranê wan yekê tahrî bû, û ji sê para yekê ê ro tav nedida, wusan jî ê şevê.

¹³ Ê mi nihêrt û li orta azümanan mi dengê melekekî bihîst ko bi bilind awazê digot: Vay! vay! vay! li ser ardê ji sakîn bûoxan ra, gava ko dengê aw boruê mayin bibe; ko sê melekên dê pîf bikin.

SER 9

¹ Û beşîncî melekê boruê pif kir; û mi dî istêrkî ji azûman⁴¹⁸ ket, û miftahê ardê aflî saflî hati dayin, ² Û çalê aflî saflîê vekir, û ji çalê weka dûmanê külxanê mezin dümankî rabû û ji aw dûmanê ro û hawa reş bû.

³ Û ji dûmanê li ardê kulîan rabû, û ji wan ra hükümetê hati dayin; mîna hükümetê dûşşkê ardê. ⁴ Û ji wan ra hati gotin ko zarar nedin ji gîyayê ardê ra, û ne jî ji hêşînayî ra û ne ji darkî ra, lê tenê ji dinewî merûvan ra, ji wan ra ko li ser anyê⁴¹⁹ wan mühr tunne. ⁵ Û ji wan ra hükümet hati dayin, ko wan nekujin⁴²⁰, lê ezîyetê bidin ji an ra pênc mehan, û ezîyetê wan mîna ezîyetê dûpişkan e gava ko bi merûvan vedidin. ⁶ Û sê royan merûvan li mirinê dê bigarîin dê nabînin; û dê bixwazin mirinê, û mirin ji wan dê bireve. ⁷ Û tarzê ku[l]îan, mîna bûn hasbêt ko jab ra hazir bûn, û li ser serê wan weka tacê zêrînan hebû, û rûyê wan weka rûyê merûvan bû. ⁸ Û porê wan weka porê jinan bû, û diranê wan weka di- [600] ranê aslan bû. ⁹ Û zirxê wan hebû weka zirxê hasinîn, û dengê parê wan weka dengê araba kşandoş haspan bû, ko li cengê bazdidin. ¹⁰ Û weka dûpişkan dûvê wan hebû, û hükümetê wan hebû ji merûvan ra pênc mehan ezîyet bidin. ¹¹ Û li ser wan melekê cehenemê padîşah bû, û navê wî bi Îbranîyê Aşpaţon bû, ko li zemanê Kurmancî helak tê gotin. ¹² Û va ha waykî! bihurî û duwayan jî dê bèn.

¹³ Û altincî melekê boruê pif kir, û mi dengî bihîst ji çarê qoçê sexanê zêrîn ko li ber Xodê bû. ¹⁴ Ko digot ji altinci melek ra ko boruê girtibû, Veke aw çar meleketan li ser çemê mezin Yeprad hatin grêdan. ¹⁵ Û aw çar melekên hatin vebûn, wan ko hazir bobûn ji boy saat, û ro û hîv û sal, hata ko ji sê parê merûvan yekê bişujin. ¹⁶ Û hasabê swar askerê wan du caran dah hazaran, dah hazar bû; û hasabê wan mi bihîst. ¹⁷ Û li aw xayîş da mi haspan dî û li ser wan swaran, û ji wan ra hebû agirîn û weka hagîntê û kîbrîtê zirxan, û serê aw haspan weka serê aslanan bû; û ji devê wan der dihat agir, û dû û kîbrît. ¹⁸ Û ji aw sê belayan yanî ji devê wan rabûn ji agirê û ji dû û ji kîbrîtê ji sê parê merûvan parkî hatin kujtin. ¹⁹⁴²¹ Zîra quwwetê wan li nav devê wan da e; û li ser dûvê wan, û dûvê wan weka mahr bûn, û serê wan hebû, ko bi awî yaramazan dicahimandin. ²⁰ Û başqa merûvan ko ji av belayan nemirin, û toba nekirin, û ji amelê destê xo şûnda nesekinin, hata ko ji Şeytan ra û ji

⁴¹⁸ Di metnê de *azûnan*.

⁴¹⁹ Di metnê de *anxê*.

⁴²⁰ Di metnê de *nequjin*.

⁴²¹ Di metnê de *18*.

zêr hem ji zîv û ji sifr [601] û ji kevîr û pûtê darîn ra secde nekin, ko wan ji dîtin ra, ya bihîstin ra, ya çûndin ra qadîr nin in. ²¹ Ê toba nekirin ji qatlîtî xo, û ji sîhrbazîtî û ji zînayê û ji dizîtî.

SER 10

¹ Ê mi dî başqa melekê quwwetlî ko ji azümanan dihatibû xwarî, û awr wergirtin; û li ser serê wî kaska sor hebû; û rûê wî weka ro bû, û lingê wî weka istûnê agirî bûn. ² Ê li destê wî da kitêbkî piçûk hebû vebûyî, û lingê xoy rast li ser bahrê danî; û lingê xoy çep li ser ardê. ³ Ê bi bilind sawtkî qîrîn kir, weka qîrînê aslankî, û gava ko qîrîn kir, û haft gürültîan bi dengê xo xabar dan. ⁴ Ê gava ko haft gürültîan xabar dan, mi dê binivîsanda, û mi ji azümanan dengê bihîst ko digot: Gotinê haft gürültîan mühr bike, û wan menivîs. ⁵ Ê aw melekê ko li ser bahrê û ardê hati sekinand mi dî, destê rastê xo li azümanan bilind kir. ⁶ Ê sond kir li ser abedül ebed ganî bûoxê, ko xalq kir azümanan û çî ko li nav wî da e; û wext hênî dê nebe. ⁷ Lê güna dengê yedîncî yedîncî melekê, gava ko boruê pif bike, sira Xodê dê tekmîl bibe; çawan ko müjde da ji qulê xo ji peyemberan ra.

⁸ Ê aw sawt ko mi ji azümanan bihîst, dîsa xabar da bi mi ra û go, Hare bistîn aw kitêbê vekirî piçûk⁴²², ko li destê li ser bahrê û li ser ardê sekinandox melekê da e. ⁹ E jî çûm ji melekê ra, û mi go jê ra: Bide ji mi ra aw kitêbê piçûk, û go ji mi ra: Bistîn vîa [602] û bixor; û li zikê ta da tahlîtî dê peyda bibe; hama li devê ta da weka hingif şîrîn dê bibe. ¹⁰ Ê aw kitêbê piçûk mi ji destê melekê send, û mi xwar awî, û li devê mi da weka hingif şîrîn bû, û paşê xwarinê li zikê mi da tahlîtî bû. ¹¹ Ê go ji mi ra, Ji ta ra lazim e ko ji boy pîr qawman û tayîfan û zimanan û padîşahan dîsa peyemberîtî bikî.

SER 11

¹ Ê ji mi ra weka asa qamîşkî hati dayin, û melek sekinîbû û digot: Rabe bipîv dacar û seşanê Xodê û li nav wî da secde kiroxan. ² Ê aywanê ko ji dacarê der e bihêl û awî mepîv; zîra ji tayîfan ra hati dayin û bajara azîzê çil û du mehan dê pê lê bikin. ³ Ê ji herdu şahîdê xo ra dê hükümet bidim, û wan xararan wergirtin, hazar û du sed û şêst ro peyemberîtî dê bikin. ⁴ Ê vanan aw herdu zeytûnê û herdu çira nin, ko li

⁴²² Di metnê de *biçûk*.

huzûra Rabbê ardê disekinin. ⁵ Û erki yekê bixwaze ji wan ra zarar bide, ji devê wan agir tê, û dijaminê wan dixo; û erki yekê bixwaze ji wan ra zarar kirin gerek e ko ahwa bê kuştin. ⁶ Hükümetê vanan heye ko azümanan girêdin, ko li roya peyxemberîtî wan baran heye, û hükümetê wan heye li ser awan ko wan li xuyn tebdîl bikin, û bi her türlü belayê ardê xisdinê çend caran ko bixwazin. ⁷ Û gava ko şehadetî xo tekmlîl bikin, wê çaxê ji aflsaflî hati rabûn canawarê bi wan ra dê ceng bike, û wan dê yengmîş bike û dê bi kuje **[603]** wan. ⁸ Û leşê wan avêtî dê bimînin li meydanê aw bajêra mezin, ko bi rûhanî wan jî li Xaçê rabû. ⁹ Û qawman û zürîetan û zimanan û tayîfan ji leşê wan ra sê ro û nîv dê tamaşa bikin, û dê nehêlin leşê wan li tirban da bi tamarînin. ¹⁰ Û wan ko li ser ardê sakîn dibin şaz dê bibin û li ser wan dê bikenin; û ji hevûdu ra dê hedîan bişeyînin, çima ko av herdu peyxemberan, li ser ardê ji sakîn bûoxan ra ezîyet dan.

¹¹ Û paşê sê ro û nîvan, ji alî Xodê li nav wan rûhê hayatê ket, û li ser lingê xo sekinîn, û li ser wan dîtoxan tîrskî mezin ket. ¹² Û ji azümanan mi dengkî bihîst ko ji wan ra digot: Li jor li vir werin û wan bi awran li azümanan hatin helanîn, dijaminê wan wan dîn. ¹³ Û li wê saatê da zelzelkî mezin bû, û ji dah para yekê e bajêr ket, û ji aw zelzeleê haft hazar merûvan mirin, û mayinan bi tîrs tîji bûn, hamd dan ji Rabbê azümanan ra. ¹⁴ Wayê îkîncî bihurî îşte wayê üçîncî zû tê.

¹⁵ Û yedîncî melekê boruê pif kir, û li azüman da bilind awazan bûn, ko digoti bûn; Padîşahîtî dinê ji Rabbê me ra û ji Mesîhê wî ra bû, û aw dê padîşahîtî bike abedül ebedê. ¹⁶ Û bîst û çar yeretsan ko li ser taxtê xo roniştî bûn li ber Xodê li ser rûê xo ketin û ji Xodê ra bi secde kirinê gon. ¹⁷ Ji ta ra em şikir dîkin, ya! ji her tîştî ra qadîr Rabb Allah, tu ko mewcûd î û mewcûd bûy; ko qudretê e mezin ta send û ta padîşahîtî ajot. ¹⁸ Û tayîfan sû hatin û **[604]** xazabê ta hat, û wexta mrîan ko hükm bibin, û ücret bide ji qulê xo ji peyxemberan ra û ji azîzan ra, û ji navê ta tîrsoxan ra, ji piçûkan ra û ji mezinan ra, û wan ko ardê xarab dîkin, tu wan xarab dikî.

¹⁹ Û li azüman da dacarê Xodê vebû, û li dacarê wî da santûxa ahdê hati xuyayî û birûskan û sawtan û gürültîan, zelzela û tayrikkî mezin bû.

SER 12

¹ Û li azüman da alametkî mezin hati xuyayî, jinkî ro wergirtibû û hîv li bin lingê wî bû û li ser serê wî da ji dwanzdah istêran tackî hebû. ² Û hamla bû qîrîn dikir çima ko ji zayin ra hêş û ezîyet kişandin da bû.

³ Û li azüman da başqa alametkî xuyayî bû û va ha yek mezin qizil ajdîyarkî, ko haft ser û dah qoçê wî hebû û li ser serê wî haft tac hebû. ⁴ Û dûvê wî ji sê para yekê istêrê azümanan dikşand, û wan li ser ardê xist û ajdîyar sekinîbû li ber aw jînikê ko li ser zayinê bû, ko gava ko bize, ewladê wî bixor. ⁵ Û jînik ewladkî nêr za, ko aw hemî tayîfan bi asayê hasinîn dê biçêrîne, û ewladê wî qapmîş bû li ba Xodê û li ba taxtê wî. ⁶ Û jînik li çölê revîe li ko kî ji Xodê ji wî ra cî hatibû hazir bûn, ko li wê xoyî bibe hazar û du sed û şêst ro.

⁷ Û li azüman da ceng bû, Mîkayel û melekê wî bi ajdîya[r] ra pevçûn ajdîyar jî bi melekê xo pevçû. ⁸ Û xalîb nebûn, û li nav azüma- **[605]** nan hênî ji wan ra cî nehati dîtin. ⁹ Û aw ajdîyarê mezin hati avêtin, aw mahra qadîm aw Îblîs hati gotin, û aw Şeytan ko dinê hemî dixapîne, li ardê hati avêtin, hem melekê wî jî pê ra. ¹⁰ Û li azüman da mi awazkî bilind bihîst ko digot, Nua xelas û quwet û padîşahîtê Rabê me bû, û hükümetê Mesîhê wî, zîra gilî kroş brêyêt me li jêr hati avêtin, ko ji wan ra gilî dikir li ber Xodê, şev û ro. ¹¹ Û wan awî yengmîş kirin bi xuyna Berxê û bi söza şehadetê wan, û aw canê xo nahebandin hata li mirinê. ¹² Ji boy vîa şaz bin ey! azümanan û li nav wî da sakîn bûoşan, way! ji ardê ra û ji bahrê ra, zîra Şeytan li ba wê hati xwarî, ko pîr xazebê wî heye bi zaninê ko dê hinkî zeman bisekine.

¹³ Û gava ko ajdîyar dî ko li ser ardê ket, ket li dû aw jînik ko ewladê nêr zabû. ¹⁴ Û ji jînik ra du parê qartalê mezin hati dayin ko li çölê li cîê xo bifire li ko kî dê bihata xoyî bûnê ji rûê mahr zeman, û zemanan û nîv zeman. ¹⁵ Û mahr ji devê xo weka çay av deranî li dû jînikê, hata ko awî li çay da xarq bike. ¹⁶ Û ard jînik ra yardum kir, û ard devê xo vekir, û balihant aw çayê, ko ajdîyar ji devê xo deranî. ¹⁷ Û ajdîyar ji jînik ra sê hat, û çû pev biçê bi başqa ewladê wî ra, wan ko tenbîhê digirtibûn, û şehadetê Mesîhê digirtibûn.

¹⁸ Û sekinî li ser qumê bahrê.

[606] SER 13

¹ Û mi dî ko ji bahrê canawarkî derdiket û haft serî û dah qoçê wî hebû, û li ser qoçê wî dah tac û li ser serê wî navê küfrê hebû. ² Û aw canawar ko mi dî mîna bû qaplanê, û lingê wî weka lingê herç û devê wî weka devê aslan bû, û ajdîyar quwetê xo û taxtê xo hem azîm hükümetê xo jê ra da. ³ Û ji serê wî yekê qasa mirinê brîndar bû, û brîne mirinê wî sax bû; û dinê gîjk, li aw canawarê tacûb kir. ⁴ Û secde kirin ji ajdîya[r] ra ko ji canawar ra hükümet da, û ji canawar ra jî bi secde kirinê gon: Aw kî? e mîna canawarê û kî? qadîr e pê ra ceng bikin. ⁵ Û jê ra xaberê mezinan û küfr xaber dan dev hati dayin, û jê ra çil û du mehan hükümet hati dayin ko meramê xo îcra bike. ⁶ Û devê xo bi küfr kirinê li qarşî Xodê vekir, navê wî û çadirê wî li azûman da sakîn bûoxan küfr kirinê. ⁷ Û jê ra hükümet hati dayin ko bi azîzan ra ceng bike, û wan yengmîş bike; û ji wî ra hükümet hati dayin li ser ömetan û qawman û zimanan û tayîfan. ⁸ Û jê ra secde bikin aw hemîan ko li ser ardê sakîn in, ko navê wan ji teme bûnê dinê li nav kitêbê hayatê, hati serjê bûn Berxê nenivîsandîe. ⁹ Ji kê ra ko go heye bra bibihê. ¹⁰ Her kî ko li esîrîtîe bikşîne awî dê esîr biço, erki yekê bi kêr qatl bike, lazim e ko aw bi kêr bê kuştin⁴²³, sabr û îmanê azîzan li vir e.

¹¹ Û mi başqa canawarkî dî ko ji ardê der [607] dihat û weka berxê du qoçê wî hebû, û xaber dida weka ajdîyar. ¹² Û hemî hükümetê canawarê awulîn li ber wî îcra dibobû, û ardê û aw hemî ko li wî da sakîn in, zor dikir ko secde bikin ji canawarê awulîn ra, aw ko brîne mirinê wî sax bobû. ¹³ Û alametê mezinan îcra dikir, hata ko ji azûmanan agir dianî xwarî li ber merûvan. ¹⁴ Û bi aw alametên li ser ardê sakîn bûoxan şaş dikir; ko li destê wî hatibû dayin li ber canawarê kirinê, û digot li ser ardê sakîn bûoxan ra ko sûret çêkin ji aw canawar ra, ko bi kêr brîndar bobû û sax bobû. ¹⁵ Û jê ra hükümet hati dayin ko ji sûretê canawar ra rûh bide ko sûretê canawarê xaber bide, û kî ko ji sûretê canawar ra secde neke awî bide qatl kirin. ¹⁶ Û zor dikir ji hemîan ra yanî ji piçûkan ra û ji mezinan ra, û ji zengînan ra û ji faqîran ra, û ji azadlîan ra û ji qullan ra, ko li ser destê xo rastê yaxod li ser henê xo daxma qabûl bikin. ¹⁷ Û kî ko nikâre bikîre, ya bifîroşe, li tenê aw ko jê ra heye damxa, ya navê canawarê, yaxod hasabê navê wî. ¹⁸ Îlm li vir e; ji kê ra ko aql heye bra bijmêre hasabê canawarê, zîra hasabê merûvkî e û hasabê wî şex sed û şêst û şex e.

⁴²³ Di metnê de *quştin*.

SER 14

¹ Û mi nihêrt, û va ha Berx sekinî bû li ser çîaê Sîonê, û bi wî ra bûn sed û çil û çar hazaran wan ko li ser henîyê wan hatibû nivîsandin navê wî û navê Bavê wî. ² Û mi ji azümanan dengkî bihîst weka dengê pîr [608] avan, û weka dengê gürültîkî mezin; û aw deng ko mi bihîst, weka dengê tanbûrê xo lêxisdox tanbûrcîan bû. ³ Û îlahîê nû dixondibûn, li ber taxtê û çar haywanan û yeretsan, û yekê nedikaribû aw îlahê hîn bûnê ji aw sed û çil û çar hazaran pê ve; wan ko ji ardê xelas bobûn. ⁴ Vanan aw in ko bi jinan ra murdar nebûn zîra bakîr in vanan li dû Berxê diçûn, li ko kî aw here, vanan ji merûvan hatin bijartin ji Xodê ra û Berxê ra. ⁵ Û li devê wan da derew nehati dîtin çima ko wan bê qusûr in.

⁶ Û başqa melekî mi dî ko difîrîa li orta azümanan, ko jê ra müjdeê ebedî hebû, ji hemî mîlletan ra û qawman ra û ji tayîfan ra ko li ser ardê sakîn dibin müjde bike. ⁷ Û bi sawtkî bilind digot: Ji Xodê bitîrsin û jê ra şikir bikin; zîra saatê şeraatê wî hat, û secde bikin ji awî ra ko azümanan û ardê, û bahrê û kanîyê avan xalq kir.

⁸ Û li dû wî da başqa melekî hat û go, Ket, ket bajêrê mezin Papîlonê; çima ko, ji şarabê xazabê zînayê xo ji hemî tayîfan ra da vexwarin. ⁹ Û li dû wan başqa melekî hat, û bi bilind awazkî go: Kî ko ji sûretê canawar ra secde bike, û damxayê li ser henîê xo, yaxod li ser destê xo qabûl dike. ¹⁰ Aw dê vexu ji şarabê xişmê Xodê, ko safî hatîe tji bûn li nav kâsikê xazabê Xodê, li ber azîz melekî û li huzûra Berxê bi agir û kîbrît dê ezîyet bikşînin. ¹¹ Û dümanê ezîyetê wan abedül ebed radibe; û li ro û şev rahatê wan tunne, ko ji sûretê cana- [609] war ra û ji wî ra secde dikin û damxayê navê wî qabûl dikin. ¹² Li vir e sabrê azîzan, wan ko tenbîhê Xodê û îmanê Mesîhê dipên. ¹³ Û ji azümanan mi dengkî bihîst ko digot: Binivîs, ji vê pê ve xozî ji wan ra ko bi Rabb dimirin, bîra dibê Azîz Rûh: Hata ko wan ji zahmetê xo rahat bibin; û amelê wan li dû wan diçûn.

¹⁴ Û mi nihêrt, û va ha awirkî sipî, û li ser aw awrê yekê ronîştî bû mîna Qurê merûv; û li serê wî da tackî zêrîn û li destê wî da daskî tûj hebû.

¹⁵ Û ji dacarê başqa melekî radibobû, ko bi bilind awazkî li ser awrê hati ronîşdox ra diqîrabû, û digotibû: Dasê xo dirêj bike û biçîne, zîra wexta çînadîne hat, çima ko palayê ardê gihîştin. ¹⁶ Û aw ko li ser awirê rodinibû, dasê xo li ser ardê dirêj kir, û ard hati çînandin.

¹⁷ Û ji aw dacarê azümanê başqa melekî rabû; ji wî ra jî daskî tûj hebû.

18 Û ji seṣanê başqa melekê rabû, ko hükümetê wî li ser agir hebû; û bi dengê mezin gazî kir ji awî ra ko dasê wî ê tûj hebû; û go: Dasê xo tûj drêj ke, û ji rezê ardê weşîyan biçîne; zîra tirîê wî gihîştî e. 19 Û aw melek dasê xo li ser ardê dirêj kir, û ji rezê ardê tirîan çinî; û li nava mahsareê mezinê a azabê Xodê xisd. 20 Û mahsara ji bajêr derve hati pê lê kirin; û ji mahsara xuyn dihatibû der, ko hata li gemê haspan hazar û şeş sed asbarez digihîştibû.

[610] SER 15

1 Û başqa mezin û acayîb alametkî mi dî li azüman da, haft melean, ji wan ra ko haft belayê paşîn hebû, zîra xazabê Xodê bi wan tekmîl bû. 2 Û mi dî weka bîlorê bahrkî bi agir hati tev bûn; û wan ko yengmîş kirin ji canawar ra û ji sûretê wî ra û ji hasabê navê wî ra, li ser bahrê bîlorê sekinîbûn; û ji wan ra tanbûrê Xodê hebû. 3 Û îlahîê qulê Xodê a Mûsaê dixondibûn, û îlahîê Berxê, digotin, Mezin û acayîb in amelêt ta ya ji her tişt ra qadîr Rabb Allah, sadiq û rast in rêya ta, ya! padîşahê tayîfan. 4 Ya! Rabb ji ta kî? natirse û bi navê ta ra hamd nake; zîra tu tenê azîz î, çima ko tayîfan gijk dê ên û li ber ta secde dê bikin, zîra doxrî şeraatê ta beyan bûn.

5 Û ji vê pê ve mi nihêrt û li azüman da çadirê dacarê şehadetê vebû. 6 Û haft belayan grtox haft melean pak û parlax kitan hati wergirtin, û li ser singa xo pişta zêrîn hati grêdan, ji dacarê rabûn. 7 Û ji aw çar haywanan yekê ji haft melean ra ji xazabê abedül ebed Ganî bûn Xodê haft kâsikê zêrîn tijî da. 8 Û dacar ji celal û quwetê Xodê bi dûman tijî bû, hata ko tekmîl bibin haft belayê haft melean û li dacarê ketinê qat yekê qadîr nebû.

[611] SER 16

1 Û mi ji dacarê sawtkî bilind bihîst ko ji haft melean ra digot, Herin haft kâsikê xazabê Xodê li ser ardê birêjin.

2 Û melekê awulîn çû û kâsikê xo li ser ardê rijand, û konnêrkî kötî bû li ser wan merûvan ji wan ra ko damxayê canawarê hebû û wan ko ji sûretê wî ra secde dikiribûn[.]

3 Û îkîncî melekê kâsikê xo li ser bahrê rijand, û avan weka xuyna merûvê mirî bû û li bahrê de bûn hemî haywanan mirin.

4 Û üçîncî melekê kâsikê xo li ser çayan û kanîê avan rijand, û wan xuyn bûn.

5 Û mi ji melekê avê bihîst ko digot, Tu sadiq î, ya! Rabb tu ko mewcûd î û mewcûd

bûy û tu azîz î, zîra ta va ha hükm kir. 6 Zîra wan xuyna sadiqan û peyemberan rijandin, û ta ji wan ra xuyn da vexwarin, zîra ji wî ra layiq in. 7 Ê mi ji sexanê bihîst ko digot, Belî ya! ji her tişt ra qadîr Rabb Allah şeraatê ta rast û haq in.

8 Ê dördincî melekê kâsikê xo li ser ro rijand û jê ra hükûmet hati dayin, ko meruvan bi agir bişewutîne. 9 Ê meruvan bi şedîd heraretê şewutîn, û küfr kirin ji navê Xodê ra ko li ser aw belayan hükûmetê wî hebû; û toba nekirin ko jê ra hamd bikin.

10 Ê beşincî melekê kâsikê xo li ser taxtê canawarê rijand, û padîşahîtê wî tahrî bû, û ji hêşan zimanê xo dicûtin. 11 Ê ji [612] Allahê azüman ra küfr kirin ji semedê hêşa aw kunêrê xo, û toba nekirin.

12 Ê altincî melekê kâsikê xo li ser çayê mezin Yepradê ra rijand, û avê wî zuwa bûn; wusan ko rêya padîşahê rohelatê hazir bibe. 13 Ê mi dî ko ji devê ajdîyarê û canawarê û derew peyemberê sê nepak rûhan der dihatibû weka baqan. 14 Zîra av rûhê cinan in, ko alametên dikin û ji hemî padîşahê dinê ra diçun ko wan ji boy ji her tişt ra qadîr cengê Xodê ra bicivînin. 15 Va ha ez weka diz tîm xozî ji wî ra ko hêşar dimîne û cilê xo dipê, ko tahzî negere, u ayba wî xuya nebe. 16 Ê wan li cîkî civandin ko bi îbranî Armaketan tê gotin.

17 Ê yedincî melekê kâsikê xo li hawayê rijand, û ji dacarê azümanan, ji taxtê awazkî bilind rabû bi gotinê, Bûe. 18 Ê birûskan û dengen û gürültîyan bûn û zelzelekî mezin bû, wusan ko meruvan li ser ardê xalq bûnê hata nua, wusan zelzelekî mezin nebobû. 19 Ê bajêrê mezin sê par bû, û bajêrê tayîfan ketin; û Papîlonê mezin li ber Xodê zîkr bû, ko kâsikê xişm û xazabê şarabê wî jê ra bide. 20 Ê hemî adayan revîan û çîan nebaded bûn. 21 Ê teyrikê gir, saykî her yekê bi wezn talantkî ji azümanan dihatibû xwarî li ser meruvan; û meruvan ji Xodê ra dijmînan kirin ji boy belayê teyrikê zîra belayê wî pîr mezin bû.

SER 17

1 Ê haft kâsikên grtox ji haft melekên yekê hat, û bi mi ra xaber da bi gotinê: [613] Were, û ji ta ra binimêrim hükma aw fahîşê mezin; ko li ser pîr avan rodine. 2 Ko bi wî ra padîşahê ardê zîna kirin; û sakîne ardê bi şarabê zînatî wî serxoş bûn. 3 Ê mi girt bi Rûh li çolê bir, û mi dî jinkî koli ser canawarkî sor roniştî bû, û aw canawar bi navê küfran tîjî bû û haft serî û dah qoçê wî hebû. 4 Ê jinik xelatê sor hatibû wergirtin, û xemilandibû bi zêr û bi kevîrê cewahîran û bi incuan, û li destê wî

da kâsikkî hebû, bi mekrûhâtî bi zînayê û bi nepakîtî tîjî bû. ⁵ Ê li ser henî wî navkî nivîsandin bû, sir, yanî dîya fahîşan û mekrûhatî ardê ê Papîlonê mezin. ⁶ Ê mi dî aw jin bi xuyna azîzan û şahîdê Mesîhê serxoş bobû û gava mi dî awî bi pîr tacûb bûnê tacûb kir. ⁷ Ê melek ji mi ra go: Çima? ta tacûb kir, ez ji ta ra bibêjim sira aw jînikê û ê aw canawarê ko ko aw li ser xo girtî, û haft serî û dah qoçê wî heye. ⁸ Ê aw canawar ko ta dî heye û tunne, û ji ardê reş jor dê bê û li helakê dê biço, û li ser ardê sakîn bûoxan ko navê wan ji îbtîdaê dinê li kitêbê hayatê da nivîsandindin nin in dê tacûb bikin gava ko bibînin aw canawarê ko hebû û tunne, û nêze. ⁹ Li vir lazim e îlmkî, ko aqlê wî hebû, aw haft serî haft çîa ne, li ko kî jînik li ser wan rodine, û haft padîşah in; ¹⁰ Pênc ketin û yekê dimîne û awê din hêja nehatî, û gava bê hindik zeman dê bisekine. ¹¹ Ê aw canawar ko hebû, û tunne, aw jî sekîzîncî e; û ji haftan e, û li helakê diço. ¹² Ê dah qoçan ko ta dî, dah padîşan in, wan ko hêja padî- **[614]** şahî nesendine, lakîn bi canawarê tev saatkî weka padîşahan hûkmetê distînin. ¹³ Ê meramê vanan yek in û quwwet û hûkûmetê xo ji canawar ra didin. ¹⁴ Vanan bi Berxê dê ceng bikin, û Berx wan yengmîş dê bike; zîra aw Xodê xodîan û Padîşahê padîşahan e; û bi wî tev bûoxan, dawetlî û bijartî û îtîqatlî nin. ¹⁵ Ê ji mi ra go: Aw avan ko ta dî, ko li ser wan fahîşe ronîşdî bû qawman û qalabalixan û tayîfan û zîmanan in. ¹⁶ Ê aw dah qoçan ko ta dî û canawarê wan dê ji fahîşê îkrah bikin, awî xarab û tahzî dê bikin; û gowdayê wî dê bixun, û li agir da awî dê bişewutînin. ¹⁷ Zîra Xodê li dilê wan danî ko meramê wî îcra bikin, û yek meram bibin û padîşahîtî xo ji canawar ra bidin, hata ko Kelamullahê tekmîl bibe. ¹⁸ Ê aw jînik ko ta dî, aw bajêrê mezin e, ko padîşahîtî dajo li ser padîşahan.

SER 18

¹ Ê paşê av tiştan başqa melekî mi dî ko ji azümanan dihati xwarî bû; û hûkûmetkî wî mezin hebû û ard ji celalê wî hati rohnî bûn. ² Ê bi quwwetlî dengkî gazî kir gotinê: Ket, ket Papîlonê mezin; û meskânê cinan bû; û zindanê hemî nepak rûhan û qafasê hemî murdar û mekrûh teyrin. ³ Zîra hemî tayîfan ji şaraê xişm û zînayê wî vexwarin, û padîşahê ardê pê ra zîna kirin, û tücarê ardê ji ardê ji pîr sefayê wî zengîn bû. ⁴ Ê ji azümanan mi başqa dengkî bihîst ko digot: Ji rê rabin, ya! qawman min; ko ji **[615]** güneê wî ra îlhaq nebin, ko ji belayê wî hîsse nestînin. ⁵ Zîra güneê wî hata azüman gihîştin, û Xodê qabaatê wî zîkr kir. ⁶ Aw çawan ko kir hûn jî wusan bikin jê ra, û jê ra li gora amelê wî du qat bidin; aw kâsik ko aw tişt kir

jê ra du qat tiji bikin. 7 Her çiqas ko aw xo îzetlî kir û sefa ajot ji wî ra awqas îskence û şîn bidin; zîra aw li dilê xo da dibê: Ez sultan rodinim û jinebî nin im, û ez qat dê şîn nebînim. 8 Ji wî semedê belayêt wî, mirin û şîn û birçîtî li yek ro da dê bê; û bi agir dê bê şewutandin, zîra awî hükm kroş Rabb Allah quwwetlî e. 9 Ê padîşahê ardê ko bi awî ra zîna kirin û sefa ajotin, dê bigirin û şîn bin li ser wî gava ko bibînin dümanê şewutandinê wî. 10 Ji semedê tîrsê îskenceê wî dûr ve dê bisekinin û bêjin: Way!, way! ji ta ra, ey! bajêrê mezin Papîlon, ko hükm û xazaba ta li saatkî da dah hat. 11 Ê tücarê ardê dê bigirin û şîn bibin li ser wî, çima ko mataa wan hênî yekê nakîra; 12 Yanî zêr û zîv, û kevîrê cewahîr û încu û ktanê zirav û xelas û hawrîşim, û mataa qîrmiz, û her dürlü darê buxûr, û her dürlü fraqê fil dîşî, û her dürlü bi pîr baha ji dar û ji sifr û ji hasin û ji fraqê mermer. 13 Ê darçîn û amamon û buxûran û bi bîna xoş rûn, û künlük û şarab û zeytûn yaxî, û arê sîmîdê û genim û dawaran û mîan û araban û kölean û canê merûvan. 14 Ê meyweê arzûê canê ta ji ta çû, û van hênî qat tuê dê nebîni. 15 Ê tücarê tîştê hana ko ji vîa xort bobûn ji tîrsê azabê wî dûr ve dê bisekinin û [616] bêjin; Bi şîn û girînê. 16 Way!, way!, ey! bajêrê mezin ko bi ktanê zirav û⁴²⁴ xelat û qîrmiz hati wergirtin û zêr û kevîrê cewahîran û bi încu hati bûn xemilandinê çima ko awqas zengînîti li yek saat da pûc bû. 17 Ê her reyîsa gemîê û li gemî da bûn hemî tayîfan û gemîciyan, û li bahrê da hemî şîxulandoşan ji dûr ve sekinîn. 18 Ê gava ko dümana şewutandinê wî dîn, diqîrabûn bi gotinê; Mîna bajêra hana mezin heye?. 19 Ê li ser serê xo xolî danîn, û bi girînê û şîn bûnê diqîrabûn bi gotinê: Way!, way! ji aw bajêrê mezin ra, li wî da ji pîr qîymetlî bûnê wî xort bûn aw hemîyan, ko gemîê wan hebû li ser bahrê, zîra li yek saat da xopan bû. 20 Şaz bin li ser wî, ey! azûmanan û azîz resûlan û peyemberan, ko Xodê hayfa we jê send.

21 Ê quwwetlî melekî qasa kevîrkî mezinê aşê kevîrkî helanî û avêt li bahrê bi gotinê: Ahwa bi quwwet xwarî dê bê avêtin, bajêra mezin Papîlon, û hênî dê neye dîtin. 22 Li ta da hênî dengê tanbûrcîyan û dengbêjan neyzanan, û borazan dê neye bihîstin û li ta da hênî ustakî sanaatê dê heye dîtin, û dengê aşê li nav ta hênî dê neye bihîstin. 23 Ê li ta da hênî rohnîa çîre qat dê nexuya be, û dengê zava û bûk hênî li ta da dê neye bihîstin, zîra tücara ta kîbara dinê bûn; çima ko bi sîhîrbazan xo ta hemî tayîfan şaş kir. 24 Ê li nav wî da xuyna peyemberan û azîzan û aw hemî ko li ser ardê hatin kuştin hati dîtin.

⁴²⁴ Di metnê de sv.

[617] SER 19

¹ Paşê av tîştan weka dengê pîr qalabalixê, li azüman da mi awazkî bilind bihîst, ko digotibûn, Alelûîa, xelas û hamd û izzet û quwwet ji Xodê me a maxsûs e. ² Çima ko şeraatê wî haq û sadîq in; zîra bi zînayê xo dinê li fesadê dayox şeraatê aw fahîşê mezin birî, ji boy xuyna qulêt xo ji destê wî întîqamê send. ³ Ê tekrar gon: Alelûîa, û⁴²⁵ dûmanê wî abed el ebed ra dibe. ⁴ Ê bîst û çar yeretsan û çar haywanan ketin û secde kirin ji Xodê ra, ko li ser taxtê rodine, bi gotine: Amîn, Alelûîa. ⁵ Ê ji taxtê dengkî rabû bi gotinê: Ji Xodê me ra şikir bikin, hemî qulêt wî, û hûn ko jê ditîrsin, piçûk û mezinan. ⁶ Ê weka dengê pîr qalabalixê û weka dengê avan, û weka dengê quwetlî gürültîan mi bihîst, ko digotibûn, Alelûîa, zîra ji her tîşt ra qadîr bûn Rabb Allahê me padîşahîti ajot. ⁷ Em şaz û mesrûr bibin, û jê ra hamd bidin; zîra dawetê Bexê hat, û jina wî aw xo hazir kir. ⁸ Ê jê ra hati dayin ko pak û parlar kitanê zirav wergire, zîra kitanê zirav sadaqatê azîzan e. ⁹ Ê ji mi ra go: Binivîs xozî ji wan ra ko li zîyafetê dawetê Bexê dawet bûne û ji mi ra go: Vanan in doxî Kelamullahê. ¹⁰ Ê e jî li ber lingê wî ketim, ko jê ra secde bikim, û ji mi ra go, Saqin nekî, e jî quldaşê ta me, û ê brêyet ta, ji wan ra ko şehadetê Mesîhê heye, ji Xodê ra secde bike, zîra şehadetê Mesîh Rûhê peyxemberîti e.

[618] ¹¹ Ê mi dî azümanan hati vebûn, û va ha hespkî boz, û ji li ser wî swar bûox ra, Emîn û haq dihatibû gotin, û bi sadaqatê şeraat dibîne û genc dike. ¹² Ê çahvê wî weka alevê agir bû, û li ser serê wî pîr tacan hebû, û hati nivîsandin navkî hebû, ko yekê nedizanibû, lê tenê aw. ¹³ Ê bi xuyn hati boyax bûn cilkî wergirtibû; û navê wî Kelamullahê dihatibû gotin. ¹⁴ Ê li azüman da bûn askeran li pey wî diçobûn bi hespê sipî; sipî û pak kitanê zirav hati wergirtin. ¹⁵ Ê ji devê wî şûrkî tûj derdihatinbû, ko bi awî li tayîfan xe û bi asayê hasinîn wan dê biçêrne, mahsarayê xişm û xazabê şarabê qadîr Allahê aw dê pê lê bike. ¹⁶ Ê li ser cilê wî û li ser hêtê wî, hati nivîsandin nivîskî wî hebû, PADÎŞAHÊ PADÎŞAHAN Ê XODÎÊ XODÎAN.

¹⁷ Ê melekî mi dî ko li nava rojê da sekinîbû, û bilind awazkî qîra li azüman da frox hemî teyrên ra bi gotinê: Werin li mezin zîyafetê Xodê cem bibin. ¹⁸ Ko bixum leşê padîşahan, û bînbaşîan û swar leşê quwetlîan, û ê hesapn û leşê li ser wan swar bûoxan, û leşê aw hemîan, erki azadlîan û erki qulan, erki piçûkan û erki mezinan.

⁴²⁵ Di metnê de sv.

19 Û mi dî canawarê û padîşahê ardê û askerê wan li yek cî da hati civandin ji boyê ko bi wî ra ceng bikin, ko li ser hespê swar bobû, û bi askerê wî ra. 20 Û canawar û bi wî ra bûox peyemberê derew hati girtin; aw ko li ber wî alametani kir; bi wan ko şaş kir wan ko damxayê canawarê qabûl kiribûn; û ji sûretê wî ra secde kroşan, herdu jî sax sax [619] hatin avêtin bi kîbrît hati şewutî li agirê. 21 Û aw ko mabûn hatin kuştin bi li ser hespê swar bûn şûrê ko ji devê wî derdihatibû; û teyran gişk ji goştê wan têr bûn.

SER 20

1 Û melekkî mi dî ko ji azümanan dihatibû xwarî, û li destê wî da miftayê ardê raş û zencîrkî hebû. 2 Û girt ajdîyarê, yanî aw mahrê awulîn ko Îblîs û Şeytan e; û awî grêda hazar sal. 3 Û awî li bin zikê ardê xist û qapamîş kir û ji ser da mühr kir, ko hênî tayîfan şaş neke, hata hazar sal tamam bibe; û ji vê pê ve hinik wext, gerek e ko vebe.

4 Û mi dî taxtan, û li ser wan roniştoxan û ji wan ra hükümetê şeraatê hati dayin, û ji boy şehadetê Îsaê û Kelamullahê rûhê serjê bûnan in dî; û wan ko, ji canawar ra secde nékirin, né jî ji sûretê wî ra; û damxayê wî li ser henîê xo û li ser destê xo abûl nekirin; wan sax bûn û Mesîh ra hazar sal padîşahîti ajotin. 5 Û başqa mirîan sax nebûn, hata ko hazara sal tekml bû, vîa e qiyamê awulîn. 6 Xozî ji awî ra ko para wî li qiyametê awulîn da heye; li ser wanan hükümetê îkîncî mirinê tunnê, lê wan îmamê Xodê û Îsaê dê bibin; û bi wî ra hazar sal dê padîşahîti bajon.

7 Û gava hazar sal tekml bibe, Şeytan ji zindanê dê bê der; û dê rabe û şaş bike li çar alîê dinê bûn tayîfan yanî Kox û Maqokê, ko wan ji ceng ra bicivîne ko hasabê [620] wan qasa qumê bahrê e. 8 Û li ser frayîê dinê rabûn û ji çar alîê hasad kirin ordua azîzan û bajêrê delalî. 9 Û ji azümanan ji alîê Xodê agir ket, û wan telef kir; û⁴²⁶ Îblîs ko wan şaş kir, hati avêtin li göla agirê û kîbrîtê, li ko kî bû canawarê û peyemberê derewîn. 10 Û dê îskence bikşînin şev û ro abed el ebed.

11 Û mi taxtkî sipî dî, û li ser wî yekê hati ronişdî, ko ji rûê wî ard û azümanan revîan û ji wan ra cî nehati dîtin. 12 Û mirîan mi dî piçûk û mezinan, ko li ber taxtê sekinîbûn, û kitêban vebûn û başqa kitêbkî vebû, yanî, kitêbê hayatê, û weka li kitêban da hati nivîsandin mirîan hükml bûn li gora amelê xo. 13 Bahr ji nav xo mirîan da, û mirin û cehennem li nav wan da bûn mirîan dani; û her kes li gora amelê xo

⁴²⁶ Di metnê de sv.

hükm bû. ¹⁴ Û mirin û cehennem li göla agirê hatin avêtin, vîa e îkîncî mirin. ¹⁵ Û her kî ko li kitêbê hayatê da néhati dîtin nivîsandin, li göla agirê hati avêtin.

SER 21

¹ Û mi dî azümanê û ardê nû, çima ko azümanê awulîn û ardê awulîn bihurîn û hênî bahr tunnebû. ² Û bajêrê azîz Yerusalmê nû mi dî ko ji azümanan ji Xodê dihatibû xwarî, ko weka ji boy mêrê xo hati xemilandin bûkkî, hati hazir bûn. ³ Û mi ji azümanê awazkî mezin bihîst, ko digot: Va ha çadîrê Xodê li nav merûvan û aw bi wan ra dê sakîn bibe; û wan qawmê wî dê bibin û **[621]** Xodê bi wan dê bibe weka Xodê wan. ⁴ Û aw ji çahvê wan hemî hêstran dê paqij bike, û hênî mirin dê nebe, né şîn, né feryad, û ne hêşan ji wî pê ve nebe, çiam ko tiştê awulînan bihurîn. ⁵ Û aw ko li ser taxtê ronîşdibû go: Va ha hemî tiştan nû dîkin, û mi ra go: Binivîs, zîra xaberê vanan doxrî û emîn in. ⁶ Çem jî go ji mi ra: Bû, Ez im Alfa û Omexa, îbtîda û nîhayet, ez ji tî ra belaş dê bidim ji kanîê avê hayatê. ⁷ Wa ko yengmîş dike, tiştê hana dê mîras bigire, û ez Xodê wî dê bibim, û aw ewladê min dê bibe. ⁸ Lakîna para tîrsokan û îmansizan û murdaran û qatûlan, û zînakâran û sîhîrbazan û putperestan, û ê hemî derewîan li göla bi agir û kîbrît hati şewutandinê bibe; ko vîa îkîncî mirin e.

⁹ Û aw paşîn bû bi haft belayê hati tîjî bûn haft kâsikê grtox ji aft melean yekê hat ji mi ra û bi mi ra xaber da û go: Were ji ta ra nîşan bidim bûkê, jina Berxê. ¹⁰ Û mi li rûh da li çîakî bilind û mezin bir, û ji mi ra aw bajêrê Yerusalmê azîz nîşan da; ko ji alîê Xodê ji azümanan dihatibû xwarî. ¹¹ Û li wî da celalê Xodê hebû, û rohnîê wî pîr qiyetlî weka kevîrkî bû; li şekla bîlorê weka yemîş kevîrê bû. ¹² Û hîsarê wî bilind û mezin bû, û dwanzdah derîê wî hebû, û li ser derîê⁴²⁷ wî dwanzdah melek hebû; û li ser derîan nawan hatibûn nivîsandin, yanî navê dwanzdah zürîyetê kurê Îsrayelê. ¹³ Û ji rohelatê sê derî, û ji alîê şemalê sê derî, û ji alîê qible sê derî û ji alîê roavayê sê derîê wî hebû. ¹⁴ Û ji hîsarê bajêr- **[622]** rê ra dwanzdah hîmê wî hebû, û li ser wan dwanzdah navê dwanzdah resûlê Berxê nivîsandî bû. ¹⁵ Û aw ko ji mi ra xaber didabû li dest wî da qamîşkî zêrîn hebû; ko bi wî bajêr, û derîê wî û hîsarê wî bipîve. ¹⁶ Û bajêr çar köşe bû, û dirêjîtiê wî qasa firatîê wî bû, û bajêr bi wî qamîşê dwanzdah hazar asbarez pîvand; dirêjîtiê wî û berê wî û bilindîê wî yek bû. ¹⁷ Û hîsarê wî sad û çil û çar gaz pîvand bi çapê însanan; ko aw çapê melekê e. ¹⁸ Û

⁴²⁷ Di metnê de *derî*.

yapuê hîsarê yeşîm bû; û bajêr ji pak zêr bû, mîna bîlorê pak. ¹⁹ Û hîmê hîsarê bajêr bi hemî dürlü kevîrê qiyetlî hatibû xemilandin, hîmê awulîn yeşîm bû, û îkîncî yaqûdê mawî, üçîncî balxamî, dördîncî zümrüt bû. ²⁰ Beşîncî aqîq, altîncî yaqûdê qizil, yedîncî kevîrê zêr, sekîzîncî şebçîraş, doquzüncî topaz, onuncî krîsobrasos, on bîrîncî yaqûd, on îkîncî ametovs bû. ²¹ Û dwanzdah derîan dwanzdah încuyan bûn, her derî ji sax yek încuyê bû; û meydanê bajêrê beriqî weka bîlor ji xalîs zêr bû. ²² Û li nav wî da mi dacar nedî, zîra ji her tiştê ra qadîr Rabb Allah û Berxê dacarê wî ne. ²³ Û bajêr mühtacê ro, ya ê hîv nin e, ko jê ra rohnî bidin, zîra celalê Xodê jê ra rohnî dide, û qandîlê wî Berx e. ²⁴ Û hati xelas bû[n] tayîfan bi rohnîê wî dê biçun, û padîşahê ardê şan û îzzetê xo dê li nav wî bînin. ²⁵ Û derîê wî li ro dê neyin qufulandin, zîra li wê dê nebe. ²⁶ Û şan û îzzetê tayîfan li nav wî dê bînin. ²⁷ Û li nav wî da, qat yekê murdar, ya mekrûh ya derew kirox dê nekeve; lê [623] tenê wan ko li kitêbê hayatê Berxê hatin nivîsandin.

SER 22

¹ Û ji mi ra çemkî avê nîşan da, beriqî weka bîlor, ko radîbobû ji taxtê Xodê û Berxê. ² Û li meydanê aw bajêr û li aw alî û wî alîê çemê darê hayatê hebû, ko dwanzdah türlü meywe dianîbû, û li her meh da meyweê xo dida, û pelê aw darê ji tayîfan ra şîfa didabû. ³ Û hênî qat lanetkî dê nebe, û li wî da dê bibe taxtê Xodê û Berxê, û qulê wî jê ra dê îbadet bikin. ⁴ Û rûê wî dê bibînin, û navê wî dê li ser henîê wan bibe. ⁵ Û li wê hênî şev dêbe, û hênî mühtacê qandîlê û ro nin in; zîra Rabb Allah wan dê rohnî bike, û abed el ebed dê padîşahîti bikin. ⁶ Û ji mi ra go: Xaberê hana emîn û doxrî e; Rabb Allahê azîz peyemberan melekê xo şîyand ko ji qulê xo ra nîşan bide çi ko zû ve lazim e bûn. ⁷ Va ha ez zû ve tîm, xozî ji wî ra ko xaberê peyemberîtiê kitêbê han dipê.

⁸ Û tiştê hana dîtox û bihîstox ez Hanna me, û gava mi dî û bihîst ketim ko secde bikim li ber lingê aw melekê, ko tiştê han ji mi ra nîşan dida. ⁹ Û go ji mi ra, Saqin tu nekî, ez ê ta hem ê brêyê ta peyemberan, û quldaşê ê xaberê kitêbê han girtoşan im, ji Xodê ra secde bike. ¹⁰ Û go ji mi ra xaberê peyemberîtiê kitêbê han mühr meke, çima ko zeman nêz e. ¹¹ Nahaqîti krox henî bra nahaqîti bike; û aw ko murdar e henî murdar bibe; û aw ko sadîq e, henî sadîq bibe, û [624] aw ko azîz e henî azîz bibe. ¹² Va ha ez zû tîm û ücretê min bi mi ra e, ji her yekê ra li gora amelê wî bedel kirinê. ¹³ Ez im Alfa û Omexa, awulîn û paşîn, îbtîda û nihayetê. ¹⁴ Xozî ji

wan ɾa ko tenbîhê wî îcra dîkin; ko hûkûmetê wan bibe li ser darê hayatê ji derîan hindur li bajêr bişevîn. ¹⁵ Lakîn derve dê bimînin kelban, û sîhîrbazan û zînakâran, û qatûlan, û putperestan, û aw hemîan ko derew dihebîne û dike.

¹⁶ Lê Îsa mi melekê xo şîyand, tiştê hana ji we ɾa şehadet bike ji boy kîlîsan, ez qurmê Dawûd û cînsê wî me, û beriqî istêrê sibê me. ¹⁷ Ê Rûh û bûk dibên: Were, û aw ko dibihê bra bêje: Were, û aw ko kî e bra bê; û aw ko dixwaze ava hayatê belaş bistîne.

¹⁸ Ez şehadet dikim ji aw hemîan ɾa ko xaberê peyşemberîtî kitêbê han dibihê; erki yekê li ser vanan tiştê zêde dike; Xodê jî li ser wî dê zêde bike aw belayan ko li kitêbê han da nivîsandî e. ¹⁹ Ê erki yekê ji xaberê kitêbê peyşemberîtî tiştê kêr dike; Xodê jî hîsseyê wî dê kêr bike ji darê hayatê û ji bajêrê azîzê, ko li kitêbê han nivîsandin in. ²⁰ Tiştê hana şehadet kroş dibê: ²¹ Belî, zû tîm, Amîn; Were ya! Rabb Îsa. ²¹ Înayetê Rabbê me Îsa el Mesîhê bi hemî azîzan bibe.

Amîn.

TEMAM

XELADÎ

[A]

Û	R	X	XELAD	RAST
	4	29	ulatê	welatê
	8	4	ceřibaedinê	ceřibandinê
	9	17	gerî	gemî
	9	20	uxda	wî da
1	1	26	...	xismê ta, ta ji qadî ra teslîm bike;
3	1	1	wa ra	we ra
2	2	22	wa ra	we ra
3	2	32	gevnd	gund
0	4	23	wanja	wan ra
1	4	1	38	39
2	4	32	lo	li
2	8	27	ke	ko
4	8	8	rebû	rabû
5	8	18	..	28
07	1	32	têş	pêş
1	1	32	çob	çok

07			
1 09	15	36	35
1 11	2	bişt	tişt
1 12	2	dizin	dizan
1 14	32	24	23
1 15	32	cawe	çawa?
1 16	2	32	37
”	5	39	38
”	7	30	39
1 37 ⁴²⁸	23	hajdeh	hajtê
1 46 ⁴²⁹	14	16	19
1 51	17	..	û meruvê neqanc ji dilê xo neqanc tiştê kotî derîne

⁴²⁸ Di metnê de 135.

⁴²⁹ Di metnê de xeletiyek wiha nehat dîtin.

[P]

RÛ	XET	XELAD	RAST
153	20	..	çawan kor dibîne, topal di gere, üyuzan paqij dibin, keṛ dibihîse
163 ⁴³⁰	21	..	42
164	33	ṭamarînim	ṭamarînin
165	7	heftê û didoyan	heftê
166	13	”	”
181	17	hat	hata
183	26	xoda	xo ṛa
189	23	...	36
191	7	...	19
”	9	25	20
200	18	hinṛuṛa	hinduṛa
211	1	sadûşêst	şêst
217	2	Nasratdê	Nasratê
225	27	Weabb	Rabb
227	4	ḵurra	Ḷur ṛa
”	15	We	Û
235	24	Weuîa	Vîa
252	33	di pê	napê
253	7	Xaber	xaber
265	26	qapvcî	qapucî
270	14	tişjê	tiştê
292	9	sezê	sözê
”	23	ej	ez
298	17	bişt	tiştê

⁴³⁰ Di metnê de xeletiyek wiha nehat dîtin.

301	12	li dê da	li rê da
”	26	şaḡ	lal
302	7	serjest	serbest
305	7	Ketros	Petros
306	11	Ṭutsê	Qudsê
324	28	zûze	zû ve
325	8	hate	hata
”	10	heta	hata
”	22	Xodêan	xodêan
371	7	...	wan ṛa dibêm ko nomosê zanin ko

[K]

RÛ	XET	XELAD	RAST
397 ⁴³¹	32	paşah	padîşah
408	11	Jalqê	Xalqê
410	26	yaqilmîş	yaqîşmîş
412	17	dêdeng	bêdeng
427	28	ki	ji
428	1	babin	bibin
”	19	Der	Ber
430	5	Xodêê	xodêê
438	17	ebîda	ebeda
441	25	pasan	pasna
442	17	ceran	caran
445	24	qûrve	dûr ve
446	2	dikin	bikin
450	23	didim	dikim
450	29 ⁴³²	ah	aw
464	32	80	30
467	17	xoçnûdîtî	xoşnûdîtî
471	9	bibêm	bibim
499	11	xodêra	Xodê ra
545	18	12	18
567 ⁴³³	17	an	aw
572	14	bîyan	beyan
594	32	mûra	mühra
599 ⁴³⁴	24	kuîan	kulîan
601	30	biçûk	piçûk

⁴³¹ Di metnê de 392.

⁴³² Di metnê de 97.

⁴³³ Di metnê de xeletiyek wiha nehat dîtin.

⁴³⁴ Di metnê de xeletiyek wiha nehat dîtin.

ENCAM

Berhemên kurdiya kurmancî yê bi alfabeya ermenîkî hêmanên giring ên ji dîroka nivîskî ya vî zimanî ne. Lê ji ber ku bi alfabeyeke kêmnas hatine çapkirin bandora wan sînordar maye û li ser wan, xebatên akademîk an derveyî akademiye hebin jî zêde nehatine zanîn.

Xusûsiyeteke van berheman ew e ku yekemîn nimûneyên çapkirî yê zimanê kurdî ne û xeyn ji pirtûkên îlahiyan tev bi pexşan hatine weşandin. Bi qasî ku hatiye tesbîtkirin pexşana zaravayê kurmancî bi wan dest pê kiriye û her ku çûye ji aliyê uslûb û vegotinê ve bi pêş ketiye. Eger berhema ewil a sala 1856ê û tercumeya Peymana Nû ya sala 1911ê bi hev re werin berawirdkirin, ev rastî bi hêsanî dê were famkirin.

Alfabe, pêdiviyeke sosyolînguîstîk a neteweyan e. Ji ber şert û mercên wê demê, ermeniyên kurdîaxiv ji bo cimeata xwe çî te'lîf bin çî werger, di wan de şaşitiyên rêzimanê hebin an tune bin, zêde bîn xwendin an hîç neyên xwendin, di encamê de metnên kurdî ava kirine û ji bo ku bi hêsanî bigihîjin armancên xwe alfabeya xwe ya neteweyî bi kar anîne. Ji bo adaptasyonê jî alfabeya ermenîkî li gor taybetmendiyên fonetîk ên zimanê kurdî guherandine. Bi kurtî, kêmjimareke xeyrî muslim ji qewet û pratîkbûna kurdî sûdmend bûye û bi vî zimanî baweriyên xwe û hestên xwe yê neteweyî anîne zimên.

Bi zimanê tirkî, bi alfabeya ermenîkî tradîsyoneke xurt çêbûye. Berî ku di Împaratoriya Osmanî de ev terz nivîs geş bibe, li Ukraynayê bi lehceyeke tirkî ya din, bi qipçakî, tradîsyona nivîskî bi alfabeya ermenîkî pêk hatiye. Bi vê alfabeyê gelek agahiyên biqîmet, wek bûyername (bûyerên dîrokî), tercumeyên pirtûkên pîroz, duaname, berhemên berhevkarîyê û yê din hatine qeydkirin. Îro jî xebatên zanistî li ser vê mîrata nivîskî dewam dike.

Di nav lehceyên tirkî de yê herî berbelav zimanê osmanî ye ku bi gelek alfabeyan hatiye nivîsîn. Alfabeya ermenîkî jî yeka ji wan e. Herçend bi qipçaqî arşîveke xurt hebe jî ev dewlemendî tu car nagihîje dewlemendiya mîrata nivîskî ya zimanê osmanî ku bi alfabeya ermenîkî hatiye çêkirin. Ev mîrat ewçend berfireh û rengîn e ku heta îro tenê perçeyek biçûk jê hatiye derxistin û mixabin ji ber pêşbiryaran ev cûre xebat hêdîkan pêşda diçe.

Ev kevneşopî bandor kiriye li ser kurdên Dewleta Osmanî jî û ji tecrubeya rastnivîsa tirkî bi tîpên ermenîkî îstîfade kirine û ji wê re wek nimûne girtine.

Gelo bandora pirtûkên kurdî bi alfabeya ermenîkî li ser cimeata ermenî çi bû? Destpêkirina karê wergera Încîlê, berfirehkirina van wergeran, temambûna wergera hemû beşan, çapkirina pirtûka dibistanê ji bo zarûyan, ji nû ve çapkirina wê, çêkirina stranên rûhanî (yerkaran) ji bo dêrê û ji nû ve çapbûna wê di sala 1938ê de li Sûriyeyê⁴³⁵ û destpêkirina wergereke nû ya Încîlê ku bi temamî ji wergera ewil cuda ye, tev nîşan didin ku bandora berhemên kurdî bi alfabeya ermenîkî bi tu awayî biçûk an bêqîmet nebû.

Di vê xebatê de danasîna van berhemên giranbiha hatiye kirin û bi taybet jî çend taybetmendiyên wergera tam a Încîlê bi navê “Peymanê No Ê Xoîyê Me Îsa El Mesîh” hatine hilsengandin. Di dawîya xebatê de hat dîtin ku di nivîsîna peyvan de ji devokên Serhedê sûd hatiye wergirtin. Ji ber ku ji zimanekî din hatiye tercumekirin û hewceyî bi termînolojiya dînî çêbûye tê de peyvên biyanî gelek in. Uslûb ewçend ne herikbar e. Carina îfade ne zelal in an jî biqisûr in û ji ber wan têgihiştin dijwar dibe. Ji aliyê peyvan ve gelek dewlemend e û ev yek tenê bi serê xwe dikare bibe mijara xebateke berfireh.

Di encamê de mirov dikare bibêje ku wergera Încîlê ya tam, metneke dîrokî ye û tê de çiqas kêmasî yan xeletî hebin jî di hindurê xwe de materyalên dewlemend ên zimanî jî vedişêre û bi xusûsiyeta xwe ya pêşengî ji bo pexşan û wergera kurdî dikare bibe mijara gelek xebatan.

⁴³⁵ X. Der Xazaryan, *Yerkêd Rûhanî Bi Zimanê Kurmancî*, Haleb, 1938. (Ev, pirtûka dawî ya bi alfabeya ermenîkî ye. Mixabin xeyn ji sê rûpelan di destê min de nusxeya wê ya çapkirî an dijîtal tune ye. Î. S.)

ÇAVKANÎ

— (1856), *Încîlê Xodêê Me Îsa El Mesîhê Nivisandin Bi Destê Madteos*, Çapxane: A. P. Çirçîl, Istambûl.

— (1857), *Încîl Xodêê Me Îsa El Mesîhê Nivisandin Bi Destê Madteos Markos Lukas û Hanna*, Çapxane: Kayol, Istambûl.

— (1868), *Tasakîrkê Kurmancî, Amerîgatsî Dedragî Ingerutyan, Nor York*.

— (1872), *Peymanê No Ê Xoîyê Me Îsa El Mesîh*, Çapxane: A. H. Boyacyan, Isdambol.

— (1891), *Încîla Rabbê Meî Hîsus Krîsdos Ko Madteos Nvîsî*, Çapxane: A. H. Boyacyan, Stambol.

— (1911) *‘Emelê Resûla*, Çapxane: A. H. Boyacyan, Stambol.

— (1911) *Încîla Rabbê Meî Hîsus Krîsdos Ko Hovhannes Nvîsî*, Çapxane: A. H. Boyacyan, Stambol.

— (1911) *Încîla Rabbê Meî Hîsus Krîsdos Ko Margos Nvîsî*, Çapxane: A. H. Boyacyan, Stambol.

— (1911) *Încîla Rabbê Meî Hîsus Krîsdos Ko Xûgas Nvîsî*, Çapxane: A. H. Boyacyan, Stambol.

— (1911), *Peymana Nû Mizgîniya Îsa Mesîh (Încil), Bî Kurdi (Devok A Kurmancî), Wergêr: Seidê Dewrêş, Resûlê Qereqoçani, Gute Botschaft Verlag, Dillenburg, Germany*.

— (2005), *Încîl Mizgînî, Kitab-ı Mukaddes Şirketi, İstanbul*.

— (2011) *Kitêba Pîroz, Derketin 19: 3-6, Wergêr: Said Alpaslan (Seidê Dewrêş), Resul Yıldırım (Resûlê Qereqoçanî), Komela Hêvî û Jiyanê, Biefeld, Germany*.

Açar, Zafer (2022), *Sosyolînguîstîk Hin Têgehên Serekî û Sehayên Xebatê Yên Vê Zanistê, Rêzegotarên Zimannasiya Kurdî, Destpêk û Têgehên Sereke, Peywend, Van*.

Ayaydın, Cebe - Günil, Özlem (2009) *19. Yüzyılda Osmanlı Toplumı Ve Basılı Türkçe Edebiyat: Etkileşimler, Değişimler, Çeşitlilik, Doktora Tezi, Türk Edebiyatı Bölümü Bilkent Üniversitesi, Ankara.*

del Castillo, Jesús Martínez (2013), *Semantics and Lexicology, Almería.*

Dîkranyan, Migirdîç (1860), *Ayppenaran Kürderen Yev Hayeren Alîfbecuz Kurmancî û Armenî, Gostantnubolîs.*

Dîkranyan, Migirdîç (1861), *Ayppenaran Kürderen Yev Hayeren Alîfbecuz Kurmancî û Armenî, Gostantnubolîs.*

Filson, Floyd V. (1948), *How Much of the New Testament Is Poetry?*, McCormick Theological Seminary, *Journal of Biblical Literature*, Vol. 67, No. 2, Jun.

Hinkel, Eli (?), *Descriptive versus Prescriptive Grammar*, TESOL *Encyclopedia of English Language Teaching*, Seattle Pacific University.

Karjagdiu, Lirak - Mrasori, Naser (2021), *The Role of Literary Translation in the Development and Enrichment of National Literature*, *Journal of Language and Linguistic Studies*, 17(4), 2332-2345.

Nort, M. Eric (1938), *The Book of a Thousand Tongues*, The American Bible Society New York.

Rzepka, Marcin (2009), *Protestants among Kurds and some problems of translations of the Bible into Kurdish in the 19th century*, *Orentala Chrstana Cracovensa* 1.

Rzepka, Marcin (2013), *Konfesyjność przekładu Kulturowa historia kurdyjskich tłumaczeń Biblii*, Uniwersytet Papieski Jana Pawła II w Krakowie Wydawnictwo Naukowe, Kraków.

Rzepka, Martin (2017), *Translation, Power and Domination: The Postcolonial Explorations of the Bible in the Kurdish Context*, "Palgrave Studies in Cultural Heritage and Conflict, Rediscovering Kurdistan's Cultures and Identities, The Call of the Cricket", Gewerbestrasse, Switzerland.

Sakayan, Dora (2021), *Western Armenian For the English-speaking World A Contrastive Approach*, Yerevan State University.

Sayım, İlyas (2020), *Hasköy Kurmancî Ağzının Bir Kısım Özellikleri*, Muş, *Tarih, Toplum, Siyaset ve Hafıza*, Pınar Yayınları, İstanbul.

Serfiraz, Mesûd (2015), *Kurd, Kitêb, Çapxane Weşangeriya Kitêbên Kurdî di Dewra Osmaniyan de (1844-1923)*, Peywend, Stenbol.

Seyari, Ahmet - Aktaş, Murat (2023), *Pêşgira Dariştinê ya ‘Ve-’ yê û Fonksiyonên Wê yên Morfosemantik di Berhemên Klasîk ên Kurmancîya Jorîn da*, *Kurdi-name*, Jimar: 9, Mijdar.

Stepanyan, Hasmik (2018), *Hayeri Bîtîsum Yev Hayadarr Krderen Dzerragir u Dpagir Grakanutyuni*, *The Countries and Peoples of the Near And Middle East*.

Thackston, W. M. (?) -*Kurmanji Kurdish- A Reference Grammar with Selected Readings*.

Thomas, Kenneth J. (?), *BIBLE viii. Translations into other Modern Iranian Languages*, *The Encyclopaedia Iranica*.

Ûazaryan, Û. Der (1938), *Yerkêd Rûhanî Bi Zimanê Kurmancî*, Haleb.

Wendland, Ernst - Noss, Philip (2023), *Bible Translation*, Stellenbosch University.

Yule, George (2001), *The Study of Language*, Cambridge University Press, Cambridge.

PÊVEK

1. Ferhengok

a nwa: ha niha, tam di vê kêlikê de

abandin: avandin, çewisandin; civandin

ajx[al]: bnr. aşxal

anatema maranata (yûn. + ara. ἀνάθεμα מְרִנָּה): Rebbê me dê were û xezeba xwe lê bike!

anglemîş (tir. آڭلامش): fambar, watebar, têgihbar

anglemîş bûn (tir. + kur. آڭلامش): têgihiştin, fam kirin

aramîş bûn (tir. + kur. آرامش): lê gerîn

aramîş kirin (tir. + kur. آرامش): lê gerîn

arhamorhox (erm. աղբարհմորհոյ): pozbilind, kebar, ê ku biçûk dibîne

asdvadzapan (erm. աստվածաբան): teolog, îlahiyatnas

asnav: avjenî, sobayî

astû: stû

aşxal (ere. أشغال): şixul, xem, fikar

ayirmîş kirin (tir. + kur. آیرمیش): ji hev cuda kirin, ji hev veqetandin

ayrî (tir. آیری): cuda, cihê

azdirmîş kirin (tir. + kur. آزدیرمیش): ji rê derxistin

barê: qet nebe; ku wusa ye

başlamîş bûn (tir. + kur. باشلامش): dest pê bûn; dest pê kirin

başlamîş kirin (tir. + kur. باشلامش): dest pê kirin

başlandin (tir. + kur. باشلا): dest pê kirin

başlemîş bûn: bnr. başlamîş bûn

basmaxane (tir. + kur. باصمه): çapxane, metbee

başqa (tir. باشقا): ê/ya din

başqan (tir. + kur. باشقا): kesên din

başqasî (tir. باشقاسی): yekî/yekê din

başxa (tir. باشخا): bnr. başqa

batmîş bûn (tir. + kur. باتمش): binav bûn, xerq bûn

bawur: bawer

bayram (tir. بایرام): cejn, eyd

begenmîş bûn (tir. + kur. بگنمش): ecibandin

begenmîş kirin (tir. + kur. بگنمش): ecibandin

beklemîş (tir. بکلهمش): bendemayî, bendemanî, berbendî

beklemîş kirin (tir. + kur. بکلهمش): li bendê man, li hêvî man

bengzemîş bûn (tir. + kur.
 (بکزمش): şibîn, lê çûn
bira: bi rastî, bi heqîqet
bizdîan: vecîniqîn
brêy: bira
çalışmîş bûn (tir. + kur.
 (چالیشمش): xebitîn, şixulîn
cengleşmîş bûn (tir. + kur.
 (جنگleşمش): ceng kirin, şer kirin
cîyê kirin: cihê kirin; jê kirin
çok: çok
cöl: col, kerî
con: civîn, kom bûn
çûn (diçu/diço): çûn, çûyîn
çûndin: bnr. çûn
çürümîş bûn (tir. + kur.
 (چورومش): rizîn, petîn
dacar (erm. unuûup):
 perestgeh; Mabeda Hz. Suleyman
danişmîş bûn (tir. + kur.
 (دانیشمش): şêwirîn
dayanmîş kirin (tir. + kur.
 (دایانمش): tehemmul kirin, sebr kirin
dayinandin: teyinandin,
 teyisandin, badene kirin
deng û dûn: deng û beng, deng
 û hes, seda
dengser: tengezar, hişk
derawî: bnr. derewî
derewî: derewîn; derew,
 xapandin, hîle
dijmîn kirin: çêr kirin, dijûn
 dan

dil pîrs kirin: tesellî kirin
dîleg kirin (tir. + kur. ديلک):
 xwestin, arzû kirin
düman (tir. duman): duxan,
 dûkêl, dû
dûn: bnr. deng û dûn
düşîmîş bûn: bnr. düşünmîş bûn
düşîmîş kirin: bnr. düşünmîş
 bûn
duşumîş bûn: bnr. düşünmîş
 bûn
düşümîş bûn: bnr. düşünmîş
 bûn
düşümîş kirin: bnr. düşünmîş
 bûn
düşünmîş bûn (tir. + kur.
 (دوشونمش): fikirîn; niyet kirin; pêşnuma
 kirin, sêwirandin
duwa (ere. دعاء): dua
dzîranî (erm. ծիրանի): qumaşa
 binefşî
 erki: eger ku; ku
falqa (ere. فَلَقَة): felqe, filq, perçe
faqitin: feqitîn, qelişîn
faraz (ere. فرضا): wisa hesab
 bikin, sergotinê
fehmsuz (ere. + tir. فهمسوز):
 bêfam, bêdrak
gebermîş kirin (tir. + kur.
 (گبرمش): geber kirin, sekitandin
geçimîş bûn: bnr. geçinmîş bûn
geçimîş kirin (tir. + kur.
 (گچینمش): tevgerîn, muamele kirin

geçimîş kirin: bnr. geçürmîş
kirin

geçimîş bûn (tir. + kur.
(گچینمیش): jiyîn

geçimîş (گچمش): bihurî, çûyî

geçurmîş kirin (tir. + kur.
(گچورمش): derbas kirin, bihurandin

glok: gilok, kûrpîv, îskandîl,
pîvana kûrahiya deryayê

gövde (tir. گوگده): beden, laş

gowda: bnr. gövde

Goḡovnîa (erm. Կոյնովնիա):
kolonî

gügenmîş bûn: bnr. güvenmîş
bûn

güleş (tir. گورش): gulaş

güleşmîş bûn (tir. + kur.
(گورشمش): gulaş kirin, gulaş girtin

güvemîş bûn: bnr. güvenmîş
bûn

güvenmîş bûn (tir. + kur.
(گوگنمش): îtimad kirin, pê ewle bûn

halabî (ere. حليبي): helebî,
pîvaneke kevn a dirêjahiyê

hama (ere. أما): lê, lê belê, feqet

hamp (erm. hawûp < hunûp):
serok, reîs

haps (ere. حبس): hebs, heps,
zindan

harî: herî, çamûr

haridîn (ere. حرد): heridîn,
xeyidîn

hasakî: bnr. saykî

hasas (ere. حساس): hesas,
nobedar

hem daxî (far. + tir. هم دخی):
herwiha

hênî: hêj, êdî

hêş: êş

heşar: hişyar, şiyar

hîvketox: fêdar, biser‘e, atî,
biepîlepsî

hökm kirin (ere. + kur. حکم):
hukum kirin, darizandin, mehkeme
kirin

hûs bûn: hiş bûn, bêdeng man

îlla: bi taybet, xusûsî

încîlçî (ere. + tir. انجيل):
Încîlnivîs

istirîyê mişkan: strîmişk

kanon (yûn. κανών): qanûn,
şerîat (Tewrat)

katîb (ere. كاتب): mustensîxê
Tewratê

kâtîb: bnr. katîb

keşer bûn: veşirîn, xwe veşartin

kî: ku

kîbîrlemîş bûn: bnr. kîbîrlenmîş
bûn

kîbîrlenmîş bûn (tir. + ere. +
kur. کبرلنمش): qure bûn, xwe mezin
kirin

kînga: kengê, çi dema ku

kotî: bnr. kötî

kroş (?): babelîsk, firtone


leş: term, cesed
lîs: hêlîn
maleb: melhêb, melêv
mamon (ara. מָמוֹן): pere, mal û milkê dinyayê
mêras (ere. میراث): mîrat, pêmayî
meresxor (ere. + kur. میراث): mêrasxwer
mihana: bihane, hincet
misas: mesas, darmisas, zext, kaleg
misewî (ere. مسوی): misêwa, tim, daîm
mişk: bnr. istirîyê mişkan
mûbar: nûbar, nûber, xêve
nar (ere. نار): agir
nebû kirin: bnr. nebûyî kirin
nebûyî kirin: îxbar kirin;
newehî kirin, bêdadî kirin; îftîra kirin
nihiştin: nihêrîn, ninêrtin
nimêc: nimêj, dua, îbadet
no: nû
nomos (yûn. νόμος): şerîat, huqûq, fîqh (Tewrat)
nomosî (yûn. + kur. νόμος): huqûqnas, me'limê Tewratê
nua: niha, vê gavê
nwa: bnr. nua
öd (tir. اود): zirav, ziravik, zerdav
oxul (tir. اوغول): kur, lawik

pan (bipê): li bendê man, li hêviyê bûn; parastin, hifz kirin
pekenay (erm. փեղեկայ): sipend, giyayê sedefê
pêtî: saxlemî, xurtî, qewîtî, hêzdarî
pêtir: zêdetir
prud (erm. քրմ): cer, dîzik
qalawuz (tir. قیلانوز): rêber
qarîb (ere. غریب): xerîb, kesê li xurbetê
qarşî (tir. قارشى): li hember, muqabil
qarwaş (tir. قارواش): carîye; xizmetkara jin
qasarcî (ere. + tir. قصار): cilşo, kincşo
qatî (ere. قاطع): ban, serê banê
qîrî: qîrîn
qul (tir. قول): xizmetkâr, xulam; evd
rahmsuz (ere. + tir. رحمسوز): bêrehm, bêmerhemet
şagird: telebe, xwendevan; hewarî
sahandin (ere. + kur. صح): sehandin, pelandin, destê xwe lê dan
sahîtî kirin (ere. + kur. صحیح): kontrol kirin, teftîş kirin
şaxşun (tir. شاشخون): aqilçûyî, hişbelav
sawnd (ere. صوت): sewt, deng

şaz: şad, şa, dilşa
semed: sedem
ser: beş
sîrka (tir. sirke): sêk, sihik
şixul (ere. شغل): kar, ‘emel;
 keramet, mûcize
şixulîn (ere. + kur. شغل): kar
 kirin, kirin
soxun (erm. unqnîlû): xışok,
 kişok, xijende
sû hatin: hêrs bûn, qehirîn
şûrik: hewcar, kotan
suxra: suxre, angarya, bêgar
tab (ere. طبع): teb‘, çap
tahfil (ere. تحفيل): waftîz
tahindin: tehn dan, dehf dan
tahzî: tazî
ţaynandin: teynandin,
 teyisandin; mesh kirin, li ser lebatekê
 xistin
tercube (ere. تجربة): tecrube,
 ciribandin, ezmûn
ücret (ere. أجرة): destmiz; xelat,
 padaş
uydurmiş bûn (tir. + kur.
 اویدیرمش): li hev hatin, hevdû girtin
uydurmiş kirin (tir. + kur.
 اویدیرمش): li hev anîn, bi hev ve
 şidandin

uyuz (tir. اویوز): bicuzam, bigulî
üyuz: bnr. uyuz
vorç (erm. զոյր): kuna rovîyan
voxçagez (erm. զոյրապետ):
 qurbana şewitandinê
warîyet (osm. واریت): saman,
 dewlemendî, zengînî
waz (ere. وعظ): we’z, pend, şîret
xalf (ere. خلف): ji paş ve; ji nişkê
 ve
xapxapok: pir xapînok
xarar (ere. غرارة): xerar, telîs
xaxam (îbr. חַחַם): mamosteyê
 Tewratê, xoceyê cihûyan
xayîş (ere. غشي): xeşy, halê
 transê, cezbe, wecd
xoca: xoce, mamoste
xodî: reb, îlah
xoî: bnr. xodî
xonidan: xanedan, desthilatdar
yapu (tir. یاپو): avahî
yaramaz (tir. یاراماز): xerab,
 nebaş, neçê, xebîs
yemiş (tir. بيمش): fêkî, mêwe
yerets (erm. երեց): rûspî,
 êxtiyar
zid (ere. ضد): dij, dijraber
zîwan: giyayekî ziyandar

2. Belge û Materyalên Vîzuel



Wêne 1: Wergera ewil ya çapkirî ya “Silav Li Meryem” ji aliyê keşîşê îtalyayî Maurizio Garzoni (1734-1804) ji latînî ber bi kurdî ve. Bi kurdiya îroyîn tîpguhêziya vê duayê wiha ye:

Selam lekî (ji te re), ya Meryem; tejî ne‘meta Xodê. El-Reb gel te; mubarek tu beyn (navbera) zenan, û mubarek mêwa zikê te Seydna (seyîdê me) Îsa. Qedûs e (pîroz e) Meryem dayika Xodê, newesiya (xeber/dua) bike bû me gunakar; nuk (niha) û li se‘t (saet) meria (mirina) me. Amin.

B Abe ma ke derûnit ser asmân : m̄kaddas bit
nave ta .

Bdêi a ma baehîre ta .

Debî amrâda ta ser asmân , u ser ard .

Au,ro u ehr rvz tera nan bdêi a ma .

U âfu beka ghuna ma , sibi am âfu bekem ehr kî .


cekirîa a ma zerer , ia zahhmet .

U na avefia ma naftegerib .

Amma Kalasbeka ma ez K̄arâbia . Amîn .

Wêne 2: Wergera ewil ya çapkirî ya “Duayê Reb” ji aliyê keşîşê îtalyayî Maurizio Garzoni ji latînî ber bi kurdî ve. Bi kurdiya îroyîn tîpguhêziya vê duayê wiha ye:

Babê me ke derûnit ser asman: muqeddes bit navê ta. Bidey a me beheştê te. Debit emreda (mirada) te ser asman, û ser erd. Ewro û ehr (her) rûz têra nan bidey a me. Ê ‘efû bike guna me, sibî em ‘efû bikim [bikin] ehr (her) kî çekiriye a me zerer, ya zehmet. Ê neavêje me naf tecerib. Emma xelas bike me ez xerabiya (xerabiyên). Amîn.



Wêne 3: Wergera Garzonî bi guhartinên biçûk li dêra ‘Pater Noster’ê li ser dîwarekê ku li bajarê Qudsê ye. Metn bi tîpên latînî û li gor rastnivîsa zimanê îtalyanî hatiye nivîsîn. Dîjîtalîzeya wê wiha ye:

BABE-MA, ki derûnit ser ásman, mokaddas bit nave ta; b'déi a ma baehscte ta. Debit amráda ta ser asman, u ser ard. Auro, u ehr ruz, tera nan b'dei a ma. U āfúbeka ghuna ma, sibi am āfubekem ehr ki cekiria a ma zerer ia zahhmét. U na avèsia ma naf tegerib; amma kalasbeka ma ez karabía. Amin.

Bavê me

Bavê me yê li ezmanan,
Bila navê te pîroz be.
Bila padîşahiya te bê.
Daxwaza te wek li ezmanan,
Li ser rûyê erdê jî bi cih bê.
Nanê me yê rojane roj bi roj bide me.
Û li deynên me bibihûre,
Wek ku em li deyndarên xwe bihûrtine.
Û me nebe ceribandinê,
Lê me ji yê xerab xilas bike.
[Çimkî padîşahî, pêkarîn û rûmet
her û her ên te ne!]

Amîn.

Wêne 4: Yek ji tercumeyên nûjen ên ‘Duayê Reb’ an ‘Bavê Me’ ku ji aliyê ‘United Bible Societies’ ve hatiye kirin.⁴³⁶

⁴³⁶ https://ministrants.com/lords-prayer_kurdish.php

Printing done in 1856.

<u>Armenian</u>	<u>Size</u>	<u>Pages</u>	<u>No. Copies</u>	<u>Total Pages</u>
The Andapa (Messenger) Once in two weeks	Folia.	108	1000	108,000
Ar. Great. Arm. New Testament Complete	8vo.	172	1500	258,000
Do with Ancient Armenian	"	348	1500	522,000
The book of Psalms	16mo.	325	3000	975,000
Daily Meditations 2 ^d ed	"	340	3000	1,020,000
Mod. Armenian Bible Continued	12mo.	720	3000	2,160,000
Church Music	8vo.	24	1000	24,000
Rule of Faith 2 ^d ed. Continued	12mo.	324	3000	972,000
Jones Catechism 3 ^d ed	"	384	3000	1,152,000
Loddidges Riv & Rogers 2 ^d ed	"	450	3000	1,350,000
Light of the Soul	"	36	3000	108,000
Joy in Heaven	"	28	3000	84,000
Infidelity	"	16	3000	48,000
Guide to Salvation	16mo.	16	3000	48,000
First Step	24ts.	8	3000	24,000
		<u>3,244.</u>	<u>38,000.</u>	<u>8,758,000.</u>
<u>Armeno Turkish</u>				
New Testament with references Completed	Imp. 8vo.	176	4000	704,000
Old " " Continued	"	24	5000	120,000
New " without " Completed	12mo.	426	4000	1,704,000
Rites & Ceremonies 2 ^d ed Continued	"	72	3000	216,000
Hymn Book	16mo.	48	3000	144,000
Tract or Holiness	12mo.	12	3000	36,000
German on the Mount	24ts.	23	3000	69,000
		<u>781.</u>	<u>25,000.</u>	<u>2,993,000.</u>
<u>Armeno Kurdish</u>				
Gospel of Matthew	12mo.	60	1000	60,000
Tract (Lords Prayer & a Psalm)	"	8	1000	8000
		<u>68.</u>	<u>2000.</u>	<u>68,000.</u>
<u>Greek</u>				
Church Music Continued	8vo.	8	500	4,000

Wêne 5: Belgeya ku mîsyonerên amerîkayî yên protestan hazir kirine. Di vê listeyê de nav û tîraja wergeran hatine rêzêkirin. Ji bo kurdî ev qeyd tê dîtin:

Armeno Kurdish (Kurdî bi alfabeya ermenîkî)

Gospel of Matthew (Încîla Madteosê), 60 pages (60 rûpel), 1000 copies (1000 nusxe).

Lords Prayer and a Psalm (Duayê Reb û zebûrekê), 8 pages (8 rûpel), 1000 copies (1000 nusxe).



Wêne 6: Heyeta mîsyoneran ku bi weşandin û çalakîyên mîsyoneriyê re têkîldar bûn. Di nav wan de Isaac Grout Bliss (di cêrga jorîn de ji milê çepê şexsê duyem) ji weşana wergera kurdî berpirsiyar bû. Fotograf di sala 1859ê de li Stembolê ji aliyê wênegirên navdar Abdullah Frères (Birayên Evdile) ve hatiye kişandin.⁴³⁷

⁴³⁷ <https://archives.saltresearch.org/handle/123456789/203944>



Wêne 7: Edîtorê wergerên pêşîn ên Încîlê Isaac Grout Bliss (1822–1889) û hevjîna wî Eunice Bliss Day (1822–1916).⁴³⁸

⁴³⁸ <https://archives.saltresearch.org/handle/123456789/46831>

		LOCATION
JOSEPH GREENE	-	Served in BROUSA (BURSA)
CHARLES MORSE	-	ADRIANOPLE
WILLIAM MERRIAM	-	PHILLIPPOPOLIS
HERMAN BARNUM	-	HARPOOT
TILLMAN TROWBRIDGE	-	ERZURUM, MARAŞ AND AINTAB
ISAAC PETTIBONE	-	CONSTANTINOPLE, TOKAT, ERZURUM
JASPER BALL	-	CAESAREA, YOZGAT
JULIUS LEONARD	-	MERZIFON
GEORGE WASHBURN	-	CONSTANTINOPLE Mission Treasurer Then to Robert College
JOSIAH PEABODY	-	ERZURUM Organized Evangelical Church there
CROSBY WHEELER	-	HARPOOT Euphrates College - 1st President
SANFORD RICHARDSON	-	MERZIFON

Wêne 8: Navên çend mîsyoneran û bajarên ku li wir xebitîne. Li ser belgê bi tirkî “Amerikan Bord Heyeti” hatiye nivîsîn. Mîsyonerên jorîn girêdayî “American Board Foundation” bûn û di nav sînorên Dewleta Osmanî de pir çalak bûn. Di eyaleta Kurdistanê de jî pir xebitîn û ne tenê bi fealiyetên mîsyonerî, bi casûsî û propagandayên xwe jî li ser gelên ermenî û kurd pir bandor kirin. Ev bandor bi piranî neyênî bû.⁴³⁹

⁴³⁹ Erdal Açıkse, Amerikalıların Harput'taki Misyonerlik Faaliyetleri, Türk Tarih Kurumu, Ankara, 2003, r. 321.

152. KOI.

(On the Nerbadá,
East India.)

Nanna tédì, ná tappénagga anji, ó yaiyá, nanna
Dévuni munne ní munne pápam tungi minnána.—
(Luke xv. 18.)

153. KONKANI.

(Konkan,
Bombay Pres.)

ಇತ್ಯಾ ವ್ಹುಳ್ಯಾರಿ, ದೆವಾಲೆ ಪುತಾಚೆರಿ ಕೋಣು ಎಶ್ವಾಸು
ದವರ್ತಾ ಕೇ ತೋ ನಾಶ ಜಾಯಿನಾತಿಲೆ ನಿತ್ಯಜೀವು ಪಾವಂಕಾ
ಮೋಣು, ದೇವಾನೆ ಆಪ್ಣಾಲೊ ಯೆಕ್‌ಲೋಚಿ ಉಬ್‌ಜಲೆಲೆ
ಪುತಾಕ ದಿವಾಂಜೆ ತಿತ್ಲಿ ಪ್ರೀತಿ ಜಗತ್ಯಾಚೆರಿ ಕೆಲಿ.

154. KUMUKI.

(Daghestan.)

ای بتون قینالغان لار و آوز بیکلور

منی یانه کلنکر ومن سزکه طحلیق ابته من
Matt. xi. 28.

155. KURD.

(Kurdestan.)


Չըմա քո խօսեմ քուսան հոգանա տընէ, հա՛րա
քո եւէք զա Գուռէ խօ տա, Գը հէք քի քո ժէռա
խման պինը քուստա նէ պը, է՛ք ժը էպէտի հայաթա
մալիք պըպը :

156. KWĀGUTL.

(Vancouver's
Island.)

Gāk la gākun, nāwhūtl kulkyā glū qun-
dikil, kun yhūs-idā masa ūtl.—(Matt. xi. 28.)

Wêne 9: Ji ber xebatên sistematîk ên rêxistinên xaçhebînan lîteratureke gelek berfireh ya tercumeyên Pirtûka Pîroz çêbûye. Hin pirtûk wek antolojî hatine amadekirin ku perçeyên cuda yên Încîlan di nav xwe de diheband. Di pirtûkên bi vê cureyê de kurdî gelek caran bi alfabeya ermenîkî dihat çapkirin. Li jorê jî zimanê 155em wek “Kurd” hatiye destnîşankirin û erdnîgariya ku kurdî tê de tê qisekirin wek “Kurdestan” hatiye tarîfkirin. Tîpguhêziya metnê wiha ye: “Çima ko Xodê wusan huband dinê, hata ko yekza Kurê xo da, Ki her kî ko jê ra îma bîni wunda nebi, lê ji ebedî hayat ra malîk bibi.” (Yûhenna 3/16)



Wêne 10: Heman ayet ji antolojiyeke din. Di rastnivîsê de çend guhartinên biçûk hene. Metna transkrîbeyê wiha ye: “Çima ko Xodê wusan huband dinê, hata ko yekza Kurê xo da, Ki her kî ko jê ra îma bîne wunda nebe, lê ji ebedî hayat ra malîk bibe.” (Yûhenna 3/16)

(Kurdistan.)


[illegible]

Wêne 11: Werger ji antolojiyeke din ku di nav xwe de Lord's Prayer (Duayê Reb) dihewîne. Serenav wek “Kurdish” hatiye nivîsîn û dîsa erdnigariya axaftinê di nav kevaneyan de wek “Kurdistan” hatiye nîşandan. Ji ber ku alfabe bi ermenîkî ye di nav kevanekan de “Armenian” (ermenîkî) dinivîse. Metna transkrîbekirî wiha ye: *“Ya Bavê me kî li azîmanday, navê ta azîz biba; padîşahîtiyê ta bê; meramê ta bibi, çawan kî li azîman da, wusan jî li ser ardê. Nanê ma hemû royan îro ji ma ra bide. Û deynê ma ji ma ra baxş biki, çawan kî em jî baxş dikin ji deyndaranê xo ra. Û me li tercubeyê mebe, lê ji şerê xalas biki, çima kî ê ta ye padîşahîti û quwet û hamd ebedil ebed; amîn.”*




Wêne 12: Wergêrên Încîlan: Bedros Amîrxanyan, X. Der Xazaryan û Kavîne Aflakadyan. Bi destê wan tenê şeş beşên ewil ên Încîlan hatine wergerkirin.⁴⁴⁰


⁴⁴⁰ Mehmet Bayrak, Kürt Bâtıniliğinde Kutsal Metinler, Manzum Lirik ve Didaktik Eserler, Özge Yayınları, Ankara, 2016, r. 759.



Wêne 13: Pirtûka yekem (ku heta niha hatiye tespîtkirin) bi kurdiya kurmancî: ÎNCÎLÊ XODÊÊ ME ÎSA EL MESÎHÊ NIVISANDIN BI DESTÊ MADTEOS LI ISTAMBÛL DA, A. P. ÇIRÇÎL, 1856.



Wêne 14: Pirtûka Duyem (ku heta niha hatiye tespîtkirin) bi kurdiya kurmancî: ÎNCÎL XODÊÊ ME ÎSA EL MESÎHÊ NIVISANDIN BI DESTÊ MADTEOS MARQOS, LUQAS Û HANNA LI ISTANBULDA 1857.



Wêne 15: Wergera tam a Peymana Nû bi kurdiya kurmancî: PEYMANÊ NO Ê XOÎYÊ ME ÎSA EL MESÎH LI BASMAXANEÊ A. H. BOYACYAN TAB BÛA 1872 LI ISTAMBOL DA.

Ի Ն Ճ Ի Լ Ա

ԲԱՊԱԿԷ ՄՈՒ ՅԻՍՈՒՍ ՔՐԻՍՏՈՍ

Ք Օ

ՄԱՏԹԷՈՍ ՆՎԻՍԻ

معارف عمومیہ نظارت جلیلہ سنک ۲۷ ربیع الاول ۳۰۹
و ۱۹ تشرین اول ۳۰۷ تاریخی و ۶۹۳ نومرو
رخصتنامه سیله نشر اولمشدر


مصارفی آمریقان بیبل شرکتی طرفندن تسویه اولنه رق طبع اولمشدر

ԼԸ ՍԹԱՄՊՈԼՏԱ

ԼԸ ՊԱՍՄԱԽԱՆԷԷ Ա. Յ. ՊՕՅԱՃԵԱՆ ԹԱՊ ՊՈՒՂ

1891

Wêne 16: Wergera Încîla Madtêosê ku pirtûka ewil ji tercumeya nû ya Peymana Nû ye: ÎNCÎLA RABBÊ MEÎ HÎSUS KRÎSDOS KO MADTÊOS NVÎSÎ LI STAMBOL DA LI BASMAXANÊÊ A. H. BOYACYAN TAB BÛE 1891.



Wêne 17: Wergera Încîla Madtêosê ku pirtûka duyem ji tercumeya nû ya Peymana Nû ye: ÎNCÎLA RABBÊ MEÎ HÎSUS KRÎSDOS KO MARGOS NIVÎSÎ LI STAMBOL DA LI BASMAXANÊÊ A. H. BOYACYAN TAB BÛE 1911.

Ի Ն Ճ Ի Լ Ա

ԲԱՊՊԷ ՄՈՒ ՅԻՍՈՒՍ ՔՐԻՍՏՈՍ

Ք Օ

ՂՈՒԿԱՍ ՆՎԻՍԻ



ԼԸ ՍԹԱՄՊՈԼՏԱ

ԼԸ ՊԱՍՏԱԽԱՆԷԷ Ա. Յ. ՊՅՅԱՏԵԱՆ ԹԱՊ ՊՈՒՂ

—.—

1911

Wêne 18: Wergera Încîla Xugasê ku pirtûka sêyem ji tercumeya nû ya Peymana Nû ye: ÎNCÎLA RABBÊ MEÎ HÎSUS KRÎSDOS KO XUGAS NVÎSÎ LI STAMBOL DA LI BASMAXANÊÊ A. H. BOYACYAN TAB BÛE 1911.

Ի Ն Ճ Ի Լ Ա

ԲԱՊՊԷՆ ՄՈՒ ՅԻՍՈՒՍ ՔՐԻՍՏՈՍ

Ք Օ

ՅՈՎՀԱՆՆԷՍ ՆՎԻՍԻ



ԼԸ ՍԹԱՄՊՈԼՏԱ

ԼԸ ՊԱՍՄԱԽԱՆԷՆԷ Ա. Յ. ՊՕՅԱՃԵԱՆ ԹԱՊ ՊՈՒՂ

— . —

1911

Wêne 19: Wergera Încîla Hovhannêsê ku pirtûka çarem ji tercumeya nû ya Peymana Nû ye: ÎNCÎLA RABBÊ MEÎ HÎSUS KRÎSDOS KO HOVHANNÊS NVÎSÎ LI STAMBOL DA LI BASMAXANÊÊ A. H. BOYACYAN TAB BÛE 1911.

ԼՐ. ՊԱՐՄԱԽԱՆԵԷՆ Ա. Յ. ՊՅԱՃԵԱՆ ԹԱՊ ՊՈՒՂ

1911

474



Wêne 21: Pirtûka yekem bi kurdiya kurmancî ku ji bo zarûyan hatiye çapkirin. Danasîna wê bi ermenîkî û kurdî ye: AYPENARAN KÛRDEREN YEV HAYEREN ALÎFBÊCUZ KURMANCÎ Û ARMENÎ (...) 1860 GOSDANTNUBOLÎS Î XALATÎA, Î DBARANÎ HOVHANNU MÛHENDÎSYAN.

ԱՅԻԲԵՆԱՐԱՆ
ՔԻՒՐՏԵՐԷՆ ԵՒ ՀԱՅԵՐԷՆ
ԱԼԻՖԲԵՏԻՆՈՒ
ԳՈՒՐՄԱՆՆԻ ՈՒ ԱՐՄԷՆԻ

ՅՕՐԻՆԵԱԼ Ի ՊԵՏԱ ՄԱՆԿԱՆՑՆ ՔԻՒՐՏԻՍՏԱՆՑԻՈՑ
ՅԱՌԱՋՆՈՐԻՔ ՔԻՒՐՏԻՍՏԱՆՈՒ ԵՒ ԲԱԼՈՒՅՑ

Ի ՀԱՅՐԱՊԵՏՈՒԹԵԱՆ Ս. Ե. ԶՄԻՆՏՆԻ Տ. Տ. ՄԱՏԹԵՈՍԻ
 ՎԵՀԱՓԱՌ ԿԱԹՈՒԴՈՍԿՈՍԻ ԱՄԵՆԱՅՆ ՀԱՅՈՑ

Ի ՊԱՏՐԻԱՐԲՈՒԹԵԱՆ Ս. ԵՐՈՒՍԱԿԵՄԻ Տ. ՅՈՎՀԱՆՆՈՒ
 ՄՐԲԱԶԱՆ ԱՐԲԵՊԻՍԿՈՊՈՍԻ Ի ՏԵՐ ՀԱՅԳՈՒՑԵԼՈՑ

ԵՒ Ի ՊԱՏՐԻԱՐԲՈՒԹԵԱՆ ԿՈՍՏԱՆԴՆՈՒՊՈԼԻՍՈՑ Տ. ՍԱՐԳՍԻ
 ԱՄԵՆԱՊԱՏԻ ԱՐԲԵՊԻՍԿՈՊՈՍԻ
 (ԵՐԿՐՈՐԴ ՏՊԱԳՐՈՒԹԻՒՆ)



Արիք մանկանք բազմն Հայկոյ՝ ելէք յառօրսդ,
 Մըտէք յայս նոր խնամու թեան ցանկալի պարտէզ:


1861

ԿՈՍՏԱՆԴՆՈՒՊՈԼԻՍ

Ի ՂԱԼԱԹԻԱ, Ի ՏՊԱՐԱՆԻ ՅՈՎՀԱՆՆՈՒ ՄԻԻՀԵՆՏԻՍԵԱՆ

Wêne 22: Çapa duyem a heman pirtûkê. Li ser bergê bi ermenîkî jî (yergrort dbakrutyun) ev agahî hatiye dayîn ku pirtûk gihaştiye çapa xwe ya duyem: AYPENARAN KÛRDEREN YEV HAYEREN ALÎFBÊCUZ KURMANCÎ Û ARMENÎ (...) (YERGRORT DBAKRUTYUN) 1861 GOSDANTNUBOLÎS Î XALATÎA, Î DBARANÎ HOVHANNU MÛHENDÎSYAN.

Ermenice — Kurdish — Persian
ԴԵՍԵԳԻՐՔԻ ԳՈՒՐՄԵՆՁԻ




ՆՈՐ ԵՕՐԻ

Ի ՏԳԱՐԱՆԻ


ԱՄԵՐԻԿԱՅԻ ՏԵՏՐԱԿԻ ԸՆԿԵՐՈՒԹԵԱՆ

1868


Wêne 23: Pirtûka duyem ku ji bo zarokên ermenî yê kurdîaxiv hatiye çapkirin. Ev pirtûk ji pirtûken din bi vê taybetmendiya xwe cuda ye ku li derveyî welêt, li Amerîkayê çap bûye: **TASAKÎRKÊ KURMANCÎ NOR YORK Î DBARANÎ AMERÎKAYÎ DEDRAGÎ INGERUTYAN 1868.**



Wêne 24: Pirtûka duzimanî (ermenîkî û kurdiya kurmancî) ku tê de agahiyên dînî û exlaqî hene. Agahiyên kunyeyê bi ermenîkî ye: LABDER LUSADU HORÎNYAL Î DER MGRDÎÇ YEBÎSGOBOSE DÎKRANYAN HARAÇNORTE KÜRDÎSTANÎ Î LUYS INDZAYEYAÎ (...) GOSDANTNUBOLÎS Î DBARAN Î T. DÎVÎCYAN 1868.




Wêne 25: Pirtûka îlahiyan ji bo ku di dêran de bên strîn. Pêşgotin bi ermenîkî û îngilîzî ye lê hemû îlahî bi kurdî ne: YERKARANÊ BI KURMANCÎ BASMA BÛ LI BASMEXANA KOLLÊCÊ LI XARPÊTÊ 1880.




Wêne 26: Pirtûka îlahiyan a din. Li gor tespîtan ev yekemîn pirtûk e ku piştî damezirandina Kovara Trikiyeyê çap dibe. Lê ne li Tirkiyeyê, ji hêla ermeniyên Sûriyeyê ku piştî tehcîrê li wir hatibûn bicîhkirin li bajarê Helebê çap bûye: YERK Û ŞARAGANÊ BI KURMANCÎ BASMAXANA KOLÊC LI HALABÊ 1934.



Wêne 27: Pirtûka îlahiyan a sêyem. Li gor tespîtan ev pirtûka dawîn e ku bi alfabeya ermenîkî lê bi zimanê kurdiya kurmancî hatiye çapkirin. YERKÊD RÛHANÎ BI ZIMANÊ KURMANCÎ A. HADOR wan civand û ediland û da basmakirin X. DER XAZARYAN BI WASÎTA ŞÎRKETA Action Chretienné en Orient LI HALÊBÊ 1938.




Wêne 28: Pirtûka yekane ku li Sovyetistanê bi alfabeya ermenîkiya rojhilatê lê bi zaraveya kurmancî çap bûye. Dîroka çapê nehatiye diyarkirin lê qasî ku tê zanîn di sala 1921ê de li Eçmîatsînê, merkeza rûhanî ya Ermenistanê hatiye çapkirin. Agahiyên li ser bergê wiha ne: LAZO ŞEMS KÎTABÊ EWEL SEBA ZARUÊD KÎRMANCAN WE ÊZDÎAN.



Wêne 29: Wêneyê nivîskarê ermenî Hakop Krîkorî Xazaryan, bi ermenîkî Հակոբ Գրիգորի Վազարյան (1869-1926) ku di nav kurdan de wek Lazo an Le'zo diha nasîn. Wî pirtûka ewil a pedagojîk amade kiriye û senaryoya filma Zarê nivîsiye ku di dîroka sînemaya kurdan de yekemîn film e ku mijara xwe ji jiyana kurdan wergirtiye.⁴⁴¹

⁴⁴¹ [https://en.wikipedia.org/wiki/Zare_\(film\)](https://en.wikipedia.org/wiki/Zare_(film))



1. Բապա մո պըսըլամոթի
 Կըհանտո ոտա լահտե,
 Մո պ'հով ուո ճըվանտ լ'վի ճի,
 Քօ շընորիք պըխօազըն ժե.
 Չը' խօշա ով լահտա հա,
 Մինաեմ եա ազմանա:

Rabb me bi silametî
 Gihande roja lahdê,
 Me b' hev re civand l' vî cî,
 Ko şinorhk bixwazin jê;
 Çi xoş a ev lahda ha,
 Mîna ye ya azmana.

Wêne 30: Pirtûka çapnebûyî ya bi destxet: TESBÎHAT. Di vê berhemê de ku bi hecma xwe ve jî balkêş e (504 rûpel) bi sedan îlahî hene. Dîroka wê ne diyar e lê li pirtûkxaneyê dijîtal a vhmml.org qeyda “sedsala 19em” tê dîtin.⁴⁴² Li jorê wêneya îlahiya yekem ji nusxeya orîjînal, metna wê ya dijîtalîzekirî û transkrîpsiyona wê tê dîtin.

⁴⁴² <https://www.vhmml.org/readingRoom/view/505943>